


CİVAKA KOLEDAR Û
СІАВКА КОГЕДАК Û
PÊŞVEÇÛNÊN
БЕŞАЕСÛНЕН
ŞARİSTANÎ
ŞARİSTANI



ABDULLAH OÇALAN
АВДУЛЛАҲ ОЇАЛАН

PEŞGOTİN PEŞGOLIN

Di darizandina min a Êmralî de, mercên demê, di warê kompoyê û girtina min de bi awayekî lezgîn pêşlêgirtina şidetê, ne dayina fersenda hêviyên komplovanan û piştgirên wan, şopandina rêya herî rast, her çiqas ku gelekî bisînor be jî, jibo alîkariya aştiyeke birûmet pêdiviya hewldaneke mezin nîşan didan. Di vî babetî de nêzîkbûna herî pratîk, parêznameyên pêşxistî ku çareseriya aşti û yekîtiya demokratîk bingeh digirtin bûn. Di van mercan de, qet nayê ji bîrkin ku hewa lînceke siyasî li hawir serdest kiribûn. Ligor baweriya min, derdorên aqlî selîm û karbidestên Tirkîyê jî, di bin wan şertan de ji têngihîştina mantiqê kompoyê dûr bûn yan jî ne amadeyî qewimînên bi vî rengî bûn. Di her astê de, dorhêla bîryareke saxlem tinebû yan jî gelekî bisînor bû. Esasê wê, vê kompoyê ji hewayê pakêtek pêşkêşî şovenîzma ku gihayî asteke hîsterîk kir û di sedsala 20an de li arenayê jibo ku bi şêran bide xwarin, listikekî Roma amade kiribû. Şideteke wisa anîbûn holê ku mirov nikaribe ji nav derkeve û di ser hemû armancên PKKê re be, heta li dijî armancê wê be. Mixabin bi wan hemû yên ku li dijî hev bûn, wisa dabûn fêhm kirin û wisa baweriya wan anîbûn ku li hember hev bikaranîna hêrîşên xwekuji û berxwedanî, mafê wan yê herî meşrû ne. Ya herî ne baş ew bû ku her du alî jî, ji têngihîştina vê listikê gelekî bi dûr xistibûn. Exaneteke sedsalê ya herî mezin ev bû ku xwe hêjî mîna dost û alîgirê azadiyê nîşan didan, lê yên mezlûm ku babetên lehengiyê, bi awayekî sitemkarane tine dikirin û didan jibîrkirin. Meydan mabû ji wan xayîn û hevkarên ku di kemînê de, li benda rewşeke wiha bûn. Eslê wê, her tişt ligor mirina min hatibû duristkirin. Bi giranî hedefa wan ev bû ku min fizîkî, ew ne be jî, di warê wateyî de tine bikin. Digel gelek fikirînên min jî, ez texmîn nakim ku hedefên din dabin ber xwe. Komplo ewqas kûr û bi tiştên nayên zanîn tije bû, çirandin û derketina ji nava wê, bi awayekî mûcîzewî mirovatiyeke pêşketî û mezin dixwast. Her tişt wisa bi awayekî sitemkarane hatibû duristkirin ku tevayê cîhanê kiribûn dijber, heta bi dostên nêzîk û rêhevalên ku xwedî baweriyên serdest, ligor nîrxên mirûz (moral), ji "mirineke bi şeref" pêde ne li benda tiştêkî din bûn. Mantiqê sedsalê ev bû. Mantiqê dostan jî û yên dijminan jî ev bû. Xala ku dilîn û bawerî tê de cemidî bûn, evder bû. Her tişt mehkûmî tenêbûneke xofane kiribûn. Ligor qaydeyên şer, ez na bêjim "ber gule dan" cezayekî gelekî dûr e, her çiqas ku ev mîna mafekî tê nîşandan jî, ev maf nedane min. Şaristaniyê dixwest ku bi awayekî din heyfê li min hilîne.

Min ti caran xwe li qehremeniyê neqewimand. Her çiqas ez ne xwedî cesaretekî wisa bûm û her çiqas min dixwast ez weke xwe bixûyem jî, min xweş dizanîbû ku bi hevalên min yên herî nêzîkî min re jî, ez nebûme şahidê vê yekê. Lê aliyekî min hebû ku qet minê lê îxanet nekiriba: Minê rewşa "zaroka ku îxanetê li xeyalên xwe nake" bidomanda. Minê xwedayên şaristaniyê nas nekiriba, di saziyên wan de neheliyabama, ezê ji jinên wan re nebûbûma mêrê malê. Diyalektîka kesayetiya min, di warê pêşveçûneke wiha de serketî bûbû. Mîjar ji zû de ji nakokiyeke sivik ya nava Tirkîyê derketibû. Rewşa min, ez mehkûmî "Prometheusiyeke hemdemî" kiribûm. Ferqa bizmarkirina min ya li lata Êmralî, ji ya Prometheusê di efsaneyê de ku li çiyayên Qefqasya hatibû bizmarkirin tinebû. Çi dirûvtiyeke bi êş û xemgîn bû ku ev yek dîsa ji aliyê neviyên xwedayê Athena Zeus ve hatibû kirin. Moskovaya ku navendekî ji ya şaristaniyê ye, listika rezîlane ku li hember sosyalîzma -ne bi têrayî be jî- mîlyonan leyîstî, bi awayekî bê şerm û bê fedî di meseleya min de jî, jibo du îhaleyan û çend mîlyar krêdiyên IMFê leyîst. Li Romayê, arênaya koledariya klasîk û hesabên kapîtalîzma hemdem yên hesas, qet nîrxên ti moralî û yên ti hiqûqî nasnakîn, terora wan ya psîkolojîk wê ez mecbûrî şerê rûmetê bikirama û ezê di rewşa pêkanîna pêdiviyê de mabama. Athena, baweriya dostaniyê bi awayekî rezîlane bikaranî, bi cesaret û aqilekî ku fahîşe nikaribin bikin, wê ez bişandama nav yamyamên Kenyayê. Rûyê şaristaniya sedsala bîstan yê zexel, êşkenceker, bêhest û yê ku ji mantiqê berjewendî pêde qîmet bi ti nîrxên mirovahiyê ne dida, yê xwe nîşan bida û ezê matmayî bimama. Rastiya li dijî min ku refleks li min cemidandibû ev bû û ev jî rast bû. Yên ku li benda helwesteke din bûn, heger rastiye fêhm nekin û vê rastiye heta bi mêjiyê xwe nejin, nikarin ti encamên moral û ramanî jê derînin.

Min qet bawerî bi qederê ne anî. Lê ezê di çarmixa hemdem ya sedsala 20an, ya ku hêzên qederê jibo min fesilandibûn, bi serê xwe û bi bédengiya tirbekê bendewar mabama. Aedî minê heta bi lédana dilê xwe ya dawî, piçka hişê min ku mabû jî, jibo bikaranîna diwarê mirovahiyê, bikira rûmet û minê her tişt bi dev xwezayîya wan de berda.

Ev çend gotinê min, jibo kesên ku bixwazin helwesta min ya Êmralî fêhm bikin, hêviya min ne rexnekirin, ne xwerexnekirin, ne bexş (efû) û ne şeweyê jiyanekî bi vî an bi wî rengî ye. Pêşveçûnên

bi vî rengî, nabine rûmet û wateya jiyîna min. Rewş gelek cihêreng e û pêdiviya têgihîştina orîjînalîteyê dide nîşandan. Bêşik, her çiqas ku gelekî bi sînor be jî, jiberku

Helwestê aşî û biratî wesfê kûrahiya dil bû, minê pêşik nedaba meseleya helwesta siyasî yan jî ezê ligor çep û rastê şaristaniyê ne bûbûma bersiva hêviyên wan, minê xwe ne kiriba alet. Ezê li vir li mezinahiyê bigeriyama, li hember naleta şaristaniya hemdem têk neçûbama. Heger cîh bidin jiyaneke bi biratiya hevpar ku di aştiyêke bi rûmet û azad re derbas bibe, minê nirx bidana nêzîkbûna hemû siyasetan. Weke ku ez baweriyaya xwe bi nirxên komikên siyasî yên cuda cuda nayînim, liqasî xeyalperestiya wan, bi zanîna ku ji xizanî û mehrumî re vekirîne, di her astê de minê yekîtiyên spartiyê îfadeya azad tercîh bikira. Mîna her car, liqasî yekîtiya bi zorê, ezê ne ketibama cudahiya bi zorê jî û minê helwesta xwe ya bi wate berdewam bikira.

Rastiya parêznameyên min yên emralî ev in. Hêvî dikim ku çî roja here, nirxê wê hê bêhtir wê were fêhm kirin. Heger me terora bi rastî ku encama şensekî kor û bi nalet, liser Tirkîyê sekinandibe, me berjewendiyên ranta mijokatî ya sitemkar hêdî kiribe, me rêya demokratîk ya têkoşîna siyasî hê bêhtir bi wate û derbasdar danibe holê û li hember hêzên ku aştiyê naxwazin, me parastina çekdarî ya rewa bê yê çawa be nîşan dabe, êdî tê wê wateyê em bûne xwedî helwesteke dîrokî ku kesên xwedî dilên paqij nirx bidinê.

Divî babetî de bawer dikim ku yê nirxekî dîrokî bîne ziman, di serî de weke parastineke Rojhilat ya li hember Rojava û ya çanda Rojhilata Navîn li hember şaristaniya Ewrûpa, di warê ronîkirina dîrokê ya rast de, ez vê yekê liser xwe peywir dibînim ku platformeke hiqûqî û demokratîk ya ku gotinên liser navê gel tê de werin gotin binirxînim, herwiha ez mafê xwe yê parastinê li DMME (Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpa) bi cîh bînim. Ez vê yekê xelet nabînim û nakevim nava kompleksan ku rêya çareserkirina pirsgerêkên civakê yên ewqas mezin bûne dizanim, wî mafê xwe yê ku ji berjewendiyên karbidestên derketî holê bikar bînim, vê gelicandina olîgarşîk ku berevajî damezrandina Tirkîyê jî, berteref bikim û bi sînor be jî, bi platformeke ku sipartî çareseriyaya yekîtiyêke aşî û demokrat, alîkariyê bidim endamtiya YE (Yekîtiya Ewrûpa) yê. Ewrûpa di rewşeke pêşketî de ye. Heger em wê, bi aliyên ku ew dewlemend kirine xweş fêhm nekin, derfetên pêşketina çanda Rojhilata Navîn ku min pê bawer e, çênabin. Bi zanîna lihevparîkirina nirxên YE, li hêzên civakî bi awayekî dadiyane (adîlane), çawa nabe hevkarîyeye erzan, li hember vê yekê rawestandîna jî nabe pêşverûtî û ev yek diyar e ku yê were wateya paşverûtî û kevneperestiyeke tund.

Mercên ku rê ji girtina min re vekiribûn û ligor ku ev yek ji aliyê karbidestên şaristanî ve pêkhat, pêdivî ye ku parêznameya min jî, bi vî awayî were pêşêxistin. Divê berî her tiştî, serpêhatiya min ya Ewrûpa ku pêwîst e gelek ders jê werin girtin, derkeve holê. Di vî babetî de, tenê em xwe di nava rastiyan Tirkîyê û yên Rojhilata Navîn de bihêlin, ne mimkun e ku em rastiye bi timamî bibînin. Ev yek girîng e ku li qasî cîhderka pirsgerêkê, çareseriyaya wê jî di nav rastiya şaristanî ya Ewrûpa de were helkirin. Heta niha çend tevgerên ku navê wan rizgariya neteweyî, jiberku ev temamî bi dest nexistine, dibin dilên wan rêyên çareserkirinê ku Ewrûpa ew ji mêj ve derbas kirine, yan jî di borê polîtîkaya "perçeke-birêve bibe" de dixeniqin. Neteweperestî, olperestî û dûrmayîna ji demokrasîyê, her çiqasî nirxên ku Ewrûpa ji ser xwe avêtibin, sazîbûna raserî neteweyan, jiyana pir çandî û sazûmana demokratîk ku heta bi mafê kesan diparêze, dibin nirxên hemdem yên gerdûnî ku xwe dane pejiwandin. Ev nêzîkbûna bingehîn, hûrnêrîneke şaristanî dixwaze.

Sedemeke din ya herî girîng jî ev e ku trajêdiya bi serê min hatî, ji min zêdetir bi pratîka xwe ya gelê Kurd e. Terîfîkirineke rast ya di derbarê rastiya Kurd de, yê bibe rast dîtina pirsgerêkeke ku îro di rojê Ewrûpa de jî cîh girtiye. Ev rast dîtîna, wê qedera demokratîkbûna Tirkîyê jî diyar bike. Di vî warî de, çareseriyeye demokratîk ya li Tirkîyê, wê rê ji çareserkirina pirsgerêkên Rojhilata Navîn, Kafkasya, Asya Navîn û ya Balkanan re jî veke. Girîngiya vê pirsgerêkê ya navnetewî, ji vê rastiye tê. Heta weke îro ku berdewam kirî, înkâr kirina vê pirsgerêkê yan jî nêzîkbûnên ku qet nabin çareserî, wê bibin sedem ku dev ji vê rola erênî were berdan û wê ev krîza kûr, wiha berdewam bike.

Ji aliyekî ve nîqaşên liser bûyera Kurd tene kirin, bi hatina pirsgerêkê ya vê merhaleyê, bêşik ez weke yekî ku xwedî pareke mezin, girîngiyeye mezin digire ku nêzîkbûneke berfireh, zanistî û çareserker bikim bingeha parêznameyê.

Herwiha ne bi kûrahî be jî, emê bi xetên sereke dîroka şaristaniyê tehlîl bikin, ji aliyekî ve emê xwe berdîna çavkaniya pirsgerêkê, emê çareserkirina pirsgerêkê jî bi rê nîşandana vê tehlîl kirinê bînin cîh. Tiştên heta niha hatine kirin, yan înkâr e yan jî ji aliyê zanistî ve lawaz e, dilnên şoven ku li rastî bizavan hatine, him pêş ve ne çûne, him jî ne dane qezenc kirin û bûne sedemên bingehîn yên windakirinê. Rizandina pirsgerêkan, rê û rêbazeke herî ne baş e. Dibe ku mantiqekî tinekirinê hebe, lê mantiqê rizandinê tine.

Weke di pirsgirêkên hemû gelên ku pirsgirêkên wan yên civakî henin de, terîf kirina rastiya gelê kûrd, êşnasiya nexweşiyên wan û dîtina rêya başkirineke (tedawî) bijûn (saxlem), bi rêbazên (metod) vê nêzîkbûnê ve hişk girêdayî ye. Di dema damezrandina PKKê de, derbasbûna ji pêkneanîna nêzîkbûnên şamatîk yên reel sosyalîzmê, bêçareyiyên bi şûn ve ku ji neteweperestiya Kurd ya kevnare û bandorên dilînî dihatin, neyînîyên ku sedema bingehîn ya windayiyên bê wate, êş û azaran, derxin holê , ji navê rakin û ev xebata ku ne hatibû meşandin were kirin, heger ku bi derengî be jî û bûbe sedema êş û azarên mezin jî, peywireke (wezîfe) liser her kesî ye ku bi cîh bînin. Lêbelê yên ku bi hêz bin û berpirsiyar bin encex vê peywirê bi cîh tînin.

Wateya ku bi xetên stûr ketime dahûrandina tehlîlkirina şaristaniyê ev e. Dibe ku ev jibo çend gelan yan civakan zelal bûbe. Xebatên wan yên dîrokî û civakî ku berfireh rê ji vê yekê re vekirine. Lê jibo bûyera Kurd jî ev pêdivî ye û li hêviya wate dayînê ye. Dema ev were pêkanîn divê ku dîrok bingeh were girtin. Herçiqas ku ne geş û bi xeteke stûr be jî, dîrokeke Kurd heye. Heta ku ev dîrok neyê ronî kirin, dîtina roja me, êşnasî û başkirina vê rastiya ku gelicî ne mimkun e. Heger ku rêbaziya dîrokî biserkeve, hêzeke çareseriyê ya bêhempa yê derkeve holê û li qasî wê, yê rê ji hêsaniyeke nazîk re veke. Timamkirina bi merhale ya perspektîfên bingehîn yên dîrokî, têgihîştina roja me, ronahî kirina korîtiyê wê diyar bike ku perspektîfên çareseriyê yên dewlemend hene. Nêzîkbûnên olî û neteweperestî bêçiqasî çavan kor dike, ku were fêhm kirin bê nêzîkbûnên yek alî û xeyalî çawa mezin dike, girîngiya vê nêzîkbûnê yê bêhtir xuya bike. Di vî babetî de ev nabe dereng mayin. Dema beremberî pirsgirêka Filîstînê û yên mîna wê were girtin, ligel bêçareyiyên mezin, bi koka olî re, berdana rêya rêbazên neteweperestî ku ji sedsalan ve berdewam dike, pêdiviya nêzîkbûneke zanistî, hemdem û demokratîk nîşan dide. Ev yek gelekî girîng e ku hemû alî û sazîyên têkildar, bi vê rêbaza nû re rewşa xwe biguherînin. Qeyrana (krîz) ku Tirkiye tê de, ew aniye wê merhaleyê ku nikaribe vê bi paş de bavêje.

Bêşik aliyê herî diyarker ya rastiya Kurd ku gelek têkiliyên dîrokî û rojane jiya ye, dibe aliyê "têkiliyên Kurd û Tirk" . Ev yek gelek girîng e ku bi kûrahî û bi berfirehî liser were rawestandî. Heger çareseriyê ku tê daxwaz kirin, di nava dewleteke yekere (unîter) û yekîtiyeke demokratîk de be, ev rewş hê bêhtir wê tehlîl kirina zanistî ya têkiliyên dîrokî girîng bike. Divê em bi bîra wanê ku naxwazin pirsgirêka Kurd nas bikin bînin, bi gelek dewlet û komikên Turkî re yekîtiyeke hevpar li dera han, piştgiriyeke bi sînor jî, dibe şert ku ev piştgiriya dîrokî ye û rastiya vê ya rojane rast were naskirin. Ev rastiyeke ku nêzîkbûnên dilînî rê li ber tevgerê vedikin. Ev rêbazeke xelet û ne bi têrayî ye. Herwiha têkiliyên kurd û tirk ku di roja me de, nûsaziyeke demokratîk û berfireh dide inyatîkirin, rastiya van têkiliyan, aliyên wan yên çalexwarî û yên erênî yê werin nirxandin û bi nûsaziyeke qewîn (zexim) ji nû ve werin sererastkirin. Bêşik reform ji dînamîzma hundirîn derdikevin, lê jiberku xwe parçekî Ewrûpa dibînin û dixwazin têkevin YEYê, bi vê rastiyeke re girîngiya hewldanan du qat dibe. Nûsaziya konjektura hûndir û derve ne barek e. Jibo derketina ji vê qeyrana mezin, ev dibe şensekî.

Ji aliyê PKKê ve, parêzname hê bêhtir girîngiyê digire ser xwe. Nirxandineke zanistî ya PKKê, ne jibo endam û alîgirên wê bi tenê, jibo dijberên wê jî pêdivî ye. Wesfandina tenê bi terorê, ne tehlîleke ber bi çav e. Berevajî vê yekê, gotina "Her tiştê ku me kirî pîroz e" jî, yê me têxe nava şaşbûnan. Di roja me de, ne ji aliyê berbiçavîyên Turkî ye tenê, li erdnîgariya (coxrafya) Rojhilata Navîn, Kurd û bûyera PKKê ketine nav hev. Tehlîlkirina PKKê ya bi awayekî kûr, li qasî xwerexnekirineke bi wate, wê rê li ber çareserîkirinê jî veke.

Zelalkirina du peyvên mîna "teror" û "cudahî" ku bi behsa PKKê re tîr rojevê, pêdiviyeye gelek girîng e. Bêşik, divê ku pîlanên pişt van herdu peyvên bi dîrok û civakê ve girêdayî, xweş werin dîtîn, dîsa divê bîrdozî û pratîkên şoresên hemdem, di ber çavan re werin derbaskirin. Ya herî girîngtir ev jî dibe şert, terora lîpewîstker ya ku rastiya Kurd çewsandiyê, di nava dîrokê de tim hatiye pêşxistin, hatiye jiyandin û tim di rojevê de hatiye hiştin, bi awayekî zanistî were tehlîlkirin. Ewên ku qedexekirina pêşveçûnên azad yên di warê aborî, çandî, civakî û siyasî de hindik didîtîn, ew nêzîkbûna terorî ku qedexekirina liser ziman kirin nava zagona bingehîn, divê him di warê siyasî û leşkerî, him jî di warê hiqûqî û demokrasî de were nirxandin. Herwiha ev jî girîng e ku hinek nirxandinên tîgînî û teorîk yên ku cîh û destek ji PKKê re çêdikin, ji aliyê din ve ku ji rewşeke dijber jî dihatin, werin zelalkirin. Di vî babetî de, ji aliyê siyasî û hiqûqî ve, zelalkirina hinek tîgîn û teoriyan yên mîna sosyalîzm, serxwebûn, demokrasî, neteweperestî, zor, teror, yekîtiya yekere, neteweyetî, yekîti û cudayetî pêdivî ye û girtina rastî û şaşiyên wan ya li ber çavan, pir girîng e. PKK ya ku ji şewegirtinên tund yên van tîgîn û teoriyan, pareke bi zêdeyî wergirtî, ku ji aliyê pratîk û teorîk ve were nirxandin, wê jibo çareseriyê pêvajoyê, alîkariyeke mezin bike. Ev hatiye fêhmkirin û

derketiye holê ku suçdarkirinên zêde, yan wekî din nêzîkbûna parêzkariyê, xizmetê jibo çareseriyê nakin.

Yên ku PKKê binirxînin, divê bila ji hundirê wê bin, divê ji derveyî wê, divê bila dijber û divê alîgirê wê bin, pêdivî ye ku reseniya (orîjînal) pirsgirêka Kurd, rewşa wî ya di nav êş û şidetê de, bêpariya wî ya ji zanistî, pêşketina civakî û lidervegirtina wî ya ji vebûnên siyasetê, taybetiyên wî yên ku tim hatine qedexekirin û pêşeskirin (dewisandin), li ber çavan were girtin. Heger di navê de têkiliya bandor û tevger neyê dîtîn, nirxandinên ku bêne kirin, yê gelekî subjektîf bimînin û ev wê encamên xeter bi xwe re bîne. Ev jî wê nebe çareserî, wê bibe nêzîkbûneke bêçareyiyê. Ez derbasbûna ji vîna girîng dibînim. Herwiha di çareserkirina tiştê ku bikeve ser milê min de, ligel berpirsiyariyê ez liser xwe peywireke dîrokî jî dibînim. Lewre ev peywireke zor e ku ti kesên din nikarin bi cîh bînin. Ev nirxandinên di derbarê PKKê de, bi wate ne û yê bibin alîkarê çareseriyê, wê derfetê ji xwerexnekirineke rasteqînî re jî çêbikin. Nêzîkbûnên mehkûmkirin û suçdarkirinê, wê şensê veguherînan kême bike, wê bibe alîkarê têgihîn û helwestên hişk û kevneparêz. Dema em, pratîka li Tirkîyê ya li hember çepgir, rastgir û olperstan ku deriyên siyaseteke demokratîk li ber wan di gire û nêzîkbûnên wiha dibin sedema windakirina gelek nirxan, li ber çavan bigirin, girîngiya vê nêzîkbûnê yê hê bêtir derkeve holê. Di vî warî de serdestiya Ewrûpa, ji piştî gelek tecrûbeyên ku derî ji siyaseteke demokratîk û îfadeyên azad re vekiriyê, tê. Baweriya bi vê rêbazê û şensdayina wê, jibo çareseriyê pirsgirêkê rêya rasteqînî û hemdem e.

Di çareserkirina pirsgirêka Kurd de, derketina şidetê ya ji rêbazî, bi sînora be jî derbaskirina înkâr û çewandinê, ji nêzîk ve bi demokrasîyê vekirî ve girêdayî ye. Qedexeya liser perwerde û weşana ziman û çandê, li qasî ku şeweyekî terorê yê herî tund e, ji şideta li dijî re jî, rê vedike. Bê kontroliya şideta PKKê û bikaranîna şideta, ji têgihîna parastina meşrû gelekî derbas bûbû. Di gelek tevgerên dama me de, ev hê bêtir tê bikaranîn. Berevajî vê, agirbesta yek alî û li derveyî sînora ketina rewşeke xweparastina meşrû, tawanbarkirina (suçdarkirin) bi "terorîzm"ê vala derdixe. Tiştê pêwîst e ku were kirin ev e, nêzîkbûnên ku ji pêvajoya gotûbêj û yekîtiya demokratîk re derî vedikin, têxin dewrê û bikin ku bi tevayî çek werin berdan. Nirxandina rewşa PKKê ya di vê dorhêlê de, yê pêşiyê li neyînîyên gengaz (muhtemel) ku telafîya wan ne mimkun be bigire, pêdivî ye ku ev fersenda girîng wiha were nirxandin. Di berbiçaviyên Tirkîyê de, jibo veguherînan PKKê yê zagonî (legal) û demokratîk, rê li ber vekirin çêtir ji rêbazên bi tevayî qedexê û safî kirinê ne, ev yek rêya herî rast ya çareseriyê siyasî ye.

Min di parêznameya xwe de, ev nêzîkaya nerm, weke rêbazêke bingeh dît ku her dem li ber çavan were girtin û tercîh kirin. Di tevahiya Rojhilata Navîn de, çî dewleta ku pirsgirêka Kurd lê heye, ligor nirxandina min, li şûna pozberiyêke cudaxwaz û neteweperest ya bê encam, bi serbestkirina azadiyan, yekîtiyêke demokratîk, biratiya gelan û nêzîkbûneke polîtîk ya rasteqînî li aşî û xizaniyê, pêdivî ye. Gelek tecrûbeyên hemdem dane nîşandan ku pozberiyên ji neteweperestiyên piçûk derdikevin holê, rê li ber bêçareyiyê vedikin, hineke ku mîna ber bi çareseriyê herin jî, ji berê xirabtir dibin. Jibo ku erdnîgariya Kurd ya xwedî potansiyeleke pozberiyê, ne keve rewşa Êsraîl û Filistinê, berpirsiyariyêke mezin pêwîst e. Divê ku her dem, Rojhilata Navîn ya Demokratîk, weke armanceke stratejîk li ber çavan were girtin.

Ji aliyê din ve, pêvajoya DMME vê derfetê dide ku em çareseriyên wê test bikin, yan jî mîna şensê binirxînin. PMME (Peymana Mafên Mirov ya Ewrûpa) ku Tirkîyê jî, ji aliyê hiqûqî ve girêdayî wê ye, bêtirî ku min têkildar bike, rewşêke tevahî li ber çavan radixe. Sê mafên bingehî yê nîşan, anku mafên kesaniyê (şexsî) yê hemdem, mafên aborî û civakî û mafên diyarkirina hebûna azad yê çandan, ku NY (Neteweyên Yekbûyî) jî pejiwandine, Lê PMME berfirehtir liser rawestiya ye û endam mecbûr kirine ku pêwîstiyên wê bi cîh bînin. Bi gelek dozên bi vê naverokê ku ketine DMMEyê, divê êdî pirsgirêk bi awayekî esasî li ber çavan were girtin û bi gihîje normekî hiqûqî. Jibo bi hezaran doz, biryarên cihêreng rastiyê nîşan nadin, herwiha êdî pêwîst e ku zagonên pêwîst di parlemena neteweyî re derbas bibin. Di vî warî de, di nav endamên KE (Konseya Ewrûpa)yê de, Tirkîyê bi tenê, ligel mafê jiyanê ti peywirên xwe pêk nayîne. Di pêvajoya endamtiya YEyê de jî, pêwîstiya krîterên Kopenhagê bi cîh nayîne.

Hêvî ew e ku doza min bandoreke lezgînî bike. Heger ku Tirkîyê jî bixwaze, ez ji çareseriyêke bi dostaniyê re jî vekirî me. Ji vî alî ve jî, parêznameya min, derfetên ku hiqûq ji çareseriyê siyasî re çêdike, bi awayekî rasteqînî dinirxîne. Ne mîna demên borî, ku rêbazên leşkerî û siyaseteke hişk dihate bikaranîn, vê girîng dibîne ku şensê bide çareseriyêke di nav dewleteke hiqûq û demokratîk de. Di warê pêdiviyên Tirkîyê de, bi nirxandineke berpirsiyarî, dixwaze ku deriyekî ji çareseriyê dostaniyê berfireh û ji guftûgoyêke siyasî re vebe. Min berpirsiyariyêke dîrokî dît ku ez rewşa xwe ya kesaniyê, hê bêtir bikitekit (bifeferûat) bînim ziman. Ev peywireke girîng e ku li

derveyî pêdiviyên teknîk yê dadgehê, hinek tiştên ku qewimîn, her çiqas ku aliyên wê yê wêjeyî zêde bin jî, werin xebitandin û rastiyên dibin dozê de werin ronîkirin. Tenê ne hiqûqê navnetewî, perçiqandina gelek nîrxên mirûz (moral) jî, ez mecbûr kirim ku liser vî aliyê parêznameya xwe bi kûrahî rawestim. Di kesaniya min de, ne tenê trajêdiya gelê Kurd ya rojane, bêkesiya mezin ku ji dîroka wî ya binalet tê, aletbûna wî ya kompoyan û îxanetên kes nedîtî ku bi serê wî hatin, encex bi daxuyaniyên berfireh werin ronîkirin. Armanc ev e ku were gotin, êdî ev trajêdî bes e û têkevin rêya pêşveçûnên hemdemî. Ev beş, mîna kurtahî û dawiya parêznameya min dikare were nîrxandin. Di bingeha vê pêşgotinê de, parêznameya min ku ezê pêşbixim, wê gelek kêmasiyan bi xwe re bîne. Di vî warî de, bitenêtiya min ya sê salan li ãmrallyê, ku bi bandoreke mezin hiş û zîmanê min mehandî , roleke girîng dilîze. Lê dersên ku min ji pratîka stemkar derandin û jiyana min ya giran, bawer dikim ku yê ji derdorên têkildar re xizmeteke baş bike. Demeke dirêje ku yekem car ez dinivîsim, herwiha min xwest ku ez vê peywira xwe bi cîh bînim.

BEŞA YEKEM BEŞA YEKEM

CIVAKA KOLEDAR Û PÊŞVEÇÛNÊN ŞARİSTANÎ CIVAKA KOLEDAR Û PÊŞVEÇÛNÊN ŞARİSTANÎ

Pirsgirêka Kurd ya ku di parêznameya min de mijara sereke ye, di nav reseniya xwe de, bi rasteqîniyêke civakî ku di pêvajoya belavbûneke pir alî de, ji bûyina xwe heta bi gihîştina xwe, di pêşveçûnên ber bi şaristaniyê ve û bi têkilî û nakokiyên ku jiyayî ve girêdayî ye.

Nirxandinên binyata çîmî û neteweyî ku bi pîvanên hemdem tên kirin, derfetên têgihîştina rasteqîniya Kurd nade. Nirxandinên ku di vî warîde werin kirin jî, ewên ne berçav bimînî û wê gelek şaşiyên bi xwe re bin. Vê pirsgirêka ku sînorên Rojhilata Navîn hilweşandine û ketiye rojeva Ewrûpa û gelek hêzên hemdem, pêwîstiyê nîşan dide ku di nav dîroka şaristaniyê de bê nirxandin. Heger bingeha ku pirsgirêk pêve girêdayî rast neyê terîf kirin, encamên rast yê hiqûqî jî wê werin asteng kirin. PMME û DMME (Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpa), du saziyên demokratîk yê Hiqûqê ne ku şaristaniya Ewrûpa vê dawiyê pêşêxistine. Rastiya ku neyê nîqaş kirin ev e, şaristaniya dema me ya tekûz û serdest, bi pîvanên nirxê Ewrûpa tê temsîl kirin. Kurdên ku îro bi awayekî pêkenokî (îronîk), li ber deryê Ewrûpa li çareseriyê pirsgirêkên xwe digerin, bixwe çavkaniya bûyina vê şaristaniyê ne. Dayîkeke gelekî pîr, ji wan zarokên xwe yê ku bi hezar salan di dergûşê de mezinkirine û ji aliyê wan ve êdî nayê naskirin, dadmendiyê dixwaze. Gelo mafê vê dayîka şaristaniyê wê were dayin? Pirsgirêk hinekî jî wiha hatiye kilît kirin. Hêza civakî û ya ferdiyîkirin li pêşberî hev in. Erdnîgariya Rojhilat û Rojava, Asya û Ewrûpa, û ya Anatolya û Grek, mîna şanoyekê xûyane û bûne eniyêke li pişt şanoya emralî ku tê pêşandan.

Heger kesekî bêkêr jî, bi bal binêre, liser vê şanoya darizandinê yê li bersiva van pirsan bigere: Senaryoya vê şanoyê kê nivîsî, rolên diyarkirî çawa li hev hatin parvekirin, aktor û figûran kî bûn û xwestin kîjan mesajan bidin temaşevanan? Doza min ya ku DMME kiriye rewşeke teng û ferdî, bi nirxandineke wiha wê gelek rastiyan durrî çavan bigire û yê perdeya şanoyê ya dawî bilîze. Jibo ku ne kevîne vê rewşê, pêşveçûnên dîrokî yê bi xwîn û êşkence ku saziyên hiqûq yê demokratîk li hember van damezirîne, heger biryar û rêvebirineke dadwer ne meşînin jî, bi baweriyê ku yê derfetê bide nirxandineke azad, ez ronîkirina dîroka kirêt, bi xwîn û bextreş a li pişt doza xwe, peywireke bingeh dibînim. Nirxandinên ku ez dixwazim, di bin beşên sereke de pêşbixim, ji aliyekî ve bi armanca parêziyê ne, ji aliyê din ve jî ez dixwazim bidim nîşandan ku çend sal in, bi jiyana min ya di hicrê de û bi bandora ku liser hişê min kirî, yê kê mînim. Ji ber van sedeman, dozên dîrokî nirxandinên dîrokî dixwazin. Ev doza ku êş û windakirinên wê mezin, jibo ku her kes dersê bigire, pêwîst e berpirsiyar daxûyaniyêke serketî bidin. Layiqê dozên dîrokî û ya pêwîst jî ev e. Ev peywir, çiqas ku biwate were bi cîh anîn, Doz bi xwe jî yê layîqî navê xwe yê dîrokî be.

A- SUMER

Şaristaniya li peravên Dicle-Firat helatî

Şaxên bingeh yê zanista civakî, weke arkeolojî, etnolojî û teolojî, bi lêkolînên berfireh yê di sedsala borî de kirin, gihaye vê encamê ku civaka yekem a bi dewlet, xwediyê dîroka nivîskî û şaristaniyê, Sumerî ne. Dema em binin ber çavan ku demeke dirêj, dîrok weke saziyên civaka bi dewlet hatiye girtin, ev pêşveçûn dibe pêşveçûna dîrokê ya herî mezin. Bidewletbûn, bi aliyên wê yê erênî û neyînî, di dîroka mirovahiyê de, tê wateya gav avêtineke mezin. Dewlet mîna amûrekî civakî û saziyêke berfireh, hebûna xwe di roja me de jî, bi xetên sereke didomîne. Dewlet şêweyên serdestiyê ne ku liser hilberîna keda mirovan ya ku tê guhertin hatine damezrandin. Jibo vê yekê, bi naskirina Sumeran emê xwe û roja xwe nas bikin. Heger Sumerî ne hatibûna keşif kirin, bi jîbîrkirina vê çavkaniya şaristaniyê ya herî kevin û sereke, me yê xwe jî ji bir bikira û me yê bi awayekî rast dest bi dîrokê ne kiriba. Ji ber vê yekê Sumerî do ya me ne û mîna do gelekî nêzîkî me ne. Herwiha Sumer çawa çêbû û di nav xwe de kîjan saziyên bingeh vedihewîne? Bersiva van pirsên dîrokî jî, çiqas ku diçe, lêkolînên dîrokî, bi şêweyek nêzîkî rastî didin.

Bêşik, pêşveçûnên di heyîna civakî yê berî dewletbûnê de, jibo civaka bi dewlet merca pêşî e. Sepînkirina (tetbîqkirin) teoriya peresanê (teoriya tekamulê) ya li mirovnasiyê (antropolojî) dide çespendin (îspatkirin) ku prîmatên hoveber -kalikên mirovan yê pêşî ku mîna meymûnan- beriya 60 mîlyon sal çêbûne û beriya 20 mîlyon sal jî, di encama mercên avhewayî (siriştî) de, li rojhilatê Afrîka cûreyek (çeşîdek) bi amûrên hoveber liser du lingan pêşveçûn pêk aniye. Ev jî hatiye

çespandin ku beriya 3 mîlyon sal, piştî hilweşîna rojhilatê Afrîka, Derya Sor û Derya Spî, li derdor belav bûne. Ji mîlyonek sal û virde, li rojhilatê Derya Spî û li qewîniya Toros-Zagros -bi gotina dîrokzanan Hîvika Zêr- çiqas ku diçe siftbûneke (tîrbûn) zêde tê dîtîn. Di vê de, kêrhatîbûna çanda avhewa, rîwek (nebat) û ajalan (heywan) rola bîngeh dilîze. Nefsên (nufûs) ku li vî parçeyê erdînîgariyê zêde dibin, li çar aliyên cîhanê belav dibin. Di koka mirovên Asya û Ewrûpayî yên îro de, ev heyîn di warê genetîkê de jî dikare were çespandin. Hîvika Zêr, bi giranî li navbera Dicle û Ferad, bi navê din ya dîrokî Mezopotamya, di warê pêkhatina civaka komunî ya hoveber de jî, xwedî roleke sereke ye. Ji holê rabûna serdema qeşayî ya beriya 20 000 salan, veguherîna avhewa ya sar û mehteşî bi ya hênkayî û şiliyê, di navbera salên 15 000 û 12 000an de, rê li ber pêşveçûna civaka mezolîtîk vekirîye. Li herêmê birhanên (delîl) civaka mezolîtîk gelek in. Di pêşveçûna civakî ku ji nêzîk ve bi avhewayê ve girêdayî ye de, Beriya dor 10 000 salan, mehteşiyê ku ji nişkê ve derketibû holê, li şûna pêşveçûnên ku tenê danehev û nêçîrvanî bû, serdema Neolîtîk -serdema kevirên sîqalkirî (cîlakirî)- derande holê. Heta weke niha, bermayî yên civaka neolîtîk yên herî kevin, li jora Dicle û Ferad tên dîtîn. Serdema Neolîtîk, bi pêkanîna çandinî û kedîkirina ajalan, mîna şoreşeke gundiyan bû. Li Amedê, Erxenê -Çemê Kote Ber, Batman -Çemê Xalan, Riha Siwêrek -Newala Çorê, kolanên hatine kirin, niştecihbûna tevdeyî ya li vê herêmê dibe BZ (Berî Zayînê) heta bi salên 10 000an. Di bin gelek kaşên ji axê ku di navbera Dicle û Ferad de bilind dibin, gond ên herî pêşî yên şoreşa neolîtîk dimînin. Ev gond weke tê zanîn bi kurdî ye. Di zimanê Lûwiyan de ku ev gel ê Anatolya yê herî kevn e, -ev jî dikevîne koma zimanê Arî- tê wateya 'Welatê cîhên bilind' pişt re, Gondwana werdigere Kurdîan, di serdema navîn de di devoka Selçûkiyên êranê de, dibe Kurdîstan. Liser vê mijarê hûn dikarin bi berfirahî, di beşa dîroka Kurdîstan de lêbikolin. Birastî jî ev kaşên ji axê ku îro jî li ber çavane, didin diyarkirin ku şoreşa neolîtîk li van dera, bi kûrahî û berfirehî hatiye jiyandin. Heta weke îro, li ti derên cîhanê kevnariyêke wiha ne hatiye dîtîn.

Ev yek weke nêrîneke zanistî bi piranî hatiye pejirandin ku civaka neolîtîk jî, mîna civaka mezolîtîk jî vê axê li çar aliyên cîhanê belav bûye. Ev belavbûna sereke ku serdema BZ ya herî girîng e, xwedî taybetiyêke wisa ye ku bi berfirehiya civakî jî, hemû mercên şaristanî derandine holê û bi xwe re anîne. Civaka neolîtîk BZ dinavbera 6000 û 4000an de, li nivenda Dicle û derdorên Ferad pêş ve çû ye, ev civaka ku di çanda Khalafbûnê re derbasbûyî, BZ di salên 6000an de gihaye Bakurê Afrîka - Misrê, Ferada Jêr, Kendava Basrayê û Nivenda Anatolya -Çatalhoyuk ê, BZ nêzîkê 5000 an de, gihaye Kafkasya, Bakurê Derya Spî, Balkanan, Bakurêrojhilata êranê, Hindîstanê, Pencap û Peravên êndûsê, BZ di salên 4000an de, gihaye Sînê û tevaya Ewrûpa yê, BZ di salên 3000an de jî, gihaye Parzemîna Amerîka yê. Nêrîna dîroka zanistî, belavbûna bi vî rengî di warê vedîtînan de, weke angaşteke (tez, îdîa) herî nêzîkî rastiye dinirxîne. Çanda Tel Khalaf jibo şaristaniyê hemû amûrên pêdivî dahênandine (îcad kirine). Hemû amûrên ku şaristanî pêşve birin, weke kûzik (dîzik), bivir, halet, ristina hiriyê, rêçandin (çêkirina qumêş), hêrtina liban, qesirbendiya (Avahîsazî) gundan a tomerî (bitevayî), tekelek, ji kevirê şîn çêkirina amûrên niv madenî, pejirandina stêrkan ya îşaretan, îdeolojiya bîr û baweriya xwedawendî (îlahe) ûwd. Hilberînen mirovahiyê yên vê demê ne. Heger bi rola xwe ya dîrokî bîr nixandî, ev encex bi sedsalên 16-20an re werin raberkirin (muqayese). Cîhê vê çandê di dîrokê de ev e.

Li nêzîkî Kendava Basrayê, belavbûna Dicle û Ferad ya li qadeke berfireh û bi lewe (aluvyon), bi hewldanên civakên ku nûnerên çanda Tel Khalaf, bereketêke hilberîne ku heta wê demê ne hatibû dîtîn, derande holê. Di vî derbarê de, ji ber mehteşiya ku BZ di salên 4000 û 3000an de bi serê wan hatibû, coyên avdanê ku hatibûn çêkirin û çandîniya avî roleke mezin leyîstibû. Bi tevlibûna gelek darên xurme û bi masiyan jî, di ramanên mirovan de têngihîneke bihiştê çêkir û şensekî destpêka demê nû bi dest xist. ædî dem ketibû dema 'dîrok li Sumer dest pê dike'. Di salên BZ 3000an de, bi dahênandina nivîsa bizmarî, êdî dîroka nivîskî jî, dest pê dike.

Digel ku gelek terîfkirinên şaristaniyê hene, taybetiya cihêreng ev e ku ji mesrefê bêhtir hatina gelek, rê li ber keda mirovan ya hilberîna zêde vedike, dike mijara têkiliyên koledarî anku xwedaniyê (mulkiyetê). Şêweya ku Sumeran pêk aniye, damezrandina Zîggûrat ên rahîban yên ku him perestxane (îbadetxane) bûn, him cîhê karê pevrayî (kolektîf) bûn û him jî navenda rêvebirîya civakî bûn. Ev navendên ku nasnameya civakê bûn, xwe dianîne wateyêke pîroz ku xwe mîna nûnerê sazûmana (nîzam) ezmên yên li erdê didîtin, di pêvajoya dîroka şaristaniyê ya vê dawiyê de, dibine pêşnimûneyê (prototîp) perestxaneyên mezin, komele yan (meclis), kargehan, baregehên leşkerî û navendên çand û perwerdeyê, Zîggûrat di sazîbûna dewletê de cîhderka sereke ye. Dahênana ku dibêjin dewlet anku Zîggûrat, bi rahîbên ku îdeologên wê demê bûn, rê li ber berhemdariyêke mezin vedikin, hê di serê wê de wan pîrozwer berdidin û mîna nûnerên sazûmana

ezmên yêner liser rûyê erdê, di ramanê mirovan de serdest dîkin û dibin cîhderkên desthilatî yêner pêşveçûyî.

Ev jî aliyekî ve weke amûrekî hilberînê, keda koleyan ku dayîneke gelekî zêde dianî û gelek mirovên ku li derveyî hilberînê mabûn, derfeta xweşî û dema vala bi dest dixistin ku di warê olî, huner û karên rêveberiyê de bixebitin, jî aliyê din ve weke navendêke rêveberiyê ya manewî teolojîya Sumer ku sazûmana xwedayan damezrand, desthilatdariyeke mezin liser mêjî, raman û heyinên giyanî dike. Pêşveçûna dargî (madî) û ya manewî hev û din beramber xweyî kirine, xwedaniya pîroz, sazûbûna olî û malbatê weke bingeha malbatê jî nû ve şêwe digire, civaka ku xwîn û nijada wan yek, êdî bi binyateke bi çîn bi tebeqe û bi saziyên nû tê temsîlkirin.

Birastî jî, dewlet dahênanêke sumeriyana e. Pêşevanên vê pêvajoyê, di serî de li qasî ku îdeolog bûn, jî kesên wisa pêk dihatin ku weke rêveberên rola wan di warê bi rêkûpêk kirina pratîka hilberînê de jî be. Ædî jî rahîbiyê derbasbûna qeralên rahîb nêzik bû. Zemîna dargî û manewî bi awayekî tekûz pêşveçûbû. Ligor nivîsarên (metnên) di dest de, mîtolojiya sumeriyana were lêkolîn, emê bi awayekî zanistî têbigihîjin bê çima sumeriyana çî tiştê ku kirine, gotine ev sazûmana xwedê ye. Lê mirovên wê demê jî bedêla ku zanibin ev sazûmanêke mirovan ne, wisa bawerîya xwe dianîn ku ev sazûmana xwedayî ya liser rûyê erdê ye û jî sazûmana asîmanî ya rahîban pêk tê. Şêweya bingehîn ya ramanê ne bi zanîna bi baweriyê ve girêdayî bû. Hemû tişt sazûmana xwedayan bû. Ji dil û bêşik bawerîya xwe bi vê dianîn.

Ti îdeolojiyan weke mîtolojiya sumeriyana, bandora xwe ewqasî liser mirovan ne kiriye. Mirov şaş dimîne bê sumeriyana çawa ev mîtolojî derandine û kirine teolojî, wekî din çawa weke dewletekî û îdeolojiyekê birêkûpêk kirine, pişt re çawa kirine çavkaniya tevgerên olî, felsefî û zanistî û çawa di warê wêje û huner de jî bi şêweyek saf û hoveber wate dayinê. Dive mirov şaş nemîne ku sumerolojî, bûye beşa dîrokê ya herî girîng û her ku diçe vê girîngiya xwe bêhtir pêş dixê. Cîhderk gelekî girîng e. Heger ku ev cîhderk neyê dahûrandin (tehlîlkirin) dîrok hemû yêner bi kêmasî bimînin û şaş bêne nivîsandin. Ji ber vê yekê Sumer pîr girîng e lê mixabin ev girîngî niha tê fêhmkirin û encamên bibandor derdikevine holê.

Di warê pêşveçûnên dîrokî de, em dikarin rola sumeriyana bi xalên sereke wiha bi rêzînin:

- 1- Dahênanê nivîsê
- 2- Matematîk û salname
- 3- Mîtolojî û teolojîya berfireh ya seretayî
- 4- Saziya dewletê û siyaseta, çînîbûn.
- 5- Zagon (qanûn) û hiqûqa nivîskî
- 6- Bajarvanî (şaresazî), perestgeh, huner, navendîbûna bazirganiyê
- 7- Xwedanî (mulkiyet) ya taybetî û ya pevrayî
- 8- Malbata pîroz û xanedanî
- 9- Wêjeya nivîskî û destanan, muzîk
- 10- Mêhtingehbûna (kolonîbûn) seretayî û emperyalîzm

Em dikarin gelek têgîn, sazî û sazûmanan tevî van xalan bikin. Lêbelê ev çend xalên han jî, nîşan didin ku qurmê şaristaniyê yê sereke û cîhderka wê di vê bingehê de pêkhatîye. Yêner ku vê dawiyê lê hatine zêdekirin, bisînor û di babetê çendayînê de ne, beşên bikitekit û çalakîyên pêşveberînê ne. Gotîneke sumeriyana ku bikartînin û jê gelekî hez dîkin heye. Dibêjinê "me" yanê zagon, dikarin bibêjin taybetîyên şaristaniyê jî. Sumerî di ferqa dahênanên ku pêkanîna de ne, "me" yêner pîroz bi zagon tîner binavkirin û tîngînbûnkirin. Heta niha 104 heb jî van hatine hijmartin. Xuya dike ku ev hijmar hê jî yê zêde bibe. 99 navên xwedê jî van tîngînen sumeriyana tîner.

Di behsa sumeriyana de mijareke din ya sereke ku em bînin zimên, pozberîya îfadeya mîtolojîk ya di navbera sazûmana daykanî (maderşahî) û bavkanî (Pederşahî) de derbas dibe ye. Demên berî "Nînhûrsag" ya ku em dikarin bi navê keybanû ya çiya bi nav bikin, xwedawenda sazûmana herêmên bakur û rojhilat ên çiyayî -bi stêrkê tê temsîlkirin- bû, ev xwedawenda bi "Stêrk" ku navekî kurdî ye tê bi nav kirin, di sazûmana dewleta Sumer ya desthilatiya mêran de dikeve plana duyemîn, herwiha bi koledariyê re jin jî hêza xwe wînda dîkin û di vê qadê de pozberîyeke mezin dest pêdike. Lêbelê di dewleta Sumer de, hê jinê hemû tiştê xwe wînda ne kiriye û hurmeteke mezin dibîne, di sazûmana xwedayan de, nivî nivî cîh digire. Nînhûrsag bi xwedayê mêr "Enkî" yê xasûk û zana re dikeve nava pozberîyeke mezin û bi piranî ev pozberîtî bi lihevhatîna diqede. Vê dawiyê dema ku di bin navê "ennana" de derdikeve pêşberî me, weke xwedayêke afirînêra neolîtîkê "me" yêner xwe yanê dahênanên xwe jî Enkî werdigire û dema jî bajarê Enkî Erîdû vedigere bajarê orûk,

xwedî serkeftineke mezin e. Di heman demê de, di mîtolojiya Sumer de jiberku bûye mijara baweriya misoger (quteber), olî bû ye. Hemû lihevda û pozberiyên ku tên meşandin, diyar e ku liser dewletbûna Sumer, têkoşîna çînî û şerê bajaran yên xanedanî ne. Mirov qet bi hev re pozberîtiyê nakin. Di sazûmana xwedayan de, ev yek nayê ramandin. Lewre benî (evd) encex bibin sî. Yên xwedî viyan (îrade) tenê xweda ne. Liser navê mirovan encex ew lihevda bikin û lihev werin. Ev desthilatiyeke bîrdoziyî ya herî balkêş e, binyatê têtî û saziyên dewletê yên ku sazûmana olî, hiqûqî û siyasî bi navendîbûna xwe temsîl dike de digire. Her çiqas ku vê desthilatiyê hebûna xwe veguherandibe jî, hê jî bi awakî balkêş dide meşandin.

B- Rola dîrokî ya şaristaniya Sumer û sazîbûna wê

Digel ku bişemleke mezin pêvajoya dîrokê dabû destpêkirin jî, sedema ku şaristaniya Sumer di warê dîroka zanist de cîhê xwe yê layîq ne girtiye, keşîfbûna wê ya dereng û serdestiya ramana Ewrûpa ya xwepereşti ye. Xwepereştiya şaristaniya Greko-Romen, di vî warî de roleke mezin dilîze. Her pêngava şaristanyê, xwedî xwezayîyeke xwepereşt e ku pêşveçûnan bi xwe re bisînor dike û ji xwe re dike mal. Sumerî jî li hember nîrxên serdema neolîtîk, di nava xwepereştiyeke wiha de bûn û ji xwe re dikirin mal. Wan afirandina her tiştî, bi sazûmana xwedayan yên ku ew jî afirandîbûn ve girêdîdan. Di bin van têtî û sazîbûnên ewqas balkêş de ku heta îro jî hatine, ev sazûmana sumer ya mîtolojîk- teolojîk heye. Vê bandorkirinê em dikarin bi beşên sereke wiha bi rêzînin:

a- Çêkirina civaka biçîn: Ji aliyê zanistiyê ve tê pejirandin ku pêvajoya civakîbûnê, bûyera herî bingehe e ku bi destê mirovan hatiye pêkanîn. Bi tevayî li derî mirovan, pêvajoya peresana (tekamûl) xwezayî ya di hemû giyandaran de berdewam dike, di civaka mirovan de bi têtî û viyana xwe bi zanistî tê berdewamkirin. Dema nîfşê mirovê Homo Sapiens, qevastina di warê pêvajoya têtîhîna bastûra zimên ya îroyîn de, derfetên qevastinê dane çêbûna civaka bi viyan. Komikên mirovan yên di merhaleya civatokên hovik de, di asta (sewiye) komên ajalan yên pêşketî de dijîyan. Dema ku mezinbûna mêjî û bikaranîna amûr û teknîkên jiyane bi nîfşên Homo Sapiens re gihîştê pileyeke bilind, merhaleya yekemîn a ku bingeha şoreşa civakî, pêk tê. Taybetiya bingehe ya vê şoreşa civakî, têtîhîştina serdestî û qenciya jiyana ku bi hev re bû. Mîna elementên ku pêşî di dîngê (made) de çêbûn, di warê civakbûnê de jî, pêşketina dezgehên zexim û payîdar, dabaşa axaftinê ne. Berî dîroka şaristanyê, dirokeke civakê wiha ku bi hezar salan domkiriye heye.

Şoreşa gund a neolîtîk, di vê pêvajoyê de merhaleya duyemîn ya mezin e. Ev şoreşa ku beriya 12 000 sal pêşketibû, pêngava herî mezin a civakbûnê ye. Bandora vê pêngavê ya liser pêşveçûna mirovan, bi saziyên xwe yên dîngê û manewî di hîmê bîrûbaweriyê de berdewam dike. Tiştên ku her tim şaristanî xweyî kirine û hê jî xweyî dikin, bîrûbaweriyaya jiyana azad a xwezayî ku îro jî daxwaza mirovan ne, bi xwezayê re dostaniyeke zindî, hîmê giyanî ku ji xof tirs û bandora hêza xwedayan dîr, dilînen zexim yên dayikîtiyê, daxwaza wekheviya jin û mîr, çandî û ajalên kedîkirî ku îro jî hilberîn û amûrên wan Ewrûpayê xweyî dikin, bîrdoziya bi van hilberîn û amûran ve girêdayî, raman û bastûra ziman û têtînen wan, keşîfkirina madenan û vekirina wan jibo bikaranîna şoreşa gund a neolîtîk û bi vê ve girêdayî, pêşveçûna hîmê civaka gundewarî ya cîwarbûyî ne.

Heger xweza û deştên ku Dicle û Ferad xweyî dikin û bi van ve girêdayî, amûrên ku ev şaristanî afirandî û sazûmana mezin ya civakî nebûna, ne civaka Sumer ya bi çîn, ne dewleta Sumer û saziyên hîmê bilind û ne jî xeta şaristanyê pêşketî ya vê dawiyê derdikete holê. Dikarin bibêjin dîrok ne disekinî, hey yê ji derna bipijiqiya û pêş ve biçûya. Ev teoriyek e. Dîroka ku diqewime yê cidî were girtin û evê nêzîkbûna meqûl a dîroka zanistî be. Jibo nivîsandina dîrokê ya rast û hişmendiya wê ev nêzîkbûna me gelekî girîng e.

Bi gelemperî civakên ji derî Ewrûpa, bi taybetî civakên Rojhilat ku di rolên xwe yên dîrokî bigihîjin, yê ewlebûna bi xwe pêşbêxin û evê derfetê bide wan ku têkevin ser rêya xwe ya rast. Aliyê şaristaniya Rojava yê herî xeter, aliyê wê yê serdestiya bîrdoziyî ye, heta ev serdestî neyê şikandin, pêşketineke azad ya di rêya siyasî û aborî de çênabe û ji sazûmana cîhanê ya bi heqî, parwegirtin mimkûn nabe. Ezê van mijaran di beşên têtîkildar de bi kûrayî binim zimên.

Heger ez vê mijarê jî neyînim zimên, yê kêmasiyeke mezin derkeve holê. Di beşên pêşiya me de, yê baş were diyarkirin ku hîmekî bingehe ji ya şaristaniya Ewrûpa, berî ku takekesîti (ferdîtî) ya ku fermîtî (resmîyet) daye mafê mirovan yên takekesî, têtî û hiqûqa wê çêbibe, jibo civakîbûna komek mirovên meymûnî ku bi sed hezar salan ji prîmatan derketin, hewldanên mezin hatine pêkanîn. Esasê wê, hemû pûtperestiya (fetîşîzm) hoveber, giyanwerîtî (anîmîzm), totemî (totemîzm), heyinên gelek xweda û yek xweda, jibo ku nîfşê mirovan bi sazûman û civakê ve girêbidin, şer meşandine, di vî warî de hewldanên xwe kem ne kirine. Saziyên mîna daykanî,

bavkanî, sêrebendî (efsûnker), şamantî (şamanîzm), rahbîtî, û pêxemberî, jibo ku mirovan ji ajo (dozîn) ya ajalî (heywantî) derînin û wan têxin rêzika civakî û sazûmanê. Jibo vê yekê rêbazên ku hatine hîlbijartin, dibe ku biêş, biêceb bin û neyên fêhmkirin. Di serî de ji qurbankirina mirovan bigirin, pêşkêşî û merasimên cur bi cur, mîna parçeyek ji yê pêvajoya perwerdeya hoveber in û hemû jî, jibo hêza civakî derînin holê ye. Divê em ne bêjin civaka hov û em bi borin. Dive bi van rêbazên ku şaristanî derandine holê, hewldanên mirovan yên esîl werin dîtînin ku mirovan ji ajaltî derînin û xwezayê têxin xizmeta wan. Ev hewldan nebûna, em jî ne dibûn. Ji mercên xwezayê yên ku bi nebîreweriyê dikarin bibin dogeh, çûyina ber bi cîhaneke wek bihiştê, yê di vê rêya zor û zehmet ya civakbûnê re derbas bibe. Têgîna dogehê ku zoriyên cîrnexweş bi bîra mirov tînin, weke têgîneke herî pêşî û bingehîn di hişê mirovan de cîh girtibû, lê têgîna bihiştê bûye têgîna berbanga hêvî, pêşeroj û jiyaneke mirovahî.

Bi damezrandina mîtolojî û olên pêkenî re, divê ku çîroka bê mirov çawa bûye mirov, neyê ji bîrkirin. Em bi zagonêke fizîkê mînakê bidin, weke atomên hîdrojenê ku vejena (enerjî) rojê diderînine holê û hev û din digirin dibine atomên helyûmê, jibo ku vejen û teqîna civakî derkeve holê, pêdivî bi bûyera civakbûnê heye. Heger ku kesayetiyên dayîk, bav, totem, xwedê, sêrebend, rahîb û pêxemberan weke saziyên afirînerên vê pêvajoyê werin fêhmkirin, emê civakîtiyê xweşiktir fêhm bikin. Taybetiya bingehîn a şaristaniya Rojava an jî Ewrûpa, bi şeweyekî giran û pêşêxistina hinek aliyan ji vê pêvajoya çewt (ters), hîmên civakî yên ku ne ligor berjewendiyên xwe dibîne belav dike û di bin navê azadiyê de takekesiyê (ferdîtiyê) radike ji piya. Kes û saziyên dewlemend û kapîtalîst ku ji qeran û dewlemendên di dîrokê de otorîtertir, berhemên vê felsefeya çewt in. Evan ji madenên civakî ku bi milyonan sal keda mirovan bûn, erdnîgariya ku lê, seresazî û binesaziyên wê, aliyên wê yên daringî û manewî,

Yên ku ne ligor berjewendiyên wan û karê wan ne bi dilê wan bûn, parçe kirin û xwedanî li yên bi kar kirin. Ev yek mijareke bingehîne ku filozofên îro gelekî liser radiwestin bê ev çiqasî ber bi şaristaniyê ye, an jî li derî şaristaniyê ber bi ajaltiyê (heywantiyê) ye. Di vî babetî de pêdiviyê ku bi berfirehî liser were rawestandî, bê çiqasî armanca tevgera "sosyalîzm"ê di cîh de ye.

Dema ku em dahênana sumerîyan, çîncînîbûnê û civaka dewleta bi çîn terîf bikin, evê kêmasiyeke mezin be ku em pêşveçûnên civakê dîrokî yên berê, li ber çavan ne girin û bi nîrxînin. Teoriyên civaka koledar yên ne berbiçav, zêde ravekar ne bûne, jiberku berbiçaviyên (nêrbaran) Sumer tehîlî nebûne, weke ku çêbûye ne hatiye diyarkirin. Li koledariya Roma û Atîna nihêrîne û di derbarê civaka koledar de, bi gelemperî gîhane hinek encaman. Dibe ku di merhaleya gihîştin û rizîna koledariyê de, ev mînak werin dayin, wê kerhatî be. Lêbelê ku em dîroka şaristaniyê û çêbûna civaka bi çîn, di çavkaniya wê de lê ne vekolînin, herwiha taybetiyên wan yên ku gelekî ji hev cuda bi awayekî rastî çavdêrî nekin, yê mimkûn nebe ku em bigîhin zanyariya dîrokê, heger em bigîhin jî, yê gelek kêmasî û çewtî tî de hebin. Sedema ku em liser civaka Sumer bi awayekî girîng radiwestin, têgihîştina rêçika pêşketî ya berbiçav ku dîrokê jê destpêkirî ye. Weke ku zanistiya dîrok û civakê ne gîhaye vîna, ligor min kêmasî û çewtîtiyên wan yên mezin ev in ku tinekirî yê û piroleiyê (mubalexe) bi xwe re tîne. Sedemek ji ya parêznameya min, pêdiviya bangewaziya min e ku bi pîvanê dadê nêzîkiyê li rast naskirina dîrokê û civakê bikin. Ji civaka heyînen nijadî derbasbûyina civaka siyasî, bi pêşveçûna saziya koledariyê ve girêdayî ye. Ev jî zemîneke daringî, jibo veguherînen kûr çêdike. Keda koletiyê ku ji berxwarîne (mezaxî) gelekî zêdetir rê li ber berhemdariyê vekiribû, çînekî ku ji bazirgan û hunermendan hatibû holê, pêşveçûyî û bi ser konfederasyonên bavikan (qebîle) ketibûn, bûbûn sedema çîneke rêvebir ya hîlbijartî û serdest ku tîkiliyên wan bi nijadê re tinebûn. Herwiha şewegirtina sisê hîmên bingehîn yên civakê ku heta îro berdewam dikin, dest pêkiribû. Lêbelê her çiqas ku bi xetên mîsoger ji hev ne cuda bûn, ji tîkiliyên nijadî jî ewqasî ne qut bûn. Ev hemû pêşveçûnên ku di nava hev de çêbûbûn, îfadeyeke ramanî ya çêbûna vê civakê tine. Lêbelê îfadeya wê ya bi mîtolojiyeke tekûz, bûbû karê nivîskar û helbestvanên Sumerî yê bingehîn. Şaristaniyeke din weke ya sumerîyan tine ku koletî bi îfadeyeke mîtolojîk, mîna sazûmana xwedayan nîşan dabe û qet kesekî ji vê rewşê gilî nekiribe. Vê dawiyê, bîrdozger (îdeolog) û rêvebirên civakên bi çîn, ji vê mîtolojiya sumerîyan sud wergirtin û ligor mercên civaka xwe bikaranîn. Mîtolojî û teolojiyên ku vê dawiyê derketin holê jî, teqlîdên mîtolojî û teolojiya Sumerîya ne. Mîtolojiya Sumer, serdestiyeke bîrdoziyî wisa çêkiribû ku qeranên rahîb bi xwe jî, pêdiviyên wê mîna zagonên xwedê didîtin û bi cîh dianîn. Eslê wê tiştê ku kiribûn, bi serdestiyeke bîrdoziyî, berjewendiyên xwe bêdawî kiribûn. Ev hunereke civakî û afirînerê ku ev mîna sazûmaneke xwedayî hatiye nîşandan, ji vê yekê bawer kirine û bi civakê jî dane bawerkirin.

Ji BZ salên 4000an heta bi BZ 2000an kole di rewşa benî (evd) û sîyê de ye. Di vê sazûmana ku li perestgehê dihate birêvebirin de, ji qeranên rahîb heta bi kedkarên zeviyan, divabû her kes ligor

rewşa xwe ya ku bi zagonê hatibû diyarkirin, bilive. Çawa stêrkên li ezmana bê veguherîn, di nava sazûmanekê de diliviyên, divabû sazûmana liser rûyê erdê jî wisa bûna. Di tégihîna vê sazûmanê de, xwedê çawa bi xwaze, hemû dilînên mirovan xwedî wateyeke wisa ne. Qet çenedibû ku ligora xwesteka kesan dilîn hebûna. Dîsa ji ramana xwedayan pê de ti ramanên din tine bûn. Sazûmaneke wisa bû ku ne serê wê û ne dawîya wê hebû, çawa emir kiribûn wisa bû. Ev sazûmana bîrdoziyî ya çîna serdest a mijok ku liser keda koleyan bû, bi rastî jî berhemeke rewşedar (mûhteşem) xuya bû. Dema ku qeranê xweda dimir, jiberku mîna xwedayên nemir dihatin dîtîn, bi hemû mehyeta (maiyet) xwe re dihate binerd kirin, jibo ku li cîhana din jî bi hev re bijîn. Di tirba qeranekî de heftsed termên (cendek) ku zêdeyê wan jin û xizmetkar bûn, hatiye dîtîn. Evan hemû yên ku bi zindîtî bi qeranê mirî re ketine tîrbê û ax bi wan hatiye dakirin. Vê çalakiyê mîna peywirekê dibînîn. Nikarîbûn ne tîrsa xwe û ne jî êşa xwe bînin zimên. Di tîrbên firewnan de jî ev mînak gelekî hatine dîtîn.

Bawerî û îbadetên Sumeriyan yên ku mirov dikirine qurban, bi hêza bîrdoziyî ya koledarî ve girêdayî ye. Çînen serdest û mijok, di pêvajoya dîrokê de, li hember aqil û viyana mirovên ku hişyar dibûn, xwe bi vê serdestiya bîrdoziyê nûjen dikirin. Zincîr ne hatiye qetandin û tim hatiye nûjenkirin û qewînkirin. Pergala dewleta Sumer, amûreke vê yekê ya herî saf û bi bawerî bû, lêbelê serdestên vê dawiyê digel ku ji vê yekê bawer nedikirin jî, bi çînen bin xwe didane bawerkirin û serdestiya xwe ya bîrdoziyî berdeham dikirin. Mirovahiyê heta weke îro, her çiqas jibo azadiya raman û viyanê hewl da be jî, şikandina serdestiyê ya li koledariyê bi vê şeweyê pir zor e. Berevajî vê, bi bîrûbawerî, bi giştîkirina saziyên perwerdeyî û bi hewldanên ku vê yekê payîdar bikin, bêhtir tekûz kirine. Bi teknolojiya hemdem, heta bi genên mirovan hikim dikin. Di berbiçaviyên sumeriyan de, bêhtir di warê koletiya perestgehên tevdayî de, pêşdikeve. Lê li Roma û Afina, koletiya taybet ya serdest e.

b- Di civaka Sumerî de, ji pêşveçûyinên seretayî yeke herî girîg, asta ku cudabûna zayende (cinsiyet) gihayê ye. Hêza serdestiya hilberîne ya di zayina Sumer de û dema neolîtîk ya di bin guhê wan de jî, jin e. Çandî û kedîkirin bi giranî dahênanên jinê ne. Dîsa jiyana cîwarbûyî anku şoreşa gund, jiberku bêhtir bersivê dide jiyana jinê, ji alyê wê ve hatiye damezrandin. Kûzkerî (dîzikkerî), raçandin û hêrtina liban jî, karên ku bi pêşengiya jinan çêbûyî ne. Malbat li dora jinê sift dibe û diyariya nijadê jî, bi jinê dibe. Sazûmana daykanî serdest e. Ev yek îfadeya xwe ya bîrdoziyî, di stêrkan de, di xwedawendên ku bi heyvê têne temsîl kirin û bîrûbaweriyên olî de dide nîşandan. Cudahiyên çîni yên di civaka sumeriyan de ku bi cudahiyên zayendan re pêşdiketin, îfadeya xwe ya bîrdoziyî di mîtolojiyê de didîtîn. Xuyakirina cudabûna statuyê ya li vir gelekî hîkarîker e (bibandor e). Giraniya xwedawendan ya di serî de, vê dawiyê kêmtir dibe. Di dema Babîl de, di destpêkê de, di kesayetiya Tîamat de, derba mirinê dixwe. Lawê piçûk Mardûk, çûyina ber bi yek xwedatiyê û çanda mêrê serdest temsîl dike. Vê dawiyê Hz. Brahîm, vê çandê bingeh digire û dibe kalîkê pêxemberên yek xweda. Jina ku demên pêşî, rola wê li perestgehan li qasî ya rahîban bû, li malê dikeve pileya duyem. Kerxaneya pêşî jî, di bin navê museqetîm de, dahênanana sumeriyan ne. Statûya jinê, li qasî pêla şaristaniyê ya duyemîn ne ketiye. Statuûyeke nêzikî lihevkerîne, di hemû mîtolojiyên Sumeriyan de xwe nîşan dide.

c- Şoreşa bajêr û dewlet-bajar jî, seretayîyeke bingeh e ku sumeriyan pêkaniye. Serdema neolîtîk, bi şoreşa gund û çandiniyê ve girêdayî bû û civaka şareza bi bajarvanîbûn û dewleta wê re temam dibe. Him sazîbûna binesaziya aborî û him sazîbûnên seresazî yên navendiya dewletê, rê li ber rêxistinên civakê yên gelek mezin vedike. Civaka ku gelekî mezin û tevlihev bûyî, bîrewerî û sazîbûnên nû bi xwe re tîne. Nivîs, wêje, hesab, salname, tendurustî û perwerdeyî saz dibin û dibine pişeyên nû. Ev hemû pişe û yên mîna wan, seretayiyên ku sumeriyan derandine holê ne. Di sazîbûnên nû de, digel girêdanên nijadî, saziya civakî ya ku bi taybetiyên pişe ve girêdayî derdikeve holê. Sazîbûnên civakî, awayê têkiliyên wan ku sumeran pêkanîbûn, heta îro tîne, encax di warê wergirî (berfirehî) û kitekit (detay) ve, dewlemend bûne û hebûna xwe didomînin. Heger ku xelekên zincîrê yên pêşî nebin, wateya xelesa dawî tine.

d- Sazîbûnên aborî yên sumeriyan jî, xwedî şensin ku bibin sazîbûnên şaristaniyê yên bingehîn û seretayî. Têkiliyên xwedaniya tevdayî û taybetî, pêşveçûne û bi sazî bûne. Liser axê ev herdu cureyên xwedaniyê (xwedîtiyê) têne nasîn. Pişe ji axê veqetandine û serbixwe kirine. Weke bazirganî, xiratî, madenvanî, raçandin û kûzkerî, pişeyên ku di warê aborî de êdî dev ji wan neyê berdan, hîmên civaka sumeriyan ne. Raserî û nûjeniya Sumer, ji hêza van pişeyan tê. Saziye zanistî û pêxemberî bi van pişeyan re ji nêzik ve têkildar in.

e- Seresaziye civaka Sumer, hê bêhtir dewlemend in û nûnertiya afirîneriyekê dikin ku heta wê rojê ne hatiye dîtîn. Çêbûna saziyên dewletê, beşên burokratîk mîna qerantiyê, komele, leşkerî û

şalyarî (wezîrtî), mînakên yekemînin ku ji pêşketinên vê dawiyê re, bûne çavkaniya îlhamê. Nirxên ku ji tîgîn û sazî hatine holê, kemilîn (peresîn) û bi hêza xwe gihane heta îro. Di vî babetî de, heger ku em çêbûna çavkaniyê ne bînin û ne nirxînin, dahûrandina dîrokê û ya roja me wê kêr û çewt bimîne.

f- Afiran û sazîbûnên bîrdoziyî, di pêşveçûn û veguherîna hişê mirovan de, xwedî cîhekî herî girîng e. Afiran û şeweyên îbadetê mîtolojîk yên sumerîyan, di xebitîna dezgehên serresazî û binesazî yên civakê de, rola dontêdanê û benzîna dileyîzin. Rêvebirên bijarte yên Sumer, bi taybetî çîna rahîban, di wê zanîna de ne, heta pêşnûmayên (proje) bîrdoziyî ku çerxa demê bizivîrîne ne afirînin û vê bi civakê nedin pejirandin, wê nikaribin civaka bi çîn û dewletê birêve bibin. Civaka neolîtîk, ku tîkildarî çandîni û ajaldariya hêsan, rêxistina nijadî ya civaka gund û rêvebirîya wê jî hêsan e, pêdiviyê bi ramana tevlihev, sazî û rêzikên rêvebirîyê nabîne. Pêdiviya çavkaniya mîtolojiyê de wê demê, zêde pêş ne ketiye. Ev serdema ku bi perizîna (kult) dayîk û kalîk ve tîkildar, zêdetir bi tîgînên totem û heyînan asîmanî tê nîşandan, jibo tîbûrîna civaka Sumer û çîqas ku pêdiviya tekûziyê xwe lê pêwîst kir, sazîya rahîbîyê pêşket û bû sazîya herî bîngêhîn.

Pêşnûmayên bîrdoziyî yên Sumer, îro jî mirov di nava şaşwazî û heyrantîyê de dihêle. Teolojî û mîtolojiya ku bîngêha wêjeyê, dibîne pêşnûmayên ku herî zêde bandor liser bîrdoziyî ya dîroka şaristaniyê kirine. Di bîngêha hemû dogmayan de jî, ramana Sumer cîhekî girîng digire. Di vî babetî de, Sumeroloji şaxek ji ya dîrokê ye ku girîngiya wê zêde dibe.

Şeweya ramanê ya dogmatîk, jibo veguherîna diyalektîkê vekirîye û xwedî çavkaniyêke afirîner û dewlemend e.

Hêmanên normên ramana bîngêhîn, wiha dikarin werin rêzkirin:

1- Ev hîmekî diyalektîkê ye hoveber e. Dijwateya ezman erd, di heman katî de hemanê nêr û mê temsîl dike. Dîbêjin ezman "En" û erd jî "Kî" ye. Enkî di vê yekbûyîna de, bi giraniya xwe di şeweyêke mêranî de ye û di wê bîr û baweriyê de ye ku bi xwedawendê re lihev hatiye. Enkî di rewşa kalîkê tîgîna bav de ye, bi hemû xwedawendan re dizewice û gelek zayînan bi taybet pêktîne. Zayîna herî dawî -di vî derbarê de, destana Babîl ya afirandinê Enûma Eliş gelekî hînkê e- bi xwedayê Babîl Marduk re, derba kuştîna li dayîka xwedawend dixin û ji Pantheon a xwedayan Tîamat -ev lijne ye- diderînin. Ji BZ 2000an û pêde, perizîna (kult) xwedawend û bilêvkirîna mîtolojîk ya ku wê îfade dike, paşve ket û hate heremojî kirin. Ev pêşveçûn bi ketîna statûya jinê ya civakî ve girêdayî ye. Hêmana mêranî -serdestiya mêr- di hîmê dewlet û civakê de, serdestiya xwe zexim kir. Otorîteya qerantîyê û mîtoloji, ji sazîyên dewletê yên jor heta bigihe jêr, mêranî dibe û bi şeweya olê xwedayan baweriyê distîne, herwiha civak, di warê ehlaq û bîrdoziyî de, di veguherînan mezînan re derbas dibe. Qeran yan xweda ne, yan jî raste rast di rewşa nûnerên xwedê de ne. Têkiliya efendî û kole bi şeweyêke pir xweşik wergerandin tîkiliya xweda û benî. Veguherîna ramana mîtolojîk ya bi bawerîya bîngêh, anku ol û bi zagon anku hiqûq, pêşveçûnên dîrokê û yên civakî ku encamên girîng derînin holê ne. Perestgehên Sumer û akademyên çandê yên bi navê Edduba, sazîyên ramanê ne ku otorîteya qeranên rahîb pêşve bibin û bidin meşandin. Di çêkirîna mîtolojiyê de, ji aliyekî ve ola di rewşa teolojiyê de, ji aliyê din ve jî, pêşnûmayên di rewşa destanên wêjeyê de, peywîrên bîngêh yên rahîban, wêjevanan û ramangêra ne. Nîppur a pîroz, Babîla vê dawiyê, bi hezar salan bûne navendên çand, ol û wêjeya van karan.

2- Sîstema ramanê bi sazûmana ezman ve girêdayî ye., Di hereketên stêrk, heyv û rojê de, çawa rêgeh nayê guhertin, zagonên ser rûyê erdê jî, dive ku vê temsîl bikin. Dewlet û qeranê rahîb, liser navê xwedê vê sazûmanê temsîl dikin. Vîyana wan pîroz e û peyvên wan zagon in. Hêzên liser rûyê erdê, her yekî xwedayekî wan heye. Jibo hêzên civakê jî ev wîhaye. Ti taybetî, ti alav û ti heyînan ne bê xweda ne. Ev wiha bi şeweya ramana teolojîk ya xwedanî tê bi nav kirin. Vê dawiyê ramana bi vî şeweyî, peresaneke mezînan derbasdike, Li Grekîstan felsefe û li Ewrûpa hemdem, dibe destpêka şeweya ramana zanistî. Herçîqas ku di navbera van şeweyên ramanan de, nakokî hebin jî, jiberku ji hev û din zayînan, bi awayekî tund bi hev ve girêdayî ne. Heger em tîkiliyên di navbera wan de ne deynin holê, emê nikaribin ne dîroka olan, ne felsefê û ne jî dîroka ramana zanistî rave bikin. Ligor dema xwe, şeweya ramana Sumer, pêşketîneke mezînan pêkaniye. Zagonên xwedê, vê dawiyê bûne zagonên zanistî û derketin hemberî me.

3- Tîgînên mîtolojîk yên bîngêhîn, weke mirovê seretayî, bihişt û dogeh, ji bihiştê qewirandin û tofan, di ramana Sumer de cîhekî girîng digirin. Ev kevneşopîyêke sumerîya ye, zor û zehmetî û nakokiyên ku li xwezayê û di nava civakê de derdiketin holê, bi zîmanekî helbestî, mîna destanan digotin. Ligor xwe bûyerên xwezayî û civakî, ku bi tîgîn bûn dikirin teorî, weke sîstemekê îfade dibin. Teolojiya xwe disepînine (tedbîq) her bûyer û tîkiliyê û her yekî encamêkê ji wan derdixin. Vê yekê, rê li ber teqîna raman vekir. Ti tîşt ji nêzîkbûn û darizandîna vê sîstema ku hatibû

damezrandin na filite. Ti tişt ne serberdayî ye. Her tişt bi hev û din ve girêdayî ye. Weke ku em li pêşberî hêmana diyalektîkê ya yekemîn lê bi şêweya ya hoveber in. Çavkaniya utopya û destanên seretayî, Sumer e. Utopya bihiştê, jiyana Adem û Hawa û ji bihiştê qewirandin, lihevdana birayan ya yekem ya Habîl û Qabîl û destana nivîskî ya Gilgamêşê bi kesayetiya niv xweda û niv mirov, hatine heta dema me. Di van utopya û destanan de, tiştê ziman, bêrikirina wekheviya rojên civaka neolîtîk û têkoşîna li hember zehmetiyên ku ji nakokiyên civakî dihatin. Ravekirin û raman wiha ne. Jibo ravekirina zanistî, hê gelekî zû ye. Aqlê mirov ji serdema zanistî gelekî dûr e. Di şaristaniya Greko-Romen bi xwe de jî, zanistî gelekî bisînor e, felsefe hê ji teolojî û mîtolojiyê rizgar nebûye.

4- Ya ku yekem car sepandinên emperyalîzm û mêtîngehiyê bi rêkûpêk kirin jî, şaristaniya Sumer e. Sargonê ku Xanedaniya Akad damezrand, hemû dewlet-bajarên Sumer fetihandin û kirin yek, di heman demê de împeratorê yekemîn e. Sargon dewleta mêtînkari li dar dixê. Dewlet-bajarên Sumer yê berî wî, tenê jibo parastina xwe û bazirganiyê, hinek qereqolan vedikin, berê xwe nadin fetihandin û mêtînkariyê. Lêbelê Sargon li şûna qereqolan, mêtîngehên fireh, ji nav bajaran paytextek damezrand û sistema xwe anî merhaleyê ku bi şidetê li hawîr belav bibe. Ædî karê emperyalîst û mêtînkariyê piştî wî re hatin, bû sepandin û tekûzkirina vê sistemê. Kuştina mirovan ya bi şideta plankirî, dest danîna liser her tiştên wan, kolekirina wan, mêtîngehkirina cîh û warên wan û girêdana wan ya di bin rêvebiriyê de, merhaleyê herî girîng yê pêşveçûna dîrokî ne. Ev tê vê wateyê ku wê demê, împeratoriya mukemel ya gerdûnî hatibû damezrandin. Di vî babetê de, Sumer ji bilî ku dewleta civaka bi çîn tenê be, şaristaniyê emperyalîst ya bi gelek heyinên etnîk e.

5- Normên hiqûq yê nivîskî jî, yekem car ji alyê Sumeriyan ve hatine nivîsîn. Sumeriyan rêzikên hiqûq li latan kolane û çikandine, xwastine ku hemû kes van zagonên bîngehî yê revebiriyê fêhm bikin û bisepînin. Zagonên Urnamû û Hamûrabî dengê xwe heta bi dema me anîne. Ji nixê bîngeha şaristaniyê, mûzîk û helbest jî, dîsa bîngeha vê sepandina di dema me de ne. Çespandina (îspatkirin) van mijaran ne zor e. Weke ku awaz, stran û dilok gihane miqam û amûrên xwe, ev hezaran sal in ku bandorê li pêvajoyên vê dawiyê dike.

6- Mijareke din ya girîng ku pêwîst e were zelalkirin, nijada sumeriyan ne. Xwediyê kîjan taybetiyên etnîkî ne, li hember heyinên etnîkî helwestên wan çawane? Ji bîngeha etnîkiya vê şaristaniya ku wiha dexmê xwe li dîrokê dayî, çî bi şûn de maye? Bêşik ev pirs gelekî girîng in û dive ku bi kûrayî werin lêkolînkirin. Du herêmên bîngeh ku di dîrokê de rolên mezin listine, liser qada herêma Sumer hev û din birîne. Welatê sumeriyan ku li çola Erebiştanê û li destên riste çiyayên Zaxros-Torosan cîh girtibû, çiqas ku şaristaniya xwe pêşdixist, her dayîm hêriş lê dibûn û dihatê dagirkirin. Mîna împaratoriya Grek û Roma yê demekê, dewlemendiya ku bi şaristaniya Sumer derketibû holê, çav didelandin û dil dibijandin. Lê ew bi xwe jî emperyalîst bû. Hêmena tek (bandor) û bertek (bizav) ku bi giraniya xwe kete jiyane, hikmê diyalektîkê bi şêweya pêşveçûna dîrokî da meşandin. Çiqas ku di warê şaristaniyê de pêşket, ji başûr û rojava hêrişên qewm û komên Semîtik, ji bakur û rojhilat yê Aryen (Bi gotîneke din ya Sumeriyan Horrît) pêl bi pêl bi ser wan de dihatin. Ev nêzîkbûn dikare dawîya sumeriyan rave bike, lê di warê ravekirina çavkaniya wê de derfeteke bisînor dide. Di encama vekolanan de, belge û kûzikên ku derketine holê, nîşan didin ku ji bakur û rojava belav bûne. Amorît yê ku ji başûr û rojhilat hatin, jiberku şivantî tenê kirine, ti belge bi şûn xwe ve ne hiştine. Gengaz e ku (ihtîmale) komên piçûk yê komûnal, yê ji herdu hêlan hatin, BZ di salên 6000an de, niştê cîh bûne. Derfetên herêmê yê dayin û hilberînê, di nava pêvajoyê dirêj de veguherîn çêkirine û cudabûna nijada Sumer derandiye holê. Peyvên ku ji Horrît û Amorîtan ketine nav zimanê Sumeriyan vê yekê bi awayekî vekirî nîşan dide. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku Sumer ne qewmekî orîjînal e. Berevajî weke li gelek deran derketiye holê, çandên cuda ku tevî hev bûne, di nava sentezeke raser de gihane hev û heyîneke çandî çêkirine, li vir jî mînakeke vê şîweyê ku gelek tekûz, orîjînal derketiye holê.

C- Di şaristaniya Sumer de encamên payîdar

Şaristaniya Sumer jî, bi encam û bi cîhê xwe yê payîdar, di dîrokê de mîna çandên din di veguherînên bibandor re derbasbûye, herwiha xwe di heyinên çandên din de ku ji xwe jî gelek tişt tevî kirine, dîtiye û di dîrokê de cîhekî bi nix girtiye. Xanedaniya Akada Sargon ku giraniya semîtik liser, di dîrokê de mînaka veguherînana yekemîn e. Rewîştê (karakter) zimanê fermî û serdestiya çandê bi temamî ya Sumer e. Di bin destihilatiya vê xanedaniya ku BZ salên 2350-2250an hikim kirî de, siftbûn û giraniya zimanê semîtik xwe nîşan dide. Ji ber vê yekê Gutî yê ji koka Aryen-Horrît, li dij derketin û bi xanedaniya Sumer re yekîtiyê pêktînin, teraze û veguherîneke nû çêdikin. Çanda êran-Elam giraniya xwe nîşan dide. BZ di salên 2000an de, ji

başûr û rojhilat bi sifî dagiriya komên Semîtîk-Amorît pêktê. ædî Xanedaniya ór a Sêyemîn hildiweşe, dema begîtiyên bi giraniya Amorît û dewlet-bajaran vedibe. BZ di salên 1800an de, bi Xanedaniya Amorît Hamûrabî ya navdar, Sumerî hêza xwe ya siyasî bitemamî winda dikin. Zimanê Sumer, êdî bi fermî nayê bikaranîn. Zimanê fermî dibe Akadiya Babîl ku zimanê Asûriyan û Keldaniyan ji koka wî tê. ædî zimanê çandê yê Rojhilata Navîn Babîlî anku zimanê Aramî ye. Vê carê jî, ji bakur bi hêrîşên Kassît, Mîtannî û Hîtîtiyên ku ji koka Aryen-Horrît, di navbera her du çandan de, sala BZ 1600an dîsa teraze tê pêkanîn. Lêbelê dîsa jî, mêjî û zimanê rêvebiriyê Babîl e û Babîlî ye. Hemû çanda Sumer, di parzûnê Babîl re dibore û dema teolojî û wêjeya bi şeweya Babîl, cîhê xwe di dîrokê de digire. Matematîk û astronomiya Babîl hilperîne dike. Li Nînova Xanedaniya Asûr-Amorît a li bakurê Babîl, vê pêvajoyê gavekê bêhtir diqevêze bi pêş de. Pêşengiya Babîl ya bîrdoziyî-çandî û pêşengiya Asûr ya siyasî-leşkerî, temamê Rojhilata Navîn pert û perîşan dike.

Di şaristaniya Sumer de demên Babîl û Asûr, werdigerine Akadî û yekser li temamê Rojhilata Navîn û ne yekser li derdorên cîhanê belav dibe. Ev belavbûn, zêdeyî bi rêbazên şîdeta emperyalîst çêdibe. Aliyên wê yên çandî û bîrdoziyî bisînor in. Sumerî weke zimanekî kevin û pîroz tê fêrbûn, bi wergêrên domdar, xwe bi giranî digihîne tevayê cîhanê. Bi çandên cîgeyî (mehelî) ku hev û din xûnifandin, çiqas ku çû hate veguherandin. Lê ev quteber e ku mînaka herî kevnare (qedîm) Sumer e. Hebûna Sumer ya di warê ziman de, di serê salên zayînê de (mîladî) bi temamî ji holê radibe.

Dema ku em li cîhê şaristaniya Sumer ya di nav dîrokê de binêrin, wê bê pejiwandin ku ti şaristaniyan evqasî bi kûrayî, bandor liser mirovatiyê ne kiriye. Ji BZ sala 4000an heta bi 2000an yekser, BZ ji sala 2000an heta bi 500an jî ne yekser, ji aliyê yên bi şûn wan de hatin, mirovatî him hatiye mêhtin û him jî hatiye xweyî kirin. Seresazî û binesaziyan civakê, sîstema koledarî wisa rûnandine û bi dogmayên wêjeyî wisa pîroz kirine ku ev yek ji aliyê ti îdeolojiyan ve nikare were kirin. Rawestandina liser wateya vê yê gelekî sûdewar (bifeyde) be. Jîbo ku şaristanî were dahûrandin (tehlîlîkirin), dive ku ev wate derkeve holê.

Heger em bi awayekî berbiçav binirxînin, emê bigîhin van tespîtan:

1- Şaristaniya koledarî ya Sumer, liser nirxên ku gelan di Heyva Berhemdar û di nava 10 000 salan de, bi civaka neolîtîk pêşêxistibûn, bilind bûye. Carina bi bazirganî, carina bi şîdetê, zêdeyî bi qayîlîkirina sîstema xwe ya berhemdar, teknolojiya neolîtîk û zanistî ji xwe re kiriye mal, şaxên huner û pişe saz kirine û jîbo hebûna xwe wergerandiye berhemdarî û dewlemendiyeke bêhempa. Mîna serdema me û helwesta emperyalîzma DY(Amerîka) li hember gelan, li hember bilindbûna şaristaniya Sumer ya koledar jî, gelên di nav civaka neolîtîk de û komên etnîk yên din, matmayî mabûn. Emperyalîzma Sumer, bi taybetî di dema Asûr de, gel wisa serû binî hev kirine û ji cîhê wan koçber kirine ku li Rojhilata Navîn û li tevaya cîhanê hê jî bandora wê didomîne. Ji aliyekî ve di erdê de kutan, Li sing dayin, ji aliyê din ve ji hev belav kirin, bûne rêbazên teror û komkujiyê ku di hişê mirovan de hate kolan. Mijokatî û serdestiya di civaka bi çîn de ku liser mirovan bi plan û sîstem hatiye meşandin, bi tekûzbûn hatiye heta îro. Heger di serdema me de jî, ev qirkirina mirovan bi plan û sîstem tê meşandin û bi pêşveçûna teknîkê re ev qirkirin her zêde dibe, ev yek ji pratîka vê şaristaniyê ya ku weke genekî di hişê civakê de cîh girtiye tê. Çawa genê mirovan digihin hev û dirûvên mînak diderînine holê, genên hişê civakî jî hene, bi nifşên din re çêdibin û bandora xwe didomînin. Ji civakê yên ku serdest û mijok, tim li xwe zêde dikin, yên ku bindest û tene mêhtin tim lawaz dibin û li xwe kêmtir dikin. Diyalektîka zalimî û mijokatiyê ger ku neyê damezrandin, rawestandina vê çerxê hê ne mimkûne. Mirovatî atomê perçe dike, lê hê nikare vê çerxê perçe bike. Ji civakê re, him zêdeyî û him kêmayî ne pêdivî ye. Her du nebin, civak çêtir yê bi teraz û bextewar be.

Ev rewş, yekem car û ji ajalan cuda, bi awayekî hişmendî, rê li ber êşa mirovan, zayina rûmetê û dilxwaziya berxwedan û azadiyê vedike. Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, saziya Pêxemberiyê jî, tê vê wateyê. Di vê mînaka pêşî ya rewşedar re xuyadike ku şaristanî, bi dizîna civaka ku wekheviya neolîtîkê û civaka bê şer di hişê xwe de dike xeyalên bihiştê, bi avêtina yên ku mayina derî dîrokê û hiştina wan ya bê dîrok, dest pêdike. Bi nirxên ku ji xwe re dike mal, bi dahênana sazîbûnên dewletê, hemû takekes û civakên etnîk diqurpîne û dibe cinawir.

2- Dewleta ku li Sumer, wek kurtayiya civaka bi çîn û nasnameya wê derketî holê, birastî jî derasayî (fewqulade) û rewşedar e. Ev amûreke wisa ye, xeyalên ku pêknêyîne tine û aliyê dewletê yê bi giranî wiha tê dîtin. Gotineke gelekî bandorker heye, dibêjin: "An dewlet wê were serî, an qelereşk liser laşê mirî." Zilamê bi dewlet, netewa bi dewlet, ji cem xwedê xwe xwedî her mafî dibînin ku wateya vê gelekî kûr e.

Mînaka Sumer ku datîne holê, bê dewlet vê hêza xwe ji ku digire, jiberku yekem e û teze ye, amûra dahûrandina şaristaniyê ya herî pêkatî dide. Li hember takekesan û li hember komên etnîkî ku bi

navê wan tê bangkirin, him jî li hember kesên civakê ku li derî dewletê mayin, bi awayekî derasayî û bê pîvan bi hêz dibe. Ev hêz timî tekûz dibe. Di çêkirina dewletê de, dîtînen rahîben Sumer yên bi xasûkî, bi hostayî û bîrdoziyî, bîrûbaweriya civakê pêktînin, bi vê bîrûbaweriyê nêrina wan ya li dewletê, weke sazûmana ezman ya li erdê şewegirtî, tişteki nuwaze ye (Hrîkûlade). Armanca mîtoloji û teolojiyê ya sereke, çêbûna civakeke bi çin ku pîroz û ebedî, weke sazûmana xwezayê serdest bikin. Eslê wê otorîteyên xwedê, xanedaniya qerantiyê ya ku nû bilind dibe ye. Lêbelê ku vê bi rastî bibêjin û bi awayekî vekirî pêşkêşî gel bikin, bawerî pê nayê, damezrandin û domdariya wê jî mimkûn nabe. Pêşî divê ku dewlet di bîrdozî de were damezrandin û bide qezenckirin. Dema ku dayîna qezenckirina bîrdoziyî û teknolojiya civaka neolîtîk di sînorê nîrxê zêdek (qîmetê zêdek) de bi gihînin hev, dewlet derdikeve holê. Bi peydakirina ya yekemîn, ya duyemîn tê bi destxistin, Dema ku herdukan bikin yek, rê li ber bereketeke mezin vedike.

Perestgeha Sumer cîhderka dewletê ya sereke ye. Weke ku vê dawiyê dibêjin, dewlet ne îfadeya hiş û aqlê mirovê zanistî ye, îfadeya teolojîk û dogmatîk e. Ez dikarim tarîfeke nû bidim: Şaristanî û weke derûna wê (nefsa wê) dewlet, di merhaleya çinçînîbûna hoveber de, bi çênebûna ramana zanistî, îfadeya teolojîk ya têngîna dogmatîk e. Di bingeha wê de ne zanist, dogma ya baweriyê heye. Herwiha di vê wateyê de, amûra herî deredemî dewlet bi xwe ye û şeweyên wê yên klasîk ku bi gel re nabe yek e. Emê di beşên pêş de jî bibînin, heger ku bi sînor be jî, pêngava herî girîng û pêşveçûyî ku Ewrûpa di vî warî de avêtî, kolandina demokrasîyê ya li rewîştî (karakter) dewletê ye. Ev jî encex bi berxwedan û têkoşîna gelan, çinan, neteweyan û takekesan pêkhatîye.

Têkiliyeke hişk di navbera dewlet û xwedê, dewleta ku navendîtiya wê gelekî pêşveçûyî û raman û baweriya yek xweda de heye. Çiqas ku hûn navên bihêz bidine xwedê -ev yek taybetiya şaristaniyê ya bingehe- hûn wî negihêj (dûrîdest) û nefêhmbar (nefesîh) bikin, ewqasî jî hûnê dewleta ku xwe bi maskeyên şaristaniyê veşartî, bi hêz, tirsdêr (çavşikên), nefêhmbar û negihêj bikin. Ev mijar di heman katê de, taybetiyên qerana ne. Perwerdeyiya qeran bi kinayî dayîna van taybetiya ye. Ev bikêrî nûnerê xwedê tê û ev jê re pêdivî ye. Berî civaka biçîn, totem nasnameya civaka ku nûnertiya wan dikir bû û weke paşnavê wan bû. Jiberku rêwîştî civakê ya mijokatiyê nebû, aliyekî wan ê bizdok jî tinebû, ne xweda jî bûn. Çi wexta ku rêwîştî serokên qebîleya (bavik) ya mijokatiyê pêşdikeve, tê dîtînin ku totem jî, hin bi hin ber bi pileya xwedatiyê hildikişê, ji erdê ber bi ezman cîh diguherîne. Ji navên nêzîk, netirsdêr û destlêdayin dîr dikeve, navên dîr, negihêj (dûrîdest) distîne. Di civakê de xiyaneta çinçînîbûnê ya li hember derûna wê, wiha dest pêdike.

Ev wê kêmasiyeke mezin be ku dewlet bi temami weke amûreke bi dizîya neyekser û derewan were halkirin. Derketina wê ya holê, tenê bi van taybetiyan rave nabe. Wesfên civaka bi çin yên tevlihev, zêdebûna pêdiviya karbesiyê û pirsgirêkên ewlekariya hevbeş (hevpar), pêdiviya ahengiyekê (kordînasyon) nîşan dide, liqasî ku çîna serdest ya mijoker, dewletê erênî dike, nîşan dana wê ku xwe devjêbernedan (jêneger) dike, bi van pêdiviyên ku derdikevin holê re girêdayî ye. Nedahûrandina dewletê ya bi rasteqînî jî, ji ber taybetiya van herdu rewîştî ye. Rê li ber van şîroveyên dogmatîk yên dualî vekiriye. Di derbareyî dewletê de, şîroveyên çinan yên bi temami xwedayî û begê pîroz, li dij van şîroveyên şeytanî, bi nalet û reş li hemberî hev in. Di vê rewşê de, dewlet dibe îfadeya nasnameya civakî ku berjewendiyên wan nakokî hev, hinek aliyên civakê ku bi kemayî û zêdeyî tirihîne û nayên dahûrandin. Ji çêbûna wê heta roja îro, di raman û sepanê de, Lebikandina dewletê ya evqasî ne belaş e. Lewre cîhderka wê xwedayî ye. Di têkiliyên zanistî û xwezayê de, niha têkilî ji xwedê qut kiriye. Lê di civakê de vê yekê nikare biserbixe. Lewre dewlet heye. Dera ku dewlet lê hebe, tim xwedê heye.

3- Dema em lêkolînê liser şaristaniya Sumer dikin, dahûrandina bûyereke din xwe dide pêş. Dahûrana (tehlîl) mîtolojiyê û xwedanasî -Bi grekî teolojî, bi erebî îlahiyat- ya ku jê derketî, bi hindikayî li qasî dahûranên Karl Marks yên liser dewlet û dravan girîng e. Teoriya Marks, tevkarîyên bi nîrx dane zanistiyê. Lê ligor min, nîrxandina Marks ku hêza îdeolojîk ya di koka dewletê de, bi awayekî sivik digire, kêmasiya teoriya wî û aliyê wê yê herî xeter e. Weke ku ewqasî sivik û hêsan e ku dibêje "ol efyona civakê ye" sedemeke bingehe jî ya biserneketina wî ye. Ligor min, li qasî dahûrana "drav" û "dewletê" pêdiviya dahûrana "xwedanasîyê" jî heye. Rastiya Sumer vê yekê bi awayekî hîkarîker nîşan dide. Jîbo vekirina şaristaniya Sumer, divê ku hûn xwedanasîya (teolojî) wê dahûrînin. Xwedanasî, zanistiya Sumer ya têkoşînen çînî ye. Heta ku bi têngî û teoriyên wê, hûn sîketina civakî ya xwedanasîyê ne dahûrînin, hûn bîrdoziya Sumer û herwiha pê ve girêdayî, cîhana kevnare nikarin vekin. Hûn nikarên olên yek xweda vekin, hûn nikarin hişmendî û hîmê wêjeya civakên serdema navîn, serdema klasîk û yên îroyîn vekin. Di hişmendîya hemû civakan de, şanenava xwedanasîyê heye. Heta ku ev şanenav deşîfre nebe û neyê xiritandin, hûn nikarin civakeke erênî liser bingeha zanistî damezrînin. Kêmayî û xeletiya "reel sosyalîzmê" ya herî mezin,

dest neavêtiya aliye civakê ye dîrokî, bîrdoziyî û dewlet bi awayekî yekalî dahûrandiye. Çawa tenê bi dahûrandina drav û sermiyan rasteqîniya civakî nayê ravekirin, berevajî ye têkeve dawa îdealîzma ku tim rexne dike. Laşî "reel sosyalîzma" ku ji xwe re kete dawa sermiyaniyê. Ji ber van sedemên ku em rave dikin, ramana Marksîst ya bi kêmayî, bivênevê ye bikeve wê rewşê.

Li qasî ku hêza şeweya xwedanasî ya bîrdoziyê, ji ya dravan ne hindiktire, ji hêza dewletê jî ne hindiktire. Hersê jî tevli hev in û ketina nava hev û din. Dibe ku di dîrokê de, ti sêbareyên mîna van ne ketibine nava hev û hêzeke wiha ne derandibine holê. Ev hinekî jî dişibe tîkiliya "bav, giyana pîroz û law" Ne tenê dişibe, şeweya çêbûna wan yek e. Yek ji wan çiqas ku diçe daringî dibe û ye din manewî dibe. Ev sêbare di Sumer de, bi hev ve girêdayî ne. Ji van sêbareyan, ji yekê hêza cîhanê û ji ya din hêza axretê derdikeve. Ew sumeriyan ku em dibêjin hoveber in, baweriyê bi vê yaweyê (sefseteyê) nayînin, xweş dizanin ku wan dahênandine û xweş fêhm dikin bê bi kêrî çî jî tên. Ev tiştêkî xerîb e ku ye herî olperest û bawerhişk, zanistî û zanyarên dema me ne. Çawa mirovê Sumer ji zanistiya îroyin dûr e, mirovê îroyin ya bi zanistî jî, ji xwedanasîya Sumer ewqasî dûr e. Li vir bawerhişkî îzafî ye (rolatîv). Rasteqînî li herdu aliya ye. Ji lêgerînê, dîtinê û bi cîhkirinê pêde, ti rêyên din tine ne. Çawa lawik bê dayîk neyê terîfkirin, zanistî jî bê xwedanasî nayê terîfkirin.

Livir bangewazî jibo xwedanasîyê nîne. Zanistiya ku pêşî li qurbanê sazûmanên dogmatîk yên bi milyonan ne girtî û ji vê yekê berpîrsiyar, jiberku dahûrandina xwedanasî, herwiha dahûrandina dewlet û şaristaniyê bi hev re nekiriye, ketiye rewşa sêrebendê ku bibe qurbanê sêra xwe. Bîrdozgerên civaka hemdem ku xwe zanyar berdidin, encex sêbareya xwedanasî-dewlet-dirav ku ketina nav hev, bi şeweyeke teraz dahûrînî û ligor vê yekê pêşnûmayên civakê pêkbinin, êdî dibe ku bigihîjin armancê û xwe ji bandora sêrên rûxîner (wêranker) rizgar bikin. Ev mijarên ku ezê li pêş bi berfirehî liser rawestim, bi min gelekî girîng in.

4- Dema em civaka Sumer ya bi çîn û dîroka şaristaniyê ku derandî holê, di çavkaniya wê de binirxînin, mijara din ya girîng, wê bandora wê ya liser tîkiliyên di navbera zanistî, felsefê, ol û mîtolojiyê de be. Êdîyek dibêje, "zanistî û felsefe bi şaristaniyê re pêşveçû" raya din berevajî vê yekê îdîa dike. Pejirandineke giştî dide nîşandan ku nûvedanên (icad) BZ di navbera 6000 û 4000 salan de, -çanda Tel Khalaf a civaka neolîtîk- encex bi nûvedan û teknolojiyên PZ (Piştî Zayînê) yên sedsala 16an re werin hevberkirin (qiyas). Ev yek rast nayê dîtin ku civaka bi çîn, mîna çavkaniya nûvedan û teknolojiyê were nirxandin. Digel vê yekê, di mînaka Sumer de tê çespendin ku serdestiya dewletê ya bîrdoziyî, roleke kevneperst lîstiyê, lêbelê nûvedan û teknîka herî mezin, berî civaka biçîn derketiye holê. Zanîna veser (îlawe) û nûvedanên teknîk yên Sumer bisînor in. Tiştê ku herî zêde pêkaniyê, gemerdanîkirina (yekdest) dewlemendiyan teknîk û zanîna civakê û avakirina serdestiyeke bîrdoziyî ya liser e. Zanîn, ne mîna berhema teknîkê, ked û pratîka mirov, mîna litûfeke -qencî- xwedê ku dide mirovên xêzmetkarê xwe, tê îdealîze kirin. Şewşandineke (berevajî) di dîrokê de ya herî mezin ev e. Di damezrandina dewletê de û di serdestkirina rewîştê şaristaniya biçîn de, rola herî mezin ya rahîbên Sumer ku di dîroka civaka biçîn de pêkanîne, hêza sawîn a bîrdoziyî ye. Heger ku ev şewşandin, bi pêwana mîtoloji û ola Sumer wernegerandibana sawîna bi vê şeweyê û serdestiya bîrdoziyî, bi pratîka hilberîna azad ya mirov, zanistî, teknîk û felsefe, de karîba biba xwedî derfeta pêşveçûnên zûtir û bilez.

Mînaka seretayî ya Sumer a dîrokî, ji ber vê yekê gelekî girîng e: Dema ku asta azadiyê ya di tîkiliyên civakê de di warê zanîn, teknîk û afirandina felsefî de bikêrhatî dibûn, bi pêşveçûna pêkutî (çewsan) û xapandina bîrdoziyî, di warê zanistî û felsefê de anku di derbarî xwezayê de, agahdarbûna rasteqînî û asta şirovekirina giştî paş diket. Di civaka biçîn de, qutbûna beşekê ji hilberînê bi temamî û beşa din ya mezin ku mîna parçeyê makîneyekê hete kolekirin, dibe çavkaniya hemû dogmayên bîrdoziyî. Rola serdest ya çîna rahîban, di pêvajoya dîroka şaristaniyê de, ev e. Bihişt û dojeha sexte û tîgîhîna xwedayê ku ceza dide, pêşkêşî mirovê ku kiribûn nava êş û azarê dikirin, Ew bi xwe û yên ku bi wan ve girêdayî û hêzên berjewendî yên rêvebiriyê, bêkar û bêxebat dikirin xwediyê hebûnên bêhempa. Jibo vê yekê jî, tim û dayîm amûrên hişî (bîrî-zîhnî) yên serdestî anku ol û mîtoloji pêştêxistin. Di serî de navendên hilberînê perestgeh bûn, lê vê dawiyê ev rol, bi rewşenbîr û nivîskarên re, kete ser akademiyan pêşveçûyî. Bi taybetî di şaristaniya Greko-Romen de, sazûmana Akademî ya feylesofan derdikeve pêş. Li Sumer, li navenda çandê Nîppûr, yekem car akademiya wêjeyê Eddûba, mîna pêşenumûneyekê derdikeve holê. Ev pêşveçûn, di dîroka mirovatiyê de, weke zanîngeha yekemîn cîhê xwe digire.

Di vê nirxandinê de, divê em wiha ne binin ku "ol bi çîna serdest re, an jî dewletê re wekhev e (yeksan e)". Bêşik gelek tîgîhînen olên hoveber, serdestî tîgîhîna xwezayê ya serdestî civaka wê demê bûn. Bi taybetî, tîgîhînen totem ye bavikan (qebîle) tîgîhînen ol yên bavkanî û daykanî bingeh digirin. Baweriya giyanetiyeke giştî, zemîneke civakî ji sêrebendiyê re çêdike, ji tîgîhîna

xwezaya zanistî gelekî dûr dimînin. Lêbelê çiqas ku civaka biçîn pêşveçû û pozberiya (lihevexistin) berjewendî zêdebû, dabeşbûna di ol û mîtolojiyê de jî, di leha sazûmana serdest û mijok de zêdebû, çîna rahîb ya nû, têgihînên olê kevin bi taybetî sêrebendiyê hermonoyî dikin û guneh nîşan didin. Lêbelê mîzgîniyê dide ku çalakiya wan, bi xêr û pîroz e. Di bingeha pozberiya xwedê û şeytên de, dabeşbûna cicakê ya bi vî rengî heye. Mîtolojiyên Sumer, vêna bi awayekî vekirî li ber çavan radixin. Xapandin jibo wê demê qutebir e (mîsoger), Lê ku em li dema îro dinêrin, diyar e ku bi rewîştî çînî ye. Bi taybetî qewirandîna Adem û Hawa ya ji bihiştê, îfadeya bingeha mîtolojîk ya destpêka cudabûna çînî ye û rawekirina wê ya mîtolojîk hîkarîker û helbestî ye. Ez pêdivî nabînim ku li vir binivîsim. Pozberiya Habîl û Qabîl, lihevdana yên ku bi çandîna û şivantiyê dilebikîn, nîşan dide. Lawaziya statûya jinê, bi şeweya xwedawenda ku di civata xwedayan de, cîh û girîngiya xwe winda dike, bi raweyeke helbestî û mîtolojîk tê ziman. Di ola yekxweda de ku pêngavekê li pêşya vê ye, him bi îfadeya mîtolojîk û sawandin, him jî jin di civakê de di rewşa koletiyê de ye. Jin mişemir dibe û dev û zimanê xwe digire. Ji serdema xwedawendan tiştek ne maye. Jinê jiberku di rabirduya xwe de, Adem kiriye nava guneh, kirine tîpeke tawanbar û gunehkar û ji vê yekê berpîrsiyar. Li vir di leha mêr de, serdestiyeke hîkarîker derdikeve holê, bi pêwana mîtolojî û ol vê serdestiyê meşrû dikin. Serdema serdestiya mêr, di her astî de tê mezin kirin û vê serdemê dikin nûnerê pîroz yê ol. Dîroka pêşvebirina koletiya cînsî ya bi sexelî, dabaşa xebirdanê ye. Dema em li mîtolojiya Sumer dinêrin, zanayê mezin û xasûk, bav "Enkî", vêna bi mantiqê lihevkinê pêşvedibe, bi derketina Babîl re, xwedayê Babîl Mardûk, di kesayetiya Tîamat de, derba kuştinê li dayka xwedawend dide. Destana Babîl ya afirînê "Enûma Eliş" bi du alibûna xwe gelekî girîng e. Rewîştî qerantiyê ya teqez (mutleq) diyar bûye û ev, di zagonên Hamûrabî de, bi girîngiyeke dîrokî û nivîskî ne. Ji aliyê din ve, di mîtolojiya Sumer de, zagonên ol ku kesek nikare li dij derkeve, rêzikên xwe danîne holê. Ev di warê koletiya çînî û cînsî de merhaleyê gelekî mezin temsîl dike û rê li ber sazûmana wê vedike. Pêşî ji otorîteya teqez (mutleq) re vebûbû û bi şeweyeke mîna xwedê bû. Jin kirin koleyên taybet û kerxaneyan, ev yek kûrtir kirin û bi sazûnan û zagonan payîdar kirin. Dema olên pirxweda û pirxwedawend paş dikeve, di erdnîgarî û çanda Rojhilata Navîn de, rê li ber dîroka olên yekxweda ku bi kalîtiya Hz. Brahmî Xelîl sembolîze dikin, vedibe. Piştî van nîrxandinan, ez dixwazim bidim zanîn ku rola sumeriyên bi temamî ne neyînî ye, heger ku ne bi zanistî be jî, îfadeyeke sembolîk e ku rewîştî bi zagon ya pêşveçûna bûyerên xwezayê nîşan dide. Çawa ez fikra xwedê mîna pûtkirineke totemîk ya hêsan nabînim û wiha nanîrxînim, ez di wê baweriyê de me ku fikra xwedê ya ku mezin û asîmanî dibe û çîqa diçe dibe yek, îfadeya sazûmana gerdûnî ye, divê were nîrxandin ku merhaleyê teoriya îzafetê ya pêş ya hoveber e ku ne zanistî ye, sembolîk e. Divê bi girîngî bînim zimên ku esasê wê, têkiliyên çînî yên rola serdest îfade dike. Îfadeya zanistî ya civak û cîhana hêzên xwezayî ku civak jî perçek jê ye, timî di nava pêşveçûnê de ye. Şaristaniya Sumer, ev ligor berjewendiyên çîna serdest bi pêşvebirina mîtolojî û ji wê kevneperestî rêzikên olî yên bi hikmê mîsoger (qutebir) û di xeta dewletê ya fermî re dide meşandin, her çiqas ku cîgeh (meqam) yên fermî van di bin navên "şeytan", "sêrebend" û "sîmyavan" de tawanbar bikin jî, di warê pêşveçûnê felsefê û zanîna zanistî de, rola wanên ku hatine hermono kirin û berjewendiyên wan berevajî hev, mezin e. Jibo dahûrandîna şaristaniyê ya rasteqînî, ev yek gelekî girîng e ku pêşveçûnê herdu aliyên civakê yên mîtolojîk, olî, felsefî, û zanistî, bi aliyên wan ên pêşverû û kevneperestî û bi rewîştî wan ya pozberîti li ber çavan bigirin û bi nîrxînin.

D- Di pêşveçûn û belavbûna dîrokî de pîrsgirêka rêbazî

Liser têkiliya wê ya bi mijara me re, ez girîng dibînim ku ji nav rêbazên nêzîkaya dîrokê, yekê di warê tarîfkirinê de, binîrxînim. Rêbazên ku emê liser rawestînin, ne berevajîtiya materyalizma dîrokî û îdealîzmê ne. Ev pozberiya rêbazan, derûna pêşveçûnê weke heyîna wê nîşan nade. Ji aliyê din ve, raveyên dîrokê yên di derbareyî pozberiya çîn û takekesê qehreman de, ti agahiyan nade. Pîrsgirêkeke din ku bi vê pîrsgirêkê ve girêdayî, têkiliya di navbera pêşveçûna civakî û dîrokê de ye. Dahûrandîneke civakê û şaristaniyê ya bê mejû yê çiqasî rast be? Gelek beşên civaknasiyê (sosyolojî) bê mejû ne. Weke ku pêşveçûn ji nişkê ve çêbûbe tê berdan û hemû nîrxandinên, aborî, hiqûqî, siyasî û leşkerî liser vê têne avakirin. Him jî ev yek bi navê zanistîtiyê tê kirin. Wekî din dema ku pêşveçûnê civakî li demên dîrokê tîna belavkirin û dabeş dibin, ew neberbiçavî (nenêrbaran) û têkiliyên sar berdewam dikin, weke ku ji demê qutin û di navbera wan de ti têkilî tinebin li ber çavan tê girtin. Her dem, an dema berî xwe înkâr dike an jî berevajî dike û jibo nêzîkbûnê xwe yên neberbiçav (subjektîf), dike malzeme.

Di dawî de dîrokê jibo armancên xwe didaxînin wateyeke gelekî teng. Her dema ku hatî ji dema din çî sitandîye yan çî dayiyê û ew dema din nebe, gelo ew yê hebe yan nebe, pîrsgirêka nîrxandinê vê

yekê ya rasteqînî, îro jî li ber me ye. Di vî babetî de, dibe ku rast be, çaxê ku dibêjin, 'têgihîna dîroka zanistî hê di merhaleya çarlepka de ye'. Ez nirxandina nêzîkbûna xwe, ji vî aliyê rexnegirî ve, raveker dibînim. Bi taybetî di demên agahdarbûna serkî de, nêzîkbûnên pirtûkî-şematîk gelekî bimehzûr (bifikar e) in, encamên ku ji rastiyê dûr kirine derandine holê

Dahûrandina dîrok û civakê yên bi reçeteyên di dest de amade, civaknasên ku xwe herî bi zanistî berdidin jî, bi berpirsiyariyên mezin re, rû bi rû dihêle. Dive mirov ji vê dersên mezin bigire ku nêzîkaiyên "reel sosyalîst" yê bi îdeaya ku herî zanistî ne derketine holê, encamên weke nêzîkaiyên dogmatîk-îdealîst bi xwe re anîne. Sedema di bin vê yekê de, têgihîna eznavendparêz ku hê ji dema sumeran hatiye heta îro ye. Çi têgihîna ku di tasdîqkirina saziya polîtîka heyî re derbas dibe, çiqas ku xwe bi zanistî jî berde, dibe amûra meşrûkirina sazûmanê. Tiştê ku tê çêkirin, ji ya ku rahîbê Sumer çêdikir ne cuda ye. Jiberku bi piranî zanîna zanistî dihate bikaranîn, ev hê xetertir e. Di serdema zanistî de, liser navê zanistê sererastkirin (rotûşkirin), Pirolekirin (mubalexê) û piçûkdîtina nêzîkaiyên mîtolojîk û olî, wêrankeriya (tehrîbat) gelekî zêdetir dide civakê. Heger ol û mîtolojî efyon bin, zanistiya bi şewşandin jî xencereke ku di dilê civakê de çikandiye. Xilasbûna ji bandora bêhişkeriya efyonê çiqas hêsan be, dermankirina birîna xencerê ewqasî zor e.

Sedema bingehîn ya berfirehbûna sazûmana mijokatî û çewsandina ku ji zanistê û teknîkê tê, ji rêbazên êşkenceyê zêdetir, bi çêkirin û bikaranîna zanistê ve girêdayî ye. Zanist û nûnerên zanistê jî, ji vê rewşê berpirsiyar in. Berpirsiyarbûna van ji berpirsiyarbûna rahîbên Sumer ya wê demê gelekî bêhtir e. Di serdema me de mijarên weke, du şerên cîhanê di serî de, di hemû şeran de, hejarî, qirêjbûna hawîrdor, newekheviya cinsan, sawa (erjeng) teraza nukleer, zêdeyiya nefsan, harbûna teknolojiyê ûwd. ku derketine holê de, ji berpirsiyariya leşkeran bêhtir, berpirsiyariya rêbazên zanistê û nûnerên wê hene. Rahîbên zanistê rê li ber vê rewşê vekirine. Zanîngehên di roja me de, bi awayekî ku ji perestgehên Sumer û yên serdema navîn kevneperestir û ezperestir (egoîst) li hember serdemê ketine nava neberpirsiyariyeke mezin. Ew timî serdemên seretayî û yên navîn tawanbar dikin û xwe paqij dikin, vê jî bi awayê "rêbaza zanistî" pêktînin, lê ew av wan paqij û zelal nake. Hemû hevberkirin didin nîşandan ku di sedsala 20an de, tinekirin, êşkence, birçîbûn û nexweşiyên bi serê mirovan hatin, ji tevahiya hemû sedsalên din bêhtir in. Heger ku bi rastî li hember dîrok û civakê xwe berpirsiyar bibînin, pêdiviyê ku rêzeyên (paradîgma) bingehîn yên serdema me, rêbazên wan, berhemên ku derandine holê, şeweya zanistê û taybetî sepandina wan, di rexnegiriyeke esasî re derbas bibin. Heger ku vê peywirê bi awayekî serkeftî neyînin cîh, ji tawanbarî û darizandina ku ji çîna rahîb û sêrebendan bêhtir xerabî nekirine rizgar nabin.

Jibo vê yekê, tiştê ku di serî de were kirin ev e: rastkirina nêzîkaiyên dîrokî û civakî û bi dersên wê yen bingehîn ve, bi encamên etîk û exlaqî ve were girêdan. Berevajî vê yekê, sêrek an terîqateke ji rê derketî, li qasî Çernobîl û Hîroşîma wê wêrankeriyê nake, êş û azarê nade, sêrebendek an jî alimekî ol, ji alimekî zanistê ne xetertir e.

Ez dixwazim vê bibêjim: Li pişt pêşveçûnên ku wêranî û êşê bi xwe re tîne, plan û bername yên liser maseya alimekî zanistê ku ji nirxên mirûz (moral) qutbûyî, nizanibe ji kê re û jibo çî xizmetê dike, heye. Li pişt vê jî, têgihîneke seqet a dîrok û civakê heye ku çewtîyên mezin, bêpîvanî û bêdadiyan bi xwe re tîne. Heta ku zanist van pirsgirêkan çareser neke, ji vê tawanbarkirina giran û rexnekirinê rizgar nabe. Lewre rasteqîniya ku heye, rexneya mafedarî bi xwe ye.

Em pêşveçûna şaristanîtiyê bi Sumer ve û sumeriyên jî bi çavkaniya civaka neolotîkê ve girêbidin, girîngiya wê ya dîrokî di ronahiya vê rexnegiriyê re, wê çêtir diyar bibe. Lewre dîroka şaristaniyê bi Sumer dest pêdike. Pêşveçûna Sumer jî, bi çiyayên ku Dicle û Ferad ji wan dertê, bi deştên biber û dayîna xwezayê ye, bi pêla mezin û yekemîn ya civakî û şoreşa gund û çandiniyê ye. Ji BZ bi 10 000 an bê navber, digel ku xwe da zuwakirin jî, di serî de şaristaniya Sumer û ya tevaya cîhanê xweyî kiriye. Dayîka zayok ya şaristaniyê ye. Dera ku dîrokê -di warê nivîskî de- dest pêkiriye, şixûlandina hêmana diyalektîkê ax û mirovên wê ne. Ez vê mijarê ne ku ji ber dilîna û welatparêziya xwe dibêjim. Wisa were fêhmkirin wê gelekî çewt be. Ez vê gelekî girîng dibînim, da jibo ku girêdana diyalektîkê ya dîrokê di cîh û demê de, rast were damezrandin. Ez vê yekê ji ber, pêdiviyên rexnegiriyê ku di roja me de hatine pêşvebirin û bi giştî tîr pejirandin, bi cîh binim dikim. Evqas ku ez liser dahûrandina şaristaniyê radiwestim û diçime ber bi destpêkê, ji ber girîngiya wê ya jiyanî ye. Lewre ev yek xweş tê zanîn, dîrok û heyîna civakî ya ku destpêka wê rast neyê danîn, ti caran rast nayê terîfkirin. Dîrok û civakeke ku rast neyê terîfkirin jî, wê timî bibe cîhderka xeterî û qeyranan.

Heger çavkaniya dîrokê rast hatibe danîn, wî çaxî pirsê, 'weke pirsgirêkeke din ku were ronîkirin, çavkaniyên din tinene, heger ku hebin tîkiliya di navbera wan de çawa ye?' Girîngiya xwe diderîne holê. Di vî derbarî de, çewtîtiya xeternak (vehîm) ku tê kirin, şeweyên civakî weke ku qeder bin, bi îfadeya pêşveçûna şematîk ya mecbûrî tînine holê. Di vî babetî de, di navbera materyalizma

diyalektika Marks û îdealizma diyalektika Hegel de ti cudahiyên zêde tinene. Bêşik, di warê şîrovekirina rasteqînî ya dîroke de, tégihînên rêbaza Marks û Hegele gelekî girîng in. Evan hê ji windakirina derbasdariya (muteber) xwe dûr in. Ji ber vê yekê, di derandina holê ya rastiye berbiçav yên dîrok û civakê de, pêdivî ye ev herdu rêbaz werin perpirsiyarkirin. Ligor rêbazê, berbiçavî ketiye plana duyemîn yan jî bi alîkariya wê ya bi rêbazê re, bi nirx bûye. Bi hatina ber bi sedsala 20an, zanyarên zanistê rastiya sereke diavêjin aliyekî û bi hemû awayî berbiçaviyê dikin "şaxa zanistiyê", an jî gotine "ne mijara zanistiyê ye" û avêtina plana duyemîn. Vê yekê ew zanyarên zanistê kirine rewşa "bawerhişkên zanistiyê". Ev jî dide nîşandan ku zanyarên zanistê û zanîngeh ji rola perestgeh û rahîban derneketine. Ez dixwazim vê jî bînim zimên, heger eznavendperezîya dema me di asta takekesiyê de were derbaskirin jî, lêbelê di asta sazîbûnî de ji serdema navîn ne pêştir e, di gelek waran de jê paştir e, ji aliyê exlaqê civakî ve ji gelekî xeter e.

"Sosyalizma zanistî" ku xwe parêzkarê kedê û nûnerê wekhevîyê, herwiha xwe bidad û xwediyê nêzikaya zanistî dide nîşandan, hê ji vî navî gelekî dûr e. Çespana (îsbat) vê yekê, ketina "reel sosyalizmê" ya nava bê exlaqî û bêdadiyê ye. Bêşik ev rewş, heyf hilanîna li hember nenêzîkbûna rast û dadiyane ya li dîrok û civakê ye. Ez vê nêrînê rast dibînim: Dîrok û civak organîzmayên zindî ne. Yê bersivê bidin wanê ku şîroveyên çewt û înkara wan bikin, çî zû û çî derng, yê şeqamên ku maf dikin li rûçimê wan bixin. Proje û bernameyên civakî ku bi şemayên neberbiçav û bi nêrînên çewt yên dîrokî tèn bikaranîn, encamên xwe yên biêş, di tevgerên "reel sosyalizm", "reel faşîzm" ûwd. di gelek tevgerên civakî û sazîbûnên dewletê de nîşan dane. Tiştê ku bîngeh ne xweşik ava bûbe, rastkirinan di cîh û demê de pêkneyîne, ligor naveroka xwe yê têkbiçe. Rastiya vê rêzîkê, ji hemû serdeman bêhtir, di serdema me de xuya kiriye.

Çavkaniyên din yên ku dîrokê xweyî dikin, cur bi cur in. Giraniya hêza wan ji hev cuda ne. Li vir pîrsgirêka esasî, herka çavkaniya sereke ye, hêza wê ya xweyîkirinê û kaşkirinê (xiriqandin) ye. Çem û golên piçûk, zêde bikêr nayên. Encex ew di coheke (kanal) sereke de bigihîjin hev û wergerin bendavê, êdî yê wergerine enerjîyeke ku werine bikaranîn. Pîrsgirêkeke dîrokê jî wiha heye ku bibe çemekî sereke. Pêşveçûna dîrokî, bi serê xwe ne tenê çem û gol in. Dîrokên wiha jî hene. Lêbelê rastiyeke din jî heye ku çavkaniya sereke, zorê li çavkaniyên din dike, tevî xwe dike û xweyî dike yan jî wan bi tenê dihêle û zuwa dike. Çemê sereke yê herika dîrokî, xwe ji gelek çeman xweyî kiriye û hatiye heta îro. Di demên borî de, herçiqas ku li geravan qelibî be û hinekî rawestiya be jî, dîsa mezin bûye û bilez herikiye. Li vir peywira dîrozkaniyê ev e ku bide çespanandin, bê di vê herikînê de kîjan civakê, li kûderê û çawa tevkariyek kiriyê. Mayina li derî dîrokê jî, bi vê rêbazê hesantir yê were çespanandin. Nîqaşa, gelo pêşveçûn mîna xetê rast an jî mîna xelqeyên pêçokeyî (helezonî), çiqas ku girîng be jî, jibo rêbazê di plana duyemîn de ye.

Ev diyar e ku ev nêzikayiya me, bi mirovhezîyeke (hûmanîzm) kûr ve girêdayî ye. Divê ev yek xweş were zanîn ku civakên xwe herî neteweperest berdidin jî, xwe bi awayekî zêde bi dîrokê xweyî kirine. Mînaka vê ya tîpîk, civaka cihûya ye. Ev civaka ku di dîrokê de, herî neteweperest e, xwe bilind û di rewşeke cuda de digire, civakeke ku ji çavkaniyên dîrokê ji hemû kesî bêhtir xwe xweyî kiriye. Li qasî ku Cihûyan Ji Sumer a mezin, Misrê, Fenîke, Grek, Roma, Ewrûpa û DYA (Dewletên Yekbûyî ya Amerîka) bêhtir xwe bi dîrokê bi xweyî kirine, dîsa civaka ku bi hişmendî tevî bûye û pêdiviyên xweyîbûnê bi cîh anîne, Cihû ne. Di vî babetî de, dîroka cihûyan xwedî şens e ku giştî û taybetî di nava hev de nîşan daye. Rola rewşenbîrên bi eslê xwe cihû ku li tevayî cîhanê xwedî cîhekî mezin in, bi vê tevîbûna dîrokî û hişmendiya wê ve girêdayî ye. Hêza civaka Cihû, çavkaniya xwe ji van rastiyan digire.

Encameke din ya nêzikaya min ev e ku bi rastiya xwe re, nirxên ku mafedarî bin wergire. Herçiqas ku dîrok yekbûnî be jî, di nava vê yekbûniyê de, her perçekî nirxekî xwe heye. Nirxê civakeke herî biçûk û yê takaksakî jî qîmetekî xwe heye. Çawa dîrok di civakê de, civak jî di dîrokê de diyar dibe, takekes di civakê de û civak jî di takekes de diyar dibe. Ez vê yekê di nirxê baweriya zanistî de dibînim, weke îfadeya ku rêbaza diyalektîke li dîrokê were sepandin, encama bîngehîn ku materyalîzma dîrokî yê bi gihîyê ev formûl e.

Ez vê yekê girîng dibînim ku van pîrsgirêkên rêbazî, di beşên têkildar de bi berfirehî li ber çavan raxînim.

E- Dema belavbûn û gihîştina şaristaniya koledar

Dema ku Sumer di warê hilberîna aborî de, biberîyeke (berdar) bêhempa xwe çespan, jibo ku derbasî rewşa civaka bilind bibe jî çespan bi dest xist. Biberîya serdest ya di warê hilberînê de, vê dawiyê jibo hemû şaristaniyan dibe pîvana bernîşana hêzê. Civakên biber (berdar) civakên bi hêz in, herwiha bûyera medûcezîr (rabûnûdanîn) ya kêşan û belavbûnê, rewşa navendî derdixe rastê. Ev

serdestiya Sumer, di warê dextlê anku genim û ceh de, tê hesabkirin ku ji yekê heştê dida. Ev hebûn bi xwe jî nişan dide, bê ligor dema xwe çawa xwedî bandor û hêzeke belavbûnê bûn. Bidestxistina berxwarina zêde, gelek cihên pişekarî û bazirganî îstihdam dikin, li dor perestgehên ku navenda hilberînê ne, bajarvanî û şoreşa bajarî pêktê. Vê pêvajoya ku li deşta Mezopotamya jêr destpêkir, rê li ber pêşveçûneke tûnd ya civakî, him çînî, him bajarî him jî nasnameya pevrayî siyasî ya serdest ku di dahênandina rêxistibûna bi şeweya dewletê, vekiriye. Ev tê wateya şoreşeke siyasî. Nirxên berhevbûyî, rê li ber pirsgerêkên ewlekarî vekir, pêdiviya amûrên perastin û yên êrîşê derkete holê, di vê demê de mecbûriya teknîkên şer derdikeve holê. Teknolojiya tevîrê ji tûnc, halet û bivir ku berê di warê çandinî de, tevkarîyeke mezin kiribû, rê da teknolojiya şer. Çekên ji tûnc, mîna serdestiya atoma îroyîn, hêzeke mezin bi xwe re anîbû. Herwiha, êdî di warê hêza çekdarî de jî, ti civakên ku li hember civaka Sumer rawestin tinebûn.

Bi ser vê serdestiya duyemîn de, em sazûmana dewletê ku rêxistineke gelekî pêşketî û hêza perstgehê jî biservebikin, emê careke din hêza ku dîrok daye destpêkirin, bi xalên sereke terîf bikin. Ev sazûmaneke wisa ye ku ne bi tenê hilberînê dike û xwe diparêze, bi hêzeke bêhempa belav jî dibe. Di kesayetiya damezrînerê (sazgêr) xanedaniya Akad Sargon de, em vê yekê dibînin û xweş fêhm dikin ku di dîrokê de yekem car, çawa bi plan û armanc wergeriyaye emperyalîzmê. Serdema emperyalîzmê ya sazûmana civaka koledar, destpêdike. Em dikarin bibêjin ev, di dîrokê de bûyera medûcezîr anku merhaleya belevbûn û lidirabûnê ya yekemîn e. Rola Sargon, dikare were nirxandin ku wî, dewlet-bajarên Sumer yên ji hev perçebûyî û pozberî hev, kirin yek û hêza xwe da belavbûna derveyî. Hêzên emperyalîst yên vê dawiyê, ev mînak ji xwe re kirin rê û tekûztir domandin. Herwiha ne tenê bi helatina şaristaniyê û sazîbûna wê, em di warê şeweya sazûmana belavbûnê de jî, deyndarê Sumer in. Heger ku em salên navbera BZ 4000- 2500an weke zayîn û sazîbûna Sumer bibînin, emê li rastî pêvajoya emperyalîzm û mêtîngeskariya wan werin ku piştî salên BZ 2500an heta weke niha jî tê lêkolînkirin û rastiya wê tê fêhmkirin.

Em dikarin mantiqa vê pêvajoyê di bin van xalên jêr de birêzînin:

a- Belavbûn, ji ber hilberîna zêde ye. Zêdeyiya doringên çêkirinê (îmalat) û daringa xam (madeya xam), pêdiviya bazareke mezin derande holê. Dayîn û standina bazarê, yekem car bi sazî dibe û pêşdikeve. Çîna bazirganiyê dibe pêşenga belavbûnê û di dîrokê de roleke mezin dilîze.

b- Pêşketina teknîka çekên ji tûnc û hilberîna wan ya zêde, rê li ber zayîna hêzek leşkerên profesyonel vedike û bi rêxistinî re, bi sazûmanê re dikevin pêvajoya belavbûnê. Bi plan û berfirehî dema xenîmetê destpêdike. Yekem car nijada mirov, bi plan, bi armanca xenîmet û kolekirinê, li tinekirina yên ji nijada xwe digere. Ev mijar ji ber vê yekê girîng e, di sazûmana hemû ajalan de, em nabin şahid ku cureyek ajal hemcînsê xwe tine kiribe. Wekî din, tinekirineke bi plan û rêxistin qet tine. Yekem car nijada mirov vê yekê bikartîne. Ev yek bi civaka bi çîn re pêşdikeve. Di civaka neolîtîk de ku çînçînîbûn pêşneketibû û serdemên berî de, tiştekî wiha nayê dîtin. Yamyamî bixwe jî, hatiya çesandin ku gelekî bisînor û bi pêdiviya armanceke pîroz, şeweya îbadetekê ye. Bikaranîneke bi vê şeweyê ya hikarîker, rêzika "kuştina qeran e", ev şeweya pêkanîne ku temsîla xwedayî ya zayîn û mirina demsalî, vê dawiyê bi qurbankirina zarok û xizimên xwe hatiye berdewamkirin. Hêrîşên bi plan, bi armanca talanê û tinekirinê, ji aliyê çîna serdest û mijok ve tê pêşêxistin, sazîkirin û weke ku çalakiya normal ya dîrokî be, tê meşrûkirin. Vê dawiyê, çalakiya qehremanî ji aliyê ola serdest û gerdîş (tore) ve tê pîrozkirin, wateyeke mafedarî distîne û dibe destan. Çîneke civakê, vê dike armanca xwe ya bingehîn. Hildide pîleya pişeyekî. Herwiha serdema "Mirov kurmê mirov e" dest pêdike. Divê ku çavkaniya naletîbûnê, di vê pêşveçûnê de were dîtin. Lewre destana Sumer ya herî girîng, "Naletbûna Agade" bi rûxandina bajarê pîroz Nîppûr ve girêdayî ye.

c- Pozberiya dewlet-bajarên piçûk a navxweyî, rê li ber vê pêvajoyê vedike, mezinbûna pêdiviyên wan mecbûrî emperyalîstîtiyê dike. Civakên komunvan yên berê jî, bi gelek aliyên de belavdibin, lê ev belavbûn ne bi armanca talankirinê û ne jibo hikimkirinê ye. Ev jibo pêdiviyên xwezayî û girêdana wan a bi jiyana di rex hev û din de ye, ji emperyalîzma koledar, talankirina wê û mêtîngeskariya wê gelekî cuda ye. Bi kinayî em bi bêjin, çîna serdest a mijok ku di nava xwe de kete tengasiyan, jibo ku vê tengasiyê ji ser xwe bavêje û hinek qezencan bike, berê çewsandinên nav xwe ku polîtîka wan ya bingehîn bû, da derve .

d- Ev hersê sedemên bingehîn, bi belavbûna ku rêzika bingehîn ya şaristaniya biçîn e, xwe mezin dike û werdigere rasteqîniya xwejiyandinê. Ev şeweya bi vî rengî, taybetiyeke di xwezaya şaristaniyê de. Ligor armancên belavbûnê, gelek şeweyên wê yên cur bi cur hene. Digel bi armanca talankirina ji nişkê ve, daxwaza wan ew bû ku çavkaniyên doringên xam yên stratejîk, hesin û sifir têxin bin kontrola xwe, ji aliyê din ve mêtîngehên bazirganiyê û bajarên nû ava bikin. Dîsa

belavbûna bazirganî, jibo bidestxistina daringên xam û firota daringên çêkirî û jibo damezrandina perestgehên weke yên xwe, herwiha belavbûna olî û bîrdoziyî. Ligor taybetiyên cihên ku lê belavdibûn, an timî li wira niştecih dibûn anku mayina payider bû, an jî jibo demekê, anku çendemî diman. Di mayina payidar de, êdî ew herêm bi tevgerî û jiyanekê pevrayî, werdigeriyane qadên şaristaniyê yên nû.

1- Şaristaniya Misrê: Piştî Sumeriyan, yek ji civaka koledar ku derkete holê, şaristaniya Misir-Nîlê ye. Dema ku em vê şaristaniyê dinirxînin, girêdana wê bi neolîtîka Afrîka Bakur ve nayê çespendin, belavî û resenîtiya (orîjînalîte) wê nayê dîtîn. Êhtîmal e ku dema gihîştina şoreşa çandinî ya Heyva Berhemdar, çawa li hemû deran belav bûbe, BZ di salên 6000an de gihabe vira jî. Ev nirxandin ji aliyê kronolojîk ve jî, ne dûrî mantiqê belavbûnê ye. Lewe (alûwyon) yên Nîlê yên gelekî berhemdar, derfetê didin şoreşeke wiha ya bajêr. Lê dîsa di reseniya wê de, dewsen şoreşa bajêr ya Sumer tê dîtîn. Lêbelê berhemdariya zêde, bi pêvajoyeke xunaftinê (xwemalîkirin) heyina xwe ya resen diderînine holê. Têkiliyên zû yên bi çanda neolîtîk re û xunaftina bilezê, Misir kire civakeke bi çîn û resene ya şaristanî. Lêbelê ev jî rastiyeke ku şoreşa çandinî ya Heyva Berhemdar û şoreşa bajêr ya Sumer nebûna, şaristaniya Misrê bi serê xwe dervedikete holê. Çawa bêyî Nîlê şaristaniya Misrê neyê hizirîn, bêyî Heyva Berhemdar û şoreşa gund û bajêr ya Sumer jî, berhemdariya Nîlê û şaristaniya Misrê nayê hizirîn. Di vî babetî de çespîna herî girîng, mercên erdnîgarî û avhewayê derdora Nîlê ye ku bi serê xwe derfetê nade şoreşa çandinî ya neolîtîk yên ajal û rîwekan (nebat). Li Misrê mercên şoreşa çandinî yên resen tine ne. Heger ku hebana, ji ber mercên ku nayên guhertin, geliyê Nîlê hê ji zû de yê bûbana cihê şoreşa çandinî û bajêr, yê ne piştî Mezopotamya, berî wê di vî warî de pêşbiketa. Rola Nîlê ya esasî ji taybetiya avdana wê û axa biber (berhemdar) derdikeve holê. Dema ku teknolojiya çandinî bidest xist, di warê şaristaniya resen de gavên mezin avêt.

Şaristaniya Misrê BZ ji salên 3000an dest pêdike û heta serê zayînê bê guherîn berdewam dike. Di warê geometrî, avahîsaz (qesirbend) û nivîsê de, pêşveçûnên ji Sumer cuda pêkanîne. Di warê avahîsazî de wisa pêşketine, encex bi Roma re werin hevberkirin. Barkêşiya bi keştiyên bayê gelekî pêşveçûye. Hesabên sal û demsalan yên bi stêrkan, sererestirin. Digel ku sazîbûna dewletê bêhtir navendî ye, derfetê zêde nade dewlet-bajaran. Dabeşîneke rêvebiriyê ya bi şeweya eyaletan heye. Misir jî weke Sumer ji aliyê sîh xanedanên ku bi awayekî demên zû, navîn û dereng, hatiye birêvebirin. Pêşî giraniye rahîban heye, lê duv re bi qeranên rahîb serdest bûye. Têgihîna xwedaqeran serdest e. Mîtolojî ligor ya Sumer lawaztir e û bi sînor pêşveçûye. Li vir navendeke xwedayî tê holê ku nêzîkî sêbareya bav, dayîk û law e. Xwe mîna şewqa sazûmana ezmên ya liser rûyê erdê nîşan dide. Di vî bingeşî de, serdestiyê bîrdoziyî ya bi hêz dadimezrîne. Ji ber vê çavkaniyê, kevneşopîya rahîbên Misrê, heta weke îro bi hêzeke xurt dijî. Hewldanên mêtîngehkirina emperyalî, bisînor dimîne. Têkiliyên bazirganî yên bi Girî-Fenîke re, bandorê li pêşveçûna şaristaniya binî dike. Misir di xweyîkirina çemê şaristaniyê de rola robarekî dibîne. Lê dîsa jî di pêşveçûna xeta şaristaniya koledarî de, ji BZ 3000an heta bi serê zayînê, xwedî pareke sereke ye. Rola şaristaniya Grek ku şaristaniya Roma xweyîkirî, ji çavan dûr nayê girtin. Digel ku Misrê, Afrîka ji şaristaniyê re venekiriyê jî, lê bazirganî heta bi nava wê pêşvebiriyê. Di hêla bazirganiya keştiyên bayê yên li Nîlê, Derya Sor û Derya Spî, rola şaristaniya Misrê gelek e.

Misir di sêwirana (tasarim) mîtolojiyê de, ligor Sumeriyan paşketiyê, lê di pêşveçûna olên yekxweda de, cihêkî girîng digire. Digel ku ceribandina olê yekxweda destpêkirine, ev yek bisînor maye. Çîna rahîbên Misrê, bi rola xwe ya perwerdeyîya bihêz, bûye navenda gihîştina kadroyên mîtolojî û ola Grekiyan. Rahîb û pêşengên feylesofên Grek, heta BZ sedsala 5an qûtê xwe ji perwerdeya Misir û Babîlê wergirtine. Di warê pêşveçûna şaristaniya koledarî de, him jî pêşveçûna zû û resen, him jî, ji mezinahiya xwe ve, piştî Sumer di rêza duyemîn de ye. Di xweyîkirina sazûmanê de berdâr û domdar e. Di warê bikaranîna koledariyê de, ewqasî bi pêşveçûne, bi taybetî di avakirina pîramîdan (ehram) de, keda koleyan bi awayekî erjeng hîkarîker e, bi vî awayî cesaret dane gelek împeratoriyan mîna Roma jî. Despotîzma (zordestî) Rojhilata Navîn ku hê jî bi hêzeke mezin e, ji mîrateyên sazûmana civakî ya Misrê tê. Çiqas ku koletî bi awayekî kûrahî bi rêk û pêk kirine, ewqas jî desthilatiya (otorîte) siyasî û olî bi hêz û tekûz kirine. Di dîrokê de, helatin û pêşveçûna koletiyê bi Sumer destpêkiriye lê gihîştin û domandina wê bi Misrê pêkhatiye.

2- Şaristaniya Harapa û Mohanjadaro ya li Geliyê Pencab û êndûsa Hindê: BZ di salên 2500 an de, vederbûna şaristeniyeke bişeml, weke ku ji erdê bide der, derkete holê. Ev şaristanî dişibe şaristaniya Misrê ya vederkirî. Hatiye çespendin ku di warê nivîs û qesirbendiyê de, pêşveçûneke bisînor pêkaniye. Tê texmînkirin ku girêdana vê şaristaniyê bi şaristaniya Sumer re, bi pêwana okyanûsa Hindê çêbûye. Dibe ku BZ di salên 5000 an de, di ser îranê re bi şeweyên neolîtîk

re têkildar bûbe, lêbelê ji şoreşa çandinî zêdetir, mîna mêhtingehke Sumer ya bazirganî pêşketibe. BZ di salên 2000 an de, tê ferzkirin ku ev şaristanî ji ber mehteşiyêke mezin, qeyraneke mezin derbasdike, li derî dîrokê dimîne û vedimire. Li qasî şaristaniya Misrê, resen nebûye û berdewam nekiriye.

Şaristaniya Hindê BZ ji salên 1000an pêde, bi saya niştêcîhbûna komên Aryen, resenî û berdewamiya xwe pêktîne.

3- Şaristaniya Çînê: Hevnasîna Çînê ya li rojhilatê Asya, bi serdema neolîtîk ya bi Heyva Berhemdar girêdayî re, BZ di salên 4000an de çêbûye. Di şoreşa çandinî de, ti pêşveçûnên wê yên navxweyî nayên dîtîn. Çemê Zer, bi berdarî (berhemdar) û rêkûpêkbûna avdaniya xwe, rola Çemê Nîla Misrê dileyze. Erdnîgarî û avhewa wê, ji bilî avdanê bikêrî çandiniya rîwekên çandî tê. BZ di salên 1500an de, emperetoriyêke koledar ya bihêz, liser civakeke biçîn ya pêşveçûyî tê avakirin û li qasî xanedaniyên Misrê bi navendparêziyêke hişk pêşvedîçe. Mîna şaristaniya Hindê qetandinek tê de çênabe. Gelek merhaleyên perçebûnê û navendîbûnê derbasdike û digihe heta dema îroyîn. Ti tevkariyên wê yên resen jibo şaristaniyê ne hatine çespendin, lê bi awayekî resen xwe xweyîkirin domandiye. Di dema Roma de, serê zayînê, bi awayekî herikîn tevlî çemê şaristaniyê dibe. Dema ku Asya û Ewrûpa liser xeta şaristaniyê dibin yek, gelek şaristaniyên civakî yên hûr û gir tevlî çemê sereke dibin. Çemê sereke mezin dibe û bilezdibe. Hêzên civakî ku ji bakur û başûr di herikin ber bi xeta herêmên Okyanûsa Atlas û Okyanûsa Mezin, taybetiyên vê xetê dikişînine seresazî û binesaziyên xwe, ji xwe jî hinek rengan tevlî dikin û alîkariyê didin dîroka dewlemend. Wateya rastiya Rêya Hevrîşim ya efsanewî, ji leyistika rola wê ya di vê dewlemendiyê de tê.

Di warê dabeşbûna şaristaniyê ya li parzemînan de, hevnasîna BZ di 3 000 salan de bi neolîtîkê re û BZ di sedsala 5 an de derbasbûyina şoreşa bajêr, para Emrîka ketiye. Parzemîna ku di nava xwe de, pêşveçûneke bi sînor pêkaniyê, rola xwe ya di cîhanê de, piştî ku ji alyê kapîtalîzma Ewrûpa ve hatiye mêtingehkirin, gelekî bi derengî û di sedsala 20an de, bi pêşevaniya DEY (Dewletên Emrîka Yekbûyî) leyîstiyê.

4- Di balavbûna şaristaniya Sumer û lidijderketina wê de, pêşveçûnên balkêş li herêmên cîranê wê pêktên. Li rojhilat û bakurê wê Horrît ên ji koka Aryen, li başûr û rojavayê wê komên Amorît ên ji koka Semîtîk, li hember hêz û dewlemendiya Sumer a di nivê wan de, ketine nava liv û lebatên mezin. Jiyana wan a bêdengî, sazûmana çandinî ya niştêcîhîya gundîtî û sazûmana şivantî ya koçberî, di nava hejîneke gewre de ne. Civakên Aryen, nikarin ji ajaldarî û çandiniya ku bi kûrahî dijîn, derbasbibin. Ji mêj de, Sumeriyên ev serdestî bi dest xistine. Civakên Amorît ên şivan, ji çandinî û jiyana bajêr gelekî dûr in, di mercên çolê yên giran de, bi zêdebûna carcaran mehteşiyê, jiyanêke bi zor û zehmetî dibûrînin. Li ber serê wan bihişteker berfireh dibe. An yê bibine koleyên xizmetkar an jî yê bibine dagirkerên fetihker ku qedera xwe bi leyîzin. Li rojavatir şaristaniya Misrê jî, bi pêşveçûnên bi vî rengî re, rû bi rû ye. Ezmûna şaristaniyê, an li hember barbariyê yê qezenc bike û belav bibe an jî yê bi xeniqe û vemire. Dîrok li hemberî kêliyên xeternak ên pêvajoya diyalektîkê ya diyarker e. Pêvajoya ku Sumer daye destpêkirin jî, bi livên van koman ve girêdayiye. Lêbelê dema ku ew serdestbû, cudahî nakokiyan diderîne holê.

BZ di salên 2500an de, dema ku gihan sînorên xwezayî yên bajarbûyînê û şerê berberî (rekabet) û xwedaniyê (mulkiyet) dijwar bû, Xanedaniya Sargon ya ji koka Semîtîk ji navê derket, nakokî bi darê zorê çewsand û seferberiya derveyî ji xwe re kire polîtîka bingehîn. Taybetiya Sargon ev e, ber bi derve de çûna xwe ya carcaran ku weke qehremaniyekê, -destana Gilgamêş di derbarê van çûnan de ye- ji bûyera yekaniyê derdixe, dike pêvajoya belavbûneke bi plan û mêhtingehkirinê. Serdestiyêke bazirganî li çar aliyan, bi rêyên deryayî, bejî û çemen destpêdike. Ev pêvajo di nivîstekan (kîtabe) de, bi awayekî şanazî tê ravekirin. BZ di navbera salên 2500 û 2000an de mêhtingehên bazirganî, ji rojhilatê Derya Spî heta bi Derya Reş, ji nava êranê heta bi girav û peravên Kendava Basrayê, mîna aşîte belavbûne. Fenîkeyên li rojhilata Derya Spî, Hîtîtiyên li navenda Anatolyayê, Mîtaniyên li Mezopotamya jorîn û navîn û Elamiyên li êranê li zaxrosên rojhilat, piştî sependina mêhtingehkirina seretayî, resene dibin û bi berxwadanên ku xwîn rijandine, dibin xwedî hêzên siyasî û dewlet. Eynî weke piştî şerên berxwedanê yên li hember pêvajoya mêhtingehkirina kapîtalîzmê, çêbûna dewletên cîgeyî û federasyonan. Bi hêzbûna mêhtingehkeriya emperyalîst ya Sumer û hebûnên cîgeyî yên di bandora vê de mabûn re, pêvajoya dîrokê ya nû rê li ber gelek pêşveçûnan vedike. Taybetiya vê demê ya tîpîk ev e ku bi xûnifandin û resenebûn digihine civaka biçîn, him jî bi şerê piştî berberiya (rekabet) zêde, weke dewletên piçûk yên cîgeyî derdikevin sehneya dîrokê.

Digel serdestiya mêhtingehkirina Sumer ya BZ di navbera salên 2500 û 2000an de, tê dîtîn ku piştî salên BZ 2000an, bi giranî heyînen siyasî yên li dor mêhtingehan bi hêz dibin û demeke nû vedikin. Ev dema ku ji BZ 2000an heta bi BZ sedsala 5an berdewamkirî, di dîroka Rojhilata navîn de xwedî

wateyeke mezin e. Ev yek dabaşa xeberdanêye ku van heyînên siyasî, bi hindakayî li qasî Sumera klasik û Misrê tevkarî kirine û rê li ber pêşveçûnan vekirine. Ev yek tê wê wateyê ku sazûmana koledar, weke qederek be li serê mirovatêyê dibe bela û dema xwe ya herî gihîştî dijî. Herwiha dive ku ev pêvajoya nû ya şaristaniya koledar, bi her awayî were dahûrandin.

F- Serdema dewlet bajarên koledar yê Rohhilata Navîn

Piştî ku sazûmanên koledar yê Sumer û Misrê, qenc bi sazî bûn û payidariya xwe dan çespendin, êdî weke hemû sazûmanên civakî yê serdest, ji pêdiviya wan ya xwezayî ew jî dikevin pêvajoya belavbûnê. Civakên qebîle yê ku bi çandinî û şivantî debara xwe dikin, bi têkilî û bandora van re, jiyana wan ya azad tê sînorkirin. Serdem tê guhertin. Qebîleyên çandinî û şivan ku ji BZ 10 000 salan ve derketibûn holê, li hember vê hikariyê (bandor), bi du vebijarkan (alternatîf) dibizivîn: Qismên ku zêde dibin û hejar in, li derdorên bajarên herdu şaristaniyan niştecih dibin ku evder jibo wan çavakaniya kar û xebatê ne. Bi rastî jî pêvajoyeke wiha di nivîstekan de jî derbas dibe ku wê demê hatiye jiyandin. Ji Tewrat û gelek nivîsên Babîl tê fêhmkirin ku li Misrê komên semîtîk û îbraniyan, li Sumer jî komên aryan û kassîtan, di kar û barê wiha de, bi jiyanêke nîvazad xebitîne. Eynî weke gundiye îro ku diherikine metopolan û bi awayekî nîvazad kar dikin. Yê din ku dimînin, bi giranî giregirên qebîleyan û qismên ku biîmtiyaz, mîna xelqeyên herdu hêzên navendî, di warê serdestiya cîgehî de sift dibin, dibine bajarvanî û bersiva vê hikariyê didin. Di serî de mîna bazirganên kompredor ku bi navendên emperyalîzma koledar ve girêdayî, rolê dileyîzin, div re modela navendî dişopînin û dikevin rewşa dewlet-bajaran.

Ev mîsoger e ku ev pêvajo, ji BZ 2000 salan pêde bi tempoyeke ku zêde dibe, hatiye jiyandin. Pêşevanên dewlet-bajaran û niştecihbûnên yekemîn ev in: Li peravên rojhilatî Derya Spî Bîblos û ôgarî, li bakurî Suriye yan jî Mezopotamya Navîn Karkamiş, Samsat, Ebla, Ruha, Haran û Marî, li navenda Anatolya Hattûşaş, Kaneş û li rojhilatî Zaxrosan Elam.

Di serdema neolîtîk de, jiberku herêmên niştecihbûnê bi giranî jibo çandiniyê bûn, ji gundiye derbas nedibûn. Lêbelê ev herêmên nû yê niştecihbûnê, jiberku li herêmên neqebên stratêjîk weke qadên bazirganiyê û çêkirinê kar didîtin, bilez bûne bajarok û çiqas ku çû bûne bajar. Daringa ku herî bêhtir lê dihat pirsîn, keresteyên serwîzad (sedar) û cewhera madenê ku li Libnan û çiyayên Toros bûn. Ligel vanan, raçandin û kûzikkerî (dîzik) û gelek hilberînên pişekarî, jibo bazirganiya derveyî tene çêkirin. Jibo bazar û bihevguhertinê dirav dikeve navberê (dewrê), sazûmanêke nivîsarî heta bi nameyên bazirganî derdikevin holê, taybet li bajarên Fenîke bi awayekî hesan û bikêrhatî tê bikaranîn. Hêza şaristaniyê ya di warê dirav, bazar û nivîsê de, zêde dibe. Di dîrokê de çîna navîn, mîna gewdeyê civaka çînçînî di rewşa çêbûnê de ye. Dema ku em, qeralên rahîb yê li perestgeh û navendên rêvebiriyê bi burokrasiyê re û giregirên qebîleyan ku bi van ve girêdayî mîna çîneke raser binirxînin, bazirgan û pişekarên ku çîqa diçe serbixwe dibin çîna navîn û yê herî zêde ku giradanên qebîletî wînda kirine çîna kole diderînine holê. Bêşik ev çînçînîbûna nû ne zelal e û ji hev nehateye raqetandin. Lêbelê diyar e ku di çêbûna çalakiyên dîrokî de, zemîneke civakî ya dargî (madî), jibo berjewendiyên çînan dihile.

Di vê merhaleyê de, pirsgirêka dîrokê ya bingehîn ku pêdivî ye were dahûrandin, bûyera konfederasyona qebîleyan ku weke merhaleya pêş ya dewlet-bajar tê nirxandin e. Ev merhale berî şaristaniyê, di hemû civakên qebîleyan yê pêşketî ku xisimên hev de, derketiye holê. Tê fêhmkirin ku du sedemên girîng di vê de rol lîstine: Pêdiviya yekbûnê xwe nîşan dide ku weke nelihvîkirinê di nava dewlet-bajaran de, pozberî û nelihvîkirinê di navbera qebîleyan de berteref bikin, hê bêhtir xwe li hember hêrîşên hêzên şaristaniyê biparêzin û jibo berjewendiyên xwe qezencan bi dest bixin. Yek dikare bibêje ku ev jibo dewletbûnê merhaleya pêşek e. Ev şêwedarbûniyeke (formasyon) demborîn e. Hê li navenda bajarekî artêşeke siftbûyî tine. Burokrasî û perestgeha xwe saz nekiriye. Çîna navîn ne afirandî ye. Li hember gef û guran her kêlî dikare ji hev tertûbela bibe. Navekî din yê vê merhaleyê di dîrokê de, serdema lehengiyê ye. Berî dewleta koledar were damezrandin bi hindikî, ev dem ji aliyê Sumer û Misrê ve BZ di salên 3000an de, di merhaleya ku sazûmana koledarî gihîştî de, ji aliyê Hurrî û Hîttîyên ji koka Aryan ve BZ di salên 2500an û 2000an de, ji aliyê Kenanî û Amorîtên ji koka Semîtîk ve BZ di salên 2000an û 1000an de hatiye jiyandin. Merhaleya pêşek ya sazûmana koledariya Greko-Roman, Hindê û Çînê BZ di salên 1500an û 1000an de, bi hêz û bandor hatiye jiyandin.

Pêdiviya têgihîneke (serwextiyeke) bi kûrahî, jibo dema federasyonên qebîleyan heye. Bi hêzbûna eşîr û qebîleyên li erdnîgariya Rohhilata Navîn, quweta xwe ji vê dîrokê digirin. Ne sedsal, hezarsal di bin vê şêwedarbûniyê de derbasbûne, qehremantiyên mezin hatine pêkanîn. Eslê wê, ev pêvajo dîroka eşîran, bi gotineke din ya heyinê etnîkî ye.

Qewm, bi gelekî berî dîroka xanedaniyê, ol û çîna tê. Jibo ku yek bigihe dîrokekî sererast, divê ku pîrsgirkên dîroka heyina etnîk çareser bibe. Çi serdema seretayî be, çi serdema navîn û çi serdema nêzîk be, xwe weke serdemên xanedanan, ol û qewman dane rewakirin (meşrûkirin). Têgînên dîrokê ku di bingeha serdema seretayî de bi giraniya xanedaniyê, di serdema navîn de bi rengên olî û di serdema nêzîk de bi netewetiyê hatiye fermîkirin, ji ronîkirina dîroka civakê ku bêhtir geliciye, dûr e. Di vî babetî de, dîrok wisa hatiye şewşandin ku mirov nikare giraniya xanedanî, olî û qewmîtiyê di cîh de rûnîne. Mecbûriyeteke wisa heye ku dîroka dîrokê were nivîsandin. Digel hemû mezinkirin, tinekirin, piçûk û kêmtînin, çewt nivîsên bi zanayî û heta bi ravekirinan, wateya dêrandina xerakirinan çibe, heta dîrokekî wiha dernekeve holê, ne mimkûne ku mafê rastiyê were dayin.

Her çiqas ku bingeheke wê ya nivîskî nebe jî, "dîroka etnîk" wateyeke wisa dide ku ji dîroka ol, xanedanî û qewman rastir e û xwedî roleke domdar e. Heyînen etnîk (sazûmanên eşîr û qebîleyan) sazûmanên berbiçav û yên ne berbiçav û pêşveçûnên herî mezin, di serdema neolîtîk de ku giraniya wê çandinî û şivantî bû, jiyîne. Yekeya bingehîn ya dema civaka hovik (wehşî), qebîleya (bavik) bi navenda sereke bû, Ti caran bi ser hijmara sedî ne ketine. Jiyan di şkeftan de û gerhokî serdest e. Di avhewa û demsalên dijwar de, bi nêçîra ajalan û daneheva rîwekan debara xwe dikin. Ev civakên qebîleyî ku heta bi dawiya serdema qeşayiyê ya dawî (BZ 20 000) jiyîyan, dişibîyan hev û bi hinek dengên bisînor, di merhaleya zimanekî hoveber de bûn ku giraniya wî bi îşaretan bû. Xwedî têngîhîneke giyanwer (animîst) û olekî totemî ne. Dîroka mirovahiyê, ji sedî 98 di bin şeweyê jiyana vê civakê de derbasbûye. Hê ti taybetiyên ol, xanedan û qewman, herwiha jî dîrok çênebûye. Di navbera BZ 20 000 û 10 000an de, piştî merhaleya dema mezolîtîk ya ku dema derbasbûyînê, derbasî serdema neolîtîk (qebîleyên barbar) dibin. Sazûmana cîwarbûyîna gundîtiyê bingehe e, çandinî û ajaldarî çavkaniyên debariyê ne. Koçerî bisînor bû ye. Jiyanêke daykanî yên civakên pêwîstên hev heye. Hijmar carina digihe hezaran. Lêbelê nayê dîtîn ku bi ser pênc hezaran ketiye. Azadiya qebîleyê dilîneke gelekî bihêz e. Êbadetên olî yên bi giraniya xwedawenda dayîk, pêşvedîçin. Li cîhên cîwarbûnê yên vê demê, gelek peykerên piçûk yên xwedawenda dayîk têne dîtîn. Jin bi heyv û stêrkan tê temsîlkirin, lê hê bêhtir weke dayîka xwezayî ya hêzên cîgeyî û xwezayî, xwedî giraniyeke mezin e. Têgihîştina vê yekê ne zor e. Çandinî û kedîkirin keda jinê ye, bi anîna zarokan jî, jin di dîrokê de bi awayekî pîrozwer tê xuyakirin. Herwiha ew hêza jiyane ya afirîner e. Xweza û ax dayîk e. Mîna hêza keşkirina hilberînê ya xweza, rîwek û daran, temsîlkirina jinê ya xwedawendî, bi rewîştî xwezayî rê li ber wateyeke kûr vedike. Girîngiya jin-dayîk ya ku bi awayekî bêhempa zêde dibe, li hember mêr serdestiyeke diyar bi dest dixê.

Dema nêçîrvanî amûra debariyê serdest bû, çiqas ku rola mêr bi hêz bû, piştî ku nêçîrvanî kete plana paş, rola mêr ewqasî kêmtî bû. Gotina dîroka jinê, gotina dîroka famîliya genim, yên dewarên piçûk, darên fêkî, xaniyên gund, raçandin, ya bivir û ya aşkê desta ne, gotina dîroka rêzgirtina bingeha kedê û sazûmana ku hilberînê dike ye, gotina dîroka hilberîna ku bi kedê hatiye afirandin e û mezinkirina zarokan e, damezrandina sazûmana malan e. Dîsa gotina dîroka ji îşaretan derbasbûyîna zimanekî dewlemend e, derbasbûyîna têngînen ku ji amûrên hilberînê yên bi wate tên e, herwiha derbasbûyîna çêbûna hişê mirovatiyê ye. Bi watekirina helatin û gihîştina dîroka etnîk ya bi vî rengî, rasteqîn û girîng e. BZ di salên 4000an de, bi destpêkirina ajotina cot û pêkhatina şivantiyê, cîhê jinê yê di pêvajoya hilberînê de teng dibe. Çiqa ku diçe jin di malê de tê asêkirin û ev yek bi kûrahî tê heta dema îro. Di vî babetî de, di warê nivîsandin û têngînkirina dîrokê de, jin ji mafê wê û gelekî bi şûn de tê hiştin. Tekûzbûna serdestiya mêr ya bi pêvajoya şaristaniyê re, li der hiştina jinê ya ji saziyên seresazî û binesaziyên civaka biçîn, bingeha nivîsandina pirtûkên dîrokê yên "dîroka bê jin" e. Şewşandineke mezin, bi encama newekheviya di navbera zayendan de, weke dîrokê tê pêşkêşkirin. Bi vê nirxandina kin ya derbareyî etnîkiyê re, em li bersiva vê pîrsê digerin: Konfederasyonên eşîran kengî û li kûderan li hember pêşveçûnên şaristanîtiyê çêbûne û peresîne (tekamûl)? Dîroka Rojhilata Navîn, bi bersiva vê pîrsê ya rasteqînî ve girêdayî ye. Yanê bersiv hê di reşahiye de veşartî ye. Dîsa jî, mimkûn e ku em demên bingehe yên sazûmanên qebîle yên Rojhilata Navîn bikin sê beş.

1- Dema pêşveçûna çandinî û şivantiyê: Tê pejirandin ku li Erebaştan û Afrîka Bakur koma Semîtik ya ziman û çandê, di navbera BZ 9000 û 6000an de, bi belavbûna bandora civaka neolîtîk ya di nava wan de, derketine holê û pêşveçûne. Tê zanîn ku di navbera BZ 10 000 û 6000an de, li gelî û deştên nava çiyayên Toros û Zaxrosan, li navenda cîhê bi navê Heyva Berhemdar, komên afirînerên çandiniya neolîtîk û kedîkirinê, bi navê gelên ji koka Aryen têne nasîn. Dema ku lêkolînên peyvnasî (etîmolojî) bi şûnwarnasî (arkeolojî) re bibine yek, bi mîsogerî tê çespendin ku ev koma gel afirînerê çandinî û kedîkirinê ye. Bi navlêkirina herdu koman em deyndarê sumeriyane.

2- Sazîbûn û derbasbûyina sazûmana eşîrtî: Dema ku civaka neolîtîk di Heyva Berhemdar de, di bin çanda "Tel Khalaf" de rê li ber sazîbûnên payîdar vekirî, tê wateya merhaleya şewegirtina komên eşîran jî. Ev dema ku di navbera 6000 û 4000an de, nêzîkî du hezar salan berdewamkirî, dema "dahênanên bingehîn" e ku şaristanî amade kiriye.

Dema ku Sumer amade kiriye jî, ev dem e. Komên Aryen û Semîtîk di navbera xwe de, li cîhên ku tevahiyeke aborî çêkirin, ji hev cûda dibin, ji rewşa qebîleyên ku dişibine hev derbasî eşîrên cuda dibin. Her çiqas ku hişmendiyê eşîrtî ya bihêz û bîrûbawerî bi wan re çênebûbe jî, bi hebûna xwe ya berbiçav ketine rewşa civakên bi rewîştî etnîkî. Çawa mercên daringî û aborî yê çînçînîbûn û vê dawiyê yê netewîbûnê, roleke diyarker leyistine, mercên daringî, aborî û civakî yê demê jî, civaka etnîk û heyînen eşîrtî diyar kirine, derandine holê.

3- Ji dema şewegirtina şaristanî, ji şiklê çend çînen bingehîn heta bi dema îroyîn: Ev merhaleya ku em dikarin bibêjin, dema berxwedana eşîran û şaristanîbûnê, dikare were nirxandin ku hişmendiyê eşîrtî gelekî pêşvedîçe, şertek ji yê jîyanê ewe ku her kes xwe ji eşîrê dihesibîne û "serdema destanî helbestkî" ye. Liser ax û zozanên ku bi qedir dibin, lihevixistinên di navbera wan de, berxwedana wan ya li hember hêrîşên hêzên şaristaniya pêşveçûyî û hêrîşên wan yê li hember van hêzan, herwiha demeke ku bi şeran derbasdibe, dabaşa xeberdanê ye. Jibo jîyanê dive eşîra we, jibo eşîra we jî dive qebîle û malbata we bi hêz be. Rasteqîniya daringî ku bîrûbaweriya nû bi xwe re anî ev e. Ravekirina "destan û çîrok" yê bi zimanê helbestî ku hê jî di nava hinek civakan de bihêz in, esasê wê demê tîne zimên. Lihevandanên eşîran yê bê dawî, qehremantiya li hember hêrîşên ji derve tîne, berxwedan û hêrîşên li hember, di dîroka her gelî de, cîhekî girîng digirin. Ev dîrok, ligor mercên komên civakên etnîk, tiştêkî ji girîngiya xwe wînda nake, heta bi serdema navîn û serdema nêzîk -serdema qewman û netewan- dexme ya xwe bi giranî li hemû pêvajoyên civakî xistiye. BZ ji salên 4 000an ve, êrîşên bê dawî, him yê lêzimên hev û eşîrên cîranên hev, him jî yê cur bi curên hêzên dewletê, hêza heyînen etnîk ên Rojhilata navîn li ber çavan radixe. Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, rastiya dîrokî a bingehîn ku ev heyînen etnîk, bi hêz kirine û liser lingan hiştine, ev babet in. Her komeke eşîrê neteweyek, xanedanek, bi bîrûbaweriya xwe olek û bi zaravayê xwe mîna xwedî zimanekî ye. Digel lawazbûna şoventiya netewî, bihêzbûna şoventiya eşîrtî -dilînî û bîrûbawerî- jî, çavkaniya xwe ji vê rastiye digire.

Dema ku ji van agahdarbûn û nêzîkayiyên rêbazî ve were nêrîn, gihîştina civaka koledar û çûyina wê ya ber bi sazûmana cîhanê, Rojhilata Navîn ji BZ 2 000an heta bi BZ sedesala 5an derawa (pozîsyon) diyarker dijî û dide jiyandin. Rol ne tenê pêşewatiya (rêberî) damezrandin û sazîbûna şaristaniya Sumer û Misrê ye. Di pêvajoya gihîştinê de, pêşewatî bi mîsogerî di erdnîgariya Rojhilata Navîn de ye.

Berî nirxandina vî babetî, em li pêşveçûnên şaristanî yê dema pêla belavbûna yekem binêrin:

1- Hîtîtiyan: Vê şaristaniyê, piştî ku Sumer li Asya biçûk û li navenda Anatolyayê mêtîngêh pêkanîn, BZ di navbera 1 900an û 1 200an de hikim kiriye. Nimûneka (model) Sumer bingeh digire. Li qasî ku navenda bazirganiyê girîng e, ewqasî jî ji kanên madenan avantajê bi dest dixê. Him bi Babîliyan û Asûriyan re, him jî bi Misriyan re berberiyê (pozberî) dike. BZ di sala 1595an de Babîl dagirkirîye. Dîsa BZ di sala 1243an de bi Misrê re "Peymana Kadeş" şanên kirîye. Di destpêkê de konfederasyonê eşîran e, lê pişt re dibe navendeke koledar. Şaristanîbûna Anatolyayê, bi piranî berhema sazûmana Hîtîtê ye. Komên etnîk yê di nav de, li Bakurêrojhilat Khaldîyan (Kalikên Ermenîyan), li Başûrêrojhilat Hûrriyan (Kalikên Kurdan) Li Başûr û Rojavayê Anatolya jî Lûwiyan bûn. Hersê komên etnîk jî, xwediyên çand û zimanê

Aryen in. Bi hêzbûna Hîtît ji gemerdan (yekdest) bûna kanên madenan tê. Têgihînen parastinê, parastina kanên madenan dike plana pêş. Jiberku pêdiviya Babîl, Misir, Helen, Eyon û konfederasyonê Mîtaniyan bi cewhera madenê hebû, timî bi wan re di nava pozberiyê de ye. Bi taybetî, pêşveçûnên di karê sifir û hesin de ku ji aliyê komên etnîk yê ji koka Ermenî ve pêkhatin, tevkeriyên şaristaniyê yê herî girîng in. Di mîtolojiya Sumer û mîtolojiya komên etnîk yê Aryen de, xwedakî sêbare ku hêzên ezmên, erd û axê temsîl dike heye. Demên pêşî mîtolojiya ku gelek xweda di xwe de dabûn hev, vê dawiyê bi pêşketina qerantiya navendî xweda kêma dibin, Wek mînaka Sumer, bi îfadeya lihevkerinê dadikeve heta bi sêbareyî. Hê ne gihane têgihîna yek xwedayî. Şerê xwedayan hê yê gelekî berdewam bike. Di lihevkerinê de, hê pozîsyona xwedawendê bi hêze. Lêbelê yekemînî ji mêj de wînda kirîye û çîqa diçe girîngiya xwe ji dest dixê. Ji vê re, çanda Xwedawend Kîbele (Kupapa) jî tê gotin.

Di damezrandina Roma de çawa pêdivî bi vê Xwedawendê çebûye, li Erebaştanê têgihîna hêla (aliyê) nimêjê anku "kible" jî, ji girêdana bi vê Xwedawendê ve tê. Çawa şaristaniya Sumer, şaristaniya Hîtîtiyên Anatolya diyar kirîye, şaristaniya Hîtît jî bandor li şaristaniya Eyonya li rojavayê Egeyê û

bi pêwana bajarên Troya yê naserî tengava Çanakelayê, li şaristaniya Grek kiriye. Bi vê wateyê, ji alyê Troya ve yê rola "serdema qehremantiyê" were leyizandin. Rola Troya ya dîrokî û girîngiya wê ji vê yekê tê ku heta BZ 1 000 salan, qereqoleke Hîtîtiyan a pêş bû, deriyê herî girîng ê belavbûna şaristaniya Rojhilata Navîn û di rewşa navanda wê de bû. Çawa Kaneş deriyekî ku şaristaniya Mezopotamya bi gihîne Anatolya be, Troya jî deriyekî ku bi gihîne Balkanan, nîvgirava Grek û Ewrûpa yê ye. "Ûlyada" ya Homeros ku evqasî deng daye, jiberku hinek şerên Troya kirine mijar û şaristanî û dîrok kişandiyê Ewrûpa. Têkçûna Troya yê bibe destpêkeke dîrokî ya nû.

2- Hûrriyan, Gutiyan, Mîtaniyan, Órartûyan û Medan: Mezopotamya jorîn û ya navîn (Bi zimanê Lûwî Gondwana, bi Sumerî Horrît=welatê bilind) ku di navbera êmperetoriya Hîtîta Anatolya û peyhatiya Sumer êmperetoriya Asûr de cîh girtî, bi kanên maden yê dewlemend, bi cîhgirtina stratejîk ya di navbera rojhilat û rojava de, bi xwedîbûna erdeke jibo çandinî û ajaldariyê û awhewake jibo avdanê bikêrhatî, rola "dayika zayinê" ya dîrokê û dergûşa mezinkirinê dilîze. Bi vê taybetiya xwe di heman demê de, ji çar aliyan ve timî hatiye dagirkirin û talan bûye. Her çiqas ku bingeha zayîna şaristaniyê ye jî, ji ber van taybetiyan ne bûye xwedî sazî û heyînên navendî. Ji herêma tampon ya derbasî xilas nabe. Halbûkî heta îro, ti şaristanî tinene ku xwe pê xweyî nekirine. Ev taybetiya wê, sedema vê yekê rave dike ku di roja me de, nikare zimanê xwe li qasî ajalan jî bi azadî bi kar bîne.

Heyînên etnîk yê li vê herêmê, ji BZ 6000an têne zanîn. Navendên şoreşa çandinî, li cîhên di navbera çiyayên ku Dicle û Ferad ji wan derdikevin û deştên ku di herikina wan de, derketine holê. Bi sedan girikên ku hatine kolanê ve yekê diçespînin. Bi kolanên şûwarnasî û peyvnasî hatiye rastkirin ku bingeha zimanê êndo-Ewropî jî, li van navendên şoreşa çandiniyê hatiye avakirin. Dema ku pêşveçûna van navendan bi taybetiyên cîhên bingehîn re dibine yek, bi vê rewşê sazûmana qebîle û eşîran bi awayekî gewre bi hêz dibin. Ev taybetiyên binyatên etnîk ji alyê hêzên şaristanî yê derdor ve ku navendî bûne, tên vegirtin û dagirkirin, herwiha bi hêsanî fersendê nadin ku bibe navendeke şaristanî.

Di bin ronahiya van nêzîkbûna de, tê fêhmkirin ku eşîrên bi navê Hûrrî û nêzîkên wan, BZ di navbera 2000 û 1500an de, konfederasyonêkî pêkanîne lêbelê weke hîtîtiyan navendî nebûne û ewqasî pêşveçûne. Hûrriyan timî bi Hîtîtiyan, Lûwî û Khaldiyan re, têkilî danîne. Bandorên Sumer, Babil û Asûr bi rêya bazirganiyê kişandine Bakur û Rojhilat. Jiberku cîranên şaristaniya Sumer in û xwediyê neolîtîkê ne, lêzimên (eqrebe, nêzîk) Sumeriyan e. Di warê binyata zimên û gelek peyvên de hevpar in. Ev tê pejiwandin ku hê di damezrandina Sumer de, ev hevparî bi pêşveçûyê. Bi awayekî din were gotin, herêmên bajar yê Sumer û herêmên çandinî yê Hûrrî, di nava hevgerîneke (pevratî) xwezayî de ne. Ev yek, di mîtolojiya Xwedawend ênanna û di Destana Gilgamêş de, bi awayekî tund tê dîtîn. Anku Şaristaniya navendî ya Hûrriyan cureyekî (texlît) Sumer e. Pêdivî nabîne ku navendeke cuda damezrîne. Lewre di bin guhê wan de navendeke wisa heye û pêdivî nabîne ku ew jî yekê çêbike. Ev têgihîn heta weke dema îro jî berdewam dike. Rola wê ku dileyîze, şeweya xwaserî (otonomî), eyalet û federeyêke hêzên siyasî yê di bin guhên xwe de ye. Êro rasteqîniya di vî babetê de ku li vê herêmê li ber çavan e, ji bingeha destpêka dîrokê tê.

Gûtiyan, komeke etnîk ya ji koka Aryen e ku li rojhilatî Sumer, li pesarên Zaxrosan dijîn. Dema ku dewlet-bajarên Sumer du serî bûn, alîgiriya aliyekî ji wan dikin. Di hilweşîna Xanedaniya Akad ya Semîtîk de, rola hevkarîya hinek ji van dewlet-bajar û gutiyan rola bingehîn listine. Dîrok yê heta weke roja îro jî, bibe şahidê hevkarîyên bi vî rengî. Wateya peyva Gûtî (Gût=Ga) îro jî di Kurdî de ga ye û tê wateya "Gelê xwedî Ga". Binyateke zimanê Sumer wiha heye ku timî peyvên bi têgînî dikin. Xanedanê Gûtî, BZ di navbera 2250 û 2150an de, xanedaniyêke sed salî damezrandiyê. Vê xanedaniyê, liser axa Sumer hikmê xwe kiriye. Vê dawiyê, hinek rêvebirên dewlet-bajarên Sumer û Amorîtên ji koka Semîtîk (Amorît di zimanê Sumer de, tê wateya rojavayî) Xanedaniya Gûtiyan hildiwêşînin. Kassîtan, kedkarên bejik yê hejar in ku ji bakur û rojhilat, ji herêmên çiyayî hatine bajarên Sumer û dijîn. Carcaran hêzên xwe didin hev û di guhertina xanedanan de, rola xwe dileyîzin. BZ di sala 1595an de, dema ku Mîtaniyan û Hîtîtiyan Babil dagirkirin, Kassîtan jî di vê dagirkirinê de, rol listine. Di warê burokrasî û çandê de rêbazeke ligor xwe afirandine. Em dibine şahid ku Barmekiyên di êmperetoriya Ebasiyan de û dema êmperetoriya Selçûkiyan wezaretê Nîzam-ul Mulk ev rêçik şopandine. Ev cureya burokrasiyê, heta bi Kassîtan diçe.

Konfederasyona Mîtaniyan, piştî ya Hûrriyan hatiye damezrandin û hê bi hêztir e. Ligor tabletên ku ji cîhderka çemê Xabûrê derketine, bajarekî li vî cihî bi navê "Wajûkanî" navenda vê konfederasyonê ye. Zimanê Hûrrî diaxivin, bi giranî li Mezopotamya navîn, li herêmên Riha, Mêrdîn û Şernexê hikim dikin. BZ di navbera 1500 û 1250an de jiyiyane. Hesin di gemerdana xwe

de girtine. Bi xwedîkirin û gihînêriya hespan, bi nav û deng in. Bi Asûrî û Hîtîtiyan re timî di nava şerekî giran de ne. Cara dawî ji aliyê êmparatorê Asûr Salmanassar ve tên hilweşandin.

órartû (Bi Sumerî: Welatê cihên bilind) perçeyek ji şaristaniyê yê girîng e ku li peravê Gola Wanê bi navendî bûne. Bi binyata xwe bi komên Khaldî û Hûrriyan ve girêdayîne. Tê fêhmkirin ku Khaldiyan bêhtir giraniya xwe danîne. êhtîmaleke gelek mezin e ku Khaldî kalikên Ermeniyane. Hê bêhtir li bakurê vê dewletê dijîn. Bi sedan ji eşîrên Hûrrît tên, pêşî federasyoneke sisit pêktînin û duv re, dewleteke navendî avadikin. BZ di navbera 1 000 û 700an de jiyîne. Jiberku xwediyê kanên madanan, navendên gihêneriya hespan û xwedî keresteyên daristana ne, li rastî êrîşên Asûriyan yê erjeng hatine. Vê demê, qeranên Asûr bi teknolojiya xwe ya şer, bêhnê nadine ti gelan. Hêrîşên wan yê li hember Khaldiyan ku li dij wan hêzeke bi tenê, xweş tê fêhmkirin. Khaldiyan di dîrokê de yekem car coya avdanê ya herî dirêj (56 km) û bendav çêkirine. Zimanê giregirên wê tevlihev e. Metnên pîrozwer yê Sumer li dibistanên wan tene xwendin. Asûrî weke zimanekî dewletê tê bikaranîn. Weke her der, li vir jî, giraniya şaristaniya Sumer xwe di warê ziman û çandê de nîşan dide. Zimanên eşîran cuda ne û di warê nivîsê de nayêne bikaranîn. Ev mijar jî rastiyeke herêmê ye ku heta dema îro berdewam dike. Rêvebirên serdest û hevkarên wan, barkêşên ziman û çanda serdest in lê barkêşên ziman û çanda cîgehî jî eşîr in.

Piştî órartûyan bi hindikî, vê carê li rojhilat federasyona eşîran Med ku wek berdewamiya Gûtiyan û bi Babîl re di nava yekîtiyê de, BZ di sala 625an de êmpiretoriya Asûr têkdibe. Babîl careke din û wek cara dawî serdestiyê bi dest dixwe. Federasyona Med ya sist, jibo xanedaniya Akhamenît ya ji koka Aryen-Pers ku pêşve diçe, rola derbasbûyîne dilîze. Xwarziyê Astiyag ê qeranê Med Kîros, derbeyekê li serayê dike û desthilatiya siyasî dikeve destê arîstokrasiya Pers û BZ di sala 550an de bi damezrandina êmpiretoriya Pers bi dawî dibe.

3- Li Rojhilata Derya Spî şaristanîbûn, herêma ku di bandora sazûmanên yekbûyî yê Sumer û Misrê de herî zû jiyayî Rojhilatê Derya Spî: Li vir bingeha mezolîtîk û neolîtîk bi hêz e. Li rojavayê Heyva Berhemdar cih digire. Ji BZ 4000 salan ve li vî cihî siftbûna qebileyên Semîtîk tê xuyakirin. Daristanên sedar (serwîzad) yê Libnanê, him jibo Misrê him jî jibo sumeriyên, herî pêdiviyên çavkaniya dewlemendiyê ne. Li sêgoşeya Misir, Anatolya û Girîtê ragihandina (çûnûhatin) deryayî tê kirin. Evder xwedî axeke çandinî ya biber e. Jiberku li sêgoşeya Anatolya, Misir û Mezopotamya cih digire, rewşa wê bikêrhatî bazirganiya bejî û deryayî ye. Fenîke weke çîna bazîrganan berendema pêşveçûnê ye. Mercên ku şaristaniya dîrokî ya Fenîke derandî holê ev in. Navê wê yê giştî welatê Kenan e. Binyata şaristaniya Fenîke, ji mêtîngeha Kaneş ya li Anatolya û yê mîna wê, mêtîngehên Bîblos, Tyr, li herî bakur Ugarît in. Mêtîngehên li vir, ji komên etnîk yê tevlihev derdikevine holê. Weke ku li Libnana îroyîn tê dîtin, ji serî de li vir çandeke kozmopolît serdest e. Lêbelê di berbiçaviya Fenîke de, resenîbûnek jî çêdibe. Bi gelemperî di warê bazirganiyê de, bi taybetî di bazirganiya Derya Spî de, mîna qewmekî bêtirs û jêhatî ne. BZ di serê salên 2000an de, xwedî dewlet- bajarên xwe ne. Ev dewlet-bajarên ku bi sûran dorpêçkirî, bi giranî di bazirganiyê de, duyemîn di pişekarî de, bi taybetî di xeratiyê de pêşveçûne. Keştivaniya Fenîke binav û deng e. Hê di merhaleya damezrandinê de, li peravên Derya Spî, li gelek deran mêtîngeh ji xwe re çêkirine. Tevkariya wan ya herî girîng ku li dîrokê kirin, Alfabe ya Fenîke ye. Gelek alfabayên dema me, bingeha xwe ji vê alfabayê girtine. Digel hîkarîkirina mîtolojiya Sumer, bi awayekî balkêş resene bûne. Xwedayê wan ya herî mezin El e (Allah ji vira tê). Di bin vî xwedayî re, Xwedayê Hêzê Baal û Xwedayê mirinê Mood tên. Bi navnasiya (pênasî) eştar, Astarte dijî. Bi sifî qurbankirina zarokan tê dîtin. Efsaneyê Hz. Brahmî ku Smayîl qurban kirî, bi vê kevneşopiyê ve girêdayî ye.

Çanda Fenîke, piştî Misir û Sumeriyên timî bi xunaftina çandên Grek, Roma Bîzans û êslamê, resene bûye û heta dema îro bandora xwe domandiye. Laîqtiya çanda Libnan, bingeha xwe ji van taybetiyên şaristaniya Fenîke werdigire. Di dîrokê de, li qasî ku di damezrandina şaristaniyên Kartaca û Girîtê de xwedî roleke mezin e, yê ku çanda Grek herî xweyîkirine dîsa Fenîkeyî ne. Di ragihandina mîtolojiya Rojhilata Navîn û alfabayê yê heta bi Grek, dîsa Fenîkeyî rola mezin listine. Li Rojhilatê Derya Spî li herêmên navîn, bi navê bajarên weke Quds, Şam û Helebê, rêzek bajarên din tene çêkirin. Ev bajarên ku liser bazirganiyê, Di navbera Mezopotamya û Derya Spî, Anatolya û nivgirava Erebiyan de, weke navendên bazirganiyê bilind dibin, derdorên wan jî, ji çandiniyê re gelekî bikêrhatî ne. Cihê vê şaristaniyê, bûye şahidê gelek rêwingîtiyên dîrokî. Mîna navendên ragihandin û xunaftina çandan jî, xwedî rewşeke diyar in. Bi giranî zimanê qebileyên Semîtîk ên Rojava li vir serdest e. Bi saya van mercên bikêrhatîbûnê, ev rewşa pir çandî naskiriye. BZ di salên 1500an de, weke li tevayî Rojhilata Navîn, li vira jî hereketên şaristanîbûnê, bi şeweya dewlet-bajaran, di pileya herî bilind de ye. Ji ber sedema erdnîgariya wan, Babîl, Asûr, Misir û Hîtîtiyan

serdestiyeke bi temamî li wan nekirine. Hinekî jî bi saya dîplomasiyê, di nava sêbareya navendî de leyîstine û serxwebûna xwe berdewam kirine. Çi qebîleya ku ketiye nava tengasiyan, ji aliyê serokên wê ve, ji ber van taybetiyan bi vir ve hatiye kişandin. Di nava pîvanên diyar de, resenî û serxwebûna xwe parastine.

Qebîleyek ji wan yê ku di dîrokê de wê roleke mezin bilize û ji ber tengasiyan, bi pêşevaniya Hz Brahîm xwe li vê herêmê girtî, qebîleya ëbranî ye. Ligor lêkolînên ku hatine kirin, koka ëbraniyan digihe órfa (ór=gir) û Harran (Bi Sumerî=Devê xaçerêyê) ku metingehên Sumer bûn, ev qebîle ji wira hatiye vî cîhî. Di van mêtîngehan de bandora Hûrrît û Amorîtan bi hev re xûya dike. Di çanda ëbraniyan de jî taybetiyên van xwe nîşan didin. Bi texmînî BZ di salên 1800an de, di dema qeranê Babil Hammûrabî de ev serpêhatî çêbûye, dibe ku berjewendiyên vê qebîleyê bi yê qeranê bajêr Nemrud re lihevnekiribe û barkiribin. Ji ber çewsandineke zêde ya li navenda van bajaran û cîhgirtina van bajaran ya liser rêyên bazirganî, tevger û barkirinên qebîleyan yên bi vî rengî bi zêdeyî tîn dîtî. Liser vê demê, ligor belgeyên ôgarît, weke koçberiya Hz. Brahîm ya ji bakur ber bi başur ve, gelek qebîleyên bazirgan tevgerên bi vî rengî dikin. Ev qebîleyên bazirgan ku nîvşivan bi koçberî û koçdanîne, di nava liveke sift de ne. êhtimal e ku Hz Brahîm, di bandora çanda bajarê ór ya Sumer de mabe, binyata wan ya pir Xwedayî naskiribe, lêbelê weke serokê qebîleyeke bavkanî totemê xwe bîngê girtibe, tiştên ku ji olên demê yên serdest û çanda xwedê girtibin bi baweriya xwe re kiribe yek û gihabe têtîna Xwedayekî qebîleyê bi tenê.

Ev di warê olî de, şoreşgeriyeke Hz Brahîm e ku totemê xwe hildaye qatê xwedê û bi azadiya qebîleya xwe re, wergerandiye yek xwedayî, derûniya vê wergerandinê jî nîşan dide. Ji sazûmaniya Sumer, bi vebizaviyê (reaksiyon) qut bûye. Jixwe gelek qebîleyên Amorît vê vebizaviyê timî dijîn, ligel vê yekê totemê qebîleyê yê kevin û hoveber, nikare bersivê bide pêdiviya olî. Derbasbûyina ji vê nimûnekê (model) pêdivî ye. Ev herdu mercên dîrokî, bîngê ola Brahîm in. Ev weke pêngaveke piçûk û ne girîng tê dîtî, lêbelê ji hêla dîrokê ve, rola "şoreşa bîrdoziyî" ya herî mezin listiye. Di hersê pirtûkên pîroz de (Tewrat, êncîl, Quran) ne belaş e ku gotine pêxember û kalkê damezrênerê olê yek xwedayî. Olên pir xweda, ligor merhaleya şaristaniyê ya pêşveçûyî, êdî sêwiran û nasnameyên li paşmayî ne. Ev şoreşa bîrdoziyî bersivê dide hişmendî û mentiqê mirovan yên pêşveçûyî û xizmetê ji yekîtiya siyasî re dike.

Di kevneşopiya Hz Brahîm de weke ku tê dîtî, devjêberdana (jêqerîn) wî ya ku lawê xwe qurban bike jî, sepandineke şoreşgerî ye. Di baweriya Fenîke de, qurbankirina zarokan jîbo Xweda Baal îbadeteke olî ya bizêdeyî ye. Bi vê yekê encex pêşî li neqencî û neyîniyan digirin. Li dijderketina vê îbadeta ku gelekî zêde û mecbûrî bû, di mercên wê demê de, şoreşeke olî ya bêhempa ye. Pêş lêgirtina qurbankirina zarokan, ne bûyereke wisa piçûk û ketûber e, ev li dij derketina fanatîzma hoveber ya olî, weke livbaziyeke şiyarbûna wijdanê mirovatiyê, nîrxekî mezin îfade dike. Ev li hember vê hoveberiyê, livbaziyeke ku gelekî bi wate ye. Wisa tê fêhmkirin ku Hz Brahîm ne tenê bi pêşêxistina van her du şoreşan anku li dij pûtperestiya hoveber û merasimên qurbankirina zarokan derketiye. El Kenan weke (dibe ku ev el ji xweda El hatibe) Xwedayê Ezmên El dipejirîne. Lêbelê vê yekê bi serokatiya qebîleya xwe re ahengdar dike.

Merhaleya herî girîng ya şoreşa ola yek xweda ev e ku El bû "Allah"ê temamê nivgirava Erebaştanê û kevneşopiya qebîleyên şivanên çolê şikand, kir ku dev ji totemên xwe berdan û ew jî ketin pêvajoya olê yek xweda. Lê ev yek, di pêvajoyeke gelek dirêj û ne hêsan de pêk hat. Mûsa jî El mîna xwedayekî dipejirîne, lê ew berî hemû teşî xwedayê qebîleya ëbranî ye. Ev mijar, di Pirtûka Pîroz de wiha derbas dibe: "Min hûn bi xwe re zewicandin û ji hemû mirovan bilindtir girtin." Ev darazeke (hikim) gelekî girîng e û di çêbûna reseniya gelê Cihû de ku heta îro bûye kevneşopiyek, rola xwe dileyîze. Ji xwe navê xwedê jî diguherin, vê yekê jî Mûsa dike. Xwedayê ku pêşî navê wî "Elohîm", vê dawiyê dikine "Yahweh" (navê Yahûdî -Cihû- ji vir tê.) Wateya peyva ësrail jî "Yê bi El re afra (gulaş) digire" ye, anku qebîleya ëbranî li qasî xwedê bi hêz e û li xwedê çerax e (can cîger e) ku dikare pê re afra bigire.

Ev guherînên ku Hz Brahîm li warê Kenan pêkanîne, di Pirtûka Pîroz de, weke peyva xwedê tê danîn. Tê dîtî ku qebîle mezin dibe -dema ku ji Misrê derdikevin, 72 qebîle ne- û çîqa ku diçe bi hêz dibe. Dema ku hijmara wan zêde dibe, tîn rewşa mîrîtiyê. Ji nakokiyên di navbera qebîleyên cîgehî de û yên dewlet-bajaran de, sûd werdigirin. Carna bi wan re dikevîne nav nakokiyan. Hê di serî de, pozberiyekê weke ya Ereb û ësrail ya îro dijîn. Ev nelihêvkirin û pozberî di heman rewîştê de, berdewam dike. Him jî li heman cîhî, li derdora Qudsê.

Ev gelekî girîng e ku rewşa qebîleyên ëbranî yên dema Hz Brahîm û têtikiliyên vê rewşê bi pêvajoya wan ku ji Misrê derketin re, bi kûrahî were nîrxandin. Ev gelekî balkêş û hînker e, koçberiya ku di dema Brahîm de ranewestiyaye û heta bi Misrê çûye, di pirtûkên olî de mîna gotinên xwedê tîn

ravekirin. Çawa qebîleyên hejar yên aryan, di bin navê Kassîtan (bi Sumerî Kassît tê wateya hejar) de, di heman demê de li bajarên herêma dewlemend ya şaristaniya Sumer, niştecih dibin, ber bi nava Misrê jî niştecihbûnên wiha pêktên. Gelek qebîleyên çolê yên hejar diherikin Misrê. Weke di roja îroyîn de ku ji herderî koçberî Amrîka û Ewropayê dibin. Gelê Misrê van koçberiyên wek Apîrû (mirovê çolê yê bi toz) bi nav dike. Peyva ëbranî jî ji vê gotina Apîrû derketiye. Dema ku Qebîle ji Riha, ji Harranê derdikeve, navekî wê yê wiha tine. Li Misrê di nava hejariyê de ne, lê xwedî nîvazadiyekê ne. Di nava wan de bisînor be jî, weke Yûsif hinek di nav burokasiyê de cîh dibînin. Çîroka Yûsif, şeweyeke wisa ye ku bilindbûna wî ya di nava burokasiya Misrê de, weke gotinên xwedê yên pîroz tene nîşandan. Mînakeke weke vê em di çîroka Sargonê Akadî de, bi awayekî mîtolojîk û bi raveyê resene, dibînin. Wisa tê fêhmîkirin û ev yek ji kûrahiya dîrokê tê ku ji qebîleyên bê nav û deng, xanedan yan jî revebirê dewletan bi çîrokên wiha anîne ser kar.

Pêvajoya Misrê, jibo ëbraniyan sêsed salan berdewam dike.

Ûhtimala mezin ya koçberiya wan a nû ev e ku di serhildaneke nav Misrê de dibine alîgir, Mûsa (Di zimanê Misrê de Mos tê wateya lawik) yê ku mîna Yûsif di burokasiyê de cîh girtî, tevî vê nelihvîkirinê dibe û rewşa wî dikeve nav xeteriyê, wekî din xisimtiya Mûsa ya bi ëbraniyan re ye. Hînbûna van qebîleyên çolê ya jiyana azad jî, di vê koçberiyê de roleke mezin dileyize. Mercên kû ew ji wira derandine ev in ku ewlekariya wan li cem Fîrawûnê (Jibo Brahîm navê Nemrûd çibe, jibo Mûsa jî navê Fîrawûn ew e, tê wateya qeran) Misrê namîne û bêriya jiyana xwe azad ya qebîletiyê dikin. Bi texmînî di vê koçberiya ku BZ di salên 1300an de çêbûyî, hijmara wan nêzîkî 25 000 kesan ne. Dabeşî 72 qebîleyan bûne. Bi Ûhtimaleke mezin, qebîleya Brahîm ji çend sed kesan derbas nabe. Ji vê qebîleyê eşîrek an jî qewmekî mezin derketiye holê. Hicret a ku mijara Tewratê ya sereke ye (Ligor kevneşopiya olî navê van koçberiyê wiha Xurûc yan jî Hîcret e) di nava dîrokê de şopên gelekî bihêz hiştine. Ev meşa yekem ku di dîrokê de weke "Meşa azadiyê ya dirêj" tê nîrxandin û çil salî berdewam kir, gelekî bi zor û zehmetiyên dibore. Dema ku di çola Sînayê re diborin, bi qebîleyên cîgehî re him şer dikin û him jî tekiliyan çêdikin.

Dema ku Mûsa li Misrê bû, di bandora rahîbekî di baweriyaya xwedayê rojê "Aton" ku bi zorê hatibû fermîkirin de, dimîne. Bi rê de, li herêma Mîdyan (Medyan) ku li rojhilatî Derya Sor dimîne, di bandora rahîbê hîkarîker Yetro de jî dimîne. Hz Brahîm, bi pîrsgirêkên rêvebirî ku bi siftî dijî û bi bandora van baweriyên ku nas dike, di warê baweriyaya xwe de cara duyem pêşveçûneke mûcîzewî (behitdar) pêktîne. Ji xwe ev mûcîze, weke çareseriyên derketina vê pêvajoyê wateyê digirin. Jiberku ligor rê û rêbazên berê û têngîhînan bi şûn ve, çareseriyaya pîrsgirêkan nabîne, pêdiviya wî bi têngîhînan û sepînên nû çêdibe. Gotina mûcîze, navê van têngîhînan û sepînên nû ne. Guherînên hîkarîker yên di warê hişmendî de ku bi hêsanî nayên xûnifandin, bi peyva mûcîze tê biwatekirin. Di dîrokê de, gelek pêvajoyên bi vî şeweyî hatine jiyandin, ev tiştêkî tê zanîna ku xwestine bi van têngîhînan, wateyekê bidin livbaziyên pêxemberî.

Pîrsgirêka di pêvajoya derketina Mûsa de, gelekî dijwar e û bi nediyariyan tije ye. Rêvebiriya ligor çend qebîleyên piçûk yên kevin, bersivê nade mercên nû, rêvebiriya 72 qebîleyên di nava serhildanê de ku gihane merhaleya qewmîtiyê, jibo wî gelekî zor û zehmet e. Tenê di warê debariyê de, hero li bizavên gelek malbatan rast tê. Hewldanên qebîleyan yên serdestbûnê, qet kêman nabin. Mercên koçberiyê wan dixê nav xeteriyên, erdên ku li ser re diborin, jiberku ne yên wan e, bi binkiyên (niştecih) wira re ketine nava pozberiyên û gelek caran xwîn rijîya ye. Êbadeta ji pûtan re, li hawîr serdest e û gelek ji qebîleyên wan jî, tevî van merasiman dibin. Ji ber "Êbadetvanên Golika Zêrîn", Mûsa mecbûr dimîne ku wan bi mirinê ceza bike. Ne mimkûne ku bi konfederasyoneke eşîran ya ketûber, ji bin barê pêvajoyê derkeve. Pêdivî bi pêguherîn an jî şoreşa bîrdoziyî, mirûz (moral) û rêvebiriyeke kûr heye. Di her roj û her gavê de, ev pêdivî xwe nîşan dide.

Mûsayê ku di bin van pîrsgirêkan de tengijî, mîna ku di hemû livbaziyên pêxemberî de xuya dike, xwe dikişîne xwezayê û şikeftan, dikeve silûk (înzîwa) û sift dibe. Kevneşopiya Şamanîzmê, di warê civakîbûnê de, merhaleyeke civakî ya bi gelemperiyê. Şêxîtiya li Erebaştanê, şeweyekî şamanîzmê ye ku li herêma hatiye pêkanîn. Lêbelê saziya pêxemberiyê ji saziya şêxîtiyê bilindtir e. Peywira kevneşopiya şêxîtiyê ev e ku gerdîşa (tore) serdest bidine xûnifandin, serwer bikin û herwiha sazûmana qebîleyê bidine meşandin. Şêx kevneşopiyê dide meşandin. Rola wî nêzîkî şamanîzmê ye. Ne tenê kevneşopiyên olî, gerdîşê bi tevayî û bi taybetî mercên jiyane yên dargî, bi hostayî dide fêrkirin û birêvedibe. Pêxemberî ji van gelekî cuda ye. Pêxemberî derketineke nû û utopya pêşerojê ye. Armanca wî ku ji rojborî (raborî) derbas bibe û red bike û peywira wî ev e ku pêşerojê bipilan û têngînan nû damezrîne. Pêxember nabin rahîb jî. Rahîb hê bêhtir berpirsiyarin ku kevneşopiya olekî niştecih temsîl bikin. Lê peywira pêxember ew e ku ji vî olî derbas bibin û yê nû damezirînin.

Herçiqas ku emê di beşên pêş de, têtînen xwedê bi berfirehî binirxînin jî, em dikarin bibêjin ku nasnameya xwedê jî gelek veguherîn derbas kirine. Têgîna Brahîm ya "Xwedê" gelek cuda ye û nûjenî bi xwe re anîne. Li hember van mercên demê yê berbiçav, Mûsa ne weke emîrekî (mîr) Misrê dimîne, ne jî dibe şêx an rahîb. Hemû tişt zora derketineke pêxemberî lê dike. Kevneşopiya Brahîm ku bi qebîleyan re mayî, Zor li Mûsa kiriye ku bingeha ola "Mûsewî" ya di dîroka olên yek xweda de herî mezin, dayne.

Xweda bi navekî resen "Yehova" (Wateya wî ew e) ye. Pêdiviya rêvebiriyêke tund û hişk, ji devê Yehova bi awayekî dexesî (çavnebarî) wiha tê ziman: "Min hûn bi xwe re zewicandin, hûn nikarin bigihine xwedayekî din." Em dikarin vê resenîbûnê, di rastiya cihû de weke netewîbûna ol binirxînin. Jiberku ne helin û timî bi xeteriyên re rû bi rû ne, ev yek bingeha têtîhîniya cihûyan ya ola qewmî ye. Bi wehîyên navdar ku ji çiyê wergirtin, bi "10 Ferman"an re, pêvajoya nû di dawîya koçberiyê de, hinekî din şêwe digire. Di vê pêvajoyê de Mûsa, gelek tedbîrên hiqûqî, darayî û rêxistinî digire. Nûnertiya ola nû, pêşewatiya bîrdoziyî û darayî dide birayê xwe Harûn. Jibo karên hiqûqê, lijneyekê pêktîne. Yeşû yê bi nav û deng dike fermandarê leşkerî. Ji serokên qebîleyan meclîseke şewirmend liser kar e. Hinek lidijderketinan bi awayekî hişk ceza dike û dukuje. Di nava pozberiyên de, digihe nêzikî Qudsê. Ev derketin bi texmînî 40 salî berdewam dike. Li vê axa biber ku Yehova ji wan re newîn (belên, wad) dayî, gelên cîwarbûyî (niştecîh) hene, pejiwandina mêtîvanên nû bi xweşî û bi awayekî hêsan zor e. Hinek xizimên wan yê ji koka êbranî ku ji kevin ve li wir bûn, bikêrî tiştêkî nayên. Bikaranîna darê zorê yê encamê diyar bike. Eynî weke roja îro, pîrozwerî û naletî di nava hev de ye. Berî ku Mûsa li vê axa pîroz ku fermana xwedê ye, cîwar bibe, ji hêz dikeve, yekî tenê bi xwe re dibe û li çiyayê "Nebo" li benda mirina xwe dimîne. Dema ku Tewrat vê yekê bi awayekî hîkarîker rave dike, bingeha peyvnasî (termînolojî) û şeweya olên yek xwede dideyne. Dibe ku rastî ji hev cuda pêşveçûbin, lêbelê dîrok, girîngî û encamên vê derketinê bi bandor in, gelek pêşveçûnan bi xwe re tîne.

Merhaleyên meşa êbraniyan ya piştî vîna, bi efsaneyan re hatiye ravekirin. Heta BZ salên 1000an, pêvajoyêke bi navê Dema Serweran (pêşewa) tê jiyandin. Bi Saûl re, ji rahîbtîyê derbasbûyîna qerantîyê destpêdike. Anku piştî jiyaneke olî ya duvdirêj derbasî sazîbûna siyasî dibin. Dema Dawûd û Silêman dema qehremaniyê ye. Bi hêrişên asûriyan, qerantîya Qudsê zêde nadomîne. BZ di sedsala 7an de Asûrî û BZ di sala 585an de jî Babîlî Qudsê xera dikin û dawiyê li siyasîbûna wan tînin. Gelekan ji wan koçberî Babîl dikin. Di pêvajoya Babîl de, mîtolojiya sûmer gelekî dixûnîfîn. Qisimek rewşenbîr û nivîskarên nû derdikevine holê. Êdî bi pêxemberan re, perwerdeyî û rêvebirina nivîskaran giraniya xwe nîşan dide. BZ di sala 538an de, dema ku êmparatorê Persê Kîros, Babîlê distîne ew jî digihin azadiya xwe. Careke din vedigerin Qudsê. Qudsê ji nûve ava dikin. Bi Skenderê Mezin re, dema Helen destpêdike. Cihû li Skenderiyê têtîkîlî Grekî dibin, nîşekî Grekî digihîje. Herwiha bi du çavkaniyan, bi Babîl û Grek -Divê bandora Pers û Zerdest jî were biservekirin- xwe xweyî dikin û "Ahîd a Kevin" bi şeweya îroyîn derdixin holê.

Di pêvajoya dagiriya Helen de, dabeşî çend mezheban dibin: Sadûkiyan (Dost) kevneperest û patexwer in. Ferîsiyan (Di bandora Farisan de ne) tundra (radîkal) in. Makabiyan (serhildêr). Bi dagirkirina Roma y BZ di sala 63an de, lihevda û serhildanên wan naqedin. Berbêj (kahîn) ên patexwerên Roma nikarin pêşiyê li pêvajoyê bigirin û ji kontrola wan derdikeve. Tevgera Esseniyan yê hejar, û Yahyayê waîzvan û tehfîlker (waftîz), nûnerên dema nû ne. Mercên dargî yê olekî mirovatiyê, bi awayekî lezgînî li dij koledariya Roma digihîje. Zimanê cihûyan yê fermî û yê berbêjanî neteweperest, bersivê nade rewşê. Propaganda ya Yahya rê li ber êsa (Mesîh=rizgarker) vedike, lê ev dibe serbira wî. Êsa, li carmixê tê dayin û PZ (Piştî Zayînê) di sala 70an de, Roma dîsa Qudsê dagir dike û cihûyan li hawîrê cîhanê belav dike, ev yek dibe sedema serdemêke dîrokê ya nû. Sedema çîroka êbraniyan ku evqasî dirêj bû, ji ber têtîhîştina û terîfkirina çêbûna olên yek xweda û rola wan ya di şaristaniyên koledar de ye. Di van beşên ku tên de, yê were dîtin ku ji aliyekî ve klasîkên mezin, "nûsazî"ya ku bi felsefê destpêkir, ji aliyê din ve bi pêşewaniya pêxemberan, serhildanên olî û tevgerên nûsazî, yê zorê bikin ku koletiyê di sazîbûna bîrdoziyî û siyasî de veguherînin.

4- Şaristaniya Girîtê: Tê dîtin ku li girava Girîtê, BZ di salên 2000an de, şaristaniyêke ku bilezgînî resene dibe, şêwe digire. Têkiliyên vê şaristaniyê bi Misir û Fenîke re xurt in. Şaristaniya vir, di rewşa çavkaniyêke sêyemîn de ye ku nîvgirava Grek xweyî dike. Di kûzikkeriyê de gelekî pêşketiyê û difiroşe derve. Sazûmanêke serayê ya bi şeml damezrandîye. Di warê mîtolojiyê de, hê di rewşa destpêkê de ye. Zeus û Demeter li ber zayînê ne. Xwedî nivîseke hoveber in ku dişibe nivîsa Fenîke. Bêhtir bi Misrê ve girêdayî ye. BZ di salên 1500an de, ji aliyê Şaristaniya Mîken ya Grek ve tê dagirkirin, di nava çend sedsalan de serxwebûna xwe wînda dike. Ji aliyê şaristaniya

Rojhilata Navîn ve, wê demê şaristaniya Girîtê, dawîya cîhanê û xala şaristaniyê ya herî li rojava ye. Dor digiha afirandina şaristaniya Girîtê. Ev zayîn jî, ji çar aliyan ve bi şaristaniyên Fenîke, Misir, Anatolya (Troya, Hîtît, Frîgya, Lîdyâ) û Girîtê ku bûne sîsika şaristaniya Ewrûpa, yê pêk were. Di mîtolojiya Girîtê de, zayînên xwedayan bi taybetî zayînên Zews cur bi cur û tevlihev in. Em bi zayîneke mîna Hurmiza Heft Mêr re rû bi rû ne. Digel hemû hewldanên resenekirinê jî, digel ji anya Zews, ji çîm (paq) ên wî û ji her deverên wî, xwedayekî ku cudahiyeke temsîl dike were afirandin jî, ev tiştêkî diyar e ku şaristaniya Rojhilata Navîn, ji çar aliyan ve kişandine vira. Bi ronîkirina meseleya "Ewrûpa çawa helat û deyndarê kê ye?" re, di beşa têkildar de, liser şaristaniya Grek, rawestandineke dorfireh pêwîst e.

5- Şaristaniya Sumer û Misrê: BZ di salên 2000an de, di nava veguherîneke mezin de ne. Dema zayîn û sazîbûna bi şeml li paş mane. BZ di salên 2050 û 1950an de, Sumerî bi Xanedaniya òr ya dawî, piştî restorasyoneke demeke kin hêdî hêdî ji qada dîrokê bi dûr dikevin. Di derbarê van rastiyan de, nivîskarên Sumer ku vê yekê bi kûrahî his dikin, gelek giryanok (zêmer), awaz û destan nivîsîne. Ravekirina vê şaristaniya ku dîrok derandiye holê, bi vî şêweyî gelekî hîkarîker e. Hatiye çespendin ku çavkaniya hemû dram, tragedya û komedyaya ev nivîsên sumerîyan e. Hatiye çespendin ku çavkaniya sereke ya olên yek xweda û mîtolojiyên ku nûka çêbûne, dîsa li cem sumerîyan e. Hemû saziyên siyasî jî, li nav Sumer derketine holê û ji vira li hemû derên cîhanê belav bûne. Sumer çavkaniya hemû amûr û zanînen binesaziye, vê çavkaniyê bi sedsalan çarmedorên cîhanê xweyî kiriye.

Babîl û Asûr rola xwe ya dîrokî, bêhtir bi veguhaztîne listine. Ev herdu xanedaniyên ji koka Semîtîk - Amorît, ji BZ 1900an heta bi serê Zayînê (mîlad), liser mîrateya Sumer danîne, rast kirine, xwarine û kişandine hawîrdorên xwe. Tevkariyên wan yên resene bisînor in.

Babîliyan gelekî hewl dane ku mîrateya sumerîyan derbasî nivîsê bikin. Sumerî jibo wan jî, tèn wateya pîrozweriyê. Demeke Babîl ya bi şeml liser vê mîrateyê bilind bûye. Babîl demeke dirêj, ji BZ salên 1800an heta BZ sala 550an ku Persan ew dagir kirin, di derawa paytexta cîhanê de ye. Birca (nêrîngêh) Babîl, xwedî îfadeyeke hîkarîker e ku kozmopolîtîzma demê temsîl dike û di çêbûna hişmendiya mirovan ya olî û payîdar de, xwedî pareke mezin e. Babîl, di gihîştina sazûmana koledariyê, nivîsandina bingeha wê ya bi zimanekî nivîskî û belavkirina wê ya li cîhanê de jî, xwedî roleke balkêş e. Reseniya (orjînalîte) Sumer ya 2000 salan, pêvajoya Babîl ya 2000 salan ku wergerandiye, nivîsiye, veguhertiye û veguhastiye, dişopîne. Digel ku van 4000 hezar salan, xwedî û berpirsiyarên çêbûna şaristaniya mirovan, sazîbûn û gihîştina wê ne, di warê van tevkariyên wan de, ne bi erênî û ne jî bi neyînî, ne hatine nirxandin.

Asûriyan ev belavbûn, hê bêhtir bi cerdên leşkerî yên sitemkar û bi bazirganiyê meşandine. Esasê wê, serdemên Asûr di navbera BZ salên 1300 û 650an de ne. Di serûbinkirin û xerakirina cîhên heyinên etnîk de, Asûrî rola herî mezin listine. Tinekirin û hişkkirina tevgerên etnîk, armanca wan ya sereke ye. Liser vê yekê, dema asûriyan di dîrokê de, tevgerên civekî xwe bi rengekî olî û mezhebî nîşan didin. Dîroka Rojhilata Navîn, li şûna dîroka meşên etnîk, werdigere derketina holê ya ol û mezheban û dîroka meşa wan. Asûr bi tevayî, emperyalîzmeke leşkerî ye. Asûriyan di dema xwe de, serdestiya xwe ya leşkerî, bi hemû kesî dane pejirandin. Misir, Anatolya, Rojhilatê Derya Spî, Mezopotamya Jorîn û êran jî tevli ve ne. Cîhê wê ya di dîrokê de, ji ya Babîl paştir e. Liser mîrateya Sumer in. Karê nivîsê û weşanê domandine. Di warê qesirbendiyê de pêşveçûne. Hêza dawî ya kêşan û belavkirinên Sumer in.

Rola qeranên Asûr, di derbarê koletiyê de ku di hiş û lebata (tevger) mirovan de serdest bûye, Ne hindik e. Rola wan ya di pêşketin û sazîbûna bazirganiyê de jî diyarker e. Di meşa şaristaniya koledarî ya 1000 salan de, bi Babîl re pêşengî kiriye. Li hember vê pêşewatiyê, hêzên ku navenda wan Mezopotamya Jorîn, li Anatolya Hîtîtiyan, li Bakurê Rojavayê êranê Medya û beşek ji Rojhilatê Derya Spî, hevûdin digirin û bi serhildan eniya berxwedanê diderînine holê. Hewldanên herî mezin Mîtannî û òrartû yên ji koka Aryen, nîşandane, lêbelê ji belavbûnê jî rizgar nebûne. Efsaneya Kawayê Hesinker, çavkaniya xwe ji pêvajoya vê berxwedana domdirêj digire. BZ di sala 625an de, hêzên Medya û Babîl hevgerînekê pêktînin, paytexta Asûr Nînowayê dirûxînin û dawî li emperatoriya Asûr tînin. Carekî din jî piştî xwe rast nekiriye. Lêbelê nivîskar û rahîbên Asûr, çalakiyên xwe domandine. Pirtûkxaneya Nînowa ya herî mezin, heta bi dema me hatiye. Zimanê Asûr yê aramî, weke grekî û latînî zimanekî şaristanî ye û li Rojhilata Navîn, 2500 salan di warê ragihandinê de rola bingeîn listiye. Piştî êsa, gelê Asûr dibe gelekî xiristiyan, li Rojhilat di belavkirina vî olî de, herwiha li hember şaristaniya koledar jî roleke gelekî mezin dilîzin.

Şaristaniya Misrê, BZ di salên 2000an de, di dema xanedaniyên navîn de pêşveçûna xwe domandiye. Ji BZ salên 1800an pêde, ji aliyê Hîksos (êbraniyên pêş û hinek Aryen) yên ku ji Bakur

ve hatine, tê dagirkirin. Piştî çend xanedaniyan wan dixûnifnîn û yê n ku mayin jî sirgûn dikan. BZ di salên 1500an de, dema xanedaniyên nû, dikevine bindestê asûriyan, persan û grekan, dawî BZ di salê 30an de, dikevin bindestê Roma û reseniya xwe winda dikan. Dema Kleopetra, ev serpêhatî, di dîrokê de bi awayekî xemgîn xwe nîşan dide. Kleopetra him berxwedanê, him teslîmbûnê, him jî xwekuştina bi jinîti îfade dike, herwiha vê jî diyar dike ku ev şaristanî bi hêsanî nayê jibîrkirin û îfadeya şemlê ya dawî ye.

G- Li hemberî şaristaniya koledar berxwedan û reform

Dema ku me derbasbûyina şaristaniyê nixandibû, herî zêde liser du mijaran me nixandin û dahûrandin kirin. Yek ji van, berhevbûna amûrên hilberîne, bi taybetî vekirina zeviyên biber jibo avdanê, bi pêşketina teknîka tuncê re, zêdebûna hilberîne û pêşveçûna pîşekariyê. Ya din, bi zêdebûna nefsan (şênî) re, çêbûn û cîwarbûna bajaran e. Li derî wateya fizîkî, ev di heyîna civakê de tê wateya şoreşê. Rêvebiriyên qebile û nijadên piçûk, li hember vê nûjeniya bajaran nikaribûn xwe liser lingan bigirin. Şêweya hilberîne bikêrî vê yekê nedihat. Cudabûna pêvajoya kar, belavbûna rexistiniya nijadê bi xwe re anî. Pêdivî bû ku ji rêxistiniya qebile ya bi çandinî û şivantiyê ve girêdayî, li hember karbeşiya pîşe û çandiniyê were bihûrîn. Rastiya daringî ya şoreşa bajêr ev e.

Mijara duyem ya girîng, pirsgerêka amadebûna hişyarî ya veguherîna vê hilberîna daringî ye. Şêweya hilberîna li qada gundewarî ku serbest û bikêrhatî, di mercên bajêr de nedihate meşandin. Di heman demê de, perestgeha ku xwedî roleke navenda hilberîne, divabû ku hêza rêvebiriyê liser xebatkaran çêbike, kedkarê xwe biafirîne, hemû demên wî bi pîlan bike û ligor karê ku dike wî perwerde bike. Ev rewş, şoreşeke bîrûbaweriyê pêwîst dike. Kesên ku destê wan ji jiyana qebiletiyê tê qutkirin, li dorhêla bajêr dikeve nav valahiyekê, jibo ku heyîna xwe ya fizîkî berdewam bike, divê bê qanîkirin. Mirov nikare demeke dirêj, ajaleke bi serê xwe, di hevşî de bigire. Jibo yekî ku hîn azadiya nav qebileyê bûyî, li dorhêla bajêr fêrî jiyane bibe û hemû dema xwe bide hilberîne, qanîkirineke hîkarîker, veguherîneke bîrdoziyî û şoreşeke bîrûbawerî pêdivî ye. Mercên jiyana û xebata berbiçav, dide diyarkirin bê çawa rahîbê perestgehê mecbûr e ku hem rêvebiriya hilberîne û him jî bîrdoziya nû, di nava hev de biafirîne û bide meşandin. Şewegirtina şaristaniyên Sumer û Misrê yê pêşî, bi rastiye ve girêdayî ne. Ev rastî nîşan dide ku heyîna rahîb şert e, mecbûre bîrdoziyê çêbike û perwerdeyiyê pêkbîne, dîsa ev rastî diyar dike ku berî siyaseta bisazî bibe û qerantî derkeve holê, heyîna wî li pêş her tiştî bû. Divê sazûmaneke baweriyê were pêkanîn ku bawerîke mezin pê were û cîhê lidij rabûnê (îtiraz) nehêle. Heger ku baweriyeye wiha bi hêz nebe, sazûmaniya hilberîne ya nû nayê meşandin. Tenê wê zorê û mirinê bi xwe re bîne. Mezinatiya mîtoloji û ola Sumer, ji hêza wî ya qanîkirina mirovên "kole" tê. Bîrdoziyî, sazûmana mîtolojiyî û olî yê n ku rahîbên Sumer afirandin, ewqasî bi hêz in ku şaristaniya hemû serdeman kişandine heta bi dema îroyîn. Heger ku teolojiya Sumer nebana, olên yek xwedê, mîtoloji û olên Hindê û yê Grek-Roma jî çenedibûn. Lewre dîrok, ji vî alî ve jî bi Sumer destpêdike û bandorê li yê n bi şûn xwe re dike.

Lêkolîna zanistî, bi gelemperî ya pêşveçûna bîrûbawerî û giyanê, bi taybetî jî ya binyatên mîtoloji û ol, hê pêşneketiye. Ol, tenê ya mirovek bawermendê wî olî ye, yan jî wî olî red dike, jiberku bi vî awayî bisînor kirine, di roja me de ne berhemdar e. Li şûna vê, civaknasiya (sosyoloji) zuwa ku tê xwendin, rastiye sofîstîke dike û ti wateyên din nade. Bi xerqûna nav metafîzîkê ya heta bi qirikê, jibo derawa çewt, tenê dahûrandina mercên daringî, bi şewşandina rastiyan wê mirov bibe heman bêpirsiyariyan. Di dema îro de, bîrûbawerî, felsefe û perwerdeya zanistê jî, di nava vê nexweşiyê de ne. Ez vê peyîtandinê (selmandin), ji ber vê yekê dikim: Heta em tenegehîjin bê çî di perestgehên Sumer de qewimî ye, ne mimkûne ku em tenegehîjin roja îroyîn jî. Em mizgeftê, dêrê, kenîşte (sînagog), hemû navendên huner û zanîngehê jî nasnekin. Dibe ku Zîggûrat ligor pîvanên îro, bi me sazûmaneke pêkenok (komîk) xûya be, lêbelê dive neyê ji bîrkirin ku ew malzaroka bi hezaran saziyên şaristaniyê ye, navenda çekirina genên bîrûbaweriyê ye, cîhê îbadeta pêşî ye ku "beniyê (evd) xwedê" lê hate afirandin, navenda konservetuar û konserta yekemîn e, zanîngeha yekemîn e, mala xwedê û xwedawenda yekemîn e, kexane û mala yekem ya taybetî ye. Bi kinayî em bibêjin, navenda çekirin, afirandin binavkirin û binasnamekirina saziyên bingeh yê n şaristaniyê ye. Tevî yê n li Misrê, hemû perestgeh, dibistan û salonên ku vê dawiyê hatine avakirin, nimûnekê Zîggûrat ên pêşveçûyîne. Ji ber van sedeman, heta ku li perestgeha Sumer çî qewimiye, tiştên hatine pêkanîn, di zanistiya civakî de bi kûrahî liser neyê rawestandî, em nagihîjine dîrok û hişmendiyeye civakî ya rasteqînî.

Ev nirxandina kin, li qasî ku ne terîfeke sumerolojiye, qet ne ravekirina wê ya bi wergirî ye jî, tenê jîbo bi bîranîneke pêdiviyê ye. Van demên dawî ku li zanîngehên DYA (DewletênYekbûyî ya Amerîka), liser sumerolojî bi sifî radiwestin, ji ber têgihîştina van pêdiviyên e.

Di mîtolojiya Sumer de, afirandina "benî" ya ji aliyê sazûmana xwedayan ve, dahênaneke herî mezin e. Lewra amûra bingeh ya hilberînê ev kole -benî-ye. Dema ku em dahênandina tekelekî yan jî tevirekî (bivir) ku bi tecrûbeyê hezar salan pêkhatine, li ber çavan bigrin, emê têbigihîjin ku çîroka dahênandina "kole" bêhtir wê ji lêkolînê re nirxdar be. Ædî ku em bînine hişê xwe, bê serfê gundî û karkerên kargehê tîn çî wateyê û liser navê wan çî dikin, emê wê hengê wateya vê "sazûmana benî (evd)" ya bi êş û azar ku herî dirêj domandiye fêhm bikin. Heger ku em pîramîdekî tenê, yan jî bajarekî antîk, bînin ber çavan, gewreyî û erjengiya (saw) karê ku hatiye kirinê bêhtir were dîtin. Peywira dîrok û civakê ya bingehîn ev e ku di bîrûbawerîya vê rastiye de bin û di giyana xwe de hisbikin.

Dahêrandin û meşandina hişmendiya benî, bi civaka bi çîn re bêhtir girîng dibe, ev kar di roja me de jî, bi awayekî sifî û zexmtir tê meşandin. Ez li vir dahêrandinên, hişmendî, giyanî û bîrûbawerî nakim. Lebelê ku em van aliyên civakê jî li ber çavan daneynin, em dê nikaribin pêvajoyên dîrokê bi awayekî rasteqînî deynin holê. Hemû ravekirinên min yên di vî derbarê de, jiberku bi hindikayî ez vê pêdiviyê terîf bikim e.

Weke di her şewegirtineke dîrokî û civakî de, ev pediviyek e xwezayî ye ku piştî çêbûn, sazîbûn û lê anînan, zor li veguhertin û wergerandina civaka bi çîna koledar were kirin. Daringperestiya (Materyalizm) dîrokî, fêrî me dike ku ti şewe ne payîdar in, "bi kêra demê daringa xwe hûr dike" û her ya nû dafirîne. Zanist di babetê mijarê de, peywîrên xwe nayîne cîh, hê ew şewşandinên mezin derbasnekirine, tenê kerese (kelûmel) yên zanîne li holê kirine lod, ji azmûna terîfkirineke ku emê bikaribin di derbareyî mijarê de bikin, derbasnabe. Lê jiberku peywireke min ya girîng e, ez pê re têkildar bûm, çewt an rast, tiştê hate zimên min girîng dît û got.

Sazûmana koledarî, tiştê ku BZ di salên 2000an de, bi Xanedaniya ór ya sêyemîn û bi Xanedaniya Navîn re jiyayî, azmûneke restorasyonê ye. Nakokiyên sazûmanê bi rewîştê hûndir û derve, timî mezin dibin. Azmûnên Sargon yên sitemkar û bi darê zorê, hewldanên wî ku sazûmanê bikişîne derve, ne hiştiye ku ezbeta (sulale) wî bi ser sed salî bikeve, bi eynî zordariyê ji holê hatiye rakirin. Temenê Xanedaniya Navîn jî gelekî kin e. Sazûman bi şeweya kevin nayê meşandin, restorasyon jî, jiberku ne bi awayekî derûniye domdar nabe. Dema xweda-qeranan jî, di pîrozwerî û bawerdêriya xwe de zorê dibînin. Çavkaniya vê zorlêhatinê, him li hûndir e û him jî li derve ye. Li hundir, rêvebirên eyalet û yên bajaran, jiberku bi nimûnekî qeranan mezin bûne, liser hev hewldanên serxwebûnê didin, jîbo vê yekê jî, gelek hêmanên hevgirtinê, ji derve, ji xwe re dibînin. Bi azmûneke dirêj, têdigihîjin ku sazûmana "xweda-qeran" sazûmana mirova ye. Gav bi gav, veguherîna hişmendiye pêşvedîçe. Hê ji serî de, nakokiya rahîb û qeran heye. Guhertina gelek xanedanan, di perestgehên rahîban de pêktê.

Eyalet û bajarên ku girîng dibin, dixwazin ku hêza xwe xurtir bikin. Tirbên bi serê xwe ku mezin hatin çêkirin û bi mirina qeranan re, veşartina hemû malbata wî ya bi awayekî zindî, zemînekê ji şoreşa bawerî û hişmendiye re amade dike û rê li ber danaheva vê vedike. Teknîka pêşveçûyî ku rê li ber berhemdariyeke mezin vekirî ye, ji ber hebûna koleyan, nayê bikaranîn û li hêlekê tê danîn. Jiberku serdestî li amûrên hilberînê yên ku neolîtîkê afirandine hatiye kirin, ketine pêvajoyeke kevneperestiyê, azadiya pişekar bi zêdeyî hatiye tengkirin. Di nava mercên xwe de, ew jî yan di derawa milkê serayê de ye yan jî milkê perestgehê ye. Ji rojên xwe yên azadiyê, yên kevin jî dûr e. Ne jîbo xwe kar dike. Yên ku têkiliyên wan bi hilberînê re tine zêde dibin û yên hilberînê ji encamên hilberînê bê par tîn hiştin. Di warê şoreşa hişmendiye û serhildanên çînî de pêşketin pêktên. Zor û zehmetiyên ku di nav de, çîqa ku diçe diwartir dibe, li hember baweriyê, şik û guman çêdibin. Di hişmendî û giyana mirovan de, dengê ku di bêje bila xweda ewqasî ne bê wijdanbin, vedide. Dilînen "lavayî û serhildanê" kûr in, nûhirîna (mirmirandin) "êş"ê di rewşeke bê perwe de ye. "Eyûb"ên sazûmaniyê zêde dibin. Pêxemberê êş û aramê Eyûb, pêxemberê guherînen dîrokî yên di giyan û hişmendiye de ye. Nûnerê vê pêvajoyê ye.

Derfetên serhildan û hêrîşên ji derve zêdetir bûne. Kenanî û amorîtiyên ku qebileyên Semîtik yên çola Erebaştanê, hê şaristaniya Sumer û Misrê şeweyek negirtî, ji Rojhilat û Rojava timî hêrîş dibirin ser wan. Li hember "emperyalîzm" a ku timî hêrîş di bir ser çîyan, daristan û deştên Bakur yên berhemdar, Aryenê ku ji wan fêrî çêkirina amûran bûne û ji madenê xwe van çekan bi zêdeyî pêktînin, dikarin xwe biparêzin û hêrîşan jî bikin, bi hevgirtiyên nav xwe re, di veguherandina xanedanan de rola xwe dileyîzin, gelek caran xanedanan ji nav xwe tînin serî. Di van pêşveçûnan de, gûtiyan, akadiyan, kassîtiyan û hîksosiyên, di dîrokê de dewsa xwe çêkirine. Bi gelemperî li her

deverê eniya "federasyona qebîleyan" tê lidarxistin, li hember emperyalîzma koledar têkoşîneke bêeman didin destpêkirin. Pêvajoya vê tekoşînê, gelek dewletên piçûk diderîne holê. Ev rewş dibe sedema lawazî û bêhêzbûna sazûmanê, êdî jiberku sazûman xwe biparêze bêhtir hêrîşker (hêrîşbaz) dibe. Dema asûriyan BZ di navbera 1900 û 625an de, anku 1300 salên ku bi Hammûrabî destpêdike û bi Asûrbanişîpîal diqede, bi dijiwariyeke ku Sargon di siya xwe de dihêle, hemû heyînên etnîkî yên Rojhilata Navîn, dixwe nava saw û toqîneke gewre. Ti heyîna etnîkî namîne ku serûbinî hev nekiribin. Her dever di nava saweke bêhempa de di nale. Zemîna serdema baweriyê ya di dîrokê de herî mezin û ya serdema hişmendiyê, gelekî berfireh dibe, pêxemberên ku pêşevanên sazûmaniyên baweriyên mezin û serhildêrên giyanê û dema olên yek xweda, xwe dide ferzkirin. Ramana Mesîh (rizgarker), her ku diçe di seriyan de cîh digire û hêviyên mezin çêdike. Tenê ne guherînên bawerî, êdî dizanin ku xweda-qeran jî mîna wan mirov in, teolojî û mîtoloji hew bersiva wan dide û jê qut dibin, dikevîne demeke dîrokî ya nû ku ramana felsefî xwe dide pêş.

1- Bûyina olên yek xweda û cîhê wan yê di nava şaristaniyê de

Bûyina olên yek xweda, tê wateya şoreşeke di hebûna ehlaq, mirûz (moral) û hişmendiyê de. Mijara ku daxistina pîrsa 'xwedê heye yan tineye', bi temamî daherizandin (berevajîkirin) e. Nêzîkbûna bi vî şeweyî, derûniya wê dinixûmîne û rola wê ya herî mezin di reşahiyê de dihêle. Hê jî kiryarên zanist û mensûbên olên yek xweda, ji xweparastîneke zûwa derbasnabe. Li qasî dahûrandinên kûr yên civakî yên van olên yek xweda, ji vî jî girîngtir pêşveçûna hişmendiyê mirov, çêbûna mantiq û rola wî ya di çêbûna zanist û ramana felsefî de, bitêrayî li ber çavan nehatine raxistin. Pêşveçûnên civakî ku di pêvajoya qeyranên mezin de çêdibin, rewîştên şorêşê nîşan dide, divê bersiva pîrsên kîjan hişmendiyê nû û derfet ji kîjan sazûmanan re çêkiriye, were dayîn. Resenebûna di warê çînî û siyasî de, hê bêhtir girîngiya xwe nîşan dide.

Di beşên borî de, em liser mijarê rawestiyabûn. Di beşên ku tîn de jî emê bi kûrahî liser rawestî. Di vî beşê de, terîfa civaka biçîn ya koledar û rola wê ya di pêşveçûna şaristanî de, wê were kirin. Peyitandîneke zanistê ya hevpar ev e ku çavkaniya saziyên şaristaniyê yên bîngêhîn, şaristaniya Sumer e. Mesele ya Adem yê ku mîna pêxemberê yekem tê berdand, di mîtolojiya Sumer de bi awayekî hîkarîker tê ronîkirin. Heta bi afirandina Hawa ya ji parsûya Adem jî, di mîtolojiya Sumer de cîh digire. Di her taybetiyêke Sumer de, xwedayek heye, bi belgeyan hatiye çespendin bê çawa yekî nexweş dikeve ji xwedayê afirînêr "Enkî" tê zayîn. Ya herî girîng bûyera "qewirandina ji bihiştê" jî, di mîtolojiya Sumer de bi raveyêke helbestî cîh digire.

Têgîna bihiştê dahûrandîneke bi her alî dixwaze. Lêbelê ev nayê înkarkirin û jibo gel daxwazê ku bûyerên zor û şidetê nebin, ku mirov mîna dost û perçeyek ji yê xwezayê bijîn, di tîkiliyan de wekhevîyeke mîna ya dema neolîtîk serdest be. Jibo çîna efendiyan ya nû ku mezin dibe, tê wateya ku ji karê bihiştê yê mecbûrî rizgar in, cîhanêke ku gelek mirov jibo wan kar dikin û cudahiyeke civakî. Bihiştê tîgîneke wîha ye, dema civaka Sumer ya biçîn bilind dibe, yê ku li bin dimîne xeyal dike û yê liser bi awayekî hîkarîker wê xweşiyê dijî. Rola cudabûna çînen pêşî yên civakê, di zayîna mîtolojîk de bi awayekî zindî û helbestî tê ravekirin. Ev yek mîsoger e ku seray û perestgehên li giravên Kendava Basrayê, li peravên Dicle û Ferad hatine çêkirin, di vî de bûne çavkaniyên best (îlham) dayînê. Ev yek bi hêsanî tê fêhmîkirin û ji nivîstekên ku hatine xwendin diyar dibe ku çar xwedayên afirînêr (An, Enlîl, Nînhûrsag, Enkî) bûne çavkaniya olên yek xweda. Ravekirinên liser bihiştê yên bi navê "Dîlmûn", tîgînen bîngêh yên şayesên (teswîr) vî dawiyê ku liser bihiştê hatine kirin, bi zîmanekî helbestî rave dike. Seraya Enkî ya bi navê Abzû (çavkaniya peyva hewz û mînaka seraya yekem ya bi hewz) li bajarê Erîdû, berbiçavbûna vî xeyalê îfade dike. Piştî vî re, Baxçeyên mêwan (dêlî) ên Babil û hemû seray û seyrangêh (park) yên ku hatine pêşxistin, bestê ji vî nimûneya hoveber digirin. Di ravekirina mîtolojiya Sumer de, xwedawendên ku rola Nînhûrsag û Înanna dileyîzin, di pêvajoya dîroka şaristaniyê de girîngiya xwe wînda dikin, heta bi dayika êsa Meryem, lê tîn vegeandî. Di kesayetiya Hawa de, ev windayî hê bêhtir e. Çawa Enkî ji parsûya nexweş hatiye afirandin, ev yek weke xwe wergerandina "efsaneyê Adem û Hawa". Nînhûrsag xwedawenda herêma çiyayên Zaxrosa ye, lê xwedî pozîsyonekî li ser Enkî re ye (Bi sumerî Nîn=navê xwedawend, hûr=çiya, gir, Sag=perçe) Ev ravekirina mîtolojîk, di dema şoreşa çandinî de rola jinê ya sereke û di zîmanê aryanên ku hê xwe bernedane deştên Dicle û Ferad de, bi navê "Star" (Pişt re bi Akadî eştar) temsîlkirina xwedawendê, rastiya dîrokî ya di mîtolojiya Sumer de, derdixe holê. Ev yek bi zelalî diyar e ku hêza çanda xwedawendî ya ku ji şoreşa çandinî ya neolîtîk dihat, ji aliyê Sumer ve hatiye guherandin.

Pêvajoyên lijneya xwedayên Sumer (Bi gîrekî bi navê Pantheon ketiye wateyêke din) ku mirovan ji heriyê diafirînin gelekî hîkarîker e. Di heman mîtolojiyê de bi zîmanekî helbestî û awayekî pîrozwer

tê gotin ku xweda westiya ne û êdî pêdiviya wan bi xebatkaran heye. Xweda heta bi taybetiyên xebatkarên xwe jî diyar dikin. Ev gelekî diyar e ku sazûmaneke "benîyekî xwedayî" bi awayekî tekûz pilankirine û afirandine. Ev mijar gelekî zelal e ku ev pêvajoyê, çêbûna rahîb, siyaset, burokrasî û leşkeriya Sumer tîne ziman. Dema ku rahîb û qismên rewşenbîran bîrdoziyan çêdikin û belavdikin, helbet nabêjin mirovan "Werin emê we bikin suxrewan (xizmetkar)." Dizanin ku wiha serkeftî nabin. Ew xweş dizanin ku li şûna yekîtiya bi zorê, liser bîrûbawerî û giyana mirovan serdestiyekê saz bikin, yê bêhtir bi ser bikevin. Sêwirana mîtolojîk û olî karê wan yê bingehîn e. Serkeftina wan ya di vî derbarê de, ji şerê serdestbûna îro ku li zanîngehên Ewrûpa û DYA tê kirin, ne hindikî girîngtir e. Ligor demê, payidartir, bi zanistî û serkeftitir e. Dema ku çîna serdest yan jî giregirek bixwaze bilind bibe, tişta herî pêşî dive ku têkildaran hişyar bike û baweriya wan bîne. Bêyî vê yekê, dema ku bixwaze serdestiyê bi darê zorê û bi derewan bide meşandin, ji gelek ceribandinan diyar e ku pêşveçûn çênabe. Pêşî dive ku şerê bawerî û hişyariyê were dayin.

Li vir em nabêjin baweriya bîrdoziyî ya ku heyî û zanistiya amade. Ev pirsgerêkeke perwerdeyî ya hêsan e. Weke mînak Sumer, pêdiviya sazkirina şaristaniyê, yanê hemû seresazî û binesaziya civaka nû ya bi çîn ku weke pêdiviyeyeke bi zorê xwe nîşan dide, ligor wê demê zayîneke afirîner ya mîtolojîk e. Rahîbên Sumer vê demê bi karên gelek mezin re têkildar in û wisa serketî ne ku bandorê li temamê dîroka şaristaniyê bikin. Serketenê ne tenê ji çîna serdest ya ku bilind dibe re dikin. Vê yekê ji civaka biçîn tevî re, liser navê hêzên ku şaristaniyê temsîl dikin, pêktînin. Ev ne tiştekî zor e ku ez bi belgeyan biçespînim bê vî karî çawa dikin. Lê evder ne cîhê wê ye. Lêbelê bi taybetî jibo ku em dîroka Rojhilata Navîn, ji bandora dogmayan dûr bikin û bînin zimên, ev mijareke girîng e.

Afirandina Adem ya ji heriyê, di hemû pirtûkên pîroz de heye. Lê çavkaniya vê gotinê mîtolojiya Sumer e. Him jî bê vê heriyê ji ber kîjan kendalî tînin û kîjan xweda dize, bi raveyeke helbestî tîne zimên. Jiberku mirovan suxrewanê (xizmetkar) xwe dibînin, îfadeyeke weke ku ji destava (gû) xwe diafirînin derdikeve holê.

Em dibine şahid ku kêman caran, hinekan ji suxrewanên xwe yê jêhatî jî digirin nav xwe. Divê em bala xwe bidine vê yekê ku ev gherandina çînê, raveya nivîskî ya yekam ya xwedayî ye. Ew ji ezmanan, ji heyvê, ji rojê, ji agir û ji hewayê tîne afirandin lê mirov ji heriya gûyê wan tîne afirandin. Çîna serdest û mijok, encex cudahiya xwe bi vî rengê bibandor li ber çavan radixe.

Dîsa têgîna "Qewirandina ji bihiştê" ku di hemû pirtûkên pîroz de cîh digire, bi hêsanî dikare were dahûrandin. Ev yek, bi ji hev veqetandina civaka Sumer ya biçîn ve girêdayî ye. Ji aliyekî ve çîna jor ku ji hev vediqete, xwe ji hemsalên xwe yê hemnijad qut dike, ji aliyê din ve jî, îfade dike ku qismên di rewşa suxrewanan de, ji bandora wan dikevin. Têgîna "fêkiyê guneh", angaşteke (îdîa) tawanberker ya wanên ku êdî liser sifreyên serayan cîh ji xwe re nabînin ne, bi hêrişê bîrdoziyeyeke din ve girêdayî ye. Anku cîhê suxrewanan, li derên mîna bihiştê ku ew û yê mîna wan tê de dijîn, tîneye. Ev têgînê vê yekê temsîl dike ku çîna serdest sedema cudabûna xwe, di pêvajoya dîrokê de, bixeteke sor, bi perdeyeke sitûr û bi dîwarekî ku neyê rûxandî hûnandî ye.

Efsaneya pêxember Nûh, yanê bûyera Tofanê digel ku di her çar pirtûkên pîroz de cîh digire, di serî de di Destana Gilgamêş de û di gelek destanên Sumer de jî, cîh girtiye. Bi awayekî zanistî jî tê çespanandin ku BZ di salên 3000an de, ava okyanûsan bilind bûye. Di dema Sumer de, Derya Basrayê misêwayî erdê ye û vê demê gelek caran ser ve çûye û gelek der di bin avê de mane. Dibe ku efsane di demekî û rewşeke wiha de derbas bûbe. Ev bûye sedem ku Sumeran cîhên cîwarbûna xwe kişandine ber bi bakur ve. Sedema van serveçûnên avê, di mîtolojiyê de, weke naleta xwedayan û bizavên li hember zêdebûna nefsan cîhê xwe digire. Mîna livbaziyeke cezakirinê, kirasekî bîrdoziyî lêkirine

Jibo rizgariya ji tofanê, keştiya ku ji her cinsî cotekê de, liserê çiyayê Cûdî rawestiya ye. Ji xwe ev rastî jî diyardike ku Cûdî çiyayê herî nêzikî Mezopotamya jêrin e û ji bilind ve lê dinêre. Hê jî li vê dorhêlê, Cûdî weke cîhê Tofana Nûh tê ravekirin. Di Kurdî de Nûh=Nû ye û Cûdî, Cû=cîh dî=dît e, yanê tê wateya 'cîhê nû dît.' Ev peyvên ku koka wan ya etîmolojîk gelekî kevn e, koka hemû zimanên êndo-æwropî ye. Kokên new, geo û deûs bi zelalî vê diçespînin. Ev kok çespandineke dine ku di BZ salên 10 000an de, bi çêbûna zimanê çandinî yê neolîtîk re, bi şoreşa li vê derdorê ya bi zimanê Aryen ve girêdayî ye. Gelek peyvên kok ku ji Hindê heta bi Ewropa, bi çavkaniya Heyva Berhemdar ve girêdayî ne, vê peyamê bi gelemperî rast derdixe. Pêşveçûna bi sedan zimanan liser koka aryen, çespandina serdema neolîtîk û hêza wê ye.

Efsaneya Eyûb pêxember jî, hilberîna êş, azar û bêhêvîbûna civaka Sumer ya di demên qeyranê de ye. Ev salên bi qeyran ku mirovatî bi êş û azarên mezin dikeve lavayan, lê xweda anku çîna serdest bersivê nade, BZ di salên 2000an de gelekî zêde dibe. Eyûb pêxemberê ku tirba wî li Rihayê (órfa),

diyar e ku ji koka Sumer e (peyvên bi kita ûr hemû sumerîne, tê wateya "cîwarê ku liser gir hatiya avakirin", weke ûr, ûrûk.) Li órfa û derdora wê ku weke cîhê pêxemberan bi rûmet, BZ di salên 2000an de, gelek mêtîngêhên Sumer hatine damezrandin. Derdora órfa yê herêmeke çavkaniya dîrokêye ku du çandên dîrokî, Amorîtên şivan yên ji koka semîtîk (Timî ji çolên Erebaştan ber bi Mezopotamya hêrişan dikin) û Hûrrî yên çandiyar yên ji koka Aryen, li hember hev tèn, şer dikin û li mêtîngêhên Sumer fêrî bazirganiyê dibin. Dijayetiya li hember sazûmana Sumer ku bi awayekî hêsan pêşketî, bi vê rastiya doringî ve girêdayî ye. Gelek çand, gelek bîrûbawerî ye. Êbadetkirina bîrûbaweriyên cîwarbûyî, hebûna xwe bi inyard berdewam dikin. Di efsaneyên Hz Brahîm de jî derbasdibe ku di demên qeyranê de, li hember Nemrûd órfa (Nemrûd=bi Sumerî qeran) serhildan zêde bibin. Li órfa yê hê gelek cîh û efsaneyên pêxemberan hene. Him ji derve mêtîngêhkariya Sumer ya emperyalîst û çîrokên Nemrûd yê ku wan temsîl dike, him jî efsaneyên pêxemberên ku yekem car li dij van rabûne, didin nîşandan ku órfa bûye qada têkoşîna van. Erdnîgariya órfa, berhemdariya axa wê, avhewa wê, nasnameya wê ya çandî û pêşveçûna wê ya dîrokî, vê dibetiyê (ihtimal) xurtir dike. Emê gavekî din liser vê biaxivin.

Herêma Qudsê jî yê roleke wiha bilîze. órfa hê bêhtir li hember emperyalîzma Sumer vê rolê dilîze, lêbelê Quds li dij emperyalîzma Misrê ya koledar vê rolê bi cîh tîne. Herdu cîh jî warên pêxemberan ne. Ev herdu cîh mîna navendên dijberiyê ne. BZ di salên 2000an de ku ev herdu bajar û herêm, weke navendên olên yek xweda derketin pêş jî, ji vê derawa wan tê. Ji dema ku Hz Brahîm koçî Qudsê kir û heta bi serhildana êsa wiha ye.

b- (Tê gotin ku wê demê Abgarên serdestî li órfa yê dikirin, êsa vexwendî órfa yê kirine.) Ev jî ji vê derawa wan ya dîrokî tê ku di nava du hezar salên borî de, gelek çûn û hatin di navbera van herdu herêman de çêbûne. Ev herdu navendên ku olên yek xweda li wan haveyn girtî, di heman demê de dorhêla çandê ya ku hêviyên azadiyê geş dike jî temsîl dikin. Ev derawa wan a li hember koledariyê, sedema herî girîng e ku ev herdu bajar îro jî pîrozwer têne naskirin. Jiberku rola wan mezin e, cîhê wan ê di hişê mirovan de jî mezin û nejbîrok e. Dema ku emji ser pêxemberiyê perdeya olî ya giran bidin alî û em têkilî û nakokiyên wê bi şaristaniya koledar ya arkeîk -herî kevin- re damezrînin, emê derawa pêxemberiyê xweşiktir terîf bikin.

Em dikarin taybetiyên wê yên bîngêhên weke çend angaştan (tez) wiha bi nîrxînin:

I- Bi giranî di ber sînga du sazûmanên koledar yên arkeîk de pêşvedîçe, him saziyên bîrdoziyî ku ji veqetandinên civakî derketine holê, him jî tevliheviya demê ku ji pêvajoya qeyrana giran ya sazûmanê tê, bandorê lê dike. Li hember çewsandina sazûmanê ya liser bîrûbaweriyaya mirovatiyê û şewegirtina netewî, mîna serhildana wijdan derdikeve holê.

II- Ji şewegirtineke bîrdoziyî ya serbixwe zêdetir, dike ku aliyên mîtolojiya serdest an jî têgihîna olî (wijdan) ku bi rastiya re ditewişin, ji nû ve bi rêk û pêk bike. Hêza wê tîne ku têgihîna olî saziyên fermî derbas bike, digel ku aliyên wê yên şoreşger hene jî, taybetiyên wê yên serdest nûsazîbûne. Encamên ku sazûmanê nûjen bike û dikaribe were kişandin dîderîne holê.

III- Qismên hejar ku ji veqetandinên bîngêha çînen civakî derketin û qismên serdest ku ji belavbûna heyîne etnîk derketin holê, ne tede, beşên civakê yên li derî van esas digire. Dibine pêşengên qebîleyên ku bi sazûmanê re ditewişin û takekesên ku ji saziyên civakî qut dibin û bi serê xwe dimînin, ber bi xwe dikişînin.

IV- Ji tevgerên siyasî û doringî zêdetir, weke pêşewayekî bîrdoziyî ku aliyên wî yên menewî û mirûzî girantir, derdikeve holê.

Ev mijarên ku hê jî em dikarin berfireh bikin, bi têrayî şeweya saziyên rave dikin. Dema em bi taybetiyên sê pêxemberan re beremberî hev bikin, emê wateya wê derînine holê. Di bîngêha van taybetiyan de, dema ku em di erdnîgariya Rojhilata Navîn de li tevgerên pêxemberanên berbiçav binêrin, em dikarin pêşveçûnên ku pêkanîne wiha bi rêzînin:

1- Brahîm di têgihînen ol de, di bin navê tewhîd (yekîtî) de bîngêha saziyê yek xweda daniye. Xwedayê Hz Brahîm, taybetiyên girîng nîşan dide. Ji yekîtiya xwedayên Sumer û Misrê veqetiyaye. Serbixweyî yê xwedayî qezenc kiriye. Ev vê yekê nîşane (sembolîze) dike ku mirov bi gelemperî bi azadiyê re, bi taybetî heyîna etnîk, bi zêdeyî bi mayîna qebîlê ya azad ve girêdayî ye. Ev nasnameya xwedayî ya nû, ligor heyîna mîtolojîk û olî yên herdu sazûmanên arkeîk, di warê azadiyê de, tê wateya pêngavekê.

2- Nasnameya xwedayî bi temamî ji mirov cuda ye, nemir û di şeweya nepûtîkirinê de ye. Li asta jor, neberbiçaviyek dabaşa xebirdanê ye. Him têgihîna olê totemîk ê qebîleyê û him jî têgihîna olê çînî ku ji qerantiya sazûmana koledariyê diyar dibe, tê derbaskirin. Pêşveçûneke olî ku deng li hemû mirovahiya dike û merhaleyê bîrûbaweriyê ku bêhtir pêşveçûyî esas digire, dabaşa xebirdanê ye.

3- Bi vê rewşê, di bîrûbaweriya mirov de, merhaleya mantiqekî pêşketî temsîl dike. Têgînkirina bi totem û pir xwedayî, bi zarokî ye û ji alyê mantiq ve li paş e. Bi taybetiya wê ve girêdayî ye ku di pêş de, yê herkesên ku wijdan û ramana wan hişyar dibe, li ber sînga xwe bide hev.

4- Hê bêhtir qebileyên ji koka Aryen û Semîtîk ku bi sazûmanê re nabine yek, pêre di navnakokiyan de ne û hînbûyî liva azad in, di dorhêla kesayetiyên bi pîşe û hindik jî bin yên weke mecnûn û derwêşan de, serkeftî dibin. Bi taybetî di qeyrana sazûmana koledarî ya BZ di salên 2000an û bi şûnve de, rê li ber bilindbûna pêlên pêxemberiyê vedike û ev yek aliyê tevgera civakî ya herî girîng dertêxe holê

5- Ji bilî dewletên Misir û Sumer yên navendî, gelek dewlet-bajarên piçûk ku derketine holê, bi tevgerên van pêxemberan ve girêdayî ne. Mînaka vê ya herî bibandor Qerantiya êbranî ye.

6- Him rewîştî sazûmana koledar ya serdest, him jî ji ber heyîna qebileyên bavkanî, perestîş (kult) ya jinê û xwedawendê ji holê rabûye. Bi taybetî, piştî ku amorîtiyan Sumerî ji qada siyasetê rakirin û di pêvajoya damezrandina emperatoriya Babil de, ev mijar mîsoger bûye. Destana Babil ya afirandinê Enûme Eliş, vê rewşê rave dike. Bi Hz Brahîm re, hemû pêxember mêr in û di sazûmana wan de cîh ji jinê re tine. Cîhê jinê nêzîkî şeytên kirine. Bandora Babil ya liser Hz Brahîm û bandora Misrê ya liser Mûsa, di derkirin (hermonokirin) ya jinê de roleke mezin dilîze. BZ salên 2000an û bi şûnve, jin timî statûya xwe winda dike. Çîncînîbûna bi gelemperî û cudakirina cinsan bi hev re dimeşe.

7- Ramana yek xweda, vê dawiyê yê bibe nîgareke (motîf) bîrdoziyî ku di warê zeximkirina otorîteya qeran de, were bikaranîn. Yek xweda=yek qeran dê bibe formûla rêvebiriyê. Heçku ev raman di serî de, di pêşveçûna azadî de roleke girîng dilîze û mantiqa neberbiçav jî xweyî dike. Herwiha çîna serdest, xwedayê olê nû yê erênî jî dixûnîfîne û li xwe tîne.

Rola sazûmana pêxembertiyê ya dîrokî, bê şik ev e ku di nermkirina sazûmana koledarî ya arkeîk de, bûye diyarker. Tevgera duyemîn ya şaristaniyê ku li Rojhilata Navîn hatiye afirandin, derbaskirina dema xweda-qeranên ku liser bîrûbawerî û giyana mirovan zagonên xwezayî disepandin û pêşveçûna rêbazên olên nû ku digotin, xwedayekî bi tenê û mezin heye, qeran jî berpirsiyar in ku hesab bidin. Ev diyar e ku herçiqas di mantiqa mirovan de û di rêvebiriya dewletê de, çilvirandibin (dejenere) jî, zagonên yek xweda pêşveçûnekê îfade dike. Bi taybetî jiberku rêzikên ol heyîna siyasî jî girêdaye, sepandina hêza bêsînor rawestandîye. Pêşveçûna mantiq ku gihaye merhaleyekê, di heyîna ramanê de guherînên bingehîn pêkanîne. Merhaleya teolojîyê ku ji alyê helbestvan û feylesofê binav û deng Goethe yê Alman ve, di babetê serdemên giyan de ku weke "helbest, teolojî, felsefe û pexşan" veqetandî, li tayê serdema olên yek xweda ku ji alyê pêxemberan ve hatiye bilindkirin tê. Di derbaskirina sê emperatoriyan (Sumer-Asûr, Misir û Roma) di dîrokê de ku herî demdirêj, têkoşîna ku liser navê olên yek xweda hatiye meşandin, rola bingeh lîstî ye.

2- Berxwedana heyînen etnîkî û şaristaniya koledar

Cureyek ji tevgerên dîrokî ku sazûmana koledar ji bûyina xwe heta bi hilweşîna xwe mecbûr maye pêre pozberiyê bike, yekîtiya etnîk (qebîle, eşîr) ku hişyarî qezenc kiriye. Heyînen etnîkî ku di serdema neolîtîk de ji ber xwe ve çêbûne, wateyêke mîna çîna karker îfade dikin. Jibo ku heyîna xwe berdewam bikin, pêdiviya wan bi hişyariya berxwedanekê tine. Lewra dijminekî wan ya ku hêriş bike tine, nakokiyên ku rê li ber hişyariya etnîk vekin, pêk nehatine. Yekîtiya etnîk û berxwedan armanckê pêwîst dike. Ku ev armanc derveyî be û ji alyê civakeke biçîn ve were rêvebirin, tişteki xwezayî ye ku nakokî rê li ber hişyariyê veke. Civaka nû ya siyasî biçîn û pêşveçûyî, yê vê nakokiyê çêbike. Qismê jor ya heyîna etnîk, tevî civaka nû ya bi çîn dibe, qismê jêr xwe li hemberî gef û gurên piralî dibîne. Di serîde yeke (unîte) yên civaka biçîn, di çîhana neolîtîk de, di rewşa giravên li qasî okyanûsa ne. Gef û gur bê hêz e. Dema ku li hawîrdor giravên şaristaniyê pêşketin, êdî ew dikevîne rewşa giravkên piçûk. Jiberku bi temamî ji holê ranebin, çavê xwe vedikin û li ber xwe lep vedidin. Ev hişyariya etnîk ku hêji li Rojhilata Navîn gelekî bi hêz e, ji vê pêşveçûna dîrokî tê. Dema ku şaristaniya koledar hate merhaleya emperyalîzmê, dema "bûyina komên etnîk yên hişyar" jî tê.

Ji alyê pêşveçûna dîrokî ve, ev pêvajoyê wîha dikare were şopandin:

a- BZ di salên 3000an de, tevgerên mêhtingehkariyê yên têkildarî şaristaniya bajêr, rê li ber hişyarbûna komên etnîk vekiriye ku xwedî li çavkaniyên madeya xam ya li welatê xwe û li berjewendiyên xwe yên bazirganî derkevin. Dema ku rêvebiriya mêhtingehan, dest avêtiye derfet û berjewendiyên wan, vê rewşê berxwedana hişyarî û demeke gelekî bixwîn bi xwe re aniye.

b- Dema ku berjewendiyên dargî derdikevin pêş, ev yek merhaleyêke nû bi xwe re tîne ku heyîna etnîk him di nava xwe de û him jî li hember derve xwe nû bi rêxistin dike, bi taybetî hêzeke

xweparastin û hêrîşkirinê bi dest dixê. Ev komên etnîk ku di pêvajoya şerê emperyalîst de û li mêhtingehan fêrî teknolojiya çekan bûne, mecbûr dimînin ku femandariyeke leşkerî pêkbînin. ædî mayîna wan ya liser lingan û parastina berjewendiyên wan, bi hêza wan ya leşkerî ve girêdayî ye.

c- Jibo ku bigêhin teraza hêzê, bi komên mîna xwe re ku li hember nakokiyên wiha, hevgyirtinê çêdikin. Ev hevgyirtin di dîrokê de, bi navê "federasyona qebîleyan" derdikeve pêşberî me. Ev rewş bi nakokiyên di nava sazûmanê re dibe yek û di rêvebiriyê de gelek xanedanan diguherîne. Ev dem bi navê "serdema qehremantiyê" ya eşîran, tê binavkirin.

d- Du encam li benda van federasyonên ku tên damezrandin in: Yan ewên biserketinekê zêdetir navendî bibin û bibin dewleteke xwedî bajar, yan yê têk herin li çol û çiyar vehewin û xwe biparêzin, yan jî yê bibin dilê civaka biçîn ya serdest û bihelin. Çerxa dîrokê li hember vê rastiyê tim wiha dizîvire. Ev heta roja me ya îro berdewam dike.

e- Hişyariya eşîrtî ya bi vî rengî, hişyariyeke qewm (ne netewe, neteweyî) ya bisînor û hoveber bi xwe re hildigire. Hişyariya qewm pişt hişyariya eşîrê re tê û bi derbaskirina wê re pêşvedixe. Heynên ku hişyariya eşîrtî zexm be, hişyariya qewm bi hêsanî pênaqeve. Di merhaleyên ku heyîna eşîrê têrê neke, yan bibe asteng, yan jî li hember pirsgerêkan, hişyariya neteweyî û vesaziya wê gaveke din diavêje. Ev gav bi piranî siyasî û leşkerî ne. Di dîrok û erdnîgariya Rojhilata Navîn û di bin ronahiya vê dahûrandinê de, bi awayekî berbiçav em van pêşveçûnan dibînin:

1- Pêlên qebîleyê Semîtîk, di sê merhaleyan de rolên girîng lîstine. Tevlîbûna wan ya di çêbûna şaristaniya Misir û Sumer de li ber çava ye. Di merhaleya duyemîn de, hê bêhtir li ber xwe dane. Bi giranî pêşewanê wan pêxember in. Li rojhilat amorîtên ku hêrîşî Sumer dikirin, li rojava kenanî û îbraniyên ku li hember Misrê li ber xwe didan û carina hêrîş dikirin, di merhaleya duyemîn de ne. Merhaleya dawî, serdema belavbûna erebên semîtîk yê serdema êslamîtiya Feodal e. Erebbê jî belavbûna xwe berdewam dikan.

2- Koma duyemîn ya mezin, yê jî koka Aryen in. BZ di salên 3000an de, aryênên ku hişyariya wan ya etnîkî bilind dibe, jî alyê sumerîyan ve bi gelek navan tên binavkirin. Navekî bi gelemperî 'Horrit' li vê pêldanê dikan, ev nav tê wateya 'Yên bi welatê bilind'. Hêşîrên di bin vî navî de ku nîşê yekem in, ev in: Gûtiyan, Kassîtiyan, Mîtaniyan, órartûyan û herî dawî Medîyan. Li vê herêma hişyariya eşîrtî ku gelekî bihêz e, çavkaniya xwe jî berxwedanên li hember teqîbên bêeman yê bi salan domdirêj distînin. Eşîrtî jibo wan bûye amûra herî bingeîn ku liser lingan bimînin û heyîna xwe li her deverî bidomînin.

3- Beşên aryên ku li Hind û Ewropa belavbûne (belavbûn ne fîzîkî ye, bêhtir çandî ye) heyînen paleolîtîk (dema kevin ya keviran, dema hovî) hildiweşînin, şoreşa çandinî û saziyên neolîtîk pêşvedibin. Armanç ne civaka biçîn e, armanç heyînen civakî yê paşvetir û hoveber in. BZ di navbera salên 2000 û 1000an de, di bingeha çanda Aryen de, jî Okyanûsa Mezin heta bi okyanûsa Atlas, çêbûnen şaristanî yê komên nijadên Çîn, Hind, Tirk, û Kelt, bi bandora Sumer û Misrê re derdikevin holê û şeweyekî digirin. Pêla belavbûna duyemîn dest pêdike. Di çêbûna şaristaniyên Asya û Ewropa de, rola livdariya (bizavdarî) komên Aryen yê etnîk ku şoreş û çanda çandiniyê temsîl dikan, gelekî mezin e.

4- Vê demê di tevayî cihanê de, hêza herî mezin êmperatoriya Babîl-Asûr yê ku heyînen serdest yê qebîleyên Amorît wê temsîl dikan e, Amorît jî Mezopotamya jêrîn ber bi bakur belavbûne, çanda Sumer xûnifandine, zimanê Akad pêşvebirine û fermî kirine. Ev dem BZ di salên 2000an de destpêdike, bi damezrandina êmperatoriya Pers re, di salên BZ 550an de hebûna xwe ya siyasî wînda dike. Ev dem bi serdestiya êmperatoriya Asûr ya li Rojhilata Navîn ku gelekî bixwîn tê naskirin. Di paqijkirina heyînen etnîk de, ceribandînen nijadkujî (jenosîd) yekem car, di belgeyên Asûr de bi awayekî şanazî (iftîxar) tê ravekirin. Ji alîkî ve tevgerên azadiyê yê bi pêşewatiya pêxemberên komên semîtîk ku di bin şewegirtina olên yek xweda de û bi kalîkîtiya Hz Brahîm pêşveçûbûn, jî aliyê din ve berxwedanên federasyonên qebîleyan yê jî koka Aryen ku bi hişyarî û pêşewatiya eşîrtî ve girêdayî, di warê pêşveçûnên dîrokî de, roleke mezin lîstine.

Di encamê de, çêbûnen bîrdoziyî yê di bin şewegirtina olên yek xweda de û pêşveçûnên siyasî yê bi şeweya federasyonên qebîleyan ku li hember emperyalîzma koledar pêşketin, herçiqas ku navendên koledariya klasîk ne hilweşandibin û ne gihabine sazûmana şaristaniya feodal jî, di warê hejandin û şewegirtinên wê yê nû de, roleke diyarker lîstine. Heyîna van berxwedanan, di nermbûna sazûmanê û nûsazîbûnên wê de, mîsoger e. Girîngiya van livdariyan, di warê pêşketina normên rizgarî û azadî ya di heyîna hişyarî û giyana mirovan de, ne piçûk e. Jibo wan komên tene rêvebirin û stembar (bindest) ku ew kirine weke amûrekê wek siyê, pêvajoya eşê wan bîne ziman, serîhildan û lêgerîna yekî rizgarker destpêkiriye. Ev dema lêgerîneke mezin e. Li erdnîgariya Rojhilata Navîn, digel heyînen etnîk, ev merhaleya derketina holê ya heyînen razdar (mîstîk,

nependî) e. Ev şêweyekî çêbûna civakî ya nû ye, ev veguherîneke civakî ye ku li heyîna etnîk nanêrin û hev û din di bingeha terîqatên veşartî de weke bira dibînin. Herwiha ji bilî civaka koledar ya biçîn û civaka etnîk, şêwegirtineke civakî ya sêyemîn tevlî meşa mirovatîyê dibe. Dîrok bi liva van komên civakî, bi şêweyekî "dîroka ol û mezheban" hetîye girtin. Gotina 'dîroka olan' ku vê dawiyê dikeve rewşeke bingehîn ya ravekirinê, berhema van pêşveçûna ye. ædî dîroka Rojhilata Navîn, seranser dîroka şerê ol û mezheba ye ku di serdema navîn de, digihe pîleya bandev (navser). Veguherînên ku ev kom dibûrînin, di heman demê de, pêşenumûneya komên bi wesfê felsefî ne. Lêgerîn hêdî hêdî ji qada ol derbasî qada felsefê dibin. Çawa pêşveçûnên olî, bi taybet yên olên yek xweda, di ber sînga mîtolojiyê de pêşketibin, nêzîkbûnên felsefî jî, di zemîna daringî ya şaristaniyê de û bi bandora pêşveçûnên komên nependî yên bi liva hişyarî, derdikevine holê. Pêdiviya sazûmana koledar ya bi nûsaziyan û pêşveçûnên di bîrûbawerî û giyaniya mirovan de, zorê li derbasbûyina serdema felsefê ya di şêweya raman de, dike.

3- Pêşveçûna Ramana Felsefî û Şaristanî (Dîroka kurt ya bîrûbawerî û pêşveçûnên giyanî)

Pêşveçûnên di bîrûbawerîya mirov de, bi asta civakî re têkildar in. Bêşik jibo pêşveçûnên mêtîkî yê di cureyê mirov de, ev yek pêşemerc e ku gewriya mirov were asteyeke fîzyolojîk. Lê ev jî bi gelek tecrûbeyan hatiye rastkirin, çiqas ku raman û organên deng pêşve biçîn jî, heta ku neyên rewşa heyîna civakî, yê bêtêr bimînîn û ji prîmateke pêşveçûyî zêdetir, derbasî wî alî nabin. Derbasbûyina zimên ya ji raman û dangan, bi mîsogerî bi jiyana civakî pêşvedîçe û qevastinên wesifdar pêktîne. Di vî warî de, tiştên ku bûye nesîbê bavikên (klan) ku şêweya civakê yên herî teng in, Çend nîgaş (îmge) yên bisînor û anîna van ya zimên bi şêweya jest, mîmîk û îşaretan e. Şêweya zimên ya pêşî bi îşaretan e. Hê gelekî dûr e ku jest û mîmîk derbasî sazûmana deng ya di rewşa peyvên de bibe. Ev tê zanîn, çiqas ku hêz û jênegerîya jiyana civakî xwe dide çespandin û çiqas ku pratîkbûn di mêtî de vedide, Ji ramanê ber bi zimên ve pêşveçûnek bilez dibe. Ev pêşveçûn di dîroka mirovatîyê de, şoreşa herî mezin û ya yekemîn e. "Heyîna çandî" ya berhema pêşveçûnên civakî ku em dikarin bibêjin hemû tişt e, piştî çêbûnên fîzîk, rîwek û cîhana ajalan, weke çêbûneke çaremîn çiqas ku mîsogerî bi dest xist, jibo raman û zimên mîna zemîneke daringî, dibe bingeh.

Di vê çêbûnê de, pêşveçûna raman û zimên ne eşkerebûneke pasîf e. Meşandina jiyana civakî, di rewşeke girêdana diyalektîk ya hişk de, spartî vê şoreşa yekemîn e. Diyalektîka civakî, yê ji aliyê ragihandina di navbera heyîna wî ya çandî û hêza ramana wî de were diyarkirin, wê weke zagonên pêşveçûnê hikim îfade bike, bi pratîkbûnê nûjen bibe û berdewam bike. Dema vê hêzê nîşan bide, hêza civakî ya herî nêzîk ku hikim û zagon bikartîne, yê di nav de bi hele û ji hev belav bibe. Ev zagoneke pêşveçûnê ya gelemperî, jibo hemû civakan e, bi 'diyalektîka daringperestî (materyalîzm)' tê binavkirin. Di vê çarçovê de, tê dîtîn ku pêşveçûnên bîrûbawerîya mirovan, di merhaleya çend pêşveçûnan de derbasdibe.

a- Şêweya ramanê ya herî domdirêj ku spartî heyîna bîrûbawerîyê, dema ku mirovan her tişt weke xwe zindî û heyînên bi raman didîtin e. Di wê bawerîyê de ne ku fîzîkî, rîwekî û ajalî her tiştên li xwezayê, heyînek zindî û bi raman e. Ev mijara bawerîyan dema ku tiştêkî ne zindî be dibe "fetîşîzm", di merhaleya pêşî de hemû heyînan digire nav xwe û heta bigiyanwerîtiyê, "anîmîzm" ê berfireh dibe. Ev şêweya ramanê bi hemû civakên hoveber re heye, bi kurtî were gotin, xweza zindî tê ramandin. Eslê wê ev ramana mirovan ya pêşî, ne ewqasî jî çewt e, lê jibo ku ji ber xwe ve, ji her tiştî re gelemperî kirine, ketine nava çewtiyê mezin. Zindîti bêtîk pêşveçûna xwezayî, encameke organîzasyonê tevlîhev ya daringa di bin mercên diyar de ye. Bi vê wateyê mirov dibe doringeke ku dirame. Lêbelê qezenckirina wî ya organîzasyonê, pêvajoyeke gelekî dirêj e ku ji daringa herî piçûk ya bi enerjî kuars, ji kuarsan galaksî, ji galaksiyan stêrk, ji stêrkan gerstêrk, ji gerstêrkan atmosferên berbihev, av û perçeyên bejê çêbûne, ji wir heta bi candarên yek şane (hucre) û heta bi cîhana rîwek û ajalan, piştî dîroka peresaneke mezin, heta bi çêbûna bûyera civakê, bi pêşveçûna bi mîlyaran sal, heta bi berhema dawî heyîna ku dirame "mirov", digire nav xwe. Bi vê wateyê, mirov doringeke ku gihaye hêza zindîbûn û ramanê. Nayê gotin ku mirov doringe, lêbelê tê gotin ku mirov doringeke ku dikare birame. Herwiha mirovên pêşî çewt naramin, ligor ku ew zindî ye û dikare birame, hêmana wî ku her tiştî weke xwe bibîne ye. Ev hêmana bi awayekî ku xwe diguherîne berdewam dike. Ev hêmana ku em dikarin bibêjin hêmana "eznavendparêzî", bi cureyên "bavikîti" (klantî), "qebîletî", "şêfîti", "xanedantî", "dewletperestî", "xwedîtiya taybet", "olperestî" "her cureyê takekesîti" berdewam dike.

Vê ramana bi vî şêweyî, "şamanîzm" û sêrebendî derandiye holê. Bingeha şamanîzm û sêrebendiyê, ceribandîna ku bûyer û qewaman, birêkûpêkiyên rîtuêl (cureyek îbadetê, merasim) ligor daxwaza

xwe têxin rewşeke din e. Zanistî ya ku guherînan ligor zagonên têkberan (tiştan) pêktîne, şaman û sêrebend dixwazin van guherînan bi dilsafiyeke zarokatî, bi listikên ku pêşexistine, pêkbînin. Sepandina şeweya vê ramane, dibe ku bi we tewş (fişar) were. Lêbelê jiberku vîna guherîne datîne holê, merhaleyêke pêşveçûnê ya mezin e. Liser têkiliya di navbera bûyeran de dirame, destekarî (mudaxile) lê dike û bawer dike ku yê encamê jê bigire. Dema em bi bînin ku şaman û sêrebend di nav civaka xwe de, yê herî bi ramana sift û bi giyanêke pêşketî, kesên ku di pratîka xwe de bi taybetî di nêçîr û danehevê de serkeftî bin, emê fêhm bikin bê çawa xwedî erkeke (mîsyon) zor û girîng in. Em ne ligor xwe, ligora şert û mercên giran yê wê demê ku dibûne hêviyek û herwiha civak liser lingan digirtin, wateyêke bidinê, emê bibînin ku peywîreke girîng anîne cîh. Bi awayekî din em bibêjin ev rola zanist û pratisyenên yekemîn dilîzin.

Taybetiya vê şeweya ramanê ev e ku hê negihaye merhaleyê xwedê û herwiha ya ol. Ev şewê, ji sedî nod û heşt temenê mirovatîyê yê di bin bîrûbawerî, raman û sazûmana qebîleyên hoveber de, digire û olê yekem teşkil dike. Di vî babetî de, dikare were nîrxandin ku şamanîzm û sêrebendî, di warê pêşveçûna ramanê de saziya bi rêxistinî ya yekemîn e. Di nûkirin û meşandina van saziyan de, rola pêşevaniyê dike. Çiqas ku çûye, şamanan di nav civaka xwe de, weke malbateke li pêş bi qedr û qîmet dibin, ev rol, dema ku derbasî sazûmana qebîleyan ya bevkanî yan ya daykanî dibin jî, faktorekî li pêş e. Asta civakê ya wekhevî û mercên hilberîne, derfetê nade serdestiya mêr an jî ya jinê. Di jiyana xwe de tişt, rîwek û ajalên ku zêde pêre têkildar in, nîşanedikin (sembolîze). Ev navlêkirina ku dibe paşnav û nasnameya qebîlê an jî bavik, bi totem tê binavkirin. Giramgirî û baweriya ku ji totem re dikin, îfadeya sembol e ku bi kesayetiya xwe û bi kalikên xwe ve girêdayî ne. Bi vê yekê bi nasnameya xwe û bi hêza xwe dihisin. Di heyina baweriya vê dema dirêj de, baweriyê tînin ku di her tiştî de bi gelemperî zindîtî heye, di pratîkê de tişt, rîwek û ajalên ku têkiliya xwe bi wan re çêdikin pîrozwer dibînin û vê bi "mana" binavdikin. Mana bi awayekî din, di tiştê ku liser di xebitin de, nîrxê ku bi keda wan ketiyê de ye. Vê bi totem nîşanedikin, lê xwedî derdikevin û jê re îbadetê dikin. Piştî totem, derbasî olên pir xweda dibin.

b- Şoreşa çandinî û kedîkirinê, di şeweya ramanê de jî pêngavên mezin diavêje. Tiştên derdikevin pêş, ax, rîwekên tene çandin, darên fêkî didin û ajalên kedî ku bi her awayî ji wan tê îstîfadekirin. Bala mirovan, herî zêde ber bi van heyînen ku derfetên jiyane didine wan, werdigere. Yê bixwazin wan nas bikin, yê kedê bidin, yê bi evrînin (pîroz bikin), yê baweriya xwe bi taybetiyên wan yê derasayî (harîkulade) bînin. Jibo ku çandiniyê bikin û ajalên xwedî bikin, têdigihîjin ku demsal, roj û baran pêdiviyên herî girîng in, herwiha yê bêhtir bi van ve girêdayî bin û yê wan bievînin. Ev bûyerên yê ku wateyê dide heyina civaka wan û dewlemendiyê tevî dike. Ji ber girîngiya van a jiyani, ev bûyer yê navên taybet bigirin û yê wan bikin xweda. Ji totem derbasbûyina xwedê, bi serdeme neolîtîk ve girêdayî ye û di raman û baweriyê de, merhaleyêke mezin e. Demêke berhemdar e ku di bîrûbaweriya mirovan de xweza xweştir tê naskirin, bi taybetiyên wê têdigihîjin û bi zanî dibin.

Beşên zimanan ku hatina dema me ya îroyîn, berhemên vê merhaleyê ne. Li Erebîstan û Afrîka Bakur beşa zimanê Semîtik, ji Hindê heta bi Ewropa û Amrîka beşa êndo-Ewropa yê ji koka Aryen, li bakurê vê xete, beşa Fîn-öygûr an jî oral-Altay, beşa Kafkas-Bask-Derya Spî, bi giranî di vê demê de çêbûne. Jiberku Aryen şoreşa çand û çandiniyê kiriye, beşa herî mezin û bi bandor e. Têgînên bîngeha ramanê ji koka xwe ve çiqas ku bi jiyana spartî axê ve girêdayî be, di vê beşa zimên de nav standine.

Jiberku hêza sereke ya di dema çandinî û ajaldarî de, ya jinê ye, di pêşveçûna raman û zimên de şeweyekî jinwarî (jinane) giraniya xwe datîne. Hê jî di gelek zimanan de, pêşgir û paşgir tînin bikaranîn. Gihandina rîwekan, kedîkirina ajalên, jiberku bi pratîk û ramana jinê ve girêdayî ne, "Dayika xwedawend" weke ku hemû anîbine cîhanê, biqedir dibe. Vê demê jin xwedawendê serdest û bi qedre, di vî babetî de, li hemû cîwarên neolîtîk yê wê demê, peykerê jinan yê ku tene dîtin, vê rastiye li ber çavan radixe. Ew weke axa biber, dayika xwedawend ku dizê ye. Jin pîrozweriyêke mezin werdigire, olê totem yê kevin dike pilana duyemîn, perestîşa (kult) xwe serdest dike, nîrxên rojê, hevv û stêrkan pê tê dayin. Di zmanê aryên de, "Stark" him xweda ye, him mezinahiya pîroz e, him jî tê wateya stêrkê. Têgînbûna star ya biserê xwe, rastiya ol ya vê demê dide xuyakirin. Ji lawiran jiberku ganêr (boxe), çêlek, bizin û beraz bi qedir in, di warê xwedakirinê de (yezdankirin) timî nemîş (figûr) ên wan tînin bikaranîn. Dera ku xwedawend lê hene, ew jî hene, bi wan re hevpar in. Ganêr bi navê Apîs, xwedayekî Misrê yê herî girîng e. Dîk û bizin jî heyînen pîroz in. Hê jî li Hindîstanê, dest nadine çêlekan.

Rîwekên weke genim û garis, darên weke berû û mêwan jî mîna çavkaniyên xwedayî û pîrozwer tînin. Hêza wateyê ku di olên berê de berfireh bû, kêr dibe, lêbelê dibine ser heyînen ku bi

girîngiya xwe li pêş tîn, gelek toteman dadixin xwedahiya ku bi hijmarê bisînor kirin e, heyîna herî mezin sembola hêza zayînê dayika xwedawend e. Li herêman navên xwedawenda jî derdikevine holê. Di derbareyî mêr de peykerek jî nayê dîtin. Mêr hê bêhtir di dawa xwedawendê de, weke law yan jî heval wateyê dibîne. Dumendên di mîtolojiyê de, êştâr-Dûmûzî, ësîs-Osîrîs, Afrodît-Adonîs, Kîbele-Attîs ku çanda xwedawendê ya ji çavkaniya serdema neolîtîk temsîl dikin, di bingeha çanda hemû mirovatiyê de jî, xwedî wateyekê ne. Li vir mijara herî girîng ev e ku demeke berî dirokê gelekî dirêj, di bin pêşengî û pîroziya jinê de, mêr mîna zarokên sernerm û girêdayî jinê, jiya ye.

c- Şoreşa bajêr li qasî di heyîna civakê de guherîn kirine, di heyîna ramanê de jî guherînen bingehîn pêkanîne. Nûjeniya herî mezin, têngihîştina ku hîkariyê rasterast di navbera zagonên pêvajoya xwezayî û hêzên civakî de, tine ye. Asta bîrûbaweriyekê hatiye bi destxistin ku livbaziye (çalakî) takekesî, bandorê li pêvajoyên xwezayî nakin. ædî şamanîzm û sêrebendiyê girîngiya xwe ya kevin wînda kirine. Hêmana olî ya nû, perestgeha ku bajar li dorê hatiye avakirin û rahîbê wê ye. Dibe ku hîkariyên şamanîst û sêrebend bi rahîb re gihabine hev. Jibo civaka ku tevlihev bûye, sazûmaneke nû û bidisiplîn divê. Jibo sazûmana ku her demê pîrozwer hatiye dîtin, çavkaniyê pîroziyê ya nû pêdivî ye. Rahîbê Sumer ev sazûman di ezmanê Mezopotamya ya zelal û biliv de dîtîye. Li ezmên sazûmaneke newaze û bi şeml berdeyam dike. Ligor ku sazûmana herî pîroz ya ezmên e, li erdê jî dive ku ev sazûman were bikaranîn. Divê ku sazûmana beşen (cisim) yên ezmên, liser rûyê erdê jî sazûmana mirovan re bibe bingeh. Li hember vê yekê qet nayê derketin û qet nayê ramandin. Jibo vê baweriyekî bihêz û gelekî cidî jî divê. Anku hijmara xwedayan wê kêmbibe û ewê ezmên û heyînen wê diyar bikin. Di bîrûbawerîya mirov de, demeke têngîkirinê ya li teraza vê dihile. Ramana mirov bihêz bûye. Şeweya hilberînê ya nû, rê li ber berhema zêde vekirîye. Jibo yên ku dema xwe bi sêwiranên hişmendî diborînin re, bi hêsanî dikarin parekê veqetînin. Rahîben ku di vê şoreşê de pêşevaniyê dikin, vê hilberîna zêde li perestgehan dikin embaran û ev yek ewleyîyekê (pêbawerî) bi xwe re tine. Hilberîna zêde, jibo çîna nû ya ku li dora rahîb gihayî hev jî, ewleyîyê mezin e. Ev çîn yê rêvebir be û çîqa wêde here yê bibe xwedî milk. Diyarbûna wî ya bîrdoziyî, nûnertiya (temsîlkar) hêzên xwedayî li ezmên ya liser rûyê erdê ye. Zîggûrat mîna biryargeheke (qerargeh) ku yekîtiya xwedayan û nûnerên wan digihîne hev e. Li qata herî jor rahîb bi tiştên xwedayî re têkildar e, ji beşên ezmên kehanetan derdixe, jibo beniyên li qata jêr jî, hikmên xwedayî yên ku bi teqezî (mutleqa) bînine cîh, rave dike û îbadetê bi wan dide kirin. Şoreşa olî ya nû di biryargehê de bi newazeyî biserdikeve. Li qasî ku hêzên xwezayî temsîl bikin, cîhana xwedayan ya ku civakê bi navê wan birêvedibin, bi awayekî tekûz hatiye damezrandin.

Çîna serdest, piştî senaryo ya wê hate nivîsîn û şanoya wê mîna îbadetê pîroz, li hemû bîrûbawerî û giyanan hate nîgarkirin (nexşandin), êdî dikarîbû bi rûçîkê xwedayî, xwe nîşanî suxrevanên xwe yên ku kirine benî, bide. Liqasî dirûtiya xwe, mekanîzma ol û ramana nû ku bi bawerkirin û danbawerkirinê hemû giyan dîl girtine, weke demsalan hatine dubarekirin bi guhertin û veguherînan, hatine heta bi roja me. Tiştên ku di bingeha bêhêziya mirovên Rojhilata Navîn de razahî, bawerîya vê sazûmanê û rastiya gerdîşa (tore) civakî ye. Hûn navê çî olî û çî ramanê jî lê bikin, ev çerxa bawerî û ramana sazûmanê, ku bingeha wê bi awayekî zexim hatiye danîn, mîna du ferên aşên kevin, hê jî giyana me û bîrûbawerîya me dihêre.

Şeweya raman û bawerîya Sumer, sazûmaneke wisaye ku liser bîrûbawerî û giyana mirovatiyê, neyekser jî be hê bandoreke xwe ya bihêz heye. Sumerîyan gelek şeweyên ol û ramanan guhertine, li şert û mercên xwe anîne û cihêreng kirine. Dîsa ligor demê ev çavkaniyê bingeh e ku ji ramana felsefî heta bigihe ramana zanistî, bi xebata girêdana bingehîn ya diyalektîkê ya di navbera wan de, veguherînen wiha dane destpêkirin.

Sumerîyan li heyîna raman û rewîştên mirov, asayêke (norm) sazûmanê ya gelekî bihêz bi cîhkirine. Ev qalibekî sazûmanêye ku di hêza wan sazûmanê berê yên şaristanî pêkanîbûn de ye. Jiberku bi nivîsê, bi wêjevanan û bi hêz sazîbûna vê daye meşandin, serdestiyêke bêhempa pêkaniye. Bi huner re, bi taybetî bi muzîkê re yekîtiyêke bi aheng damezrandiye, bûye xwedî şeweyekê ku heta weke îro ahenga di navbera jîyan û muzîkê de, herî bi hêz îfade kiriye. Çavkaniya sereke ya muzîka olî ye jî.

Aliyê vê şeweya raman û baweriyê ya herî xeter, taybetiya wê ya dogmatîk ku herî bi hêz e. Ev dogmatîzma ku liser bîrûbawerîya mirov hatiye sazîkirin, gelek veguherîn derbaskirine û di bingeha hemû dogmatîkên ku hatine heta bi dema me de, cîh girtiye. Ev şeweya raman û baweriyê ku di rûniştina koletiyê û sazîbûna wê de, roleke girîng listiye, bi gotîneke din, di bin bandora sepandin û têngîna olî de, ji zanîne bilindbûna zanistiyê û felsefeyê zor e. Di dîroka şaristaniyê de, rêzîkek wiha heye: çanda ku herî bêhtir şeweya civakî pêşvebirî, çanda ku li hember guherîne liberxwedide ye û çanda xwe ya derûnî bi hêsanî bernade. Rojhilata Navîn êşa vê rêzîkê dikişîne. Her çiqas ev rastiyeke

be, jiberku Ewrûpa şeweya şaristaniya Rojhilata navîn ne jiya ye, di warê şaristaniya kapîtalîst de bi awayekî hîkarîker pêşketiye, berevajî vê yekê jî ewqasî rast e. Anku bandora şaristaniya koledar ya liser giyan û bîrûbaweriyê, xûnifandin û sazîbûna giyan û bîrûbaweriyaya kapîtalîzmê, zor dike. Ev weke ku kat (tirh) ên nû ji kokê neçin, lê katbûneke nû xwe liser kokê bigirin û koka xwe bernedin bin erdê. Jibo çanda li herêma Heyva Berhemdar ku Şoreşa Çandinî derandibû holê, ev mijareke ku bandorên gelekî kur danîne. Ev herêm hê jî di bin bandor, xûy û kevneşopiyên çanda neolîtîk de dijî.

Lêbelê ev jî mîsoger e ku çawa şoreşa çandinî û gund nebe, şoreşa bajêr û şaristaniya koledar wê ne mimkun be, dema ku binyata civaka biçîn, bajar û heyîna hêmanên bîrdoziyî yên şaristaniya koledar jî nebin, nagihin şeweya ramana felsefî. Ji aliyê xabîtîna diyalektîkê ve, bi têkoşîna şeweya felsefî şeweya ramanê ku yê hile, şeweya koledar e. Li vir nakokiya felsefê ne bi çanda dema neolîtîk re ye, bi çanda civaka biçîn re ye. Dîsa pêdiviya dema vala û xweşiya ji berhemderiya zêde ya ku civaka bi çîna felsefê rê li ber vekirî, dikare di nava sazûmana koledar de bibîne. Yê cemsêra (qutb) xwe ya dij û hêza xwe ya nakok bi nirx û zagonên sazûmana koledar re li hev bide xistin û pêşvebibe. **d-** Ramana felsefî, hewldana ravekirina rastiyên xweza û civakê yên bêyî mîtoloji, ol û dogma ye. Hatina bîrûbaweriyaya mirov ya vî astî, berhema pêşveçûna civakî ye. Wêrekiya (cesaret) bîrûbaweriyaya takekes ku li ramana felsefî dike, pêngaveke herî mezin ya azadiyê ye. Mirov yekem car e di derbarê xwe de, daxûyanîyê dide. Ev nêzîkbûn bixwe, peyana (teşebus) perçekirina dogmayên bicîhbûyî ye. Çawa ku olê yek xweda, pûtên totemîk û lijneya xwedayan derbaskir û di binyata bîrûbaweriyê de rê li ber guherînan vekiriye, ramana felsefî jî çespandiye ku bêyî xwedê yan jî xwedê tevî vî karî nebe jî, ev dikare were jiyandin, herwihe şoreşa herî mezin ya dîroka ramanê pêktîne. Bîrûbaweriyaya civakî ya spartî mîtoloji û dogmayên olî, baweriyeye wisaye ku yan bi kolebûnê yan jî bi teqezî xwe bi hinekan bigire, yê karibe bijî. Di binyata vê bîrûbaweriyê de, dîrketin yan jî derkirina ji dogma, bawerî û şeweya îbadetê, bi mirinê û dawîlêhatinê re yek e. Ev cezayê herî mezin e. Bihêzî û bêhêziya bîrdoziya dogmatîkê, di vê taybetiya wê de ye. Takekes weke berbendekî (tabî) civakê, bê pirs û pirsiyarî girê dide. Di sazîbûneke wiha ya bîrdoziyî de, civak, bi hinek nîşane û nirxên ku baweriyaya xwe bi wan tîne û bi pêwana (wesiteya) hêza ku li van bardike, dikare xwe bihêz his bike. Lê di pêvajoya qeyranekê de, jiberku bîrûbaweriyeye wê ya serbixwe tine û nikare alternatîfekê derîne holê, ev civak yan wê hilweşe, yan wê bibe civakekî gelekî li paş, yan jî wê ji aliyê hêzeke serdest ve were pişavkirin (asîmîlekirin).

Binyata bîrûbaweriyaya dogmatîk ya bi civakên Rojhilata Navîn re, ev encam hemû li ber çavan raxistine. Mînak, Civaka Sumer digel wê heyîna xwe ya derasayî, di pêvajoya qeyranê de, li hember qebûleyên çol û çiyeyên sivik (besît) têkçûye. Encama Misrê jî mîna ya Sumer bûye. Digel ku bîngeheke Grek û Roma ya felsefê heye jî, ji ber bîrûbaweriyaya civaka koledar ku rê li ber dîlîtiyê vekiriye, ji hev de ketine, hilweşiyane û ji hev belavbûne. Bêşik di vê de, têkiliyên xwedaniya (xwedîtî) koledar ya liser şeweya hilberînê, rola diyarker dilîze. Lê saziya bîrdoziyî ya serdestî tevaya civakê, bi berxwedaneke ku gihaye merhaleyekê, nehiştiye ku ji rewşê derkeve der. Ev di saziya bîrdoziyî de, ne derketin e, ne çareserî ye û ji hev belavbûn e. Ji ber vê yekê, saziya dogmatîk ku serdestî ramanê ye, jibo civakan weke bîrdoziyeye bêçareserî rola xwe dilîze. Koletiya serdema pêşî ku gelekî domdirêj bûye jî, ji ber serdestiya ramana dogmatîk ya liser bîrdoziya civakê ye. Ji ber vê yekê derketina pêxemberan ku ewqasî bi nirx tînin û sedema ku yekî ji wan bi hewldaneke şoreşgerî re weke hev digirin, li dijderketina wan ya li hember van dogma û qûlên ku di heyîna wan de vikirine. Şoreşa Hz Brahîm, bi şikandina pûtekî ve girêdayî ye, armanca Mûhamed ya yekem, berê xwe dide pûtên Kabeyê, Mûsa hêrsa xwe ya herî mezin, nîşanî "yên îbadetê ji golika zêrîn re dikin" dide, ev ligor dema xwe kiryarên girîng û diyarker in. Armanckirina dogmayê û parçekirina wê, jibo wan deman tê wateya şoreşê.

Qeyran û bêçareseriyaya li navendên çêbûna şaristaniya koledar, rê li ber dewletên piçûk yên derdor ku nermtir û hişmendiyaya etnîkî bihêztir vedike, ji aliyê din ve jî hewl dide ku di pîlana bîrdoziyî de, derketinekê ji olên yek xweda û lêgerînên razdar (mîstîk) re bibîne. Bi taybetî felsefe, di dorhêla ku komên razdar zêde dibin de, ji pêşveçûnê re hê bikêrhatîtir e. Ev komên ku em dikarin bibêjin, biveşartî serî li bîrdoziya koledarî ya fermî hildane, bêhtir xwedî derfetên ramana azad in. Ji xwedîbûna dogmayên diyar zêdetir, di nava lêgerîneke sazûmana nirxan de ne ku bîrûbawerî û giyana wan têr bike û tirsên wan tine bike. Evan cureyek terîqetên serdema pêşî ne.

Pêkereke (faktor) din ya ku rê li ber ramana felsefî vekiriye, pêşveçûna amûrên hilberînê ne. Esasê wê şaristaniyên koledar yên pêşî, liser serdema tûncê bilind bûne. Xwedaniya ku li ser madenên tûncê hatiya kirin, di warê çêkirina amûrên çandinî, pişeyî û leşkerî de, derfeteke bihêzbûnê ya girsegir (muezem) kiriye destê çîna koledar. Ji derî navendê, heyîna van amûran ya bi kêmayî û

bisînor, heyînên etnîk bêhêz dihiştin, çiqas ku ev amûr bi dest dixistin, di berxwedanên xwe de ewqasî biserdiketin. Lêbelê BZ ji salên 1000an û pêde, teknîka hesin ku berfireh bûyî, rê li ber bandoreke demokratî, û kartêkirina ku bi dest qismê civakê yên hejar jî bikeve, vedike. Bi teknîka hesin, hilberîn û xweparastin giha astaya herî pêş. Ev dihat wateya zêdebûn û ewlekariyeke mezin. Ewlekarî û zêdebûnê rê li ber xweşî û dema vala vedikir. Felsefe jî, jixwe li zemîneke civakê ya wisa digere. Klasîkên felsefî yên mezin BZ di salên 5 û 6an de, ne ji berxwe ve derketine holê, ev yek bi perçebûna bîrdoziya civaka koledar ya serdema pêşî û şikandina gemerdana (yekdest) liser amûrên hilberînê yên bingeh ve girêdayî ye. Dema dawî ya serdema pêşî (navbera BZ sedesala 5an û PZ sedesala 5an) ku em dikarin bibêjin "serdema klasîk" ya sazûmana koledar, di heman demê de tê wateya "serdema felsefê" ku feylesofên mezin derketine holê, doktrînen xwe pêşvebirine û bisazîkirine.

Heger ji feylesofên vê demê, em yên ku liser navên xwe dibistan hiştine nas bikin, emê wî çaxî bêhtir bizanibin, bê jibo mirovatiyê merhaleya bîrûbaweriya nû û ya giyanê tê çî wateyê.

1- Zerdeşt û Zerdeştî: Herçiqas ku Zerdeşt weke pêxemberekî tê nixandî jî, Rawestina wî bêhtir nêzikî feylesofiyê ye. Tê texmînkirin ku di navbera BZ salên 1000 û sedesala 6an de jiya ye. Li bakurê rojavayî êranê, li dera ku şoreşa çandinî bihêz lê tê jiyandî, hatiye cihanê. Di pêleya evîne de, girêdayê aboriya çandiniyê ye. Em dikarin di navbera kesayetî û heyîna wî û hikariyên ku çanda neolîtîk derandine holê de, têtikiliyan çêbikin. Kedê, hilberînê û qezenca helal bingeh digire. Şînahiyê pîroz dike û parastina ajalana esas digire. Qurban û dehîkirina ajalana qedexa kiriye, di warê cotkariyê de ji hêza wan û ji şîr û tewaşê wan sûdwergirtin, bi têrayî dîtîye.

Zerdeşt, sazûmana baweriya Aryen ya hoveber, di nûsaziyeke bi bingeh re derbaskiriye. Ligor ku ji sazûmana sêbarebûna xwedê, pêvajoyeke sazûmana yek xweda daye destpêkirin, pêxember e. Lewra ew jî, weka Hz Brahîm ji ola pir xweda di lêgerîna ola yek xweda de ye. Hz Brahîm vê yekê di nava qebileyên Semîtîk de pêşdixe, Zerdeşt jî di nava qebileyên aryen de pêşvedibe. Ji xwedawendên Arya yên demê, êndra, Mîtra û Varûna, derbasî xwedayekî bi navê Ahûra Mazda dibe, herwiha li Anatolya, êran û Medya ber bi yek xwedayî ve gihaye merhaleyekê. Di warê çêbûna têtînen bihişt, dogeh, sirat, firîşte (milyaket), tebeqeyên ezmên, mehşer, dadgeha mezin û mêzîna qencî-xerabyê de, xwedî roleke mezin e. Nixên mezin bi jinê dide. Paqijî jî mijareke ku gelekî girîngiyê didiyê ye. Ew di vî babetî de, pêxemberê çandiniyê, qezenca helal, malbata dawênpak (bîfê), mala xweşik hatî rahêxistin û ji bilî xweparastinê yê li hemberî şîdetê ye.

Di bingeha feylesofiya wî de, hêmana diyalektîka ku bi sincperestiya (biexleqî) xwe, bi şeweya tekoşîna di navbera tarî û ronahî, qencî û xerabiyê de şeweya yekîti û hemberiya dijan, cîh digire. Yekem car mirov azadiya vîna xwe naskiriye. Naskirina azadiya vîna mirov, tê wateya ku heta wê rojê afirînerî tenê karê xwedê bû, êdî ev dibe karê mirovan jî. Afirîneriya takekesî ku derûniya ramana rojava ye, aliyê felsefeya Zerduşt ya herî girîng e. Bingehgirtina vîna azad, destpêka felsefê û redkirina têtîhîna benî (evd) ye. Doktrîna wî di vê xalê de, di navbera ol û felsefê de, di rewşeke derbasbûyî de ye. Ev tê wateyê mezin ku di navbera ol û felsefê de, rêveqetandina (terka rê) wan temsîl dike. Ligor lêkolînen ku hatine çêkirin, him di çêbûna felsefeya Rojhilat (Hind, Çîn) û him jî di ya Rojava de, roleke girîng listiye. Tê fêhmîkirin ku di kûrahiya vê çavkanîbûnê de, rola senteza çanda Sumer û ya Arya di astayêke bilind de ye. Ev welatê ku Medya, Zaxros û Toros bi geliyên berhemdar digihine hev, cîhê yekbûna şoreşa bajêr ya Sumer û şoreşa çandinî û gund ya neolîtîkê ye. Zerduşt li qasî ku sentezkerêkî vê mîrateyê ye, wê di astayekî bilind de vediguherîne û di nûsaziyeke mezin re derbasdike, him koletiya serdema pêşî nerm dike û dema serdema klasîk ya ku bêhtir mantiqî, dide destpêkirin, him jî vîna civaka çandiniyê azad dike û rêyekê ji felsefê re vedike.

Nêzikbûna herî rast ev e ku pêxemberiya ola yek xweda û feylesofiya vîna azad, li erdnîgariyê wî derbasî nava hev bûne, ev jî bi saya heyîna du çandên di dîrokê de herî kûr pêkhatiye. Ev yek ne tesaduf e ku yê herî têtîhiştîyê liser lêkolîn û siftbûna Zerdeşt, feylesofê mezin yê Alman Nîetzsche ye. Dema li çavkaniya vîna wînda û nixên mirûz yên Rojhilata Navîn û Mezopotamya were gerandin, vegera ber bi Zerdeşt ji meraqa zanistiyê zêdetir, gihîştina çavkaniya felsefeya civakeke azad û gihîştina têtîhîna sincê (exlaq) vejînkê e, tê wê wateyê jî ku kesayetiya xwe di dîrokê de jinûve keşf dike û rojaneyî dike.

2- Bûdîzm: Di dewleta rahîbên (Brahman) Hindê de, rola nûsazîparêzê (reformîst) herî mezin, Bûdha leyîstî ye. Ew mîna lawmîrekî (prens) vê sazûmanê ye. Dibe ku piştî gelek têtîkûn û windakirinan, bûbe şahidê şeweyekî jiyanê ku di nava gelek êş û azaran de derbasbûbe. Rewşa weke ku ji bihiştê ketibe dogehê, ew xistiye nava siftbûneke mezin. Vê tecrûbeyê, aliyên koledariya Brahman yên stemkar û encamên cudabûnên hişk yên çînî, bi awayekî hîkarîker nêşanî wî daye.

Sazûmana Kast ya Hindê, ewqasî hişk û stemkar e ku heta sedsala borî jî mirov qurban dikirin û hê jî di navbera Kastan de, taybetiyên çandên ji hev cuda diparêze (dihemîne). Şeweyekî civaka biçîn yê gelekî hişk û resen bi sed salan jiya ye. Jibo Bûdha were fêhmkirin, dive ku bandora vê civaka biçîn ya liser giyan û bîrûbaweriya mirov werine nixandin. Li aliyekî şeml û gewzgerî (kêfdarî), li aliyê din, mirovên li tebeqeyên herî jêr ku jibo qurbankirinê tî xweyîkirin, ji mirovan nayên hesêbê û tî firotin û kiryarî. Gelekî vekiriye ku ev sazûman, wê bibe çavkaniya gelek êş û trajediyan. Bûdha berhemê vê sazûmanê ye. Liqasî ku di felsefeya wî de cîh ji xwedê re nîne, xwezayê jî bingeh nagire. Têkildarî afirîner û afirandî nabe. Pirsgirêka ku li çareseriyê wê digere, rastiya cîhana biêş e, taybetiyên jiyana civakê yên biêş in. Ev doktrîna ku di bin navê Bûdîzmê de, yê li başûrê rojhilatî Asya bibe felsefeya jiyana civakeke girîng, ji aliyê taybetiyên bingehîn yên civakî ve, felsefeyêke sinc e (exlaq), nûsaziyeke sinc e.

Formulasyona wê ya bingehîn, wiha li ber çavan tê rahêxistin:

a- Cîhan, civak ji êşan tije ye.

b- Di çavkaniya êşan de, daxwazên tund, tirs û nezanî hene.

c- Rizgarbûna ji êşan mimkun e. Di vê hewldanê de pêleya herî bilind, gihîştina Nîrvana ye (xweda, bihişt, kêliya bextewariyê)

d- Rêya vê yekê Yoghî ye (Ronahîbûna bi zanîne, siftbûna hundirîn û jibo vê çend rêyên pêdivî û rêbaz)

Li vir tê xuyakirin ku weke mînakên din -Misir, Sumer- serdestiya hişk ya ku sazûmana Kast a Brahman, liser bîrûbawerî û giyana mirov damezrandî, dive ku were nermkirin. Pozberiya Bûdha ya bi Brahmanan re, bi vê ve girêdayî ye. Ev BZ di sedsalên 5 û 6an de, di rewşa xelegeke di pêvajoya nûsaziyên civakî yên ji Girek heta bi Çînê de ye. Li qasî ku di bandora Zerdest de maye, wî jî bandor li Rojhilat û li Rojava kiriye. Bi razdariyê (mîstîsîzm, tesewûf) re tîkiliyên wî yên xurt hene. Rêbazên weke zehmetkêşî, qutbûna ji daxwazan û jiyana bi serê xwe, pêdivî û tîgihîştina naskirina xweperstiya çîna serdest ya mêhtînger û bisînorkirina wê datîne holê. Tecrûbeyên jiyane yên bi vî rengî, nefse terbiye dike, bi rasteqînî çavdêriyê li teraza xwezayê dike û bi rêbaza bestlêhatinê (îlhamgirtin) rê li ber hînbûnê vedike û wijdan rihet dike.

Doktrînen Bûdha, di şaristaniya koledar ya başûrê rojhilata Asyayê de, desthilatdariya Brahmanan ya xwedayî dişkîne û di damezrandina sazûmaneke mantiqî de, rolê dilîze. Dogmayan bisînor dike, aqil û wijdan dikişîne nav sazûmanê. Di dîroka mirovatiyê de, nûsazîparêzekî sinc (exlaq) yê mezin e.

3- Konfuçyûs: Li Çînê rola Bûdha leyîstî ye. Tê texmînkirin ku di heman demê de, BZ di sedsalên 5-6an de jiya ye. Bi hilweşîna monarşiya Çînê re, di van sedsalan de aloziyeke mezin derdikeve holê. Bîranînen dema kevin yên bi şeml (BZ 1500-700) liser sedemên hilweşînê û xerabûnê dide ramandin. Tê pirsîyarîkirin bê rêya xwezayî (Tao) çawa yê careke din were damezrandin. Di vê demê de, tîgîneke (zagon, rê, şerîat) ku herî tê bikaranîn, li Çînê "Tao", li Hindê "Dharma", li Sumer "Me", li Misrê "Maat" û li Grek peyvên "Moîra", tîne wateya taybetiyên şaristaniyê yên bingehîn. Jiyan bi teqezî divê ku weke van taybetiyên bingehîn be. Heger ku wiha nebe, sazûman yê were hilweşandin. Di van sedsalan de, rewşeke wiha tê jiyandin. Mînakên (paradîgma, rêze) pêşî ku bi zagonên bingehîn yên sazûmanê re nabine yek, tîne derbaskirin, lê jiberku mînakên nû nakevin dewse, di vê demê de çêkirina nûsaziyan mecbûr dibe. Bi dogmayên dewleta rahîban, sazûman nayê birêvebirin. Bersiva ku hatiye dayîn, bi şeweya dewletên piçûk (dema perçebûna ku em dikarin bêjin, begîtiyên koledar) komên razdar, û doktrînen mezin yên felsefê çêbûne. Para şaristaniya Çînê Konfuçyûs e.

Pênc hêmanên wî yên bingehîn ev in:

a- Pêwîst e ku rêvebir rêvebirîtiya xwe bike.

b- Divê jin ligor pêwîstiyên jinîtiyê bijî.

c- Divê law pêdiviyên girêdana bi bav ve bîne cîh.

d- Pêwîst e birayê piçûk ahengdarî birayê mezin be.

e- Divê ku herkes pêdiviyên hevaltîyê bi cîh bîne.

Ji nûsazîbûnê zêdetir dişibe restorasyonê (Ji nû ve damezrandina kevin) Bi Konfuçyûs re ol qet tine. Tenê pirsgirêka civak û ya sazûmana siyasî heye. Sazûmana civakî û ya siyasî ku xerabûne, yên çawa ji nû ve werin damezrandin? Li vir mijara ku liser tê rawestîn, zêdetir ji tîkiliyên di navbera saziyan de, tenê bi takekesan tê lebigandin. Anku di Konfuçyûstiyê de, pirsgirêka bingehîn sincî ye. Dixebitin ku bi damezrandina sazûmana sincî re, sazûmanê bidin rûniştandin. Di navbera takekesan de, bê rêzikên jiyane yên çawabin, bi awayekî kûr heta bi kitekita herî piçûk tê diyarkirin. Bandora vê bîrûbaweriyê hê jî liser civaka Çînê gelekî heye, ev yek di rewîştên çînê de, bi Jêhatîbûn û

xebatkariya wan xwe nîşan dide. Ev doktrîneke di rewîştî razdarî de ye û rola wê ya di pêşveçûna şaristaniyê de, nayê înkarkirin.

4- Sokrates û serdema felsefeya civakî

Koletiya serdema pêşîn ya Sumer û Misir, sînorên şaristaniyê ji rojhilatê Asya heta bi rojava berfireh kiribû. Sazûmana koledarî ya Grek û Roma, liser vê mîrateya dewlemend di pêvajoya bilindbûnê de bûn. Hesin weke bingeha teknîka hilberînê, tevkariyeke mezin li xweşiyê (geşdarî) dikir, rê li ber firehbûna çîna navîn vedikir, ragihandin û xwendin û nivîsandin zêde dibû. Mirov xwedî merc bûn ku xwe di nava ewleliyê de bibînin. Ji rojavayê Anatolya bajarê Sard heta bi paytexta emperetoriya êranê Persepolis, bi rihetî rêwingîtî dihate kirin. Dikarîbûn ji rahîbên Misir û Babîl, danehevên çandî û bîrdoziyî yên serdema pêşîn wergirin. Berevajî vê rewşê bû ku îro Rojhilat zanîn û çandê ji Rojava hîn dibê. Navendên zanist û çandê yên bilind, li Babîl û Misrê bûn. Yên ku bîrdozî kişandine Grek û Roma, rahîb û razdarên ku li van navendan hatibûne perwerdekirin bûn. Liqasî şêweya hilberîna Rojhilat, , berhemên xwe yên bîrdoziyî jî, BZ di nava salên 1000an de, bi sifî dijî, tecrûbeyên xwe yên zanistî vediguhêze, Sazûmana alfabeyê dida fêrkirin. Bi kurtî em bibêjin, du nîvgiravên Ewropa ku nêzikî Asya, Grek û Êtalya du pirên ku ev nîrx dikişandin bûn. Di rewşa du herêmên teze de ne ku destlênedayî ji şaristaniyê re vebûne.

Di asta bîrdoziyê de, mîtolojiya Misir û Sumer û sepandinên olî, ji vê kişandinê cuda nayên girtin û rola xwe ya pêşevaniyê didomînin. Teolojiya Grek, weke muştayeke mîtolojiya Sumer ku xerabûyî pêşvedîçe. Jiberku di bandora Misir, Fenîke û Girîtê de jî dimîne, Ji jiyandina bijartekerî (ekletîzm) rizgar nabe. Lêbelê jiberku navxweyî bike, di biçavbûnekê re derbasdike. Zeus tevde weke xwedayê Babîl Marduk e lê lasayî (teqlîd) Kronos Enkî dike. Ji xwe dema ku ji xala bingeh veguhastin destpêdike, êdî dawîya wê mîna goreya verişandî tê. Hemû têgînên mîtolojîk û olî yên neolîtîk û civaka biçîn ya koledar, bi guherandina nav û têgînan têne çîgêyîkirin. Heta BZ salên 1500an ji mîtolojiya Grek ku qet navê wê ne dihate dikirandin, mîtolojiyeke dewlemend tê pêşxistin. Ji nîrxên dargîngî bêtir, bidestxistina nîrxên menewî girîng e û ev yek tê pêkanîn. Mîtolojiya Grek ku di cîhanê de herî afirînê û bi şemlê tê pejirandin, çiqas ku wêde diçe tê fêhmîkirin ku di rewşa jêgirtiyê (kopî) mîtolojiya Sumer ya destê duyemîn û sêyemîn e. Van salên dawî jibo çespendina vê yekê, lêkolînên ku hatine kirin, gihane vê encamê. Jixwe ku dîrok herikîna çemê be, di van salan de beşeke xwe herikandiye vira, ev ax bi herikîna xwe ya bi coş, xweyî kiriye û çem û golikên piçûk yên li vir jî bi çemê sereke ve girêdane. Grek weke mîtolojiya xwe pêşveçûna felsefeyê jî, ji zanînan ku vî çemî dikişandin distîne û serdema xwe destpêdike.

Dema ku feylesofên Grek dest bi serdema felsefê kirin, BZ ji salên 10 000an ve ji çavkaniya çanda serdema neolîtîk ya ku li Mezopotamya pêl bi pêl belav bûyî, sîdwergirtine. Sazûmana ramana Rojava, vê rastiyê hêsan û ne girîng dide nîşandan. Rûçikê şaristaniya rojava ya emperyalîst, jibo ku bingehêke xwe ya zexm û rewşa çêbike, weke ku di hemû waran de pêktîne, di "eznavendperestiyê" bingeh digire. Dema ku çand û nîrxên şaristaniyê yên gelên din derkevin holê, wê were dîtin ku angaşten (îdia) wan ne di cîh de ne û yên vê bipejirînin ku di warê şaristaniyê de, tenê pêncsed salên dawiyê weke hêzeke pêşevaniyê tevî bûne. Grekî van têgîhînan şoven, hê di serê serdema klasîk de nîşan didin. Gelên ku li derveyî şaristaniya nîvgirava Grek, ligor wan encex temsîlkerê barbariyê bûn. Herweke dîrok nîşan dide, ew wê demê di rewşa "zaroka çavbirçî" de ne. Dema ku ji Misrê qesirbendî û çanda perestgehê, ji Fenîke alfabe û keştîvanî, ji Firîgyayê hesinkerî, ji Heyva Berhemdar hemû amûrên teknîkî yên şoreşa çandinî û ji Sumer mîtolojî û teolojiyê distîne, di demeke hoveber ya nîvkoçerî de dijiyan û hê holikên (qulûbe) kevirî jî çenekiribûn. Tevayê Ewropa hê di merhaleya civaka hovîtiyê de ye. Şewşandina dîrokê, sedema bingehîn ya di bin nêrînan çewt de ye û ev yek rê li ber bêmafîyên mezin vedike. Têgîhîna dîroka rast, jibo pêşxistina sazûmaneke navnetewî ya bidad, bingehêke jêner e.

Heger em ewlekariyê bi dadmendî û hiqûqa Ewropa bînin, berî her tiştî divê ku rast be û spartî têgîhîneke dîrokî ya dadmendî be.

Digel van rastiyên şaristaniyê, ev yek mîsoger e ku bi Grek re reseniyek û afirîneriyek pêşketiye. Nîvgirava Grek û cîranên wê, rojavayê Anatolya, başûrê Êtalya û li bakur Makedonya, di dîrokê de piştî Mezopotamya dikevine ceribandina şaristaniya herî mezin, êdî nêzîkbûnên mîtolojîk, teolojîk û bîrdoziyî ku hê berê ji şêweyên wan sîd werdigirtin, bi têrayî nabînin. Di vê de, ji cudabûna erdnîgarî û avhewayê girîngtir, bûyera ku rola xwe dilîze, bîrdoziya Sumer û him kevneşopiya Zerdest ya li Medya, him jî kevneşopiya Bûdha li Hindê, tên derbaskirin û şêweyêkî nêzikî felsefê tê qezenckirin. Feylesofên pêşî yên nîvgirava Grek Thales û Phytagoras gelek salên xwe li Misir û Mezopotamya diborînin. BZ di sedsala 6an de, digihîjin ku gelek nûjeniyên bikişînin û wan bideng

bikin. Weke ku di roja me de, ciwanên welatên paşdemayî, nêrînên şaristaniya Ewropa li welatê xwe belav dikin, ev berendamên feylesofiyê yên pêşî jî, ciwaniya xwe bi taybetî li Babîl li navenda çandê ya wê demê diborînin, di demên dirêj yên pratîkê re derbasdibin, zanînen ku di wê demê de herî pêşketî (di serî de matematîk û bijîşk) bingeha wan ya mîtolojîk û teolojîk bi awayekî tekûz fêrdibin, vedigerin û bingeha ramana serdema klasîk ya Grek dideynin.

Diyalektîka ramanê ya wê demê, xwedî belavbûneke bi vî rengî ye. Destpêkirina vê ramanê ya ji sifrê li aliyekî, ev zanîn di merhaleyê gihîştinê de, di nûsaziyan re derbasdibin, têne kişandin û resnekirin, di mercên berbiçav yên welat de bi awayekî afirîner têne sepanandin.

Merhaleyên ramanê yên ku di ronahîbûna Grek de rola xwe listine ev in:

a- Pêvajoya pêşî ku bi Homeros û Hesîodos destpêdike, dema ravekirina mîtolojî û teolojiya Grekê ye. Homeros hozanê mezin yê serdema klasîk e. Dema helbesta di BZ salên 1000an de, temsîl dike. Helbestên wî bi şeml in. Di vê dema dîrokê de, li Hindistanê "Vedayan", li Êran û Medya "Aveste", li Mezopotamya destana afirandinê ya Babîl "Enûma Elîş" li Kenan "Yahova, Elohîm" bi gotineke din "Tewrat" bi vegotinên nivîskî û devkî, dexmeya xwe li van salan dixin. Zimanê hemûyan zimanê helbestê ye. Ev destanên damezrandina konfederasyonên qebîle, eşîran û yên xanedanan tînin holê. Em dikarin bibêjin ev destanên qehremaniyê ne. Ev vî û daxwazên çînen bilind û kesan ku xwe niv xweda dibînin diyar dikin. Vegotinên Homeros, li erdnîgariya Rojhilata Navîn berî wî bi gelekî ku kevneşopîkiribûn, li merhaleya qehremaniya Grek disepîne, vegotina bi zimanekî destanî ye ku hêrîşên barbar yên ji BZ 1800an heta bi 1200an berdewamkirine, di encamê de bajarê dîrokî "Troya" ketiye û deryê Anatolya ji Aka û Doran re vebûye, tîne ziman. Girîngiya dîrokî ya bajarê Troya ku li qiraxa Tengava Çeneqela, alyê Anatolya, gelekî mezin e. Ji BZ salên 4000an ve bûye deriyek, nirxên çand û şaristaniya Mezopotamya û yên Anatolya di ser vira ve kişiyaye nîvgirava Grek û Balkanan. Grek û Balkanan xwedî dike û Troya serdemeke zêrîn dijî. Ji ber vê yekê ketina Troya dibe sedema berevajîbûna dîrokeke mezin û domdirêj. "Ëlyada" Homeros ku piştî Gilgamêş bi nav û deng, deh salên ji vê dîrokê, şerekî dawîya sala BZ 1200an, kiriye destan. Jiberku şer dişibe berxwedan û hêrîşên gelek gelan û wiha hatiye destankirin, Ëlyada bûye xwedî nirxê vegotineke gerdûnî. Di vê destanê de, di merhaleya barbariyê de, komên etnîk ku hê nebûne dewlet lê bi yekîtiyê federasyonî û bi zorê tîne meşandin, rola serokên qebîleyan ya derasayî bi awayekî pirola (mubalexe) tê vegotin. Pêdivî bi vê yekê heye. Lewra siftbûna vê hêzê nebe, di merhaleyê de bi şûn de, civaka bi çî û dewletbûn pêknayê. Ev vegotinên destanî ku hê jî di bîrûbaweriya gelan de tîne jiyandin, girîngî û zorbûna gihîştina hêzeke şareza didin diyarkirin, veguherîna serdemên dîrokê îfade dikin.

Nirxekî Ëlyada yê dîrokî wiha heye ku heta weke roja îro, bi awayekî nivîskî hatiye. Homeros, xewna yekîtiya Grek "Helen" yekem car tîne zimên û haya wî ji vî nirxê mezin ku hatiye pêkanîn heye. Wek tî zanîn piştî ketina Troya, BZ di salên 1200an de, demeke belavbûna hember ya bi navê "qewmên deryayê" ji rojavayê Anatolya destpêdike. Rojavayê Anatolya dibe "Ëyon" û ev pêl ber bi Mezopotamya, Rojhilatê Derya Spî, Başûrê Derya Spî, Başûrê Êtalya, Makedonya îro û derdorên Derya Reş, belav dibe.

"Odysseia" duyemîn destana mezin ya Homeros, vegotineke van belavbûnên bi rêya deryayê ye. Destankirina serpêhatî û fethkirina deryayê ye. Ev destan gelekî girîng e ku di dîrokê de yekem car, belavbûna li deryayê bi awayekî nivîskî gihandiye dema me, jiberku weke belgeyekê ye, him jî zimanê wêjeyî û mîtolojîk ya wê demê diyar dike, gelekî bi nirx e. Xwedî vegotinekê ye ku dişibe gera Gilgamêş ya di nav ava bin erdê de, li "giyayê nemirînê", herwiha bi tîkiliyên xwe yên bi kevneşopiyê re jî, gelekî binirx e.

"Theologîa" Hesîodos jî, BZ di salên 800an de bi zimanê hozanan hatiye nivîsîn, ji mîtolojiya ku li mercên demê hatiye anîn, best (îlham) girtiye. Di ser Anatolya re, mîtolojiya Sumer bi taybetî şêweya hîtîtiyan werdigire, di xwedakirina dema qehremaniya Grek de, bikartîne. Hemû çalakiyên qehremanî yên vê dema dîrokê û hewldanên dewletbûnê yên di bingeha xanedaniyê de ku bilind bûn, ji mîtolojiya Sumer û Misrê best digire û werdigerîne bîrdoziya "Pantheon" anku yekîtiyên xwedayan yên piçûk. Hewldanên olkirinê yên spartî tîgehîna xwedayê mezin, bi şêweya li Hitît û Hûrî "Teşşûp", li Fenîke "Baal", li Êbranî "Yehova, Elohîm", li Hindê "Brahma", li Êranê "Ahûra Mazda" tê bilindkirin, bi derengî be jî li nav Grek, yekîtiya xwedayan ya di bin pêşevaniya "Zeus" de ku bi navê xwedayên Olîmpiya jî tîne bi navkirin, bi navê "Pantheon" derdikeve holê. Di bin vê yekê de, dema qehremaniyê ji heyîna etnîk û yekîtiya nijad derbasbûyîna yekîtiya siyasî, çûyîna ber bi dewletbûnê û damezrandina seresaziya vê ya bîrdoziyî, heye. Yanê pêdiviya yekîtiya siyasî û afirandina wê ya bîzorê, bi hinceta (pêwîstek) bîrdoziyî ve tê girêdan. Afirandina bîrdoziyê, ji her rêxistina siyasî ya nû re pêdivî ye.

Di her dema dîrokê de û di her pêşveçûna civakê de, ev pêvajoyê tê dîtîn. Di bîngeha hemûyan de, hewldanên mîna dema Sumer ku BZ di navbera 4000 û 3000an de pêşveçûna veguherîna civakî, veqetandina çînan û îdealîzekirina dewletbûnê, hene. Di encama vê hewldanê de, afirandina rahîbên Sumer ya nuwazeyê, xwedayê ezmên "An", xwedayê hewayê "Enkîl", xwedawenda çiyê "Nînhûrsag", (vê dawiyê ênanna, eştar), xwedayê erd û avê "Enkî", kevneşopîya bi şeweya sêwiran û pênasîbûnê (binasnamebûn), bîngeh digire. Ev ezmûnên (tecrûbe) Sumer in ku heta îro jî "Theologîa" re bûye bîngeh û jîbo şewegirtina wê, rola sereke lîstiyê. Lêbelê her herêmekê kevneşopîya çanda xwe tevî kiriye, veguherandiyê, pişav kiriye û ligor xwe birêkûpêk kiriye. Hesîodûs, ev yek jîbo nivîgirava Grek pêkaniye. Lêgerînên ku di vî babetî de hatine kirin, tîkiliyên "Enkî=Kronûs", "En=órânûs", "Marduk=Zeus", bi awayekî zanistî bi hev ve girêdane. Theologîa Hesîodûs, jiberku resen e, birêkûpêk e û bi awayekî nivîskî hatiye heta dema me, girîngiya xwe nîşan dide. Ev yek nayê piçûkgirtin ku parçekî girîng jî kevneşopîya çanda mirovatîyê, di vî bîngehî de hatiye amadekirin. Lêbelê heger ku çavkanî li ber çavan neyê girtin, em nagihin encamên rast. Bi taybetî dema ku zayîna olên yek xweda were nîrxandin, pêwîst e herikîna vê kevneşopîya çandî li ber çavan were girtin û pir girîng e ku were dahûrandin.

b- Destanên qehremaniyê û vegotinên theologîa, ji BZ sedsala 6an û pêde, qenc û qenc netêrayîya xwe datînin holê. Ev qalibên bîrdoziyê yên dema koledariya hoveber, tîra berdewamiya şaristaniya koledar ya di nav qeyranê de nake û rêyê derketinê nabîne. Di vê merhaleyê de, pêdivî bi teqîna bîrdoziyê nû û bi derketina bîrûbawerî û giyanê heye. Him ravekirinên nû yên bûyerên di xwezayê û nav civakê de, him jî çareserîya aloziyên civakî, xwe didin pêş. Nûsaziyên ku Zerduşt û Bûdha bi taybetî di warê sincî de pêşexistin, pêwîst e ku hê bêhtir werin berfirehkirin, li temamê xwezayê û tîkiliyên civakî bê sepandin. Dorhêlên bajarên nû ku li Grek, başûrê Êtalya û li rojavayê Anatolya hatine avakirin, jîbo vî karî bikêrhatî ne. Çanda olî ya dewletên navendî yên Sumer û Misrê ku stemkar û serdest, li vandra li bîngeheke zexm rûnenîştîye. Koledariya Grek ya nû, pêwîstî bi bîrdozgerên suxrekar heye û ne di rewşeke wisa de ye ku bikaribe çewsandinê bike. Pêvajoyê bajarvanî ya berhemdar û bilind tê jiyandin. Hewldanên bîrdoziyê yên bilindkirinê (berzkirin) ne asteng in, bêhtir hevkarîyê dikin. Di bîngeha ronahîbûna Grek de, ev rastiyên dîringî hene.

Herêmên "Elea" ya li başûrê Êtalya û "Eönya" ya li rojavayê Anatolya ku felsefe pêşî li wan deran pêşveçûye, jiberku ji Greka navendî dût in, bêhtir derfetê didin dorhêleke azad. Hevkarîya felsefê ya Thales ê Mîletî ku di dîrokê de feylesofê yekemîn tê bi nav kirin, xwedê tevî kar nake, hewl dide ku xwezayê bi tîkiliyên wê yên derûnî rave bike. Gotina wî ya "Gerdûn ji avê hatiye afirandin" belkî ligor pîvanên dema me, ne gotineke bi têrayî be. Lêbelê jiberku sîya xwedê liser vê gotinê nîne û bi awayekî serbixwe ev gotiyê, di dîroka ramana mirovatîyê de xwedî nîrxekî şoresgerî ye. Dive neyê jî bîrkirin ku di bin vê ramanê de, nêrîna Sumer ya ku di bêje, 'xwedayê Sumer pêşî av afirandiyê yan jî xweda ji avê hatiye afirandin', heye. Tê zanîn ku Thales him li Misrê û him jî li Babîl, perwerde dîtîye. Dîsa ramana "Her der ji xwedayan tije ne", ji Thales re dikine mal. Li vir jî, berpêbûniya felsefeya olî, dabaşa xebirdanê ye. Qutbûyîna xwedê û xwezayê bi temamî ne hatiye pêkanîn. Bêhtir, du heyînen di nav hev de tê ferzkirin. Ev yek rê li ber tîgihîna şeweya pêşî ya "Wahdetê wîcûd" vedike.

Pêngava duyemîn ya girîng, ji aliyê Herakletîos tê avêtin. Ji xwedê qet xeber nade û dibêje, bîngeha xwezayê jî ber xwe ve hereket dike. Xweza bi sazûmana zagonên di nava xwe de ku bi wateya "logos" jî dikare were nîrxandin, hereket dike, dibêje ku ji derve ti bizavên xwedê lê tinene û timî tê guhertin, vê ramana xwe bi gotina "Bi ava ku di çemekî de diherike du caran nayê şîştin" formule dike. Cara yekemîne bi awayekî vekirî, şeweyê ramanê ku dîringê esas digire, tê bîngehkirin. "Daringperestî" ya di dîroka felsefê de, vê dawiyê nêrîna "daringperestiya dîrokî" ku hatî pêşvebirin, çavkaniya xwe jî vê ramanê digire.

Li aliyê din li başûrê Êtalya Phytagoras, bîngeha felsefeya îdealîst diavêje. Wî jî weke Thales, di xortaniya xwe de li Misir û Babîl, demeke dirêj (25 sal) di dibistanê rahîban de perwerde dîtîye, bi gerê rewşa şaristaniyê ya wê demê dîtîye. Girîngiya vî feylesofê BZ di sedsalên 6 û 5an de jiya ye ev e ku tîkiliyên xwezayê, li matematîkê sepandin. Hijmaran pîrozwer dibîne, di wê baweriyê de ye ku bi hijmaran her tişt dikarin werin ravekirin. Di vê nêrînê de ye ku zimanê gerdûnê yê ahengdar, bi muzîkê dikare were ragihandin (hisandin), bipergaliya armonîa diparêze. Heyînen giyanî di bîngeha her tiştî de dibîne, dîringî û rastiya bedenî jî, di rola rekihê (qefesê) de dibîne. Doktrîna xwe bi şeweyê razdar dide meşandin, perwerdeyîyê tund esas digire. Jîbo civaka biçîn ku li Grek û Êtalya helatî, rêvebirîya feylesofî ya berî Eflatun amade dike. Eslê wê tiştê ku dike, rojanekirina hêmanên ku ji rêvebiriyên Sumer û Misrê re, bîngehê teşkîl dikin û lêanîna li mercên

cîgeyî ne, ev yek vekiriye ku ji van navendan, bi awayekî sift bandor girtiye. Ev jî tevkarîyeke girîng e ku dibêje her form û şewegirtinên di xwezayê de, bi têkiliyên rêje (nîsbet) ya hijmarî ve girêdayîye, esas ev e ku ev rêjeya di tiştan de, were dîtin. Di pêşvebirina bijîşkî, qesirbendî û muzîkê de, girtina vê rêjeyîyê, gelekî girîng e. Bi cîhkirina hijmar, pîvan û sînoran ya nav têkiliyan jî, pêşveçûneke gelekî girîng e. Di bîrûbawerî û heyîna giyanî ya mirovan de, di gihîştina mantiq de xwedî roleke li pêş e. Li qada navenda Grek, BZ di navbera sedsalên 6 û 5an de, feylesofê herî girîng ku jiya ye, Pharmedes e. Girîngiya wî ev e ku di bingeha her tiştî de, mantiq, têgihîştin û behreya (kapasîte) aqil derpêş dike. Ewlekariyê bi hînbûna dilîni nayîne û dibêje, zanîna ku bi dilîni were yê xapînok be, di wê baweriyê de ye ku zanîna bi aqil esas e û encex mirov wiha yê bikaribe bigihe rastiyê. Esasê wê girîngiya Pharmedes, ev e ku nirx dide aqlê mirovê ku hişyar bûye. Belkî pirole (pir zêde) çûbe, ji çavkaniyên berbiçav yê agihînan dîrketibe û bi xeletiya rêbazeke mezin deriyek ku hezar salan wê bidomîne vekirî hiştibe. Lêbelê bi avêtina bingeha ramana bi mantiq û danîna girîngbûna wê ya li holê, roleke gerdûnî jî listiye.

Zor û zehmetiyên dewleta Atîna ku li hember Persan dikeviyê, windabûnên ku dide, berberiya bi Isparta re û cudahiyan çînî ku zêde dibin, BZ piştî sedsala 5an rê li ber dema qeyraneke kûr vedike. Çîqa ku diçe pîrsgirêkên civakî xwe didin pêş. Dorhêl jibo sofîstan (mamosteyên ku xwe zana dibînin û zanîne difroşin) gihîştiye. Vê rewşê rê li ber bandoreke du alî vekiriye. Ji aliyekî ve dogmayên olî bawerdêriya xwe wînda dîkin, baweriyê bi xwedayan kêmbûne, ji aliyê din ve dibistanên felsefê yê berevajî hev, tim seriyên tevlihev dîkin. Sofîstên ku ji vê yekê sûd wergirtin, bi dirûşmeya "Her kesekî ramaneke wî ligora wî heye", rê li ber derawayekê azadiya takekes vedikin. Lêbelê sedema ku ji qalibên ramana bingehe dikevin, zanîna û ramane jî bê qîmet dîkin. Bêsilbûn û havildarbûn (istîsmar) derdikeve holê. Ne di ol de û ne jî di felsefê de ti pîvan nemabûn. Gotina her kes ligora pîvana xwe, zagonên daristanê serdest dike, di civakê de despotiyê (tîran) dide destpêkirin û ber bi desthilatdariya demagogan dibe. Di hemû nirxên civakî de rê li ber nehêjayî (bêkalîte), mehanê (erozyon) û sextekariyekê, vedike. aedî rawestandina vê rewşê pêwîst bû.

c- Sokrates: Di demeke wiha de ku her der di nava toz û dumanê de, weke berhemeke demê derdikeve holê. Pîrsgirêkên civakê yê ku giran bûbûn, li benda ravekirin û çareseriyê bûn, naverok û rêbaz yê çawa çêbûbana, dibû pîrsgirêka bingehe. Sofîst ji zêdekirina van aloziyan pêde bikêrî tişteki din nayên. Sazûman xirek (sist) dîkin, dihejandin, lêbelê ji berpirsiyariya ku vebijarkekê (alternatîf) deynin holê, direviyan. Rê li ber nîşekî xortên bêberpirsiyarî vedibû. Van ciwanan xwe binbarê ti nirx û baweriyên ne didîtin. Mezinaya xeteriyê ji vê yekê dihat. Sokrates (BZ 470-399) li hember vê rewşê, bi danîna bingeha doktrîneke sincî, roleke dîrokî dilîze. Esasê wê pîrsa ku Sokrates dixwaze bersiva wê bide ev e ku her tişt, bi taybetî her kar xûypakiyeke (pîvanên tekûziyê, zagon û kevneşopiyên wê) xwe heye. Hinekî din were vekirin, dema ku di derbareyî mijarekê yan jî karekî de were peyvandin, tiştê pêşî ku yek bike ev e ku mirov bi bingeha wî karî an jî wê mijarê bizanibe. Di vî babetî de parole hêmana binav û deng "Xwe bizanibe" ye. Kesê ku di derbareyî mijarê de ne xwedî zanînen tekûz be, divê ku liser mijarê qet neaxive û jê xeber nede. Nezanî, cahilî dayika hemû aloziyan, xeletiyên û herwiha hemû neqenciyan e. Kesê ku bixwaze rêya qenciye veke, pêwîst e zanînen wê jî qezenc bike. Pîvanên gelemperî yê wê zanîne hene. Pîvanên ligora herkesî çênabin. Her saziyekî û her pişeyekî pîvan û zagonên xwe hene û ev jibo hemû beşên sazî û pişeyan derbasdar in. Pîvanên hemû saziyên civakî yê weke leşkerî, siyasat, cotkarî, pişekarî, û oldarî, ku bi zanînan ve girêdayî, hene. Dema ku yek ligor van pîvanan bilive, ew sazî an jî ew pişe wê rola xwe bi têr başî bileyze. Jibo vê yekê pêwîstiya herî girîng ev e ku her hewldana mijara kar û pişe, bi zanîne ve girêdayî be. Karê ku kesê nezan bike, di dawiyê de dikeve korereyekê. Herwiha bingeha hêmana "Pratîka zexm (peyt) bi teoriya zexm ve girêdayî ye" tê nîşandan. Heger em bala xwe bidîne, Bûdha, Konfuçyûs û Zerduşt jî li pey vê helwestê bûn.

Liser naveroka mijareke cureyîn (celebîn), ti nêrinên berfireh yan jî ti pirtûkên Sokrates tine ne. Ew hê bêhtir bi rêbazê û bi pîrsa "Çawa bijiyin" re, têkildar e. Heger ku rêbaz nebe, hemû zanînen berhevkerî weke pirtûkên ku tu liser piştê kerê bikî ne, belkî jê xetertir jî bin. Lewra zanîneke di destê mirovan de ku bê rêbaz were bikaranîn, dikare hezar qatan zêdetir ji bédengiya kerê, rê li ber xeteriyên veke. Di vê pîrsgirêka bingehe de, Sokrates, bi awayekî xwedî helwesteke tundraw (radîkal) derdikeve hemberî me. Jixwe derdê wî ne ew e ku zanîna zêde bi dest bixe, jibo çî û çawa bi dest dixwe ye. Zanîna ku jibo çî û çawa ya wê nebe, jibo wî bê nirx e. Di heman demê de, bersiva çima zanînan rast were dayin, ew zanînan, karê pêve girêdayî û rastî jî yê derkeve holê. Ligor Sokrates ramandina (hizirîn) rast, dibe çêkirina baş. Karê baş hatibe çêkirin jî karê xweşik e. Derûniya sincê Sokrates, hêmana ku dibêje, "Rast bi rame, baş (tekûz) bike, xweşik bibe". Ev hêman bi Zerduşt re

wiha ye "ramandina rast, peyva rast, çalakiya rast". Aliyên hevbeş yên van doktrînen dişibine hev ev e ku sazûmana xerabûyî, di nûsazîbûnê re derbasbikin.

Yên ku berjewendiyên wan di civaka qeyranê de hene, li vê helwesta hişk û bihêman xweş nanêrin. Weke ku di her demê de tê dîtin, yên ku xwe bi ranta qeyranê xweyîdikin, despot û dîktatorên ku ji zagon û dadmendiyê qut in. Çeka wan a herî mezin demagojî (xapandina bi peyvan) û zordestî ye. Bingeha darizandina Sokrates ev e ku sincê ciwanan di nûsaziyeke kûr re û di veguherînên ku bi hêmanên rast ve girêdayî re, derbaskirine. Lêbelê sedema darizandinê weke "Hêmanên bilind ên yekîti û yekerebûna Atîna û xwedayên wê yên parêzker înkâr dike" nîşan didin, bersiv û helwesta Sokrates a li hember vê yekê, gelekî watedar û bêhempa ye. Rîayetkirina zagonan weke xûypakiyê dinirxîne, ligor hêmana xûypakiyê dijî. Dema ku şagirdên wî bazdanê teklîf dikin, ew vê yekê nexûypakî dibîne û red dike. Di nava rihetiyeke mezin de, jehra zirgêjnokê (giyajehrk) vedixwe û bi şehîdbûneke bi şeref, di nava nemiran de cîhê yekemîn digire.

d- Eflatûn û Arîsto: Bi van herdu kesan, dema felsefeya klasîk digihe bandev. Di felsefeya civakî de herdu jî şagirdên Sokrates in. Eflatûn liser bîranîna mamosteyê xwe, têgînên rast, baş û xweşik, jibo rizgarbûna Atîna û bi awayekî feylesofî were rêvebirin, dike nimûne û pirtûka bi navê "Dewlet" dinivîse. Di cîhana Eflatûn de, "raman (îdea)" bingeh e. Cîhana daringî, ji bîranînen cîhana ramanê yên ku bi awayekî lawaz tînin bibîrhatin, pêktînin. Pêşî derûn, yanê raman heye. Dawiyê sift dibin û rê li ber hebûna cinsan vedikin. Daring bi serê xwe çênabe. Ev şêweyeke têgihîna aqil ya Pharmanîdes ku pêşveçûye. Feylesofê îdealîzmê yê herî mezin e. Derawayekî wî ya nêzîkî pêxemberiyê heye. Bi vê rewşa xwe hinekî dişibe Zerduşt. Mirov dikare bêje ku Arîsto têheva (komînek) Sokrates û Eflatûn e, bersiveke doktrîna Zerduşt e. Rêvebirîya pîrzanan, dîmendariya hunerwarî, qilafetekî (timtêl) atletîk, taybetiyên felsefeya Eflatûn yên bingehî in. Dema ku kesên bijarte (xuyayî) wiha werin gihandin, dewlet wê bi awayekî zexm were rêvebirin. Ew jî weke Sokrates rêbaza gotûbêjê (dîyalog) bingeh digire. Jiberku di dîrokê de yekem car, dersên xwe li nêzîkî Atîna li dera bi navê Akademîa dide, tim bi vî navê re tê bi bîranîn. Kevneşopiya Akademîa û sazîbûna wê, bi rêbaza wî ve girêdayî ye. Feylesofê civaka biçîn e. Liser wekheviya hemû mirovan na rame. Şaristaniya koledar weke sazûmaneke xwezayî û domdar tê hizirandin (ramandin). Di gotûbêja wî ya bi navê "Dewlet" de, dewleta Atîna weke ramana herî bi hêz ya vê sazûmana xwezayî tê sêwirandin.

Ji ber rêbaza vê ramanê ye ku Grekî herkesî jî xwe piçûktir dibînin. Piştî Eflatûn, gelek ramangêr hewldidin ku bi cur bi cur şêweyan wî pêşvebibin û doktrînen demê, bi wî rave bikin. Neo Eflatûntî tê wê wateyê ku bi gelemperî ramana olî û ramana felsefî, bi taybetî di berbiçaviya xiristiyantiyê de, pêkbînin. Bandora wê liser ol û felsefeya îslamî jî heye. Ev bandor, di têgihînen îdealîst yên serdema nêzîk de jî rola xwe dilîze.

Arîsto (BZ 386-320) afirînerê felsefeya ramana serdema klasîk yê herî mezin yê dawî ye. Mamosteyê Skender e. Atînayî jê hez nakin. Li qalibê Grek nayê. Hemû ramanên olî û felsefeyî yên heta dema xwe, lêkolandine û fêrî wan bûye. Çavdêrekî liser xwezayiyê yê kûr e. Aqil û dilîn weke hev digre û cîh dide wan. Hewldide ku girêdana di navbera aqil, dilîn û bîrbirina (têgihan) xwe de, bi awayekî zexm saz bike. Jiberku meraqa wî liser daneheva hemû zanînen demê hebû, bê cudakirina xweza û civakê, dixwest ku hemûyan bide hev. Ev hewldan wî dibe rêbaza talîlê (deduksiyon). Mantîqa Arîsto jî ev e. Eslê wê Arîsto, hewldana avakirina hîmên mantîqê giştiye ku ji zanîn û ramanên heta wê demê gihabûn hev. Em dikarin bêjin ku Arîsto, jibo wê demê têheva (yekûn) bîrûbaweriya mirov û hêza wî ya giştî ye. Ev encameke vê taybetiya wî ye ku weke sembola birêkûpêkiya zanîn û ramanê yê li bandevê, tê bi navkirin. Sepandin û îfadeya berbiçav, pêkanîna Skenderê Mezin ya împetoriya cîhanê ye. Ev tê wateya, sepandina mezin ya ramana mezin, desthilatiya gerdûnî ya ramana gerdûnî jî.

Arîsto xwedê mandele (înkâr) nake. Sedema yekem dirame, pêvajoyên bi şûn de weke ku xwezayê xwe bi xwe pêşve biribe, bi înisyatîf berdide. Bi gotina ku dibêje, her tişt wê bi sedema yekem re yanê bi xwedê re bibe yek, têgihîna gerdûnê ya bi armanc, datîne holê. Distûra "Her tiştêkî armanc û sedemeke xwe heye", formuleke Arîstoyî ye. Herwiha xwedayî ye. Bi vê yeke biqasî ku bandora wî liser olên yek xweda heye, bandora wî liser felsefeya xiristiyaniyê û îslamî ya serdema navîn jî mezin e. Ya rast ev e ku felsefeya îslamî û xiristiyantiyê, bi bikaranîna ramana Eflatûn û Arîsto hatine pêşvebirin.

Heta weke roja îro, nêrînen Arîstoyî serdestî mantîqê mirovê nîvekî (wasatî) ye jî. Mantîqê diyalektîkê hê jî serdestbûna bîrûbaweriya mirov, dûr e. Bi vê taybetiya xwe, yê ku hêjî bi hêzî di mantîq de dijî, Arîsto ye. Yê ku di felesefeya baweriyê ya bawermand de jî, dijî dîsa ew e. Herwiha piçûk nayê girtin. Lêbelê ku ji Arîsto derbasbûyîn çênebe, fêrbûna şêweya raman û zanîna dema me, ne gengaz e (mimkun). Ev yek gelekî grîng e ku Arîsto di şêweya ramana felsefî de, weke

merhaleyeke mezin tê nirxandin, lêbelê asta wî ya agahdarbûnê ji mêj ve hatiya derbaskirin, ji ber sedema pêşveçûna fîzîk, kîmya, bîyolojî û zanista civakî, êdî weke rawestgeha di mantiq û baweriya kevneperestî de tê dîtin. Rawestîna li vê rawestgehê, di roja îroyîn de, paşverûtî ye. Di vî babetî de, derbasbûyîna ji Arîsto, girîngiyek e mezin e û jibo pêşveçûn û veguherînan pêdivî ye.

Vê dawiyê di heyîna ramana Grek de, bi şîroveyên van feylesofan, gelek dibistanên cuda hatine pêşexistin. Heta bi serdema nêzîk Renaissance, di serî de îslamîyet û xiristiyantî, ji aliyekî ve gelek cureyên felsefeyên olî, ji aliyê din ve gelek felsefeyên li derî ol, di pêşveçûna dibistanê de rola çavkaniyê listine.

Herikîna ramana dîroka şaristaniyê ji mîna çemekî ye. Çavkaniya wê ya sereke, li Heyva Berhemdar pesarên çiyar bû, Ji wira beşan digire û li Sumer dibe herikîna pêleke sereke. Bi wergirtina beşên ji Misir, Anatolya, Hindê, Çînê, û êranê, li derbenda (gêduk) Grekê weke bendaveke felsefê, werdigere çavkaniya vejenê. Careke din hêza herikîna bi dest dixê. Digel astengiyên serdema navîn, di serdema nêzîk de li Ewropa, careke din digihe hêza xwe ya berê û di dema me de dibne şapeyeke ku kesek nikaribe xwe li ber bigire.

H- Di şaristaniya koledar de bandev (navser)

Dema ku min dahûrandinên xwe yê di derbarê şaristaniyê de, pêşxistin, min bala xwe da hebûna girêdayinên di navbera mijaran de. Di bin van nêzîkbûnên min de, hêvî û niyeta min ev bû. Dubare û siftbûna min ya liser, ji ber vê şayîşa (fîkar) min e. Reva ji dubareya liser hev û kirp, nabe.

Bi dahûrandina şaristaniya koledar, ez vê armanca xwe ji çavan dûr nagirim: Dahûrandina kapîtalîzmê ya bi serê xwe, derandina encaman yê li dij an jî li berwerî (leh) sazûmanê, weke rêbazekê, netêrayiyên mezin bi xwe re digire. Di kapîtalîzmê de û heta di "reel sosyalîzmê de" tişta tê jiyandin û lê vehewandî, afirînekên ku heyîna civaka koledar di seresazî û binesazî de pêkanîn, şeweyên "taybetiyên şaristanî" yê giştîkirî û şîrovekirî ne, derûnên di bin de ne. Dibe ku di pîvan û şeweyan de zêdebûn û di warê tekûzbûnê de pêşveçûn hîkarîker çêbûbin. Heta dikarin bibêjin di wê astê de ye ku hevberkirinê nasnake. Lêbelê dîsa esasê wê ev e ku şewegirtina şaristaniyê ya pêşî û derûna di bin de, diyarker e.

Rêbazeke ku zanist liser hev disepîne civakzanî jî nasepîne, encex dikare bi têgîna serdestiya çîna gelekî bihêz, were ravekirin. Têgînên berbiçavî û diyarkerî ku gelekî tene dubarekirin, carekê jî li civakzaniyê nayên sepandin. Sedema vê ya bingeh ev e ku bi taybetî li qasî hişkbûna di warê berbiçavî û neberbiçaviyan de, vîna (îrade) serdestbûna li dorhêlê ya bi dîmenên (vexûyan) bîrdoziyî yê behitîhiştî ye. Tişta ku dixwazim behs bikim, "diyarkerî" ya di zanist de anku ji ber çavan windabûna kêliyên gihîştina rêzika giştî û zagonê, çendaniyîya zêde û ji hev qut, nevegotina ti tiştî, heta veguherandina rêbaza ku wateya xwe wînda bike ye. Di têgîhîna civakzaniyan de, pêkanîna şewşandinên mezin yê Ewropa û DEYê, bi pêdiviya serdestiya çînî û di cîhanê de serdestiya emperyalîst ku gelekî zêde bûyî ve, girêdayî ye. Daxwaz û niyeta min ev e ku heger di bin navê "sosyalîzma zanistî" de derûneke ku bi xwazînan were têgihîştin hebe, gihîştina vê ya rêbaza rastî ye. Dibe ku hinek "çepgirên" tûj vê biwate nebînin. Lê ez angaş (îdîa) dikim ku heger rast neyê rexnekirin û neyê birêkûpêk kirin, "marksîzm", yê ji alyê sincî ve ji bîrdoziya rahîbên Sumer paştir be û yê bibe pêleyîstika kapîtalîzmê ya bê lêçûn (mesref), teorî û sepandina wê ya bi "dîktatoriya proleter" jî, wê ji emperyalîzma Sargon ya Sumer, nimûneka wî ya serdestiyê û ji amûreke ku kapîtalîzm bikartîne wêdetir neçe. Di bin vê hilweşîna "reel sosyalîzmê" de ku bi ti nimûneyên teorîk nayê ravekirin, ev rastiya xeternak heye û dibe mînakekî ku ez çî dixwazim bibêjim. Liqasî pîrsa çewtî û xiyaret li kûderê, kengî, ji alyê kê ve û çawa hate kirin, rastiya wê yê li kûderê, kengî, ji alyê kê ve û çawa divê were pêkanîn, bi dahûrandina vê pîrsê ve girêdayî ye. Çiqa ku dema wê were, vekirina van mijaran wê aliyê parêznameya min ya "dirûtiya sedsala 20emîn" derîne holê.

1- Şaristaniya Grek

Ev pîrsgirêka zanista dîrokê ya herî girîng e ku şewegirtina Greko-Romen ya şaristaniya koledar, rast were terîf kirin. Rastnekirina vê yekê, dibe bingeha çewtî, xeletî û şewşandinên di warê dîrok û civakzaniyê de. Şewşandina bingeh jî ev e ku bi awayekî mezin weke bingeha derketina şaristanî, didine pêş. Ev mijar bi zêdeyî, weke taybetiya sereke ya têgihînan Navendiya Ewropa, derdikeve hemberî me û li me pêwîst tê kirin. Berevajî vê yekê, têgîhîna bingeh ev e, Rojhilatî û ligor nêrîna îslamîyê ye ku piçûk digire, weke kufir dinirxîne û bê nirxên zanistî, nêzîkbûnên bi giraniya propagandayî dike. Di bingeha herdu têgîhînan de, ji aliyekî ve şeweya ramana felsefî û mîtolojîk ya Grek, ji aliyê din ve ramana olî ya Rojhilata Navîn ku bi awayekî fanatîk heramoyî dike û nêzîkbûna

xwezayî ya eznavendperezî, heye. Dema ku di bin ronîya daneyên zanistî de were nirxandin, wê bi hêsanî were dîtin ku şaristaniya Greko-Romen ji du çavkanî û du demên dîrokê xweyî bûye.

a- Xweyîbûna bi serdema neolîtîk: Ev yek tê çespendin, pêla şoreşa çandinî ya neolîtîk ku ji Heyva Berhemdar dihat, BZ di salên 5000an de, di ser Balkanan û çolterên (step) Başûrê Rûsya re, gihaye Ewropa. Tê dîtin ku BZ ji salên 4000an pêde, tevaya Ewropa şoreşa çandinî nasdike. Ev di dîrokê de, pêla Hind-Ewropa ya ji çavkaniya Aryen tê bi navkirin.

Jibo ku em pêşiyê li têgihîştineke çewt bigirin, divê ku em peyva "Aryen" zelal bikin. Weke gelek têgînên ji koka Rojhilata Navîn, di vê peyvê de jî rola Sumer derdikeve holê. "Ar" û "Ard" di Sumerî de tên wateya halet û cîhê cotkirinê. Jiberku pesarên Zaxros û Torosan çavkaniyên çêbûna şoreşa çandinî ne, axa ku yekem car kirine zevî, ji aliyê Sumeran ve, "Ard (Erd)" hatiye binavkirin. Dibe ku wan jî ev nav ji qebileyên Horrît yên xwedî ax ku li vira niştecih, standibin. Di dîrokê de tê zanîn ku "Horrît" tê wateya "yên bi welatê bilind" û ev peyv ji aliyê sumeran ve hatiye bikaranîn. Peyva "Ar" ku girêdayî peyva "Ard" e û tê wateya halet, pêwîstiya peyvnasiyê (termînolojî) ye. Piştî Erebbê peyvê bi navê "Arz" bikartînin. Êro di kurdî de weke xwe, bi navê "Erd" anku bi wateya zevî tê bikaranîn. Herwiha peyva "Aryen" tê wateya 'gelê ku zevî, erd cot kiriye.' ædî ev yek diyar dibe, bê çima jibo gelên di şoreşa çandinî re borîne, "Aryen" tê gotine. Vê dawiyê nêzîkbûnê weke Arî=bilind, Ar=agir lihevanînen bîzorê ne û zêde ne rast in. Lêbelê jiberku di dema xwe de, gelekî pêşketibûn, nirxandinên, bi bilindayî û bi arîti nabine sedem ku encamên nijadperestî jê werin derxistin. Şewşandina Faşîzma Alman ya vê têgînê, ne bi zanistî ye, bîrdoziyî û bi armanca propagandayê ye. Ji niha û pêde dema ku em vê têgînê bikarbînin, divê ku bi vê naverokê were fêhmîkirin. Dîrokê ev mijar peytandîye (tesbît kiriye) ku di pêvajoya xweyîbûna Ewropa ya bi şoreşa çandinî de, timî ji çavkaniyên dahênanên Rojhilata Navîn, amûr û têgînên wê sîd wergirtiye. Nêzîkbûnê Gordon Childe, bizanistî, biçespîn û rênîşander e. Vê demê jiyandina pêşveçûneke ber bi gelbûn û qewmbûnê ve tê dîtin ku derûniya wê bi belavbûna şoreşa çandinî ve girêdayî ye, ku çanda wê bîngeh digire û ku nêzîkaya wê fizîkî û bi bûyera hêzê re tine ye. Di civakên Rojhilata Navîn de, hê BZ di salên 6000an de, bi destpêkirina jiyana vî reseniyê re, çêbûna komên etnîk, bi derengmayîna hezar-duhezar salan, li Ewropa tê dubarekirin û lê tê anîn. Pêşveçûnê weke vî yekê, li Bakurê Afrîka, Hindistan û Çînê jî, di demên nêzîkî vî mêjûyê de hatine jiyandin. Em di dîrokê de, bi bûyera xweyîbûna ji çavkaniya sereke ku her demê derdikeve pêşberî me ya herî bîngeh re rûbirû ne. Têgihîştina belavbûna Hind-Ewropa ya bi vî naverokê, wê bibe sedema têgihîştina dîrokê ya rasteqînî.

Dema ku em tene ber bi BZ salên 1000an, ev gel yan jî ev komîkbûnên etnîk ku xwe bi "hesin" jî xweyî dikin, hinek navên bîngeh distînin. Li Rûsya ya îro û derdorên wê, "Slaw", li Bakurê Ewropa "Norman" û "Totan", li Elmanya "Germen" û "Got", hê li Başûrtir "Kelt" û "Latînî". Di merhaleya duyemîn de, di erdnîgariyên tengtir de, komên gelan yên resenebûyî anku hebûnên qewmî û nijadî derdikevin holê û şewe digirin. Pêvajoya gelbûna li nîvgirava Grek "Helen" û li Êtalyayê "Latîn", berhemên vî demê ne. Di dawîya serdema neolîtîk de, tê dîtin ku di bin van navan de sift dibin.

b- Xweyîbûna bi serdema şaristanî: Di bîngeha şewegirtina şaristaniya Grek de, çavkaniya bandorker Sumer, Misir û şaristaniya koledar ya tevaya Rojhilata Navîn e. Xweyîbûna şaristaniya Grek ya rasterast ji vî çavkaniyê, ji çar aliyên bîngehîn û bi taybetî BZ ji salên 2000an pêde sift dibe. Hêzên şaristaniyê ku di ser Anatolya re ji Troya, ji Rojhilata Derya Spî, ji Fenîkiyan, ji Misir û Girîtê distîne, bi nirxên neolîtîkê yên ku berî standî re, li nav hev dixê û sentezeke dewlemend derdixê holê. Tê ramandin ku berî neolîtîkê û şaristaniyê, li nîvgirava Grek komikên eşîrî yên Derya Spî ku hoveber, hebûn. Lêbelê tê texmînkirin ku bi pêla neolîtîkê hatine helandin. Zimanê Grek ku bi taybetiyên Aryen e, çespendina vî yekê ye. Heçku di dema eşîrên komunal yên hoveber ku berî serdema neolîtîkê ji Kafkasya heta bi Baskê cîh di girtin de, bi texmînî BZ di salên 20-25 000an de, beşa zimanê Derya Spî (Kafkas-Bask) ku derketibû holê cuda ye. Di nîvgirava Êtalya de jî, pêşveçûneke bi vî rengî tê dîtin.

Taybetiyên erdnîgariya Grek, di şewegirtina şaristaniyê de, rê li ber bandoreke xwerû vekiriye. Ev têgîn ji ber her herêmê wiha ye. Ji aliyê reseniyê Grek ve, roleke diyarker nalîze. Pêşveçûna vî reseniyê ya dewlemend, ji nêzîk ve bi çavkaniyên ku ji wan xweyî dibe ve, girêdayî ye. Ev yek raveya rasteqînî ya dewlemendî û nûjeniyê wê ye ku qezencên serdema neolîtîkê, bi qezencên çar çar aliyên ku di warê şaristaniyê de pêşketî re, dike yek, van di erdnîgariya xwe ya ku Asya, Ewropa û Afrîka lê dibin yek de, sentez û resene dike. Çawa çêbûna dewlemendiyeke bi nirxên ku jê tê xweyîkirin, were pîvan, çêbûna şaristaniya Grek jî, ji çavkaniyên ku di xwe de dane hev, xwe xweyî dike, şewe digire û tê rewşeke ku di dîrokê de, roleke di merhaleya bilind de bilîze. Sentezeke dewlemend derdixê holê. Tevkariya wê, serkeftina di çêkirina sentezê de ye. Weke ku kerese

(malzeme) pir bin û aşûre xweşik were çêkirin. Ev rola wê ne piçûk e, lêbelê weke roleke nikûnû û zayîneke ji çavkaniyeke derûnî jî nayê nirxandin. Me behsa vê pêvajoyê kiribû. Em dikarin bêdubare bi xalên sereke wiha bibêjin:

1- Bingeha mîtolojiya wê ji Sumer û bisînor ji Misrê hatiye wergirtin. Çavkaniya Sumer di ser Anatolya û Fenîke re û ya Misrê di ser Girîtê re distîne. Em bibêjin ev veguhêzî destê duyemîn ne, rastir e. Lewra piştî ku Sumer li Anatolya û Fenîke tê sepandin, piştê dikişînin nîvgirava Grek. Misr jî piştî ku li Girîtê rûdinê, derbasî nîvgiravê dibe. Mîkenên ku li Girek hêzeke şaristaniyê yên pêş bûn, ne di wê hêzê de bûn ku bikaribin mîtolojiya şaristaniya Grek derînin holê, ji çêbûna Zeûs ya li Girîtê ev bi hesanî tê fêhmkirin. Ev mînakeke hîkarîker e, çawa BZ di salên 1500an de, perizîna mîtolojiya Zeûs kişandine nîvgiravê. Peyva Zeûs jî aliyê peyvnasî ve, ji peyva "div" ya ji koka Aryen hatiye wergirtin. Div wê demê di hemû komên Aryen de, tê wateya "Dêw" yê herî mezin. Tê zanîn ku ji yê herî mezin re, "hebûna xwedayî" tê gotin. Dêw ev rola xwe li nav Sumeran jî listiye. Pêşevaniya têgîna xwedê ya Rojhilata Navîn, bi rewşa hoveber têgînkirina komên aryenên neolîtîk û bi qezenca nasnameyê derdikeve pêşberî me. Piştî ku di gelek merhaleyan re derbas dibe, digihe têgîna xwedayê herî mezin, îlah, Alah.

Çanda Kîbek weke xwedawenda li Anatolya ya herî kevin, bi xwedawend Artemîs rola çavkaniya herî girîng dilîze, xwedayê şerab û fêkî Tarhuzza bi "Dîonyos" hatiye xûnifandin, weke ku tê zanîn, berî Anatolya bibe Helen, di peykerên Luvîyan ku komeke herî kevnare de, li vî fêkîyê tê rasthatin, bi taybetî xwedayê şerab û tirî Terhuzza diyar e. Resenekirina bi navê Dîonyos, mînakeke hîkarîker ya din e ku ji çavkaniya xwe xweyî dibe. Bûyina Afrodît ya ji kefa li peravên Qibrîsê jî, dide nîşandan bê rajêriya (bindestî) mîtolojiyê çawa pêşveçûye. Şêwegirtina serdestiya xwedayê mêr, li nav Hîtî û Hûriyan bi "Telepînû û Teşûp" hatiye pêkanîn, ev şêwegirtin ji Rojavayê Anatolya derbasî Grek dibe û bi Aplon li hember xwedawendan serdestiyê qezenc dike. Ev mijar jî hatiye dahûrandin ku xwedayê Misrê êsîs, bi vî rengî bandorê li êo û Osîrîs dike, mînakeke din Demeter û keça wî Persephone jî xwedî bandor in.

Kitekitkirina kişandina mîtolojiyê, zêde biwate nabe. Lêbelê em dikarin vê bi hesanî bibêjin ku Hesîodos, di serî de jî destana afirandinê ya Babil (Enûma Eliş) û ji gelek çavkaniyên mîtolojîk yên demê sûd wergirtiye û "Theologia" nivîsiye. Grûbeke çandê ya wê demê xwedî theologiya (xwedanasî) yên wiha ne. Ev bergeh û şêweyên hişmendî ku ji sumerîyan tî, bêşik ligor asta têgîna serdema neolîtîk, asta bîrdoziyîyeke pêşverû nîşan dide. Ev teolojî, weke kemna (xêlî) bingeha bîrdoziya koletiyê, di bingeha hemû xwedanasîyan de, cîh digire.

Divê neyê jibîrkin ku ev nebe, gihîştina bergehên felsefî zanistî jî mimkûn nabin. Lewra girêdana dîyalektîka dîrokî ya di navbera wan de, mîsoger û zelal e.

2- Mijareke din ya girîng ev e ku alfabeya îro li tevayî Ewropa tê bikaranîn, fenîkeyîyan ji sumerîyan wergirtine, pêşvebirine û BZ di navbera 1000 û 700an de kişandina nav Grek. şaristaniya Grek bi alfabayê ji dîrokê re bûye mal. Weke vê yekê matematîk û geometrî jî, ji Misir û sumerîyan hatiye standin. Şêweya wêjeyê him ji aliyê dêw û him jî naverokê ve, çandên vira bingeh girtine. Heynên giyanî û bîrewerî ku bi grekiyan re çêbûye, weke giştîyên demê şêwegirtina xwe ji van çavkaniyan standiye, lêbelê tevkariyên xwe jî, bi hostayî tevlikirine. Ev yek ne bi şêweyekî jêgirtî (kopya) standine û servebirine, bi xûnifandin, serifandin bi gihîştina giyan û bîrûbawerîyeke dewlemend pêkhatiye. Bi vî aliyê xwe jî, di dîroka şaristaniyê de, roleke tevkarî ya girîng listiye. Tiştê çewt ev e ku rola xwe ya tevkariyê weke rola "çavkanî, dan zayîn"ê, berevajî dike, Grek û piştê şaristaniya Ewropa vê berevajiyê bi awayekî fanatîk û şovenîst pêktînin. Bi Grekan re ev bûye kevneşopîyek ku li derî xwe hemû kesan barbar bibînin. Heçku hê ew nebûn xwedî hêzeke şaristanî û dema ku bi sazûmaneke qebîleyên hoveberî dijiyan, şaristanî di çavkaniyên orîjînal de hatibû afirandin.

3- Dema ku Grekiyan xwe bi "Helen" binavkirin, hesinê ku amûreke bingeha şaristanîbûnê ye, li Mezopotamya jorîn hatiye dîtin û bi pêwana Frîgiyan gihaye Grekê. Amûrên tûncî jî, di ser Troya re hatine nav Grek. Dema BZ di salên 1000an û bi şûn de, komên Helen têr çekên hesin û tûnc dibin, êdî niha dibin xwedî hêzeke dijraber. Piştî BZ salên 1200an ku Troya hilweşiya, deryê Anatolya ji wan re vedibe, Pêşî Rojavayê Anatolya êonî dibe, piştê li tevayî Anatolya, heta bi Feradê xûnifandina Helen pêktê. Lûwî bi carekê tî paqîjkin. Frîgya û Lîdyâ jî li pey Lûwîyan diçin. Encex qeranên "Komagenes" ku kalikên Kurdan û Ermenan bûn, hebûna xwe diparêzin. Belavbûna Helen ya hember, BZ di salên 1000an de destpêdike û bi pêlên rabûnûdanîne (med û cezîr), di dema Skenderê Mezin de, digihe bandevê, PZ di serê sedsala 20an de, ji aliyê Tirkan ve ji Anatolyayê bi temamî tî avêtin û bi awayekî trajîk bi dawî dibe.

Belavbûn li Rojava jî berdewam dike. BZ ji 1500an pêde, Girît serxwebûna xwe winda dike. Qibris jî pêvajoyeke wisa dijî. Rêya Makedonya vedibe. Di vê navberê de pêvajoyeke mêhtingehî ya bihêz derdikeve holê. Li peravên Derya Reş Pontus û li hemû aliyên Derya Spî mêhtingehên Helen yên bihêz tên sazîkirin. Nîvgirava êtalya ji niştecihbûnên sift re vedibe. Başûrê wê tev de dibe Helen.

4- BZ di sedsalên 7 û 6an de, li nîvgirava Grek, ji federasyona heyina etnîk, dewleteke koledar ya navendî ku bi bingeha çînan ve girêdayî ye, derdikeve holê. Reseniya vê dewleta koledar ev e ku rewîştî rahîban di plana duyemîn de ye û aliyê wê yê siyasî li pêş e. Ya herî girîngtir ev e ku piştî qerantiyeke kin, şewegirtineke ku em dikarin bibêjin komara koledar, pêktîne. Di hîmên dewletên koledar yên Sumer, Misir û hemû Rojhilata Navîn de, rola bingeh ya rahîban û vê dawiyê ya xanedanan e, lê li Grek û êtalya, aliyê komarparêzî derdikeve pêş. Bêşik ev rewş bi rasyonallîte ya di bîrdoziyê de ligel çandiniyê bi girîngbûna bazirganiyê ve girêdayî ye. Bi taybetî bazirganî, pêşveçûneke civakî ya nêzikî bajarî (bûrjûva), bi xwe re tîne. Esasê wê vê îfade dike ku weke çîneke navîn, nêziktirî laîkiyê ne û jibo berjewendiyên xwe, dûrî şeweya rêvebirîya rahîb û xanedanan e. Bazirganiya li deryayê ku ji rêbejahiyê bikêrhatîtir, mercê bingeh yê serdestiya Grek e. Dewlemendî û xweşiya ku bazirganiyê anî, bingeha şeweya ramana felsefî jî digire. Ev yek gelekî girîng e ku zêdetir ji pêşveçûnên cuda yên aborî, karbeşiyeke bi bazirganiyê ve girêdayî, hatiye pêkanîn. Ev karbeşî di mercên wê demê de, pisporiyeke ku cîhana şaristaniyê, bi rajava, bi rojhilat, bi bakur û bi başûr ve, di warê bazirganiyê de girîng dike, bi xwe re tîne. Herwiha di warê pîşkerî de jî, demeke nû ya belavbûnê û pêşveçûnê tê jiyandin. Dikarin bibêjin ku ji Okyanûsa Atlas, heta bi Okyanûsa Mezin, tevgera malê bazirganiyê, derfetê bi dest dixê. Kûreyîbûna (kadîbûn) yekem bi vî awayî pêktê.

Di rêyên bazirganiyê de, raman û baweriyên hevpar jî, danûstandineke wiha dikin. Divê mirov şaş nemîne ku şeweya pêşketina aborî, civakê û bîrdoziyî ya pêkhatî komar e û piştî jî îfadeya wê ya herî pêşveçûyî jî "demokrasi" ye. Pêşveçûna çîni ya bi mercên doringî yên dewlemend û tevlîhev ve girêdayî, di warê siyasî de, wê hîmê ji xwe re bikêrhatî bibîne. Liqasî nîrxê dîrokî yê "Demokrasiya Atîna" tevkarîya wê ya şaristaniyê jî, di vî babetê de ye. Bêşik ev demokrasi, demokrasiyeke çîna koledar e, lê dîsa jî nûjeniyeye girîng e. Jiberku ji gemerdana hişk ya rahîb û xanedanan dûr e, jibo şaristaniya Rojava rola dergûşê dilîze.

5- Nûjeniya Grek ya girîng û tevkarîya wê ya dîrokê, pêşvebirina şeweya "ramana felsefî" ye. Bi wateya jê hezkirina zanîne, nîrxandina bi rengê ku felsefe ji Grek helatiye, nêzîkbûneke mezinkirinê ye û kêmasiyên girîng bi xwe re hildigire. Thalesê Mîletî û Phytagoras yên ku şeweya ramana felsefê bi belge dane destpêkirin, tê zanîn ku xortaniya xwe li Misir û Babîl bûrandine û li wir perwerde bûne. Berî ku şeweya ramana felsefê derkeve holê, hemû pêşevanên menewiyatê, perwerdeya xwe li dibistanên rahîbên Misir û Babîlê pêkanîne. Di van salan de li Grek dibistanên resene tine ne, tê texmînkirin ku hozanên gerhok yên weke Homeros, Hesîodos û Orpheus BZ di sedsalên 8 û 7an de, jiyane. Di van salan de, di asta Babîl û Misir de perestgehan deyne dera han, jibo çanda perestgehên cîgeyî jî, zemîneke zexm nehatiye pêkanîn. Bîrdozî bi awayekî sift ji Rojhilat tê wergirtin. Homeros bixwe jî hozanekî ji Rojavayê Anatolya ye. Lêbelê ev rastî girîngiya ramana felsefê ji holê ranake, vê yekê dide pêş ku malê hevpar yê şaristaniyê ye. Bi awayekî diyalektîk ramana felsefê, berhema dorhêleke wisaye ku li Rojhilat êdî raveyên mîtolojîk bi kêmasî ne, bîrûbawerîya mirov tîr nakin û êdî mirov bi xwe dikenînin. Jiberku mîtolojî û pêve girêdayî nêzîkbûnên olî, weke kemneke (xêlî) bîrdoziyî dikevin nav kêmasiyan, heyînen giyan û bîrûbawerîya mirovan dikevin nav lêgerînen nû. Bawerîya olî ya civaka Grek ku ligor civakên Misir û Babîl gelekî lawaz e û yên heyî jî ne hişk in, rejîma siyasî ku nêzikî komar û demokrasiyê, zemîna doringî ku derfetê dide xweşî û dema vala, dorhêla ramana nû bikêrhatî dike. Pêdiviya dewlemendiya doringî û rejîma siyasî ya bi nîqaşan, derfetên ewlekarî û azadî bi xwe re tîne. Serdema ku ji xwedayan tê tirsandin, derbas dibe, dewleta bajêr ya tevlîhev, bêhtir pêdiviya ramanên nasyonî û nêzikî aqil nîşan dide. Kartêkera bingehîn ku di bin hemûyan de, şaristaniya koledar ku sê hezar sal li pey xwe hiştin, piştî pêşketinên xwezayî û gihîştinê, êdî nikare ji nûhîneke cidî bireve. Sazûman ber bi dawîya xwe tê. Bandev û hilweşîn nêzik e. Esasê wê şaristaniya Greko-Romen îfadeya vê rastiyê ye.

Ev hemû merc nîşan didin ku êdî serdema bawerîya mîtolojîk borî ye, dema ramana bîaqil hatiye. Hebanka (tûrik) zanîne ya mirovan ku ji serdemên dirêj hatiye berhevkerin, pir mezin bûye.

Pratîka di serbareyî tîkber (tişt) de, agahdarbûna berhema kedê, di babetê taybetiyên xweza, rîwek û cîhana ajalan (lawir) de, roleke serwestker dilîze. Têkiliya sedem û encamê, bêyî hebûna giyan û xwedayan jî, xwe nîşan dide. Bêyî viyana mirov û xwedê, xebitîneke xwezayî ya serbixwe heye, çiqas ku diçe bêhtir xwe bi cîhana bîrûbaweriyê dide pejirandin. Ji cîhana baweriyên saxik (saf),

çiças ku diçe bêhtir guman (şik) xweyî dibin. Wêrekî (cesaret) tê kirin ku ji cîhana xeyalên zarokî derbasî cîhana rastiyê bibin. Ev hemû ji vê rastiyê tînin ku cîhana bazirganiya Grek, xwe digihîne her derî, ji keşkirina razan (sir) hez dike û berjewendiyên xwe dibîne. Bazirganiya ku Sumer bisînor pêkanîbû, bazirganiya Grek bi biryare ku heta bi dawî bi meşîne. Weke bajariyên (bûrjûva) pîşesazî (sanayî) ku jibo qezencê (kar) sînor nasneke. Zagonên xwedayan teng dimînin, pêdivî bi hêza takekes heye ku jibo cîhana bazirganiyê ku tê guhertin, wek hêza aqil ji xwe re bilez bihizire (birame). Mîtolojiya ku jibo heyîna çandinî ya demsalî ku sekinandî, têra bazirganî û pîşekariya bajaran nake, dikeve rewşa pêkeniyê. Zor li çîna civakê ya serdest tê kirin ku ramana xwe ya serdest derîne holê. Dîsa di bingeha heyîna tîkiliyên koledarî de, veguherîna di heyîna çînan de, wê di seresaziya xwe de veguherîne biafirîne.

Mirov dikarê di ramanê de, liser mercên berbiçavî û neberbiçaviyên şoreşa felsefî zêde raweste. Lê jibo terîfkirineke rast, ev destnîşankirin bes in. Derûna wê jî ev e ku çawa pêşveçûna şaristaniyê, di binesaziya xwe de bi girêdaneke diyalektîkî mîna zincîrekê ye, di amûrên sêwiran û veguhêzîna yên bîrdozîyî de jî ku saziyeke bingeh ya seresaziyê ye, di nava tevahiyeke diyalektîkî û girêdaneke zincîrî de ye. Heger ku ne ji ber xwe ve û ne ji danehevên xwe be, bi dahîtiya kêfî ya hinek takekesan, dernakeve holê. Ev yek ya bi vî rengî, rola ramangêr (hizirmend) yên felsefî piçûk nake. Berevajî vê, tê wateya ravekirineke rast ku berhemên kîjan mercan e û çawa afirînerên şaristaniyeke mezin in. Rê ji vê yekê re vedike ku bi mafdarî werin nirxandin û encamên rast wergirin.

Di serdema feylesofiyê de, piştî qutbûna ji mîtolojiyê, pêvajoyeke ramanê ku liser du bingehan û bi nakokî destpêdike.

a- Rêbazîya ku pêhesî bingeh tê girtin, giraniya xwe datîne ser pratîkê. Heyîna xwezayê ya berbiçav nasdike. Têdigihîje sedem û encamên di navbera bûyeran de, dizane ku mirov xwedî zagonên serbixwe ye ku ji çalakî û daxwaza wan cudatir e. Şewegirtina yekem e ku di warê agahdarbûnê de, bi ezmûn û çavdêrîkirinê dilive. Hewl didin ku bêyî mîtolojî û dogmayên olî, bigihîjine şeweyeke ravekirina xwezayê. Kevirên rêya ku yê wan bibe zanistê, bi awayekî zexm tînin danîn.

b- Rêbaza ramana baqil ku hişyar bûyî û rê li ber hîkarîkeriyê mezin vekirî, hê jî di bin bandora dogmayên demên borî de ye. Aqil, ji îlankirina serxwebûna xwe hê gelekî dûr e. Lêbelê dîsa ji siya xwedayan dûr, bi wêrekiyeke mezin li daristaneke destpênebûyî (bakîr), dimeşe, herwiha ku bisînor be jî, gava ber bi ramana serbixwe diavêje. Tiştên ku heyîna di ramanê de pêktên. Cîhana berbiçav anku tiştîyî dîmen e, xapandine. Ramana ku aqil çavkaniya wê be, herî binirx e. Bêşik liser vê, bandora ramanê ya ku bi xwe rabûye ser lingan, heye. Ewqasî hîkariyê dike ku li derî wê rastî hebe tinebe, ne girîng e. Bandora hemû yekemînan çawa hîkarîker be, ev pêşveçûna dîrokî jî bêyî piroleiyî (zêdeyî) pêknedihat.

Jiberku me hinekî, behsa nûnerên van herdu beşên ramana felsefî kiribû, em careke din dûbare nakin. Lêbelê dive em bînin ziman ku herdu beşan, li qasî mîtolojiya Sumer, bandora xwe gihandina heta îro. Çawa di bingeha baweriyê me de, mîtolojiya Sumer rol dilîze, di bingeha ramana me ya felsefî û zanistî de, ramanên ku ji van herdu beşan diherikin, rola xwe dilîzin. Ew mîna pêxemberên felsefê ne. Di serî de, Thales, Phytagoras, Pharmanîdes, Herakleitos, Sokrates, Platon û Arîsto, yên ku zincîreke êkolê derandine holê û her yek ji wan xekek ji yên vê zincîrê, di çêbûna hêza ramana me de, bi hindikayî li qasî pêxemberên cîhana baweriyê me, xwedî par in. Di derandina holê ya hêza takekes de, çavkaniyeke kesîti ya jêneger e. Ol û mîtolojî bêhtir pîroziya civakî û statûkoyê didin pêş, lêbelê felsefe mizgîniya takekesê hişyarbûyî ku ber bi azadiya xwe direve, dide.

Herçiças ku ol û felsefe, di pêşveçûnên şaristanî de, saziyên jêneger bin û herçiças ku xwedî kokeke mîtolojîk ya hevpar in jî, çiças ku diçe ji hev dûr dikevin, ditewişin û pozberî hev dibin, car caran jî di sentezeke raser de, dibine yek. Di navbera cîhana raman û baweriyê de, zagona hebûnê wiha li dijî hev û yên ligel hev derbasdar e. Ev zagon wê bixebite û pêşveçûn wê çêbibe. Ev zagona ku yê wergere zagona di navbera herdu beşên felsefê de, wê ramana felsefê heta weke îro, bi şeweyên tewişin (nakokî), pozberîti û bi gihîştina sentezê, pêşveçûnên xwe bide meşandin. Zanistê pêşve dibe û xwe jî bi zanistê xweyî dike.

6- Tevkariya Grek ya liser şaristaniyê, bandoreke mezin liser huner û mirûz (moral) jî kiriye. Di warê muzîkê de, digel bandora Sumer, reseniyek jî hatiye jiyandin. Di perwerdeya dilînan de, pêşveçûn çêbûne. Him strana perestgehê û him jî cureyê takekesî jî pêşvedîçin. Phytagores mûzîkê weke zimanê gerdûnê şîrove dike, Sumer jî xwedî nêzikayîyeke wiha bûn. Jiyan tenê bi mîtolojî, wêje û zimanê feylesofî nayê ravekirin, ravekirina bi muzîkê qenc û qenc rûdine. Di qesirbendiyê de bandora Sumer diyar e. Piştê Misrê, di warê qesirbendiyê de, pêngava duyem tê avêtin. Dera ku çanda Helen lê hatî belavkirin, bandora qesirbendiyê li wan deran kiriye. Di hêla peykervaniyê de,

ekolek afirandiye û tevkariya wê li ber çavane. Weke ku bi bedewiyên xwezayê re pêşbaziye bike, şayesandineke (tasvîr) zindî pêktîne. Bi tamamî, behreya (qabîliyet) hunera Grek ku ji cîgehî gerdûnî dibe, xwe nîşan dide. Tevkarî weke berhema sentezeke bilind, derdikeve pêşberî me.

Pêşveçûna bi vî rengî, di qada sinc (exlaq) de jî tê dîtîn. Bi taybetî têgihîna "xûypakî (dîlpakî)" ku bi Sokrates pêşveçûyî, berpirsiyariya takekes ya civakî eseyî dike. Tê derpêşkirin ku pêşveçûneke hemû takekesan ya rewşenbîrî pêkwere. Paroleya vê yekê "xwe bizanibe" ye. Heger ku em xûypakiyê, di hemû qadên xebatê de weke gîhaştina tekûziyê bi nirxînîn, tiştta ku yê li para takekes bikeve ev e ku di warê karê ku pêktîne de, bibe xwedî zanîn û herwiha jiyaneke bi xûypakî pêkbîne. Jibo takekes lebta bi berpirsiyarî, dibe pîvana sincê baş. Têgihîna lebteke sincî ya bi vî rengî ku bingeha wê ji Zerdestiyê tê, pir girîng e. Heger ku bisînor be jî, azadîbûnekê derpêş dike. Di têgihîneke sincî ya bi vî rengî de, takekes dikare qedera xwe bidest xwe bixe. Heçku di têgihînên gerdîşên berê de, berî bi gelekî bê rêzikên ku nirxên pîroz diyar dikirin çibûn, wê wisa were livandin. Pêşveçûneke bi rengê din, qet nayê aqilan. Jixwe di sazûmana baweriyê de, her tişt ji aliyê xwedayan ve tê diyarkirin. Takekes nikare di asta siyê de jî, bibe heyînek. Derûniya felsefeya benî û kole jî di vê yekê de ye. Ev yek gelekî hîkarîker e ku vîna çawa takekes û di kesayetiya wî de, civak dîl girtiye. Lebta sincî ku xwe bi mîtoloji û baweriyaya olî xweyî dike, bi taybetiyên gerdîşên ku ji kevin de mayin, serdestî lebta takekesan dibe.

Ji asta lebta azad a takekesê serdema neolîtîk ku herçiqasî bi awayekî pevrayî (kolektîv) dijiya jî, paştir e, di girêdanên xwe yê bîrayî û giyanî de, bi bîrdoziya ku bi "qeder" binavdike ve girêdayîye û di wê baweriyê de ye ku heta hetayê yê bidomîne. Ev têgihîna sincî ku Şaristaniya koledar, bi destê rahîban dide civakê, di domandina sazûmanê de, roleke bingeh dileyîze. Di doktrînen Zerdest, Bûdha û Sokrates de, tiştta ku êrîş lê tê kirin û tê perçekirin, ev têgihîna sinc e. Sedema ku van bi nûsazîparêzên mezin binavdikin, ji vê yekê tê. Dibe ku bi awayekî vekirî li hember xwedê anku li hember şaristaniya koledar dernakevin, lê di derûniya wê de, rêya ku diceribînin, jibo azadiyê perçekirina sazûmanê ye. Ev pêngavên ber bi azadiyê ku BZ di sedsala 5an de pêkhatin, çîqa ku wêde diçe, bi hêz dibe û rê li ber têgihînên lebt û sinc vedike.

Di beşên pêşiya me de, divê ev pirsgirêka ku bi taybetî jibo rexnekirina dema me, weke mijareke bingeh were dîtîn. Têgihîna "takekesparêz, sincê azad" li hember tegihîna sincê di sazûmana benî û kole de ku demeke dirêj domandiye û heta dema me bandora xwe kiriye, xeteriya ku takekes di bin tûmê xwe de dîl bigire, bi awayekî berbiçav îfade dike. Ev têgihîna sinc ku bi taybetî di şaristaniya Ewrûpa de gihaye bandevê, nirxandineke pîralî û pêşvebirina alternatîfêkê dixwaze. Heger ku ev têgihîna "sincê takekesparêz" ku ji aliyê zanist û teknîkê ve, bi awayekî bêsînor tê xweyîkirin, neyê dahûrandin, yê mehdemînên mezin rake, rê li ber curê şerên şet û har ên sedsala 20an veke û yê sazûmaneke wehşî û hovanek bi mirovan bide jiyandin.

Rola şaristaniya Grek ya di derizîna vî mirûzî de, bêşik ber bi aliyê pêşveçûna sincê takekes ve ye. Bi Roma ev hê pêştir dikeve û di şaristaniya Ewropa de digihe bandevê. Aliyê derizîne yê din, "çanda lebta Rojhilat" an jî sincê wê, yê diyar bike. Li Grek, çîqa ku diçe xweda dibe mirov û dikeve pêvajoya veguherîna hêza takekes, lêbelê di heyîna raman û sincê Rojhilat de, pêvajoyeke ku takekes xwe dike xweda û sazûmana damezrandî, bi sazûmana xwedê pîrozwer dike, pêşdikeve. Ev herdu têgihînên ku li Sumer xwedî kokeke hevpar û meyla viyanê, bi Zerdest tene derizandin (terikandin), veqetîna dîrokî ya Rojhilat û Rojava, her yekî weke xêzeke şaristaniyê ya stûr, heta weke dema îro girîngiya xwe winda nake, bi nakokî, pozberî û bi gihîştina sentezeke raser, didomîne. Jibo ku ev heyîna şaristaniyê ya nakok, di dema pêşya me de were vekirin, divê ku bi berfirehî bê nirxandin. Heta niha gotina lîberal ya kapîtalîzmê û gotina marksîzm ya sosyalîzmê ku hatiye pêşvebirin, derfet dane çareseriyêke bisînor û serveyî mane. Ne bihiştta ku lîberalîzmê belên (wad, soz) daye û ne jî ya ku reel sosyalîzmê daye, nayên pêkanîn. Heye ku çewtî di têgihîna bihiştê bi xwe de be. Emê nirxandinên di vî babetî de, bihêline dawî, armanca me vekirî û diyar e ku di bingeha nêzîkbûnên me yê dîrokî de, heger ji vê pirsgirêkê re ne çareseriyek be jî, emê ronahiyekê bînin.

Di derza (terk) kûrbûyî ya bingeha şaristaniya Grek de, rêya Rojava ku xuya kirî, bêşik mirov bingeh digire, behreyên wî bikartîne û hewl dide ku xweza û civakê dahûrîne, berjewendiyên takekes dide pêş, asta aborî, civakî, çandî û siyasî pêşvedibe, herwiha bi van pêkanînan bingeha çûyina pêş avêtiye. Ev şaristanî bi Arîsto digihîje bandeva bîrdoziyî, bi belavbûna Skenderê Mezin ya rojhilat ku heta bi Hindistanê çûyî, serdestiya xwe liser hemû şaristaniyan çespandiye. Şagirdê ramana nû ku xweş perwerdebûyî, di peywira xwe de, serkeftineke bi şeml werdigire. Şêweya ramana Rojhilat, bi taybetî li Babîl, jiberku ketiye nava nîqaşên rahîban, hêza xwe afirînêr ya kevin winda kiriye, encex bi jêgirên (kopya) nivîsarên kevin têkildare û di nava asteke nizim de

weke ku xeniqî be lêhatiye. Brahmanîzma Hindê, bi dubarekirina sazûmana kevin ya rahîb-qeranên Misir û Sumer, mijûlin. Hirmijîna (şîqîn) viyana Zerdeşt, vê nizimbûnê ranawestîne. Ji aliyekî ve pêşketina olên yek xweda, rê li ber pêşveçûnên bisînor vedikin, lê nikarin ji têgihîna dewletên rahîb ku bingeha wan bi awayekî zexm hatiye danîn, derbas bibin. Sazûmana nasnameya civakê ku li dor perestgehê hatiye hûnandin, dewletbûnê weke îfadeya sazûmana gerdûnê ku neyê guhertin ya liser rûyê erdê, bingeh digire. Hemû bîrdozî û sinc ligor vî esasî nû dibin, tên raxistin û tên payîdarkirin. Takekes ji esasî tê windakirin. Sazûmaneke xwedayî tê serdestkirin. Têgihîn û sincekî ku tenê tiştê were gotin, bînine cîh, serdest bûye. ædî em li pêşberî "rêya Rojhilat" in ku mirina jibo qeranê xwe, jibo efendî û mamosteyê xwe, xûypakiya herî mezin dibîne. Herçiqaş ku êrîşa viyana azad ya Zerdeşt, gihabe heta bi Atîna, lê jiberku di nava têgihîna Rojhilat de xerq bû, li hemberî Skenderê 25 salî ku şagird bû, têkdiçe û serdestiyê bi dev Rojava ve berdide. Heçkû hêza Rojhilat ya daringî gelekî mezin e û leşkerên wê jî ewqasî zêde ne. Lê ev têgihîna ku her tiştî bi dev xwedê ve berdide û qeranên xwe diêxe dewsa xwedê, li hember rasyonîzma Arîsto gu derandiye bandevê, li hember serdema aqil, ne xwedî ti nirxên berhemdêr in û ji têkçûnê rizgar nabin. Ji windakirina vî şerî "rêya Rojhilat berpîrsiyar e".

Li Çîn û Hindê ya ku vê rêyê di şopînin jî, encam eynî ye. Di destpêka Serdema Navîn de, bi helatina êslamê re, zindîkirina ceribandînan nûsaziyan, bi hemû şeml û domdariya xwe ya dirêj re jî, jiberku yê di "rêya Rojhilat" de ziq bisekine û bimîne, yê li hember "rêya Rojava" têkbiçe. Ger ku em balbidinê û di beşên pêş de, liser rawestin emê bibînin, tiştê ku bilindbûn û hilweşînê diyar dike, qalibên lebta sinc û heyîna mantiq yê di bingeha sazûmanan de ne, yê şîkil dide van, şeweya raman û hêza viyanê ye. Di mînaka Grek de, bi awayekî hîkarîker tê çespendin ku di zayîn, bilindbûn, veguherin û hilweşîna şaristaniyan de, kartêkera rola xwe dilîze, bîrûbawerî û nirxên mirûz in, nirxên daringî encex bi van nirxan ve girîng dibin û pêşvedicin.

2- Dema Roma ya şaristaniya koledarî

Di mercên ku bilindbûna Roma amade kirin de, li bakur Konfederasyona Etrusk ku ji 12 herêman derketî holê, pêşveçûna xwe didomîne. Ev yek dabaşa xeberdanê ye ku çanda neolîtîk niziliye herî kûr, gelê ji koka Latîn, ji BZ salên 1000an dest bi teknîka hesin dikin, bi hêz dibin, belavdibin û dexma xwe li heyîna etnîk ya nîvgiravê dixin. Etrûskan nirxên şaristaniya Mezopotamya di ser Anatolya re anîne û heta bi bilindbûna Roma, rola pêşevaniyê listine. Çavkaniya herî girîng ku Roma xweyî kiriye. Mêhtingebûna Helen ya li başûr, rewşeke Rojavayê Anatolya ya duyem diafirîne, gelek dewlet bajar tene avakirin. Serdestiya bazirganî, çandî û bîrdoziyî, timî di rewşa pêşveçûnê de ye. Li başûrtir Qerantiya Sîrakûza û li Bakurê Afrîka şaristaniya Kartaca ya ji koka Fenîke, demeke rewnaq dijîn. Bandorên Rojhilata Navîn yê şaristanî, di ser van cokan re li bingeha Roma tene raxistin. BZ di salên 750an de, tê dîtin ku Roma weke dewlet-bajarekî qerantiyê derdikeve holê. Digel ku bandora Etruskan ya kûr liser heye jî, komên ji koka Latîn dexma xwe li pêvajoyê dixin. BZ di salên 500an de, Roma weke komareke ji koka Latîn ber bi bilindbûnê ve diçe. Bi taybetî jevqetana (dêran) heyînen etnîk û têkoşîna hişk ya çînî di navbera esîlan (Patrîcî) û yê qismê jêr ku hejar (Pleban) de, rê li ber sazîbûna komarê vedike ku lihevhatinekê pêkbîne. Senato û komel (meclis) yê gel, ji mînakên xwe yê li Atîna bi hêztir hatine çêkirin. Birêvebirin (magîstra) û darizandin (preator) jevqetanî saziyan dibin. Çiqas ku pêdivî çêdibe, sazîbûnên wiha derdikevine holê. Hemwelatiya Roma, girîngiyekê qezenc dike. Mafê hemwelatbûnê ku pêşî dane gelê bajêr yê Roma, piştî ku li tevayî nîvgiravê belavbû, pîrsgirêkê komarê zêde dibin. Piştî ku xeteriya Kartaca (BZ 264-146) hate derbaskirin, hêdî hêdî pêvajoya serdestiyê liser Helen tê damezrandin. Dema ku BZ dikeve sedsala dawî de, bi taybetî bi seferên Sezar, fethandina Galya (Fransa), Başûrê Almanya, başûrê girava Brîtanya, Spanya, Rojhilatê Derya Spî û Anatolya li ber dawîbûne ye. Misir dikeve û dibe eyaleteke bîndest. Liqasî kelayên şaristaniyê yê bingeh, gelek perçeyên axa destpênebûyî jî, dikevine bin destê Roma. Serdema Helbestvan Vergîlius hatiye êdî. Li dewsa rejîma komarê, rojên împeratoriye û dema împeretoran, ya bihêzan û ya hemwelatiyên di pileya yekemîn de, hatiye.

Hikmê dîrokê mîsoger e ku ev bilindbûn û belavbûna şaristaniya koledarî ya Roma, ji hemû hêzên ku heta wê demê çêbûne mezintir e. Lêbelê kartêkerên ku di bingeha vê de, bi bingeh girtina krîterên berbiçav, ji ravekirinê dûrin. Nêzîkbûnên mîtolojîk, mezinkirî û fanatîk yê di zayîna Grek de, jibo mînaka Roma jî, derbasdarin. Şaristaniyên ku heta îro bi şeweya "eznavendî" li ber çavan hatine girtin, li vir jî heta dawî angaşta (îdîa) xwe berdewam dike. Peywira ku dikeve ser milê dîroka zanist de, pîvana di cîh de deyne û raveyê rast bide kirin. Ev ne tesaduf e ku Helbestvanê mezin Vergîlius, di Destana Aîneas de, damezrandina Roma bi Aîneasê ku di berxwedana Troya de cîh girtiye û paşî hatiye êtalya ve, girêdide. Herwiha ew koka çandî ya ku Roma derandiye holê

nîşan dide. Ev rastiyeke nayê înkarkirin ku Roma ji çanda Grek, bi awayekî tund sûd wergirtiye û heta berdewama wê ye. Di vî babetî de, bandorgirtina rasterast ya ji Anatolya, Misir û Fenîke, di pilana duyem de ye. Bi pêwana Grek ku ji vê çavkaniyê xwe xweyî kiriye, bi awayekî nerasterast (neyekser) xweyî bû ye. Heger ku wiha jî be, dema em li bandora Sumer ya bi Etruskan re dinêrin, em vê rastiye dibînin ku şaristaniya Rojava, xelesa mezin ya dawîye ku ji Rojhilata navîn belav bûye. Çawa li Rojhilat xelesa dawî emperetoriya Çînê ya spartî Okyanûsa Mezin e, li Rojava jî, xelesa dawî, emperetoriya Roma ya spartî Okyanûsa Etlas e. Herwiha Roma xelesa sêyemîn ya mezin e ku ji Heyva Berhemdar ya şaristanî jê helatî, xweyî bû ye. Zimanê şaristaniyan yê pêşveçûn û belavbûnê, hinekî wiha ye.

Dema şaristaniya Roma were dahûrandin, ku bi Sumer re were hevberkirin ev yek wê gelekî hînger (fêrker) be. Sumerî orîjînalê hîmê civakî ya koledarî ne, Roma di derawa hêza wê ya temamker de ye. Sumerî hemû binesazî û seresaziyên sazûmana xwe, di bingeha temsîla sazûmana asîmanî ya liser rûyê erdê, bi ramanêke mîtolojîk û bi çanda perestgehên rahîban ya pîroz, dixemilînin, lê Roma çanda Grek jî distîne, bi awayekî rasyonel û bi şeweya komareke laîk berbiçav dike. Qeranên xweda cîhê xwe didine împeratorên xweda. emperetor Sargon nimûnakî herî pêşî yê împeretora ye, çavkaniya bestê (îlham) û rewîştên bingeh ya împeratorên Roma ye. Dema ku mîtolojiya Sumer orîjînal e, ya Roma weke jêgirteke wê ya ji destê sêyemîn e. Destana Gilgamêş wergeriyaye Destana Aîneas. Em dikarin van hemberhev girtinan di gelek mijaran de nîşan bidin. Girêdanên di navbera wan de weke hev û mîsoger in. Cudahî ne di derûnê de ne, taybetmendiya şeweya kuxwezayî ya ku cîh û demê rê li ber vekirîye. Heger ku em mînakeke bêteşe bidin, Nirxên şaristaniyê yên ku Xwedawend êştar (ênanna) di bêje "me yên min, zagonên min" weke gulokeke berfê ya piçûk, ji pesarên Toros û Zaxrosan dixindire, ji rast û bestên Mezopotamya diçe geliyê Nîlê, liwir hê mezintir dibe û dixindire Anatolya û hemû Rojhilata Navîn, ber bi nivgirava Grek û ji wir jî diçe nivgirava Êtalya, Di ser Alpên Bakur re, di ser şopa pêşiyên xwe re dema ku digihe kaşîkên Roma, dibe gulokeke bêhempa. Di vî babetî de, şaristanî dişibe gulokeke berfê, çî dera ku tê re dixindire hinek nirxan bi xwe re hiltîne û dibe mîna aşîteke ku kesek nikaribe xwe li ber bigire. Bi van nirxandinan, em gewrebûna Roma û aliyên wê yên resene, piçûk nagirin. Em çavkaniyên ku ew xweyî kirine bi awayekî rast û berbiçav dipeytînin (tesbît dikin) û herwiha dixwazin nirxê wê yê rast terîf bikin. Tiştêkî ku rast neyê terîfîkirin, di derbareyî wî de biryar û nirxandîneke rast nayê kirin. Bêşik nirxên şaristaniyê yên ku Roma resene kirine hene. Heger ku em bi xalên sereke bişopînin, wiha ne:

1- Di heyîna mîtolojîk de, resenî zêde tine. Cîhê xwedayê Babîl Mardûk û yê xwedayê Grek Zeus, Jupîter girtiye. Cîhê Dîonyos Lîberte digire û Afrodît dibe Venus. Xwedawenda Anatolya Kîbele, tevî perestgeha xwe kişahye Roma. Li vir mijara bingehîn ev e ku em bibêjin, esîlbûn û orîjînalîteya mîtolojiya Sumer ya afirandinê, piştî di dem û cîh de timî hate resenekirin û pişavtin, heta ku giha Roma temirî dibe û ji bawerdêriyê dûr dibe. Şeweyên nû ku werdigire, her yekî di nirxê nîşanekê (sembol) de ye, tenê rêzê jê re tê girtin. Di babetekî de Roma bijartekera (ekletîk) olî ye û çêkirî (xwedest) ye, eynî weke DYA ya roja îro. Esasê wê ol di siyasetê de sift bûye. Siyasetê bi xwe jî mîna ol pîrozwerî qezenc kiriye. Saziya ku tê bilindkirin, bi wateya klasîk ne ol e, siyaset e. Bîrdoziya Roma pêdiviyê bi kemna olî nabîne, bêhtir hez dike ku xwe bi nirxên siyasî deyne holê. Ji dewleta pîrozwer ber bi dewleta laîk (li derî ol) pêngaveke bingehîn tê avêtin û zemîn te bidestxistin.

2- Tiştên bi watetir ev e ku li Roma pêşveçûna saziya siyasî, tevkariyekê dide şaristaniyê. Di warê demokrasiya çînî de, çiqas ku Atîna xwedî derawayekîe resene be, para Roma ewqasî diyarkere ku komarê weke şeweya rêvebiriyê bi zagonên hîkarîker, li cîhê sereke daye rûnandin. Wekî din her demokrasi nabe komarparêz û her komar jî nabe demokratîk. Di navbera herdukan de wekhevî jî nayê sazîkirin. Wekî din ev yek hatiye çespendin ku komeleyên yekem anku saziyên herî girîng ên demokrasiya çînî li Sumer derketine holê. Lêbelê sazûmana Roma weke rejîmeke ku xwedî sazî û zagonên pêşveçûyî, bi şeweya rêvebiriyê ku hîlbijartinê nasdike, tevkariyêke şaristaniyê ye. Şeweya serdestiya çîn ya herî pêşveçûyî ye. Dikare were nirxandin ku demokrasiya Atîna, şeweyêke demokrasiya gerdîşî (toreyî) ya piçêkî pêşveçûyîtir e û kurt domandîye. Rewîştên laîk ya komara Roma, reseniyêke girîng e. Yên rêvebir kemna olî ji xwe re nakine mertal, nevbera wan bi hemû olan re yek e, ku bi berjewendiyên wan nelîzin bi wan re lihev dike, heta wan dipejirînin û herwiha bûne xwedî rejîmeke pir ol. Mirov dikare behsa olê Misrê, yê Sumer an jî yê Atîna bike. Lêbelê behskirina olê Roma ne hesan e. Di vî babetî de Roma, wisa xuya dike, weke DYA û YE yên îro ku pêşveçûne û li herêmên şaristaniyê gihane piranîparêziyê ye. Lêbelê du mînak, dema Roma ya siyasî û aliyê têgihîna olî hîkarîker e. Lê olê Mîtra yê ji koka Hind-Aryen ku di pêşveçûna çîna leşkerî de, tevkariyên wî hene, ti nemabû berî xiristiyanîyê, bibe olê fermî. Ji ber vê yekê, heta bi

nava Ewropa, destûr dane çêkirina perestgehên Mîtra û şûnwarên wan heta roja îro hatine. xiristiyanî, jiberku heyîna leşkerî lawaz dike, dibe armanc (hedef) û êşkenceyê hovnak (wehşî) lê tîn kirin. Dema ku di pêvajoya jevketinê de, tê dîtin ku mîna çimento yê bihevkekirinê pêkbîne, niha dibe olê fermî. Di têkiliyên dewlet û ol de, derûna hêmanî danîne aliyekî û timî berjewendîtî bingeh hatiye girtin.

3- Di pêşveçûna şaristanî de, tevkarîya Roma ya sazîtiyê, di warê hiqûq de ye. Heta wê demê hîqûqê gerdîş darbasdarbû, ji aliyê din ve gotinên rêvebir, kes û saziyan ku xwe dikin dewsa viyana xwedê, di warê hiqûq de hîkarîker in. Ne zanistekê hiqûqê ne jî saziyekê fermî ku hiqûqê çêbike, tine ne. Ev erkeke (fonksiyon) bingehîn ya komara Roma ye ku viyana çînê ya hîkarîker, nivîskî û fermî, bi sazûmanekê rêzikî, bangewazî (îlan) dike û disepîne. Ji ber vê yekê têkoşîna di navbera Patrîcî û Pleb de, bi sedsalan domandiye. Aloziya (tevlîhevî) civakî ku pêşveçûyî û gelicî, pêwîstiya sazûmana hiqûqê derandiye holê. Ev hinekî jî qedera Roma ye. Pêşî bajarê Roma vê sazûmanê rûdinîne û di pey re, li tevaya împeretoriyê vesaz dike, anku dikevîne merhaleyê ku rêzikên hiqûq bi awayekî fermî derbasdarbin. "Pax (Paks) Romana", aştîya Roma ku di dîrokê de binav û deng e, tê wateya serdestiya sazûmana fermî ya bi hiqûqê Roma ve girêdayî.

Hiqûqa Roma, çavkaniyê bingehîn ya hiqûqa nûjen (modern) e. Hemanên vî hiqûqî di roja me de jî, derbasdariya xwe diparêze. Ev yek, jiberku erkên civakî bi cîh tîne ye. Nîrxên şaristaniya civakê ku hiqûq pêşvedibin, timî bilind û payîdar mane. Çiqa ku civak pêşveçûyê, tenê bi rêzikên olî û gerdîşî nikare were rêvebirin. Sazûmana fermanê ya rêvebirîya siyasî jî, têrê nake ku sazûmanê damezrîne û biparêze. Siyaset karekî wisa ye ku venêran û rêzikên rojane pêktîne, lê hiqûq sazûmanekê wisa ye ku hemû kesî (hemû hemwelatî û saziyan) demên dirêj û bi awayekî wîredar (biezm) digire nava xwe. Dikare wiha jî were ravekirin ku payidar bû ye, liser lihevhatîneke bingeh hatiye çêkirin, jibo herkesî xwedî hêzeke sepîn e û siyasetekê bingehîn ya siftbûyî ye. Di vî babetî de nîrxê komara Roma yê hiqûqî, bilind û şaristanî ye.

4- Ev bêşik e ku Roma di warê leşkerî de, hêza herî mezin ya demê ye. Lêbelê pêşveçûnên Babil, Asûr, Pers û Misrê yên di warê leşkerî de, zêdetirî ku di derûna xwe de derbasbike, dikare weke hêzeke gihîştîbe xweseriyê û resenebûyî, bê îfadekirin. Li hemberî çîna siyasî, bi taybetî Bi destpêkirina Sesar, beşek leşkerên xweser dixwaze ku giraniya xwe liser siyasetê deyne. Hê di merhaleya konfederasyonan de, kesên ku hêza wan ya leşkerî û desthilatiya doringî li pêş, weke serkar (şef), serok, qeran û împeretoran, di kesayetiya xwe de, navên siyasî, leşkerî, hiqûqî û olî dabûne hev. Di vî babetî de, dîroka şaristaniyê dîroka pêşveçûn, veqetan û xweserbûna van saziya ye. Veqetana bingehîn ya ku di Komara Roma (vê dawiyê împeretoriyê) de pêkhat, veqetana giraniya navendên siyasî û leşkerî ne. Lê ev veqetan li Sumer û Misrê, di navbera saziyên rahîb û qeranan de ye. Herdu veqetan jî demê dirêj û bi têkoşîneke hişk pêkhatine, ligor girîngî û hêza xwe sazûne. Çi dewleta ku hatiye damezrandin, veqetaneke wiha an jî yekîtiyek bingeh girtiye. Eslê wê tiştê pêkhatî, gihandiyê sazûmana pratîk, anku ne afirandiyê. Afirandin, di warê bicîhanîna tiştê resene, dema dîrokî û pêdiviyên civakê de, çalakiya pêkanîna tiştê bingehîn e. Di pişt vê de, bîrûbaweriyêke pîralî, giyanî û têkoşîneke çînî heye.

Ev gelekî girîng e ku Roma ji teknîk û taktîkên leşkerî zêdetir, di rêxistina artêşê de, lejyonên navendî û herêmî bingeh digire. Leşkerî pîşekî payîdar û esîl e. Bi vê taybetiya xwe, heta weke îro bandora xwe domandiye. Serdestiya ku saziya leşkerî, li hember hemû hêzên civakî û siyasî bidest dixê, bi bîrûbawerîya Roma ya di vî babetî de, bi heyîna giyana wê ve û bi kevneşopîya saziyên wê ve girêdayî ye. Dema ku leşkerek yan jî generalek bixwaze bilind bibe, bixwaze giraniya xwe deyne ser siyasetê, ew kevneşopîya Roma didomîne.

Mînaka vê ya yekemîn Sargonê Akadî ye û mînaka dawî ya bi şeml, Napoleon Bonapart e. Lêbelê di roja me de jî, bandora xwe liser siyasetê dike, bi taybetî di demên qeyranê de, rolên erkî digire ser xwe. Bi gelemperî ev nêrînen siyasî bi "Sezeryanîzm" an jî "Bonapartîzm" tîn binavkirin.

5- Di diyarkirina statuya çînên civakî de, tevkarîya Roma girîng e. Aliyên wê yên resene evin ku bi taybetî her çînekê digire nava hiqûq û bi erk dike, girêdanên di navbera hemwelatî û çînîyê de zelal dike, maf û peywiran birêkûpêk dike. Bi mîsogerî têgîna çînîyê fermî kiriye. Heta di dema împeretoriyê ya dawî de, derawaya her pîşe û tebeqeyê, di warê hiqûqê de birêkûpêk kiriye. Digel ku behsa mafên hemwelatîtiyê dike, ev zor e ku em bibêjin mafên mirovan yên bingehîn naskirine û fermî kirine. Latînî weke zîmanekî ku bilind dibe, di warê desthilatiyê de, derdikeve pêş û zîmanê Grek di pilana duyemîn de dihêle. Di warê perwerdeyî û tenduristî de, reseniyêke wê xuya nake. Digel ku di warê ramana felsefî, di ramana siyasî û hunera gotinbêjiyê (xîtabet) de, pêşveçû be jî, esasê wê bi filozofîya Grek ve girêdayî ye, hê bêhtir Stoatîti û Epîkurtîti bisaz û dezgeh bûne, pêşveçûne û bandora xwe kirine. Lêbelê dema ku li hevberî afirînêrî û çêkirina ekola filozofîya Grek

bê girtin, yê were dîtin ku Roma ji afirînêriyê gelekî dûr e. Bi gotineke din, jiberku Grek di vî babetî de rola xwe lîstiyê, tişta ji Roma re maye, rola xwendekariyê (şagirdiyê) ye. Çanda Helen, giraniya xwe di parêze û weke çavkaniyeke ku sazûmanê xweyî dike, rola xwe dilîze. Digel serdestiya Roma ya di warê leşkerî û siyasî de, serdestiya çand û ramana Helenîzmê dibe hêmana terazê û lihevhatinê, ev yek di pêvajoya împeretoriyê de, timî hatiye xebitandin û sepandin. Ji ber vê yekê dibêjine vê sazûmanê Greko-Romen, ev terîfîkirin bêhtir rasteqîn e. Di navbera herdu hêzên şaristanî de, şeweyên têkiliyê yên bêhijmar, sazî û raman, roleke hevpar dilîzin, sazûmanê pêşdixin, ligor hêza derawa xwe dabeş dikin (lihevpar dikin), carcaran jî tesfîye dikin. Herdu sazûmanên bingehîn, ligor dabeşkirina rolên xwe şewe digirin û hê bêtir hev û din xweyî dikin.

6- Qada aboriyê mezinahiyeke kûr û berfireh bidest xistiye. Beşeke girîng ji Ewropa, kişandiyê nava aboriyêke bi şeweya koledarî, di vî babetî de şaristanî kiriye. Bi berfirehî hesin, di warê çandiniyê de bikaraniye. Çandinî weke pişeyekî bingehîn yê esîlan, qada herî bijûndar (saxlem) ya çalakiya aborî ye. Sazûmana cotyarî (latîfundîa) derbasdar e, kevan (kemer) û coyên avdanê pêşketine. Bazirganî û pişekarî, karên ku di pilana duyem de ne û bi awayekî bêeslî têne dîtin. Rûmet (îtibar) a wan ne bilind e. Sazûmaneke rêyan ku gelekî pêşketî heye. Ji gotina xweş (wecîze) ya "Hemû rê digîhjin Roma" jî tê fêhmîkirin ku rêyên tevgerê gelekî pêşketî ne -digel bi leşkeriyê ve girêdayî bin jî- di pêşveçûna şaristaniyê de rola mezin listine. Derya Spî mîna goleke Roma, girîngiya xwe ya di warê bazirganî de pêşvebirîye û domandiye. Keştîvanî pişekariyêke pêşketî ye. Lêbelê dema bi Misir û Sumer re bête hevberkirin, di warê aborî de, tevkarîya Roma bisînor e. Ji sazîbûn û birêkûpêk kirina tiştên pêkhatî pêde, pêşve neçûye. Di rola amûrên aborî de, çîneke kole ya çandiyar gihandiyê pileyêke berfireh. Keda kole derandiye bandevê. Yekem car li bajarên, tebeqeke civakê ya bi navê proleterya ku dişibe çîna karker, tê pêkanîn. Esasê wê, bajarên Roma û Atîna, di bingeha sazûmana kapîtelîst de, pêşnimûneyên bajarbûyîna hemdem in. Bi bazar, sûk (çarşî), şano û arena xwe, bi akademî, perestgeh û serayên komela xwe, saziyên xwe ligor Misir û Sumer pêşvebirine. Ev bajarên ku bi qesirbendiyê zexm hatine avakirin, îro jî tevî kavlên xwe, gelekî hîkarîker in. Dewleta bajar çawa yekem car saziyêke Sumer ya sereke be, bajar bi xwe jî, taybetmendiyê Roma û Grek e ku bûye saziyêke nişteciîbûnê. Mînakên Sumer û Misir yên pêşî, hê bêhtir perestgeh, serayên qeranan, li derdora wan biryargehên karbeşiyêke tund û navendên rêvebirî û îbadetê ne. Ev mijareke kêmtê dîtin e ku ev navend liqasî pêdiviyên xwe, koleyên pişekar jî dihewîne û nefsen (nifûs) wan ji deh hezaran zêdetir in. Ev rewş bi vê yekê ve girêdayî ye ku çîna navîn pêşvenaçê û serbixwe nabe. Bajar weke sazûmana nişteciîbûnê ya bazirgan û pişekaran, pêşvedîçe.

Bajar, BZ di navbera salên 3000 û 2000an de dihele, BZ di navbera salên 2000 û 1000an de, berfireh dibe, şeweya bajarê Greko Romen vê demê xuya dike, piştî BZ salên 1000an, mezin û bi sazîbûn dibe. Bidestxistina derawayekî diyarker ya li hember gundê ku bingeha nişteciîhiya çandiniyê ye jî, di dema Greko Romen de pêktê. Heta BZ salên 2000an cîhan, di derya gundan û koman de, di saziya çend giravkên bajarbûnê de dijî. Dema serdestiya bajarên, BZ salên 500an destpêdike û di roja me de serweriyêke mezin bidest dixê. Herçiqas ku navekî şaristaniyê yê din medeniyet (bi erebî sazûmana bajêr) be jî, bajar û bajarvanî, ji aliyê rê li ber vekirina pirsgerêkên bingehîn ve, di rewşa çavkaniya bingehîn ya civakê û jiyana sazûmanê ku herî bêhtir gefan li şaristaniyê dike de ye. Bajar li qasî ku nav û nîşana şaristaniyê ye, çavkaniya wê ya ku bingeha xwe dirîzîne ye jî. Ji qada nişteciîbûnê ku mezin bûye bêhtir, pirsgerêkeke civakî ye ku bi kûrahî bête daûrandin. Dibêtiyêke (îhtimal) mezin e ku bûbe çavkaniyêke nexweşiyê ya bihêz. Ne tenê qirêjbûna derdor, divê ku şeweyên jiyana yên berevajî herka xwezayê, bi bajarîbûnê re li ber çavan werine girtin. Bi gelemperî nixandînan ku hatine kirin, bajar weke pîvaneke pêşveçûnê nîşandane. Di beşên pêş de emê bêhtir liser vê mijarê rawestînin, ev gelekî girîng e ku bi şaristaniyê re bajarîtî jî bê dahûrandin.

7- Di warê huner û zanist de, tevlêbûnên Roma yên li şaristaniyê, bisînor in. Bi taybetî di warê qesirbendiyê de, piştî Misrê pêşveçûna herî mezin li vira çêbûye. Dikare ji hunera qesirbendî û endezyariyê bête behskirin. Di vî babetî de ya rastî ev e ku şeweya Misir û Grek bingeh hatiye girtin û gihîştîye pileyêke bi şeml. Ev pêkanîn bi saya desthilatdariya koledarî ya bê sînor e. Heger ku keda koleyên nebûna, ne pîramîdên Misrê, ne jî berhemên qesirbendî yên Greko Romen ku qedirbilind, derdiketin holê. Sepîneke stembar ya liser nîşên mirovan, di pêkanîna van serberhemên qesirbendî de, xwe nîşan daye. Em deyndarî hunera qesirbendiyê ve demêne ku şano, arena, agora, perestgeh, serayên rêvebirên girîng û avahiyên din yên di navenda qesirbendiyê bajêr de cîh digirin, weke birhanên (berjeng) zindî yên dirokê, bandoreke mezin li hestên me dikin. Mirov bawernake ku tiştêkî din li qasî van berhemên qesirbendî yên dema koletiyê, bandora xwe bike. Bawerîya min ev e ku di bin vê rastiya bisêhr de, liqasî keda kola ya bikom û bêsinor,

bikaranîna vê kedê ya stemkar jî diyarker e. Şeml û xofa ku ev berhem didin, ked û şêweya bikaranîna wê ye. Ev şeml di çêkirina pir, kevane (kemer), goristan, kela û surhan de jî, tê dîtin. Şaristaniya Roma, çiqas mînakên qesirbendiyê yên di dema koletiyê de hatine pêkanîn hene, liser lêkolînan dike, digihîje sentezeke bihêz, qesirbendiyê xwe ya resene diafirîne û bi rastî jî, gihîştîye pîleya bandevê. Mafê kole çi hebe (mafê kole tine lê ev gotina wa ye), Roma ew bi awayekî şayeste (layîq) pêkaniye.

Di warê peyker de, weke berdewama Grek e. Behskirina orjînalîteke cuda zor e. Di muzîkê de, bi taybetî di wrê leşkerî de, sirûd û stranên serfiraziyê hatine resenekirin. Em dikarin behsa nimûneyekî cil û girêdanên (kinc) ku taybetmendiyên Roma, bikin. Esîltiya Roma xwe di cil û bergên wê re jî nîşan dide, lêbelê ev yek li ber çavaye ku ji Rojhilat berhevkirine. Di hunera wêjeyê de, bandora Helenîzmê xûya ye. Vergîlius xweziya xwe bi êlyada Homeros aniye û destana damezrandina Roma, "Aîneas" liser bîranîna Augustus ê mezin nivîsî ye. Lêbelê dîsa jî klasîkeke wêjeyê ya mezin e. Hunera şano pêşveçûye. Gotinbêjî bi awayekî derasayî girîng e û hatiye sazîbûnkirin. Şêweya zimanê êtalyan ku di warê îfadekirinê de ewqasî hîkarîker e, bawer dikim ku ji hêza gotinbêjiya vê demê tê. Di bin vê gotarê de jî, viyana hêzeke ku serdestî cîhanê heye. Desthilatdarên herî bihêz, digihîjin zimanê herî bihêz û bi rewabêjî (belaxat), para koleyan jî, dibe zimanê Ezop yê ku qet nayê fêhmkirin. Dema ez dihizirim ku di navbera hêz û azadiyê, serdestiya zimên û axaftina xweşik de tekiliyê heşk heye, timî peyvên desthilatdarên Roma yên gotardêrî (gotarbêjî) tînin aqlê min. ereb, spanyolî û îranî di pîleya duyemîn de ne ku ev hunera gotardêriyê pêşvebirine. Divê ku Vergîlius, him ji aliyê rewîşt û him jî ji aliyê zimên ve, weke îfadeya vê şeml û esîlbûnê bê fêhmkirin. Di warê zanistî de, dahênanên şaristaniya Roma pêknehatine, lê zanistiya ku tê zanîn, bi awayekî bilind hatiye sepandin.

Di asta terîfbûnê de, encama bingeşên ku ji van nîrxandinan bê deranîn, cîhê Roma klasîk yê di dîroka şaristaniya koledarî de, bandeva berî hilweşînê ye. Roma, hemû nîrxên biderûn, ligor girîngiya wan, baş lêdikole, berhevdike û wan werdigerîne sazîbûneke dewletê. Ji vê qenc haydar e: Dema ku civakên neolîtîk yên doh, bi zorê zikê xwe têr dikirin, li ber serê wan, nîrxên şaristaniyê yên ku ji mîrateyên koletiya sê hezar salan, xwe xweyî dikin, heşîn dibin. Ev jibo komên etnîk yên Latîn, xewna "serdema zêrîn" e. Gelek hêz û çanda şaristanîkirinê, ji Sumer ber bi Misrê, ji Persan ber bi Grek, di bin navê şaristaniya Roma de, ber bi sentezekê diçe, lê asta herî bilind, bi resenbûn û sazîbûnê re, rûbirû ye. Ev di heman demê de, şensekî Roma yê mezin e.

Di dîrokê de, kêliyên fersendê yên wiha çêdibin. Heger ku bi zanîn bînin nîrxandin, yê rê li ber pêşveçûnên ku ew jî yê bibine dîrok, veke. Şensê sumerîyan, şoreşa gund ya ku di çavkaniyên Dicle û Ferad de, pêşveçûbû ye. Tevkariya wan, afirandina sazûmana şaristanî û şoreşa bajêr e. Misirîyan jî ev şens li geliyê Nîlê bidest xistin. Li geliyên Çemê Zer şaristaniya Çînê, li geliyên Pencap û êndûsê şaristaniya Hindê, xelekên mezin yên zincîra şaristaniyên din in. Heger cîh hebe û were gotin, li pişt van pêşveçûnên ku ji hinekan re bûbûn şens, çawa keda mirovan ya mezin û hewldanên qehremanên bênav hene. Heger bê fêhmkirin, bê çawa liser vê kedê ew mîtolojiyên bi şeml û bihiştên liser rûyê erdê hatine damezrandin. Heger mafê wê bê teslîmkirin, li qasî hêviya cîhanên mezin, êşên ku tîgîna dojhê zayîne bêtine ravekirin, dibe ku hinekî dad bicîh bê û rastî were ser zimên.

Grekiyên ku ji çar aliyan, şensê şaristaniyê bidest xistin, qewmê Rojava yê yekem e ku herî zû ji vê yekê haydar bû. Bi bijîneke (mad, îsteh) mezin, tiştên ku ji Rojhilat hat, xwarin, xûnaftin û di merhaleyê jortir de, weke hêzeke şaristanî zayîna xwe pêkanîn. Di gotûbêjên xwedayan yên ku li dora xwedayê sereke Zeus, hatine pêşxistin de, mirov dikare bi çêşê (xiros) mezinbîşopîne. Di vê mîtolojiyê de, tiştên ku dive bê gotin, çîroka esîlên ku ji komên etnîk yên Grek qut bûne, ketine rewşa çîna serdest û nîrxên şaristaniya Rojhilata Navîn xûnifandine. Ev çîrok bi zimanê helbestî hatiye gotin û bûye destan. Bûye êlyada û Odysseia. Bûye zanista xwedê "Theologia". Hêzên aqil, liser vê bingeşê dane livandin û gihane felsefê.

Greki, jibo ku ji Rojava re bibine dergûşê resene, rola xwe xweşik listine. Lorîk (pêçek) bi awayekî tenduristî mezin kirine. Mirov ji kûderê binêre, zewaca bi Rojhilat re gelekî berhemdar bûye û zaroka ku ji vê zewacê çêbûyî, dema ku bû mîna Skender, xwe ne belaş li Babîl bi zewaca "Semîramîs" re rûbirû dîtiye. Him nîşanî (sembolîk) û him jî bi rasteqînî zewaca Skender û Semîramîs, zewaceke şaristaniyê ye û navê zaroka ku çêbûye "Helenîzm" danîne. Ev tevlihevîna yekem ya Rojhilat û Rojava ye. Tê gotin ku Skender 20 000 leşkerên xwe li derdorên Mezopotamya, bi jinên cîgehî re zewicandine. Çand wiha tevlihev dibin û senteza xwe diderînine holê. Xwedayê Sumer yê xasûk anku nûnerê sembolîk ya çîna esîlên ku bilind dibin, "Enkî", zewaceke mîtolojîk ya bi vî rengî, bi xwedawenda çiyê "Nînhûrsag" re çêdike, zaroka ku anîne cîhanê, em dizanin ku

şaristaniya Sumer e. Di kesayetiya ênanna de, dema ku keybanûya çiyê dibêje "Me yên min yên pîrozwer, dîsa bide min", tê fêhmkirin ku nîrxên afirandinê yên jina afirînêra şoreşa çandiniya neolîtîk ku têne mandele (înkâr)kirin, amûrên şaristaniyê û mafên wê tîn xwestin. Dema ku em zimanê mîtolojiyê bi rasteqînî dahûrînîn, emê bizanibin dîrokê rast binivîsin, emê têderxinîn ku xwedî derûniyeke hîkarîker û helbestî ye, emê karibin êş û kêfê di nava wê de hînbibin. Piştî dîroka ku ji hezar salan ve hatî reşkirin, wiha hêşîn bû, emê bibîn ku li bin serê me, dareke bi rahên zexm ku fêkî dide heye.

Çaxê ku Roma ev şens bidest xist, dara şaristaniyê di dema xwe ya herî berhemdar de, weke ku li benda çinandina (berhevkerin) xwe bû. Roma bi hemû xişma xwe hate ser û bi lêxistin berhevker, dara me ji qurmê xwe qelişt, hate xwar û careke din jî nehate ser xwe. Liqasî serkeftina mezin ya şaristaniya Roma, li hember rastiya hilweşîna wê ya ji nişkê ve, -heger em sazûmanê bi van hevberkirinên bêteşe, weke ku em bixwazin bidine fêhmkirin dahûrînîn- divê ku em şaş nemînin. Weke di xwezayê de, heyîneke di civakê de jî, ligor rêzika diyalektîkê jibo ku xwe bide jiyandin, wê hemû hêza xwe ya veşarî (potansiyel) bikarbîne. Ligor vê hêmana ku weke pevrariya dijan (zidan) tê formûlekirin, heta ku aliyên nakok, bi têkoşîn bi sentezeke raser bi encam bibin, ev pêvajoyê berdewam bike. Tiştê Roma dahûrandiye, ligor sazûmanên her civaka girîng ku li paşmayî, digire nava xwe û vediguherîne. Têkiliya serdestiyê ku koledariyê bi aliyên civakê yên paşmayî damezrandin, tesfîyekirina van aliyên paşmayî yên di nava sazûmanê de ne, ligor ramanên nû û qalibên giyan têne bisazîkirin û bi şeweyên nû jiyana xwe berdewam dikin. Di vî babetî de, Roma dikare weke makîneyeke hêrtinê ya bê hempa bête şibandin. Çi koma mirovan ku digihîje wan, di vê makîneyê re derbas dike û dişibîne xwe. Eynî weke bûyera kadîbûnê (kureyîbûnê) ya îroyîn û mîna DYA ku serkêşiyê dike.

Tê zanîn ku di xwezayê de ti tişt wînda nabe. Tiştê ku pêktê tenê guhêran û veguherîn e. Nêzîkbûnên metafîzîkê vê pêvajoyê an negengaz (nepêkan) dibîne, an jî bi şeweya tinebûnê fêhm dike. Ev mantiq gelekî xeter e. Dema şaristanî bê nîrxandin, divê ku zagona vê guhêran û veguherînê li ber çavan bête girtin. Çalakiya Roma ya veguherînê, tenê liser heyînen neolîtîk yên Ewropa ku niha kirine nava sazûmanê, nameşe. Ew vê çalakiya xwe, liser heyînen kevin yên ku berê di himbêza şaristaniyê de bûn û hêza xwe ya veşarî pêknanîne jî, dide meşandin. Girtina wê ya nava xwe û mezinaya wê ya di vî babetî de ye. Sumer, Misir, Hîtît, Grek û hê gelek şaristaniyên din yên di sata jêrî de, di qada xwe de zayîn û pêşveçûna xwe pêkanîn. Bisînor be jî, bi pêleke belavbûnê xwe serve birin (fûrandin). Tevkariyên wan him ji aliyê qadê ve teng him jî ji aliyê kûrbûnê ve bi serdemên zayîn û pêşveçûnê bisînor in. Jibo hilweşînê demê hê zû ye, di salên pêş de hê gelek pêşveçûnên nû yê werine bikaranîn. Em ji bajarên şaristaniyê yên pêşî bigirin, heta bi yekîneyên wê yên kozmopolît, bi hemûyan re aliyekî gerdûnîbûnê di asta angaşte (îdîa) de heye. Lêbelê di babetê pêkanîne de, tevkariyên wan bisînor in. Sargon dikare xwe weke xwedayê teveye gerdûnê nîşan bide. Lêbelê bi rastî jî, pêşveçûnên wî, tenê çend pêngavên. Babil û Asûr pêngavên mestir avêtin lê dîsa jî, nebûne xwediyê tevaya erdnîgariya Rojhilata Navîn. Di warê hundirîn de jî, ti caran reseniya Sumer derbas nekirine. Ji bûyîna mîrîtiya serhedan ya çend sazûmanên dewletokan wêdetir, ne xwedî erk (fonksiyon) in. Senteza Skenderê Mezin ya Rojhilat û Rojava, ceribandineke cîhanê ya cidîtir e. Tevkariya wî kûrtir û payîdartir e. Sazûmana şaristaniya Roma, liser xûnaftina pêngavên şaristaniyên berî xwe bilind dibe, axa Ewropa ya destlênedayî (bakîr) jî digire nava xwe û di dema xwe de, dibe nimûnekî herî nêzîkî împeratoriya cîhanê. Çawa îro li her deverê, ji bandora çanda jiyana DYA tê behskirin, Di dema Roma de jî gihîştina vê bandorê û temsilkirina wê, bi sed salan di rewşeke azwerî (îhtîras) de ye. Hemû hêzên serdest yên sazûmana koledar, jiyana ligor şeweya Roma weke pêdiviya esîlbûnê û şaristaniyê dibînin. Weke Çîn û Hindê ku di nava xwe de girtî û hê jî du girav ne di nav de, xwe ji vê yekê rizgar nekirine, sazûmaneke cîhanê ya Paks Romana ye. Di temenê wê yê hezar salan de, bi sazûmaneke civakî û siyasî ku di nava çarçova mantiqê xwe de û nîrxên ku zemîn jê re dîtî de, rastiyeke dîrokê ya bînimûne ye ku çiqasî xwestibe bi rêxistin bibe ewqasî bi rêxistin bûye, çiqasî xwestibe fetih bike ewqasî fetih kiriye û ligor derûna xwe çiqasî xwestibe bijî ewqasî jiyaye.

Lêbelê navê vê rasteqîniyê Roma ye. Di demên xwe yên dawî de, bi împeratorên xwe yên ku ji hemû komên etnîk gihîştine, bi serdestiya herêman, dema ku weke yekîtiyeke mezin dihate fêhmkirin bi ceribandînen perçebûna di nava xwe de, nîşan dide ku hemû nakokiyên di himbêza xwe de bipêkîne asta raser. Sedema bîngehîn ya di bin şemlê û temenê dirêjiya Roma de, hêza wê ya ku hunera jiyaneke pêşketî daye pejiwandin e. Ne şovenîst e, kozmopolît e. Çi esîl û hêzên ku dixwazin li tebeqeyê raser bijîn, dizanin ku sazûmana Roma ji vê yekê re herî îdeal e, êdî tîkiliyên xwe nîşan didin, herwiha tevkariyê li hêz û temenê wê dike. Rola zorê berevajî ku tê fêhmkirin, ji

diyarkerbûnê dûr e. Asûr û Persan jî, bi rêkûpêkî zor bikaranîne. Lêbelê eynî payîdarî û hîkarîkerî nîşan nedane. Ji cîhê mayînê derbas nebûne. Xanedan bingeha rêxistinên di sazûmana wan de ne û ji ber vê yekê hê di serî de, bi vî aliyê xwe mehkumê tengiyê bûne. Heçkû rêxistinên Roma ne ligor xanedan, ol û cudahiyên etnîkî ne, ligor hêza tevkarîyê ya nava sazûmanê ne. Ev jî tê wateya rêxistinên ku bi rasyonallîte, bi hewldana afirînê, bi rewîşt û bi hêz xweyî dibin. Dema ku hûn mafên takekesan û sazûmanan bi wan bidin, temenê sazûmana ku hêz digire, dirêj dibe. Dema ku van wesfên xwe wînda dike, di zemîna wê weke ya mozaîkê de û teraza di navbera rêxistinên wê de, xera dibin, ji hev perçe dibin û dikevin pêvajoya ji hev belavbûnê.

Di encamê de, sirên mezinayî û temen dirêjîya şaristaniya Roma evin ku rêxistinên wê hemdem in, wesfên wê ji hemû pêşveçûnan re vekirî ne, ligor rêjeya heyînên civakî yên berî xwe ku bi xwe re kirine yek, xwedî felsefeyêke xweser ya berfireh e, Ev bîrûbawerî û rêxistinbûnî bi îfadeyên zagonî pêkanîne, rol girtin û bilindbûna di nava sazûmanê de bi hewldanên bikêrhatî û bi hêza şerê serkeftinê ve girêdayî ye. Dema em li jilhevketina sazûmana Roma û derbasbûyina wê binêrin, dive ku em rola êmperatoriya Pers terîf bikin û êdî em bi hev re bi nîrxînin.

3- Derketina Medya-Pers û rêveqetana Rojhilat û Rojava

Qewsa ku çiyayên Toros û Zaxrosan lê dibine yek (navenda Heyva Berhemdar) ku rê li ber helatina şaristaniyê vekirîye, yê berhemdariya xwe vê carê jî, bi birina navenda xwe ya derî Mezopotamya, nîşan bide. Di demên Sumer, Babîl, û Asûr de ku li pey hev pêşveçûne, navenda şaristaniyê tim navbera Dicle û Ferad e. Dema ku em merhaleyên gihîştin û rêxistinbûna şoreşa neolîtîk jî tevî bikin, Ji salên BZ 6000an heta bi hilweşîna Asûr, BZ dawîya salên 600an, nîrxên ku şaristanî derandina holê ji vanderan derketine.

Belaş nayê gotin ku evder dergûşa bûyina mirovatîyê ye. Di dîroka mirovatîyê de, ji sisê merhaleyên mezin tê behskirin. Merhaleya Gund-çandîniyê (BZ 10 000-3000), dema şaristanî-bajar (BZ 3000-PZ 1950) û merhaleya ku em îro dijîn, lê nehatiye binav kirin. Hinek dibêjin "atom", "elektronîk", an jî "serdema înternetê", hinek jî dibêjin "serdema zanist-ragihandinê" an "postmodern", jê re "dema şaristaniyê wêdetir" jî tê gotin.

Di vê senifandina bêteşe de, tiştê li para Mezopotamya dikeve, di afirandina nêzîkî 10 000 salan de, rola pêşevaniyê ye. Herka dîrokê ya mîna çemekî, li pênc-şes herêman qewimî ye. Bawerîyêke zanistî heye û ev dikare bê çespendin ku raman, bawerî, dahênanên ku şêwe dane pêkhatina dîrokê û çavkaniya sereke ya daneheva zanist, di vê demê de û li vê herêmê pêkhatine.

Ev rola çanda herêmê ya mezintirîn, nenasîna wê ya di roja me de jî îfade dike. Sazûmanekî çiqas ku rahên xwe berde kûr û demeke dirêj bijî, bi gelemperî çêbûna sazûmanekê dijberî xwe liser van rahan pêknayîne, sazûmana nû liser axa destpênebûyî pêktê. Di dîrokê de gelek berjengên vê rêzîkê hene. Dema ku şaristaniya Greko Romen-çêbû, çand û erdnîgariyê dema xwe ya herî destpênebûyî (bakîr) dijiya. Şaristaniya kapîtalîst, li peravên Okyanûsa Atlas û li navendên Ewropa navîn ku heta weke wê rojê destê şaristaniyê gelekî hindîk bi wan ketiye, tê pêkanîn. Postmodernîzm jî ne li Ewropa li DYA pêşvedîçe. Di pêşveçûnên şaristanî de, rêzîkeke sereke ya wiha heye. Ev mijar pêdivî ye ku bi awayekî kûrtir bête dahûrandin. Navendên herî kevin, Heyva Berhemdar, Sumer û Misir, îro herêmên cîhanê yên herî bi êş in û ne ligor koka xwe ya dîrokî, di nava gerîneka nakokîyan gelicî de xwe digewixîne. Dîroka hemdem ti caran bi koka sereke ve nayê tamandin. Afirînerên dîrokê, di roja me ya îro de, di nava rewşeke bêweç, bêhêz ku ji koçberiyê pê de ti hêviyên wan tinene, dijîn û bi xwe liserê xwe bûne bela. Ev yek mijareke şaristaniyê ya bingehîn e ku bê dahûrandin.

Navendên şaristaniyê ku derî Mezopotamya bûne, tevkarîyêkê jibo nêzîkbûna rastî ya bi pîrsgirêkên ku çareserîyêke acîl dixwazin, girîng dike. Pîrsgirêka navend û derdor, di tevaya cîhanê de çiqas ku diçe, dibe pîrsgirêkeke çalakî. Divê ku mijara kadîbûn (kurayîbûn) û yên dijber, weke mijarên aborî yên hesan neyên dîtin. Heger ku sazûmana kadî (kurayî) ya heyî, li zemîna dîrokî û herka çandî neyê rûnandin, çawa ji aqûbeta "reel sosyalîzm"ê xilas nebe, nêzîkbûnên rastî li sedemên bingehîn yên pratîka neçareserkirî ya sosyalîzma zanistî ku xwedî daneheveke 200 salan, nayên kirin û tengbûna di vî babetî de nayê derbaskirin.

Têkiliyên derdora şaristaniya Sumer, berhemên hember, piştî BZ di salên 2000an de, dide. Ji qadên ku dişibin sazûmana mêhtingehkarîyê, Misir ji ber bikêrhatina erdnîgariya derdora xwe, hê zû bi kok dibe û di rêya xwe re pêçvedîçe, li Rojhilat li geliyên Pencap-êndus şaristaniya Harapa û Mohanjadaro zuwa dibe. Tê dîtin, ev ne di wê hêzê de ne ku bikaribin bi Misrê re, vê berdewamiyê nîşan bidin. Me nîşan dabû ku jibo navend û mêhtingehên Sumer, xeteriya mezin li Rojava qebûleyên Amorît yên li çola Erebaştan û li Bakur û Rojhilat "yên bi welatê bilind" Horît in. Digel taybetiyên Horîtan yên çandiyar û cotyarî, tê zanîn ku Amorît, bi giranî şivan û koçber bûn. Sumerî

ji aliyekî ve li hember hêrîşên van sîstemên parastinê yên bajaran pêşvedibe, ji aliyê din ve jî di xebatên binesaziya aborî de, karkeriya erzan û bikaranîna koleyan ji xwe re dike rê. Ji aliyekî din ve bi pêşketina mêhtingehiyê re, di warê bazirganiyê de jî pêşveçûnên sift çêdibin. Ev jî mijareke din ya herî girîng e ku di têkiliyên pêşî de bazirganî roleke girîng dileyîze, ligor pêdiviyên ku zêde dibin, serî li şidetê tê dayin. BZ di salên 2000an de, derdora ku bihêz bûyî, hêrîşên xwe zêde dike. Ji aliyê din ve, Sargonê Akadî derbasî politikayê emperyalîst ya birêkûpêk dibe. Cara yekem e ku şaristaniyek, bi wateya talan û dagirkirinê, politikayê şideta bipilan û rêkûpêk, dike amûreke dewletê ya jênegar.

Dema ku ev serdestiya teknîkî ya emperyalîzm bikartîne, dikeve destê dijminên wan, li hember demeke nû ji parastinê û hêrîşê re vedibe. Bingeha dîrokî ya ku berê çekên emperyalîzmê lê vegeyriyane, wiha hatiye danîn. Ew di heman demê de, di dîroka mirovahiyê dedestpêka pêvajoyêke biêş, bixwîn, biqirkirin, bitalan û bidagirkirî ye.

Ev wêşên ku navend û derdor bidestxistine, bi çînçînîbûna ku rê li ber hişkatî û şideta di nava civaka navendî de vedike, bi tepisandina heyînên etnîk yên derveyî û pêşveçûna bi hişmendî ya di bingeha dijaretî de, bi encam dibe. Çewsandina hundirîn ya bipilan û şidet, têkoşîna çînî dide destpêkirin, li derve li hember emperyalîzm û mêhtingehiyê, têkoşîna azadiya civaka etnîk, weke reseniyêke nakokî ya jênegariya şaristanîbûnê, di dîrokê de çihê xwe digire. Di vî babetî de, zagonên diyalektîk û materyalîzma dîrokî, dibin zagonên pêşveçûna civakê. Marksîzmê hê bêhtir ev zagon li pêvajoya şaristanîbûna kapîtalîst sepandine û li çareseriyê geriya ye. Ligor min liqasî ku ev bi kêmasî ye, ewqasî jî xeteyêke rêbazî ku rê li ber çewtîtiyên tirsnaq veke ye. Jiberku rastiya di zemîna jê zayî û di demê de, bi taybetiyên wê yên rewîştî na dahûrîne, ev ihtîmaleke ku him ji aliyê teorîk-bîrdoziyî, him jî ji aliyê pratîk-polîtîk ve, di şopa rastiya pratîkê û bîrdoziyî ya serdest ya ku di pêvajoya dîrokê de, gelekî bihêz bûye, û rêya xwe girtiye.

Heger dahûrandinên şaristaniyê, bêhtir ji civaka ku herî dawî pêkhatî, civaka ku pêşî pêkhatî binyat bihatana girtin û pêşveçûbana, bi ezmûn beremberî hev bigirtana û encam hatibana çavdêrikirin, wê bêhtir bi awayekî rasteqînî nêzikî lê bikirana. Ev yek pêdiviyêke berpirsiyarî ya jênegar e ku bêşik di pêvajoya zayîna sosyalîzma zanistî de, marksîzma demê ku bi daneheveke zanist û felsefê ya bisînor, him di warê daneheva zanîn û felsefî him jî bi encamên dewlemend yên sepîna civakî û polîtîk, bi awayekî tekûz bê birêkûpêk kirin. Rewşa rastiya reel sosyalîzmê ya ku têde û qeyrana bi kûrayî ya kapîtalîzmê, bi xwerexnekirina nêzikayên bi vê şeweyê, nirx dide vê rewşa wan ya rexnegirî û jibo ku di warê çareseriyê de, bi awayekî rastebînî bibin, fersendên girîng pêşkêş dike.

Tê çavdêrikirin ku piştî dawîya salên BZ 2000an pêde, çiqas ku diçe derdor diçe ser navendên şaristaniyên Sumer û Misrê. Em dibin şahid ku PZ di sedsala 20emîn û salên 2000an de jî, li derdorên navendên şaristaniyên kapîtalîst, him bi şerê rizgariya netewan û him jî bi koçberî, heman bûyer tene jiyandin.

Komên etnîk yên ji koka Semîtîk, di bin ala olên yek xweda de, navendê di veguherîneke sift re derbas dikin û rola xwe ya dîrokî dilîzin, komên etnîk yên Aryen hê bêhtir rê li ber veqetana Rojhilat û Rojava û pêşveçûna şaristanî ya duşeqî vekir. Ev komên ku di bin navê Horîtan de civiyan, him ber bi nava navendê û him jî derveyî navendê livdariyêke belavbûnê ya dîrokî bidest dixin, bi vê ve girêdayî komên Aryen yên neolîtîk, rê liber livdariya dîrokê ya herî mezin û kûr ku bi navê şaristanîbûna Hind-Ewropa tê binav kirin, vedikin.

Erdnîgariya ku ev livdarî lê sift bûn û dişeqî lê hate pêkanîn, dîsa sîstema Toros û Zaxrosa ne. Lê di naverok û hêka vê belavbûnê de, pêşveçûnên girîng tene jiyandin. Têkiliyên sift yên bi Sumer re, rê li ber mantiqekî zorê yê emperyalîst û mêhtingehî vedike, ji aliyê din ve, berxwedana li hember vê bûyerê, encex zorê li veguherîneke bingehîn ku çekên şaristaniyê bixûnifnîn û bikarbînîn, dike. Heger ku şaristanîbûn neyê jiyandin, jiyanêke vê dema dîrokî ya serkeftî bi heyînên etnîk yên kevin, mimkun nabe û ji windabûna bi tevayî jî naporêze. Him bikaranîna şensê dîrokî yê Horîtan, bi gelemperî yê komên Aryen û him jî parastina hebûna wan, bi şaristanîbûnê anku bi vekirina girêkên etnîkî û bersivdayîna bûyera civaka bi çîn ve girêdayî ne.

Bersivên Amorîtên Semîtîk, emperatoriya Asûr, Babil û Akad yên ku li navendên Sumer pêkanîne. Hê li Rojavatir, komên semîtîk îbranî û kenaniyan jî ev bersiv, bi damezrandina dewlet bajarên Fenîke, ebrani û ôgarîtan dane.

Bersiva komên Aryen yên li navenda Anatolyayê jî, emperatoriya Hitîtan ya ku ji salên 2000an pêde, çiqas ku diçe pêşveçûnên girîng pêktîne ye. Seriyê wê yê herî li Rojava, dewlet bajarê Troya ye, rola vê dewletê kişandina pêngavan ya Ewropa ye. Helenîbûna li nivgirava Grek û li nivgirava êtalya Latînbûna bi Etruskan ve (ne bi etnîkî, bandora wan ya ku şaristanî kişandine) girêdayî, wateyêke din didin ku civak ji heyîna etnîk derdikeve, derbasî civaka bi çîn dibe û vediguhere şaristaniya

Greko-Romen. Hê baştir têgihîna wesfên vê veguherînê, bi fêhmkirina duşeqiya sîstema Toros-Zaxrosan ve girêdayî ye. Tenê li vir, rêbazeke nêzîkbûna dîrokê ya ku serdest tê xuyakirin, em sererast nekin, bi pêşveçûna vê mijarê yê zor be. Ew jî ev e: "Aryenên mûzerk (kerenzer) û çav şîn, ku ji Ewropa û ji çolterên başûrê Rûsya BZ di salên 2000an de xwe li zozanên bakurê êranê digirin, ji wira jî ber bi Hindê, Medya û Anatolya ve diçin." Ev nêzîkbûn ji bingeha xwe çewt e û nêrîneke nijadperestî ye, jibo mebesta belavbûna faşizma Alman hatiye bikaranîn. Ya rast berevajî vê yekê û cuda ye. Berî her tiştî di dîrokê de koçberiyêke wiha fizîkî ya berfireh tine. Heger ku hebe jî, li qasî ku encamê bide tine. Jibo koçberiyên din ku dibêjin çêbûne jî, ev mijar derbasdar in. Ya rast ev e ku belavbûnên tînen gotin, ji bûyera koçberiyên fizîkî zêdetir, bi bûyera daneheva çanda bihêz ku tê pêkanîne. Bûyerên çandî ku ligor çandên derdor serdest û dewlementir, timî taybetiyên belavbûnê nîşan didin. Komên civakî ku xwedî çandêke kêr naverok, dikarin hêrişî navendên pêşveçûyî bikin, dibe ku bi awayekî fizîkî bi ser jî bikevin. Lêbelê di encamê de ji xûnifandinê û têkçûnê xilas nabin. Di çîroka koçberiya Aryenan de, me ya rast anîbû zimên. Têgîna Aryen, ji nijad an jî bûyereke etnîkî zêdetir, ev nav li komên etnîk yên ku bi şoreşa çandinî re ajaldarî û cotyarî bingehe girtine û yekem car çand pêşxistine, hatiye kirin. Ev jî rastiyeke zanistiye ku ev komên etnîk, li qewsên hundirê Toros-Zaxrosan, li pesarên ku Dicle û Ferad jê derdikevin in û mezînan dibin, derketine holê. Navlêkirin ligor sazûmana Sumer e. Koma bihalet (ar=halet) an jî koma biajal (gud=ga) carna jî gelê welat, tene wateya (ûr=til, gir) Horîtan, Gûtiyan û Aryenan. Derûna tevan, heman (eynî) erdnîgarê û çandê îfade dike. Kesek nikare bibêje 'yekem car vê koma etnîk an jî ya din, pêkanîne'. Zanîna vê yekê jî ne mimkun e. Lêbelê dîroka vê çandê, erdnîgariya wê û vedorên (periyot) belavbûna wê, tene zanîn. Herwiha heger ku ji belavbûnê bê behskirin, dibêtiya (ihtimal) bigiranî, belavbûna bi naveroka çandê û ji navendên pêkhatî, ber bi derên bikêrhatî ye. Nêrîna ku bi çespînen dîrokî jî tê destek kirin, herwiha rêbaza rast jî di vê nêzîkbûnê de, bibingeh dibe. Şaristaniya Sumer ya ku li pesarên hundir û deştên Heyva Berhemdar hatî pêkanîn, çiqasî girîng be, duşeqiya şaristaniyê anku veqetana Rojhilat û Rojava ya ku bi vê şaristaniyê re di nava girêdaneke diyalektîk de û hê bêtir li zozanên bilind û qewsên ji derve yên Toros-Zaxrosan pêkhatî jî, ewqasî girîng e. Dahûrandina xeta şaristaniya Medya-Pers, ji vî alî ve pir girîng e. Di dîrokê de, pêngavên ku xwe bi navê pêşveçûna Medya-Pers nîşan didin, bêşik gelekî ji mêj de ne. Lêbelê weke ku em dixwazin rave bikin, ev pêşveçûn pêkhatineke navxweyî ye û bi çêbûna Sumer re, di nav girêdaneke diyalektîk de ye. Divê ku navlêkirinên di demên cuda de, me şaşnekin. Pêkhatinên li herdu aliyên, ji destpêkê ve li hemberî hev in û têkiliya wan timî pêşvedîçe. Di roja îroyîn de jî, ji vê leza xwe tiştêk wînda nekiriye. Divê ku ev mijar, weke rêbazeke ku dîrok rast bê dahûrandin, timî li ber çavan were girtin: Têkiliyek di koka xwe ya dîrokî de çawa hatibe saz kirin, yê wisa bimeşe û rojaneyî bibe. Ji rojaneyî li dîrokê û ji dîrokê li rojaneyî bi vî rengê bête nêrîn, mimkun e ku bigihîjin encamên nêzîkî rastiye.

Di dema pêşî de, tîkîlî û nakokiyên bi Sumriyan re, ji aliyê komên Elam û Gûtiyên ku li Zaxrosan dijiyan ve hatine pêkanîn û di siyaseta Sumer de, geh bi hevalbendî geh bi dijminî hatine bikaranîn. Komkujiya ku Sargon li Elam kirî, hovane ye. Lê hevalbendiya Gûtî û Sumer, xanedaniya Sargon hilweşandiye. Gûtî demeke dirêj bûne hêzeke rêvebir. Têkilîke kasîtan mîna vê, bi babîliyan re çêbûye. BZ di salên 2000an de, şaristaniya Hîtî, encex di ser hûriyan re pêşveçûye. Ev şaristanî, mîna keke girîng e ku ji navendê ber bi derdor ve belavbûye. Lê ev jî hatiye çespendin ku weke xelesa navîn di parzûnê hûriyan re derbasbûye. Heta weke roja îro, di navbera Anatolya û Mezopotamya de, pêvajoyeke tîkîlî û nakokî ya ku derûna wê ya diyalektîk bihêz, destpêkiriye. Beşa pêşî, pêngava pêşî ya girîng ku yê Rojava anku Greko-Roma derîne holê, wiha hatiye avêtin. Ev pêngava ku hatî pêkanîn, ya xelesa çanda Toros e. Li xeta Zaxrosan, liser daneheva şaristaniya Elam, Gûtî û Kasîtan, li bakurê rojavayê êran ya îroyîn an jî gola Wanê, li herêma Wirmiye û Zapê, li welatê Medya -bi dibetiyeke mezînan asûriyan ev nav li wan kiriye- di destpêka BZ salên 1000an de, cara yekem bi serkeftineke bihêz û navendbûnê, şaristaniya orartû pêşvedîçe. Orartûyî, girêdayî çanda Hûrî û Mîtanîyan yên ku hê berî wan, li eynî erdnîgarî û bingeha çandê, di asta herî pêş de û di merhaleya şaristaniyê ya dewletbûnê de dijiyan (BZ 2000-1250). Qezencên xwe yên şaristanî, dikişînine bakurê rojavayê êranê anku ber bi Medya ve. Bi dibetiyeke mezînan, komên etnîk yên bi navê Med, ji van derdoran rabûne û li herêmên ji aliyê şaristanî ve dewlemend, li navbera Dicle û Ferad niştêçîhbûne. Digel ku orartûyî bi heman erdnîgarî û çanda etnîk ve girêdayî bûn jî, xwedî mîrateyên berxwedaneke demdirêjin. Tê fêhmkirin ku şaristanîbûna Sumer, di kesayetiya asûriyan de gelekî xûnaftine û di ragihandina nivîskî de, weke zimanê tebeqeya serdest, zimanê Asûr bikaranîne, lê komên gel bi çand û zimanên xwe di nava jiyanêke cuda de ne. Ew jî, gelek mînakên vê rastiye hene. Çîna rêvebir ya Hindê, îngilîzî bikartîne, lê komên gel zimanê xwe bikartînin û hin

bi hin hildidine asta zimanekî netewî. Zimanê Cezayîr ya rêvebiriyê yê mêhtingehkarên fransî ye, lê zimanê gel yê çandê erebî, berberî û devokên cuda ne. Zimanê dewleta Osmanî, zimanekî tevlihev bû, lê gelên di nav de zimanê xwe bikartanîn û her yekî zimanê xwe digihînin asta netewetiyê. Gelek çespan hene ku ev pêvajoyên di serdemên pêşî û navîn de ji hatiye jiyandin. Peyva órartû bixwe jî, nayê wateya komeke etnîk, bi sumerî ye û navekî erdnîgarî ye ku tê wateya "cîhê bilind". Pêşveçûna cuda ya piştî dema Hûrî û Mîtanî ev e ku ji konfederasyona eşîrî derbasbûne û ketine rewşa çîneke koledar ya navendî. Jiberku hespan xweyî dikin, xwedî kereste û kanên maden in, dibine armanca Hîtî, Sumer, Akad, Babil û Asûriyan. Di kesayetiya órartû de, tiştên ku tê jiyandin ev e ku bi amûra heman şaristaniyê, anku bi hêza dewleta navendî berxwedanê domdar bike û heger ku mimkun be, di terazeke lihevkerinê de, bi aweyekî wekhevî bikaribin bijîn. Lêbelê polîtîkayên asûriyan yên talanê, dagirkerî, komkujiyê û koçberên ku ji van filitîne, fersendê nade vê yekê. Weke Roma ku şensê jiyandê dide gelên bin destê xwe û împetoriya xwe domdar dike, nakin. Otorîteyeke ku zagonên wê tinebin, bêsinor û kêfî tê sepandin. Jixwe ji ber van polîtîkayên wê ye ku ji nişkê ve, ji holê rabû. Dawiya hemû sazûmanên polîtîk yên ku tenê zorê disepînin, dişibine vê yekê. Ev polîtîkaya emperyalîst ku ji Sargon mîrate hatiye girtin, li Babil bi Hamûrabî hatiye tekûzkirin, û bi herî stemkarî ji aliyê asûriyan ve hatiye sepandin, jibo hemû gelên Rojhilata Navîn û sazûmanên begîtî yên koledar re, tê wateya dogehê.

Polîtîkaya çewsandinê û ji cîh qutkirinê ya liser gel û çanda Rojhilata Navîn, li qasî ku rê li ber qeyraneke kûr vekirîye, ewqasî di giyan û bîrûbaweriya mirovatîyê de jî, dewsên kûr hiştine. Di dawiya desthilatdariya Asûr de, tê çavdêrîkirin ku bêrîkirina rizgariyê û lêgerînên sazûmanê, di rewşa giyanê gelemperî de şêwe girtiye. Hewldanên bi vî rengî, ji aliyekî ve rê li ber olên yek xweda yên ku mehderî (şefaet) û rizgariyê wad dikin û komên mîstîk, vedike, ji aliyê din ve di nêzîkbûnên şaristanî de, ber bi cudabûna Rojava û Rojhilat ve dibe.

Bi dibêtiyeke mezin, li welatê Medya ku liser bingeha mîrateyên órartû bihêz bûye û Asûrî bi wan nikarin, jibo ku ji vê dogehê rizgar bibin, rê û rêbazan pêşvedibin. Di vê wateyê de, nirxandinên ku dibêjin komên Med ji Hazar û wêde ji Rojhilatê bakurê êranê hatine, çewtiyeke mezin e. Berevajî vê yekê, Med komeke Aryen e ku xwedî sîsîka çanda Heyva Berhemdar e, di dema Asûriyan de him navekî nû û him jî bîrdoziyeke derûnî ya bi viyan ku ji berxwedanên domdirêj tînin, bidest xistiye û derketiye qada dîrokê. Di bingeha bersivdana zilma Asûr de, helatina (zayîn) ji nû ve, BZ ji salên 1000an pêde berfireh dibe. Qebileyên ëbranî, yekem car dibin yek û di dema Saûl, Dawûd û Silêman de, digihine qerantîyekê. Helenî Troya têk dibin û di bin navê dewlet bajarê Athena de, bingeha şaristaniyeke nû dideynin. Piştî berxwedanên begîtîyên etnîk ku bi aweyekî stemkar tînin perçiqandin, mirov û kesên ku bi serê xwe dimînin, li derî taybetiyên xwe yên etnîk edet û baweriyên veşartî pêşdixin, esasê wê dikevin pêvajoyeke nû. Têgihîna herkes û her koman ya ku xwebixwe li çareseriyê serê xwe bigerin, taybetiya van nêrîn û nêzîkbûnên mîstîk in.

Li Medya, lêgerîna rahîbên bi navê Mag jî, perçeyek ji vê nêzîkbûnê ye. Rahîbên Mag, bîrdoziyeke rizgariyê û komîkbûnê temsîl dikin. Aliyên Magan yên nû ev in ku têgihîna Aryen yên olî û mîtolojiya Sumer sentez dikin, bêhtir ber bi rizgariyê dibin û nêzîkîyê li mirovan dikin. Zayîna mîtolojîk, jibo pêşveçûna her şaristaniyeke cidî, pêdivî û pêşrew e.

Heger ku mîtolojiya sazûmanê ya serdest û têgihîna olî neyê derbaskirin, derketineke şaristanî ya nûjen ne mimkun e. Piştî demeke qubûnê (kurkbûn) ku domdirêj û aliyê wê yê mîtolojîk giran, tevgera nû ya siyasî û civakî wê pêşvebiçe. Wekî ku rola don û benzîne pêdivî dileyîze. Erdnîgariya Medya ya hîkarîker û çanda berxwedanê ya domdirêj, çavkaniya Besta (îlham) rahîbên Mag yên bîrdoziyî ne. Digel ku ji têgihîna olên Sumer û Aryenan bandor girtine, tê çavdêrîkirin ku Medan bi xûnaftîneke cidî bersivê didine van û nûjeniyên li cîgeyîyê tînin. Dikare bê nirxandin ku Berxwedana Kawayê Hesinkar, hê bêhtir aliyê vê nêzîkbûnê yê destanî û pratîk e. Weke di heman pêvajoya demê de ku li nav ëbraniyan Dawûdê Hesinkar û li nav Helenan Akhîleûs rolên qehremantîyê listîne. Li vê derê dirûvtîyeke (manendî) hîkarîker, dabaşa xeberdanê ye. Lêbelê vê demê qismê ku bihêz e, xwedî eniya bîrdozî ye, ev jî ji aliyê rahîban ve tînin temsîl kirin. Li Hindistanê vê nêzîkbûnê, bi hêzeke mezin rahîbên Brahman temsîl dikin. Rahîbên Medya Mag, BZ ji salên 1000an pêde li qadeke herî stratejîk, temsîliya vê nêzîkbûna dîrokî dikin. Digel ku di warê etnîkî de, di bin navê Kavî-Mîr de, gihane hêza otorîteyeke di asta lawmîrîtiyê de, çêbûna dewletê û civaka biçîn nayê çavdêrîkirin, Jiberku eşîr hebûna xwe diparêzin, siyasîbûneke ku ji şêweya begîtîyê derbasbibe ne mimkun e. Herî zêde konfederasyonên eşîran tîne pêkanîn. BZ di salên 1000an de, li Medya qebileyên Med û li navend û bakurê rojavayê êranê qebileyên Pers, weke gelek dirûvên xwe, derawa wan ya siyasî û civakî ku tîdene, wiha ye. Di binyata mîtolojî û ola wan de, li herî jor sazûmana sêbare ya xweda heye. Bi gelemperî ev sazûmanên sêbare, bi çanda "Bav, dayîk û

zaro ya herî bi hêz" weke olekî bavkanî tê bilindkirin. Herçiqas ku temsîl û nîşanên wan cuda bin jî, bi komên ku di nav vê şaristaniyê de û yên li qadên nêzik re, ev têgihînên olî yên bi vî rengî pêşveçûne. BZ di salên 1500an de, di nav komên Hind-Aryen ku hê ji hev veneqetiyên de, ev sazûmana sêbare, bi êndra-Mîtra-Varûna tê binavkirin. Di tabletên ku dewletên Mîtanî û Hîtî şanavkirin de, bi navê van xwedayan sond tên kirin.

Çiqas ku çanda hevpar, li qadên cîgeyî li rastî veguherînan tê, cudabûna mîtolojiyê jî zêde dibe û ev yek hê bêhtir xwe di binavkirina xwedayan de, nîşan dide. Li Medya, di karê van nûsaziyên bîrdoziyî de, tevkariyên herî mezin yên Zerdeşt in. Girîngiya vî kesê bi navê Zerdeşt BZ di salên 600an de jiya ye- ev e ku berî Konfuçyus li Çîne, Bûdha li Hindê û Sokrat li Grekê rola nûsaziya sincî bilîzin, wî berî tevan û bi hêzeke xurt pêkaniye. Di mîtolojiya Sumer û Misrê û têgihîna ola wan ya jiberku tenê benî û kole temsîl dike de, li hember xwedayê ku hikim li her tiştî dike, benî mirovê bêçare û bê viyan bingeh e. Sîya mirovan ya bixwe jî nabe, hemû tişt ji xwedê tê. Anku viyana çîna efendiyên ku bilind dibe, tenê û pîrozwer e. Bê destûr nikarin bibin xwedê siyê jî. Di binyata giyan û bîrûbawerîya demê de, ev bîrdozî serdest e. Encama vê yekê ya siyasî, xweda- qeran û sazûmana emir ya bêsînor e. Her peyveke qeran, di nîrxê zagonekê de ye.

Berî hemû nûsazîparêzan, Zerdeşt ev qalibên bîrdoziyî yên serdest derizandine. Di Gatha (Bi kurdî gotin) yên xwe de Zerdeşt, bi awayekî lavaî pirsîyariyan ji xwedê dike. Eslê wê bîrdoziya demê pirsîyarî dike. Vê yekê bi viyaneke serhildêr, bi awayekî vekirî û bi wêrekiyeke bêhempa dike. Fermanên xwedê yên yekalî tine ne. Em bi rewîşteke bi viyan re rûbirû ne ku pirs dike û heta bersiv wernegire dev jê bernade. Heta wê demê, qeran jî di nav de ti lawê mirovan pirsîyarî ji xwedê nekiriye. Tiştê yekem ku Zerdeşt pêkaniye ev e. Eslê wê vê yekê him li hember ola xwezayê û him jî li hember ola Sumer ku bi xwedayê tenê serdest pêktîne. Feylesofê Alman Nîetzche têdigihîje vê derketina Zerdeşt ya dîrokî û di berhema xwe ya bi nav û deng de, belaş nabêje "Wiha Fermankir Zerdeşt". Ev yek şoreşeke bîrdoziyî ya herî mezin e, di herka şaristaniyê de, bîrdoziya serdest ku sazûman dorpêçkirî bê qulkirin û rê ji viyana mirovan ya ku bilind dibe re, bê vekirin. Heta wê demê mirovên ku nikarîbûn li siya xwe xwedî derbikevin, di bîrûbawerî û viyana xwe de, wiha bibêje xwedê, "ez heme, dibêjime te û bersiv bide", pêngav avêtineke mezin ya ber bi rê veqetanê ye, di sazûmana siyasî û civakî de yekem car anîna zimên ya azadiya takekes e. Ev hejandina serdema tenê xwedayê serdest û sazûmana koledariyê ya bêsînor ku temsîl dikin e.

Li welatê Medya ku Zerdeşt lê dijî, şaristanî dibe du beş. Li Hindê, li Çînê, li Misrê û li gelek dewletokan, bi sazûmana otorîte ya ku xwe bixweda dike û xweda bixwe dike re, di sazûmana Greko-Romen de, veqetana sazûmana xwedayan û sazûmana siyasî ku bi komar û aqil hatiye bisînorkirin, pêşveçiçe. Di bin vê pêşveçûna ku em dibêjin duşeqbûna şaristaniyê an jî veqetana Rojhilat û Rojava de, ev derketina nûsazîparêz ya Zerdeşt heye. Li welatê Medya pêngava duyemîn ya dîrokî ev e ku bi hindikayî liqasî ku şaristaniyê bide zayîn, zorê lêdike ku biguherîne duşeqî. Di vê xalê de, Zerdeşt wateya têgînên bingehîn yên bîrdoziya xwe, weke ronahî-tarî, qencî (başî)-neqencî (nebaşî), bihişt-dojev, xweşikî-sikayî, rastî-çewtî li cîh rûdinîne. Berî her tiştî hêmaneke felsefî hatiye bidestxistin: Hêmana, pêşveçûn encex bi heyîna dijan (zidan)mimkun dibe. Ev hêmana ku di roja me de zanistê jî esehî (teqez) kiriye, wê zagonê îfade dike ku li xwezayê û li civakê, hemû pêşveçûnan dide livandin. Bûyera ku em dibêjin guherîn jî, ev e.

Ev ne hêsane ku vê guherîna ji bin bandora, xwedî bîrûbaweriyên ne afirînêr, bêliv, mûtlaqiyetparêz û cîhana xwedayan ya timî bi lebta yekalî, derîne, Bi zagonên dema neolîtîk yên jibo marîjokan, bi zagonên xwedê yên ji aliyê şaristaniya koledar ve hatine barkirin ku mirov li siya xwe xwedî dernakeve, yek rabe bibêje yên bi binyata giyaneke ku bi bîrûbawerîya 3000 salên borî, "rabe ji piya, li viyan û bîrûbawerîya xwe xwedî derkeve û birêz be." Ev şoreşeke gelekî zor ya rewîşt û bîrûbaweriyê ye. Tevkariya zerdeşt ya li şaristaniyê ev e ku çîqa diçe, girîngiya wê bêhtir tê fêmkirin.

Di bawerîya Zerdeşt de, têgînên xwedayê qenc Ahûra-Mazda û xwedayê neqenc Ehrîman jî, tene wateya ku vê rastiyê bigihînine îfadeyeke olî. Encex ev ne xalên girîng yên vî karî ne. Jiberku bilêvkirina bîrdoziyê ya demê, qalibên wiha pêdivî didîtin, Zerdeşt jî vê peyvnasiyê bikartîne. Tiştê ku di derûnî de pêkaniye, şoreşeke felsefî ye. Şoreşeke sincî ye ku di civakê de jî hatiye pêkanîn. Em bi hinek encamên vê yên pratîk dizanin. Dixwaze ku dawiyê li qurban dayinên olê xweza yê hoveber, bîne. Jêhezkirineke mezin li derba ajalên heye. Dibêje, "Van ajalên ku di jiyana me de evqasî bifeyde (sûdewar), nekine qurban". Ew di heman demê de, pêxemberê çandiyariyê ye jî. Gelekî girîngiyê dide cotyariyê. Dilketiye çandiniyê ye. Xwedî îfadeyeke herî bihêz ya sincî ye ku bi jineke tûmandar (tekûz) re bijî. Jiyanê wekhevî ya bi jineke viyan azad re, bextwerîya herî mezin dibîne. Di ti sazûmanan de, têgîneke jinê ya bi vî rengî tine. Girêdana wî ya bi kedê ve zexm e. Belkî nûnerê

herî bihêz yê bextewariya bi xwêdana anyê vê girêdayî ye. Dilketiyê şewq û ronahiyê ye. Hay ji xweşikaya jinê heye. Rawestîna li dij tarîti û sarbûniyê, bingeha felsefeya wî ye.

Bêşik dahûrandina "Gatha" yên Zerdeşt û baweriyên olî yên ku jê re dikine mal, karekî pisporî ye. Ev tê zanîn ku nêzîkbûnên wî yên ramanî û sincî ne hatine bidawîkirin. Digel ku bi tevayî pêknehatiye û ne bûye sazûmaneke civakî jî, ji pozberîtiya zidan gihîştina wê ya sentezê û xwedîbûna sincê takekesê azad ku bingeh digire, mezinatiya ramana Zerdeşt bêhtir dide fêhmkirin. Em dixwazin vê yekê jî bidine nîşandan, bandora wî hê jî liser wan civakên ku di nava wan de jiyayî, gelekî zêde ye.

Encamên siyasî yên Zerdeştîyê ku Zerdeşt û yên bi şûn wî ve temsîl dikin, ne bi derengî derdikevine holê.

Dema ku em mercên siyasî û çandî yên bi derketina Med-Pers ve girêdayî binirxînin, liqasî derbaskirina têgihînên hinek rêbazên çewt, bingeh girtina agahdarbûnên rast, girîng e. Hekena nîrxê vê derketina dahûrînê ku li Rojhilata Navîn, di veqetana Rojhilat û Rojava de rola kilitê dilîze, rast nayê fêhmkirin. Ev derketin, rê li ber demeke nû vedike, li Rojava pêşveçûna şaristaniya Greko-Romen bilez dike, li Rojhilat, jibo ku şaristaniya koledar ya Çîn û Hindê weke "Harapa" ya berê nexeniqe û berevajî vê di nava gihîştinekê de payîdar bibe, rola bingehîn lîstiyê. Ev nêrîneke ku tê pejirandin, heger ev xelek nebe, şaristanîbûna ku ji Rojhilat û Rojava bilind dibe pêknayê, an jî yê bi aweyekî din pêşve biçê. Ev yek tenê ji derawa wê ya erdnîgarî nayê. Ev hê nêzîktir bi derûnî ve girêdayî ye. Ev nûsaziya bîrdoziyî û sincî ku em bi navê kevneşopiya Zerdeşt binav dikin, ji weke ku tê gumankirin bêhtir, hewl dide ku şêwe bide veqetana Rojhilat û Rojava û wê pêkbîne. Sazûmanên koledar yên Misir û Sumer û pêngavên şaristaniyên ku wan bingeh digirin û ji nava xwe dernakevin, di pêvajoya 3000 salan de, tenê koletî niçilandine giyan û bîrûbawerîya mirovatîyê û bi vê ve girêdayî pêkutiyek dayine meşandin. Ji aliyê azadiyê ve, rewşeke mirovatîyê afirandine ku ji serdema neolîtîkê gelekî pêşdetir be. Evên ku ev rewş afirandin, bi şêweyê fend û zordestî ku heta weke wê kêliyê (hîngê) di nava têkiliyên civakî de ne hatibe dîtin, bi maskeyeke bîrdoziyî vedişêrin, liser navê "sazûmana ezmên û cîhana xwedayên rêvebirên wê", dikine rewşa bîrdoziya "qeder"ê. Ev yek bi ketineke mezin a asta azadiya mirovatîyê, tê pêkanîn. Li aliyekî xwediyên sazûmana koledar ku çî peyva ji devê wan derdikeve, weke viyana xwedê didin fêhmkirin, li aliyê din sazûmana mirovên benî û kole ku li siya xwe jî xwedî dernakevin û ji amûrên hilberînê pêde bikêrî tiştêkî nayên.

Bêşik li hember vê sazûmanê, timî berxwedan hatine kirin. Weke ku pirtûkên pîroz dinivîsin, ev sazûman wisa bi viyana xwedayan ne meşiya ye. Dera ku zilma mezin, derew û mijokatî lê pêşveçûbe, bi berxwedan, bi birastî û bi têkoşîna maf, li hember derketin jî heye. Rêzîka pêşveçûna yekîtiya dijan, li vir jî bi aweyekî sitemkar hatiye xebitandin. Lêbelê, belkî di dîrokê de yekem car di wateya şop (rêç) vekirinê de, serkeftina derketina Med-Pers dabaşa xeberdanê ye. Di encamê de, ev derketin jî dikeve sepîn û sincê sazûmana serdest de. Sazûmana civakî û siyasî ya serdest ne hatiye hilweşandin û yeke nû li şûnê ne hatiye damezrandin. Di vê de, diyarkeriya şêweya hilberînê, rola bingehîn lîstiyê. Lêbelê dîsa jî pêngaveke dîrokî ye ku sazûmaneke koledarî ya 3000 salan bi sîtembarîyê mezin, Rojhilata Navîn di nava saweke giran de hiştibû, di kesayetiya Asûr de hilweşandiye û bi nûsaziyan, derbasî sazûmaneke koledarî ya nermtir bûye. Rê li ber rêveqetana dîrokî vekirîye zagona yekîtiya dijan li merhaleyê şaristaniyê ya bilintir daye meşandin û bêşik rê li ber demeke nû vekirîye. Ez di vê baweriyê de me, ev yê herî rast be ku derketina Med-Pers ya di dîrokê de wiha bê îfade kirin.

Pêşveçûneke berbiçav ya dîrokî ev e ku rêxistina Med, di merhaleyê konfederasyona heşîran de ye. Ev rêxistin hewl dide ku li Ekbatanê, bi navendî bibe. Eslê wê derketina wan ya qada dîrokê, bi saya hevgerîna Gûtî û Kasîtan, pêkhatiye. Hevgerîna Babîl-Med ku timî bi asûriyan re, di nava berberî û qayîşkêşiyekê de bûn, BZ di sala 612an de bi hilweşîna paytext Nînowa, bi encam dibe. Ji aliyekî ve, bi têgihîna navendî ya Sumer, pêşiya Babîl vedibe, ji aliyê din ve, şaristaniya li rojhilatê Zaxrosan, şensekî pêşveçûnê û di dîrokê de destpêka demeke nû bi dest dixê. Ev bilindbûn, ji dema pêşveçûna şaristaniya Sumer ve, liqasî derketina Elaman, Gûtîyan, Kasîtan, Hûriyan û Mîtaniyan ya qada dîrokê, ev jî tiştêkî vekirîye ku bi efsaneyên weke "Kawayê Hesinkar" yên berxwedanên gel, xweyî bûye û ev bi şoreşa Zerdeştî ya viyan û sinc sentez kiriye. Wekî din karê lêkolîna dîrokê ya bi belge û bi kitekî (hûngilî) e.

Aliyekî vê rastiyê yê din, bûyera Pers e ku yekem car bi navê xwe derketiye holê. Xisimtiya Persan ya bi Medan re, tê zanîn. Ev bi hêsanî tê çespendin û ji bûyera kurdan ya îroyîn jî tê derxistin ku Med û pêşiyên Medan, bi îfadeyeke din Hûriyên ji koka Aryen, kalikên Kurdan ne. Navên din yên ku di navê de derbas dibin, Weke Gûtî, Kasî, Mîtani û órartû, di merhaleyên dîrokê de, navên ku

dane komên bi heman çand û zimanî ne. Derketina pêş ya Persên ku liqasî rêxistina Med xwe nedane pejirandin, dikare bi rêzika belavbûna şaristanî ve bête girêdan. Rewşa nêzîkbûna di navbera zimanû çanda wan de, îro bi cîrantiya wan, erdnîgariya êran-Fars û herêma Kurdistan, bi hêsaniyê tê dîtîn. Diyar e ku di demên dîrokê yê berê de, ji hev veneqetiyabûn û di nava sazûmaneke hevpar de bûn. Komên aryanên ku vê dawiyê, koçberî Hindistan û deverên din yê Rojhilat kiribûn jî, tevî van e. Veqetana bingehîn, di BZ salên 1500an de, tê dîtîn. Di vê veqetanê de, navê van koman wiha ye, li bakurê rojavayê êranê Mad, li bakurê rojhilat Paîd, li nava başûrê rojava Pars û li başûrê rojhilat Belûcî bûn. Belavbûna Aryanan ya ber bi Afganistan û Hindistan jî, berdeewama van kombûyînen sereke ye. Di vê veqetanê de koma ku him nêzîkî navenda şaristaniya neolîtîk, him jî nêzîkî ya Sumer mabûn, Madî bûn. Herwiha yê ku bi kûrayî bihêz bûbûn û li hember belavbûna Sumer, Akad û Babil rawestiyabûn, ji ber derawa wan ya erdnîgarî dîsa kom û eşîrên Madî bûn. Hilweşîna êmperatoriya Asûr jî nîşan dide ku rastiya Mad ne bi aweyekî ketûber (lasayî) e, bi çêbûneke dîrokî ya domdirêj û berfireh ve girêdayî ye. Hemû berjeng û birhanên dîrokê vê yekê nîşan didin.

Persên ku di pêvajoyeke dîrokê ya dirêj de, ne nûhiyane û bi pêwana Medya timî bihêz bûne, mijareke ku tê fêhmkirinê ye. Ya girîngtir jî ev e ku Med merhaleya konfederasyona eşîran derbas dikin û şaristaniyeye navendî dadimezrînin, herwiha teraza di nebera wan de xera dibe. Dema ku Konfederasyona Med ya ku Pers jî di nav de cîh digirin, ber bi dewletbûneke navendî ve diçe, lirastî derbeya eşîrên Persan tê. Çawa ku serkarê konfederasyona Med-Pers yê dawî Astîyag, bi derbeyeke xwarziyê xwe Kîros (Kuraş) dikeve, desthilatdarî dikeve destê ezbeta Akhamenîd yê Pers. Herçiqas ku gelek dîrokzan vê yekê, weke têkçûna Medan û serkeftina Persan nîşan didin jî, ev nêzîkbûn ji aliyê rêbazî ve, ne rast e. Tiştê ku pêkhatiyê, di çêbûna dewleteke bilind dibe re, guhertina xanedaniyekê ye. Ev guherîn weke têkçûna komeke etnîk bê nîşandan, wê çewtîtiyeye giran û nêrîneke xelet be. Di sazûmana vê dawiyê de jî, Med û Pers di heman astê de, di rêza pêş de ne. Pergalbûyîna di nava dewletê de û şeweya wê, ji aliyê Herodot ve bi aweyekî vekirî tê nîşandan. Di êmperatoriya Pers ya ku ji 22 Satraptiyan (walîtiya herêmê) hatiye holê, cîhê Medan ku bi yê Persan re hatiye pîlekirin, dide nîşandan ku heyîneke etnîk ya hevpar derbasdare. Nakokî, di navbera hinek serkarên Med û Rahîbên Mag yê Medî de ye. Ev yek jî, rê li ber serhildanan û komkujiyan vedike. Em bi kurtayî bibêjin, nêrîna wiha ya li diyalektîka têkiliyên Med-Pers, yê me ber bi encamên rastir ve bibe.

Mêjûya serweriya Xanedaniya Ahemenîş, BZ di sala 550an de bi Kîros destpêdike. Di demeke kin de, vebûneke mezin nîşan dide. BZ di sala 539an de, Babilê bi xwe ve girêdide û navenda şaristaniyê li derî Mezopotamya, dibe Persepolis. Ber bi dawiya sedsalê, Misir û Anatolya hemû tê standin, li ber deriyê Atîna radiwestin, yekem car li Kafkasya Satraptiya Ermenî tê çêkirin û digihine Derya Reş û Hazarê, li herî Rojhilat dikevî Partiya, Afganistan û Hindistanê, herwiha rêxistina herî mezin ya heta wê demê, tê pêkanîn. Di bin vê pêşketina dîrokî de, liqasî zemîna dîrokî û çandî ya bihêz, ligor asûriyan para rêvebiriyeye biaqil û gelekî nerm, diyarker e. Di şeweya rêvebiriya Asûr de, heyînen etnîk û yê cîgeyî, nikarîbûn xwe bixwerînin û gelek caran ew ji cîh û warê wan dikirine der û yê ku koletî dipejirandin li şûna wan bicîh dikirin. Berevajî vê, Persan ew ne tenê li cîhê wan dihiştin, bi serde jî, xweseriyeye di asta Mîrîtiyê de didan wan. Her qewm û koma etnîk, bi navê xwe Satraptiyekê dadimezirîne, tenê hinek bêş û bacê dide û leşkeriyê dike, wekî din di her warî de, serbixwe dilive.

Bêşik êmperatorî xwedî gelek reseneyiyên din jî ye. Venêrana (kontrol) bi toreke baş ya ragihandin û nûçeyan, gelekî hîkarîker e. Ji peravên Ege, ji bajarê Sard yê dîrokî heta bi Persepolis, rêyeye tekûz û tûmandar çêkirine. Komên bihesp (siwarî) ên amade, nûçeyên ku ji hev werdigirtin, di nava nod rojan de, ji Sardê digihandine Persepolisê. Ligor demê ev lezeke mezin e. Rêxistina burokrasiyê hê pêşveçûye. Nûjeniya herî girîng ev e ku Mîtolojiya Sumer hatiye derbaskirin û baweriyaya xwedayê mezin Mazda ya ku bi Zerdestiyê ve girêdayî, bicîh bûye. Jiberku dawî li sirgunkirinên Babil anîne, êbraniyên ku giramiyê (rêzgirtin) didine Persan, di pêşketina çanda ola yek xweda de, ji baweriyaya Mazda sîd wergirtine. Heta di nava êbraniyan de, partiyeke bi navê Partiya Ferîsiyan ya ku alîgirê Pers, tê damezrandin û heta weka îroyîn jî di nava îsraîliyan de, hebûna xwe ya kokî domandiye.

Eslê wê ji damezrînerê çanda êbraniyên pêşî, Hz Brahîm ne tenê serkarekî qebîleya êbraniyê ye, di dema xwe de li Rûhayê, bi komên etnîk yê serdest Hurîyan re, di nava girêdanên nêzîk de ye û bi vê çandê bandor li êbraniyan kiriye, hinek berjengên peyvnasî (etîmolojîk) vê mijarê bi aweyekî vekirî nîşan didin. Bi kinayî em bibêjin, di pêşveçûna ola yek xweda de, cîhekî çanda Hûrî û Persan yê taybet heye û lêkolînê dixwaze. Pêvajoya êmperatoriya Pers, rihetiyek dayiye hemû komên etnîk

û civakên siyasî yê Rojhilata Navîn. Di pîrozkirina Cejna Newrozê ya weke cejna azadiyê de, ev pêvajoyê roleke girîng listiye. Di hemû çandan de, xwe pêşêxistin û xwe jiyandin, pêşveçûye. Di çanda siyasî de, rewatiya (meşrûti) mîrnişinan (şehzadetî) hatiye nasîn. Sazûmana Mîrîtiyê, di vê pêvajoyê de, bêhtir darîçav bûye. Sazûmana koledarî bi temamî ne hatiye derbaskirin, lêbelê gelekî hatiye nermkirin û di bingeha nûjeniyên de, di nûsaziyan re hatiye bûrandin. Sazûman jî, hêza xwe ji vê guherîna polîtîkayê werdigire. Li hember vê rêvebiriyê ti liberabûn (îtîraz) yê zêde çênabin û gelek dezgeh (sazî) yê nû, li desteka wê geriyane. Mînakên vê yekê gelek in û bi belge ne. Ji bilî qayîşkêşiya xanedanan, di nava Medan de çênebûna serhildanan, rastiya vê yekê nîşan dide. Qayîşkêşiya Persan ya birastî, li nîvgirava Grek çêdibe. Li Rojhilat, ber biçin û Hindê weke xwedî roleke pêşverû, timî pêşvedîçe. Vê pêşveçûnê li navendên Misir û Sumer yê kevin jî pêktîne. Dîsa di rewşa pêş de ye. Li gelek guherînên cîgeyî, etnîkî, çandî, civakî û siyasî rast tê, pêşveçûnên girîng pêktîne. Ev aliyê wê yê pêşvebir, rê li ber hêzeke împeratoriye ya girsehêz vedike, di heman demê de, di babetê xerakirina terazê de, jibo wê bawerhişk û paşverû bike, dijrabere xwe derdixe holê. Sazûman ligor Asûr pêşverû ye, lê ligor Rojavayê Anatolya û Grek, paşve maye. Çawa rahîbên Mag yê Medî, û nûsazîparêziya Zerdeşt, di bilindbûna Med-Pers de hevîrê bîrdoziyî ne, li Rojavayê Anatolya jî, lêgerîna felsefî û bîrdoziyî ya ku bi Thalesê Mîletî destpêkirî, dibe hevîrê bilindbûna şaristaniya Grek. Ligor Persan, bi şeweya ramana beraqil (rasyonel), felsefe pêşveçûnên mezin pêktîne. Di van pêşveçûnan de, him jî berhemên mîtolojîk yê Babil û him jî ji nûsaziyan Zerdeşt yê sincî, sût tê wergirtin. Hemû feylesofên Helen, demên dirêj li van navendan mane û perwerde bûne. Tiştê ku ew pêktînin liser wê danehevê, qevastina ramanê ya asteke bilind e. Di lebta mirov de, yanê disinc û viyana wî de, pêngava azadiyê ye. Him di bandorê de mayîn û him jî bizavên ku bi sifî tene jiyandin, di wêjeya Grek de, bi aweyekî hîkarîker tene dîtin. Gelek berhem, nav û mijarên xwe ji van tîkilî û nakokiyên werdigirin. Li hember hêrîşên Pers, pêngavên mezin yê bîrdoziyî tî meşandin. Pirtûka Herodot ya dîrokî, digel ku li cemsêra (qutb) hembere jî, vê mijarê bi aweyekî berbiçav û berfireh nîşan dide. Serdestiya Persan ya leşkerî û siyasî, mîsoger e. Atîna bixwe, li qasî mûyekî xwe ji ketinê rizgar kiriye. Lêbelê vê rewşa xeter ku ji aliyê Atîna ve hate jiyandin, rê li ber pêşveçûnên ku heta weke wê roje pêknehatibûn vekir, di vê navê de, yekîtiya Isparta-Atîna bi qeran Flîppûs re, li bakur heta bi Makedonya belav dibe. Xeteriya mezin ya di bin vê de, bêşik kartêkera bingehîn ya ku zorê lê dike ye. Lêbelê para bilindbûna bîrdoziyî jî, ewqasî mezin e. Qayîşkêşiya Pers û Grek domdirêje. Esasê wê, bi rastiya duşeqiya şaristaniyê ve girêdayî ye. Dema Persî, xerîbî derûna xwe ya ku rêya Rojava vekirî û ber bi viyana azad pêngav avêtî bûn û xwe weke tenê îradeyekê kirin xweda, rê li ber sedemên bîrdoziyî yê windakirinê vekirin. Serdestîbûneke li Grek, weke ya Misir û Sumer, li hember demokrasiya Atîna bisernediket. Pozberî di navbera serdestiya Persepôlîs û demokrasiya Atîna de, derbasdibe. Dema ku bi berfirehî bête nêrîn, ev pozberiya rêya Rojhilat û Rojava ya yekemîn e. Digel ku di serî de, di warê leşkerî û siyasî de, ji aliyê hijmarî ve gelekî bêhêz bû jî, bi pêşevaniya bîrdoziyî û bi serdestiya taktîkên siyasî û leşkerî, di demêke kin de bandora xwe nîşan dide, çanda Helen bi Skenderê Mezin re, heta bi Hindistanê bi lezeke mîna birûskê, derdikeve meşeke serfiraziyê. Skender gelekî ciwan e, lêbele li piştê wî embara (depo) hêza aqil, Arîsto sekinî ye. Weke ku Napolyon jî xweş nîşan daye, tiştê ku encamê diyar dike, hêza viyan û aqilê nû û pîlan û taktîkên bi van ve girêdayîne. Pêşveçûna bilez ya bi vî rengî, di pêvajoya belavbûna şoreşa Bûrjûva de, Napolyon bixwe jî nîşan daye. Damezrakên împeratoriya Pers, digel ku saziyên gelekî mezin in jî, bawerhişk û cangiran in. Ne di wê rewşê de ne ku, bi şeweya Grek pêşveçûnan pêkbînin. Fedekariyeke wisa jî tine. Windakirina derûniye di destpêkê de, ev şens ji wan re ne hiştiye. Ev ravekirina kin jî nîşan dide ku şaristaniya Grek, him bi rêbazên bandorgirtinê û him jî bi yê bizavgirtinê, pêşveçûna xwe, bi rastiya Pers ve girêdaye. Di navbera yê tîkçûyî û yê tîkbirî de, timî şeweyeke tîkiliyên diyalektîkê heye. Heger ev tîkilî nebe, wateye tîkbirin û tîkçûnê jî çênabe. Sedemên ku rê li ber tîkbirinê yan jî tîkçûnê vedikin, ti caran ji aliyekî bi tenê dernakevin. Di meşa dîrokê ya mezin ya bi şeweya Pers-Grek û Rojava-Rojhilat de jî, hikmê vê zagonê derdikeve pêşberî me. Herçiqas ku bi mezinkirin jî bête vegotin, aliyê serdest yê meşa Skenderê Mezin, ji leşkerî û siyasî zêdetir, çandî ye. Amûrên leşkerî û siyasî, di rola pîrên hêsan de ne. Pêşmerc in, lêbelê tiştê ku diyarker, xwedî bandora payîdar û bêhtir şewê dide, çand e. Çanda Helen, bi şeweya ramana felsefî, di rewşekî gelekî pêş de ye. Şensê bersivdayîna vê pêşveçûnê ya saziyên ku ji Sumer û Misir mane, gelekî hindike. Nûsazîparêziya Med-Pers ya bisînor jî, ji pêkanîna vê pêşveçûnê gelekî dûr e. Ji BZ 300an heta bi PZ 300an, di demên Grek û Roma de, serdema çanda Helen ku li Rojhilata Navîn bi Skenderê Mezin destpêkirî, merhaleyeke nû ye. Yekem senteza mezin ya Rojhilat û Rojava ye. Navendên vê çandê ku şopên payîdar bi şûn xwe ve hiştine, weke Misir-Skenderiye, Anatolya-

Bergama, Dicle-Ktesiton û gelek bajarên hûr û gir, rê li ber nûjeniyên dîrokî vekirine. Bajarê Ferad-Zeugma ku rojane bûye jî, jî vê demê maye. Dikare bête gotin ku Rojhilata Navîn, bajarê bi serşok (hemam), şano, bazar (sûk) û bi dibistan, vê demê naskirine. Ji Roma heta bi Hindistan û Çînê, bazareke bi hereket çêbûye. Biçîna bazirgan re, serbixwebûn û mezinbûn pêşketiye. Gelek beşên pişekarî serbixwe bûne. Bazarên koleyan û bazarên mal yên mezin çêbûne. Cîhana bîrdoziyî, jî dogmatîzmê rizgar dibe raman û mezheb mîna aşîte mezin bûne. Sazûmana kevin ya moral û civakî ku bi heyînen etnîk û dogmatîzmê ve girêdayî, tên derbaskirin, demeke nû ya civakî û rebaza mîstîk ku bawerî û ramanê bingeh digire, di nava hev de pêşdikeve.

Kevin tê fêrkirin, gelek nûjenî jî derdikevine holê. Senteza Rojhilat û Rojava ku cîhanêke nû derandî holê ev e. Bêşik di vê de, digel bandora Persan bi taybetî ya demên pêşî, çanda Helen ku serdestî li çanda cîgehî kiriye û rê li ber nûjeniyên vekiriye rol listiye. Di dema Roma ya vê dawiyê de, Li Rojhilat li Partya (BZ 250-216) bilindbûna êran ya nû, ne di rewşeke wiha de ye ku li hember vê pêşveçûna çandî raweste. Berevajî vê, di rewşeke wisa deye ku jê re xizmetê bike. Serûbinîhevbûneke mezin tê jiyandin. Di meşa Pers-Grek-Roma ya koletiyê de, hatin û rawestîna li bandevê pêkhatiyê. Di dîroka mirovatîyê de, ti deman wiha kûr û bi temenê dirêj ne domandiye. Nûjeniyên nûsazîparêziyê, di berbiçaviya şaristaniya Roma de, ji PZ salên 300an pêde, leza xwe bi temamî winda dikin û wergeriyane bawerhişkiyêke tûnd. Ola êsa Mesîh, bawerîya dijber û tevîna (vehûn) civakî ya vê pêvajoyê pêktîne. Ola Hz Muhemed jî dereng namîne, bi derbeyên siyasî û leşkerî dixwaze ku vê pêvajoyê bin erd bike.

Hilweşîna şaristaniya koledar

Dema ku bi gelemperî civak, bi taybetî jî civaka biçîn, di nava xwe de bi temamiyêke birêkûpêk li deman bête veqetandin, Ligor derûna wê rast e û pêdivî ye, lêbelê Ligor rêbazên nêzîkbûna li bûyeran, fikirên girîng bi xwe re tîne, veqetan divê ligor çî pîvanê çêbibin, ev yek bi gengeşeyî ye. Ev mimkun e ku gelek hêmanên cuda bingeh bêne girtin û dêranên cur bi cur, heta yên nakok bêne çêkirin. Lêbelê dîsa jî sepandina zagona diyalektîk ya ku di xwezayê de her tişt pê ve girêdayî tezanîte-sentez ya li sazûmana civakê -ku reseniya wê li ber çavan bê girtin- rêbazeke dahûrandinê ya jêneger e.

Nêzîkbûnên liser zayîna şaristaniya koledar, gelekî bi gengeşî ne û dive ku wisa bin jî. Di vî derbarê de nêrîn gelekî cuda ne ku gelo ev di warê pêşveçûna civakî de pêdivîbû an na û çawa şêwe girtiye.

Çî qewimîbû ku mirovên dema neolîtîk, sazûmanêke ku pêşveçûyin belên (wad) dikir, bi aweyekî zêde afirîner, di bingeha wê de asta wekhevî û azadî derbasdar û xwe daye pejiandin, bi dev çerxa koledariyê ve berdan? Ev pirsar bingehîn, digel danehevên civaknasîyê (sosyolojî) jî, jî bersivdayinê geklekî dûr e. Nêrîna çîna ku mijokatiyê bingeh digire ya bi rengê "serdestan bi zor, bi xap û fendan têtîliyên koledarî afirandin", li hember pirsar "baş e serdest çawa derketine holê?" di nava zoriyê de dimînin. Nêrîna çîna serdest yên din ya bi rengê "jibo pêşveçûna şaristaniyê çîncînbûn şert e." Li hember pirsar "sazûmana ku ber bi şaristaniyê diçe, çîma rê li ber pêşveçûnê ku encamên li dij xwe bigire, veke?" di kevîne nava zoriyan.

Bi van herdu nêzîkbûnên sereke ve girêdayî, hemû nêrînen ku hatine pêşxistin, heta bi angaş (tez) ên zanistî, her çiqas ku îflas nekiribin jî, ev mîsoger e ku di nava bêçareyîyêke girîng de ne. Bi taybetî sazûmanên kapîtalîzma di bingeha lîberalîzma takekesî de ku îdeyên wê yên zanistî pir bihêz û nîrxên dahûrîner yên sazîkirinên sosyalîzma ku civakê bingeh digire, li hember pîrsgirêkên ku bi rastiyên civakê giran bûne, ne bi têrayî gelekî kêmbirin. Herçiqas ku di bêjin "pêşveçûnên zanistî jî, dibe ku tewîşî û bi pîrsgirêkbin.", dîsa jî xeterî û nexweşiyên di nava qeyrana ku heyî de, encex mirov mîna "cinawir" rave bike, ev jî tê wateya ku em xwe anku mirovatîyê mandele (înkâr) bikin.

Jibo koka vê meyldariya xeter, dibe ku heta bi demên çêbûna civakê, heta bi hemû têtîliyên wê yên xwezayê herin û mimkune em raveyan bibînin. Bi taybetî nêzîkbûnên pêşveçûnên şaristanî yên ku bi kûrbûna çîntîyê ve girêdayî, divê bila bi rewîştî zarokatî mîtolojîk bin, divê bila gelekî cidî bi rewîştî olî bin, divê bila felsefî bin û heta raveyên zanistî jî bînin, ev qet nagihin wê astê ku nakokiyên giran yên mirov tê de dijîn, bidin pejiandin. Mirovatîya ku xwe xwedî aqil û wijdan berdide, van nakokiyên normal weke pêvajoyêke dîngî ku bête jiyandin nabîne. Nîrxandinên bi vî rengî bixwe, têne wateya înkarkirina asta hişmendî û azadiya civakê ku rewşa mirovatî ya heyî derfetê nade vê yekê. Di ti demên mirovatîyê de, divê bila bi pîrozwerîya bilind, divê bila bi îdiayên zanistî werin pêşkêşkirin, jiberku teslîmî nêrînen bi vî şêweyî, bawerî û dogmatîzmên bîrdoziyî yên di teoriyan de nabe, û jiberku îfadeya rastiyê ya bi tenê ye, encex di vê bingehê de wê bibe şêweya îfadeyêke nêzîkî rastiyê.

Di encamê de ez dixwazim vê bêjim: Mirovatî û civakîbûna wê, di rewşa rasteqînî, dad û hezjêkirinê de, ji gihîştina tarîfeke ku bi gelemperî bê pejirandin dût e. Liqasî ku timî pêdivî bi tarîfeke wiha heye, ev pêdivî di roja îro de jî, li benda dahûrandinê ye. Ev dahûrandin, peywireke sincî ya jênegere û divê ku bi rewşeke sincî liser bête rawestandî. Ezê rewşa sincî ya ku divê bi vê şeweya dubare, anku bi nirxên zanistî re di nava pevrayiyê de be, pirsiyar bikim û nêzîkbûna xwe ya di derbarê dahûrandinê de, bidim meşandin. Ev mijar jibo min jênegere e û liqasî ku nirxê wê hêmaniye, ewqasî jî rêbazeke bingehîn e ku girîngiya pratîk vedihewîne.

1- Ma şeweya koledarî ya şaristanî diviyatî (meçbûrî) ye? Nakokiya herî bingehîn ya mirovatîyê ku çi bi xwe re û çi li hemberî xwezayê, têkiliya di navbera azadiyê û diviyatîyê de ye. Nakokiya di navbera "Azadî çiyê û heta bi kûderê? Azadî û diviyatî çiyê û çawa rîayet lê bête kirin?" heta ku heyîna jiyana xwe bidomîne, bêşik yê berdewam bike. Di xwezaya mirovatîyê de, çawa timî azadî ne gengaz (mimkun) be, mehkûmiya bêçareyiyê û qedere jî, domdar nabe. Rewşa azadiya domdar, liqasî ku utopya bihiştê sexte ya çîna beredayî û kesên ku ji pêvajoya kar û kedê qut bûne ye, ewqasî jî çîhana bi "ezabê dojhê" ya koleyên ku bi dîlbûnê ji têkoşînê qut û têkçûnî xûnifandine ye. Digel ku di navbera herduyan de têkiliyeke hişk heye, dîroka mirovatîyê û jiyan bixwe, xwedî rewîşt û mantiqekî bingehîn yê hê bêhtir aloz (girîft) e. Digel herdu xalên serîk, rê li ber gelek nêzîkayiyên dogmatîk vekirine, jiyan bixwe xwedî rasteqîniyekêye ku rê dide nêrînên bi zanîn û zanistîyê ve girêdayî.

Tê fêhmkirin ku bastûra (bunye) şaristaniyê ya biçînçînîbûnê pêşveçûyî, bi derûneke ku nakokiyan sift dike, jîndariya xwe didomîne. Çînçînîbûn, bi nakokiyan ku vehewandine rê li ber têkoşînê vekirîye û hewl dide ku biryardariyê qezenc bike. Şer, çawa rewşeke têkoşînê ya gihayî asta şidetê, asta biryareke nû pêdivî dike, rewşeke aram (hedirî), ku li aştîyê hatî, asta biryareke ku li terazê rûniştî îfade dike. Aramiya domdar yan jî berevajî wê şerê domdar, an yê civakê di nava lihevdanan de tine bike û veguherîne heyîneke din, an jî yê di nava tiraliyê de birize û here.

Rexneya bingeh ku li sazûmana koledar bête kirin, bersiva van pirsan "Di pêvajoya zayînê de, bi çi berdêlan pêkhat, bi pêkhatinê çi da mirovatîyê, çi da windakirin?" yê bi wate bin. Heger ku em taybetiyên têkiliyên koledar û şeweya wî ku didomîne li ber çavan bigirin, em rexneyên tekûz pêşbixin û herwiha bersivên rasteqînî, yê sazûmanê bêhtir bi me bidine fêhmkirin. Digel ku neyê xwestin jî, ev şaşiyên xeter ku timî dikevinê, pêdiviya nêzîkayiyên zanistî û derûna encamên wê dide. Serikên çîna yê civakê û dijên diyalektîk yê di rewşa serîk de, ketina nava fikarên sabît ku xwe îdealîxe bikin û xwe bînine rewşa dogmayên jênegere. Di vê pêkhatinê de, berpirsiyar girtina qismê mijok anku yê serdest û beredayî bi tenê, yê rê li ber yek alîtiyê veke. Bi hindikayî liqasî van, divê ku qismê li bin, yê tîn mêhtin, bi rewîştê xwe ya nêzîkî dogmatîzmê, ji ber çavan dût neyên girtin. Ev ji ber du sedeman wihaye: Yekem, jiberku serdestiya bîrdoziyî bi qismê raser re ye, bandora wan ya dogmatîk timî çîhana xeyalên yê binî, bi aweyekî hişmend, dixerîcîne û xweyî dike. Duyem, zorbûna kar û jiyana yê binî ku bêhnê nadiyê, destûrê nade helwesta bîrdoziyeke ligor berjewendiyê wî.

Di bin ronahiya vê nêzîkayîya rêbazî de, bi vê pîrsa bingehîn "Kîjan mercên berbiçav, rê li ber têkiliyên civakî yê bi şeweya koledarî vekir?" bêhtir dikare bersivên rasteqînî bîn pêşvebirin.

Civaka çandinî ya neolîtîk, di pêvajoya gihîştinê ya dirêj de, bi taybetî di navbera BZ 6000 û 4000an de, rê li ber hilberîneke dewlemend û daneheveke teknîkê vekir. Teknîkên tunc û yê din, halet, çerxên kûzkeriyê, amûrên raçandinê, sûdwergirtina ji enerjîya ajalan, çanda gelek rîwek û ajalan, tekelek, qesirbendiya malê, mohr û mîtolojiya bi pîr xwedayî ve girêdayî û çandên ku yê derbasbûyîna şaristanî gengaz bikin, di rewşeke gihîştî de ne.

Ev çandên han, li derdora çeman li derên berhemdar, bi derbasbûyîna ji rêxistinên qebîletî, bi rêxistinên civakî yê bikaribûna rê li ber berhema zêdek vekin. Civaka Misir û Sumer ya nû ku em dixwazin terîf bikin, li dora perstgehan ev rêxistin bi ser xistiye. Dema ku perstgeh dibe dabaşa xebirdanê, girîngiya baweriyê derdikeve holê. Girîngiya ji sêrebediyê û ji şamantiyê qevastina rahîbtîyê, li vir xûya ye. Sazûmana ku rahîb pêşve biriye, du alî ye. Ramanên aliyên bi totemên ku bi bavkanî û daykanî ve girêdayî, têne temsîlkirin, bi têgîneke olî ya bingehîn û nêzîkî aqilan çîh diguherîne, ev tiştê ku hatiye pêkanîn, şoreşeke bîrdoziyî ye. Heyînen etnîk yê ku bi xisimtiyê di nava tengahiyê de, rê li ber hilberîneke hindîk vedikin, bi hêza kedeke ku li dor perstgehan digihîne hev û bi aweyekî pevrayî dixebitin, tê derbaskirin. Xebata pevrayî rê li ber berhemdariyeke bêhempa vedike. Berhema zêde ku tê ser hev, cotgehên pevrayî yê hê meztir derdixê holê. Encam, teqîna hilberîneke ye. Ji ber vê yekê, dema ku pîşekar jî li dor perstgehê dibine yek, civaka nû him bi seresazî û him jî bi binesaziya xwe digihîje hebûneke bi bingeh.

Dilê civaka nû perestgeh e. Ya rastir, malzarok di sînga perestgehê de ye. Şêweya hilberîna koledarî, bi karbeşiya nû ve û bi seresaziya bîrdoziyî ve girêdide û derdixê holê. Pêvajoya pişt re, herî mezinbûna nimûnekê û xwe dubarekirina wê ye. Ev şêweya civakê ne bi zorê tê pêkanîn. Şêweyêke hilberînêye ku bi mîtolojiyêke bawerdêr e û xwe bi berhemdariya xwe çespandiye. Zor, vê dawiyê bi aweyekî sift dikeve dewrê. Mirovatî, di serî de bi bawerî nakeve nava civaka nû ku yê di pey re bibîne bê çawa civakeke bi şêweya koledarî ya bê eman e. Ev zor e ku em bibêjin rahîb jî bi hişmendî û xasûkî hereket dikin. Ewan pêşveçûneke li pêşya civaka kevin, bi pratîka xwe dane çespandin û bawerkirin. Ev yek tê çespandin ku derûna destpêka pêvajoyê, bi vî şêweyî pêşveçûye. Jixwe şêweya civakê bilintir, tenê bi zor û fendan nayê damezrandin. Tî şêwegirtinên civakî, heta ku serdestiya xwe neçespînin, ne bi zorê têne damezrandin û ne jî dikarin pêşveçûna xwe bidomînin. Ya girîngtir ev e ku zor, encex dikaribe jibo şêweyên ku erka xwe wînda kirin, jibo hilweşîna yên kevin û helatina yên nû rola xwe bilîze.

Lêbelê çiqas ku pêvajo mezin bibe û xwe belav bike, rewîştê bi nakokî ku di destpêkê de xûya nake, xwe nîşan dide. Dema em mînaka Sumer li ber çavan bigirin, rêvebiriya raser û tebeqeya venêran yên ku mezin dibin, ji hev vediqetin. Koma rahîban girîngiya xwe wînda dikin, pêşî polîtîk û di pey re fermandarê leşkerî girîngiyê qezenc dike. Piştî dema qeranên rahîb, qeranên polîtîk girîngiya xwe nîşan dide. Şopên lihevdanên hişk têne dîtîn, heta bi ziman û wêjeyê jî xwe nîşan dide. Demên pêşî, lijneya xwedayan (Pantheon) yên ku weke îfadeya mîtolojîk ya tebeqeya raser, erkeke mezin ya bîrdoziyî didîtin, bi zêdebûna nakokiyên di navbera wan de, cudabûn û lihevdan dest pêdikin.

Heta ku teraza di navbera rahîb û polîtîkvanan de serûbinî hev nabe, yekîtiya xwedayan hebûna xwe didomîne. Di destpêkê de, çalakiya jinê ya civakî, hê jî di Pantheon de, bi hebûna cîhê xwe diyar dibe. Çiqas ku giraniya bijarteyên polîtîk liser civakê zêde dibe, di karbeşî û cîhên girîng yên xwedayan de, guherînan hîkarîker çêdibin.

Di şêwegirtina civakî ya pêşî de, jina ku xwedî cîheke mezin, vê yekê di kesayetiya ênanna, xwedawenda bajarê Ûruk de nîşan dide. Ênanna di civaka Sumer de, rewşa xwe ya bi hêz, ji rola xwe ya civaka neolîtîk werdigire. Bi pêşveçûna civaka koledar re, ev rol girîngiya xwe wînda dike. Nasnameya rahîb, ji aliyê enlîl, xwedayê parêzker yê navenda perwerde û wêjeyê, Nîppûr ve tê temsîlkirin. Xweda Enkî yê ku çîqa diçe çalakiya wî zêde dibe, yê herî afirîner û sazgerê kar, çîna rêvebir yên polîtîk temsîl dike. Aqilmendiya gelek xwedayên ku yê bi şûn ve werin, dîsa Enkî dike. Ev yek bi taybetiya wî ya polîtîk ve girêdayî ye ku zêde tevî şidetê nabe. Wêrekiya Enkî ku aqil û rê nîşanî Enlîl dide, îfadeyêke din ya bilindbûna rewşa çîna polîtîk li hember koma rahîba ye. Xwedayê Babîl Mardûk, dikeve şûna bavê xwe Enkî, Mardûkê ku bi ser dayîka xwe Tîamat (dayîka xwedawend e) de diçe, wêna tevî wanê ku di rola lawê wê û mîrê wê de dide erdê, bavê xwe Enkî bi camêrkî (bi kubarî) di cîhê wî de rûdinîne, pêşveçûna fermandariya leşkerî û derbasbûyina dîktatoriya yekî ku weke pêşveçûna împetoriyê despot û zordest, nîşane dike. Şêweya rêvebiriya Babîl, rêxistina olî ya ku bi şidetê û bi rola qeranan ve girêdayî, ji nû ve tê birêkûpêkirin. Koledariya ku gelekî bi xwe ewle û sazîbûna wê, weke xwe vedide sazûmana asîmanî û li asoyê "asîka (sîluet) yek xwedayî" xûya dike. Piştî demeke kin, Brahîm li şûna rahîbtîya ku hêza xwe wînda kirî û lawaziya wê ya ku ji kevnatiya wê dihat, bi şêweya "pêxember" weke rexneyêke li sazûmanê pêşvedibe, herwiha deriyê herî girîng jibo nûsazîbûnê vedike.

2- Mînaka Sumer dide çespandin ku di çêbûna civaka biçîn de, ji zorê zêdetir damezrandina nû ya bîrdoziyî, rola sereke lîstiyê. Li Misrê jî ev mijar derbasdar e. Em vê rastiyê dipeytînin (tesbît) ku rola civaka biçîn a destpêkê pêşverûyê. Vê yekê bi bîrdoziya raser û berhema zêdek ya gelek, nîşan dide. Herwiha ji ber pejiwandina koletiyê, mirov nayêne tawanbarkirin. Ev yê bikaribe di nîrxê rexneyêke wêjeyî de be. Vê dawiyê heyîna çîna rêvebir ku weke girêbayekê (ûr) mezin dibe jî, rastiyêke û sedema bîngêhîn ya civakî ye ku "pisporbûn" û harbûn pêşvedîçe. Girêbabûn, qismê çînçînîbûnê yê ne pêwîst e. Qismê ku çîqa beredayî dibe bê erk dimîne, dikeve rewşa çavkaniya mijokatî û zordariya sazûmanê ya ku zêde dibe. Vê rewşê bi mezinbûna çîna rêvebir ya ku demên pêşî di warê karbeşiyê de, cîhekî wê hebû, an yê berê xwe bide emperyalîzmê, polîtîkaya talan û dagirkeriyê pêşve bibe an jî yê heta bi dawî zorê bide derfetên mijokatiya nav xwe, herwiha rê li ber pêvajoya kevnepereştîbûna sazûmana koledar û bi temamî ne pêwîstiya wê veke.

Li vîra xwezaya mirov, bi taybetiyên bîngêhîn yên psîkolojîk, heyîna giyanî û bîrayî ya civaka ku di serdema mîtolojîk de dijî, di kesayetiya qeran de çawa ber bi "xwedabûnê" diçe, lêkolîna vê sîtava olî ya nasnameya polîtîk, bi serê xwe mijareke cuda û gelekî girîng e. Lêbelê di serî de navê xwedê yê "cezakerîne" ku xuya nake, bi mîsogerî kevnepereştîbûna sazûmana koledar û li hember bizavên ku zêde dibin, jibo zora sazûmana çîna rêvebir kesibandina (dan qezenckirin) erkeke rêxistinî, dide der. Safîkirina zimanê di navbera sazûmana xwedayan û ya polîtîk û civakî de, peywira

dahûrandina civaknasiyê ya herî bingehîn e, rawestîna liser vî zimanî ya bi bêdengî, sivik û ne bi girîngî, encex bi bandora tégihîna çîna serdest bê ravekirin. Her çiqas dahûrandina civakan, bi hindikayî li qasî lêkolîna nêrxê wan yê daringî -dirav-, nîrxê wan yê menewî -ol û xweda- girîng e. Di beşên pêşiya me de, ezê bêhtir liser vê yekê rawestim. Lêbelê dahûrandinên bi vî rengî ku di civaka Sumer de werin lêkolînkirin, encamên hîkarîker û berhemdar derdixê holê. Di vî babetî de, eslê wê dîroka şaristaniyê, weke berdewama civaka Sumer e ku mezin bûye, bi şax bûye û çîqa ku çûye cuda û cure cure bûye.

Dema ku hate BZ 2000an, rewşa ku di bilindbûna Babîl de berbiçav bû, zêdebûna zordariya sazûmana koledar û pêşveçûna xapên bi hişmendî yê xericandina rahîban e. Tiştê di kesayetiya Hamûrabî de hatî jiyandin, birêvebirina sazûmanê ya bi darê zorê ye. Herwiha ev merhale xwedî wateyeke gelemperî ye, herênayêke weke an hilweşîn an nûsazî, xistiye rojeva dîrokê. Pêşveçûnên vê dawiyê, liqasî hilweşînên ku bi zorê hatine rawestandî, bi derketina Pêxemberan yê li dût hev, bi şeweya nermkirinê û bêhtir bi jiyandarkirinê xwe nîşan dide.

3- Weke ku me di beşên borî de jî anîbû zimên, di dîroka olan de, di destpêka merhaleyeke girîng de, Hz Brahîmê ku weke kalîkê pêxemberan tê nîşandan, derdikeve holê. Kesayetiya wî, dema ku tê de jiyayî û meyla ku temsîl dike, ji nêzik ve bi ketina hêza polîtîk ya Sumer li Babîl û bi destpêkirina serdema Hamûrabî -Nemrûdan- yê ku di kesayetiya xwe de pêvajoya ji koka Amorît temsîl dike ve, girêdayî ye. Ev pêvajo, di koletiyê de dema ku zor herî bi şidet û bi aweyekî rêxistinî hatiye sepanandin e. Vê dawiyê xanedanên Asûr vê digihînine xala bandevê. Li Misrê jî rewşeke wisa tê jiyandin. Bersivên ku tene dayin, li hundir şerên xanedanan û li derve li hember emperyalîzmê tevgerên azadiyê yê heyînên etnîk in. Li nav semîtîkan, hê bêhtir guherînên xanedanan û pêşveçûnên pêxemberiyê pêktên, Li nav komên Aryen, mîrîtî û konfederasyonên ku taybetiyên çînî pêşneketine, derdikevin pêş. Di heman demê de, ev pêşveçûnên nû ku weke xelekên belavbûna yekem erkê dibînin, tevkariyê li dirêjbûna temenê sazûmana koledar jî dikin. Firehbûna axa ku destlênedayî, dide nîşandan ku sazûman wê belav bibe û temenê xwe dirêj bike.

Golikên koledar, xwedî derfet in ku li navbera du okyanûsan jî belav bibin. Li navendên bingehîn, bêsilbûna rahîban bi kûrayî tê jiyandin, sazûmana ku li tevaya Rojhilat Navîn weke yekem xeleka belavbûnê bi nermayî belav dibe, weke pêla duyemîn digihe Çînê, Hindê û Ewropayê, Piştî BZ 1000an digihe bandevê. Bi ketina hesin ya dewrê re, ev merhaleya dawî ku em dikarin bibêjin demokratbûna sazûmanê, digel ku gelek nûjenî û nûsaziyan bi xwe re hildigire jî, xwe ji nîşandana amaje (elamet) yê hilweşînê rizgar nake. Ji BZ 1000an heta PZ 500an, li Hindê, Çînê û Bakurê Ewropa, piştî ku pêvajoyeke bi şeml hate jiyandin, li hemû qadan hilweşîn di rojevê de ye. Di vê demê de pêşveçûnên herî girîng, li zozanên êranê pêkhatina hêza siyasî ya Med-Pers e ku rê li ber veqetana Rojhilat û Rojava dike. Kevneşopiya Zerdest ku bi pirsên ji xwedê dike, şoreşeke sinc û viyanê pêktîne, jibo vê veqetanê dibe zemîna bîrdoziyî, emperetoriya Pers, koletiyê digihîne xeta Rojhilat heta bi Hind û Çînê, ji aliyê din ve di rêya Rojava de, xeta helatina Greko-Romen bilez dike, roleke mezin ya dîrokî dilîze. Vê rola emperetoriya Med-Pers, di nava xwe de sazûmana koledar werdigerîne şeweyeke dadmend û nerm, temenê xwe hezar salî dirêj kiriye.

Di xeta Rojhilat de, tiştê ku Çîn û Hind dijî, dubarekirina Sumer û Misrê ya derengmayî ye. Him jî piştî du hezar salan. Di xeta Rojava de, şaristaniya Greko-Romen ku pêşveçûnê û digihe bandevê, şeweya ramana mîtolojîk û olî derbasdike û bi rêvekirina li ber ramana felsefî, bi stirhandina hevîrê şaristaniya Rojava ku îro gihaye raser, rolekî serketî lîstîye. Jiberku em liser van mijaran rawestiyabûn, ne pêdiviyê em dubare bikin. Tiştê ku jibo me herî pêwîst e, gelo li kûdera sazûmanê û kengî amajeyên jevketin û hilweşînê xuya bûne. jibo ku em ji nêzik ve Sedemên ku rê li ber vekişîne û bê kî di vê de rol listine, bibînin, bi taybetî pêşveçûnên bîrdoziyî û pratîk yê ku sazûman jevkîrine, gelekî girîng in.

a- Di merhaleya şaristaniya koledarî de, jihevketina sazûmanê ya ji aliyê teorî pratîk ve gengaz e. Jevketina sazûmana civakê ya bi aweyekî teorîk, pêwîst e ku hemû hêza di sînga xwe de derêxe holê. Heger ku sazûman ligor mercên berbiçav, xwedî hêzeke jiyane be, divê ku vê bide çespanandin. Dibe ku ev pêvajoya hilweşanê, ji aliyê şeweya kevin ve bê asteng kirin û derengî kirin, bi zorê bê tepisandin, lêbelê dema ku mercê musaîd dibin, ji xwe nîşandanê nikare bi reve. Tiştê diyarker hêza jiyana sazûmana nû ye. Çîqa ku hişmendî û viyana vê pêşveçûnê, ti hêzên zordar û xapînokî nikarin rê li ber pratîkbûna wê bigirin.

Çîna koledar di bin ronahiya vê rêzika gelemperî de, di pîvana tekiliya bingehîn yê mantiqê civakê de, di bûyina sazûmanê herî kûr, herî fireh û bi temenê dirêj de, serketî bû ye. Sira vê bi sazûmana xwedanî ya ku liser mirov hatiye damezrandin ve girêdayî ye. Di civaka berîtir de, xwedaniya liser amûrên hilberînê bi teşeya pevrayiyê bû. Bêhtir liser nîrxên berxwarinê, encex

xwedaniyeke bisînor derbasdar bû. Tegihîna mirov-xweda derbasdar bû. Weke nasnameyekî neberbiçav heyînên perestîne (îbadetkîrin), xweda, bi mirovan re û bi civaka ku ew di nav de re, li cem hev, di nav hev de û ji hev re weke xisiman bûn. Afirandina mirovan ya ji aliyê xwedê ve û xwedîbûna xwedê ya li mirovan ne dabaşa xeberdanê bû, bêhtir berevajîya vê yekê derbasdar bû. Xwedayên ku mirov û civak xwediyên wan hebûn. Ev yek tê vê wateyê ku mirov weke hêzeke civakê xwe pîrozwer dike, xwe bi nasname dike û ji hebûna xwe haydar dibe. Dema ku mirov bixwe dibine mijara xwedaniyê, benîtiya jibo xwedêweke vedaneke herî girîng ya civaka koledarî, nasnameya xwe bidest dixê. Ji xwedayê ku paşnav û nasnameya mirov, werdigerîne ser têgihîna xwedayê ku mirov dike benî. Herwiha veguherîna olî ya ji bîngê, tê wateya veguherîneke civakî û ev pêvajoyê jî encama têkoşîneke sift e.

Bi kinayî em bibêjin, benîtiya û suxrekariya ji xwedê re, di dîroka olan de, bi çêbûna çîneke tûj ve girêdayî ye. Çêbûna çîna dîngî, weke vedaneke bîrdoziyî, liser pêşveçûna olî xwedî bandoreke diyarker e. Di civaka Sumer de, ev pêvajoyê gelekî hîkarîker û hînkêr e. Jiberku orijînalê (xweser) dide vedandin, pêdivî ye ku liser bê rawestandin. Bi taybetî ev sêwiranin ku bi navê Nînhûrsag, Înanna, Îştîr, En, Enlîl, Enkî û Mardûk ku weke xwedayên bi şeweya mirov hatine bi nasnamekîrin, di veguherîna civaka Sumer de, mîna belgeyan e, dahûrandina rast ya van mîtosên xweda ku xwedî nîrxên belgeyî, Jiberku bi aweyekî efsaneyî hatine nivîsandin, yê bêhtir tîkiliyên civaka koledar bi me bide fêhmîkirin. Wê demê di bîr û bawerî û giyana mirovatîyê de, ne zimanê zanistî, zimanê efsaneyan, mîtosan û yê helbestî derbasdar e û ev ziman weke amûreke bîhêzbûna bîrdoziyî bikaranîne. Jiber vê yekê, dahûrandina zimanê mîtolojîk, pezwîra zanistê ya jênegere.

Bi vê nîrxandina kin ya di derbarê zayîna tîkiliyên koledar de, em têdîgihîjin ku taybetiyên vê civakê yê bîngê, mirov kiriye rewşa amûra hilberîne ya bîngê. Tunc û teknîkên hilberîne yê din, weke amûrên hilberîne piştî koleyan dikine rola duyemîn de. Balê dîkîşînine ser tîkiliyên koledar û xwedanîkirina mirovan. Rahîb bi bawerdêrî û tîrsdêriyeke mezin, anku bi aweyekî psîkolojîk, siyasetmedar bi venêran û rêxistîbûn, dadger bi zagonên liser kole, sazûmaneke wisa dadimezrînin ku encex bibêjine vê sazûmana xwedayên mezin û wiha jî bûye. Ev yek karakterîstîka diyarker ya civaka koledar û bîngê e ku olan bi vî rengî mezin dikin û bi aweyekî pîrozwer û tîrsdêr derdixine hemberî mirov. Taybetiya stratejîk ya bîngê ya tîkiliya koledar ev e ku di jîyanê de, bi zagonên teqezîyê (mutleqîyê) ve girêdane. mutleqîyet bîngê sazûmanê ye. Bi xwedanîkirina mirovan û birina wî ya ber bi hilberîne, rê li berhemdariyeke zêdek ya mezin vekirîye. Tenê ne di karê axê de, di hemû karên bazîrganî û pîşê de, keda kole bi aweyekî zêdekarî tê bikaranîn. Di hemû suxreyên çîna rêvebir yê taybetî de jî, keda kole tê bikaranîn. Heta tê çavdêrîkirin ku wezîran bixwe jî di rewşa koleyan de didin xebitandin û herwiha mirovan bi aweyekî berfirehî di warê suxreyan de bikartînin. Cudakîrîna cîsan liser jîne hê bêhtir bi aweyekî kûr tê dîtin. Kolekîrîna civakê û jîna ku weke cîseke di pîlana duyemîn de tê kolekîrin, di nav hev de pêşve diçe.

Derbaskîrîna sazûmana koledarî, encex bi kêmbîriya mirovên kole û van tîkiliyên wan yê gengaz be. Heta ku berhemdariya tîkiliyên koledarî berdewam bikin, jevketîna vê sazûmanê ya xwe bi xwe an jî bi darê zorê derfetê nabîne. Di warê bîrdoziyî de, liser giyan û bîrûbawerîya hemû mirovan, di bîngê tîrsandin û cizakîrîna mirovan ya ji aliyê xwedê ve de, an jî jibo suxreya wî ya baş, weke benîyekî xoşewîst were pêşwazîkirin, serwerî (serdestî) weke tevneke ku neyê perçekîrînhatîye damezrandin. Cizakîrînen pratîk di asteke erjeng de ne. Li çarsîngê (çarmix) xistin, dahênana şarîstaniya Roma ya ku di bandeva hêza xwe de ye. Li qazoxê xistîna mirovan û gurandîna wan dahênana Asûr e. Bi mirîna qeran û gîregîran re, bin erd kirîna jîne û suxreya wan, li Sumer, Misir, Hind û Çînê, bi taybetî di demên pêşî yê pêvajoyê de, gelekî tê dîtin. Nayê ramandin ku canê kole heye. Ew organek, perçeyek ji yê qeran û efendîyê xwe ye. Dema ku xwedî bimire, bînerdkîrîna perçeyên wî jî, tîştêkî xwezayî tê dîtin. Ya herî tîrsnak ev e ku kole û suxreya bixwe jî bawerdîkin ku ev yek wiha ye, liqasî ku liserhildanê nahîzîrin, kirîna rewşa organek an jî perçeyekî bîndest. Pîramîdên Misrê, tîrb û perestgehên Sumer, Hind, Çîn û Aztek, hemû berhemên qesîrbendî yê Roma, encamên keda kole ne. Ji bilî koledariyê, ti sazûman ne xwedî hêz in ku mirov weke amûrekê bikarbînin û nîkarînin jî.

Kêmbîriya vê tîkiliyê û çîqas ku diçe betan ji rû bîhatîr tê, dibe bîngê sedema ji hevketîne. Bikaranîna hesin ya di çandîni, pîşê û leşkerîyê de ku BZ di salên 1000an de destpêkir, bandoreke mezin li vê yekê kirîye. Hesin him di warê berhemdarkîrîna axê de û him jî di serxwebûna çîna pîşekaran de, roleke diyarker lîstîye û weke çekêkê gîhîştîye destê gelek koman. Tunc madeneke bisînor e, bêhtir di bin destê çîna rêvebir û efendîyan de ye. Zêdebûna hesin, ev kêmayî û ev gemerdan şîkandîye. Vê rastîyê madena hesin di bîrûbawerîya mirovan de kirîye efsane.

Ji aliyê din ve, weke ku di hemû sazûmanan de xûya dike, nûhîna ku ji ber bikaranîna demeke dirêj tê, li vira jî derdikeve hemberî me. Sazûmana ku pîrozweriya xwe ya di serî de û berhemdariya xwe winda dike, nebaşbûyîn û erjengiya xwe di bîrûbaweriya mirovan de nîşan dide, hevî zêde dibin ku alternatîvên berhemdartir yê bêne dîtin.

Amûrên hilberînê yên nû, bi taybetî têtikiliyên li derdorên hesin rola sereke dileyîzin. Felsefeya Grek, çêkirîtiya xweda yên mîtolojîk derdixê rastê, Zordestiya Medya jî viyana mirov li hember xwedê diparêze û pîrozwer dike. Di hîmên bîrûbawerî, giyanî û di yên raman û sinc de, veguherîneke bingehîn, di merhaleya bandeva sazûmanê de jî, diyar dibe. Xweş tê fêhmkirin ku zagon ne peyvên xwedê, fermanên qeran û rêvebirane. Xweda dikine yek dişînine ezman û nexûya (gom) dikin, girîngiya mirovan ku zêde dibe, di warê pêxemberbûnê û feylesofiyê de, wan bêhtir wêrek, bi viyan û xuyayî (berbiçav) dike. Çiqas ku diçe, bêhtir bawerî bi mirovan tê ku dahênanî karê aqlê wan yê bihêz û hişyar bûyî ye. Di sînga têtikiliyên koledarî de, mirovê nû bi bingeha xwe ya hilberîn û civakê re, weke hêzeke raman û viyanê dihile, ji benîtiya ku sazûman xwe dispêriyê derdikeve, weke hêzeke çareseriyê bi aweyekî hîkarîker û bi aqil pêşvedîçe.

b- Jihevketina sazûmana koledar ya pratîk, di hemû seresazî û binesaziyên civakê de, tene çavdêrîkirin.

b.1- Di jihevketin û derbasbûna her sazûmanê de, pêşdetiriyên ku xwe nîşan dikin, digel ku di nav hev de ne jî, ev yek xweş tê zanîn ku pêşveçûnên di heyîna daringî de, xwedî bandoreke diyarkirina encamê ne. Di destpêkê de, di hemû amûrên hilberînê yên ku sazûman xwediyê wane, di serî de kole jî di nav de digel ku lodbûneke mezin hebe jî, têtikiliyên xwedaniya koledarî fersendê nade bikaranîna, vê yekê ligor berjewendiyên xwe nabîne. Têtikiliya xwedaniyê, bi taybetî derawa koletiyê, ketiye rewşa benpêkê (pêgirêdanê). Seferên leşkerî ku zêde dibin, bazarê ji koleyan tije kiriye. Destliserdanîna qadên gundîtiya azad, tevkariyekê li çîna kole û proleter dike. Zêdebûna kole û nefsên bêkar, bêhna sazûmanê diçikîne, ji aliyê din ve, bidestxistina hesin û amûrên hilberînê yên bi aweyekî hêsanî, li qadên gundewarî, di bingeha têtikiliyên feodal de, derî li ber hilberînekê vedike. Gundîtî derfeteke nû ya pêşveçûnê bidest dixê û bi vê ve girêdayî li benda birêkûpêkirinê dimîne.

Gundîtiya ku timî koletî li dij pêşvedîçe, bi hêza hesin a demokratîkirinê radibe ser xwe, bi amûrên hilberînê yên din ku tekûz bûyî jî, di merhaleya veguherîna çîna bingehîn ya serdema navîn de ye. Gundî, êdî an azad e an jî bi efendiyê xwe re ji xwedaniya koledarî derbas dibe, hê bêhtir bi xwedaniya axê ve girêdayî, di bingeha şeweyên hevparî de, bi sazûmaneke têtikiliyê ve tê girêdan. Ev sazûmana têtikiliyê, hê bêhtir rê li ber nirxdayîna amûrên hilberînê, têtikilî pêdayîna hilberînê ya ji nêzik ve û têtikiliyên germ yên bi jiyanê ve, vedike. Mafê xwedîbûna malekê tê naskirin. Ev rewş, ligor bêtêtikiliyên koletiyê yên li hember amûrên hilberînê, asteke herî li pêş e. Di bingeha jihevketina koletiyê ya di qada gundewariyê de, ev pêşveçûnên nû û berhemdar rola diyarker dileyîzin. Mercên ku yê sazûmanê di warê aborî û civakî de ber bi jihevketinê û ber bi damezrandina sazûmaneke aborî û civakî ya nû ve bibin, bandora xwe li her derî nîşan didin. Ev derketina holê ya di warê daringî de û çespendîna wê ya ku yê bikaribe bibe alternatîv, sedema herî bingehîn a jihevketin û hilweşînê ye.

Digel ku pêşveçûnên bi vî rengî gelemperî ne jî, di qadên sazûmanê yên navendî û kevin de, di rewşeke diyarkertir de ne. Axa Ewropa ya destlênedayî, fireh û jibo çandiniyê bikêrhatî, di çêbûna sazûmana nû de, xwedî mercên herî berbihev e. Nejiyanbûyîna têtikiliyên koledarî yên bi kûrayî, taybetiyên ku bikaribe rê li ber şoreşeke çandiniyê ya nû vebike, bi xwe re hildigire. Ewropa weke navenda sazûmana feodal ya nû bihêz û berhemdar e. Axa Ewropa ku ji neolîtîkê ve tê bikaranîn jî, ji nû ve di têtikiliyên serf de tê birêkûpêkirin. Bingeha çandinî ku jixwe ve bihêz bû, bi têtikiliya feodal hê bêhtir zindî dibe û ew wê bikaribe roleke weke şoreşa çandinî ya duyemîn bileyîze. Jiandina şoreşa feodal a bi kûrayî, jênerêvîne. Mercên wê jî gelekî bikêrhatîne. Bandorên koletiyê yên kûr û domdirêj, nîrxê pîrozweriyê yê duyemîn dide têtikiliyên feodal û şeweya hilberînê, nîşan dide ku rola pêşevaniya herêmê bi awayekî hêsan bernade.

Qeyran û jevketina aboriya koledar û heyîna civakî ya li bajaran, kûr dibe. Piştî BZ salên 1000an, bandora duyemîn a hesin, liser çîna pişekarên bajêr tê dîtin. Demên pêşî, Jiberku maden bihabû û bi zêdekarî di xwedaniya rêvebirên siyasî de bû, di warê şeweya têtikiliyên koledarî de, rê li ber bindestiyêkê vedikir. Dema hesinê ku zêde û erzan bû, kete destê pişekaran, êdî li hember sazûmanê werdigere çîneke nû. Êdî bajar jî, ji navendîbûna koletiyê derdikevin, hê bêhtir werdigirine heyînen civakî yên ku li hember wê rolekê bileyîzin. Ev pêşveçûnên bi vî rengî, bandorê di serî de li bazirganan û hemû qismên din jî dike. Gelek pişeyên mîna cûmkeran, camkaran, kûzkeran, aşvanan û nivîsevanan serbixwe dibin û dikevîne hemberî têtikiliyên koledarî. Li hember şeweya xwedaniya koledarî ku rê li ber şoreşa bajêr vekirîye, niha ji aliyê bajêr ve rola gorvedêr

(gorkol) tê leyîzandin. Weke qada gundewarî, li bajaran jî qeyrana ku siftbûyî û jihevketina têtikilyên xwedaniya koledarî, rê li ber kêmbûna nefsen bajêr vedike, bingeha bajarîbûna nû datîne. Dema ku em têne PZ sedsala 5an, bajarên ku sazûmana koledarî lê serdest, di rewşa kavilekî de ne. Paşdeçûyineke mezin dabaşa xebirdanê. Dema ku sazûman li bandevê bû, bi taybetî hilweşîna bajarîbûna bi şeml ya di şeweya (stîl) Greko-Romen de, weke windabûneke mezin bandora xwe nîşan dide. Careke din nagihe vê qesirbendiya ku hê jî mirov heyranî xwe dihêle. Di sazûmana feodal de, ya ku di qada dîrokê de, weke şoreşeke çandinî ya duyemîncîhê xwe girtî, rola bajaran di pilana duyemîn de ye. Ti caran nagihine hêza bajar, qesirbendî û dewlemendiya sazûmana koledar. Hê bêhtir weke biryargehên rêvebirîya nû, di rewşeke bajarên piçûkbûyî û gundên mezinbûyî de dijîn. Digel hindikbûn û piçûkbûna di navenda wan de, zêdebûna hijmara gundan û ya nefsan, girîng dibe.

Şeweya têtikilya koledarî, di mercên aborî û civakî de, Jiberku li mezinbûna hilberîn, raman û moralê mirov teng tê, jihevketiye. Mezinbûna hêza hilberîna mirov a çendanî û çawanî, mezinbûna bi vî rengî ya amûrên hilberînê û xwedaniya koledarî, bi awayekî vekirî tê dîtin ku bi şeweya bîrûbawerî û jiyanê, çîqa diçe sedema zêdebûna lidijîhevîbûn û bingeh ya jihevketinê ye. Di damezrandinê de, birêkûpêkirina berhemdar, heyîna raman û moralê raser çawa diyarker be, bi vê ve girêdayî çawa zor û fend di pilana duyemîn de rol lîstibe, Di hilweşînê de jî sedemên heman-ne birêkûpêkirina amûrên hilberînê, betal hiştin, paşvemaşîna di raman de û hilweşîna di moral de hatî jiyandin- rol lîstine. Pêşveçûnên di qada aborî û civakî de, vê rastiyê li ber çavan radixin. Bîrdoziya nû û rola zorê, di pilana duyem de ne.

b.2- Bi şeweyeke ku bi emperyalîzama Roma gihaye bandevyê, elemanên siyasî û leşkerî yên şaristaniya koledar jî, pêşveçûna herî zêde pêkanîne. Di siyasî de, monarşî, oligarşî û demokrasî, her yekî weke rêvebirîyekê hatine ceribandîn. Roma ku komareke oligarşîk ya bijarte ye, vê dawiyê bi derbasbûyîna sazûmana împeratoriyeke bihêz, di rewşa rejîmeke wisa de ye ku sîstema zorê him li hundir û him jî li derve pêşvebirîye û demeke dirêj bikaraniye. Lêbelê jihevketina ji nişkê ve jî, em li împeratoriya Roma dibînin. Ev bûyer çespaneke girîng e ku, di veguherûnên bingehîn yên civakî de, zora siyasî û leşkerî ne diyarker. PZ jî salên 300an pêde, kela sazûmanê ji her alî ve tê qulêrkirin. Hîkarîbûna evqasî ya qebîleyên barbar ku xwe ji bakur berdidin, bi rizîbûna sazûmanê ya ji nava xwe ve girêdayî ye. Digel ku ev hêrîş, hê ji damezrandina wê ve hebûn û bi sernediketî, lêbelê niha biserdikevin, vê rastiyê bi awayekî vekirî nîşanî me didin. Digel ku dewlet bi tevayî veguherandine şeweyeke kooperatîfî jî, jihevketin nayê rawestandî. Şeweyeke faşîzma koledar tê sepandin. Her tişt bi talîmnameyan ve tê girêdan, digel ku sazûman veguherandî awayekî otorîter û totalîter jî dibe, ne rawestîna jihevketinê encex bi temen dagirtina sazûmanê bête ravekirin.

Ev mînak nîşan dide ku saziyên siyasî û leşkerî yên herî pêşketî jî, weke di damezrandinê de di jihevketinê de jî diyarker nabin, rola bingehîn bi pêşveçûna aborî û civakî ve girêdayî ye. Bêşik di van deman de, zext û zilm gelekî tê rapelandin. Liser girseyên gel toqînekê (teror) pêktînin. Li arenayan sehneyên erjeng lidardixin. Yên dijber (muxalîf) bi şêran didine perçekirin. aêşkenceyên bi her awayî tînin sepandin. Dek û dolab û nelirêtî zêde dibin. Liser hev derbe çêdibin. Lêbelê ev hemû jî, pêvajoya ku ketinê berevajî venagerîne. Dibe ku bi dereng bixe lê carnan jî bilez dike. aedî viyan nagire, sazûmana nû xwe ferz dike.

Hê li Rojhilatir, di vê sedsalê de emperatoriya Pers-Sasanî ku PZ di sala 216an de hatî damezrandin, di rewşek e mîna Roma de dijî. Tevkarîyeke ku bide dîrokê tine. Weke jêgirtîyeke Ahamenîşên kevin, hewl dide ku xwe bi rêxistin bike. Li qasî ku ne xwedî nirxên bîrdoziyî û moral e, taybetiya xanedan ya saziya împeratoriyeke, tengbûna siyasî jî bi xwe re tine. Di demeke nêzik ya ku yê were de, cangiraniya wê ya li hember hêrîşên Êslam-Êreb, yê eynî weke Ahamenîşên ku li hember Skenderê Mezin xwe negirtin û belavbûne, bibe. Li vir jî tiştên ku derdikeve pêşberî me, ji piyagirtina bi zorê ya sazûmana ku di nava xwe de jihevdeketî ye. Digel ku xwedî hêzeke leşkerî ya mezine jî, Bîrdozî û moralê serdest li hember bîrdozî û moralê nû ji raserbûnê dûr e. Rola çanda helen ya pêşvebirinê, çanda îslamê dilîze. Zora bihêz ya bi yekemîn re, li hember zora bisînor ya bi duyemîn re, xwe ji piya nagire. Tiştên hatî çespendin, hêza bîrdoziyî, moral ya nû û raser e. Heger ku hinek têtikçûn jî bînin jiyandin, bi ders jê derandî, serfirazî wê bibe ya rêxistinên siyasî û leşkerîya nû. Dîrok şahidê gelek bûyerên bi vî rengî ye. Tiştên ku Sumer li hember Akad, Babîl û Asûr, Misrê jî li hember Pers, Grek û Roma jiyane, çespîneke din ya vê rastiyê ye. Dema ku sazûman cangiran û bêhn çikiyayî dibe, digel hemû hêza ne wekhevî jî, hêza nû yê ya kevin an ji derve û an jî ji hundir, çî zû çî dereng wê têtikbibe an jî derbas bike. Hind û Çîn vê rewşê hê derengtir, lêbelê bi belavbûnên bi vî rengî û bi şeweyên rizîna hundir vê yekê dijî, zor di zêdekirina aloziyê de rola xwe dilîze.

Dahûrandina zora ku rêxistinên leşkerî û siyasî yên sazûmana koledar disepînin, gelekî hînkê e. Di dîrokê de yekem car yê ku nijada xwe bi pîlan û di bingeha şidetê de, hewl daye ku bi awayekî wêrekî biperçiqîne û sazûmana ku ev biryar bi rêbazeke nedîtî derbasî jiyane kirî, ji dîroka ku bi xwîne hatiye nivîsandin jî berpirsiyar e. Ti nijadên ajalan li hember hemcinsê xwe, şideteke bi vî rengî bikarnayne. Herwiha zora leşkerî û siyasî ya biçîn, cins, etnîk û cudabûna çandan ve girêdayî, weke tê gotin li derî mirovayî, ne sepandineke ajalwarî, berevajî vê li derî ajalî, mirovwarî, weke rastiyeke civaka biçîn ya herî bi nalet derdikeve holê. Ev taybetiya zora koledarî ya yekemîn, pêdivî dike ku dahûrandineke bi bal liser bête kirin. Seresazî û rêvebirên ku xwe bi hêza zorê ya sêrek ve girtine, rê li ber bûyera herî girîng û ji aliyê sinc ve ya herî xeternak vedikin ku bi şêtbûneke mezin xwe dikine xweda. Dema ku rêvebiriyê xwe bi rewîştî îlahî nîşan da û dest bi propagandaya vê yekê kir, derî heta bi dawî li ber paşvemanîyê vedibe. Dîrok şahidê vê yekê ye ku rejîmên herî xeter û mînakên herî erjeng, yên ku liser navê xwedayan xwe pîrozwer dikin e. Eslê wê rewîştî dewleta koledar ya tevlîhev ku bi tehlîleke çîna zûwa nayê dahûrandin, bi hevîrê bîrdoziya wê û bi zorê hatiye dagirtin, bûye rewîştî hemû dewletên heta weke roja îroyîn. Dewleta reel sosyalîzmê jî, tevlî vê ye. Rewîştî çîmî ya ku hêmana laîkiyê diparêze jî, vê rastiye bi timamî nadahûrine û îlahbûna xwe dixê nav bûyera siyasî. Rewîştî laîk ya dewleta şoreşa bûrjûva Fransa, serveyî (rûxalî) ye. Vê laîkiyê liqasî ku dest nedaye derûna pîrsgirêkê, bi nêzîkbûnên xwe yên nûsazîparêz, kiriye ku xeterî zêdetir bibe.

3- Di pêvajoyên şaristaniya koledar yên çêbûn û jihevketinê de, vedanên bîrdoziyî herî bêhtir girîng in. Dahûrandina dîrokê, çîqa ku zimanê bîrdoziyê tê dahûrandin, bi timamî wateya xwe dibîne. Encex bûyerên bingehîn yên mîtolojîk, olî û felsefî yên ku di sînga civaka biçîn de, bi jandeyên dargîre bîrdoziyê nîrxandin, wî çaxî wê bigihîne têgihîneke dîrokî ya rast. Mîtolojiyê ji hev qut û ne berbiçav, nivîsandina dîrokên olan û felsefeyan, fikareyên (mehzûr) mezin di nava xwe de hiltîne. Ev nêzîkayî wê ber bi nivzanîna rastiye bibe, ev yek ji nezanîna bi timamî jî xetertir e. Liqasî vê şewşandin û çewtîya di qada dîrokê de ku pêdivî ye pirtûka mirovan ya pîroz hebe, hiştina wê ya bi valahiyan, wan mehkûmî jiyaneke bê pirtûka pîroz dike. Korîtiya herî mezin ya jibo mirov, bê dîrokî ye. Dîroka çewt, ji korbûnê wêdetir, çewt dîtineke. Di bingeha vê rastiye de, nedahûrandina qalibên bingehîn yên giyan û bîrûbaweriya pêvajoyên bîrdoziyî ya şaristaniya koledar, hene. Bi vê nîrxandina di derbarê koledariyê de ku em didine terfîkirin, heger ku bi rengên lawaz be jî, divêtiya nêrîna pîroz ya li dîrokê, çavkaniya me ya bingehîne. Ez vê yekê bi bîrûbaweriya ku ti koratî li qasî ya ji dîrokê tê, bêhtir mêjî û dil bêweç nakin, diyar dikim.

Tê çavdêrîkirin ku heyînen bîrdoziyî yên sazûmana koledarî ya bi mîtolojiyê bi şeml bingehkirî, ji sê aliyan ve dişikihin û rêyên ku diçine rizgarî û azadiyê tene pêşvebirin.

a- Rêya ceribandîne ya pêşî û girîng, derketina ebraniyê ye. Dîroka her sê olên mezin yên yek xweda, herçiqas ku xwe weke rêya rast ya bitenê jî nîşan bidin, eslê wê beşên heman kevneşopiyê yên bi merhale ne. Ji aliyê din ve bendorkirina li beşên din û rewşa bandordariya ji van rêyan, bi pêşveçûna hişmendiya dîrokê re derdikeve ronahiyê. Di vê de hebûna mercên berbiçav bingeh e. Evan bi pêşveçûnên di nava xwe de derketine holê, ne derketinên ji çavkaniya xwedayî ne.

Dema ku navendên şaristanî yên Sumer û Misir çêbûn, di navbera herdu navendan de, qebileyên Semîtik yên ku Sumerî dibêjin Amorît û Misrî dibêjin Apîrû (Amorît=qebileyên çolê yên Rojavayî, Apîrû=qebileyên bi toz ên Rojhilatî) timî di nava livdariyê de ne. Yan weke hêza teze ya kar tevkeriyê li sazûmanê dikin yan jî carnî bi hêrîşdarî wê talan dikin. Ev pêvajoyê BZ ji salên 3000an pêde, bi çêbûna şaristaniyê re dest pêdike, li bakurê nîvgirava ereb weke çavkaniyê nakokiyê dîrokî ya girîng, xwe nîşan dide. Ev qebileyên ku nikarin bi sazûmanê re berberiyê bikin, di kûraya çolê de xwedî mercên parêziyê baş in. Serkariya qebileyê weke rêxistina şexîtiyê, rola şaman û sêrebendiyê derbasdike û ji aliyê yê herî zana û bitemen ji aliyê şex ve tê temsîlîkirin. Qebîle bi gerdîşên hişk yên bavkanî tê rêvebirin. Şex, nûnerê sazûmanê û hêza wê ya pêşvebirinê ye. Bandordariya ji herdu navendan mîsoger e. Pêguherîna mal û raman weke kevneşopiyê dîrokî ya herî kevin, berdewam dike. Qebîle bi girîngiya bazirganiyê dihesin û bi bazirganî dibin. Di rewşa timamkirina xelesa Misir û Mezopotamy de ne. Damezrandina xanedaniya Akad ya bi Sargon (BZ 2350) ku ji nêzîk ve bi van qebileyên ve girêdayî, hêza wan ya ku zêde dibe diçêspîne. BZ di salên 1700an de, qebîleya Brahîm hewl dide ku li Misrê niştecîh bibe. Rabûna ji Harana Rûhayê û çûna Misrê, asta pêşveçûna bazirganî û tevgerê diyar dike. Lêbelê ji pirtûkên olî yên pîroz tê fêhmîkirin, digel ku di nava navendê de hinek karmendiyên bisînor bidest xistibin jî, qebîleya Brahîm ji rewşa nîvkoletî rizgar nebûye û timî nokokiyê bi vî rengî jiya ye. Ne şiroveyê zor e ku em bibêjin, van pevbestîna mîtolojî û ramana mîtolojîk yên Sumer û Misrê naskirine û di bin bandora wan de mane.

Lêbelê ev jî mijareke tê fêhmkirinê ku ew olê xwe yê bavkanî, ji ber heyîna qebîleyî bernadin. Ev dibêtiye ku bi heyîna wan ya qebîletî ve girêdayî, têkilî û nakokiyên sift yê rê li ber derketinan veke. Rêxistina pêxemberî, tê wateya nûçegihaniyê. Heger bestgirtina ji çavkaniyekê, rê li ber bûyereke hîkarîker veke, ev tiştêkî fêambar e ku bi derketina pêxemberî bête binavkirin. Pêxember tê wateya şêxê afirîner. Livdariya qebîleyan ya sift, xweyîbûna wan ya ji sazûmanê û girîngî pêdana kêsên ku pêşevaniya derketinên bibandor dikin, mijareke berbiçav e. Heger pêşevanê qebîleyê yan jî yê civakê rê li ber raman û livdariyên ku pêşveçûnên nû derandibine holê vekiribe, navlêkirina wan ya bi pêxemberî derûna rêxistina nû ye. Di vî babetî de pêxemberî, dikare wiha bê terîfkirin ku ji ramana Sumer û Misir, di pey re jî ji navendên din Best digire, vêna bi têgihînên gerdişa bavkanî û olî ya qebîleyê re dike yek û kesek yan jî rêxistineke wisaye ku rê li ber heyîneke nû ya mîtolojîk yan jî olî vedike. Dema ku em hewldanên qebîleyê yên ku dixwazin azadiya xwe bi timamî ji dest bernedin, tevî vê bikin, derketinên pêxemberiyê di bin kemneke olî ya nû de, li hember sazûmana kevin dibe tevgerêke azadî. Lêbelê ne xwedî behreye ku sazûmanê biguherîne, tenê dikare zora nûsaziyan li sazûmanê bike. Ya herî girîngtir ev e ku li derî du navendan, weke rêyeke sêyemîn, li erdnîgariyê berfireh bi bandorbûna wan wê pêşvebiçe. Derketina olên mezin yên di pêşevaniya Hz Brahîm de ku di dîrokê de rê li ber encamên mezin vedikin, îfadeyên berbiçav yên livdariya van qebîleyan e. Ev kevneşopiya ku çî di belavbûna koletiyê de û çî di derbasbûyina wê de, rola herî bingehîn dilîze, xwesteka wê ya di serî de ku sazûmanê nerm û bi nûsazî bike, bi êsa re, yê roleke bîrdoziyî û hereketa civakî bilîze ku sazûmana koledar bixe pêvajoya jihevketinê.

Bi awayekî berbiçav ev bûyera ku em dikarin bibêjin xêzika îbraniyan, dikare bête şîrovekirin ku çîroka mîtolojiya Sumer û Misrê ya hişk dibe û vediguhere olên yek xweda ye. Ligor ku li dîrokê vedaye, ev çîrok bi derketina Hz Brahîm ya ji navendên mêhtingehên dora Rûhayê ku ketibûne bin destê xanedaniyên Babîl û Asûr, destpêdike. Efsaneya Hz Brahîm ku Pûtan dişkine, tê wateya bê baweriya wî ya bi kevneşopiyên kevin, mîtolojiya li pişt wan û serhildana wî. Wê demê xwesteka gelek qebîleyan ya livdariyêke azad û pêvajoyêke levdanê ya ku ji vê xwestekê dihat berfireh e. Dewleta sîte, bi bîrdoziya fermî û çanda perestîne, di rewşa alîgir de ye. Bûyera belavkirina civaka biçîn, gefan li wekheviya qebîleyê dike. Dêdora Rûhayê, Jiberku herêma bingehîn ya civaka neolîtîkê ye, di vê demê de (BZ dawîya salên 2000an), bi ketina wê ya pêvajoya şaristaniyê, dibe ku navendî ji livdariyêke civakî re kiribe. Li herêmê baweriyên pêxemberiyê yên bihêz ku têne gotin û ziyaretgehên wan, vê bûyerê rast derdixin. Di rewşek e wisa de ye ku dijberiyê li derketina civaka biçîn ya Sumer û Babîl dike. Derketina li hember pûtan û şikandina wan, îfadeya vê pêvajoyê ya bîrdoziyî û nîşanî ye. Ev yek wê di cîh de be ku Hz Brahîm, weke kalîkê vir yê bîrdoziyî û nîşana vî welatî bête dîtin. Ev tiştêkî xwezayî ye ku ew serdestiya Babîl û Asûr, herwiha amûrên wan yên bîrdoziyî û nasnameyên wan nas bike.

Ji alyê din ve serkariya qebîleyê, ber bi parastina gerdişa bavkanî de dibe. Heta bi wê dema dîrokê, sentezeke raser ya ku ji van herdu çandan dizê, potansiyeleke pêşveçûnê ya herî girîng bi xwe re hildigire. Pêvajoya dîrokê, weke nîşaneke bîrdoziyî li ber çavan radixe ku ev sentez di pêvajoyêke ji pir xwedayî ber bi yek xwedayî ve çûyî de, hatiye pêkanîn. Jiberku bi rewîşteke ku herdu çand derbaskirine berbiçavî bidest xistiye, gengaz e ku rola qirasekî pêşverû bilîze. Di vê rewşê de, derxistina xwedê ya ji pûtîti û birina wî ya esîmanan, nûjeniyên bi xwe re hildigire. Armanckirina pir xwedayîya di kevneşopiya Sumer de û temsîlkirina pûtan, tê wateya helwest girtina li hember sazûmana niştecîh anku koledariyê. Ji aliyê din ve, bermayîya olê ku jevketî totem jî, weke pût divê ku bê derbaskirin. Ev yek encama xilasbûna ji qebîletiya teng û ber bi qevastina yekîtiya qebîleyan ve dibe. Tegihîna yek xwedayî, jibo du armancan weke şêweyêke bawerî ya çareserker, xwe nîşan dide. Tegihîneke xwedê ya ku hêza wî mezinkirî, ji bêhêziya pût ya berbiçav rizgar kirî û hatibe asta ku li ezmanan fermanan bide, di rastiya civakê ya berbiçav de, him berxwedan, him azadî û him jî ji pêdiviya yekîtiya vê re dibe bersiveke tekûz. Gera li bersiveke bi vî rengî, jibo veguherînên dirûv yên demê yên berfireh, yên aborî û civakî ku cuda, diyar e ku wê wateyêke xwe ya dîrokî hebe. Bersiva azadî û yekîti di rewîšta bi awayekî derasayî, kişîner (cazib), hêzdêr û nûjenkirinî de ye. Li hember seresazî û binesaziyên civakên Sumer û Misir yên ku îşaretên jihevketinê ji mêj ve didin, xwe parastin, bisînor be jî xwe resenekirin, weke dirûveke jîyanê ya nû bêhnvedan, îfadeyên hîkarîker yên wateya dîrokî ne. Bandora olên yek xweda ku hê jî gelekî bihêz e, ji girîngiya wî ya mezin ku vê pêdiviya dîrokî pêşwazî dike, tê. Livdariya Brahîm ku em dikarin derûna wê wiha îfade bikin, Jiberku nêzîkî senteza çandên Aryen-Hûrî û Semîtîk-Amorîtên ku li herêmê di nava hev de ne, herwiha aliyekî wî yê girîng jî ev e, xwedî potansiyalekê ye ku bibe bersiveke gerdûnî jî. Zemîna çandê ku xwe dispêriyê, sazûmana koledar ku kiriye hemberî xwe, azadî û yekîtiya ku ji xwe re kirine armanc, nirxekî mezin didin bilindkirina bîrdoziya olê yek xweda. Mîsyona çêkirina

mîtolojiya wan, di asta yê rahîbên Sumer û Misrê de ye. Bi berbiçavkirina vê mîsyonê ya bi tégihîna pêxember-qasid, bi mîsogerî cudabûna xwedê û mirov datîne holê. Rastiya ku mirov ti caran nabe xweda, dike hêmana xwe ya bingehîn, herwiha di tégihîna ol de, rê li ber nûsaziya herî mezin vedike. Tégihîna ku mirov nabe xweda şoreşeke mezin e. Di hemû baweriyên berê de, sazûmana xwedayên bi şêweya mirovan serdest e. Bi pêwana vê baweriyê, xwe xweda îlankirin, xwe di hêza xwedê de nîşandan gengaz e. Di vî babetî de, xweda-qeranên Sumer û Misrê, bi dirûvên wiha yê herî zêde û toqîn, roleke dîrokî listine. Ramana ku mirov nabe xweda, derbeyeke mezin ya li koledariya bi vî şêweyî ye. Livdariyeke wiha bîrdoziyî, civakî û livbazî derketina herî bihêz e. Ev tiştên ku di dîrokê de, bi taybetî li Rojhilata Navîn diqewimin, îfadeyên vê rastiyê yê çîrokî ne. Vebêja bi şêweyên efsane yan jî dîroka ol in.

Çîroka Hz Brahîm ku koçberî Kenanê û ji wir jî ber bi Misrê bûyî, ji wî zêdetir hêla livdariya kevneşopiyê nîşan dide. Danûstandina mêl û raman yê di navbera şaristaniyên li kortên Dicle-Ferad û Nîlê, ku çiqas diçe pêşdikeve, tîne zimên. Dorhêl mercên mezin dide livdariyên bi vî rengî, tevlibûna herêmê ya bi karwanan ku tevli karwanê şaristaniyê dibe, vedide. Gelek qebile û gelek Brahîm, dabaşa xeberdanê ne. Kevneşopiya ku vê weke rêbazeke bi tenê darîçav dike, zagona nû tîne zimên. Bi texmînî di navbera salên BZ 1700-1300an de, ev rêbaz, bi derketina Mûsa ya li Misrê re, merhaleyeke nû derbas dike. Lêbelê di vê navê de, di dema Brahîm de, li dora Qudsê siftbûn û veguherînek tê jiyandin. Li kêleka deryayê, şaristanîbûna Fenîke ya ber bi qismên navîn ve, pêşvedide. Quds jî weke Rûhayê duyemîn navenda girîng ya guhêran û veguherînê ye. Di vê pêvajoyê de, di kesayetiya Brahîm de bandorgirtin tê çavdêrîkirin. Guhêrana wesfê xwedê, ji malbatê zêdetir bûyîna wî ya xwedayê tevaya qebîleyê, di heman demê de vê yekê îfade dike ku li herêmê bi bandor bibe, niştecih bibe, weke mîrîtiyekê bihêz bibe û bê naskirin.

Şerê nasnameyê yê qebîleyên ëbranî ku li hemberî niştecihên berê dikin, rê li ber bihêzbûna wan ya nivîşkerî û siyasî vedike. Di vê navê de, rizgarkirina Smayîl ya ji qurbankirinê, îfadeya li hemberderketina ku li herêmê bi berfirehî zarokan ji Baal re (xwedayê mezin ê herêmê), dikine qurban e. Herwiha li vir cudakirineke olî tê afirandin ku li kevneşopiya pir xwedayî neyê riayetkirin. Ev xelekeke din ya veguherînê ye. Qebile di bingeha vê cudabûnê de, xwe ji pijivîna di nava cîgehîyê de diparêzin. Çîroka Hacer, pişivîna pişkî (qismî) tîne zimên. Sefera ôsiv û bavê wî Yaqûbê Misrê, livdariya qebîleyê vedide (nîşandide). Di heman demê de, ji çîroka Sara jî tê fêhmkirin ku cêrî dibine mijara bazirganiyê. Digel ku li seraya Misrê hinek karmendiyên suxreyên piçûk bi dest dixin jî, ji rewşa nivkoletî derbas nabin. Jiberku di şerê vavbera xanadanan de, li aliyê têkçûyî cîh girtibûn, ji cezakirineke mezin ditirsin û weke bersiveke bêriya jiyanê azad ya qebîleyan ku bihêz, derketina di pêşevaniya Mûsa de, tê pêkanîn. Bi texmînî ev derketina ku ji 25 000 kesan û ji duwazdeh qebîleyan pêkhatî, li qasî derketina Brahîm ya Rûhayê bi wate ye. Derbaskirina evqas mirov ya di çolê re û rêvebirina wan, qanehkirineke bîrdoziyî ya herî mezin û rêxistinke pratîk dixwaze. Vê meşa çolê Mûsa afirandiye. Li hember xweşnebîniyên mezin, bi derketina xwedayî ya bi "Deh Ferman"an, bersiv dide. Xwedayê dema berê yê herêmên Kenan "El", bi Brahîm re vediguherînine "Elohîm", bi Mûsa re, bi navê "Yehova" (xweda ew e) tê neteweyîkirin. Weke ku bidine zewicandin, nasnameya xwedayê qewmê ësrail (ësrail=yê bi xwedê re afra digire) qezenc dike. Axaftina bi xwedê re ya li çiyê, bermayîneke kevneşopiya şamana ye û bi berfirehî tê jiyandin. Gelek derketinên pêxemberî, vê kevneşopiyê bikartînin. Sazûmana Deh Ferman, armanc digire ku di warê civakî û bîrdoziyî de bipergaliyeke nû çêbike û serokatiya Mûsa têxe rewşa zagon û şerîatê de. Qebîleyên ëbranî ku wesfê wan yê siyasî û qewmî pêşveçûyî, êdî ji niha û pêde, di qada dîrokê de wê qewmekî xwedî Tewrata (tore ji Tewratê tê) ku bi Deh Ferman destpêdike, bîn naskirin.

Piştî meşa Mûsa, bi texmînî BZ sala 1250an, demeke kadroyên serokatî (serwer) di asta bintir re, tê derbaskirin. Yê ku yekem car ev da destpêkirin, fermandarê Mûsa yê binav û deng Yaşû ye. Yaşû vî qewmê li Filistîna îroyîn cîwar dike. Rehîbên bi mîsyona pêşgoyan (kahîn), li vir jî, di derawayaya pêşevaniya çûyîna ber bi qeranbûnê de ne. Hewldidin ku nimûneke piçûk ya Sumer-Misir biafirînin. Herçiqas ku ber bi cîgehîke pişkî ve veguherîn çêbûbe jî, kevneşopiya pêşgo, bi mîsogerî vedana Sumer û Misrê ye. Deme rahîbê bi navê Samûel BZ di salên 1000an de, hewl dide ku dewleta rehîb avabike, bi nûnerê qismê siyasî Saûl re, di nava qayîşkêşiyekê de ye. Dawûdê xwedî tecrube û behre ku ji koka şivantî û hesinkariyê tê, BZ di sala 1010an de, qerantiya ësrail ya yekem pêktîne. Herwiha dema qerantiyê vedibe. Pêşveçûn bi Silêman re digihe bandevê û di pey re paşve diçe. BZ di salên 700an de, dikevine bin destê Asûr. Gelek pêxember û rahîb, di dema fermandarê Babîl Nabûkadnezar de, ji Qudsê sirgunî Babîl dibin (BZ 585). Babîl piştî vê demê bi hindikî dikeve bin destê Persan. Ji polîtîkaya Persan ya ku ji hemû çandan re giramgir û li cîhên xwe bixebitin, sûd digirin û careke din vedigerine Qudsê. Xwendin, nivîsandin û karmendiya ku li seraya Babîl hîn

bûne, gelekî bandora xwe dike. Di vê merhaleya ku bi navê dema nivîskaran destpêdike de, rola pêşevaniya nivîskarekî bi navê Ezra ku xwe li Babîl gihandî, gelekî mezin e. Pirtûka Pîroz (Kîtabi Muqedes) yekem car tê nivîsandin. Ev merhaleya nû, bi vekirina mecliseke siyasî ya bi navê Hagadol, nasnameyeke nû bi dest dixê. Ji persan, bi taybetî ji kevneşopiya Zerdeşt gelekî bandor digirin. Partîyeke bi navê Ferisiyan ku alîgirê Pers, tê damezrandin. Ev dabeşbûne yekem ya siyasî ye. Dabeşbûna çînî jî pêşvedixê. Piştî Skender, pêrgî serdestiya Grêk tîn. Di vê dema ku bi navê Antiokan tê binav kirin de, vê carê jî di bandora Grek de dimînin. Partî-mezhebekî hevkar ê binavê Sadûkiyan ku alîgirê Grek û bêhtir ji arîstokratî (esîl) tê holê, şewe digire. Evên ku baweriyên wan yê olî bi Grek ve girêdayî û pişkeke lawaz in. Demeke Pirtûka Pîroz (Septûaganînt) ya duyemîn ku bi Grekî, destpêdike. Beşek ku ji nava 72 qebîleyan hatine neqandin, li Skenderiye, li cem qerantiya Grek bi cîh dibin û xwe bihêz dikin. Li wir beşek bi navê Makabiyan, BZ di salên 200an de, demeke berxwedanê didine destpêkirin. Di vê dema ku bi şideteke mezin derbasdibe de, nasnameyeke netewî û serxwebûnê tê bidestxistin. Dawiyê di dema serdestiya Roma (BZ 63) de, weke qerantiyeke Cihû ya alîgirê Roma, bi aweyekî hevkarî û mîna eyaleteke Roma tene birêkûpêkirin. Dema ku tebeqeya jor hevkarê Roma, tevgera hejaran ya binavê Essenîyan pêşvedixê. Bi kuştina wazekî vê tevgerê yê bi navê Yahya re, dema serhildana êsa destpêdike. Ev derketina ku ji sifrê weke destpêka dîrokê tê biwatekirin, gelekî balkêş e û nêzîkbûna bi zanistî girîng dike.

Weke takekes dema ku bi heyîna wî re bête hevberkirin, tevgera bi navê êsa ku di dîrokê de rê li ber bandoreke mezin vekirî, bi dorhêla çanda êbranî û di reseniya xwe de, bi pêşveçûna tevgera ku ji hejaran re vekirî ve girêdayî ye. Eslê wê di bin navê êsa de, meyldariyeke dîrokî, coyekê ji xwe re vedike. Ti helwestên êsa yê taybetî, li hember waliyê Roma Platûs tine ne. Heta dibêje desthilatiya cîhanî "mafê Sezar e". Tiştên ku bi awayekî tûnd li dijî e, rêxistina pêşgoyiya fermî ya Cihû ye. Êsa pêwleke ku pêşgoyiyê, derûna xwe ya erênî ji mêj de wînd kiriyê. Girêdanên berjewendiyên dîringî û nakokîya wê ya bi cîhana hejaran re, xweş dibîne û helwest digire. Ya hê jî girîngtir, ku bawerîya yek xweda bi şovenîzmeke hişk, tenê weke reseniya Cihûyan berdide, bi cîhana mirovayî ya nû ku dikele re, dike nava nakokîyan. Têgihîna weke qebîle û qewmekî raser, li pêşya pêşveçûnê nû yê civakî ku derkevîne derî koka etnîkî, dibe asteng. Tiştên herî derketiyê pêş, ne bûyîna ji heman kokana etnîkî ye, bûyîna ji bûyera ku ji heman grûbên civakê yê ku heman mercên dîringî deranadine holê ye. Eseniyên ku êsa ji wan Best girtiye, komeke wiha ye. Perçebûna civaka Cihû, di bingehe çîn de ya bi kûrayî, yê bîrdoziya cihû jî, bide perçekirin.

Hîz Brahîm û Mûsa, hê bêhtir girîngî didan yekîtiya qewmî ya qebîleyan û ligor vê yekê bîrdozî û çalakî dişewandin, kevneşopiya êsa yekîtiya qewmî dike pilana duyemîn, heta li dijî vê yekê radiweste û destpêkekê pêktîne. Ew xwedayê xwe gerdûnî dike. Bilêvkirina Cihû tine. Tiştê bingehe, rizgariya mirovên di nava êş û azarê de ye. Bi vî aliyê xwe gelekî nêzîkî Bûdha dibe. Bi vê yekê re, ev rastîyeke berbiçav e ku dixwaze ji êbraniyên hejar re, rêya desthilatiyê veke. Livdariya xwe ne bi aweyekî leşkerî û siyasî, weke livdariyeke civakî ya bi hîmên bawerî û sincî ve girêdayî, belavdike. Dema tê girtin, li dijî bikaranîna Petrûs ya şûr, derketiye. Êdîyên wî yê herî girîng ev in ku pêşgoyan xiyaret li kevneşopiya pêxemberan kirine û ew Mesîhê (rizgarker) jê hevîkirinê ye. Heçku li Qudsê, rêxistineke pêşgoyan ya bihêz ku piştî xwe daye waliyê Roma heye. Ango pêşgoyî, ji mêj de hêzeke cîhanî, dîringî û siyasî ye. Pêşgo, ji wezîfedariya olê saf ê kevin derketine.

Weke têgihîna olî, hê bandora Sumer tê dîtin. Eslê wê bav, law û Rûh-ul Quds bermayîneke têgihîna sêbareyî ya xwedê ye. Koka wî dikare heta bi kevneşopiya Enkî-Tîamat-Mardûk, bê dirêjkirin. Dayîk Meryem, vedaneke lawaz ya kulta xwedawenda Tîamat e (berê eştar). Encex pif dikine giyana wê û lawê xwedê dize. (Li Sumer têgînên bavê xweda, dayîka xwedawend û lawê xweda, li paştirî wan bi çanda xwedawend-law-heval ve girêdayî ye) Ev diyar e ku bi navê êsa, tîkeliya mîtolojiya kevin û bawerîya Yehova dabaşa xebirdanê ye. Ya girîngtir ev e ku ji rêbazên olî yê berî xwe cuda, giraniyê dide êşên mirovan. Di vê de, rola mercên dîringî yê koledariya Roma ku gihaye bandevê, bingehe e. Li Roma, BZ di salên 70yan de, serhildana Spartakus daye çespendin ku êş dikarin veguherîne serhildanê. Eyaleta Cihû, ji aliyê daneheva çand û kevneşopiya serhildanan ve, xwedî merc e ku karibe ji pêvajoyeke wiha re, serokatîyê bike.

Em nikarin bêjin ku êsa gelekî plansaz û rêxistinî e. Hê bêhtir di rewşa mirovekî bawermend de ye û xwedî sincekî zexm e. Di baweriyên xwe de jidil e û jiyanî xwe ya pratîk hemû daye vê rêyê. Li hemberî naleta ku mirovatî dorpêç kiriyê ku heta dawiyê tê nezir kirin, pêdiviyê bûyîna "gotina" xwedê ye. Ne di rewşeke wiha de ye ku bikaribe siyasî û taktîk birame yan jî bike. Ev aliyê wî ku herî lawaz tê dîtin, wê bibe aliyê wî yê ku bike dîrok bi hêz derbasbibe.

Êsa bi vê taybetîya xwe, wê dema ku temsîl dike, heger ew nebûna jî, rêberîya ku mecbûr bû biafirîne, temsîl dike. Ji ber vê yekê jî êsa, ji rêberîyeke ku xwe gihandî û pêxemberiyê zêdetir,

rêber-pêxemberekî ku hatiye çêkirin û babet hatiye dîtin. Wî tîne rewşa rizgarkerekî ku bêrîkirinên hemû kesên hejariyê û êşê dikişînin û hêrsa yên bi nalet, liser piştta xwe dike bar. Dibe Mesîhê - rizgarker- ku li bendemayîne. Heger ku mercên dîrokê yên daringî û danehevêyê wê nebin, ti takekes bi zanistiyên (marîfet) xwe rola serokatîyê nagire ser xwe. Ev babetdîtin ji hemû rêberan re derbasdarin. Bi ihtîmaleke mezin ya rast ev e: Li çarmixê dayin, êsayê rast diafirîne. Heger ku çarmix nebûna, êsewîtî yê bûbana terîqeteke mîstîk ya wê demê û yê bitefiya.

Herwiha hîmê çanda resene ya dorhêlê, dema terîqetên mîstîk yên hejaran, di bin hemûkan de cîhana rastiyên daringî û civakî ku koledariya Roma ew gihandine, pêxemberê xwe yê mezin di kesayetiya êsa de diafirînin. Ji komeke piçûk (12 Hewariyên -alîkar- ku bi zorê hatine cem hev, yek ji wan xayîne) tevgerê mirovatîyê ya mezin dihêle. Bêşik di vê de, bandora çanda Grek ya ku liser çanda ëbranî jî bandoreke bi kûrayî kiriye, heye. Ji aliyê din ve, çandên tevkar jî pêşî lê vekirine. Sincê Zerdeşt yê nû, jiyana û baweriya xwezayî ya Stoaiyan, bi çanda ëbranî ya derûna zexm ya pêxemberî re bûne yek û rê li ber êsewîtîyê vekirine. Di vî babetî de, ji aliyê çînî, sincî û bawerî ve weke sentezekê, li hemberî sazûmana koledarî, divê ku tevgera herî mezin bê berdand. Belavbûna wê bi lezayî ya li nava qewman, bi van taybetiyên wê yên gerdûnî ve girêdayîne. Derûna sincî û baweriya bihêz û dewlemend, rê li ber tevgerê civakî ya gelek bihêz vedike. Terîfkirina ola xiristiyaniyê ya bi vî rengî, nêzîktirî rastiyê ye.

Çîroka tevgerê ya nêzîkî 300 salan ku bi berxwedaneke veşartî, di heman demê de, çîroka jihevketina çinara şaristaniya Roma ye. Di vê berxwedanê de, bi awayekî bê hijmar ezîz û ezîze qurban dane. Lêbelê di hilweşandina sazûmana koledarî ya herî mezin de, serfiraz bûye. Xwedîlêderketina êsa mirovan, şeweya xebata bi aşiyê, şeweya jiyana pevrayî ya xelwetxaneyan (manastir), di warê ku kirine mirovatî bigihe hîmekî sincî, xwedî pareke mezin e. Teolojiya xiristiyaniyê di serî de di pilana duyemîn de bû. Dema pişt re û di dema skolastîk de, piştî ku hêzeke siyasî û daringî bi dest xistin, ji aliyê cîhana Papa ve derketiye plana pêş. Tiştta bi êsa re ne baweriye, tevgera sincî ye. Ne hêza daringî ye, hêza menewî ye.

Piştî dema fermîbûna ku bi êmperatoriya Roma ya Rojhilat dest pêdike, destpêka bêesilbûnê ye. Di şerê desthilatîyê de, jiberku weke amûrekî bîrdoziyî tê bikaranîn, rê li ber dabaşbûneke mezin vekirîye. Piştî Roma Rojava hilweşiya, xiristiyaniyê bixwe bûye împeratoriyeke (Papayan) bihêz. Weke hêzeke damezrîner û parêzker ya serdema navîn, liser bûyerên vê demê divê ku bi girîngî bête rawestan.

Weke tê dîtin hilatin û pêşveçûna xiristiyaniyê, dibe encam û bilezbûna rizîn û jihevketina sazûmana koledariyê. Kevneşopiya ëbranî ku rê li ber Esseniyana û êsa vekirîye, bandoreke mezin li serdema navîn kiriye. Cihûtiya neteweperest, PZ di salên 70yan de, careke din yê li cîhanê tert û belav bibe, li her deverî wê sazûmanan hilweşînin û avabikin û heta roja îroyîn wê bandora xwe berdewam bikin. Di serî de qebîletiya Cihûyan ku bi bazirganiyê mezin dibe, vê dawiyê dibe qewm û vê kevneşopiyê bihêztir dike. Çanda Cihû ku di vî karî de bûye pîspor, gelek zehmetiyana tîne serê qewmê xwe, bi ezmûnên ku qezenc kirine, hostayiya hêza sîxurbûna hemû şaristaniyan, bidest dixwe. Sumer, Babîl û Asûr fêhmkiribûn, ji Hz Brahîm û olê wî re, rê vekirîye. Misir jihevxiştîye, bûye xwediyê pêngava Mûsa ya azad û olê qewmê wî. Bi vê ezmûnê bûye qewmekî ku wate û girîngiya ol herî bêhtir bizanibe. Liqasî ku dizane, ji sazûmanên koledarî yên Sumer û Misir, di warê bazirganî de sîd werdigire, raman û baweriya wan ji xwe re dike mal û wan resene dike. Ji Babîl û Persan hîn xwendin û nivîsandinê dibe, yekem car bûye xwedî pirtûka pîroz ya nivîskî. Berî Grek û Roma, ji fenîkeyan hîn bûye û pêşveçûna çandê derxistiye pîleya herî bilind.

Veguhastina evqas bazirganî û raman, tê wateya danehev û belavkirina nakokiyên mezin jî. Herwiha karesatên herî mezin jî wî bi xwe anîne serê xwe. Bi rêvekirina ji êsa re, jihevketina Roma amade dike, Ew bixwe dipeke çar aliyên cîhanê. Hewl dide ku li her derê cîhanê hîn bike, lê bi şovenîzma qewmê bilind, timî rê li ber komkujiya xwe vekirîye. Di zayîna Hz Muhemed û ola êslamê de, çiqas ku di rola çanda bîngêhîn de ye jî, dîsa derbeya herî mezin ji êslamê dixwe. Herçiqas hêzeke afirandinê ya bîngêhîn ji serdema navîn be jî, komkujiyên serdema navîn, herî zêdetir liser vî qewmî hatine bikaranîn. Hêza sermiyana bîngêhîn a ku serdema kapîtalîzmê amade kiriye, di tevgerên raman de yê ku serî dikişand û yê ku di serê çîn û rewşenbîran de cîh digirt, ji kapîtalîzmê û ji marksîzma ku xwedî par e, yê ku derbeyên herî mezin xwarine û li komkujiyên wan rast hatiye, dîsa qewmê ëbranî ye.

b- Di jêvketina sazûmana koledarî de, li qewsa derveyî sîstema Zaxros-Torosan, li zozanên Medya-Persya, kevneşopiya rahîbên Mag yên Medya ku ji BZ salên 1000an pêde girîngiyê qezenc dikin, ji ber çavan dîr nayê girtin. Li derî kevneşopiya mîtolojiya Sumer, ev meyldariya ku hê bêhtir xwe weke tekûziya sincê civaka çandinî nîşan dide, di rakirina viyana mirov a liser lingan de, para wê

mezine. Ev meydariya komên Aryen ku aliyên wan yên sincî zêde û xwedabûyina wan, di pilana duyemîn de dimîne, berî êsa, Bûdha û Sokrates bi gelekî, ji aliyê Zerdeşt ve, di nûsaziye re tê derbaskirin, dibe bingeha bilindbûna Med û Pers û dawîya împeratoriye Babîl û Asûr ku şeweya koledarî ya herî giran disepînin, tîne. Kevneşopiya Zerdeşt ku li hember koledariya kevnare (antîk) heyîneke mirûz (moral) û baweriyeke bilind hûnandî, di bandorkirina Bûdha, Sokrates û dawîtir ya êsa de, zemîna bingehîn e. Di perçekirina veqetîna sîstema mirovê ku li siya xwe nedibû xwedî û mirovê ku xwe tîne derawa xwedayê herî bihêz de, vînparêziya Zerdeşt herî diyarker e. Pêşandana wî ya vê yekê ku ji xwedayê xwe Axûra-Mazda yê ku xweş fêhmnake, pîrsiyarî dike, nîrxê wî hê bêhtir bilind dike. Hilweşandina koledariya kevnare ya di vî bingehî de, raste rast bandorê him ji aliyê daringî û him jî bîrdoziyî ve, li bilindbûna Greko-Romen kiriye. Digel jihevketina Persan, pêşî Partan û piştê berdewama wan Sasaniyên (BZ 250-PZ 650) liqasî ku Roma yê bi bacê ve girêbidin bihêz dibin, dîsa zemîna xwe ya bîrdoziyî û mirûz di kevneşopiya Zerdeşt de diafirînin. Tê zanîn ku bandora bîrdoziyî, li navendên Roma gelek alîgirî qezenc dike. Dîsa tê zanîn ku heger komkujiyên rahibên Sasaniyên paşverû nebûna, Manîti (damezrînerê wê Manî, PZ 215-275) ya ku sentezeke resene ya Zerdeştî û xiristiyanîyê, wê biqasî eşewîtiyê belav bûbana. Tê zanîn ku di şeweya terîqetan de, heta bi Ewropa belav bûye û bandor li serdema navîn kiriye. Li Rojhilat bûye olê fermî yê tirkên oğur.

Di van deman de, di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, weke komeke bawerî û civakî resene, terîqetên mîstîk pêşveçûneke mezin nîşan didin. Girîngiya van ji vê yekê tê ku di ramana serbixwe û pêşveçûna viyana takekes de, di merhaleyê girîng de ne. Ev komên piçûk, bi serê xwe ji heyînên sinc û baweriya fermî qut dibin û di jevketina heyînên civakî û sincî yên koledarî de, rolekî girîng dilîzin. Esseniyên ku êsa ji wan û Henîfên ku Hz Muhamed ji wan bandor girtî jî, komên mîstîk yên baweriya veşartîne. Di pêşketina van koman de, liqasî civaka koledar û saziyên wê yên siyasî ku mirov bêhnçikandî hiştine, meydariya van ya ku derfetê dide azadiyê jî, roleke girîng dileyîze. Bi kinayî em bibêjin, bi paşverûbûna li Rojava Roma û li Rojhilat ya Sasaniyan re, mirovên ku ji dorhêla şerê di navbera van de reviyên, ji dibistanên felsefî yên Grek û ji kevneşopiya olî ya cîgehî (nêzîkaya mirov-xweda ya dema neolîtîk) bandor digirin, dikevîne pêvajoyeke terîqetbûnê û heta dema îroyîn heyîna xwe didomînin. Weke komên çep-rast yên roja me, di dema piştî Asûr de, li hember zordariya sazûmana koledariya klasîk, bi gelek cureyên mezheb û terîqetan bi rêxistin dibin û di jihevketina sazûmanê de, rolên girîng lîstine. Ew cureyek qehremanê çêkerê dîrokê yên bê nav in. Eynî weke qehremanên qebîle û eşîran, bê nav û bê hijmar ku li hember sazûmana koledar ya dema kevnare li berxwe dane. Heger em bibêjin, dîrok bêhtir dîroka ne nivîsî ya van qehremana ye, emê rastiye bînine zimên.

c- Di sazûmana koledarî ya serdema kevnare de ku derûna xwe ya bîrdoziyî dispêre mîtolojiyê, xala şikestinê ya girîng a sêyemîn, pêşveçûnên felsefî yên weke hewldana daxûyanîdanên pêşî yên xwezayê ku bi viyana xwedê ve ne girêdayî ne. Şaristaniyê, zayîn û pêşveçûna xwe, timî bi mîtolojiyê ve girêdaye. Xwe daye propagandeya nêrîna mîtolojîk ku ji hezar salan ve, raman û heyîna giyana mirovan dagir kiriye. Jiberku xwedayan biryara her tiştî ji berê de daye, ne pêdivîbû ku mirov birame û hereket bike. Di qederê de çî hebe ewê bête jiyandin. Sazûmanê hemû hêza xwe, ji vê baweriya qederê ya kor werdigirt. Dema ku hêza Xweda-qeranan jî tevî vê dibû, rêya sepandina koledariyê, heta bi dawî vedibû.

Ola Hz Brahîm yê yek xweda, dema baweriya ku mirov nabe xweda kire mijara bingehîn, sazûmanê derbeyeke bîrdoziyî ya girîng xwar. Xebitandina gengazbûna helwesta biviyên ya bêyî xwedê û sincê azad yên di kevneşopiya Zerdeşt de û bi siyasîbûna vê re, hate dîtin ku koledariya kevnare ya bi şeweya Sumer û Misir, xwe liser lingan nagire. Heger em bi bal binêrin, yek ji wan rê li ber şoreşa baweriyê vedike, yê din jî rê li ber şoreşa sinc û viyanê vedike.

Şoreşa felsefê ya ku di sînga koledariya klasîk ya Grek û Roma de pêşveçûyî, derbeya bîrdoziyî ya dawî lédixe. Şeweya jiyân û saziya koledar, bi awayekî berbiçav bi hêza aqil, ji xwedê û ji dogmayên ol cuda, bi destpêkirina ramyariyê serbixwe, diçe sentezeke nû. Ramana felsefî, bi taybetî bi Eflatûn (Platon) û Arîsto, hewl dida ku dewleta sîte ya Atîna rizgar û tekûz bike. Hemû hewldanên Sokrates yê weke bavê hemû filozofan tê pejirandin, ev bû ku gengaziya hemwelatîyê zana bide nîşandan, herwiha rizgarkirina dewleta Atîna bi têgihîna hemwelatîyên wiha hişmend, bide çespendin. Bi vê armancê, berî karekî bike, dixwest ku wî karî bi zanîne ve girê bide. Derûna felsefê ev bû. Armanca Eflatûn ya bingehîn ev e ku vê têgihîne ango rewşa sincî têxe rewşa dewletê. Rêvebirina dewletê ya feylesofî, ya herî îdeal bû. Arîsto dibêje ku rêya vê ya herî baş û pratîk, di rêvebirina aristokratîk ve diçe. Herwiha perwerdeyîya vî çînî bingeh digirt. Digel vê yekê jî, hewldana wî encama berevajî da, dewleta Atîna û demokrasiya wê hilweşiya. Şeweya ramana felsefî,

bi awayekî berbiçav rê li ber hilweşînê vekir. Lewra di xwezaya sazûmana koledar de, aqil û viyana mirov tine. Li wira mirovê kole, ne xwedî ti mafî ye û di rewşa amûreke hilberînê de ye, lê xwediyên kole dikirine xweda. Ramana felsefî bixwe, cara pêşî di dema sofîstan de, nakokî û lihevnehatinî dîtibû. Sofîstan bi awayekî vekirî digotin ku zagon ne ji aliyê xwedê ve, ji aliyê mirovan ve tên çêkirin. Ji mafên herkesî xeberridan ku herkes bikaribe Ligor aqlê xwe û ramana xwe tevbigere. Dema rexneya aqil ya pêşî dabûne destpêkirin. Di dawiya BZ salên 500an de, ketibûne vê pêvajoyê. Him mezinbûna şaristaniya Grek û him jî jihevketina wê, bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Dera ku aqil bi azadî lê bixebite, ti dogma li wir temen dirêj nabin. Koledariya ku bi dogmayan ve girêdayî jî, li hember vê hêza aqil ji hilweşînê rizgar nabe. Jiberku Dewleta Atîna vê yekê dizane, Sokratê ku dixwest xwe rizgar bike, jehr dide, Eflatûn dide revandin û Arîsto bi razîbûna wî dişîne sirgûnê. Dawiya bi êş ya gelek feylesofan bûye kuştin. Eynî weke dema xiristiyanîyê ya pêşî, dibistanên felsefî hemû, nivî bi nivî dabeşî komên veşartî bûbûn. Ango dema felsefê ya bin erd destpêkiribû. Heta PZ sala 500an, felsefe di bin çavdêriyê de dimîne, dibistana wê ya dawî jî, di vê salê de tê girtin. Bi ketina serdema navîn re, bi şoreşeke li hember, bersiv bi şoreşa aqil tê dayin. Pejirandina Roma ya Stoaparêziyê bi şeweyekî fermî, Jiberku împeratoriya gerdûnî dibe, pêdivî bi bîrdoziyê deng li hemû kesa bike, heye. Stoaparêzan împeratorî weke qederekê didîtin. Ligor têgihînên nêrîna xwezayî, şeweya tevgera herî rast, weke ahenga li xwezayê, bi sazûmanê re jiyaneke bi aheng e. Felsefe kiribûne rewşa ola împeratoriye. Piştî demekê çawa xiristiyanî weke ola fermî tê îlankirin, ji hemû rêbazên (ekol) felsefî, heyîneke bimovik dertêxin holê, weke nêrîna dewletê ya fermî yê erka xwe bicîh bîne. Ev jî, herî baş ji aliyê Stoaparêzan ve dihate temsîlkirin. Digel vê yekê jî, sazûmana Roma bi dabeşbûna koleyê ku ne xwedî ti mafî û împeratorê xwedî hêza bêsinor, li hember pêşveçûna baweriya ku encex mirov dikaribe bibe beniyê xwedê yê xoşewîst, nikare li ber xwe bide.

Yên ku emperatoriya Roma, anga sazûmana koledarî ya herî bihêz jihevexistine û hilweşandine, ne barbarên ku bi sedsalan ji bakur ve hêrişan lê dikin, raman û tevgerên civakî yê ku ji sedsalan ve bi hêza aqil û baweriyê, hîmê wê yê bîrdoziyê perçe kirine. Ev bûyer Ligor çapana xwe piçûk, lê ligor bandora xwe diyarkere. Li Rihayê hê jî çîroka ku tê gotin, yê ku Nemrûd (qeranê Asûr an jî temsîlkerê wî) kuştîye ne şûr e, pêşiyê (kelmêş) ku ketiye ser mêjiyê wî ye. Ev tiştekî vekiriye ku pêşî, bawerî û ramênên nû ne. Ya hê jî vekirî ev e, weke ku di jihevketina hemû sazûmanên dogmatîk de tê dîtin, pêşiya ku ketiye mêjiyê sazûmana koledariyê jî, anga şeweyên bawerî û ramanên nû, heyîna bawerî û mirûzê sazûmanê ji hev dixê. Divê bila ji derve û divê bila ji hundir be, ya ku zora bêteşe biserxistiye, bi lêxistina çend derbeyên bêteşe, temamkirina karê jihevketina wê ye. emperatoriya Roma ya efsanewî, mînakeke herî hîkariker e ku vê rastiyê nîşan dide.

4- Girêdana dem û cîh ya sazûmana koledar: Mijareke din ku pêwîst e bête terîfkirin, girêdana sazûmanê ya bi demên dîrokê û mercên erdnîgariyê ve ne. Têgihîştina têkiliya sazûmana her civakê ya bi qalibên giyan û bîrûbawerî yê bîngêhîn ku serdem û dema tî jiyandin re, ji aliyê agahdariyên rast ve, gelekî girîng e. Lê pêwîst kirina têkiliyên koledar yê li çêbûna bîrûbawerî û giyanî ya serdema me, gelekî zor e. Ev encex bi xerakirin û ji rê derxistina bîrûbaweriyê û bi veguherandina hîmê civakê yê ku mirov kesayetiya xwe jê digirin, gengaz bibe. Li hember vê yekê, hişmendiya azadî û asta berxwedana viyana wê û meyla gelemperî ya serdemê, gelekî di ser semaxkirina (tehemûl) van nêzikayî û sepandinan re ye. Şensê meşa sepîneke ters ya li rewîştina serdemê, encex di rewşên gelek taybetî de (di şeran de, di serhildanan de), gengaz bibe, ragihandina heyî, hiqûqê gerdûnî û astên yekîtiya siyasî, fersendeke domdirêj nade van sepinandinan ku payîdar bimînin.

Ji ber vê yekê, şeweya têkiliya koledar, bi wan deman re di nava têkiliyan de ye ku hê hiqûqê mirov bi awayekî fermî nehatiye naskirin, ragihandin gelekî teng maye û hê saziyên bi giraniya siyasî yê derve û hundir ku hesab bidin wan, çênebûne. Desthilatiya teqez ya serweriya siyasî û olî (siyaset û ol di nava hev de ne) ku liser takekesên civakê, dibe taybetiya sazûmanê ya bîngêhîn. Rêxistinbûna çîna koledar ku bilind dibe ya di her astê de, takekes bi têkiliyê wisa ve girêdide ku encex bikaribe zikê xwe têr bike. Bîrûbawerî, giyan û hemû jiyana wî divê ku ligor vê têkiliyê çêbibe. Girêdana demê ya koledariya serdema pêşî, bi mirov re bi vî şeweyî tê girêdan. Li vir di navbera demê û şewegirtina civakê de, girêdaneke diyalektîk hatiye sazîkirin. Ev ne çêtirgirtineke (tercîh) kêfî ye. Dem weke ku Einsteinê fizîkvan rast derbixê, bi pêwendîdariyê sazûmanê girêdide. Bi temamî di rewşa hêzekê de ye. Liqasî ku sazûmana koledarî bê dem çênabe, şewegirtina civakê ku bi demê re neji, nabe dabaşa xeberrandê. Pîvana demê ya weke kartêkerekê di zanistên xwezayê de, ne bi têrayî ye. Ya girîngtir ew e ku pîvana dem û civakê bikaribe bête girtin. Dem, di rewşeke wisa de ye ku di civaknasî de, girîngiya wî ne hatiye têgihîştin û bandora wî ne hatiye diyarkirin.

Civaknasiyeke rast, encex çaxê ku pîvana demê birastî diyar bike, di hemû têkilî, nakokî, tevger û çêbûnên civakî de, demê li ber çavan bigire, yê gengaz bibe. Di vî babetî de, heger ku kronolojiya şaristaniya koledar bête çêkirin, divê ku demên sereke, li ber çavan bîn girtin.

a- Zayîn û pêşveçûna wê: Bi texmînî di navbera salên BZ 3500-2500an de ye. Dewlet hatiye afirandin. Jiyانبariya sazûmanê hatiye çespendin. Belavbûn û mêhtingebûn pêdikeve. Rewşa bîrî û giyaniya mirov, rahîb-qeranên ku bi şêweya mîtolojiya yekîtiya xwedayan (Pantheon) hatiye nixûmandin, dikare bi desthilatiya teqez ya xanedanekî yan jî komeke siyasî were karakterîzekirin. Desthilatiya bîrdoziyî bingeh e, rêvebiriya polîtîk nû pêşvedîçe û di plana duyem de ye. Serweran (hikumran) ligor têkiliyên ku bi dewletê re çêkirine, bi çavekî xwedanî dewletê yê bêsînor li xwe dinêrin. Gengaz e ku bibêjin vê demê sazûmana xweda-qeranan. Derûna wê di Sumer de bi bingeh dibe. Şaristaniyên ku herî ji nêzîk ve bandora xwe li wan kiriye, Misir, êndûs û li Pencapê Harapa û Mohenjadarô ne. Tê texmînkirin ku ev dem, li Misrê di navbera BZ salên 3000 û 2350an de, li wan derên din jî, di navbera BZ salên 2500 û 2000an de hatiye jiyandin.

Şêweya ramana bingehîn ya vê demê mîtolojî ye. Zimanê wê helbestî ye. Di destpêka demên şêweyên ramana mîtolojîk de, bi temamî zimanê helbestî serdest e. Di jiyane de, zelaliyê û xwerûtîyê, herî baş helbest tîne zimên. Zimanê helbestê matematîka jiyane ye. Di têkiliyan de windabûna helbestiyê, bêganebûn (biyanîbûn) û girêdaneke daketî derdikeve holê. Pêşaniya jiyane ya helbestkî, di wesfê bersiveke rast ya derûna wê de ye. Bê helbestî, bi windakirina jiyane re ji nêzîk ve girêdayî ye.

Di vî babetî de, divê ku mirov nekeve vê çewtîtiyê: Pîvanên kêşê (wezn), saziya çarêzkan, mijarên dirêjî û kinîtiyê kitekitin (teferûat) û rastiya helbestê diyar nakin. Di zimanê helbestê de, ne hevokên bipîvan, ne şêweyên sazîkirinê û ne yên din, derûn û naveroka wê bingeh û diyarker e. Wekî din ev dem bi saziya nivîsê jî, diyar dibe. Têkiliya di navbera hilatina şaristaniyê û saziya nivîsê de mîsoger e. Dema ku em bibêjin nivîs, ne ku em behsa îşaretên tîpan û hijmaran bikin. Divê bête fêhmînkirin ku nivîs, îşaretên vedana raman in. Encex dema ramaneke ku were vê astê, bikaribe şaristaniye bide zayîn.

Ji saziyên din ên bingeh, qesirbendiya perestgeh û serayê derketiye holê. Ji demeke koledariyê ku perestgeh û seraya wê nebe, nayê behskirin. Bingeha hemû perestgeh û serayan, di demên sazîkirinê de, pêşî hatine pêkanîn, di demên piştê, di ser vê şopê re pêşketin çêbûye. Sazûmana xwedaniyê (milkîyet), di vê demê de, bi şêweya temsîla di têkiliyên cîhana ku xweda serdestin de ye. Xwedaniya pevrayî giraniya xwe nîşan dide. Xwediyê axê, xwediyê têkiliyan û hêza rêvebir, tevaya civakê ye. Rêvebirî jî çavkaniya xwedê ye û benî encex xwedî peywira suxrayan be.

Cîhê niştecihiyê yê bingeh bajar e. Bajar saziyeke bingeh e ku bîrûbawerî û giyana demê diyar dike. Girêdana destpêka şaristaniyê ya bi şoreşa bajêr re, mîsoger e. Bajar tenê ne şêweyeke cîwarbûna fizîkî ye, navenda civata civakî û siyasîye ku giyan û bîrûbaweriyeke nû afirandiye. Siftbûna pişe, saziyeke ku nû pêşvedîçe ye. Lêbelê hê ne serbixwe ye. Weke perçeyekî ji perestgeh û serayê, têkiliyên koletiyê serdest in, mijarbûna mirov ya xwedaniyê, bingeh e. Bazîrganiya ku pêşvedîçe jî, xwedî şêweyeke têkiliyên bi vî rengî ye. Behskirina ji çîna navîn û xweykesayetîbana wê, zor e. Di hemû mijaran de, şêweya têkiliyên teqezîya yê rêvebir û yê tê rêvebirin, yê xwedî her tiştî û yê xwedî lê tê kirin, serdest e. Ji nasname, viyan û azadiya çîna navîn, nikare bête behskirin.

Amûrên hilberînê bi giranî afirandên civaka neolîtîkê ne, bi derbaskirina xwedaniya pevrayî ya bajêr re, şêweyeke têkiliyê ya nû tê sazîkirin. Amûreke cidî, bi taybetî jibo xwe ne afirandiye. Komkirina bi vî rengî jibo axê jî wiha ye. Avdaniya çêkirî û ya xwezayî, bûyerên ku xwe pêva girêdane ne.

Civata etnîk cîhê xwe daye civaka biçîn. Çanda xanedaniya serdest tê bilindkirin. Ev yek peywîr û pîrsgirêka herî bingehîn a zanista dîrokê ye ku sazîbûnên daringî yên vê demê, bi binyatên wan yên giyan û bîrûbawerî dahûrîne û têbigihîjîne.

b- Gihîştin û dema belavbûnê: Digel ku ev dem, jibo her navenda girîng cuda ye jî, bi nêzîkayî dema BZ 2500-500an, digire nav xwe. Taybetiya vê demê ya herî diyarker ev e ku sazûmanê xwe daye pejirandin, rûniştîye û belav bûye. Civaka Sumer di vê demê de (BZ 2000), cîhê xwe dide Babil û Asûriyan. Dema desthilatdariya Babil û Asûr, digel ku ketiye nava hev û hinekî bi nakokî dimeşe jî, tevayiyekê nîşan dide. Bi şêweya BZ 2000-1600an zayîn û pêşveçûn, BZ 1600-1000an gihîştina navîn, BZ 1000-PZ 1000an bandev û hilweşîn, hatiye jiyandin. Li Misrê, bi şêweya BZ 3000-2350an zayîn û pêşveçûn, BZ 2000-1800an gihîştina navîn, BZ 1500-00an bandev û hilweşîn, dikare bête bidemkirin. Harapa nadomîne, BZ di 2000an de dîtefe. Ev kronolojî li Çînê wiha ye, BZ 1500-1000an zayîn û pêşveçûn, BZ 1000-500an gihîştina navîn, BZ 500-PZ 500an bandev û hilweşîn. Jibo hindiyan, BZ 1000-500an zayîn û pêşveçûn, BZ 500-PZ 500an gihîştina navîn, PZ 500-1000an bandev û hilweşîn, dikare bête bidemkirin. Şaristaniya Greko-Romen, bi gelemperî hê

bêhtir berhema demên bandev û hilwaşanê ye. Şaristaniyên di asteke jêrtirîn de ku dişibine nimûneke sereke, Hîtît, Mîtanî, Fenîke, ëbranî û Gîrît jî, şaristaniyên vê demêne û van jî di nava xwe de an ev dem jiyîne an jî hewl dane ku bijîn.

Taybetiya vê demê ya herî diyarker, mezinbûn û bi belavbûnê re, zêdebûn e. Gelek mêhtingeh û bajarên bindest yê dema berê, derdikevine asta dewlet-bajaran û navendên nû yê sereke derdikevine holê. Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, bajar xwe weke nexşeyeke stêrkan nîşan didin. Rewîştên rahîb yê rêvebiriya dewletê, ketine plana duyemîn. Hê bêhtir di wesfê saziyeke wisa de ye ku erka wê ya bîrdoziyî heye. Ev yek dabaşa xeberdanê ye ku serdestiya polîtîk xwe nêzîkî xwedê bihêz dibîne û wisa dide sepandin. Seray û perestgeh mezin û zêde bûne. Saziya qerantiyê, hê bêhtir tekûz bûye.

Di pêşveçûna civakî de, taybetiya vê demê ya herî bingeşîn, zayîna çîna navîn û qezenckirina wê ya kesayetî ye. Bazirgan û pişekar, sîsikên mezinbûna bajaran ne, di tîkiliyên navbera bajaran de an jî yê bajar û gundewarî de, di rewşa hêza motor ya pêşveçûna aborî û civakî de ye. Pişekar serbixwe dibe, bazirgan liqasî dewlet-bajarekî bandora xwe dike. Di destpêkê de Asûrî, li pey re Fenîke, Gîrît, Kartaca, ëbranî û li peravên Anatolya gelek dewletok, di rewîştên bazirgan û pişekaran de ne. Piştî saziyên rahîb û qeranên şaristaniyê, ev hêzên weke çînen civakî yê herî girîng, rola xwe dilîzin.

Di warê aborî de bisermiyanbûn pêşveçûye. Di daringên ku dibin mijara bazirganiyê de, zêdebûn çêdibê. Bazirganiya koleyan sift bû ye. Atolyeyên nêzîkî karxaneyan derdikevine holê. Li derî venêrana dewletê, xebitîneke aborî di rêya xwe de pêşveçûye. Bi taybetî BZ di salên 1500an de, pevajo ya kadîbûna (kûrebûn) şaristniya koledar tê jiyandin. Em dikarin bibêjin, kadîbûna serdema tuncê jî. Sazûmanê kêfê bi gihîştina xwe tîne. Yekem car saziyeke dîplomasî ya tîr diyarî (perû), dixin dewrê. Şaristaniya Rojhilata Navîn, serdema xwe ya herî bihêz û ku bi xwe ewle dijî.

Mîtolojiya serdema pêşî dûçarî şikestinê dimîne. Di vê şikestinê de, pêşveçûna olê yek xweda ku dibêje mirov nabin xweda û xweda nabe pût, serî dikşîne. Têgîna yek xwedayî ya nû ku îfadeya bîrayî ya yekparebûna aborî û bazirganiyê ye, bêhtir yekparekere û weke kevîreki bingeşîn yê hîmekî bîrdoziyî ku deng li hemû mirovan bike, tê danîn. Dema xwedayên ku parêzkerên qebîle û bajaran tê derbaskirin, di bûyera dîrokî de, kevneşopiya yek xwedayê ku hemû mirovatîyê himbêz dike "Xweda", dest bi lîstika roleke herî girîng kiriye. Bi hindikayî liqasî mercên daringî, behskirina rola dîrokî ya vedanên menewî jî, rastîbîne.

Sazîbûneke girîng ya din ya vê demê, hêza hesp ku dikeve dewrê û bi erebeyên şer re, tê bikaranîn e. Yekem car saziya leşkerî bi erebeyên hespan bicoş dibe û erd û ezman dihejîne. Hêze dîrokê ya girîng û herî lezker, di dewrê de ye. Ev teknîka ku di bin desthilatiya tebeqeya raser de, bi çekên tuncî re, agahiya serdema fermandariya leşkerî ya bi hêz didin. Ev desthilatî di kesayetiya qeranê Babil Hamûrabî de, îfadeya xwe ya herî hîkarîker dibîne.

c- Dema klasîk ya şaristaniyê yan jî serdema bandev û hilweşîna wê: Ev dem di navbera BZ 500-PZ 500an de, derbas dibe. Şaristaniya bi navenda Mezopotamya, li Rojhilatê cîhê xwe dide êmperatoriya Medya-Persya, li Rojava jî, şaristaniyên bi navendên Anatolya û Misir, cîhê xwe didine şaristaniya Greko-Romen. Dema êmperatoriya Med-Pers zêdekariyên Babil û Asûr derbas dikin, demeke bêhtir dadmend û aştiyane temsîl dikin û dema Nemrûd û Firewnên yê ku îmajê gelekî bihêz hîştîbûn, li paş dihêle. Agahiya ku koletî ne qedere û dema azadiyê yê gengaz be, tê dayîn. Tê îfadekirin ku zincîra koletiyê ya heta bi qirika mirovan hatî pêçan, wê bikaribe bête perçekirin.

Li Rojava Grek û Roma, hêza aqil û felsefê didine piştî xwe û sazûmanê hildikişînine ber bi bandevê, hemû jandeyên ketinê jî, di nava xwe de diçîne. Komara Roma ya koledar û demokrasiya Atîna, hêza felsefê diçespînin, li xwe mukir tîne ku bi sazûmanê re, di nava lihevnehatinê de ne. Taybetiya bingeşîn ya şaristaniya koledar ku desthilatiyê heta bi xwedakirinê mezin dike, nikare demeke dirêj bi bawerî, raman û viyana ku azad dibe re bimîne. Hilkişîna sazûmanekî ya ber bi bandevê, liqasî heyîna nakokiyên berî jihevketinê ne, ketina wê jî, ji ber xebitîna berevajî ya van nakokiyane. Aliyekî nakokiyê hildikişîne û aliyê din dadixe. Dem ketiye pevajo ya sazûmanê ya herî bilez. Bilezî tê wateya rola zêde ya demê. Lez him rûxîner e û him jî çêker e. Lezbûna di binyatekê de, demeke wisa îfade dike ku hemanên hilweşîne û yê ji nûve sazîkirinê dikevin nava tevger û çêbûnê. Di vî babetî de dîrok ji BZ salên 500an pêde, ketiya pevajo ya bilezbûnê. Şaristanî ji Rojava ber bi Rojhilat liser piştî hesp, ketiye pevajo ya rê kudandinê. Bazirganiya mal û raman, ji seriyekî heta bi yê din bi heman lezê tevdiqere. Veqetîna Rojava û Rojhilat pêşveçûye, di heman demê de di navbera wan de, di her astê de livdariyek berdewam dike. Qayîşkêşî û levdana Pers-Grek ya berê, cîhê xwe dide levdana Roma-Sasanî. Dîplomasiya terazê, rê li ber gelek bûyerên nû vedike.

Digel enerjija ajalan, mercên sûd wergirtina zêdetir ji enerjija ba û avê, di rewşa pêşveçûnê de ye. Dirav (pere) derketiye holê. Camkarî û nivîskarî pişeyên ku pêşvedîçine. Qesirbendiya bajêr ya klasîk, demeke bêhempa dijî. Hiqûqê laîk rahên xwe berdide jêr. Çîna navîn pêşveçûna xwe ya çendaniyê û wesfînê didomîne. Baweriya êsa Mesîh, weke ola mirovatiyê yê gerdûnî, bi tevgerê mezîna ya bawerî û sincî, di rêya partîbûna herî bihêz ya civakî de ye. Di serî de Manîtî û gelek terîqetên mîstîk peyde dibin. Di serî de Stoaparêz û gelek dibistanên felsefî belav dibin. Bi Roma ya ku gerdûnî dibe re, di her qadî de şaristanî ber bi gerdûnîbûnê tê kişandin. Ti sazîyên şaristaniya koledar, nikarin mirovatiya ku di tégihîn û sepîna xwe de ketine nava livdariyan, rawestînin. Dem dema derizîn û zayîna nûjeniyê ye. Dema koledariyê ku tefiyayî, piştî hêdîbûneke dirêj, dîsa bilez dibe, jibo ku dema xwe ya herî bilez biafirîne, yê serdema navîn derêxe holê.

Têkiliya şaristaniyê û erdnîgariyê, ji mekanîkîbûn û wêdetir, bi têkiliya derûnî re, wateyeke diyalektîk vedihewîne. Heger Heyva Berhemdar nebûna, Sumer û Misir qet çenedibûn. Misir û Sumer nebûna, Rojhilata Navîn çenedibû. Rojhilata Navîn nebûna, li Rojhilat şaristaniya Hind û Çînê, li Rojava şaristaniyên Grek û Roma pêşnediketin. Grek û Roma nebûna, şaristaniya Ewropa û roja îroyîn wê nebûna. Liqasî zincîra dîrokê ya di warê demê de, zincîreke cih ya ku evqasî bi hev ve girêdayî û neqete jî heye. Ne ku em girêdana di navbera erdnîgarî û dîrokê de, tenê bi xwezaya fîzîkî û kêrhatî, li ber çavan bigirin. Di navbera erdnîgarî, avhewa, ajal, kemna rîwek û şewegirtina civaka neolîtîk de, têkiliyeke ku neyê qutkirin heye. Dîrok û xwezayê ev şens daye erdnîgariya heyva berhemdar. Yê ku ev erdnîgarî ji şoreşa çandinî ya mezîna û serdema wê re vekirine, yê ku dîrok ji malzaroka wê dane zayîn û ew qehremanên bi rastîne ku dergûşa mirovatiyê, herî pêşî hejandine. Ev dayîkên xwedawend ên dîrokê yê bînav û qehremanên kedê ne. Dîrokê di vê bingehe de destpêkir, lê çewt hate nivîsandin. Zarok li vir mezîna bû, lê navekî din lêkirin. Hemû destekên şaristaniyê li vir hatine afirandin, lê hineke din dest liser danîn. Hê jî ev şaristaniyê xweyî dikin, lê hineke din dijîn. Heta li tiştên ku Heyva Berhemdar dane dîrokê mukir neyên û mafê wê neyê dayîn, ev dîrok ji bê kokî û ji bûyîna dîroka derewan rizgar nabe.

Herodot di serdema xwe de tesbît kiriye ku Misir diyariyeke Nîlê ye. êndûs û Pencap şaristaniya Hindê û Çemê Zer jî şaristaniya Çînê afirandiye. Taybetiya Anatolya ya bi avdana xwezayî, hemû şaristaniyên ku xweyî dike, derîne holê. Dema ku navendên şaristaniyê çêdibin, bazirganiya ku bilez dibe, li xalên erdnîgarî yê herî kêrhatî, li pey hev giravên şaristniyê diafirîne. Erdnîgariya Derya Spî, him bi peravên xwe û him jî bi ava xwe, xwedî taybetiyeke wisaye ku derya şaristaniyê ya herî kevin û herî mezîna e. Kêrhatina avhewa û axa wê Ewropayê bi tevayî vediguherîne navendeke şaristanî ya herî mezîna.

Lêkolîna her erdnîgariyê ya ji aliyê civak û dîrokê ve, girîng e. Erdnîgarî bi aliyên xwe yê erênî û neyînî, liser binyat û pêşveçûna şaristanî û bi gelemperî liser ya civakê, xwedî bandoreke bi bingehe û domdare. Heger ku îro pîrsgirêkên hawîr, ber bi karesatekê ve dibe, ev yek bi erdnîgariya dema me ya ku xwe zanist berdide û bi korbûna wê ya têkiliyên bi civakê ve girêdayî ye. Erdnîgarî di rasteqîniya civakê de, rola dergûşê dileyîze. Divê mirovatî bizanibe ku bîyî wê dê nikaribe tiştêkî bike û dê nikaribe bijî, herwiha dergûşa xwe xera nake. Di dahûrandina şaristaniyan de, ji encamên ku emê bibînin ya herî girîng ev e.

d- Mîrateya şaristaniya koledar: Derbasbûyîna civaka biçîn, encama nakokiyên ku civka neolîtîk çareserî ji wan re ne dîtibû. Jiberku amûrên hilberînê û asta zanînê ne di hatine rêxistinkirin, bîkêr diman. Ji aliyê din ve zêdebûneke mezîna ya nefsan pêkhatibû. Hatîbûne dawîya dabeşkirina axa berfireh. Civaka gundî, bi belavbûnê re mercên çareserîya pîrsgirêkên xwe, qedandibû.

Dema ku hate BZ salên 4000an, civaka çandinî ji Okyanûsa Atlas heta bi Okyanûsa Mezin, axa Asya û Ewropa ya kêrhatî dabû ber xwe. Siftbûna li herêmên Derya Spî, gelekî pêşketibû. Dema civaka gundî giha sînorê pêşveçûna xwe ya herî zêde, yan yê bi sazûmaneke nû li derketinekê geriyaba, an jî yê ji ber sedemên levdanên liser axê yê ku di demên dawî de zêde bûbûn, di dorhêla levdanê de bêesil bûbana. Asta teknîkê û nifûsa ku zêde dibe, dê çareserî di guherîna sazûmanê de bidîta. Me hewl da ku em şeweya çareserîya çîna civaka koledar, ji nêzîk ve bibînin. Ev şoreşeke bajêr bû. Derûna wê ev bû ku organîzasyona keda mirov ya pevrayî, bi teknîka di destê xwe de, ji berxwarina xwe gelekî zêdetir dikarîbû hilberîne. Li geliyên Dicle, Ferad û Nîlê nifûsa zêde bûyî ku seferberî çandiniya beravî kiribûn, tiştên nuwaze pêktanîn. Weke geliyên sîlikon ê îroyîn, ev navendên hilberînê yê nû, weke xewnekê an jî mucîzeke ku pêkhatibe bû. Rewşa mirovatiyê bi vê bûyerê wiha serwest bûbû û yê li binyata hemû ramana wê, wiha bihata neqşandin. Bêşik ev pêşveçûneke mezîna bû ku piştî yekahengiya (monoton) civaka neolîtîk ya gundî ya bi hezaran salan, derketineke wiha dît. Nakokiyên gelekî zêde yê di sînga wê de, xwe nikarîbûn wê gavê nîşan bidin.

Hemû tişt weke cîhaneke xeyalan helbestî û dilkêş bû. Yên ku di xebitîn jî, Ligor dema kevin bêhtir zikê xwe têr dikirin û di nava ewlekariyê de dijiyan. BZ di salên 3500an de, sazûmana ku pêşî di saziyên bajarên Sumer órûk û Erîdû de destpêkirî, bi temamî 3000 salan derûna xwe diparêze û rê li ber saziyên zincîrî vedike, bênavber mezin û belav dibe, hemû qadên ku civaka çandinî lê belavbûyî, ji nûve zept dike û vediguherîne qadên şaristaniyê.

Şaristaniya ku hatiye afirandin, îro jî, xweş nehatiye dahûrandin. Têkiliyên bingehîn û saziyên roja îroyîn ku derbasdarin, çavkaniya xwe ji vê şaristaniyê digirin. Tiştên ku vê şaristaniyê afirandine, di rewşa şifreyên civakî de, di kûrahiya hişê me de, me beralûdike. Hemû saziyên bingehîn yên bajarîbûnê, çînen wê yên civakî û kokên çanda jiyanê, diçine heta bi vê çavkaniyê. Perestgeh, seray, şano, bazar, meclis, cade, atolye, dibistan û kerxaneyên taybetî û gelemperî, yekem car li van bajarên piçûk pêkhatine. Rêvebir, yên tene rêvebirin, xwedanî, karmend, wezîr, birêvebirê serek, organên şewirdariyê (rawêjkariyê) û femandariya leşkerî, hemû ji vê demê mane. Nivîs, mîtolojî, wêne, mûzîk, şano, folklor û perestin, ji dahênanên perestgehê ne. Sumeriyên ku têdigihîjin bê ev sazî çiqasî girîng in, weke zagonên herî bilind li van dinêrin, van bi "Me yên me" binavdikin û rêzê ji wan re digirin. Pêvajoyên şaristaniyê yên vê dawiyê, tên wateya pêşveçûn û belavbûna van saziyan û bîrûbaweriya ku şewe dide wan. Dema nakokiyên wan serdest dibin, dipenihîne xwedayên nû û ola ku temsîla wî dikin. Dema ku hê bêhtir li wan zor tê, wêrekiyeke mezin li viyana xwe bar dikin û ber bi cîhanên azadiyê ve belav dibin. Dema pêdivî didîtin, serî ne li xwedayan li aqilê xwe didan, hewldidan ku bigihîne zanînen zagonên di derûna her tiştî de. Pêşî bi tiştên ku ji xwezayê didane hev û dixwarin, dawiyê bi tiştên ku diçandin û diçînin, qîma xwe nayînin, bi guherandin û şewe danê, hînî dewlemendbûnê dibin. Tenê ne yên civakê, zagonên dewletê jî çêdikin û hiqûq jî diafirînin. Mirovatî, jibo çareseriyê nakokiyên civaka gundî, şoreşa bajêr pêktîne, vê carê jî xwe bi nakokiyên ku hê bêhtir mezin bûn re rû bi rû dibîne. Her çareseriyê, derî li ber nakokiyêke nû vedikir. Bi şaristaniyê re dema ku bilez dibe, bi pêşveçûnê tê binavkirin. Divê bila em bi qeder binavbikin û divê bila meşa azadî be, mirov di derbarê şeweya hebûnê de wiha biryar digire û dimeşe.

Nakokiyên ku di sînga şaristaniya koledar de çêbûn, bi mekanîzma sazûmanê nikarîbûnê bîne çareserkin. Berî tevan, bîrûbaweriya civakê ya bi glemperî û rewşa giyana wê, bi şeweya jiyanê koledarî re, gindirîne nava nakokiyên. Bîrûbaweriya hişyarbûyî û viyana ku azad bûyî, li rêyên nû digeriya. Bêşik di bin van bûyeran de, nakokiyên dargî rola bingehîn dileyîzin. Têkiliya xwedaniyê ya pêşî liser kole û liser amûrên hilberînê, encama bêkêriyêke mezin, bêkarî û bêtêkiliya bi amûran re, di derande holê. Gelek dahênan, weke aşê avê û teknîkên weke çerxa avê, ji ber keda kole ya erzan, bi têrayî ne dihatin bikaranîn. Hemû amûrên hilberînê yên girîng, ji aliyê têkiliyên xwedaniya koledarî û binyata bîrûbaweriya wê ve, terkî rizînê û berhemdariyêke gelekî di bin kapasîta wan re bûbûn. Ji ber şeran, artêşa koleyan bêhtir mezin dibû. Ew sazûmana xebata koledarî ku di dema destpêkê de gelekî berhemdar, niha veguherîbû sazûmanêke gelekî kêmbêr. Çeteyên leşkerî ku demên berê, di jihevketina civakên paşmayî û binyatên siyasî de roleke mezin dilîstin, di demên dawîde bi xerakirin û hilweşînan, rê li ber mesrefên mezin dikirin. Aliyekî çeteyên leşkerî ya rakêşer (kêşvan) ne mabû. Pîşekarî û bazirganiya çîna navîn ya bajêr, ew geşbûna kevin wînda kiribû. Digel ku hewldanên zanînan û felsefeya nû tinene, bi jîbîrkirina ya kevin jî, diketine demeke tarî. Pêbaweriyên civakî, tore û hiqûq, derbasdariya xwe wînda kiribû. Bîrdoziyên fermî û perestin, ketibûnê asta herî bawerhişk û bêwate. Bi şerên xanedanan yên li raser, navend jihevdikeye, mihraqên hêzê yên herêmî peyde dibûn. Çiqas ku vîdeyên dewletê dihatine şidandin, bêhtir rê li ber perçebûnê vedibû.

Ji Çînê heta bi Romayê, ji PZ salên 300an pêde, rastiyên ku bi awayekî vekirî derketin ser rûyê avê, bûyerên wiha dijiyan.

Hemû têkilî, sazî û hêzên van temsîl dikin ku sazûman derandibûne holê û mezinkiribûn, êdî di nava sazûmanê de bicîh nabin û zor didane jihevketinê. Ne li çarmixê dayin û ne bi şeran danexwarin, hişyarbûna hêza wîjdan û bîrûbaweriya mirovan ranawestîne. Bi dersên ku ji şaristaniyê girtine, bi meşa aqil û viyana xwe, mirovatî li pey sazûmanêke nû bû. Herêma pîrozweriya Rojhilata Navîn, bi hêzên pîrozweriyê yên nû, careke din di pêvajoya berhemdarî (zayokî) de bû. Êsayê ku serhildêrê şoreşa mezin ya wîjdan, li hember qeran û pêşgoyên li Qudsê ku hevkarên herî bi qirêj yên Babil û Sumer, ji mêj de, weke Ruh-ul-Quds bûbû qeranê menewî yê erd û ezman. Şerê wîjdan û sinc yê komê hewariyên wî yên bawermend, Roma ya bi şeml ji hundir ve hilweşandibû. Tevgera partiya xiristiyan ya civakî ku 300 salan domandî, hew mabû ku împeratoriye teslîm bigre.

Hê li Rojhilatir li zozanên Medya, kevneşopiya Zerdeşt ku weke brûskê veda û weke meşa şêran veguherî hêza viyanê, di kesayetiya Manî de, li ber zayîna tevgereke nû bû. Heger ku rahîbên Sasanî Kartîran yên ku paşverû bûbûn, nebûna û Manî ne hatibûya kuştin, şaristaniyeke bi şeweya ya Ewropa dikarîbî liser axa Mezopotamya bilind bibe. Êmperetoriya Sasanî ku hê zû paşverû bûbû, Ahamenîşên ku li hember Skender bi çend cengan hilweşiyabûn, li hember hêzên îslamî yê bijiyana. Van biqasî Bîzans, hêza veguherînê nîşan nedan. Diyar bû ku şensê sazûmanê yê xwe nûkirinê tinebû. Hê li Rojhilatir Çîn û Hind, piştî hev gewixandinên navxweyî, PZ di salên 300an de, bi Xanê Mezin yê nû û Xanedaniya Çandagûpta ketine pêvajoya feodalbûnê.

Dîroka Rojhilata Navîn ya pîrozweriyê, di merhaleya pêkhatina zayîna sêyemîn ya mezin de ye. Di navbera BZ 300 û PZ 300 salan de, tevgerên yekîtiyên pîroz ku liser vê axê hatibûne jiyandin, bipartîbûnên demê yên veşartî û niv meşrû ne. Jiberku çinên rûniştî tinebûn, pirsiyariya meşrûiyeta sazûmanê, encex bi şeweyên wiha gengaz dibûn. Divê bila bibêjine wan gnostîk (zana) û divê bila bibêjin komên mîstîk, qutbûna van bizavan (rêbaz) him ji ola fermî û him jî ji bizavên felsefeya fermî, di derûna xwe de, sazûmanê pirsiyarî dikin. Kuştina Sokrates, êsa û Manî ya bi navberên kin, tevger kirina di bingeha gnostîk û mîstîk de mecbûr dikir. Dersên ku ji jiyana pêşevanan derdiketin jî ev pêdivî dikir. Li hember şaristaniya koledar, li erdnîgariya pîroz, ji şexsed salan zêdetir tevgereke bîrdoziyî û mirûzî, dabaşa xeberdanêye. Neçareseriya di mercên daringî de, li cîhana giyan û bîrûbawerî vedide û rê li ber serdema rênasên mezin û terîqetan vedike. Di nava dîrokzanan de, belaş nabêjine salên di navbera BZ 500-PZ 500an de, serdema klasîkên mezin, ev bi ketina pêvajoya sazûmanê ya dawî ve girêdayî ye. Sincê Konfucyûs yê bi pênc rêzikên mezin ve girêdayî, sincê Bûdha yê rizgarbûna ji eşê, sincê Zerdeşt yê mirovê bi viyan, sincê Sokrat yê xwe zanîne, destpêkên serdema klasîkên mezinin. Hemû jî li derdora BZ 500an jiyîne. Rêyên ku li ber şoreşên bîrûbawerî û sincî vekirine, di derûna xwe de liqasî ku li dij şaristaniya koledar in, li hember torepazîyê teng ya hîmên etnîk jî weke bersivê ye. Hemû ramanên ku liser navê ol û felsefê hatine pêşvebirin, jibo şaristaniyeke nû bifirînin, bi tevgerên mêjîyên mezin û wijdanan di nûsaziyekê re derbaskirina wan, rê li ber bîrûbaweriya hevpar û wijdanê mehşerî yê vê dehsedsalan vekirîye, bi serê xwe, rê li ber guherana sazûmana şaristaniyê venakin. Encex çêbûnên mezin yên bîrûbawerî û wijdan, rê li ber sazûmana nû vekin û şeweya giyan û ramana serdema nû bifirînin. Di van sedsalan de, li axa pîroz ya Rojhilata Navîn, livdariya civakî ku mîna aşîte mezin bûyî, tê wateya ku sazûmana nû ketiye malzaroka dayîkê û şewegirtiye.

Bi awayekî berbiçavî, şaristaniya ku bi şoreşa bajêr ve girêdayî, dema bi nakokiyên bajêr yên ku nikarin bîr çareserkerin re dikeve nava gewxandinan, yê çareseriyê di gundewariyê de bibîne. Dema ku dikevine pêvajoyeke ku kole jî nikarin xwe xweyî bikin, yê ev jî ber xwe vala bikirana gundewariyê yan jî bi bazdanên berfireh re wê biketana pêvajoyeke ku nikaribin pêşiya wê bigirin. Li vir jî tiştên ku derdikeve pêşberî me, eynî weke merhaleya damezrandinê, di pya jihevketinê de jî, tiştên diyarker ne zor, mercên hilberînê ne, rewşa berhemdariyê û kêmberiya ya bi keda kole ve girêdayî ye. Zagona civakê ya bingeh dixebite: Dema têkiliyên hilberînê (şeweya xwedaniyê û rêvebirîya raser) bikevine nelihevkiyên ku bi hêzên hilberîne neyêne çareserkerin, perçebûna wan û bi şeweyeke nû xebatbariya wan, jênerêv dibe.

Dîrokzan vê veguherînê di bin navên cur bi cur de didin. Dawiya serdema klasîk û destpêka serdema navîn, bi raveyê gelemperî dikarin bibêjin, ji şaristaniya koledarî derbasbûna şaristaniya feodal. Di salên PZ 325an de, îlankirina xiristiyantiyê ya bi awaya ola fermî û dabeşbûna împeretoriyê ya Roma Rojhilat û Rojava (PZ 395), herî dawî Gotên ku Roma Rojava berdest dikin û xanedaniyê dadimezrînin (PZ 495), weke kronolojiya dîrokê ya fermî tê nirxandin. Li navendên şaristaniyên Çîn, Hind û Rojhilata Navîn, weke van lê bi şewê û mêjîyên cuda, heman rewş tê jiyandin. Dîrok, digel ku mirovatî gelekî westiyaye jî, li welatên serdema neolîtîk, lêbelê ji wê cudatir û di asta raser de, bi giyan û bîrûbaweriyeke nû, bi amûrên hilberînê ku hê bêhtir hatine pêşvebirin, ber bi dema şaristaniyê ya duyemîn ve, bi gavên hêdî û ewlayî diçe.

BEŞA DUYEM BEŞA DUYEM

SERDEMA ŞARİSTANIYA FEODAL SERDEMA ŞARİSTANIYA FEODAL

Dahûrandina vê sazûmana ku bi dengê îlah-Xwedê gurmîn jê tê û di dîroka şaristaniyên gelemperî de, bi serdema navîn an jî bi dema şaristaniya feodal hatiye têgînkirin, jibo roja me, bi taybetî jibo civakên Rojhilata Navîn girîngiya xwe ya jiyandî diparêze. Heta ku tîpê vê civakê û rastiya şaristaniyê ku bilind kirine neyêne dahûrandin, ne gengaze em karibin vê dema ku îro jî di nava bêçareyîyan de, bi levdanên ku rê li ber êş û derya xwînê vekirîye, bi rêvebiriyên xwe yê despotîk, bi komara bêesil bûyî, bi paşvemayîna aborî û civakî û ya mîna girêka kor, derbas bikin. Ev yek derketiye holê ku pêşveçûna bingehîn ne bi veguhêziya dirav û teknîkê ye. Dirav û teknîka di destê ereban de, digel ku ji dewletên Ewropa ne kêmtir jî, gelek dewletên ereban ku sazûmana serdema navîn ya bêesilbûyî dimeşînin, vê îdîayê diçêspîne. Ev rewşa ku li nav gelek hêzên herêmî jî tê jiyandî, nîşan dide ku pêwîst e çavkaniya pîrsgirêkê, li deverê din bête dîtin. Veguhêziya dirav, zanîn û teknîkê ya bi serê xwe, bi sazûmana şaristaniya Rojava re, heman encaman dernaxe holê. Wê hingê çavkaniya pîrsgirêkê, ango ya qeyran û bêçaretîyê, bîrdoziyî ye. Hê çalakiya qalibên bîrûbaweriya feodal û ya jiyandî, vê teze rast derdixe. Heta ku seresaziya bîrdoziyî neyê dahûrandin û li şûna wê vesazîbûneke bîrdoziyî ku bersivê bide demê neyê damezrandin, çareserkirina civakê ya qeyran û lihevastîbûyî -di wateya ku pêşveçûn biqevize sentezeke bilintir de- pêknayê.

Serdestiya şaristaniya sazûmana kapîtalîst ya Ewropa, ji dahûrandina sazûmana feodal tê. Sazûmana feodal ne weke ku tê zenkirin, ne ji aliyê zanist û teknîkê ve hatiye dahûrandin. Di bingeha van de, şoreşa ku rê li ber pêşveçûna wan vekirîye, di warê bîrdoziyî de ye. Şoreşa bîrûbaweriya azad ku li hember dogmatîzma dêrê serfiraz bûbû, derûna hemû pêşveçûna ye. Bêşik di vê de, para zanîn, teknîk û dewlemendiya dargî ya ku pêşdikeve jî heye. Lêbelê ev ne diyarkerin. Zanîn, teknîk û dewlemendiya dargî li gelek herêman, mînak li Çînê Ligor Ewropa ne li paşin, hê li pêştirin. Li dewletên îlamê jî, ev rewş tê jiyandî. Di sedsalên 8 û 12an de, zanîn, teknîk û dewlemendiya dargî yê li cîhana îslamê, ji Ewropa gelekî pêştirin. Çiqas ku diçe paşvemayîna van û veguherîna mezîna ya Ewropîyan, dide çespanîna ku sedem bîrdoziyî ye.

Di dahûrandina serdema şaristaniya feodal de, pîrseke din ya girîng ev e ku li kûderê û çawa dest pêkirîye. Weke hemû sazûmanên serdest ku vê yekê dikin, nivîsandinên dîrokê ya navenda Ewropa ku dexma xwe li nivîsandina dîrokê xistiye, şewşandîneke mezîna dikin ku vê serdemê, bi hilweşîna Roma re li qada xwe didin destpêkirin. Ev bi têgîhîna sazîna serdestiyê re, ji nêzîk ve girêdayî ye û gelek çewtîyên mezîna vedihewîne. weke serdemên neolîtîk û koletiyê ku pêvajoyên zayîn, gihîştin û jihevketinê jiyane, şaristaniya feodal jî, weke berhemeke çanda Rojhilata Navîn zayî ye û heta roja îroyîn jî gelekî bandorker bûye.

Ev çespan, jibo têgîhîştina dîrokê ku xwedî mantiqekî zincîrî ye û ev mantiq divê ku neyê windakirin, gelekî girîng e. Şaristanî bi aweyekî berevkî nazin. Jihevketina wan jî wisa ne hêsan e. Tê çavdêrîkirin ku di zanista dîrokê de, aloziyekî tê jiyandî. Desthilatiya siyasî, herî zêde di warê dîrokê de, pêdiviya ravekirinên eznavendperezî nîşandaye. Digel berbiçavîbûn yê di gelek qadên zanistê de, ev yek zor e ku bibêjin di warê dîrokê de, berbiçavîyek hatiye peydakirin.

Dema ku ji nêzîk ve bête nêrîn, wê were dîtin ku di navbera sazûmanên koledar û feodal de, girêdanên nêzîk hene. Dijîtiya kapîtalîzmê ya bi feodalîzmê re hişk e û jêqetana wê jî berfireh û bi levdane. Ji xwezaya xwe ve ev wihaye. Şeweya desthilatiya kapîtalîst, pêdivî dibîne ku hemû girêdanên feodal, bi awayekî hovane werin perçekirin. Derûna wê ya şoreşger jî, ji vê yekê tê. Heçkû jihevketina sazûmana koledar, weke ku di mînaka Roma de tê dîtin, bi feodalîzmê re, bi lihevkerîneke di nava bêdengiyê de pêkhatiye. Zêdetî ji veqetan û levdanên bihêz, bi guhestinên di nava xwe de, bi ketina xwe bi xwe, bi mantiqekî peresînî û diyar bi şeweyeke bilindbûnê, trendekê diçêspîne. Ji koledariya Roma Rojava, bi vî rengî derbasî feodalîzma Roma Rojhilat ango Bîzans bûye. Bûyera Çîn û Hindê jî mîna vê ye. Di vê de rewîsta nakokiyê diyarker e. Cudahiyên di navbera astên bîndestiyê tîkîliyên bi şeweya koletiyê û astên bîndestiyê bi şeweye feodaliyê, dahûrandîneke bi kûrayî dixwaze. Bi sînorbûna dahûrandîne, sazûmanan nêzîkî hev dike û veqetanê ji bingeh, bi levdanên kin yan jî bi şeweya şoreşgerî, berbiçav dike. Bi rêya peresînparêzî veguherîn dibe şeweya derbasdar.

Peywireke dîrokê ya herî girîng ev e ku veguherîna peresînî, di girêdana şaristaniyan de, cîh û dema wê bi rasteqînî pêkbîne. Ya kêma ev e ku zanista dîrokê hê jî, bi herîkena cîh û dema rast, bi

serûberiyek saz ne kiriye. Sedema vê yekê ya herî bingehîn ev e ku şaristaniya Rojava, bi bîrûbaweriyeke oryantalistên mêhtinger li şaristaniya Rojhilat, bi taybetî li şaristaniya Rojhilata Navîn dinêre û wan weke xeteriyeke mezin dibîne. Hê niha hinek lêgerînan, bi tezên cur bi cur dixwazin ku vê çewtî û bêmafîyê derbas bikin. Şaristaniya feodal ku ji çavkaniya Rojhilata Navîn, dê tevkarîyê bike ku gelek mijarên girîng ronahî bibin. Ev dane, wê nakokiya Rojhilat û Rojava hê bêhtir di bingeha rasteqînî de, ronahî bike. Ya duyemîn, ev rewş wê rê li ber dahûrandina bîrdoziya ola yek xweda ya di dîrokê de, veke. Dahûrandina bîrdoziya olî, hê jî li benda peywireke entelektule ku pêre têkildar bibin. Sêyemîn, ev dahûrandin yê jibo çanda Rojhilata Navîn rast bête terîfkirin û di derbarê rola wê ya dîrokî de, ji nêzîkayîyên zanist re, yê bibe suxreyeke mezin. Çaremîn, yê rê li ber nasan (teşxîs) û çareserkirina pîrsgirêkên li Rojhilata Navîn, herwiha li tevaya cîhanê civakên ku di nava paşvemayîn, qeyran û bêçareyîyê de ne, veke.

Şerê Ereb û Êsraîl yê ji şerê kapîtalîzm û sosyalîzmê diwartir, ku cîhanê dilebikîne û hê jî bi awayekî hovane berdewam dike, bi kokên dîrokî ve girêdayî ye. Jiberku ev şer, nakokiyên serdema me, bê çawa di rojeva Rojhilata Navîn de, dibine girêka kor li ber çavan radixe, gelekî girîng e. Di vê nakokiyê de dîrok digewixe (pevdîçe), Astên civakî yên ku kirmişîne şewaya olan, şer dikin. Sazûmanên şaristanî têne hemberî hev. Bi vê xuyabûnê, weke şerê qebîleyan e. Lêbelê Ligor taybetiyên vedihewîne, bi domdariya xwe ya dîrokî û bi rêbaziyên xwe yên dîplomatîk û leşkerî, weke şerekî cîhanê ye. Mecbûrbûna ku hemû hêzên cîhanê pê re tekildar dibin, vê tezê rast derdixe. Di bin vê yekê de jî, hêza rastiyên şaristaniya Rojhilata Navîn heye. Gelek carin ku cîhan hemû dibe yek, NY bi cildan biryar standine. Lêbelê heger hê jî çareseriyek ne hatibe dîtin, ev yek nîşan dide û diçespîne ku gelek çewtî tîn kirin, ev yek tê çespanandin ku hê jî nizanin bê çawa nêzîkî çareseriyê bibin. Şerê cîhanê yê duyemîn bixwe jî, digel hemû toqîna xwe, êdî îro bîranîneke. Lêbelê li Rojhilata Navîn, şerê di navbera Ereb û Êsraîl de, şerekî domdare ku argûra (pêtal) wî tim vêketiye. Gelek eniyên şer yên din jî, ne kêmtî vî şerî ne. Ev mijar bixwe jî nîşan dide ku heta hêza şaristaniya Rojhilata Navîn, birastî neyê naskirin (weke xwedayên wê), bi awayekî eksok (rikdar)dide nîşandan bê qadîrbûn çîye.

Ewropa, digel ku sazûmana feodal bisînor diji û di bingeha wê de serdemeke koletî ya domdirêj heye jî, encex ev serdem, bi demeke Ronesanê (Renaissance) derbaskiriye. Heger Ronesan di sedsalên 15 û 16an de nebûna, Ewropa îro çenedibû. Lêbelê Rojhilata Navîn, digel ku ev sazûman di dem û cîhekî berfireh de û bi kûrayî jiyaye jî, jiberku ronanseke ne jiyaye, gelo ne sedema bêçareyîya îro ye? Pirs di cîh de ye û bersiveke berfireh dixwaze.

Şaristaniya Rojhilata Navîn a dawî û herî bihêz, derketina îslamê ye. Mirov dikare bibêje êslamiyet, şoreşeke feodal ya bi şeml e. Êslam raperîneke dawî ya Rojhilata Navîn e. Di kesayetiya êslamiyê de, serdestiyeke feodalîzma Ewropa, liser feodalîzma Rojhilat tine. Weke ku di seferên xaçparêzan de jî xuya dike, Ewropa pêdivî dibîne ku hêza xwe, ji serdestiya Rojhilat wergire. Dema osmaniyên tirk îslamiyê temsîl dikin, feodalîzma Ewropa dikeve rewşa xweparastinê. Ewropa encex bi zayîna kapîtalîzmê, ji xweparastinê rizgar dibe. Ev yek rê li ber serdestbûna şaristaniya Ewropa ya liser şaristaniya Rojhilat vedike. Rojhilat û Rojhilata Navîn, di bin vê serdestiyê de dikeve nava tengbûn, xweparastin, qeyran û bêçareyîyeke ku îro jî didomîne. Dahûrandina vê ya bi nêzîkbûnên teng yên emperyalîzm û mêhtinkariyê, bi netêrayî dimînin. Ev dahûrandinên bi vî rengî, ji reel sosyalîzma ku jihevketina wê hê nehatiye dahûrandin, dahûrandinên teng yên ku ew pêktîne, ti wateyên bilind û di cîh de, di nava xwe de venahewîne. Di vê demê de, Rojhilat û Rojhilata Navîn, bîrûbaweriyeke mezin winda kiriye û hê jî gêjîtiya xwe ji ser xwe ne avêtiye. Ronesanxa xwe qet nayîne aqlê xwe. Lêbelê hertişt bi pêngava Ronesanseke Rojhilata Navîn ve girêdayî ye. Petrola bêsînor, veguhastina teknîkê û ronakbûna bi navenda Rojava nabe çareserî. Pîrsgirêka nufûseke mezin, bêkarî, çavkaniyên hatine beredayîkirin, xiyaneta li dîrokê, di zehrîkirinê (teqlîdkirin) de jî neserketin (liqasî Japonya jî nayên), hayjênebûna demokrasî û mafê mirovan, hingofên (ramana sabîyt) despotîk yên ji sumeriyên paşdetir, weke korbûneke herî xeter oldarî, nîrxên mirûz yên di bin sifrê re, di çareserkirina pîrsgirêkan de fêhmkoriyeke bi şûn qebîleyên hoveber de mayîn, ev hemûçik qeyrana bîrûbawerî û giyanê nîşan didin.

Heta ku ev neyêne derbaskirin, bi pêkanîna mirinên naletî yên li Qudsê, rizgarî nabe. Heger em hê jî fireh bikin, heta ku ev bîrûbawerî neyê derbaskirin, axa Rojhilata Navîn ya pîroz, ji jiyana naletî ya mezin rizgar nabe. Li hember dîrokê, xwe ji sucdariyê nade bexşandin. Ev jî tê vê wateyê ku encex bi Ronesanseke Rojhilata Navîn, pîrozî yê bête bidestxistin, bi hêza bîrûbaweriyeke ku jê bête standin ji nû ve zayîna giyanî yê were jiyandin, encex di vî bingehî de bi dîrokê re yekîti çêbibe, gihîştina serdemê were pêkanîn û bikaribin bikevine merhaleyê dîrokê ya raser. Dahûrandina sazûmanên şaristanî yên ji çavkaniya Rojhilata Navîn, derûna vê şoreşa bîrûbaweriyê ye, di heyîna

civakî ya Rojhilata Navîn de perçebûna bîrûbawerî û windabûna wê, encex bi vê şoreşa bîrdoziyî bête derbaskirin. Çiqas ku em şaristaniya feodal rast dahûrînî û di vî bingehî de veguherînine şewegirtineke ji nû ve ya jiyana giyanî û şoreşa bîrûbaweriyê, ewqasî emê bibine bersiva qeyrana kûr û pîrsgirêkên ku gelicîne, bûne girêka kor.

A- Nasnameya bîrdoziyî ya serdema feodal

Ji civaka herî bisînor heta bi ya herî pêşveçûyî, nasnameya bîrdoziyî ya ku îfadeya asta bîrûbaweriyê civakê û sêwiranên wê, bûyereke jêneger e. Terîfkirinên civakê yên bi giraniya aborî, di vî babetî de ne bi têrayîne. Di civaknasiyê de rola nasnameya bîrdoziyê hatiye dahûrandin. Çavdêrîkirina dîrokê ya berfireh, dide nîşandan ku di pêvajoyên sazûn û jevketina heyînan civakî de, çêkirina nasnameya bîrdoziyî ya nû û belavbûna nasnameya bîrdoziya kevin xwedî roleke diyarker in. Him bîriya (hiş) derbasiyên civakî, him jî nasnameyên bîrdoziyî yên weke sêwiranên utopya dahatûyê (pêşedem), weke mêjiyê civakê rola xwe dileyîzin. Bi şibandineke bêteşe, dest û pê çawa bi aboriyê ve ji nêzik ve girêdayî bin, erka mêjî ya bingeh, sêwirana bîrî ye. Di heyîna her candarî de, mêjî hêza rêvebir ya jiyane ye, lê organê hê bêtir hêza karkerên jiyane ne. Heger ku bi şeweyekî guhertî be jî, dema ku civakîtiyê weke hebûnekê şeweyê digire, pîrsgirêka mêjî derdikeve holê. Ev terîfkirineke rast e ku em vê yekê bi qezenckirina hebûna bîrdoziyî binav bikin. Di çêbûna civakê de, dema çêbûna mêjî weke sazûbûneke serresazî bête nîrxandin, di sazûbûna aborî ya amûrên hilberîne ku rola bingeh dilîzin de, binesazî, weke dest û pê tê nîrxandin. Serresazîya bîrdoziyî, ji ber vê sedemê ye. Ev nîrxandin ji têgihîna felsefî tê ku sazûmana xwezayî ya gelemperî, ji civakan re jî derbasdare. Asta dahûrandina civaknasiyê ya pêşveçûyî, di derbarê rastiya û têgihîna de, çespînan bihêz dide.

Di berhêliya (istîqamet) û têgihîna rêbazîya bingehî de, dema ku me şeweya civaka biçûn ya pêşî û herî pêşveçûyî nîrxand, me cîhekî girîng da mînakê Sumer. Digel taybetîya civaka Sumer ku di dîrokê de, mînakê yekemîn e, Jiberku gelek belgeyên nivîskî bi şûn xwe ve hiştine jî, pêdivî dike ku di dahûrandinan de, bingehê bête girtin. Jênegeriya wê ne kêfî ye, ji ber vê sedemê ye. Reseniya Sumer, weke nasnameya bîrdoziyî ya bingeh ya civaka biçûn, bi kemnên bîrdoziyî yên ku afirandine, di bingeha hemû şaristaniyan de cîh girtiye. Mînakên din ku derdikevine holê, û gerdûniyê xera nake, berevajî û yekê, diçespîne ku ev nimûnekî nîrxêke bingehê û bi hêz e. Çawa ku daneheva sermiyan neyê dahûrandin, ravekirina civaka kapîtalîst ya zanistî nayê kirin, heger ku mîtolojiyê û bîrdoziya Sumer jî neyê dahûrandin, di serîda nasnameyên bîrdoziyî yên hemû şaristaniyan û ravekirina zanistî ya hemû rêxistinên serresaziyên wan, nayê kirin. Jênegeriya wê di vîra de ye. Heger hûn ya esîl nedahûrînî, bi dahûrandina bêjiyê (pîçê) wê, hûn nagihîne derekê. Hûn ji esîlê wê bikevine rê, hûnê bikaribin berhemên wê yên pîç, bêesîl û veguherî terîf bikin. Lêbelê ku hûn berevajî û yekê herin, dîtina esîlê zor e, rêyêke wiha tije xefîk e (dafîk) û yê ber bi rêyêke çewt ve bibe. Di felsefê û wêjeya cîhanê de, mînakên bêjîbûyî û veguherî, bi vegoteneke bêsinor tene dayîn, lêbelê orîjînal weke ku tinene, tene jîbîrkin an jî pêdivî bi dahûrandina wan nabînin. Ji aliyê dîroka olan ve, ev rewş xeternaktire. Hemû olên mezînan, digel ku çavkaniya xwe ji mîtolojiya Sumer girtine, bi çêr û xeberdanên ku jê re dane û ew înkâr kirine, weke ji rê derxistineke bîrdoziyî jiyayan ne.

Ev ji rê derxistinên dîrokî, bi pîrozkirin û di bin navê fermanên xwedê de, weke malê bîrdoziyî hatin pêşkêşkirin, herwiha qezencên mezînan yên bêmaf bidestxistine. Di vî babetê de, divê ku di dîrokê de ji mêhtinkariya bîrdoziyî ya herî mezînan bête behskirin.

Jixwe ev yek hatiye çespendin ku Sumer jî perçeyên bîrdoziyî, bi heman rêbaziyê ji bîrdoziya neolîtîk dizîne. Di vir de ya herî girîng, nîrxandineke rast ya liser şerê di navbera bîrdoziyan de ye. Sazûmanên ku ne dabine hev û ji hev ne standibin, tinene. Lêbelê peywira dîrokzan ev e ku weke rastiya wê, bersivên rast bide pirsên weke "kê, ji kê, çi, çawa û bi çi armancê stand û çawa bikaranî?". Bi gelemperî di nivîsandina dîrokê de, kesek nikare bibêje ku ev bi têrayî hatiye kirin û dîroka bîrdoziyan gihîştîye îfadeyêke zanistî. Peywira bingeh li pêşîya zanista dîrokê, diyarkirina û ya di vê çarçovê de ye.

Jibo ku zayîna şaristaniya feodal bête terîfkirin, weke ku ji vê nîrxandina kinê tê fêhmkirin, ev yek wê di cîh de be ku em pêşdatiriyê bidin çarçova bîrdoziyî. Di vê mijara tevlihev de, girtina rêbazîyêke wiha û sepandina wê, yê hesaniyêke mezînan were peydekirin.

Ji kesên ku guhên xwe didin serdemên navîn yên dîrokê re, timî navê Xwedê, Mûsa, Êsa, Mûhamed bête bilêvkirin, ev yek pêwîst dike ku wesfê nasnameya bîrdoziyî ya di derbarê van têgînan de, were dahûrandin. Çiye Xwedê? Wateya herî mezînbûna Mûhamed, Êsa, Mûsa û pêxembertiya wan çiye? Bi mantiqê civakî, di logos da ev beremberî çi tîne? Vegotina dîrokê ya bêyî watedarkirina van çend

nav û têtînan, heta weke niha bûye rêbazêke sepandinê. Lêbelê liser navê ol, hêjî dînîtiyên ku têne jiyandin, îfade dikin ku dahûrandineke tekûz ne hatiye çêkirin, hatibe çêkirin jî, bi temamî ne jiyaye. Heta ku ev neyê çêkirin, di warê laiktiya ku hê jî li gelek dewletan bûye pirsgirêk de, ti pêşketin çênabin. Gelek bûyerên xeternak ku hatine jiyandin, vê yekê rast dertêxe. Behsa me ya ronensansa Rojhilata Navîn jî, ji ber vê yekê ye.

Di şewegirtina civakî de, mînakên pêşî, weke bîrdoziya civakî ya di qebîleyan de, giyanwerîti (anîmîzm), tabûparêzî ku hê bêhtir pîrozweriyê nîşan didin, tê zanîn ku fêhmkirina wan zor e, lêbelê tê hiskirin ku xwedî hêza wateyî ne. Dema ku civakîti hate rewşa bûyereke, hêz û enerjîya ku derdikeve holê, hewl dide ku bi wate bibe, lêbelê bîrûbaweriya hoveber, dike ku vê yekê bi sêwiranên giyanwerîti û tabûparêziyê, bike xwedî nasname û wiha rave bike. Ev bûyera zayî girîng e, mercên ku jiyan bi teqezî pêve girêdayîne, ev wiha tê hiskirin, lêbelê jibo ravekirineke zanistî, hê bi hezaran sal pratîk jê re divê. Di merhaleya zarokatiya mirovahiyê de, rêya sêwiranê ye herî hêsan ev e, hiskirina weke zarokan ku hemû heyîn zindîne û xwedî xwestek û dilnên mîna yên wane. Civakbûna pêşî, bi rastî jî xwedî bîrûbawerî û giyanekê mîna ya zarokan ne. Dema ku psîkolojî zarokiyê û civaka pêşî beremberî hev dike, wekhevîyên hîkarîker dibîne. Zanista genetîk, di warê civaknasî de, di gelek xalan de raveker dibe. Bi kinayî em bibêjin, di bîrdoziya qebîleyan, di merhaleya zarokati de, zayina wê ya giyanwerîti û tabûparêzî, tê fêhmkirin. Bûyera civakî, weke heyîneke giyanî ya pîrozwer tê bi têtînkirin û digihîje nasnameyê. Totem dibe nîşana nasnameya qebîleyê. Nasnameya totem, weke hay ji xwe hebe, hêza xwe nas bike û di hiskirina civakê ya menewî û bîrî de, weke nîşanekê (sembol) biwate dibe. Totem vê dawiyê di rewşa pêşnuma perestgeh û xwedayên ku pêşdikevin de ye. Qebîle bi totem bi hêz dibe, Ji kesayetiya xwe haydar dibe. Li xwe mukir tê. Heyîn çawa bê nav nebe, qebîle jî wisa bê nav nabe. Binavkirin têtîneke ku ji şêwe jî hê bêhtir tevliheve. Tê wateya her tiştên ku çêbûna civakî, bi xwe re vedihewîne. Esasê wê totem, nîşana bûyera civakê ya anîna zimêne, weke paşnavê wê ye. Ne pûtparêziya qebîleyekê ya hêsan e. Giramgirî (rêzgirtin) û girêdayiya bi totem ve, tê wateya giramgirî û girêdana kesên qebîleyê yên xwe bi xwe ve. Herwiha ola hoveber dibe îfadeya bingeh ya bîrdoziya civatê, tişt û ajalên ku wê nîşane dikin, dema ku pîrozweriyê bidest dixin, civaka ku mensûbê wê ne mezin û bi hêz dibe. Di nasnameya totem de bîrdoziyî, dibe hêza wateya ku civaka temsîl dike, ji piya bigire. Bêşik tecrûbe û qezencên qebîleya ku di bin mercên giran de jiyana xwe didomîne, weke nirxên navxweyî kirî bi wate dibin, tabû û pêrozwerbûna wan jî tê fêhmkirin. Di heyîna totem de, êş, dilşayî, astengî û keda rojên derbasbûyî veşartîye. Tiştên ku tînan nîşanekirin, heyînen civakî yên derbasbûyî û hêviyên pêşdemê ne. Ligor vê terîfkirinê zayîna ol, weke şewegirtina bîrdoziyî ya pêşî, dibe sêwiraneke qebîleyê ya menewî û şewegirtina pêşî ya bîrî û giyanî. Ol, heyîna civakê ya dîngî ye ku bi şeweya pêşî, di qada menewî de vedide ye. Rewşa di dîroka civakan de ku herî domdirêj û herî li pêş, ji vê taybetiya wê tê.

Têtîna ola bi xweda, gaveke ji têtîna ola totemîk gavekî wêdetir û şeweyeke jê pêşveçûyîtir e. Qevastina têtîna xwedê, dibe nîşana bûyera civakêkî pêşdatir. Civaka ku mezin dibe, bi hêz dibe, behre qezenc dike û xwe bi ewlayî didomîne, îfadeya vê ya nîşaneyî bi nasnameya "Xwedê" dide têtînkirin. Xweda weke îfadeya her tiştên ku civak xwe pê bide meşandin, yên ji xwezayê û ji tecrûbeyên xwe derandin pêşkêş dike, bitêtîng dike û dibe heyîna ku hemû xweza û hêza civakî lê bi bar dibe. Di vî babetî de, çêkiriye, sêwirane, têtîne. Dema ku em hê li pêşdatir binêrin, hemû sirên xwezayê, zagonên wê, binavkirina pêhesiyên civakê yên bi şeweya pêşî e. Vê dawiyê dema ku felsefe, bi pêngaveke pêştir hewl da ku xwezayê rave bike, wê ji ramana olî qut bibe û vê yekê pêkbîne. Lêbelê têtîkiliya di navberê de girîng e. Têtînen xwedê jî, ravekirinên xweza û civakê ne. Felsefe dibîne ku ramana xwedayî, ketiye nava kemberî û kevneperestiyê, herwiha xwedê li derî dewrê dihêle, biqasî asta têtîhîna civaka ku serdema zarokati derbasbûyî, digihe şeweyeke ramanê ya nû. Ramana bi xwedê, bi dema civakê ya zarokatiyê ve ji nêzîk ve girêdayî ye. Hebûna xwezayê ya gelemperî ku bi xwedê ve girêdidin, bi pêşketin û cudabûna civakê re, wê wateyên nû wergire. Bi hêza gelemperî ya civakê re, aliyên civakê yên bihêz, yên bi kirmişîna xwedayetiye û bi wate bibin. Xweda mezin dibe. Lewra îfadeya xwezayê ya gelemperî, çeqên hemû hêzên wî, qîma xwe bi terîfkirineke ji nû ve nayînin, hêza civakê ku bilind û cuda dibe, dibe xwedî nasnameyekî nû.

Ew êdî vedana hemû hêzên xwezayî û civakî ye. Heyînen weke ax, rîwek, ajal, dar, av, ba, ewr û avhewayê ku di civaka neolîtîk de, bi nirx bûne û girêdana wan ya bi hilberî û jiyane, yên di hûnaka olê neolîtîk de, rola bingeh bileyîzin. Ev hemû bûyer xwedayî dibin. Lewra yên ku jiyana civakî diyar dikin ev bûyer in. Êdî xweda dibin îfadeyên nîşanî yên berbiçav û tiştên ku pêdiviyên bi cîh tînin. Bi şeweya vê ramanê, zanistîya yekem tê pêkanîn. Ya rastir zanista xwedayan dihile (dize). Di dema totem de, Jiberku vegotin bisînor bû, bîrdozî ji perestîneke hêsan û wêdetir ne diçû. Mîtolojî

pêşveneçûye. Zanista xwedayan wê piştre çêbibe. Têgîna ola neolîtîk wê bi xwedayên ku bi mirovan re dost, wesfê bingeh ya mirovên wê demê jî nîşan dide. Rewiştaya mirovan ya bê levdan, ligor dema hovîtiya kevin, ji xwezayê sûd werdigirin û derfetên mîna bihiştê, rê li ber nîşane kirin û bi watebûna xwedayan ku weke dostan timî didin, vedike. Mirov di nava hev de ne. Lewra civak bi bûyerên ku temsîl dike re, di nava hev de ye. Ya herî girîngtir, jiberku hêza neolîtîkê sereke ya şoreşa çandiniyê jin e, hemû xwedayên ku ji zayokiya (berhemdarî) wê hêz digirin jî, bi şeweya jinê ne. Li nav Sumerî, Misrî û Hindiyan jî, di demên pêşî de xwedayî bi pêşgirên mê tînin binavkirin. Aliyê mêranî wê dawîtir derkeve holê. Hemû peykerên ku ji dema neolîtîkê mane, bi şeweya jinê hatine çêkirin. Peykerên bi şeweya mêr gelekî kêmtir in. Xweda û mirov bihev re ne. Têgîhîna olî ya xwedayekî ji mirov veqetayî û cuda, hê pêşveneçûye. Hemû xwedawendên ku tîne zanîn, eştar, ênanna, êsîs, Demeter, Kîbele, êndra, hemû jî vê demê mane. Şewegirtina olî ya demê, dibe îfadeya bîrdoziyî ya qebîle û komên pêşketî. Ligor bûyerên bingeh yê ku rola xwe di jiyana qebîleyan de dileyîzin, xwedayên ku çendahi qezenc kirine pêktên. Çiqasî ku hêza bingeh tê ferqkirin, çiqas ku sûd û zirara van bête texmînkirin, ewqasî tê têgîhîştin û herwiha digihîjine xwedê. Şeweya raman û saziya têgînan, bi tevayî bi xwedayan tîne îfadekirin û meşandin.

Divê mirov bi hêza serek ya têgînan ku xwedayî dibin, şaş nebe. Ev demên zayîn û afirandina pêşîn e. Her têgîneke nû derfeteke nû, herwiha xwedayekî nû ye. Çalakî û zayokiya dayîkê ya di warê hilberînê de, rê li ber qezenckirina girîngiyê derasayî û serdema xwedawendan vedike. Lewra gelek dahênan û nûvedanan (îcad), jin pêktîne. Ev ihtîmaleke mezin e ku rîwekên bisûd, darên fêkî, ajalên kedîkirî, xebitandina axê, çêkirina malan, xweyîkirina zarok, tevrik (xepar), aşê destan û belkî gangilî (erebeya ga) ya pêşî, nûvedan û dahênanên jinê ne. Serdema dayîkên xwedawend, li pey van pêşveçûnên bêhempa, rola jinê nîşane dike.

Me di beşên berî de, anîbû zimên ku jinê ev şoreşa çandîniyê, pêşî li qewsa Toros-Zaxrosan pêkaniye. Me gotibû, sumeriyên ev çand wergirtine û yekem car derbasî civaka biçîn bûne. Di bîrdoziya Sumer de diyarkeriya rola rahîban, hikarîker e. Ya rastir, pêşdatiriyaya bîrdoziyî ya zayîne vekirî û bi şeml e. Rahîbtî, navenda çêbûna civaka biçîn e, rêberiya wê ya bîrdoziyî ye. Perestgeh, biryargeha pêşî ya biçîn e û navenda rêvebiriyê ye. Şeweyên çêkirinê û bîrdoziya ku li wir tê pêkanîn, weke nasnameyêke civakî bilind dibin. îdealîzekirin û têgînkirina civaka biçîn, pêngaveke din tê pêşxistin, bêhtir ber bi ezman tê hildan, tînin rewşa rêvebiriyêke weke rêveberiya ezman. Dema ku rahîb civaka biçîn ya nû derandiye holê, xweş dizane bê ev berhemdariya gelekî zêde tê çî wateyê û di ferqa wê de ye ku pêwîst e bi hemû hêza xwe vê sazûmanê îdealîze bike û bigihîne xwedayên xwe. Divê ku hemû nasnameyên xwedayî, bi hemû pîrozweriyên xwe, bitêgîn bibin û li cîhên xwe yê bilind bînin rûnandin. Pêre pêre Zîggûrat tîne çêkirin, weke ku didine xwedayên qatên raser, ji ziyareta beniyên qata jê re, ango kole re vedikin.

Gengeşiya liser pêşî aborî yan bîrdozî, di mînaka Sumer de, pirsyariyekî girîng pêdivî dike. Lêbelê hemû şanîder didin çespendin ku perestgehên mîna biryargehên rahîban, him navendên hilberîna daringî û him jî navendên dahênanana menewî ne. Şaristanî, dewlet û bajar di vê bingehê de çêbûne. Ti mînak nayêne dîtin ku hilberîn bêyî navenda perestgeha rahîb, ji ber xwe ve pêkhatibe. Bi vê yekê ev tê çespendin: Hêza civakê ya nasnameya bîrdoziyî û xwedatiya wê, rêxistinên wisa ne ku hilberîna olî, qet ji wan naqere. Bi hindîkayî mîsoger e ku di merhaleya zayîne de, ev wiha ye. Vê dawiyê şeweyên wê yê pêşî ku ne pêdivî dibin, nayê wê wateyê ku rola wan bi dawî dibe. Tê wê wateyê ku cîhê xwe daye şeweyên nû. Xwedayên Sumer weke rewîştaya sereke, jiberku di wesfê berdewama neolîtîkê de ne, hê jî nêzikî mirovan û bi şeweya mirovane. Weke mirovan dixwin, vedixwin û dizewicin. Weke bi şeweyê jin û mêr, di destpêkê de di yek terazê de ne. Lêbelê berberiya di navbera wan de, çîqa ku diçe, dijwar dibe.

Weke vedana dabaşbûna civaka biçîn, qewirandina Adem û Hawa ya ji bihiştê û mehkûmkirina wan ya suxrevaniyê, di vê pêvajoyê de ye. Cudahiyêke cidî di navbera mirovan de dest pêdike, xwedayên Sumer dibin afirîner, beniyên xwe weke suxrevanan ji nû ve diafirînin. Qayîşkêşî û afirîneriya di mîtolojiya Enkî û Nînhûrsag-ênanna de, ji aliyekî ve afirîneriya jinê dike plana duyemîn, ji aliyê din ve jî şewegirtina mirovê kole û suxrevan nîşane dike. Di hemû herênayên xweda-benî yê vê dawiyê de, ev sêwirana rahîbên Sumer rola xwe dilîze. Digel ku çespendina vê mijarê pir girîng e, reva pirtûkên ol yê jî vê û redkirina wan, ji ber esehiya wan û pêdiviya ku berjewendiyên wan temirandî bimînine. Nasnameyên xwedayî ku di civaka Sumer de tîne sêwirandin, vedaneke nû ya hêzên xweza û yê civakî yê ku weke kemîn vedabine. Digel aliyê xwezayê, aliyê civakê derdikeve pêş, giraniya jinê çîqa ku diçe kêmtir dibe, di cudakirina benî, suxrevan û mirov de, pêşveçûnên girîng pêktên. Hêza civakê ya polîtîk ku zêde dibe, dibe sedema bilindbûna hinek xwedayan, hinek wînda dibin an jî vediguherine şeweyên din. Di merhaleya Babîl

de, hêza monark ya teqez, di bilindbûna Mardûk de vedide. Ev merhaleya dawî ya mîtolojiya Sumer, nîşan dide ku gihane pêpînga (derçik) olên yek xweda.

Qebîleyên çolê yên Semîtîk ku bi hêz bûne, dema ku jiyana xwe ya bavkanî û yekaheng bi şaristaniya Sumer re dikine yek, şerê xwedayên di mîtolojiyê de, dijwar dibe. Bandora Sumer û jinê ji holê radibe, dema ku kevneşopiya qebîleyên çolê ya bavkanî, dibe hêzeke polîtîk, dest bi despotîzm û monarkiyê dike. Di kesayetîya Hamûrabî de, kevneşopiya qebîleyên çolê, bingeha têgihîna qerantiyê ya bi şêweya "zagon ez im" çêdikin. Di heman demê de nakokiyên ku di navbera qebîleyan û di nava qebîleyê de sift dibin, dijberbûneke bi şêweya kevneşopiya Brahîm Pêxember, li hemberî hêza polîtîk ya navendî ku xwe bi xwedê re dike yek, radike. Pêxemberî, di têgihîna ola Sumer de, rê li ber veqetaneke bingehîn vedike. Li hember dema mirovên bi şêweya xwedê, derbasdibine têgihîneke ku mirov ti caran nabine xweda.

Naveroka vê têgihîne, dahûrandineke girîng dixwaze. Ne xwedabûna mirov, bi wateyeke din, serhildana li hemberî xweda-qeranan û helwesta li dij wan e. Ji aliyê din ve xweda, ji şêweya mirov tê deranîn, di rêvebirîya qebîleyê de, bi şêweya cîgir-qasid (elçî) derbasî rêvebirîyeke nermtir dibin. Nasnameyên xwedayî yên di civaka neolîtîk de ku di rex hev de û ji hev re dost bûn, di şaristaniya koledar de, werdigerîne şêweya xweda-beniyê suxrevan, dibe xwedayê ku ciza dike, disixurîne û dibe xwedî. Veguherîneke têgînî ya cidî tê jiyandin. Mîtolojiyê, hêza polîtîka civaka biçîn, dike navenda xwe, di vî babetî de şîrove û wesfên nû bidest dixwe.

Şêweyên bîrdoziyî yên jihevqetan û berxwedanên qebîleyê, geveke din pêşve diçe, ji xweda-qeran cudatir, nasnameyeke xwedê derdixe pêş ku rehmê li kesên bîndest, yên têne mêhtin û stembar, bike. Esasê wê, kevneşopiya Brahîm Pêxember ev e. Mirov nabin xweda. Encex dikarin bibin cîgir û qasidê xwedê. Xweda tenê ceza nakin. Dikarin rehmê jî û rizgar jî bikin. Encex dema sucê giran hebe wê ciza bike. Lêbelê ev jî gengaz e ku bi perestîna xwe bidîne bexşandin. Ev têgihîn derûna olê yek xweda ye. Hêzeke gelekî derasayî û di asta bilind de, îfade dike. Derketineke li hember têgihîna ola koledar a ku kulta xweda-benî kiriye navenda xwe ye. Şêwe û kemna bîrdoziyî ya asta têkoşîna civakî û çînî ya demê ye. Herwiha çiqas ku ji mîtoloji û ola sumer ya koledar derketibe jî, aliyekî wê yê dijber jî derdikeve pêş. Li hember şaristaniya koledar, dijberîyeke bingeh nîşan dide. Bilindbûna olên yek xweda yên bi xwedayên ne bi şêweya mirovan, li hember koledariyê, pêşevaniya bîrdoziyî digire ser xwe.

Têgîna yek xweda ji gerduniyê re jî vekirîye. Di wê meylê de ye ku her kêlî tengbûna qebîleyan biqetîne. Lewra pêdiviya qebîleyan ya yekîtiyê, wê zorê li pejirandina yek xweda bike. Jiberku rewşa qebîleyên din yên bi vî rengî jî, yê heman bandorê bike, totemên eşîr û qebîleyên herî kevin wê bêne derbaskirin. Ædî ev weke şêweyên paşdemayî, li pêşya yekîtiyê astengin. Ligor ku ji xweda-qeranan jî gelek êş hetîye kişandin, têgîna xwedayê ku yekîtiya herkesî nîşane dike, yê rizgarker û dilovan pêşvedîçe, bi zêdebûna nakokîyan û pêdiviya yekîtiyê, çîqa ku diçe tê bilindkirin, gelek navên din jî, lê dikin bar û bêhempa dikin. Her taybetîyeke kevin ya bingeh, bi xwedayekî dihate îfadekirin, lêbelê di ola nû de, hemû taybetî bi xwedayekî re îfadeya xwe dibînin. Nod û neh navên xwedê, li Sumerîyan weke taybetiyên şaristaniyê di nixê zagon û tore de, bi şêweya "Me"yan derketîye holê.

Nûbûna ku Mûsa aniye ola yek xweda, bi şêweya ku qebîleyên ëbranî hemû ji têgihîna kevin qutkirine û kiriye olê yek qewmî yê netewî. Yehova weke xwedayekî netewî, qebîleyên ëbranî bi xwe ve hişk girêdane û bi Deh Fermanên ku bi wehiyan hatin, merhaleyeke pêşketî temsîl dike. Jiberku li hember Firewnên Misrê derdikeve, aliyekî wî yê azadîxwaz jî heye. Esasê wê, nasnameyeke bîrdoziyî tê sêwirandin ku li hember monarkên Babil û Misrê, bikêrî yekîtiyeke qebîleyên paşdemayî were. Jiberku ji mecbûrî, bi du navendên koledarî re di nava lihevdanê de ne û timî hewceyî wane, bandorgirtin û desthilanîn di nava hev de ne. Danehevên ku ji herdu navendan digirin, di reseniya xwe de diparêzên û şêwe didin bîrdoziya nû. Di bingeha dîrokî ya rastiya ëbranî yan jî ësrail de, ev bîrdozî heye. Dijberîya ëbraniyan ya li hember sazûmana koledarî, lêbelê bêhêziya wan ya ku nikarin ji bin bandora wê derkevin, wê timî zorê li wan û nûjenîyan bike. Bi danûstandinên ku bi şaristaniyê re dike, lawaziya xwe telafî dike. Di vê pêşveçûna şaristaniyê de, xetekê temsîl dike. Digel ku êsa ji kevneşopiya Yehûda derketîye holê jî, cemsêra (qutb) li hember temsîl dike. Çawa ku Brahîm di kevneşopiya Nemrûdên Babilî de gihîştîye û di bingeha hemberî wan de ber bi olekî nû ve çûye, êsa jî bi Roma koledar re bûye yek û ji cihûtiya pêşgo ya fermî ku ji cîhana hejaran qut, veqetîya ye. Ev rewşa wî, di heman demê de wî ber bi şikandina dorpêça qewm ve jî dibe. Di vî babetî de, cîhana Roma ku sazûmaneke gerdûnî damezrandîye, zemîneke daringî çêkiriye û roleke berbiçav listîye. Giregirên qebîle û qewman yên raser, hejmeke Roma dibin û pê re dikevîne hevkarîyê, ji aliyê din ve, qismên hejar jî, bi pîrsgirêkên wî re dihêlin. Ev weke zemîneke

enternasyonel e. Derketna ësa, weke wijdanê cihana koletiya Roma, bilind dibe. Eynî weke sosyalistên ku li hember kapitalîzmê bi angaştâ parastina berjewendiyên karkeran derketine holê. ësa li hember sazûmana koledar hê bêhtir, serhildana bîrdoziyî û ya civakî îfade dike. Têgihîna xwedayê sêbareyî hê ne daketiye yek xwedayî, hê jî di bin bandora Sumer û Misrê de û heta di bin bandora neolîtîkê de ye. Yehovayê xwedayê qewm, bi vê şêweye derbas dike. Ew şensê wî tine ku di nasnameya xwedayê qewm de, zêde vebe. Pêşgoyên cihû jî zû de ev şensê wî bi aweyekî hişk girêdane. Ola ësa olekî rizgarker e. Koledariya Roma zordariyeke wisa liser wijdanê mirovatiyê kiriye ku baweriya Mesîh (rizgarker) timî hê ësa nebûyî, zemîneke bîrdoziyî qezenc kiriye. Bendewariya ha hat ha wexte were, timî û zindî ye. Sê çavkaniyên baweriya Rojhilata Navîn, li Qudsê di yek poteyê de dihelin. Kevneşopiya cihû jixwe kok berdaye. Piştî Skender kevneşopiya Helen, di navbera Grek û Cihûyan de civakekî bihêz afirandiye. Kevneşopiya Pers-Zerdeşt jî, ji mêjde bandora xwe li herêmê daniye. Dem dema terîqetên mîstîke. tevgereke wijdan ya ku çêdibe û tê ye. Sazûmana Roma ya gerdunî û serdst, zorê li sazûmana gerdûniya bindestan dike. Roma sazûmanên qebîleyan û qerentiyên piçûk perçedike, bi xwe ve girêdide û bi şûn xwe ve komên mirovên ku bi serê xwe dimînin dihêle. Mirovatî li xwediye xwe, li xwedayê xwe yê nû digere. Esasê wê nasnameya ësa, jî çavkaniya vê zemînê tê. Behre yên wî yên takeksî ne girîng in. Bendewariya demê ye Mesîh, yê wî hilde asta berdevkê xwe. Ev bilindbûnê bîrdoziyî ku bi navê xiristiyanî gerdûnî dibe, wê nava Roma bikoje. ësewîtî li hember bêwijdaniya mezin, wê bizanibe bibe wijdanê mirovatiyê yê nû. Belkî jî yekem car partiyeke mirovahiyê ya gerdûnî, pêşvedîçe. Piştî sêsed salan, ev partî yê Roma ji nava wê ve zebt bike (bi fetihîne). Tiştâ ku pêktê, esasê wê şoreşeke bêxîne. Hê rastir zayîna şaristaniya feodal ya ku herka peresînê, rê li ber vekiriye. Şerê baweriyê wê di serî de û cudabûna jiyana civakî, vê dawiyê vediguhere hêza siyasi.

Dema ku piştî zayîne di 325an de, weke ola fermî hat îlankirin, eslê wê di wesfê şaristaniya Roma de, guherînên girîng çêdibin. Bajarên koledar hildiweşin, vegera ber bi qadên gundewarî ve pêktê û jibo mirovatiyê, şêweyeke têkiliyê ya nû, weke nermbûneke koletiyê, saziya serftiyê şêwe digire. Şoreşa nû ya ku di warê çandinî de pêkhatiye, ne vegereke li neolîtîkê ye. Bi taybetî şewegirtina şaristaniyeke nûye ku liser teknîka hesin, bilind dibe û mirov hê bêhtir bi jiyne ve girêdide. Jixwe êmperatorên Roma, di demên xwe yên dawî de, navê xweda-qeran terikandine. Bêşik di vê de, para propaganda ya yek xweda û olekî ku dibêje mirov nabe xweda, roleke mezin dilîze. ædî xweda di bin kemna têgînên olî û yên felsefî de, qenc û qenc ber bi ezmên hatiye dehefandin. Li vir yên ku dixwazin cih lê teng bikin, împeratorê serdest e. Çiqas ku xweda ji mirov dûr bête girtin, ewqasî azadî tê bi destxistin. Ji aliyê din ve, dema ku ev li hember xwedayê fermî tene kirin, gnostîk û mîstîk, xwe li têgihîna xwedayê neolîtîkê yê ku dostê mirov, digirin. Têgihîna "Enel heq, ez xweda me, di xwedê de bûme yek", eslê wê li hember temsîla politîka fermî, xwedî lê derketina tebeqeya binî ya li kevneşopiya olê xwe yê kevn e. Li şûna xwedayê ku xerîbî mirov, serdestiyê lê dike û ciza dike, ev têgihîna ku xwe bi xwedayê xwe re dike yek, di serî de bi ësa re jî, bi şêweya "lawê xwedê" didomîne. Bi wateyeke din, ew jî mîstîkeke, gnostîk e. Vê dawiyê bi felsefeya Eflatûn û Arîsto, ev têgihîna yê bê guherandin. Ya girîng ev e ku di kesayetiya ësa de, çîqa ku diçe bi şêweyeke gerdûnî, meyldariya hemû hejaran, li poteyekê tê ser hev û rê li ber şaristaniyeke di asta raser de tê vekirin, rizgarbûneke bisînor tê pêkanîn.

Di şewegirtina şaristaniya feodal de, mîsoger e ku xiristiyanîyê roleke dîrokî lîstiyê. Xiristiyanîyê di warê bawerî û sinc de, di qedera mirovan de, rêyeke kûr vekiriye, di derbaskirina cihana koledarî de, fedekariyên mezin kirine û di bin êş û azaran de, serdema navîn amade kiriye.

Ev rastiyeke ku xiristiyanên pêşî, weke bizaveke bîrdoziya saf, hereket kirine û demeke dirêj, ji zimanê siyasat û şidetê dûr mane. Jiyana wan ya xelwetxane û dêrê ya pevrayî û bi çileyê ve girêdayî, eynî weke sazûmana rahîbên Sumer ya perestgehê ku koledarî derandibû holê, rola xwe lîstiyê. Ev heyîn bûne dibistanên jiyana alternatîf û desthilatiyê ya ku amade kirine û civaka nû di wan de şêwe girtiye. Xelwetxane û dêr ji cihê perestîne bêhtir, cihên perwerde û rêvebirina civaka nû ne. Ev berdeyamê nimûnekên Sumer in. Jiberku di têkiliyên desthilatiya Roma de dijîn, di nava pêvajoyê de, gelekî jê bandor girtine. Ew saftiya xwe ya di destpêkê de, winda kirine, çîqa ku çûye ew jî şibiyane Roma. Bandorgirtin û bizivîn, beremberî hev in. Berhema derketî holê sentezek e.

Di biryargeha şaristaniya koledar ya Rojhilat de, bûyereke mîna ya ësa, di kesayetiya Manî yê Mezopotamyayî de, tê dîtin. Tê zanîn ku Manî, xwestiyê çandên Helenîzm, Zerdeştî û Xiristiyanîyê, di sentezeke rasertir de bike yek, di vî warî de gelekî pêşketiye. Manî yê ku PZ di sala 216an de, bi xanedaniya Sasanî re zayî, heger ku bikariba çîna rahîbên paşverû derbas bikira, belkî împeratoriya Sasanî heta bi Roma vedabana. Manîtî, ji dogmayên ola yek xweda cudatir, dikarîbû bibe bizaveke ku bişibe Ronansa Ewropa. Dikarîbû jibo Rojhilata Navîn, zûka rê li ber şaristaniyeke bi şêweya

ya Ewropa veke. Zayîna zû, kevneşopiya dewleta koledar ya bihêz û rahîbên fermî yê Zerdeşt Kartiran ku weke pêşgoyên Cihû pašverû, rê nedane vê yekê. Şensê hereketê yê desthilatîyê tine kirin û sepînên stemkarî pêkanîn. Ev kevneperestiya bîrdoziyî ya di împeratoriye de, ne xwedî şense ku li hember Bîzans îslamtiya ku yê niha bize, xwe ji piyan bigire. Binyata bîrdoziya pašverû, împeratoriya herî bihêz, bê liv dihêle û bi dev qedera ku bi çend derbeyên hêrîşê re bi mire ve, berdide.

Nasnameyên bîrdoziyî ku di pêsîra koledariyê de şewe digirin, tê dîtin ku weke beşên (baskên)pêşek yê şerê sazûmanê, rolê dilizin. Serhildana bîrûbawerî û wijdana li hember sazûmanê, pêşdatir dibe û çîqa ku bigirse dibe, şensê wê çêdibe ku nûjeniyê biafirîne. Piştî gelek şerên pêşeng, an sazûmana pêşiya xwe hildiweşîne, yan jî vediguherîne û berdest dike. Lêbelê hêza xiristiyanîyê hê hemû telpên (durdî) koledariyê paqij nekirin, îslamiyet derdikeve holê. Belkî jî, xiristiyanî bi serê xwe têrê nake. Veguherîneke tundraw (radîkal), rêberiyêke bîrdoziyî ya kûr û pratîk dixwaze. Êslamiyet jî weke xiristiyanîyê, bi awayekî dereng mayî, di şopa olên yek xweda de, bi taybetî di bin bandora rahîbên nastorî yê Asûr û qebîleyên cihûyan de dimîne, weke teqîneke dawî ya erebên bedewî, şewe digire. Di kesayetiya Muhemed de, pêxemberê xwe yê dawî afirandiye û weke qiraseyekî dîrokê ya bihêz rola xwe lîstiyê.

Dahûrandina bîrdoziya îslamê, ne tenê jibo wateya wê, jibo dahûrandina civakên îslamê yê roja me jî, girîng e. Hê jî nayê zanîn bê îslamiyê kesayetiyeke çawa afirandiye. îslamtî hê bêhtir weke ku aliyên wê yê leşkerî zêdetir û weke olekî biçalakî tê ravekirin, nasnameya wî ya bîrdoziyî û civakî, di tarîtiyê de dimîne. Çiqas ku berevajî vê yekê jî bête îdîakirin, îslamtî hê jî mamike (muema). Him ji aliyê olî ve û him jî ji yê siyasî ve, eshiya wî ne hatiye dahûrandin. Rûyên wê yê ronahî û tarî, wisa ketine nava hev ku bi rastî jî, weke ola dawî û pêxemberê dawî, tê wateya serdema olî ya dawî. Berevajî ku tê îdîakirin, wesfê wê yê olî û yek xwedaya wê, di rewşeke lawaz de, kemneke bîrdoziyî ye, lêbelê hê bêhtir weke olekî ku aliyên wî yê leşkerî û siyasî serdestir, berbiçav dibe.

Êslamtî, weke bîrdoziya merhaleya sêyemîn a veguherîna mîtolojiya Sumer, xwedî taybetiya pir tebeqeyî ye. Digel hemû hewldanên sifît ên Hz Muhemed jî, ev mîtolojî û du olên mezin ku ji vê mîtolojiyê sîd wergirtine, derbasnake û kirmişîna wî ya nasnameyêke din, bisînor dimîne. Lêbelê dîsa nayê înkarkirin ku veguherîneke ne piçûk pêkaniye.

Weke pêşevaniya bîrdoziyî ya serdema feodal, şopandina têtîna ola yek xweda û xwedê ya ji nêzîk ve, dahûrandina wateya wan ya civakî, liqasî dema ku zayîne, girîng e. Jibo ronahîbûna Rojhilata Navîn û zayîneke nûjen, divê ku ev betona têtînan bê perçekirin û kerese rast werine bikaranîn.

B- Êslamtiya wek hêza şoreşger ya serdema feodal

Êslamtî liqasî di pilana dîrokî de, bi rojaneyî jî, mijareke bingeh ya gengeşiya teorîk û pratîk û bûyera ye. Sedema vê yekê, liqasî nedahûrandina rastiyên ku Êslamtî tîne zimên, ewqas jî ji ber nasnameyêke bîrdoziyî ya ku mirov têr bike naxe dewesê an jî ne veguherîneke Ligor serdemê ye. Di zayîna xwe de jî îslamiyê wate ne dîtîye. Hz Muhamed, şerê xwe yê ku divê ji nêzîk ve fêhm bike, weke "Li hember nezaniyê" îlan dike. Nezaniya ku behsa wê dike, bîrdoziya bavkanî ya qebîleyê ye. Ev mijareke girîng e. Mûsa derketina xwe ya ola yek xweda, jibo ku qebîleyên ëbranî bike yek, pêktîne. Hz Muhamed hewl dide ku jihevbiçe. Ev hewldaneke ku civaka qebîleyê derbas bike ye. Qebîletî kartêkerekê bingeh e ku li pêşya bihêzbûn û şaristanîbûnêdibe asteng. Li Kabeyê, nasnameyên bîrdoziyî yê cuda ku bi 360 pûtên piçûk û sê-çareke mezin têne temsîlkirin, hene. Heta ev bûyera ku liser bîrûbaweriyê pelax bûyî neyête derbaskirin, pêşketin gengaz nabe. Bûyera girîng ya duyemîn, rewşa Mekkeyê ya ku navendeke bazirganiyê ya girîng e. Bajar hebûna xwe liser bazirganiyê dibîne. Çawa bête gotin ku şaristaniya Misir û Sumer diyariyêke Nîl, Dîcle û Ferad bin, îslamtî jî li Erebaştanê, diyariyêke bazirganiya navenda Mekkeyê ye. Esasê wê kevneşopiya ëbranî berhema bazirganiya ku di navbera navendên şaristaniyan de pêşvedîçe ye. Hê ji dema ku em serdestiya cihûyan ya di bazirganî û finansmana cîhanê de, li ber çavan bigirin, rola bazirganiya mezin ya di pêşveçûna şaristaniyê de, yê xweş bê fêhmkirin.

Di derketina Hz Muhamed de, rola bazirganiya şaristanîker û rageşiya (tansiyon) qebîleyan ya hoveber û kevneperest, zemîna civakî yê bingehîn ne. Aliyek pêşveçûn û şaristanîbûnê pêwîst dike, aliyê din jî, hişk û bêşûd dike, di nava levdanên qebîleyan de, rê li ber rizîn û paşveçûyîninê vedike. Hz Muhamed hay ji sê navendên mezin yê şaristaniyê heye. Li Bakur Roma ya Rojhilat a bi şeml, bilindbûna Bîzans, li Rojhilat Sasaniyên bihêz, li Rojhilatê Afrîka Hebeşistan timî çavkaniya bestê ye. Muhamed bixwe, gelek caran bi karwanên bazirganiyê re, di navbera Mekke, Şam û Qudsê de çûye û hatiye. Di rê de ji rahîbên xiristiyan, taybet ji rahîbên Asûrî-Nastorî hînî gelek tiştan dibe. Qebîleyên cihû, li bin serê wî ne. Baweriya ola qewmê Cihûyan Yehova, ji nêzîk ve nas dike. Li

Mekkeyê bixwe, Hanîfiyên ji koka Sabî, weke terîqetêke gnostîk û mîstîk, propagandaya olê yek xweda dikin. Æsa çawa ji terîqeta Essenîyan sûd wergirtibe, tê zanîn ku Muhemed jî, ji Henîfiyan sûd wergirtiye. Ne zor e ku tÊgînên Zerdeşt, ji kevneşopiya rahîbên Sasanî bihîstibin. Di derketina Hz Muhamed de, Xiristiyanî, Mûsewîti û Zerdeştî, di derawayê bîrdoziya fermî de ne. Her sê jî nasnameyên bîrdoziyî ne ku gihane serdestiyê. Xwedayên Kabe yên li bin serê wî jî, hindik gelek nasnameyên menewî yên qebîleyan ne. Ev dorpêça bîrdoziyî ya ji çar aliyan ve, bêhtir rê li ber tÊkilbûna henîfiyên mîstîk vedike. Bizava ku nû çêdibe, di rewşa bizaveke nû ya gnostîk (yên wedê dizanin) de ye. Ji berî zayîne sed sala 5an ve, li erdnîgariya Rojhilata Navîn, minakên bi vî rengî, tÊne dîtin. Gnostîzm navekî terîqetî ye ku ji bîrdoziya koledarî û ji ol veqetiyaye, piçûk e lê ji aliyê wijdan ve azad e.

Dema dîrokî, merhaleyekî derbasbûyinê ye ku veguherîna ji koledarî, ber bi feodalîzmê bilez bûye. Eynî weke dema ku li Ewropa feodalîzm, veguheriye kapîtalîzmê. Qebîleyên ereban yên çolê, di dema xwe ya bêhêz de, wisa hostane ku bi ceribandin û ezmûnan, şaristaniyên dora xwe yên bişeml, bi dest xistine. Dema berîtir, qebîleyên semîtik yên ku ji heman binyatê tÊn, carna bi armanca talankirinê û carna jî weke niv koleyan, hêrîş dikirin navendên şaristaniya Sumer û Misrê. Ji van qebîleyan minakên pêşî yên li Sumer, Akadî bûn û yên li Misrê jî ëbranî bûn. Dîsa ji binyata Semîtik, di bin navê Ereb (rind) de, li ber pêngaveke dîrokê ne. Dema ku dîrok dibêje wan "Bi meşe, tê qezenc bike" ye.

Dahûrandina tÊgîna "xwedê" ya ku Hz Muhemed liser pêngaveke dîrokî ya herî mezin avêtî, pîrsgirêkeke herî mezin e. Digel ku diyarkirina zemîna daringî girîng e jî, ya zortir, dahûrandina xwedayê ku tÊgîna bîrdoziyî ya bingehîn e. Herçiqas ku bizavên teolojî û felsefê yên cur bi cur, hewldana ku xwedê terîf bikin jî, mirov nikare bibêje ku nirxên van yê zanistî bi tÊrayî ye, dahûrandina vÊ tÊgîne ya civaknasî, ne hatiye çêkirin.

Ligor daneyên bisînor yên berdest, "El" (giyan) tÊgîneke xwedê ya ji jêzaya Semîtik e. Bi texmînî, piştî merhaleya ola totemîk yên qebîleyan, sêwiraneke ku di bin bandora şaristaniyê de pêşvebirine û tÊ wateya xwedayê mezin yê ezmên. Li her deverên nivgirava Erebaştanê, di devokên cuda de, bi aweyekî cihêreng tÊ gotin. Dikare bête gotin, dema ku di nava civaka qebîleyê de cudatî zêde bû, saziya şêxîtiyê şêwe digire, rêvebiriyêke xwezayî ya yekaheng, derbasdar dibe, di rastênheva (paralel) qebîle=şêx, xweza=el de, weke nasnameyêke bingehîn ya bîrdoziyî bi tÊgîn bûye. Ramana ku el mîna xwediyê sazûmana xwezayê tÊ dîtin, li dema peresîna qebîleyan rast tÊ. Çawa xwediyê qebîleyê şêx be, xwediyê xwezayê jî el, ango xweda ye. Şêx jibo qebîleyê, him serokê menewî û him jî yê polîtîk e. Hêza qebîleyê ku zêde dibe, di raye û hêza şêx de vedide. Ew qeranekî hoveber e. Şêx çawa xwe ser qebîleyê re û mîna xwediyê wê dibîne, xwedê jî di ser xwezayê re ye û xwediyê wê ye. Herdu tÊgîn nûka pêşveçûne û girîng in. Tiştê mezin, bi "El" re tÊ beremberkirin. Di merhaleya ku qebîle ji xişokiyê û ji girêdana zêde ya bi xwezayê ve rizgar bûyî, digihîje mercên ewlekartir û azadtir, bi cudabûnê re, tÊkiliyên ser û bin çêdibin, yê ser di heman demê de, rola xwedîtî û serdestiyê digire ser xwe, di merhaleyê de, baweriya totemîk lawaz dibe, xweza bi navê erd û ezmandibe du şiq û tÊ sêwirandin ku "El" serdestiyê li erdê (şêx çawa serdestiyê li qebîleyê dike) dike, weke xwedayekî nû tÊ tÊgînkirin.

Digel navê xwedê yê mezinatiyê, nêve din yê girîng xwedîtî û serwerî ye. Malîk, melîk ji jêzaya "milk" hatine çêkirin. Milkîyê tÊ wateya xwedîtîyê. Malîk û melîk, di hemû zimanên Semîtik de, tÊne wateya milkîyê, di şêxîtiya qebîleyê de, bi wateya qerantiyê, heta bi melîkiyê bi wate dibe. Mezinatî û melîkiya di qebîleyê de, di tÊkiliya erd û ezmên de, werdigere şêweya xwedayê xwediyê erd û ezman.

Ramana ku hê di serî de "El" weke yek xweda dibîne, bi yekahengiya çolê ve girêdayî ye. Xwedayê Semîtik, vedana tÊkiliya şêx û qebîleyê ya liser tÊkiliya erd û ezmêne. TÊgîneke wiha rastênhevî, raveker e. Ev mîsogere ku di navbera wan de, girêdaneke hişk heye. Di civakên Misir, Sumer, Grek û Hindê de, yên ku gelek hêzên ku serdestiyê li jiyane dikin di nav wan de hene, pîr xwedayî bingeh e. Dema ku desthilatiya siyasî navendî dibe, nûka digihine tÊgîna yek xweda.

Xwedayê ku sêwiraneke nivgirava Erebaştanê ye, BZ ji salên 2000an pêde, weke nasnameyêke bîrdoziyî, di bîrûbaweriya hemû qebîleyên Semîtik de, cihê xwe çêdike. Esasê wê ev nasnameya ku ji cudabûna di nava qebîleyan de û ji sazûmana xwezayê ya yekaheng îlam (Best) digire tÊ, bilin dibe, belav dibe û bihêz dibe, asta pêşveçûna qebîleyan jî diyar dike. Li erdnîgariya Rojhilata Navîn û hemû welatên ëslamê, weke tÊgîna bingehîn, dîtina xwedê ya ji nêzik ve, wê gelekî sûdmend be. Berî her tiştî, zanîna hêza tÊgînan pêwîst e. Di merhaleya zaroktiya mirovatiyê de, tÊgînên nû weke ku rastî bixwe bin, xwedî wateyêke hîkarîker in. Weke ku tÊgîn û rastî yekbin tÊ tÊgîhiştin, tÊgîn dikeve şûna rastiyê. Heta feylesofekî mîna Eflatûn jî, weke heyîna bingehîn, pêşekî dide cîhana

"îdea"yan. Cîhana daringî, di nîrxê siyeke ku hesan û bi xeyalan bê bîranîn, wate digire. Sedema vê yekê ya bîngêhîn, pêşveçûna têngihîştina mirovan û ya bîhêzbûna mantiqê wan e. Hêza wateyeke bi vî rengî, bûyereke nû ye û pir xweşik tê dîtin. Serdema wateyê dest pêkiriye. Mêjî berhem dide. Sêwiranên yek xweda û şeweya ramana felsefê, hêza wateya xwe hildane bandevê. Bi vê yekê mirovatî di serdema xortyaniya xwe de ye. Kîjan têngîn berhevkar be, pêkhêner û di ravekirinê de kêrhatî be, ew têngîn dibe zemîna wateyeke xwedayî yan jî erkeke felsefî. Hilberîna tênginan û bikaranîna wan ya pratîkê, peywira bîngêhîn a rahîb û feylesofên ku nû derdikevine holê ye. Têngîneke herî bikêrhatî ku rê li ber yekbûn û bîhêzbûna civakê vedike, erka malekî herî bi qedir û amûra veguherînê dibîne.

Mirovatî bi şaristanîbûnê re, serdema herî rewneqdar ya bi têngînbûna zimên û pêşveçûna aqil, diji. Bi wateyeke din şaristanî, çalakiya cudabûna têngînen bîngêhîn û bûyerên ku vedide û bicîhkirina wan ya li bîriya civakê ye. Bi gelemperî em bibêjin, pêşveçûna civakî, bi pêşveçûna asta zimên û têngîne re dimeşe. Rastiya zimên û rastiya aqil ya têngihan (entelekt), bûyera xwe navandina civakê, ji xwe haydarbûnê û meşandina ji nû ve ya hilberîna bi hişmendî ye. Civak, bê aqil û bê têngihan xwe ji nû ve na hilberîne, encex di asta ajalan de bi mîne û tenê bi awayekî dozînî (navajoyî), xwe zêde bike. Civakbûn û meş, encex bi zimên û aqil gengaz be. Civakeke ku ziman û aqil winda kiribe, xilas dibe an jî dibe tiştêkî din. Herwiha tiştê jîbo civakeke bîngêh ev e ku ji weke ajalekî heyîna xwe ya daringî bidomîne zêdetir, bi hêza zimên û aqil, bigîhe bîriya civakî, kevneşopiyê, ol, felsefê, zanistê û pêşveçûna bîrûbaweriya ku rê li ber vê zincîrê veke. Ol û têngîn, kevîrên bîngêhîn yên pêşveçûna bîrûbawerî û bîriya civakê ne. Bi bê xwedîbûna van kevîran, ti çalakiyên civakî nayêne avakirin. Ji aboriyê heta bi polîtîkayê, çêbûna hemû saziyan û meşa wan, bi zimên, têngîn û bi van ve girêdayî bi hêza raman, gengaz e. Ev hêza raman, bi şeweya kevneşopiyê, weke bîriya civakê bi şeweya tore û helwesta sincî, weke saziya bîngêh, zagon û nîrxê ku herî pêşî heyîn, qezenc kiriye. Sêwirana jîbo pêşedemê, utopya û bi şeweya xeyalan, nîrxekî balkêş qezenc dike. Olê civakê him Jiberku weke kevneşopî û sinc bîriya derbasbûyî, him jî jîbo ku hêviya pêşedem û xeyalê, digire nava xwe, utopya bîngêh temsîl dike, herwiha ji destpêkê ve weke saziya civakê ya bîngêhîn, cîhekî girîng digire. Di navbera ol û civakê de, girêdaneke jîyanî diyalektîkê, dabaşa xeberdanêye. Wateye civaknasiya bîngêh wiha ye.

Dema ku em têngînkirinên olî bi vê naverokê binîrxînin, yê derkeve holê ku ev hêza civakê yên wateyî ne. Heger em bi têngîhîneke materyalist ya bêteşe mijarê bi şeweya "ol sefsete ye, xweda tine" bînin ziman, gelekî xeternak e û heger em bibêjin "xweda wiha ye, li vir e" ev jî sefsete ye û îfadeyeke li derî zanistîye. Ya rast ev e ku gelo ol di rastiya civakî de çi rolê dileyîze, hêzek û saziyeke çawa derandiye holê. Vê dawiyê pîrsa "çi gerdûnê rêvedibe" ku hatiye pêşxistin, mijareke ku felsefeya ol têngildar dike ye. Dema ku bête merhaleya zanistiyê, bersivên ku bidine van pîrsan, wê di şeweya zagonên zanistê de bin. Ev pêvajoyên ku hev û din derdixin holê ne. Pêşveçûnên van wateyan, heta hetayê wê bidomin. Esas paşverûtî, kevneperestî û sefsete ev e ku asta wateye demê, weke rast dipejirandin û bizorê li herkesî dikirine bar. Digel ku ji vê yekê dogmatîzma ol derdiket, pêvajoya engîzîsyonê jî, encama xwezayî ya vê têngîhîne ye. Di civakê de înkareke bêteşe ya bûyera ol, pêvajoyên wiha weke dijberiyekê xweyî dike û erkeke neyînî pêktîne. Bilindbûna civaknasiyê ya qata zanistê, encex bi bersivdayîna wate û sazîbûn çawa derketine holê, kîjan erkê bi cîh tînin û xwedî hêzeke bi çi rengîne, yê gengaz bibe.

Têngînbûna xwedê jî, saziyeke civakê ya herî bîngêhîn e ku di vê çarçovê de derketiye holê, timî pêşve diçe û bîhêz dibe. Sumer û Misir nêzikî vê têngîne bûne. Di zerdeştîtiyê de jî, pêşveçûneke wiha tê çavdêrîkirin. Çiqas ku di civakê de navendîbûna hêzê pêşvedîçe, di têngînen ol yên ku şeweyên ramanê yên bîngêhîn de, ber bi yekîtiya xwedê, ber bi tewhîdê ve pêşveçûn pêktê. Jiberku şeweya ramanê ya dema ol e, pêşveçûnên di tênginan de, herî dawî bi yek xwedayî bi encam dibe. Digihine formula li erdê qeran, li ezman xweda.

Dema ku li nîvgirava Erebaştan, yekxwedayîbûn çêdibe, bi "Allah" bitêngîn dibe, esasê wê gelek bûyerên civakî yên girîng, bi xwe re hildigire. Digel ev têngîna ku berî her tiştî ji kevneşopîya Sumer û Misir hatiye, xwedî dijberî û aliyekî xwe yê reseneye jî. Di çanda Sumer û Misrê de, têngeliya (terkîb) mirov û xwedê heye. Nemrûd û Firewn xwe weke xweda-qeran îlan kirine, koletiya serdema pêşî, weke xweda-qeranan birêvebirine. Ligor ku ji piramidên û tîrbên sumeriyan jî tê çespendin, beniyên wan weke vesera (îlawe) wane. Dema ku xweda-qeran dimirin, benî jî mirî tînen hesibandin û pê re bi awayekî zindî tînen binaxkirin. Ev rewşeke bi teror e. Dîtina çareseriyekî, peywira mirovatîyê ya herî bîngêh e. Belkî têngîna pîroz ya mirovatîyê ya herî domdirêj, şerê bîrdoziyî ye. Li hemberî xweda-qeranan ku xwe pîrozwer dibînine. Mezinatiya Hz Brahîm ku weke kalîkê hemû olên pîrozwer tê dîtin, ji vê taybetiya wî tê, wiha tê ferzkirin. Çalakiya Hz Brahîm ku

pût şkandin, esasê wê derbeya mirinê ya li têngîna xweda-qeran e, ji ber vê yekê timî tê pîrozkirin. Lewra pêşlêgirtina ku bi awayekî zindî diketine tirbê, encex bi serkeftina helwesteke wiha gengaz dibû. Hê jî li dora Rihayê, mêr çî bi jinê bike, bi gotineke wiha "mêr e, hezar caran jî bike tolaz e" ku rewa tê dîtin, lêbelê dema ku keçîk bi çavekî daxwazî dinêre, ligor toreyê, malbata wê fermana mirina wê dide, ev bermayineke dawî ya zagonên Nemrûd e. Kevneşopiyeye pênc hezar salan, têngîna xweda-qeranan serdestiya xwe pêktîne, helwesteke mirov a xwezayî, bi veşartina tirbê, tawanbar dike. Herwiha Hz Brahîm belaş li vê axê ne hatiye cîhanê. Tiştê ew daye zayîn, zagonên marîjokan yên têngîninên benîtiyê ku jî dema Sumer û Misir, belkî jî ji demên kevintir tên. Bilindkirina xwedê ya ku bi Hz Brahîm re dikine yek, bi vê zagona hoveber ku ne derbasdar kirî ve girêdayî ye. Taybetiya yekem, rêzika "mirov nabe xweda" ye. Di kevneşopiya Brahîm de, hewl hatine dayîn ku erdnîgarî û cudabûna heyîninên qebîleyan yên civakî û têtikiliya wan ya bi têngîna xwedê re, were dahûrandin. Lêbelê wateya wî û aliyê wî yê resene, dijberiya wî ya li hember têngîna xweda û olê Misir û Sumer e. Dema ku dibêje mirov nabin xweda, eslê wê dibêje Firewn û Nemrûd nabine xweda û nirxê vê yê bîrdoziyî, gelekî bilinde. Çalakî an jî şoreşa Brahîm ya pût şkandinê, nirxê wateye xwe yê herî mezin, di vê naverokê de dibîne. Derbasbûyîna serdema yekgirtina Nemrûd û Firewn a bi xwedê re, diqîre. Xwedayê ku di têngîna Brahîm de bilind dibe, bi vê naverokê derbeyeke girîng li koletiya teqez dixê. Gelekî pêşverû û azadîkere. ædî ev wê bi Hz Mûsa re, bêhtir berbiçav bibê. Dema ku weke xwedayê hemû qebîleyan, dengên "Allah" li hawîr dikine olan, ji aliyekî ve sazûmana xweda-qeranan, ji aliyê din ve dema totemîk ya qebîleyan ku gelekî paşverû bûyî, tê perçekirin û tê derbaskirin. Derûniya wî ya şoreşgeriya bilind, di vê yekê de ye û di dîrokê de cîhekî girîng digire. Xwedayê ku hatî bilindkirin û bihêzkirin, civaka bihêz ku asta azadiya wê pêşve diçeye. Bi sedsalan bi bangên "Allah! Allah!" çalakiyên hatine meşandin, şerên hatine kirin, heta bi merhaleyê paşverû û kevneperest, erka dirûşmeyên herî şoreşgerî dibînin. Di dema kapîtalîzmê de, gotinên "bijî lîberalîzm, bijî sosyalîzm, bijî netew" têne çî wateyê, di demên koledar û feodal de jî, gotina "ya Allah, xwedê yeke" têne wê wateyê. Dema ku dahûrandina civakî bête kûrkin, çespendina rastiya di bin van dirûşmeyan de, ne zor e. Duristiyeke ketûber ya zanistî, besî vê yekê ye.

Di bilindkirina xwedê de, vawêrkirina (cudakirin) sê beşan gengaz e. Dema yekem, bandorgirtina ji mîtolojiyên Sumer û Misrê û dema ku di pey totemên qebîleyan re hatiye. Têtikiliyên sift yên bazirganiyê û têtikiliyên mêtînghehbûnê yên di navbera du navendên şaristanî de, di qada bîrdoziyî de, veguherîna nasnameyî pêwîst dike. Xwedayê qebîleyan yê gelemperî "El", çîqa ku diçe girîngiyê qezenc dike û bi Hz Brahîm, pêngaveke dîrokî diavêje. Merhaleya duyemîn bi êsa tê çêkirin. Pêvajoya Mûsa ku veguheriyê ol û xwedayê qewm, digel ku di cihûtiyê de, heta bi qerantiyeke êbranî pêşveçûnek pêkaniye jî, eslê wê kevneşopiya Hz Brahîm, wê teqîna xwe bi êsa çêbike. Çawa ku koletiya Sumer û Misrê, bi Brahîm û Mûsa bersiveke dijber dîtibe, koletiya Greko-Romen jî, bi êsa dijberê xwe dîtibe. Brahîm û Mûsa weke serdestên qewmê xwe, xwedayê xwe bilind dikin, êsa jî, ji hemû bîndestên Roma re, şîroveya xwe dide pêş. Xwedayê êsa, di rewşa bavê wî de ye. Diyare ku jî vî alî ve, di bandora kevneşopiya Sumer de, gelekî maye. Xwedayê Babîl Mardûk, lawê Enkî yê xasûk û zana yê xwedayê Erîdû ye. Şopandina kevneşopiyekê li ber çava ye. Hemberê desthilatiya Sumer ya li Babîl, di kesayetiya Mardûk de, nasnameya bîrdoziyî qezenc dike. Êsa bi vê kevneşopiyê, hemberiya cîhana bîndestan û weke versiyoneke Qudsê ye. Dema ku em kevneşopiya Sumer bîngê bigirin, di serdema xwedayan de, ev wê merhaleya sêyemîn be. Ev merhale, olên yekxweda digire nav xwe. Xwedayên berê, bêhtir xwedayên bajar, qewm û yên herêman bûn, lêbelê Rabê (Rab=efendî) êsa weke xwedayê hemû mirovatiyê û yê erd û ezman tê bilindkirin. Gerdûniya ku weke dewleteke cîhanê, Roma rê li ber vekirî, bandoreke mezin li veguherîna di têngîna xwedê de kiriye. Vedana mercên dîrokiyê ya li qada menewî, careke din rê li ber merhaleyê dîrokî vekiriyê.

Êsa li hemberî pêkutiyê desthilatiya Roma ya liser bîrûbawerî û giyana mirov, bersiva bi kevneşopiya xwedê ye. Di vê kevneşopiyê de, merhaleyê nû temsîl dike ku aliyê wê yên wijdanî û sincî giran in, li hemû kesên bîndest xwedî derdikeve û deng li wan dike. Veqetîna ji xweda û olê qewmê Cihû yên kevneperest jî, temsîl dike. Bandorkirina wî ya evqasî mezin, bi heyîninên jêza û armancên wî ve girêdayî ye. Wijdanê mirovatiyê ku Roma bêhn lê çikandî, Bi êsa û bavê wî Rab yê ku li hember pêşgoyên cihû helwestên tundrew datînin û xwedê bilind dikin, vediguhere qutbûneke dîrokî, serhildan û mercên rizgariyê. Weke nasnameya bîrdoziyî ya zayînê (mîladî) nû û herî mezin, di dîrokê de cîhê xwe digire, dîrokeke nû dide destpêkirin.

Rabê êsa, ji ber sedema demê û mirovên ku xwe dispêrîna wan, ne qerantiya polîtîk, qerantiya giyan û sinc armanc digire. Jibo desthilatiya polîtîk, ne hêz û ne jî amadekariya wî heye. Lêbelê jibo qerantiya wijdan, dorhêl gelekî kêrhatiyê û berpêçûyin jênerêv dibe. Gelek nişet (şan, elamet) nişan

didin ku di destpêkê de esa, çavên xwe berdane qerantiya Qudsê. Lêbelê dema ku li hember vê yekê, li çarmixê tê dan, hereket pêwîst dibe ku bibe baweriyeye domdirêj û weke civateke sincî û civakî şêwe bigire. Eslê wê li hember pêşgoyiya fermî ya cihûyan, serhildanek dabaşa xeberdanê ye. Hevkariya pêşgoyan ya bi Roma re û bêesilbûna wan, rê li ber vê serhildanê vedike. esa bawer dike ku di destpêkê de, bi alîkariya girseyan, li Qudsê xwedî derkeve. Lêbelê ji duwazdeh hewariyên wî, Yehûda êskaryot xiyanetê lê dike û bi hêsanî wî dixwe destê wan. Waliyê Roma dixwaze ku wî serbest berde. Jiberku pêşgo berjewendiyên xwe di xetereyî de dibînin, bi helwesteke ji qeran bêhtir qeranperest, dikin ku li çarmixê tê dan. Heçku cizakirineke wiha çenebûna, ev çalakî ji serhildanekê wêdetir ne diçû. Lêbelê mercên berbiçav yên gihîştî û dayîna li çarmixê ya ku rê li ber hêrsrabûnê vekirî, dike ku olê di dîrokê de wê herî bihêz derdikeve holê. Bi gelemperî di dîrokê de, pêvajoyên wiha ku çirûskeke (çîk) piçûk êgir xurt dike, derdikeve pêşperî me. Dorhêleke ku çilo (pejik) lê gihabe hev, çirûskeke piçûk dikare rê li ber şewateke mezin veke. Di dayîna esa ya li çarmixê de, ev rol bi zêdekarî hatiye listin.

Ev rewşa eşewîtiyê ya saf ya di destpêkê de, di bin bandora bizavên felsefeya Grek de, bi taybetî bi felsefeya Eflatûn, yê bikeve rewşa teolojiyê. Têgihîna sêbareyîya xwedê (teslîs), bi gelek şîroveyan wê bête vekirin. Em dewsên van şîroveyan bêhtir di mîtolojiya Sumer de dibînin. Çi di mîtolojiya Enkî, çi di ya Babîl-Mardûk de, rasthatina li têgihîna xwedayê bav, xwedawenda dayîk û xweda lawê hê bihêztir, di asta têgihîna bingehîn de ye. Li pişt vê jî, sêbareya kalikê herî kevin, nevî yê ku temsîla kevneşopî û demê dike û law, heye. Şîroveyeye felsefî ya hemdemî Hegel pêşexistî ye. Ev şîroveya bi şeweya tez-antîtez-sentez, rêzika diyalektîka ku zagona çêbûna xwezayê ya bingehîn, tîne zimên. Birastî jî, di hemû çêbûn û bûyerên xwezayê de, ev zagon serdestiya xwe dide meşandin. Herêna ya di Zerdestiyê de jî, şeweya vê nêrîna ya pêşî ku jê haydar bûne ye. Di Zerdestiyê de, bi tez-antîtez-sentez bi dawî ne bûye. Di felsefeya Grek de, bi Herakleitos pêşvedîçe. Lê wateya xwe ya herî hemdem bi Hegel dibîne.

Vê dawiyê, di xiristiyantiyê de, rola ku dane ser milê Meryem balkêş e. Meryema Dayîk, ji xwedawend ênanna, ji Star gelekî dûr ketiye. Di vê de rola van heye ku di destana Babîl de, bi Mardûk re, xwedawenda dayîk Tîamat derbeyeke mirinê dixwe, ji aliyê din ve, bi Mûsa bi temamî di mal de tê asêkirin û dewsên dawî ku mabûn jî, winda dibin diçin.

Di vê pêvajoyê de, bitaybetî di kevneşopiya Semîtîk de, rêzikên civaka bavkanî yên hişk, dijayetiya wan li hember Iştara ku xwedawenda neolîtîk ya çiya, çandinî û rêzikên çanda wê ya daykanî, di dema Babîl de, derbaskirina bermayiyên xwedawenda çanda Sumer ve girêdayî ye. Lêbelê piştî vê demê, xwedawenda kevin êdî di mala xwe de, jineke dawênpak û hêmin e. Wekheviya wê ya bi xwedayan re li dera hanê, di wê rewşê de ye ku êdî nikaribe dengê xwe derbixe û rûyê xwe vebike. Hêdî hêdî xêliyê li xwe dipêçe, weke harema teqez ya mêrê bihêz dîl tê girtin. Mûsa, di kevneşopiya Brahîm de, ev hê bêhtir pêşexistiye. Kolebûna jinê ku li Erebaştanê hevkasî kûr, bi bûyera dîrokî ve girêdayî ye.

Meryema dayîka esa, di şeweyên kevneşopiyê yên herî kevin de, xwedawend e. Lêbelê winda kirina jinê ya statuyê, di dema zayîna esa de, ketiye pileyeye wisa ku tenê bûye amûra zayînê. Bi gelemperî ev wiha ye. Di navbera salên BZ 2000 û PZ 2000an de, dîroka jinê, bi pêşketina desthilatî û mijokatiya mêr ya bifend û xap, dîroka çîna herî li jêr e. Digel kolebûna mêr, ji ber taybetiya cîns, jin bi koletiyeye qatqatîtir tê mehkûmkirin. Di dema Babîl de, xwedawenda dayîk Tîamat, şerê ser bi ser dike, heta di dema Mûsa de, bi Marîam re, levdaneke bişidet pêktê. Marîam bi awayekî hêsan, serê xwe ji Mûsa re ne daniye.

Ti çalakiyên dayîka esa Meryem, tine ne. Rab pif kiriye wê jî zarok aniye. Wateya vê serdestiya mêr ya teqez e. Pifkirin tê wateya serdestiyê, vê yekê nîşane dike ku êdî rola jinê, tenê mezinkirina zarokê ya di ber sînga xwe de ye. Mijareke din ya girîng ev e ku dibêjin vê pifkirinê Rûh-ul Qûds (giyana pîroz), esasê wê hêza xwedayî ku pêwîst e di jinê de bête temsîlkirin tê şewşandin, di kesayetiya Meryema Dayîk de, ji jinê tê dizîn. Li nav Sumer ya ku li hemberî vê tê, xwedawenda dayîke. Esasê wê, girîngiyeye bîrdoziyî ya mezin ya vê mijarê heye. Rola vê nasnameya bîrdoziyî diyarkere ku di dema feodalîyê de, wê hê bêhtir çalakbûna jinê, ji holê rake. Ji wê rojê pêde, hemû Meryem, bédeng liser zarokên xwe digirîn, bi temamî bi mêrê xwe ve hatine girêdan, weke girtiyên ji mêjve ne. Digel ku têkiliya vê rewşê qet bi xwezayîya jinê re tine, girêdana wê ya bi serdestiya mêr ya siyasî re mîsoger e. Weke ku çawa demekê serdema xwedawendên dayîk serdest bû, di vê dema dîrokê ya biçîn û dewlet de jî, xwedayên mêr serdest in. Ev rastiya ku di kûraya dîrokê de, terkî tarîtiyê kirine û ji aliyê mêr ve, bi dirûtî weke têgihîna namûs û harem hatiye nixûmandin, encex yê bi têkoşîna azadî ku asta azadiya civakê bilind bike re, derkeve holê û bibe xwedî wate.

PZ ji sed sala 5an û pêde, xiristiyantiya ku bi destê bavên dêrê bûye xwedî wateyeke felsefî û teolojiya xwe damezrandiye, ev mîsoger e ku bûye nasnameyeke bîrdoziyî ya herî bihêz a serdema feodal. Ji vê demê û pêde ku dibe bîrdoziya dewletê, him weke hêzeke bîrdoziyî ya zayok ya serdema feodal, rola wê tê naskirin û him jî piştî têkoşîneke domdirêj ya bi Roma koledar re -gelek taybetiyên wê bi xwe digire û ji derûniya wekhevîxwazî ya destpêkê dûr dikeve- ku lihevhatinek pêkanîne, îfade dike. Ædî ne emperetoriya Roma imperetoriya koledar ya kevn e û ne jî xiristiyantî olo Æsa û hewariyên wî yên kevin ku wekhevîxwaz, saf û pîrozwer e.

Bi xiristiyaniyê, serdema ku dogmayên olî, li cîhana ramanê serdest dibin, destpêdike. Ji PZ sed sala 5an heta bi PZ sed sala 15an, nêzîkî hezar salan, bi şeweya serdestiya ramana olî, derbasdibe. Ji BZ sed sala 5an heta bi PZ sed sala 5an, di hezar salên ku derbasbûn de jî, hê bêhtir giraniya klasîkên felsefî yên mezin serdest e. Ev yek zelal e ku di vir de paşveçûneke mezin hatiye jiyandin. Sedema vê yeke ya sereke, jihevketina civaka bajêr û qezenckirina girîngiyê ya aboriya gundewariyê ye. Bajar civaka mezin bûyî û tevlihev îfade dike. Zorê li ramana beraqil (rasyonel) dike. Civaka gundewarî ku rêveberiyeye pêşveneçûyî û karbeşiyê pêdivî dibîne, civakeke teng û yekaheng e, ramaneke ji dogmatîzmê re vekirî, bi aboriyeye ku pêdivî bi rêveberiya takekesî û karbeşiyê nabîne re, dibe yek. Ev taybetiyên wê yên binyatî, zemîneke vekirî, ji dogmatîzma olî re pêşkêş dike. Gotina ku serdema navîn bi tarîbûnê binavdikin, ji vê rewşê tê. Serdema klasîk, birastî jî, di dîroka mirovatiyê de, dewsen payîdar hiştine. Di çêbûna serdema nû de, rola wê bingeh e. Hişyarbûna aqil û viyana mirov ya herî mezin, temsîl dike. Serdema ku dogmayên olî serdest, bendê li pêşiya jihevketina koledariyê çêdike, pêşiyê li paşdeçûyina wê digire û di amadekirina serdema nû de, rola girîng dilîze. Şikestineke ku pêşveçûna civaka bajêr ya gelekî zêde rê li ber vekirî, bi encameke ku li ber xwe nade û bi derize diqede. Herçiqas weke ku li neolîtîkê vedigerin tê xuyakirin jî, eslê wê rewş gelekî cuda ye. Neolîtîka ku koledarî derandiye holê, bi temamî hatiye derbaskirin. Çiqas ku civaka nû bi giranî ji qadên gundewarî pêkhatibin jî, ligor civaka koledar ji aliyê derûnî ve, hê pêşdetir e. Mirovatiyê kesayetiyeke wisa qezenc kiriye ku kesek careke din nikaribe wî li zincîra koletiyê bixe, bûye xwedî binyateke raman û mirûz (moral).

Di ketina serdema navîn de, mirov qet ne mirovên li pêşberî Sumer û Misrê ne. Herçiqas ku di bin serdestiya ol de jî bin, encex ji xwedayê li ezmên re, benîtiyê bike. Benîtiya ku ji xweda-qeranên erdê re, tê kirin, weke kufra herî mezin tê dîtin. Olan, mirov li hemberî koledariyê perwerde kirine û gihandine. Paşveçûn, hê bêhtir di hilweşîna bajaran û di lawazmayîna ramana beraqil de, xwe nîşan dide. Dîsa jî li van deran, demeke ku bajarên ji neolîtîkê pêşdatir hene, bajarên nû têne çêkirin û berhemên ramana beraqil, di pirtûkxaneyan de têne hilanîn, îfade dike. Dema ku ji nêzîk ve bê nêrîn, wê were fêhmkirin ku heta dev ji hêvotina (terbiye) serdema bawerî neyê berdan, gihîştina serdema nû gengaz nabe.

Ji aliyê derûnî ve, cîhan û dema ku bîrdoziya îslamê lê derketiye holê, wiha dikare were terîfkirin. Xiristiyaniyê herçiqas ku ji derûna xwe demanên mezin dabîn jî, emperetoriya Roma ya mezin, ji nava wê ve jihevxiyê û statuya ku bûye bîrdoziya Roma Rojhilat û Bîzans, bi dest xistiye. Li hember emperetoriya Pers-Sasanî, serdestiyê qezenc dike. Ev ola nû li Ewropa dikeve pêvajoyeke balavbûnê. Di bingeha olî de jî be, nêzîkbûnekê di navbera Rojhilat û Rojava de çêdike.

Wî çaxî rola îslamtiyê wê bibe çi? Jibo dîrokê nûjeniyeye yan dubareyî ye? Wê kîjan valahiyê dagire û wê rê li ber kîjan pêla şaristaniya nû veke? Wê vê hêzê di derketina xwe ya nûjenîxwaz de, an jî wê di zindîkirina hinek kevneşopiyan de bibîne? Tenê yê valahiyeke erdnîgarî dagire, an wê hêza ku şaristaniyeye kevin veguherîne temsîl bike? Bersivdana van pirsên jiyani, jibo terîfkirina îslamtiyê pir girîng e.

Em bilindbûna îslamtiyê ya di dîrokê de, bi bizava şoreşger tundra ya serdema şaristaniya feodal ve girêbidin, ev yek wê rastir be. Heger ku xiristiyantî xeta nûsazîparêz û peresanparêz ya feodalîzmê be, îslamtî jî, xeta wê ya şoreşger ya tundra e. Ji aliyê bîrdoziyî ve, xweş hatiye dîtin ku herdu jî, ji yek jêzayê ne. Incîl û Quran, çespînên vê yekê yê herî girîng in. Heger ku Ahda Kevin nebe, ramana Incîl û Quranê negengaz e. Lêbelê ku mîtolojiya Misrê jî nebe, sêwirana Tewrat û hemû Ahda Kevin jî gengaz nabe.

Ev yek wê çewtiyeye mezin be ku îslamtî weke şîroveyeke hêsan ya pirtûka pîroz (Ahda Nû û ya Kevin) bête dîtin. Liqasî ku bandor ji wan girtiye, divê bête zanîn ku reseniya serdema xwe jî bi îfadeyeye veguherî, derandiye holê. Ev rastiyeke nayê gengeşîkirin ku Hz Muhemed, kesayetiyeke şoreşger ya babetî serdeman, li ber çavan raxistiye. Dema ku bi her sê pêxemberên pêşî re (Brahîm, Mûsa, Æsa) bête hevberkirin, kesayetiyeke berbiçav e ku mantiq û viyana xwe hê bêhtir bihêz daniye holê, bi rêxistin kiriye û derbasî çalakiyan kiriye. Xeta xwe rast dike, bi hewldanên rêxistinî û çalakî, hê di saxîtiya xwe de, serdestî temamê nîvgirava Erebiistanê dibe. Ji vî alî ve, dikare bi Skender û

Lenîn re bête hevberkirin. Dema ku em ne bi dogmatîzma ol, bi têngihîna dîrok û civaka zanistî nêzik bibin, wê bi awayekî hîkarîker bête dîtin ku Hz Muhemed, bîrdozgerekî gelekî hînker û zilamekî siyaset û çalakiyê ye. Pêdiviya Hz Muhemed, bi nêrîn û nirxandina ku bi zirhê pîrozweriyê bête pêçan, tine ye. Kesek ji wanê herî li pêşî ku mafê wî yê zanistî, bê dayin. Pêşveçûna îslamê ya dogmatîk, ew mezin nekiriye, berevajî vê yekê weke yekî ku di dogmayên olî de xeniqîbe, nîşan daye.

Di şoreşa ji nûve zayîna (Ronesans) Rojhilata Navîn de, tiştê herî girîng û pêdivî ye bê kirin ev e ku Hz Muhemed, ji destê dogmatîkên dîrokî û rojane û ji destê zordestan (despot) bête rizgarkirin. Ev dîrok, dîroka ku liser navê wî dogma û sepînên van dogmayên ku berevajî kesayetîya wî, têne nîşandan e. Tiştê hatiye serê derdora wî ku ew bi Ehlîbeyt têne binavkirin, dema wefat dike ku sê rojan termê wî li erdê dimîne, tê çespendin bê çawa xiyaret, ji roja pêşî de di nava wêrekiyekê de ye. Bûyera Kerbelayê, tenê ne trajêdiyekî dîrokî ye, teqîna xiyaneta zûka ya di pêşîra îslamîyê de ye û hêza wê ya rastî ye. Mirov dikare vê mînak nîşan bide ku hê di pêvajoya zayîne de, xiyaneta hêrîşî wan nirxên ku pêdivîna pîrozwer bêne girtin dike, bê di pêvajoyên dîrokî yên pêş de, yê çawa rê li ber fanatîzm û hovîtiyekê vebike. Hişyarbûna zanistêke kêtûber bixwe jî, pêdivî dibîne ku dîrok û rastiya îslamê, ji nûve û ji hemû aliyan ve were dahûrandin. Heta ku ev bikilîsbûna bîrûbawerîya welatên îslamê û hemû Rojhilata Navîn ku bûye weke betonê, neyê ne qandin û paqijkirin, ne gengaze ku takekesê hemdem çêbibe. Laîkîtiyeke rast an jî nûjenparêzekî îslamê, li hember vê rastiye heger ku hişmendê rola xwe be û çî pêdivî be bike, yê bi wate bibe. Encex ev wê di giramgirîya kesayetîya Hz Muhemed de, wê wiha gengaz be ku ewê vê rastiye nabînin, ewên ku bîrûbaweriyê beton dikin, ew zordest û dogmatîkên weke Nemrûd û Firewnên hemdem ku pêkutiyê qatbiqat dikin, werine derbaskirin.

Liser pêdiviya vê giramgiriyê û girêdana bi wan kesên ku heta îro ked dane vê rêyê, emê tevkarîyên xwe jibo dahûrandina îslamîyê bidomînin.

1- Têgîna bingeş ya ku pêşî divê bête ronahîkirin, tewhîd, ango pîrsgirêka yekîtiya xwedê ye. Bi hemû şeweya xwe, hebûna xwedê û yekbûna wî û bûyîna Hz Muhemed ya qasidê xwedê yê dawî, girîngiyekî kilitê li vê têgînê bar dike. Li hember çî û kê hebûn û yekîtî, çima qasidê dawî? Teologên îslamê, heta niha di nava sînorên ol de mane û li bersiva van pîrsan geriyane. Analîzên zanistî ku hatine kirin jî, jiberku ji mîtolojiya Sumer bêxeber bûn û Jiberku xweperestiya navendî ya şaristaniya Ewropa derbasnekirine, ji raveyên bisînor wêdetir neçûne. Ronakbûna Rojhilata Navîn, nikare ji peywira pêkanîna vê yekê, ya bi behreyên xwe yên derûn, bireve. Heta ku tabû neyêne perçekirin jî, ev peywir bi serkeftin nayê çîh.

Di pêvajoya pêşveçûna olên pîr xweda yên bi giraniya jinê, ji belgeyên di dest de tê dîtin ku neolîtîk bi şaristaniyên Mîsir û Sumer, pêngavên girîng avêtine û li veguherîne rast hatiye. Him çîncînîbûna civakê û him jî binyata wê ku bi cudabûna zayendeyan (cinsiyet) ve girêdayî, dema xwe di warê hilberîne de, bi berhemdariyeke mezin diçespîne, ewlekariyeke mezin bi mîtolojiya ku rahîban çêkirî, pêşvedîçe. Perestgehên rahîban ku di heman demê de, di rola navendên hilberîne de ne, di vê yekê de xwedî pareke mezin in. Derketina olên ezmanî yên bi ezmên ve girêdayî, bi vê pêvajoyê re, di bawerîya olî de, rê li ber merhaleyeke binyatî vedike. Aramî (îstîkrar) û neguherîna di sazûmana ezmên de, weke bawerîya bingeşîn mînak tê girtin. Di pêşveçûna bawerhişkiyên di baweriyên Rojhilata Navîn de, bandora vê aramiya sazûmana ezmanî, heye. Têgînên neguherîn, abadîn (ebedî) û mêjîn (ezelî), timî bi vê bandorê ve girêdayî ne. Sûdmendiya herî mezin ya vê ramana neguherîne, liser bîrûbawerîya mirovatîyê ev e ku ji ramana zagona payîdar re, vekiriye. Li erdê jî li sazûmana ezmên tê gerandin. Baweriyên olên nû, wê timî li vê bigerin û wê hewl bidin ku serdestî çîhana bîrûbaweriyê bikin. Digel ku heyîna pîr xwedayî tê parastin jî, çîqa ku diçe hejmara wan kême dibe û ji nav wan, tenê heyînen ku erd, ezman, av, hewa û bahoz, temsîl dikin, weke xwedayên herî mezin pêşdikevin. Digel ku di şeweya mirov de, hebûna xwe didomînin jî, di encama xwezayî ya veqetîna çînan de, dixwaze ku mirovan bi şeweya xwedayên efendî û beniyên suxrevan, biafirîne. Bi taybetî xwedayê zana û xasûk Enkî, hostayekî mezin yê afirandina efendî-benî ye. Ji xwedayên din re jî, mamostetiya aqil dike û vê yekê bi wan dide pejirandin. Rola xwedawend Nînhûrsag (xwedawenda herêma çiyayî) lijneya xwedayan (Pantheon) ku bi giranî ji mêran tê holê û beniyên jîder dihêle, diafirîne. Weke versiyoneke sazûmana ezmên, sazûmana erdê tê damezrandin. Bi qewirandina Adem û Hawa ya ji bihiştê, mehkûmkirina bi suxrevaniya abadîn, weke qedera mirovatîyê tê nivîsandin. Rahîbên Sumer, vê binyata civaka biçîn ya bi cudakirina efendî-benî ve girêdayî, bi rêzikên mîtolojîk û olî ve girêdidin, bi awayekî zexm bingeşa pêşveçûna olî ya Rojhilata Navîn û çîhanê dideynin. Divê ku dîroka olan vê rastiye bipejirîne. Heta ku ev neyê pejirandin, ti şîroveyên olî li bingeheke dîrokî nayên rûnandin, herwiha bi awayekî rasteqînî nayê

ravekirin. Wê kêmbimîne û ji gelek wateyên çewt rizgar nabe. Ev yek nayê înkarkirin ku bingeha olên ezmanî, gelekî deyndarê sêwiranên rahîbên Sumer e. Perestgehên rahîban, him di warê hilberîna dargî de, him jî di afirandinên xwe yê bîrdoziyî de, peywira malzaroka dayîkê dibînin, şaristaniya ku di vira de hatiye afirandin, di peresîna mirovatîyê de û di destpêkirina dîrokê de, rola herî bingehîn dilîze.

Rahîbên Sumer, tevkariya herî girîng ku li têgîna xwedê kirine ev e, ew hildane ezmên, hêzên xwezayê yê bingeh lê kirine bar, di civakê de jî navên efendî-xwedê bilind dikin, mirovan jî dikine rewşa beniyên wî. Ev gelekî vekirîye ku bingeha bîrdoziyî ya desthilatiya polîtîk, hatiye damezrandin. Di teolojiya Sumer de xweda, bi pêdiviya civakê ya polîtîkbûnê re, tê pêşxistin û bilindkirin. Bi gotineke din, vedana bîrdoziyî ya desthilatiya polîtîk ku bûyereke dargî ye, xwedayê ku mirov weke suxrevanekî xwe afirandiye. Herwiha têgîna xwedê bi hebûna polîtîkayê re wekehevî dibe, dibe beremberiya bîrdoziyî ya polîtîkayê. Heger beremberiya bîrdoziyî neyê afirandin, şensê ti sazûmanên polîtîk ku bimesîn tine. Meşa polîtîka, timî di bin siya xwedayan de gengaz bûye. Polîtîka bixwe, bi dogmayên bîrdoziyîya wê ya di bîrûbawerîyan de, mîna goşt û neynûkan di nava hev de ye. Heta ku hêza polîtîka klasîk jihevnekeve, pêknehatina laîktîyê jî, bi vê ve girêdayî ye.

Hêmana yekîtiyê, tewhîd ya ku bi kalîktîya Hz Brahîm ve tê girêdan, weke ku berê hatî şîrovekirin, bi yekahengiya erdnîgariyê û pêdiviya yekîtiya qebîleyan re, di nava wekeheviyekî hişk de pêşve diçe. Tê çavdêrîkirin ku têgîna xwedê, piştî merhaleya totemîk ya di sazûmanên qebîleyên Erebaştan de, tê hewldan ku bi têgîna xwedayê bilindkirî yê Sumer "El", were berdêlkirin. Lêbelê gelek qebîle, xwediyê "El"ên xwe ne. Ev rewş rê li ber aloziyekê vedike û dike ku pêdiviya yekîtiyê xwe bide pêş. Raveya civaknasî ya tewhîdê, herî rast e ku di vê pêdiviya yekîtiyê de were dîtin. Çima ne di demeke din de, lêbelê dema ku qebîleyên nêzîkî hev, him jibo parastina xwe û him jî jibo hêrişan, pêdivî bi yekîtiyekê hene, jibo "El" tewhîd pêwîst tê dîtin? Ji Ahda Kevin tê fêhmkirin ku di nava qebîleyên Brahîm yê xisimên hev de jî, pêdiviya yekîtiyekê hebû. Heta ku her qebîleyeke derdor "El"ekî xwe hebe, yekîti pêknayê. Brahîm, jibo ku peywira xwe bi cîh bîne, divê ku "El"yên qebîleyan bike yek. Bi hindîkayî divê ku vê jî qebîleyên xwe re pêkbîne, xwe jî herî nêzîkî "El" nîşan bide, ango xwe weke qasidê wî, bi sazî bike, ev yek wê di çêbûna bîrdoziyîya wî de, rola kilîtê bilîze. Bi vê operasyona bîrdoziyî, him El xwemalîdike, him bi xwe re di nava girêdaneke -qasidî- nêzîk de dihêle û pêngavekê pêktîne. Di dîroka olan de, gengaz e ku ev bi şikandina mezin ya duyemîn an jî veguherîn, bête binavkirin. Ango nasnameya xwedayî, bi navê tewhîd dibe yek, him jî bi hêmana mirov nabe xweda, derbasî qasidiyê dibe.

Wateya vê ya polîtîk û civakî, di zadeganiya (arîstokrasî) qebîleyê de, gihana saziya şêxîtiyê ye. Şêx weke di Sumerîyan de, nabe xweda-qeran. Lewra qebîle bi tevayî ne veqetîya ye çîncînîbûnê. Rastiyeke civakê serdest e ku şêx jî qebîleyê ye, di jiyana rojane de di nava hev de ne û bi takekesên civakê re, ne bi navber e. Şêx ne di wê rewşê de ye ku bête xwedakirin. Xwedabûn encex taybetiyeke jibo qerana ye ku di çanda demê de, cîhê xwe girtiye. Bîrdozî û sepandina vê, hê jî berê de di civaka Sumer û ya Mîsrê de, bi aweyekî hîkarîker hatiye pêkanîn. Brahîmê ku ew bi xwe jî şêxekî ye, nîşana serhildana li hember xweda- Nemrûd e. Binyata wî ya bîrdoziyî, şeweya ku mirov nabe xweda ye. Li hember mirov-xweda, hewl dide ku bîrdoziya xwe, nasnameya xwe ya xwedayî, diyar bike. Di dawî de şerê xwe yê bîrdoziyî, bi tewhîdê ango bi yekîtiya xwedê û bi têgîhîna yê herî nêzîkî wî, encex dikare bibe qasidê wî, di dîroka olan de, merhaleyê mezin pêkaniye. Li vira ligor koledariyê, veguherîneke mirovatîtîr û nermtîr tê pêkanîn. Ji levdanên hîkariyên bîrdoziyî yê Mîsrê û totemparêziya qebîleyan, ango ji tez û antîtezê sentezeke nû çêdibe. Rastiya tewhîdê ev e. Ev bi awayekî civakî, litayê yekîtiya qewmî ya qebîleyên xisimên hev ku pêwîst e bibîne yek, tê. Ji aliyê polîtîk ve, bi sînorbûna desthilatiya şêx, îfade dike. Tewhîd, nasnameya bîrdoziyî ya qebîleyên ku di bin rêveberiya xwedê û şêx de, ne yek e. Xweda êdî weke paşnavê qewm e. Çavkaniyeke hêzê ye. Gotina "Ya Allah!" tê wateya, "were hawara min, hêzê bide min". Ev jibo yekîtiyê, weke dirûşmeyeke jiyane ye. Dengên "Ya Allah!" ku serdem dagirtine, kilîla behîtdar (mûcîzewî) ya formula bisêhr ya em bibîne yek-bihêz bibin-qezenc bikin e.

Dema ku em li pêşveçûna perestîna (îbadet) xwedê ya di dîrokê de binêrin, wê were dîtin ku bi vê yekê tê xwestin ku bigihîne yekîti û bihêzbûnê. Têgînen weke beniyên xoşewîst ku wê herne bihiştê, aliyê vî karî yê fantazî û wêjeyî ne. Derûn, yekîtiya civakê û polîtîk û pêdiviya rêveberiya bihêz e. Divê ku cudahiya di navbera wejeya ku bîrdoziya pêşketî, jibo xwe bi bîrûbawerîya demê bide bawerîkirin, bikartîne û derûna wê ku esasê wê têrî pêdiviya civakî û polîtîk dike de, were dîtin. Naxwe ji dogmatîzma ku di dîrokê de, bi armanc dikevîne nav, xilasbûn çenabe. Di bin her kemneke bîrdoziyî de, راستiyeke bingehîn ya civakî û polîtîk ku tine zimên heye. Di bin vê de jî, di

dahûrana dawî de, cudahiyên aborî yên bingeh û berjewendî hene. Di vê çarçovê de, ku dahûrandin ne bi tevayî bête çêkirin, tenê bi qadekê were bisînorkirin, wê di xebatên civaknasî de, bi hişmendî an jî ji ber xwe ve, bikeve çewtiyên rêbazî.

Ev veguherîna bîrdozî ku Hz Brahîm weke kalikê wê tê pejirandin, Di dema Mûsa û ãsa de, wê hê bêhtir were pêşxistin. Di derûna xwe de, ev nêzikî hev in. Jixwe gotina kevneşopiya olî ya yek xweda, di vê wateyê de ye. Heta dema ãsa, di nava pêvajoyeke hezar salan de, ligor pirtûkên pîroz, 124 hezar pêxember jiyiya ne. Di vir de tê fêhmkirin ku di her civakê de, kesên rewşenbîr yên hestiyar û biwijdan, weke pêxember nîrx dîtine. Peywira van ya bingehîn ev bû ku demborîna civakê û kevneşopiya pê ve girêdayî, giyandar bigirin, weke ku di van kevneşopiyan de dihate derpêşkirin, welatê belên dan, bihiştê tê xeyalkirin û hêviya roja rizgariyê zindî bigirin. Digel yên mîna Mûsa, Dawûd, Silêman, Yeremya, Ezra, Yahya û ãsa ku gelekî girîngî qezenc kiribûn, bi zêdeyî yên ku mîna perwerdekarên jî, di rewşa xelekên vê zincîrê de ne. Pêxemberî, weke perizîna (kult) kalik ya kevin, kevneşopiya pîroz ya civakê ku xwedayî qezenc kirî ye. Her dem nûnerên wê hene, dema bê pêxember tine. Ji dema Brahîm ve, di demên qeyrana giran de, pêdivî bi derketina pêxemberên bihêz heye. Zilamên ol yên di pêleya duyemîn de, di Mûsewîtiyê de yê bi Pêşgo, di îsewîtiyê de bi Patrîkyar û di misilmantiyê de bi Şêxulîslam werine binavkirin. Ev hê bêhtir, şîroveker û nivîskarên pêxemberên ku pirtûkên wan hene.

ædî di van mercan de, serdema îslamtiya Hz Muhemed, weke volkanekî diteqe. Pêşveçûna îslamtiyê ya bilez û belavbûna wê, tenê bi zora şûr ve were girêdan, wê ne rast be. Heger ku merc ne gihîjin, ti zor, herçiqas ku bi şidet jî werin sepandin, digel ku rê li ber pêşveçûna civakî naveke jî, ji encamên rûxîner wêdetir naçe. Şideta îslamê, ji belavkirina bendên jihevketî wêdetir nayê ti wateyên din. Jixwe ev bendên kevneperest ku jihevketine, bi çend derbeyan bi tevayî dikevin û ava pingahî tevî çemê feodalîzmê dibe, mîna lehî û şapê kesek nikare xwe li ber bigire. Bi vê pêngava mezin ya şoreşgerî, mirovatî li navendên herî bingeh, bi veguherîneke nû ya aborî, civakî, çandî û siyasî, wê bikeve rewşa şeweya nû ya dîroka şaristaniyê.

Heger ku em vê bûyera dîrokî wiha terîf bikin, bêşik weke kesayetiya wê yê bingeh, gelekî girîng e ku em taybetiyên Hz Muhemed ji nêzik ve bibînin. Mercên ku tê de hatiye cihanê û mezin bûye, mercên sêgoşeya Mekke, Medîne û Taîf yên Erebiştana ku di nivê sê hêzên bingeh yên demê, êmperatoriya Bizans, Sasanî û Habeşîstan de, cîh girtiye. Ev hersê bajar jî, liser bazirganiya ku di navbera van împeratoriyan de pêşketî, hatine avakirin. Ligor sazûmana qebîle ya bedewiyên çolê, pêşveçûneke rewneq û dewlemend, tê wateya bajarîbûnê. Di Erebi de, medînebûn şaristanîbûn e. Jixwe navê bajarekî ji wan Medîne ye. Yekem car ku qebîleyên ereb yên semîtîkên saf, li dor van bajarên ku bi rêya bazirganiyê pêşvebiribûn, derfetên şaristanîbûnê bi dest dixin.

Kevneşopiya ëbrani ku di nasnameya bîrdoziyî ya Rojhilata Navîn de, bi Hz Brahîm didine destpêkirin, Digel ku xwe dispêre daneheva şaristaniya Sumer û Misrê jî, lêbelê merhaleyeke wisa ye ku wan derbasdike, vediguherîne û qebîleyên çolê yên berfireh, dikişîne pêvajoya şaristaniyê. Hz Brahîm, ala bîrdoziyî ya pêla mezin ya duyemîn şaristaniyê ye. Bîrûbaweriya biherketbûna civakî ya pêşveçûyî û şewegirtina giyanî ya nûjen e. Ji aliyekî ve pûtên totemîk ku paşvemayîna qebîleyên hoveber temsîl dikin, têne şikandin, ji aliyê din ve jî, serî li xwedayên bi şeweya mirovan ku xwe weke xweda-qeranan nîşan didin û sazûmanên Sumer, Misir, Nemrûd û Firewn, hildide. Xwedabûna El, çeka bîrdoziyî ya bingehîn ya vê peresîna dîrokî ye. Bawermendên ku bi peyva "Xweda yeke, pêxember qasidê wî ye" bi girseyî bûn, hêza propagandayê yê herî mezin in.

Di dema Hz Muhemed de, digel pêşketina mercên aborî û civakî, vesazîbûnên polîtîk radiwestin û bîrdoziyên fermî, kevneperest û hêrîşker dibin. Di rêxistinbûnên aborî û civakî de, koletî bilez tê derbaskirin, şeweyên dewletên serdest, di nava israreke kevneperestiyê de ne. Paşdetirî monarkên Sumer û Misrê bi xwe jî mane. Ji pêşwazîkirina tîkiliyên aborî û civakî yên nû dîr in. Saziya polîtîk, li pêşiya şeweya tîkiliyên hilberîna nû û hêza civakî, astenga bingehîn e. Bi taybetî împeratoriya Bizans û Sasanî, serdema xwe ji mêj ve dagirtine, erka xwe wînda kirine, weke saziyên dewletê û bermayînen koletiyê, li pêşya pêngava şaristaniyê ya nû, di rewşa bendên ku pêdivî ye bêne derbaskirin de ne.

Azweriyên jiyane yên mirovan ku bilind dibin û xeyalên wan, bê rawestan li van bendan dikevin. Li Bizansê, peresîna ku bi rêya xiristiyanîyê tê jiyandin, çîqa ku diçe, vediguhere kevneperestiyeye ku rê li ber zordestî û tarîtiyê vedike. Xiristiyanîya ku bi rewşa ãsa ya saf bûbû hêviya rizgariya bindestan, ji olekî wijdan û sinc derdikeve û dikeve rewşa amûrekî listikên desthilatiyê. Di dema bilindbûna Hz Muhemed de, xiristiyanîya fermî, weke amûrekî belavbûn û zordestiya xwediyên desthilatiyê, veguherandine şeweyekî berevajî. Ji hêvîbûna girseyan derandine û kirine amûrekî bixewvebirinê. Baweriya Mesîh ya di kevneşopiyê de, ketiye wê rewşê ku weke di Ahida kevin ya

pîroz de jî derbas dibe, li Mesîhê xwe yê nû, li pêxemberê nû bigere. Di derbarê pêxemberê nû de, bêtê li kûderê û bi çî rengî derkeve holê, nişan û îşaret zêde bûne. Her roj îşaretên nû tene nişandan û tene niqaşkirin.

Di êmperetoriya Pers-Sasanî de, bilindbûna Manî, hê di destpêkê de (PZ 275) ji aliyê rahîbên Kartiran yên ku Zerdeştîti kevneperest kirin ve, bi qirkirinan hatiye rawestandî, Li hember hemû nûjeniyên, êmperetori bînefîs hiştine. Rola Zerdeştîyê ji saziyeke kevneperestî wêdetir, ne maye. Hê wêdetir, şaristaniyên Çîn û Hindê, di nava xwe de gewixandinên mezin dijîn, feodalîbûn biêş pêşvedîçe. Mirovatî, weke dema Asûrên dawî, rizgariya xwe di yekîtiyên terîqetên mîstîk yên veşartî ku belavbûne de, dibîne. Ev terîqetên ku nivî olî û nivî felsefî, jibo mirovatîyê weke rêyên azadiyê dimînin, lêbelê qet nabine bizavên rizgariyê yên sereke.

Awantajê van her sê bajarên, ligor her sê împeretoriyan di rewşa derdorekê de ne. împeretoriyek jî nikare van bi tevayî tevî sînorên xwe bike. Çol, weke deryayeke parastîne ya xwezayî rol dilîze. Ti hêzên artêşên birêkûpêk, xwe li hember qebîleyên ereban yên ku bûne xwedî hesin, hesp û hêza şûr, nikarin bigirin. Hesp û şûr roleke stratejîk dileyîzin. Hêştira (deve) ku mîna keştiyeke çolê, di warê bazirganiyê de rola xwe dilîze, dema bi hespên ereb û şûran û bi hêza parastîna çolê ya xwezayî re dibe yek, gihîştina mercên bîngêhên yên merhaleya stratejîk a dîrokî timam dibin. Digel hersê împeretori, heta bi Mekkeyê gelek seferan pêktînin jî, bi windabûnên giran careke din bi paş de vedigerin. Di van mercan de, tişteki ku artêşa birêkûpêk bike, zêde tine. Di ayeteke Quranê de wiha derbasdibe: Çîroka çûkên Ebabîl ku bi keviran artêşa Hebeş têkbirî, eslê wê ev raveyeke olî ya şerê qebîleyan ku bi hesp û şûran kirine. Bazirganiya di navbera sê împeretoriyan de, rê li ber dewlemendiyeke derasayî vedike, hesp û şûr jî, ligor mercên çolê, weke şeweya şerê gerîla derdikeve holê û mercên serkeftînen derasayî bi xwe re tîne. Hê jî li Sahraya Mezin, li Fas, Cezayîr û Sûdanê, ev gerîlayên çolê, tevî yên ku li hember rejîman radibin jî, di her demên dîrokê de, kesek xwe li ber wan nagire.

Di dîrokê de, bi vî rengê gerîlayên çolê, li olên Moxolîstan û Tirkmenîstan jî, yê derkevîne holê û rê li ber pêngaveke belavbûnê ku di dîrokê deherî bi hêz veke. Aryenên li çiyayên Zaxros- Torosan, Germen û Slawên li daristan û çolterên (step) bakur, bi rêbazên parastî û hêrîşên ku li hember navendên şaristaniyê pêşvebirin jî, bi heman merc û mantiqê van gerîlayên çolê ne. Tê zanîn ku li nivgîrava Erebiştan hê berê, ji BZ 3000an ve, di navbera navendên şaristaniyên ku li Nîl û li geliyên Dicle û Ferad pêşveçûn de, mercên wiha pêkhatine. Di navbera gundên neolîtîk yên ku gelekî hilberîner û navendên bajarên Nîl, Ferad û Dicle de, mercên bazirganiyê ku zûka derketine holê, qebîleyên Semîtik veguherandine û anîne rewşa hêzeke hêrîş û parastîne. Liser hev talanan dikin, dema ku bikaribin niştecih dibin û dema ku nikaribin, direvine kûrayîya çolê û xwe diparêzin.

Kalîtiya Brahîm, ev kevneşopî hildaye asta herî bilind, kesayeti bidest xistiye, çîqa ku çûye, kiriye rewşa hêzeke şaristanî. Hê dema ku ne xwedîyê hesp û hêza şûr bûn, erka vê hikariyê encex bi hêza hêştirê pêkanîne. Ji BZ 1000 salan pêde, bi çekên hesin ku dikevîne dewrê re, çalakî zêde dibin, qerantiya îbranî ya pêşî tê damezrandin. Ne bê sedema ku Misir û Babîl û piştî Asûr, Pers û Roma hêrîşî van navendên şaristaniyê kirine, carna bi awayekî stemkar diperçiqînin û ji cîhê wan qut dikin. Lewra yê ku herî zor li wan navendan dikirin, hêrîşên van qebîleyên çolê û behreyên wan ku dikarîbûn bibine alternatîfê wan bûn. Taliya wê, kevneşopiyên van qebîleyan, jihevketina Sumer û Misir û bi pêwana esa, ya Romaya bişemil jî pêkanîne û dawî liwan anîne. Dema Hz Muhemed, di bin mercên nû de, teqîna van kevneşopîyan ya mîna volkanekî ye ku şaristaniyeke nû ango bilindbûna feodalîzmê ya pêvajoya bandevê pêktîne.

2- Kesayetiya Hz Muhemed, di bin bandora mercên demê ku bi kinayî hatine zimên de, pêşveçûneke gelekî binakokî nişan dide. Çandên sê împeretoriyên mezin ku belavbûne, gelekî li pêşya çanda qebîleyên ereban e. Di navbera wan de, cudahiyan bîpîvan (qeyas) hene. Li Pantheon (Koma xwedayan) Kabeyê, totemên qebîleyan ku ketine ser hev, bê giyan in û ti taybetiyên wan ku hêzekê îlham bikin nemane. Herçiqas ku hineke mîna Lat, Manat û ózza, weke yên herî mezinên wan, giramgiriye digirin û qebîleyên mezin temsîl dikin hebin jî, ev ji îlham dayîna şaristaniyeke nû gelekî dûr in. Liser rûyê van, ramanên nû û terîqetên mîstîk tene qedexekirin. Liser saziyê, bîrûbawerî û saziyên ku kevneperestiya qebîleyê bîngêh digirin, serdest in. Her kes encex bi qebîleya xwe pesnê xwe bide. Jin piçûk tînin, zarokên keçik terkî mirîne dikin.

Rêwingiyên bazirganiyê yên navbera Mekkeyê û Şamê, di gihîştina ramanî ya Hz Muhemed de, xwedî girîngiyeke bîngêh e. Tê zanîn ku gelekî guhdarî li rahîbên Nastûrî kiriye û bi wan re ketiye nava niqaşan. Ewlekariya ku Xetîce dayiyê, hezkirina wê û zewaca wê ya pêre, kiriye ku di derbarê jinan de, bibe xwedî ramanên pak û erênî. Bêtê Xetîce, pêxemberbûna Hz Muhemed ne gengaz e. Xetîce bi vî aliyê xwe, heger ku bi vaşarî be jî, ji Meryem gelekî bêhtir bi bandor e û çanda

xwedawendên jin temsîl dike. Sedema ku dîroka îslamê, rola Xetîce bi layîqî nadiyê, ji ber serdestiya mêr ya di nava civakê de ye. Ev gelekî vekiriye ku li Mekkeyê, ya herî pêşî Muhemed destek kiriye, Xetîce ye. Bi temen jî ji Muhemed mestir e û liqasî ku xwedî karwanekî be jî, dewlemend e. Di civaka Mekkeyê ya serdestiya mêr de ku jin herî piçûk tê dîtîn û zarokên keçik terkî mirinê dikin, diyar e ku Xetîce wê nakokiyeye cidî nîşan bike. Ligor ku yê bi serê xwe nikaribe di ber vê civaka har re bike der, têkilî û zewaca wê ya bi Muhemed re, gelekî bi wate ye. Ji hezkirinê wêde, li hember civaka fermî ya Mekkeyê, weke kakilê (pûxte) pêşî yê dendika bîrdoziyî û polîtîkayê ye. Muhemedê ku heta Xetîce namire, bi ti jinên din re nazewice, ji giramgiriye wêdetir, bi hêza Xetîce ya daringî û menewî ve girêdayî ye. Jiberku wê herî pêşî pêxemberiya Muhemed erêkiriye, para wê ya di vê çêbûnê de xuya dibe.

Piştî yên ku wê baweriyê bi Hz Muhemed bînin, lawê apê wî yê zarok Hz Elî û koleyê wî Zeyd e. Ev wêne wesfê komê yê şoreşger nîşan dike. Di kesayetiya Elî de, girêdanên qebîleyê, bi şeweyeke şoreşgerî perçe dike, di kesayetiya Zeyd de jî, koletiyê dibexşîne û bi şoreşê ji holê radike. Eslê wê di vê sêbareyê de, heger ku bi hoveberî be jî, sê şoreş têne pêkanîn. Bi têkiliya bi Xetîce re, şoreşa jinê, bi Hz Elî şoreşa qebîleyê û bi Zeyd jî şoreşa li hember koletiyê. Jiberku jiyanêke komun ya hevpar pêkanîne jî, şeweyeke şoreşger serdestî jiyanê wan dibe. Mezinbûna komê ya di vî babetê de, wê menîfestoya bîrdoziyî pêwîst bike. Berî ku bibe pêxember, çûyina Muhemed ya çiyayê Hîra, pêvajoya siftbûna bîrdoziyî ye. Di hemû çêbûnên pêxemberiyê de, pêvajoyên bi vî rengî têne jiyandin. Di Ahdi-Atîk de, bi dorfirehî tê ravekirin ku Mûsa li Çiyayê Sîna, pêvajoyeke wiha jiyaye. Di çil saliya Muhemed de, hatina pêxemberiyê, eslê wê îlankirina siftbûna şoreşgeriya nû û derbasbûyina pêvajoya têkoşîna vekirî, temsîl dike. Danazana vekirî ya meşrûbûn û serdestbûna li Mekkeyê ye. Pêngavavêtina ji siftbûna bîrdoziyî ya polîtîkbûnê ye. Wehiyên vê demê, zêdetir di derbarê bingeha bawerî û sincî de ne. Teoriya şoreşê tê çêkirin, hêman têne diyarkirin. Mezinbûna xeteriyê, civaka Mekkeyê ya fermî dike nava livbazîyan, êdî kuştinê karê kêliya ye.

Muhemed Taîfa ku bi bazirganiyê dewlemend bûyî, na pejrîne û bajarê Medîne hildibijêre, di 52 saliya xwe de, PZ di 622an de hicret (koç) dike. Dîrok nîşan dike ku Hz êsa li çarmixê ne hatiba dayîn, ji komeke mîstîk wêdetir ne diçû. Jibo hicreta Muhemed ya Medîne jî, ev dikare bê gotin. Heger bi zorê ne hatiba hicretkirin û li hember wî, bawerhişkiyeye bi şidet ne hatiba nîşandan, îslam yê weke civakeke gnostîk bi maya. Lêbelê dema ku merc û zagona tek û bertek bikeve tevgerê, tê dîtîn ku komên herî hêsan, pêngavên herî mezin yên dîrokî pêktînin. Dema Medîne, dema leşkerbûn û polîtîkbûnê ye. Herî zêde ayet di derbarê sazûmana nû ya polîtîk de ne û bê yê çawa çêbibe de ye. Li Medîne, peymaneke civakî ya nû û dewlet-bajarek çêdibe. Lêbelê dem ne pêvajoya zayîna şaristaniya Sumer û Misrê ye. Bazirganiya pêşveçûyî û li ber serê wan navendên împeratoriye cûrbicûr hene. Dewletbûneke bilez û mezinbûneke li dij dewletên din, pêwîst dibe. Ev mijareke hebûn û tinebûnê ye. Çavbirçîtiya qebîleyên çolê ya li hember navendên şaristaniya derdor û rewşa wan a hejar, derketina Hz Muhemed ya bîrdoziyî û hevgirtina Medîne, bi derasayî dilniwaz (rakêşer) dike, careke din hikmê dîrokê yê "Bi meşe beniyê min, pêşiya te vekiriye" derbasdar dibe.

Ber bi wêfata Hz Muhemed, sazûmana dewletê jî hatiye çêkirin. Ev hebûna ku di demeke kin de, evqasî bandor li dîrokê kir û hê jî vê bandora xwe didomîne, divê ku ji nêzîk ve taybetiyên wê yên bîrdoziyî, polîtîk, leşkerî û civakî werine dîtîn.

a- Tiştê ku di asta nasnameya bîrdoziyî de hatiye pêkanîn, sêyemîn versiyona mîtolojiya Sumer ya ku bi şeweya veguherînê ye. Ji dahûrandina kevalên dawî, hatiye ronahîkirin ku çavderk mîtolojiya Sumer e. Li Babîl yekemîn, li ëbraniyan duyemîn û di destê zarokên kevneşopiyê yên dawî Ereban de, bi veguherîna sêyemîn, gihaye şeweya xwe ya herî hîkarîker. Em bi çavkaniyê, bi têrayî liser veguherînên yekemîn û duyemîn rawestiyên. Jibo ku veguherîna sêyemîn xweş were fêhmkirin, pêwîst e ev çavkanî û veguherîn pir caran li ber çavan werine girtin. Li vir armanca me ne ewe ku em girîngiya Quranê piçûk bikin û ne jî, dogmatîkbûnê ku liser bîrûbawerî û nîrxên mirûz pelax bûne, weke pêşveçûneke olî ya kêtûber nîşan bidin. Bervajî vê yekê, ev wê bibe peywireke bingeha ya zanistî ku em bi nêzîkayiyeye civaknasî, ber bi Quranê herin û em derînine rastê bê dogmatîzma îslamê, ji kîjan berjewendiyên bi nalet re kirine maske. Ronakbûna Rojhilata Navîn û ya îslamê, encex dema ku ev peywir bi serfirazî were çîh, wê pêkwere. Divê qet neyê jibîrkirin, heta tariyeye ku tê jiyandin neyê ronahîkirin, ne hêzên şaristaniyê yên heyîn têne naskirin, ne jî roleke ku di şaristanîbûnê de bi serketin bilîze, wê were çîh.

Di nîqaşên bîrdoziyî yên di derbarê îslamê de, destpêka bi pîrseke weke "Hûn ji hebûna xwedê û yekbûna wî bawer dikin?" wê nêzîkbûneke herî oportunist (jirêderxistin) be, ev wê were wateya bikaranîna rêbazên hemû sofîstên serdema klasîk û ya navîn. Mixabin bi sedsalane ku felsefe û

teolojî, bi vê rêbazê ketiye nîqâşeke vala, bi vê rêyê hêzeke entelektuel ya bêhempa hatiye xerckirin, gelek giyan hatine standin, mirov hatine êşkencekirin û avêtine zîndan, dîsa jî ne gihane encameke ku qalîkê guzê tije bike. Heçku Sokrates di axaftinên xwe yê bi sofistên re, xeteriya nîqâşeke wiha fêhmkiyê û temenê xwe bi pêşlêgirtina vê xeteriyê borandiye. Timî wiha gotiye: "Derûna xwe nasbike! Ya girîng ne nîqâşa vala ye, zanîna derûna tiştê ye" li şûna ku em nîqâşa "Xerat (dartaş) heye yan na?" an jî "xerat qence an na?" bikin, girînge ku em li bersiva "Xeratiya tekûz wê çawa were pêkanîn?" bigerin. Rêbaza yekem rêbaza oportunist ya sofistên re, lê ya duyem rê û rêbaza feylesofên rast, yen zana û zanistan ne.

Herwiha bi derketina îslamê ya hebûn û yekbûna xwedê, çi tê ravekirin? Ev weke berhema kîjan pêşveçûna dîrokî û civakî, derdikeve pêşberî me? Armanca wê ya pratîk çiyê? Pirsên ku pêdivî ye werin ronahîkirin ev in.

Berî ku careke din em pêşveçûna têgîna xwedê nîşan bidin, ez dixwazim diyar bikim ku terîfkirinên felsefê û yê teolojiyê ku gelekî liser radiwestin, yê weke sedema pêşî ya gerdûnê sazgerê wê û xwediyê wê, zêde bi wate nabînim. Ev terîfkirinên nêzîkî sofîzmê ne. Nîqâş û ramanên hebûna xwedê û yekbûna wî an tinebûna wî an jî sedema pêşî, sazger û xwedîbûn an jî ne xwedîbûn, di kîjan qonaxê de bin, ev jî bi min bê wate ne. Ez van mijaran ji ber vê yekê nîşan didim: Bi teybetî weke di dîrokê de jî, paşverûtiya rojane ji ber berjewendiyên xwe yê polîtîk û pratîk, li hember ronakbûna olî bikartîne, bi van rêbazên sofist yê xasûk dixwaze ku encamekê bigire. Tê dîtî ku hê jî paşverûtî, li tirkîyê û li gelek dewletên îslamê, van rêbazan bikartîne û berjewendiyên girîng bi dest dixê, herwiha mijokatî û îstîsmareke mezin tê pêkanîn. Ez vê ji wanê ku di pêşdemê de, van nîrxandinên min îstîsmar bikin re jî, dibêjim. Têgîna xwedê ku timî bi civakê re pêşvedixê, wê di civaka zanîne de jî heyîna xwe bidomîne û divê ku bide domandin. Lêbelê êdî ew, navekî zagona gerdûnê û yê civakê ku bûne yek e. Em çiqasî vê zagonê nasbikin, emê ewqasî jî navê wê û xwedayê wê, bi awayekî rast û biwate nasbikin. Hemû terîfkirin û nîqâşên li derî vê yekê, wê bi sofistî bin. Esasê wê, bincilkirina paşverûtî û ya tarîtiyê, tê wateya parastina sazûmana mijokatîyê, tirs û berjewendiyên bêmaf.

Di bin ronahiya van nêzîkbûnên me de, emê hewl bidin ku têgîna xwedê ne bi rêbazên felsefê û teolojiyê, emê bi rêbazên civaknasiyê dahûrînîn. Emê terîfbikin bê nasnameya olî ya ku bi civakê bûye xwedî şêwe, ji ber çi pêdiviyên civakî derketiye holê, pêşveçûyê û veguheriyê.

Hemû nîşanên di derbarê jiyana Hz Muhemed de, didine nîşandan ku herî zêde liser têgîna xwedê sift bûye. Pirsgerêka ku ew herî daye lebigandin, ravekirina nasnameya xwedê ya hebûn û yekbûna wî ye. Ji gera wî ya li bersiva vê yekê tê fêhmkirin ku ev ne pirsgerêkeke çêkirî ye. Hewl dide ku weke têgîneke kilît, naveroka wê ji nû ve terîf bike. Nêzîkbûnên wî yê bi nodûneh navan, dide nîşandan ku dixwaze di wesif de pêngavekê pêkbîne. Di bin şeweyên nû de, bi awayekî sift, timî enerjîyê dide têgîna xwedê. Jibo ku em vê xebatê xweş fêhmbikin, emê vê têgînê bi nîrxên liberalîzm û sosyalîzmê re, hevberbikin. Di veguherînên civakî de, nasnameya bîrdoziyî tê pêşxistin, têgînên kilît bi nîrxên ku tene armanckirin, dewlemend û bihêz dibin.

Tê zanîn ku qebîleyên li nivgîrava Erebîstan, ji BZ salên 3000an ve, bi nasnameyêke bîrdoziyî, "El" (Di peyvnasiya Semîtik de, El tê wateya giyan) weke hêzeke xwedayî ya herî mezin dipejîrîn. Têgîn, bi veguherînên di nava qebîleyan de û bi tîkiliyên ji derve re, bi taybetî yê bi şarîstaniyên Misir û Sumer re, dizên û pêşdikevin. Dema ku di vê pêvajoyê de, êdî totem bersiva guherînan nade, El yê ku li ezman digere û ne berbiçav, weke xweda di hiş (bîrî) de, cîhê xwe digire. Bêşik di vê de, sazûmana ezmên û têgînên xwedayên mezin yê rahîbên Sumer û Misrê, rola diyarker dilîzin. Binyata qebîleyan ya neberbiçav û monolîtîk, yekahengiya erdnîgariyê û sazûmana tîkilî û lihevdanê ya bi navendên şarîstaniyê re, El weke têgîneke tenê û pêkhêner, pêwîst dike.

Hate vegotin ku taybetiya kevneşopiya Brahîm jî, ev yek bû. Zêdekirina Mûsa ya li vê têgînê, pêngaveke din bi pêştir ve biriye. El neteweyî kiriye. Têgîna "ësrael" tê wateya qebîleyên ëbranî "Gulaşa bi xwedayê El re". Peyva ësrail bi serê xwe, çespaneke ku dixwazin bi xwedê re nêzîkaiyekê saz bikin. Vê dawiyê bi rahîb Samuel û bi desteka wî Dawûdê ku bûye qeran û lawê wî Silêman, wê bibe yekem navendîbûna hêza polîtîk û yê fermî. Ædî navê El, weke xwedayê fermî, wê bi ëbranî bibe "Elohîm". Ev diyar e ku Elohîm, îfadeya nû ya qewmê ëbranî ku sift bûye, polîtîk bûye, veguheriyê qerantîyê û ya hebûna ësrail a civakî ye. Ew, îfadeya neberbiçav ya bîrûbaweriya civaka veguheriyayî û nasnameya wê ya bîrdoziyî ku hatiye têgînkirin e. Mînakekî afirana ya dîrokî û hîkarîker, li pêşberî me ye ku ji têgînan hêze derdixê û ji bihêzbûnê jî digihe têgînên nû. Dema em li ber çavan bigirin ku vî xwedayê ësrail heta îro, rê li ber kîjan şeran, dahênanan, nûjeniyên û ramanên vekiriyê, yê bêhtir were fêhmkirin bê çi sêwiraneke bêhempa ye.

Kevneşopiya xiristiyanîye ku bi ësa pêşveçûye, weke îfadeyeke qismên hejar yên ku ji kevneşopiya ëbranî ya fermî veqetiyane. Cudabûna civakê, hêviya dema nû ya şîrovekirina kevneşopiyê jibo yên bindest, viyan û baweriya rizgariyê, şewegirtina sincî û qezenckirina heyîna nasnameyeke bîrdoziyî (Ahda Nû) ya nû ye. Elohim ji zimanê Asûrî yê ku ësa pêre dipeyive, derbasî zimanê demê Aramî dibe û werdigere Rab. Wateya wê ya ferhengî "Efendî" ye. Sumerî û peyhatiyên wan, bi zêdeyî têngîna xwedê, bi wateya "Efendî" bikaranîne. Diyar e ev, çîna ku bilind dibe temsîl dike. Ev yek jî diyar e ku mirovên ketine rewşa suxrevanan bi "benî" têne binavkirin û ev jî ji çînen ku tên mêhtin û perçiqandin, têne holê.

Xweş tê zanîn ku ësa, liser navê bindestan, taybetiyên dilovanî (rehmet), rizgarî, qencî, biratî, aşî, dad û hezkirin ku aliyên wan yên sincî zêde, li têngîna xwedê bardike. Rab weke nasnameyeke bîrdoziyî ya komên bindest, bi van têngînan tê bihêzkirin û jibo pêngaveke dîrokî, dibe çavkaniya hêzê. Weke zarokên Rab, di serî de lawê wî ësa û xiristiyan hemû, dibine civakeke pîrozkirî. Rabê wan yê di mercên herî giran de, wan biparêze û alîkariya xwe ji wan qut nake. Ji niha û pêde, êdî hemî dua wê ji wî re bêne kirin. Ew jî, heta ku hêviyên wî werin cîh, wê timî bi wan re be. Em bi mînameke dîrokî re rûbirû ne ku civak, bi pêşxistina têngînen neberbiçav, bihêzbûn, pêşveçûn û veguherîna pêktîne. Hêza vê bîrdoziyê ji pêşveçûna aborî û civakî veketiyayî nabe, yek ji wan nebe, pêşveçûn ne gengaz dibe û ev mînameke ku carna bîrdozî roleke pêşengî dilîze. Piştî, di dîrokê de gav bi gav tê dîtîn ku ji tevkariyên Paûl yên liser navê xiristiyanîyê, heta bi nûjeniyên Protestanan, ji rola wê ya çêbûna serdema feodal, heta bi tek û berteka liser zayîn û pêşveçûna kapîtalîzmê bûyer, guherîn û veguherînen bêhempa hatine jiyandin.

Ez dixwazim vê yekê bi girîngî diyar bikim: Heger mirov bi raman, bawerî û hêviyên ku li têngînan tên barkirin ve, girêdayî bimîne, ligor pêdiviyên wê bijî û tiştên derpêşdike biçalakî bike, heger bi serdemê û rojevê re ne tewişe, berevajî vê pêşvebibe, wê pêşveçûnên bêhempa çêbike, lê berevajî vê yekê, wê ber bi paşverûtiyê, sekaniyê û hilweşînê ve bibe.

Wateyên ku Hz Muhemed li Rabê (Jîbo tevlihevî çênebe: Rab peyveke Asûrî-Suryanî ye, Allah jî peyveke ëbranî ye û herdu di heman wateyê de ne) xwe bardike, hê bêhtir girîng in. Eslê wê, gelek ji têngînen ku Suryanî û ëbraniyan bikaranîne, dipejirîne. Divê em ji bîrnekin ku li pişt van têngînan, Sumer, Misir û hinekî jî, Aryen hene. Lêbelê hê girîngtir ev e ku, ji PZ sedsala 5an û pêde, jibo ku bibe bersiva guherîna bîrûbawerî û giyanî ya ku aboriya feodal ya siftbûyî û têtikiliyên civakê rê li ber vekirî, xwe bi şeweyeke îdeal amade dike û sift dibe. Hz Muhemed bixwe, weke mêjî û giyana herî bilind yê serdema ku wê bilind bibe, siftbûneke derasayî îfade dike. Lerza wî û xwêdana wî ya ku dema ayet ji devê wî derdikevin, bê çawa bi hewldaneke mezin sift dibe, dide nîşandan. Di van rewşan de, Hz Muhemed tê wateya, ji serî heta bi lingan siftbûna têngînan, şewegirtina nasnameya bîrdoziyî ya nû û weke heyîneke civakî ya berbiçavbûyî, tevayîya helwesta sincî. Şoreşa wî ya herî mezin eve ku têngînen nu li hiş, giyan û viyana xwe bardike û di kesayetiya xwe de pêktîne. Ravekirina wî ya Ayet û sinetan ku bi rêza yekemîn û duyemîn birêz dike, divê ku weke afirandina mirov û civaka nû were nirxandin.

Hemû pêxember weke têngîna bingehîn, têngînan li xwedê bardikin û li hember vê yekê, weke hêzekê çalakiyên xwe didomînin. Li vir, bazirganiya ku taybetiya civakê ya bingehîn, mantiqekî xwedayî qezenc dike, bi formula "Tu çiqasî bidî xwedayê xwe, ango çiqas tu dua û perestîne jê re bikî, qurbanan pêşkêş bikî, tu berdêla wê ewqasî bistîni", vediguhere rêzikeke olî. Divê ku ev yek neyê jîbîrkirin ku şeweyên xwedê yên di olên yek xwedayî de û bitaybetî yên di kalîtiya Brahîm de, bi bazirganiya civakê re, ji nêzik ve girêdayî ye. Bazirganî, ligor civaka çandinî, pêvajoyên civakî yên pêşdetir pêwîst dike, rê li ber civaka bajêr, herwiha li ber dewletê vedike. Dema ku em têtikiliya di navbera çêbûna dewletê û bilindbûna xwedayan de rast deynin, emê çetir fêhmîbikin bê çima liqayî merhaleyeke pêş ya pêvajoyên bîrî tê. Bitaybetî civakên ëbranî, bi vê kevneşopiyê re girêdanên xurt çêdikin. Çiqas ku xwedayê xwe bihêz dikin, ew jî ewqasî bihêz dibin. Formuleke tekûz hatiye dîtîn. Xwedayê we çiqas bihêz be, hûn jî ewqasî bihêz in. Xwedayê xwe tine bikin, hûn xwe jî tine dikin. Xwedayê xwe şaş bikin, hûn jî şaş dibin. Xwedayê mêr Enkî, yê civaka Sumer ya biçîn, xasûk û bîaqil, ji destê xwedawenda Sumer ênanna, hemû nirxên wê yên ku di civaka neolîtîk de afirandine, werdigire û herwiha her tiştê xwe, ji zayenda jin ya di civakê de, distîne. Ev yek ne belaş û rasthatiniyeke, destana mîtolojîk ku çûyina Enkî ya ji ôrûk heta bi Erîdû, ji wira standina wî ya 104 "Me" yan û vegera wî ya biserketin heta bi ôrûkê, tîne zimên û di nav destanan de nemir bûye. Ev destan vegotîneke mîtolojîk, olî û wêjeyî ye, bê têtikilî û nakokiyan çawa danûstandin û levdanek di navbera xweda û xwedawendan û weke vedanekê di nava civakê de jî tê jiyandin. Ev karê wêjevanên Sumer, tiştêkî şahwer û tekûze ku mirov matmayî dihêle. Eslê wê derûna wêjeyê jî ev e.

Hz Muhemed bi îslamtiyê re, navên ku bi wesfên polîtîk û leşkerî, li têngîna xwedê zêde kirine. Mûsa hê bêhtir navên bi terbiye ya civakê û rêbaza wê re têkildar, ësa jî navên rizgarkerî, qencî, hezkirin û weke dad, bêhtir yên sincî li têngîna xwedê barkirine. Navên weke qehhar, hakîm, malîk navên leşkerî û polîtîk in ku bi îslamtiyê re, li navên xwedê hatine zêdekirin. Mêjîn, abadîn, neafirandîbûn, nêzîktiriya ji şahdamar, têngînên teolojîk yên Grek, taybetî yên ku di bin bandora felsefeya Eflatûn û Arîsto de ne. Di zayîna îslamtiyê de, bandora felesefeyê gelekî mezin e. Ligor xiristiyantiyê, bandora felsefeyê ku hê di zayîne de xwe nîşan dide, ji rahîbên Nastûrî yên ku klasîkên Grek bidestxistibûn û bi Muhemed re têkildarbûn, tê. Weke zemîna dargî, belavbûna ramana felsefî û asta têtikiliyên civakê yên aboriya tevlihev ya li Rojhilata Navîn, Qurana ku ji bilî ayetên bawerî û sinc, gelek ayetên ramana felsefî jî di nava xwe de hildigire, bandor kiriye. Digel ramana Ahdî Atîk û Ahdî Cedîd ya bi giraniya bawerî û sinc, binyata Quranê ya bi naveroka ramana felsefî, girîngiyekê bi xwe re tîne.

Xwe îlankirina Hz Muhemed ya wek qasidê xwedê ya dawî, mijareke girîng e ku liser bê rawestandî. Ev ji aliyê olî ve di wesfê nûsaziyeke herî girîng de ye. Dawîlêanîna serdema pêxembertiyê ya bi destê wî ye. Ev gelekî dişibe dawîlêanîna Marks, ya serdema şaristaniya bidewlet ku bi sosyalîzmê pêkanîbû. Çawa ku bêyî dewletê, rêveberî gihîştibe û pêdivî biçîn û tebeqeyên bê wate nemabe, wisa tê nîşandan ku civakên bê pêxember jî, bi viyana xwe ya azad gihîştine hêzeke rêveberiyê. Herwiha di vî babetî de, îslamî bi xwe, dawiyê liserdema ol tîne. Ango îslamî olo gerdûnî yê dawî ye ku ji ol derbasî sazûmana felsefeyê dibe.

Girêdana gelekî zêde ya bi tiştêkî ve, timî şîkê bi xwe re hildigire. Bê pîvanî îşareta ne rastbûnê ye jî. Dema baweriya îslamtiyê ya bixwedê, spartî ramana felsefê bû, ji ber xwe ve ket nava şîk û gumanan. Ji ber vê sedemê, ti pêxemberan bi qasî Muhemed, liser hebûn û yekbûna xwedê evqasî hewl nedane. Em ji hijmara navan bigirin, heta bi jiyan û xebata wî, ji mêjîn û abadînbûna wî, heta bi afirandina wî ya her tiştî, liser xwedê radiweste û hewl dide ku terîf bike. Mirov dixwaze vê pirsê bike: Xwedayekî evqasî dizane, afirîner û serdest, çima xwe bi awayekî vekirî rave nake û bi beniyên xwe nade pejiwandin, lêbelê bi pêwana pêxemberê xwe yê dawî, hewl dide ku bi zor û zehmetî bide pejiwandin? Eslê wê bersiva ku ev pirs lê digere û tiştê ku divê bête ravekirin, civaka nû ya biçîn û serdema şaristaniyê ye. Zorbûn ji şewegirtina binyata civaka nû û ya şaristaniyê ku tevlihev, tê. Bitaybetî binyata polîtîka nû û ya hiqûqî, pirsgirêkên herî bingehîn in ku li benda çareseriyê ne. Diyare li hember vê saziyê, bi çanda qebîleyên çolê bersiv wê gelekî zor be, herwiha pêxember wê bi keve nava astengiyê û wê gelek xwêdanê bi rijîne. Tiştê ku tê damezrandin, ne tenê civakêkî û dewleteke, serdemeke. Êfadeya nîşaneyiya asta herî raser, an jî nasnameya wê ya bîrdoziyî, têngîna xwedê ya ku tê terîfkirine. Hz Muhemed, xweş dizane ku çiqasî navên bi wate li têngîna xwedê barbîke û bi vê têngîne re rêzik, zagon û hêza fermanê çêbike, wê ewqasî bikaribe civaka nû, ango dewleta nû û serdema nû, bihêsanî çêbike û birêvebibe.

Rewşeke weke ya dema ku rahîbên Sumer, civaka bajêr û dewlet damezrandine, li pêşber e. Berhemdariya civaka ku nû bi rêxistinbûyî, him sedem û him jî encama nasnameyeke bîrdoziyî ku baweriyê pêdivî dike ye, li wan pêwîst kiriye ku li perestgehan mîtolojî û ol bihilberînin. Dizanin ku çiqasî di vê de serketî bibin, civaka nû jî, wê ewqasî bigihe ewlayiyê. Herwiha hilberandin û belavkirina bîrdoziyê, bi hilberîne ve weke goşt û neynûkê girêdayî ye û nayê xemsarkirin (îhmal). Di hemû civakan de, di dîrokê û di roja me de, ev rastiyeke bingeh ya civakî ye ku di navbera binyata bîrdoziyî û hilberîne de, têtikiliyeke ne qete heye.

Rawestîna Hz Muhemed ya ewqasî zêde ya liser têngîna xwedê, dide nîşandan ku dizane bê di pêvajoya dîrokê de, çî bi vîna hatiye afirandin, him jî hay jê heye bê civak û serdema pêşedemê, wê çiqasî ji vîna hêzê bi girin. Eslê wê bi civaknasî dihizire. Lêbelê Jiberku felsefe jî ketiye nava kar, xweş dizane ku ol tîra civaka nû nake û çiqas here, jiberku aqlê rasyonel yê xwe bide pêş, di nava nakokiyên de dimîne. Lewra dera ku felsefe lê hebe ol û dera ku ol lê hebe, felsefe lê nahewe. Levdan û pozberîtî jênerê e. Aliyekî wê giraniya xwe nîşan bide. Tê zanîn ku di ezmûna Grek û Roma de, felsewfe derketiye pêş. Li nav Sasaniyan, Manî jî dixwest ku felsefeyê derxe pêş. Lê di encamê de, rahîbên kevneperest biserketin. Êslamî hê di serî de vê xeteriyê dijî. Ol û felsefeya ku di nava hev de ye, sedema bingeh ya kesayetiya Hz Muhemed ya di nava şîk û gumanan de ye. Hewldana wî ya liser çespondina xwedê, di ti pirtûkên olî de tinene, diyar e ku gelekî liser van pirsan dihizire, civaka ku yê derkeve holê, gelo wê bi zagonên ligor aqil, an ligor civakên paşdemayî yên serdema kevin, an jî yê ligor zagonên ol yên ku bi awayekî hesan bandorker dibin, were birêvebirin. Girêdana wî ya evqasî bi têngîna xwedê ve, ne jibo têrkirineke (tetmînkirin) hêsan ya hiş e, ev bi ezmûnên wî yên jiyanê jî, xweş tene ravekirin.

Heger em mînakeke hemdem bidin, rewş wê çêtir were fêhmkirin. Digel ku pirsra "sosyalîzmeke çawa?" bi sedsalan tê nîqaşkirin jî, hê jî ya herî baş ne hatiye dîtin û sependin. Ev jibo lîberalîzmê jî wiha ye.

Em vê jî diyar bikin ku dema Hz Muhemed binyata bîrdoziyî danî, gelekî bawermende û êmîn e ku tiştên çêdike wê bi aqil rast werine derxistin. Sofizma sexte, qet pê re tine. Liqasî hemû nirxên ol yên ku wê werin parastin dixûnifîne, hay ji wê jî heye ku di serdemeke wiha de ye, ji raveyên felsefeyê û aqil jî nikare bireve, sazûmana îslamê dadimezrîne. Ev sentezeke gelekî zor e ku rewşa felsefî û olî di nava hev de ye. Lêbelê taybetiyeke Hz Muhemed a bingehîn jî ev e. Ev jî taybetiyeke wî ya balkêş e ku hay ji zanîna civaknasî, ango bi kûrayî ji zanistê jî heye, dema ku sazûmanê dadimezrîne, ligor dema xwe bi zanistî liviya ye. Herwiha ev tê fêhmkirin bê çawa kesayetiyeke wiha ya olî, felsefî û zanistî, di takekesiya xwe de dawîbûna pêxemberiyê îlan kiriye. Baweriya wî ya ku pişt wî re aqlê mirov, wê bigîhe ramana felsefî û zanistî, kesayetiyeke di pîleya bilîmetî (dahî) de, pêwîst dike. Lêbelê ev çi nakokî û êşeke mezin e ku paşverûtiya olî ya herî mezin, zûka hat û heta weke roja me, bi heyîna aqil û giyana ometê ve, mîna şîrêzê zeliqî ye. Marks demekê li Fransayê, nîqaşên liser Marksîzmê di bîne û wiha dibêje: "Je n'ais pas Markxist (Ez ne Marksîst im)". Ez di vê baweriyê de me ku Hz Muhemed rabe û jiyana ometa xwe, ya ku bi serdemê re di nava nakokiyê de bibîne, wê bi awayekî mîsoger bibêje, "Ez ne îslam im."

Di derbarê dahûrandina nasnameya bîrdoziyî ya îslamê de, gengaz e ku em nirxandinên wergirîtir pêşve bibin. Ya girîng ev e ku terîfîkirin, bi awayekî rasteqînî bê çêkirin. Ev ne tenê jibo ku em li dîrokê rast têbigihîjin, hê bêhtir jibo ronakbûna Rojhilata Navîn, peywireke jênerew e. Di roja me de, tiştên ku liser navê Muhemed têne çêkirin, di wesfên heqaretê de ne. Ew di kesayetiya xwe de, pêşveçûnên olî, felsefî û zanistî yên demê, di asta herî bilind de sift dike, digihîne binyata civak û dewleta herî berhemdar, dîsa hê li jiyana pêngavên ku cîhanê dihejîne diavêje, êdî emê çawa kesayeti û civakên îslamê, yên ku nikarin xwe terîf bikin, bi awayekî Muhemedî binirxînin? Ev gelekî vekiriye ku çawa Hz Brahîm, Mûsa, êsa û Muhemed pût şkandine, pêkanîna tevgerêke wiha jibo bîrûbawerî û giyana îro û çîqa here, di seresazî û binesaziya rêxistinên civakê de, pêdivî ye.

b- Êslamî bi nasnameya bîrdoziyî ya siftbûyî û ji destpêkê ve, bi şoreşêke leşkerî-siyasî, di nava hev de pêşdikeve. Bi hebûna xwe ya bîrdoziyî, weke şerekî ku ji zincîra xwe bifilite, hêrîşî derdora xwe dike. Weke ku ji şaristaniyên dora xwe tolekê bigire, dikeve nava çalakiyan. Hêrîşa îslamê ye derdor, dişibe hêrîşên Got yên li Ewropa di merhaleya barbariyê de û Hûn yên ku hêrîşî navendên şaristaniya Roma dikin. Êmperatoriya Bizans, Sasanî û Hebeşîstan, bi cangiraniya xwe, herêmên aborî yên berhemdar di bin destê xwe de digirin, qebîleyên Ereban, bi zêdebûna nifûsê re, nakokiyên di navbera jiyana wan ya ku dikeve astengiyê de, rola bingeh dileyîze. Navendên şaristaniyê, rakêşeriyeke mîna xeyalên bihiştê, pêşkêşî wan dike. Bi bazirganî û hêrîşên ku hê ji dema Sumer û Mîsrê ve dihatin, nîmetên şaristaniyê xweş nasdikirin. Çol, îlhama ezabê dojhê dide wan, jiyana şaristaniyê jî, îlhama têngîna bihiştê dide. Bilindbûna îslamîyê yekem car, baweriyekê ji wan re çêdike ku yê ji dojhê rizgar bibin û bigihîjine bihiştê. Afirandina giyan û xeyalên nû, baweriyêke mezin, wêrekiyeke bêsînor, fedekarî û çalakiyê bi xwe re tine. Xeyaleke wisa ye ku şehîd bikevin, wê herine bihiştê axreta ku pê bawer in û bibin xazî, wê bibin xwediyê bihiştê liser rûyê erdê. Hostatiya Hz Muhemed, li vir e. Piştî ku ev asta baweriyê afirand, êdî tiştê dimîne, plansazî û birêxistinîkirineke hêsan e. Ji aliyê teknîkê ve, dema ku hesp û şûr gelekî zêdene û bikêrhatina çolê ya jibo hêrîş û xweparastina gerîla, wê heta bi dawî pêşiyê li ber fethandina îslamê veke. Jiberku fetih, jibo axret û cîhanê çalakiyêke herî pîroze û ji aliyê daringî ve derfetên mezin dide kesên ku ne xwedî tiştêk, artêşbûna leşkerî mîna aşîteke berfê mezin dibe, weke volkanekê diteqe û weke çarenûsa dîrokê yê pêşve here. Ev zelal e ku em bi tevgerêke şoreşê ya dîrokê ku herî birêkûpêk e, rûbirû ne. Bi rêxistinbûna bîrdoziyî û leşkerî, amadeye ku cîhanê bi tevayî bifetihîne. Êmperatoriya li hemberî wan, bi şeweya dewletên kole-benî hatine damezrandin û demên xwe yên herî sekan dijîn. Ji aliyê siyasî ve roleke paşverûtî ku bileyîzin tineye. Ev împeratoriya, piştî pêvajoyêke peresenê ya domdirêj, li hember gelên ku ji komên etnîkî ber bi çêbûneke qewmî ve diçin, bûne asteng. Mercên aborî û yên civakî ku koletî derbaskirin, di vê hêviyê de ne ku ji van heyînen paşmayî, bi şewegirtinên bîrûbawerî û giyanî yên nû ku li pêşya wan dibine bend û asteng, rizgar bibin. Êdî weke kevin lexabkirina gelan, ne hêsan e. Bi derketina êsa ya holê re, bûyera bi şeweya hatina Mesîhê ku lê bendewar, careke din tê dubarekirin. Tenê ne jibo qebîleyên çolê, jibo hemû gelên împeratoriya, afirandina îlhameke rizgariyê, ne zor e. Li derî hinek dad û hemanên paşverûtî, giramgiriya jibo çanda wan, besî gelane ku îslamîyê bipejirînin. Kesayetiya Emer ya dadmend, eslê wê ji ber vê pêdiviya dîrokî ye. Serdestiya bîrdoziyî, rê li ber terikandina

nasnameyên bîrdoziyî yê paşmayî dike, di serfiraziya seferên fetihandinê de, rola herî bingeh dilîze.

Digel nirxandina îslamîyê ya weke olekî bi şûr ku hinek rastiya xwe heye jî, heger ku bîrdoziya li pişt ya serdest, li ber çavan neyê girtin, diyare ku şûr bi serê xwe bikêrî tişteki nayê. Hesp û şûr hê ji mêjve jî hebûn. Lêbelê gavekê jî bi pêşve ne dibirin. Çiqas ku xiristiyantî di sedsalên destpêkê de, weke tevgereke civakî, bawerî û aştiyê pêşve çûbe, îslamtî jî hê bêhtir weke tevgereke siyasî, şervan û biçek pêşveçûye. Aliyên bîrdoziyî, leşkerî û siyasî, di nav hev de sift bûne û bi zincîreke bûyerên şoreşgerî, difetihîne û serdest dibe. Xiristiyantî jî, di qada civakê de pêşdikeve û ji aliyê din ve, timî tê perçiqandin, di bin desthilatiya serdestan de, dijî.

Seferên îslamê yê leşkerî, di wesfê şerên gerîlayên li hember artêşa birêkûpêk de ne. Dema ku serfiraz nabe, paşde vedigere û bilez xwe dide hev û dîsa hêriş dike. Hêrişa bilez ya ji her alî ve ya li hember artêşa birêkûpêk û jihêzistina wan hêsan e. Nakeve şerên tenê bi şeweya levdanekê, stratejiyeke domdirêj disepîne. Taktîkên wisa pêşxistine ku bi hêzeke piçûk, artêşeke mezin bêerk dihêlin. Ji aliyê din ve, artêşên birêkûpêk gelekî bi mesref in, cangiran dimînin, ligor şerên yek levdan senger (sîper) digirin, jibo dabeşbûnê ne bikêrhatî ne, dema ku têkdiçin, êdî bi hêsanî nikarin xwe bidin hev, herwiha hê di serî de, li hember hunera leşkeriya îslamê, dikevîne rewşa dezavantajiyê. Dîsa serdestiya psîkolojîk, bi tevayî di destê artêşa îslamê de ye. Demeke dîrokî ya wisa tê jiyandin ku dema mercên hêza nû derdikeve holê û hêzên ku dixwazin kevnîtiyê biparêzin digihîje, liser navê yê nû, serfiraziyên mezin têne pêkanîn. Piştî serfiraziyên leşkerî, sazûmana îslamî ya siyasî tê damezrandin. Saziya walîtiya eyaletê ya ku ji Persan mayî, di bin nasnameya bîrdoziyî ya nû de, tê zindîkirin. Êslamtî zêdetirî ku qadên şaristaniyê yê nû veke, Ereben çolê yê ku tevî şaristaniyê nebûne û gelên din yê di vê rewşê de, weke hêzên şaristaniya kevin bikartîne û di bin nasnameya xwe ya bîrdoziyî de, nûjen dike. Taybetiya bingeh ya vê nûjeniyê, veguherandina bîrûbawerî û heyînen saziyên dewleta koletiyê, ya ligor têkiliyên sazûmana feodalî ye. Ev ligor dema xwe, pêngaveke gelekî pêşketî ye. Şeweyên têkilî û bîrûbaweriya koletiya ku koka wê diçe beriya hezar salan, tenê jibo benîtiya xwedê, rê li ber dilrihetiyê menewî, nirxekî mirûz ku bêhtir ligor rûmeta mirov, vedike. Dema ku bi benîtiya xweda-qeranan re bête hevberkirin, benîbûneke xoşewîst ya xwedê, bêhtir rûmet, ewlayî û serdestiyêke mirûz pêktîne. Di bingeha serdestiya psîkolojîk ya vê de, perçebûna bîrûbawerî û mirûzê koletiyê ku mirov piçûk dikir û li şûna vê, danîna nasnameyê nû ya ku rûmetê, giramgiriye û dadmendiyê dide mirovan, heye.

Xiristiyantî xebata li binî dike, ji rêxistinbûna leşkerî û siyasî dûr dimîne, qadên civakî yê bi xwe ve girêdayî diafirîne û hewl dide ku rêxistina siyasî bifetihîne, lêbelê îslamtî, ji jor de bi fetihandinên leşkerî, rêxistinên siyasî difetihîne û ligor nasnameya xwe ya bîrdoziyî, ji nûve bi şewê dike. Yek jê ji şoreşa civakî diçe şoreşa siyasî, yê din ji şoreşa siyasî û leşkerî, diçe şoreşa civakî.

Ev cudahî dişibe têkiliyên di navbera nêzîkbûna Bolşevîk ya ji jorde ku di sedsala 20an de pêkhat û rêbazên sosyal-demokratên ku ji binî ve tên. Ev yek vê herênaya ku "Bi peresanê an bi şoreşê em bigihîne armancê baş e?" tîne bîra me. Bêşik îslamê peywîrên şoreşa feodal yê leşkerî û siyasî, dane destpêkirin. Di fetihandina xiristiyantiyê ya Ewropa de, rola îslamîyê li ber çava ye.

Em dixwazin vê jî bidîne nîşandan ku xiristiyantî jî, perçek ji çanda Rojhilata Navîn e. Heger ku ji tevkariyê bête xeberdan, hê jî Rojhilata Navîn, ji aliyê şaristaniyê ve, Ewropa xweyî dike. Karê vê xweyîkirinê jî BZ 10 000 salan dest pêdike û heta weke ku xiristiyantî, li hember Ronesanê dikeve pilana duyemîn, berdewam dike. Tenê em dîroka şaristaniyê li ber çavan bigirin, bi neolîtîkê 4000 salan û bi tevayî 8000 salan, bûyerên civakî yê Rojhilata Navîn, Ewropa xweyî kirine. Li hember vê yekê, Ewropa van 500 salên dawî, serdestî bi dest xistiye. Ewropa hinek nirxên şaristaniyê yê bisînor, dide derve, lêbelê rêbazên ku heta bi mêjî jî hişk dike, dixwe dewrê. Dema ku cîhê wê çêbibe, emê hevberkirina şaristaniya Rojhilat-Rojava biwergirîtir bînine zimên.

Di ramana îslamê de, teoriya siyasîyê mijareke balkêş pêşkêş dike. Têgîna xwedê ya di nasnameya bîrdoziyî de, dema ku sazîbûna siyasî dibe dabaşa xeberdanê, siya xwe hemûyan belav dike. Gotina ku dibêjin Siltan û xwediyên desthilatiyê, Zil-ul-Allah (siya xwedê), têgîneke din ya kilît nîşan dide. Navên qehhar, hakîm, cabbar, settar, adîl û muqtedîr ku li têgîna xwedê barkirine, bi rewîştaya siyasî ne, êdî dawî yê weke navên xwediyên desthilatiyê, derkevîne pêşberî me. Divê em nebêjin ev leyîstika bîrdoziyê ye û em hêsan nekin. Di sosyalîzma ku weke bîrdoziyêke zanistî tê pêşkêşkirin de jî, gelek têgînen ku jê re kirine mal, piştî weke sazûmanên siyasî, hatine nîşandan. Di hemû sazîbûnen bîrdoziyê û siyasî de, sazûmanên têkiliyê yê wiha tên jiyandin. Ev tenê ne aybetmendiyêke îslamîyê ye. Bê çawa şeweyên vê yê pêşî û tekûz, rahîbên Sumer pêkanîbûn, me bi awayekî wergirî anîbû zimên.

Lêbelê navên siyasî ku bi awayekî gelekî zêde, li têngîna xwedê hatibûne barkirin, piştê weke bingeha bîrdoziyî ya mutleqiyeta tarî, wê rola xwe bilîzin. Ji ber vê yekê ligor xiristiyaniyê, wê rê li ber têngîna desthilatiyeke gelek hişk veke. Cudahiya wê ya ji koletiyê ev e ku li şûna formula xwedê-qeran, formula siya xwedê- qeran daniye. Di yekê ji wan de, qeran dibe xweda di sazûmana îslamiyê de, dibe siya xwedê, ango bi xwedîbûna navê xwedê, bitaybetî bi xwedîbûna navên siyasî, nêzîkî rayeya xwedê dibin.

Ev fikare ya teoriya siyaseta îslamê, ji binyata wê ya bîrdoziyî tê. Veqetîna ol û felsefeyê ku bitevayî nayê kirin jî, kêmasiyeke ku encamên girîng diderîne holê ye. Çiqas ku desthilatî bêesil dibin, ewqasî jî, ji sazûmana koledar bêhtir stemkar dibin. Jiberku xwedayên dema koledariyê pêşneketine, xweda-qeranên wê jî pêş neketine. Lêbelê xwedayê îslamiyê, gelekî pêşveçûye, bitaybetî navên wî yên siyasî curbicur in. Dema xwedî desthilatiyên ku di rewşa siya wî de, van navan parvedikin, dibe keraset. Aliyê îslamiyê yê ku gelek erênîyên wê dihelikîne (mehfdike) ev e. Di dema destpêkê de ku pêşverû û heta bi PZ sedsala 10an, di heyînen siyasî yên ji îçtîhadê (têgihîştin) re vekirî, ev xeterî ne didane der. Lêbelê dema ku rêya îçtîhadê û ya nîqaşê, bi fetwaya şêxulîslam hate qutkirin û sazûmana îslamiyê kete merhaleyeke paşverû û kevneperest, sazûmana siyasî jî bû mîna betonê. Ædî jibo ti hestyariyan, ne li der û ne li hundir bû bersiv. Li Ewropa şaristanî, ji sedsala 15an pêde, bi Ronensansê derûn û şeweya xwe diguherîne, liser bingeha kapîtalîst bilind dibe, saziyên siyasî yên îslamiyê ku despotîk, dexmeya xwe li pêvajoya Rojhilata Navîn ya herî paşverû dixin. Civak û dîroka ku ji 15 000 salan ve, timî di xêskeke bilind re pêşvedicû, êdî dikeve dema herî tarî ku qet ne layîqî wê ye. Heta weke roja me jî, rêyeke ku ji vê tarîtiyê derkeve, nabîne.

c- Di derketina îslamê de, ji aliyê aborî û civakî ve, demeke ku bazirganî serdema xwe ya zêrîn dijî, rola diyarker dilîze. Ev mijareke girînge ku derketinên olî yên ji binyata êbranî, ked jî di nav de, veguherîn dibe zemîna doringî ya bazirganiyê û lêgerîna nasnameyên bîrdoziyî yên nû, bi vê rastiyê ve girêdayî pêşvedicûn. Ji aliyê ku em dîroka olan bi awayek zanistî bi nixînin, divê ku em vê yekê timî li ber çavan bigirin. Çawa ku cotarî ya azad û gundîtiyê, bi vê ve girêdayî pêşveçûna bîrûbawerî û giyanî, bi şoreşa çandinî ve girêdayî, dexma xwe liserdema neolîtîkê dabe, pişekarî û şoreşa bajêr jî, bingeha civaka koledar û binyata bîrûbaweriya wê ye. Di van herdu demên dîrokî yên girîng de, digel ku bazirganî derketiye holê, ne bûye hêzeke çînî. Bi serayê, perestgeh û gund ve girêdayî, hewl dide. Pêşveçûna berhema zêde û guherînê, yê di warê hêza veguhêrbariya bingeh a bazirganiyê ya di dîrokê de, rolê bileyîze. Jiyana gund û bajêr ya sabît, rê li ber mîtolojiyên sekan û çêkirina xwedayên tiral vedike, veguhêrbarî û bihereketbûna bazirganiyê jî, di warê bîrûbaweriyê de, tevkeriyê li guherîna têngînan, guherandina naveroka wan û razberkirina (neberbiçavbûn) wan, dike. Bi vê ve girêdayî, di rêxistinên seresaziyan de, rêbazên olî yên nû xwe nîşan didin û wê rê li ber sêwiranên xwedê yên xwedî navên bihereket û pêşveçûyî, veke. Di derûna bazirganiyê de, razberkirina ku ji guherînê tê, heye. Di pêşveçûna bîrûbawerî û mantiq de, behreya razberkirinê, merhaleyeke girîng e. Di dewlemendbûn û pêşveçûna ziman û raman de, xwedî tevkeriyeke bingeh e. Ji mîtolojiyên bi xwedayên sekan, nekirkêr û cangiran ve girêdayî, bi vê guherînê ve girêdayî, dema olên nû yên ku giraniyê didin xwedayên bihereket, bimantiq û jêhatî, destpêdike. Pêdiviya bazirganiyê ne bi xwedayên ku kêfî hereket dikin, bi yên ku bi zagonan ve girêdayî, bîaqil, ewlekar û li her derî amade, heye.

Dema ku em têngîna xwedê ya Hz Muhemed dahûrînî, divê em bi hebûna bazirganiyê ku di jiyana civakê de, rahên xwe berdane û hatiye rewşa çîneke jêneger ve girêdana wê çêbikin. Hz Muhemed bi xwe, berhema jiyaneke pevrayî ya bi jineke bazirgan re ku di rêya bazirganiyê de derbasbûye. Wê demê ewlekarî, jibo bazirganiyê pîrsgirêkeke bingehîn e. Rawestandina talankeriya qebîleyên çolê, ji hezar salan ve timî bûye pîrsgirêk. Brahîm bi xwe jî, serokê qebîleyeke bazirgan e. Hê dema BZ 1700an ku derketina wî ya holê van salan tê texmînkirin, ewlekariya rê, hêzeke mezin pêwîst dike. Heyîna civakî ya Erebaştan, bi girêdana li bakur Anatolya û Mezopotamya, li rojava Misir û Hebeşistan û li rojhilat bi êranê ve, pêşveçûna xwe pêktîne. Berî van, hê bi pêşveçûna civakên çandinî yên van herêman re, ji nêzîk ve girêdayî bûn. Rola wan ragihandin û bazirganiya di navbera van navendan de ye. Bazirganiya nîrxên doringî û menewî yên ku navendên şaristanî derandine holê, ji aliyê zadeganên qebîleyên çolê ve tê meşandin. Hêştir mîna keştiya çolê, amûra gihanî ya bingeh e. Hebûna bi sedan navê hêştirê, ji ber vê girîngiya wê ye.

Tenê ne mal, mîtolojî, ol û ramanên curbicur jî, dibin mijara bazirganiyê. Ev hatiye çespendin ku peykerên xwedayan, weke mal li bazaran hatine firotin. Şaristaniya Grek, di mercên deryayê de, ev hê bêhtir pêşvebirîye. Derya ketiye şûna çolê û keştiya bayî jî ketiye şûna hêştirê. Di vê navberê de, di rêyên çol û deryayê de, bi mal re gelekî bazirganiya ol û xwedê jî tê kirin. Pêşketina peykertraşiyê,

ji ber pêdiviya berhemên xwedayî û bihabûna wan e. Li qasî guherîna di warê olî de, ramana felsefê jî di van rêyên bazirganî de, pêşveçûye. Bilindbûna Babîl û ya Asûr û împeratoriya wan, bi saya bazirganiyê ye. Yên ku li Hindê,

Çînê, Asya Navîn û li êranê bûne sedema destpêka şaristaniyê, bazirganên Sumer, Babîl û Asûr in. Ji ber rêbir û cerdevanên di rêyên bazirganiyê de, qereqolên dewletan yê bihêz hatine avakirin. Di nava demê de, bi çêbûna mêhtingehan ya li dor van qereqolan, navendên şaristaniyê yê nû û bi van ve girêdayî, gelek dewletên damezrandin.

Tê zanîn ku Mekke xelegeke girîng ji ya vê pêvajoya dîrokê ye. Çawa ku Misir û Babîl berhemên Nîl, Ferad û Dicle ne, Mekke û derdora wê jî, berhemên bazirganiyê ne. Heger ku bazirganî nebe, li cîhê Mekkeyê konek jî nayê danîn. Di ayetên Quranê de jî, ji aliyê Hz Muhemed ve hatiye nîşandan ku Kabe bazara pûtan e. Ev nirxandinên kin jî nîşan didin ku îslamtî him ji aliyê nasnameya bîrdoziyî ve, him ji aliyê sazîbûna siyasî leşkerî ve û him jî di qada çalakiyên aborî de, bi heyîna bazirganiyê ve bi awayekî kûr girêdayî ye. Derketin û bilindbûna îslamtîyê, hêz û temsîla bîaqilî, sawdarî û birêzîkbûna bazirgan e. Ev çalakiyê wisa ye ku yekem car malbateke bazirgan, bi nasnameyê bîrdoziyî ya serbixwe, bi hêzeke mezin ya lêdanê, dewleteke nû û şaristaniyê diafirîne. Piştî ezmûna qerantiya Qudsê ya qebileyên êbranî, ev bazirganiya ku bi daneheva hezar salan, li nîvgirava Erebaştan hatiye pêkanîn, teqîneke mîna volkan e ku bandor li tevaya cîhanê kiriye. Pêngava qebileyên Ereb ya olî, leşkerî, siyasî û aborî ku bi bazirganîbûnê ve girêdayî ye, herwiha bûye dewleteke mezin û hêzeke şaristaniyê. Serdema aboriya bazirganiyê û ya serdestiya bazirgan e. Di ayetên Quranê û di sinetên Hz Muhemed de tê dîtîn, bê çawa wesfê bazirganiyê tê dan û bê çawa weke nirxekî xwedayî yê pîrozwer tê berdan. Heçku di serdema neolîtîk û di sazûmana koledar a Sumer û Misir ya bi çandiniyê ve girêdayî de, tiştên pîroz, zadên rîwekî, fêkiyên daran û ajalên kedî ne. Têgîna pîroziyê û peyva wê ji zimanê Sumerî, ji peyva kaûta tê. Piştî çîna çandiyar yê gundî, çîna bazirgan duyemîn hêza mezin a civakî ya şaristaniyê ye. Koletî di navbera van herdu çînan serdest de belav bûye. Pişekar hê bêhtir bi bazirganiyê ve girêdayî ne û di pey bazirgan re tên. Li Rojhilata Navîn, vê çînê bi navê bazirganên selefkar bi nav dikin. Evan di warê sazîbûna selefê (faîz) de, pêşevanî kirine. Pêşveçûna diravan û ya matematîk û hesêb jî, bi pêwana bazirganiyê ye. Ramana neberbiçav û cudabûna wateya peyvan jî, ji guherîna jiyanê aborî û bazirganîbûnê tê.

Di serdema koletiyê heta di aboriya çandinî ya neolîtîkê de, bazirganî di nava pêşveçûneke bi sînora de û bazirgan di rewşekî ne serbixwe de ne, lê di serdema feodaliyê de, rewşeke berevajî vê yekê derdikeve holê. Bajar weke navendên bazirganiyê yê serbixwe, qada gundewariyê û çandiniyê bi xwe ve girêdidin. Dewleta Mekke-Medîne ya îslamê, mîna keke vê veguherîna dîrokê ye.

Di zemîna civakî ya şaristaniyê de, guherîneke girîng çêdibe. Aborî li dora bazirganiyê, ji nû ve tê birêkûpêkirin. Bêhtir, giraniyê didin berhemên bazirganî. Jibo danûstandina di warê aborî de, dirav derdikeve holê. Êslam, weke hêzeke bazirgan ya cîhana şareza, derketiye holê. Eynî weke îro ku cîhan ber bi kadîbûnê ve diçe, çawa DYA jibo astengiyên li pêşya bazara serbest rake, rolê dileyîze, îslamtî jî vê demê, jibo ku bazirganî di nava ewlekeriyê de, bi awayekî serbest pêşbikeve, heman rolê dileyîze. Di navbera navendên hilberînê de, dewleta ewlemend rûdinîne, ji Atlantîk heta bi Okyanûsa Mezin, ji Okyanûsa Hindê heta bi çolterên Sibîryayê, digîhe rewşekî ku di pêşveçûna şaristaniyê de, roleke mezin bilîze.

d- Bandora îslamtîyê ya liser humanîzmê û liser takekes, mijareke girîng e ku liser bête rawestandin. Ev rastiyeke mîsogere ku xiristiyanîyê, bawerhişkiya ku ji qewman û ji çînan dihat derbas dike, jibo afirandina olekî (humanîzm) mirovatîyê yê ji hemû gelan û ji qismên civakî, pêngaveke girîng diavêje. Yekem car mirovatî weke têngînekê, biwate dibe. Bûyina ji qebîle, ji nijad û civakên cuda, jibo biratiyê ne asteng e. Dema ku îslamtî bi qewmê Cihû û Mûsewîtiyê re bête hevberkirin, wê bête çavdêrîkirin ku îslamtî weke tevgerê navnetewî destpêkiriye. Xiristiyanîyê, ji vî aliyê xwe ve, weke olekî herî li pêş, heta weke îro rola pêşevaniyê listiye. Berevajî vê yekê Mûsewîtiyê, ji roja ku bûyî heta weke îro, bawerhişkiya xwe ya qewmî domandiye. Gelek olên din jî, di nav sînoren herêm û qewman de mane. Êslamtî ji vî alî ve, di naveynê de disekine. Her çiqas ku Hz Muhemed gotibe, "Rasêrbûna Ereb ya ji Ecem, encex bi pîleya perestîna (îbadet) be", dîsa jî ev rastiyeke e ku wesfê qewmîtiyê, zêde derbasnekiriye.

Rewîştî çînî ya tebeqeya cihû yê jor, timî qewmîtiyêke nijadperest (şoven) pêdivî kiriye. Jibo ku rewşa xwe ya îmtiyazdar bidomîne, divê ku vê taybetiyê biparêze, cihûtî, him jibo ku weke çîneke serdest be û him jî qewmekî birêvebir be, qewmîtiyê pêdivî dike. Xweda Yehova dibêje, "Tu qewmê min yê bi îmtiyazî, min tu bi xwe re zewicandî" Herwiha wesfên nijadperestî çavnebariya xwe datîne holê. Di pêvajoya dîrokê de, cihûyên ku him rola mezin dilîzin û him jî êş û trajediyên mezin dijîn, bi vê bawerhişkiya wan ya bîrdoziyî ve girêdayî ye. Têgîhîna wan ya xuyanîbûnê, wan mecbûrî

ramana mezin dike û karê herî mezin li wan pêwîst dike, lê ji aliyê din ve jî, bi newekhevî û çavnebariya ku li derdor belav dikin jî, rik û dijminatîyê pê re tînin. Faşîzma Hîtler, di vî babetî de xelesa dawî ye. Trajêdiya Filistîn-ësraêl bingeha xwe ji telpên dîrokî werdigire.

Têgihîna xiristîyantîyê ya berevajî vê yekê, tevkarîyeke mezin li biratiya mirovan û aştîyê kiriye. Ev di hişmendîya mirovatîyê de, pêngaveke humanîst ya mezin e ku bi wekhevîyeke aştîyane nêzîkî hemû komên etnîk, qewm, nijad û ramanên cuda dibe, sepandinên sosyalîzma hoveber yên pêşî pêktîne. Jiberku zayendan ji hev cuda nake, hê bêhtir qedirbilind dibe. Ev wê gotîneke di cîh de be ku em bibêjin, xiristîyantî tevgera mezin ya navnetewî ya sosyalîzma hoveber a pêşî ye. Encex bêsilbûna wê ya vê dawîyê, pêşveçûna wê ya pêşî temsîl nake. Pêdiviya xiristîyantîyê jî, di bingeha vegera derûna xwe de, bi nûjenîyê heye.

Di vî babetî de, îslamî di navberê de disekine. Ev yek hinekî jî ji rewîştê çînî tê. Êslamî hê bêhtir olê çîna navîn e. Jiberku çîna bazîrgan hêza bingehe ya nasnameya wê ya bîrdozî, rêxistinbûna wê ya civakî û siyasî ye, ne weke cihûyan qewmîyetparêz û ne jî li qasî xiristîyantîyê navnetewî ye. Jiberku pêwîst e qebîleyên çolê bike yek, di pêşveçûna qewmê Erebe de, roleke mezin listîye.

Êslamîyê, qewmîyetparêziyeke bi hişmendî nekiriye. Xweda yezdanê hemû mirovatîyê ye, Ligor xweda Yahova, xwedayê îslamê, bi wekhevî nêzîkî hemû komên etnîk û qewman dibe. Cudahîya nijadan jî nake. Lê bimîsogerî, ne sosyalîst e. Bi awayekî vekirî tê dîtî ku di destpêkê de di Quran û sinetan de, cudahiyeke çîn û zayende ya nerm tê kirin. Digel hişkbûna Brahmâyê Hîndû, xwedayê îslamê gelekî nerm e. Mirov gihandine humanîzmê. Olên yek xweda yên din, rewê dibîne. Dema xerxa xwe bide, herkes dikare di nava sazûmanê de cîhê xwe bigire. Kesên ku hêrîştî îslamê dikin, kafîr tene îlankirin, şerê heta dawî bi van re, weke perestêke herî mezin tê nîrxandin û weke cîhadêkê datînin ber ometê. Wateya ometê navnetewîtiya îslamê ye û weke çîna lîberal ya roja me ye. Herwiha di pilana dîrokî de, cihûtî ola yên rasere, xiristîyantî ola yên li jêre û îslamî dibe ola yên navîn. Ji xwe ku ev her sê jî, hebûna xwe heta îro parastine, ji ber vê rewîştê wan e.

Rola îslama ku qebîleyan bike yek û netewîbûna serdema navîn pêkbîne, bi erênî ye. Çawa ku kapîtalîzmê rê ji netewan re vekiribe, îslam jî di çêbûna neteweyîyê û qewm de, roleke girîng listîye. Bitaybetî, qewmên ku desthilatdar, di pêşvebirina qewmê xwe de, ev rol hê mezintir listîne. Di îslamîyê de, qewmên ku bûne desthilatdar, Erebe, Farîs û Tîrk, weke netewên îslamê pêşketine. Heger îslamî nebûna, ev vekirîye ku qedera wan wê gelekî cuda bûna. Pêwîst e tîkîliyên di navbera çînîti û neteweyîtiya îslamê de, bi kûrayî werin dahûrandin. Liser van tîkîliyan, nîrxandin zêde ne hatine kirin, encex di vî babetî de, derbaskirina nijadperestîya netewî û olî, çûna ber bi navnetewîyeke îslamê ya ji biratî û aştîyê re vekirî, jibo derbaskirina gelek pîrsgîrêkan wê roleke girîng bilîze.

Di wateya takekes de, îslamîyê jibo mirvan dibêje, "eşrefî mahlûqat (afîrîdeyê herî bi rûmet)". Ev bi kûrayî têgihîneke mirovahî ye. Mirov dikare bibêje ku îslamîyê ev, li hember koletîyê gotîye. Mirovê ku koletîyê gelekî nîzm kirî, îslamîyê xwestîye ku bi rûmetê bilnd bike. Ev têgihînek e pêşverû ye. Divê ev weke bûyereke serdemê ya herî girîng bête dîtî ku li Rojhilata Navîn, mirovên bi hezar salan di dorpêça koletîyê de, bi rûmetêke wiha tene bilindkirin. Bi vê yekê belkî, ji asta azadiya civakê pêşdetir, nêzîkî azadiya takekes dibin. Perçekirina giyan û bîrûbawerîya koletî, îlankirina ku ji xwedayekî neberbiçav pê ve, ji kesekî re benîtî nabe, divê ku weke şoreşa azadiya takekes were nîrxandin. Mirovên ku bi tîkîliyên koletîya Rojhilata Navîn ya ku ji Sumer û Misrê mayî, bi şewegirtina bîrûbawerî û giyan û herwiha xerîbî derûna xwe, heger bisînor be jî, nêzîkî derûna wî bike, ev wê jibo îslamê bibe qezenceke mezin.

Mirovatîya demê, van aliyên îslamê dibîne û bê herênayî girêdana xwe pê re çêdike. Di warê takekes de, encama şoreşa îslamê ya herî mezin, ev e. Koletî bi tevayî ranekirîye. Dorhêleke azad ku kapîtalîzmê ji takekes re pêkaniye jî, bi temamî ne sepanîye. Lêbelê di rakirina koletîyê de jî û di tevkarîya ku kapîtalîzmê li azadiya takekes kirî de jî, rola îslamê mîsoger û diyarker e. Bêyî îslamê, ramana rakirina koletîyê wê ne rast be. Ji xiristîyantîyê zêdetir, îslamîyê koletî bi pêngavên tundraw derbaskirîye û ev çalakiya xwe ya tundraw gihandîye hemû qadên şarîstaniyê, qebîle û komên etnîkî yên bêhîjmar, gihandina rewîştê herî pêş. Herwiha ev wê bibe nîrxandîneke rasteqîn ku em bibêjin, şarîstaniya ku cîhan jibo nevetewîya kapîtalîzmê amade kirî, îslam e.

C- Sazîbûn û belavbûna şarîstaniya feodal

Demê hate çespanî ku bîrûbawerî û giyana koletîyê û sazûmanên wê yên siyasî, wê ji aliyê xiristîyantî û îslamîtiya ku kevnespîyên Hz Brahmî ve, werine derbaskirin, êdî ketina pêvajoya belavbûn û sazîbûna feodalîyê, jênerêv dibe. Bi peresana xiristîyantîyê ya ji bin ve û bi şoreşa

îslamtiyê ya ji ser ve, sazûmanên koletî yên Rojhilat û Rojava yên ku tên perçe perçekirin, ji holê radibin, şeweyên şaristaniyê yên nû tên sazîkirin û belav dibin.

Pêvajoyên bîrdoziyî, kesayetiyan ku şewegirtinên civakî wê li dora wan pêşvebiçin, çêdike. Ev yek pirogram û xebata kadroya sazûmana nû ye. Propaganda ya girseyê û çalakî jî, xebatên ku civaka kevin nederbasdar bikin e. Bi gelemperî, ev dem bi pêvajoya şoreşê tê binavkirin. Di xiristiyanîyê de, pêvajoya bîrdoziyî û salên şoreşê dirêj kişandine. Hewariyên êsa yên pêşî û ravekirinên wî, kesayetiya bingeh, kadro û pirogramê, tîne holê. Dema ku heta îslamtî weke olê fermî hatî îlankirin, salên çalakî yên liser propagandaya girseyê ne û nêzîkî 300 salan domandiye. Digel êşkenceyên erjeng, bi têngîhîneke bawerî, aşî û biratî, bawerî û têkiliyên kevin belav kirine, têkilî û baweriyên nû sazîkirine û gihane serfiraziyekê. Êslamtiyê di kesayetiya Hz Muhemed de, kesayetiya xwe ya pêşevanî ditiye, bi ravekirinên pêşî re, bi koma Mekkeyê yên hindik lê bawermend re, pirogram û kadro çêdikin, hê zû dikevîne pêvajoya şoreşa ku aliyên wê yên çalakî zêdetir. Şoreş bi Hz Muhemed re, di dema çar xelîfeyan de, di nêzîkî çil salan de, gihaye serfiraziyê.

Di her şoreşa girîng de, pêvajoyên bi vî rengî têne jiyandin. Digel ku şoreş di demeke kin de digihîne merhaleya armanca xwe ya pêşî, ev pêvajoyê di peresanan de, domdirêj dibe. Cudahiya di navbera wan de, ji şeweya xebata wan tê. Pêvajoya bi şûn de, demeke cuda ye, bi gelemperî ev dem yên sazîbûn û belavbûnê ne. Hêmanên şoreşê û têkiliyên nimûnek yên pêşî ku xwe dane çespendin, bi sazîbûneke domdirêj, pêdivî bi belavbûna kûrahî û firehî dibîne. Dawî, sazûmana ku derdikeve bandevê, bi pêvajoya hilweşînê re jihevdikeye û cîhê xwe dide çêbûnên nû.

1- Pêvajoya sazîbûna xiristiyanîyê, PZ di navbera salên 500 û 1000an de, timî di rewşa pêşveçûn û belavbûnê de ye. Bi fermîbûnê re, di nava împeratoriya Roma de, bi awayekî vekirî dest bi sazîbûnan dîke. Ev sazîbûnên di bingeha dêrê de, ligor rêxistinên xelwetxaneyan pêşveçûnên mezin pêkanîne. Çawa dema Sumer, li dora perestgehan bajar dihatin avakirin û dewlet çêdibûn, dema feodalîyê jî, rewşeke wiha tê jiyandin. Li dora saziya dêrê, bi qesirbendîyê herî pêşketî, bajarên serdema navîn ji nû ve têne avakirin, herwiha bingeha dewletên nû tê danîn. Eslê wê, yê ku Ewropa amadeyî şaristaniyê kiriye, saziya dêrê ya fermî ye. Dêr li kûderê vebûbe, li dora xwe zanîngehek (zanko) vekirîye, bi zêdebûna nifûsê re, bajarên nû têne avakirin, li van bajaran yan rêvebirîya begîtiyê tê sazîkirin yan jî şaredarî tê damezrandin û ber bi dewleta hemdem pêngav têne avêtin. Ya girîngtir, binyata bîrûbawerî û giyana gel, ligor viyana xwedê perwerde dike, bingeha dewleta serdema navîn datîne û bi hêz dike. Êmperatoriya Roma ku nîrxên bawerî û mirûz wînda kirî, çawa jihevketibe, bi binyata bawerî û mirûzê nû, bingeha împeratoriyan Roma Pîroz, Germen û Frank jî wiha tê danîn. Heger ku dêr ne gihabûna hemû barbarên Ewropa û ew perwerde ne kiribana, ne gengaz bû ku ji şaristaniya Ewropa bihata behskirin. Lewra bîrdoziyê ku barbaran şareza bike tîne bû. Şaristaniyê bê bîrdozî jî ne gengaz e. Xiristiyanîya ku saziyê nîrxên bawerî û mirûz ya Rojhilata Navîn, PZ ber bi salên 1000an, tevaya Ewropa difetihîne û derî heta bi dawî ji şaristaniyê re vedike. Pêvajoya paşmayîn û hilweşîna xiristiyanîyê nabe sedem ku ev rola wê ya dîrokî, bête windakirin. Şaristaniya Ewropa, berhema xiristiyanîyê ye. Nîrxên bawerî û mirûz yên ji daneheva şaristaniya hezar salan, diherikîne giyana barabar a Ewropa ya ku ji dema hovîtiyê mayî û tîpê mirovê şareza diafirîne. Li dora vî tîpê mirov, civaka bajêr ya nû û gundîti hatiye pêkanîn, bi van gund û bajaran ve girêdayî, dewleta pîroz hatiye damezrandin. Ev dem dema ku nîrxên şaristaniya Rojhilata Navîn, rasterast yan nerasterast hatine kişandin e. Çawa ku îro nîrxên şaristaniya Ewropa, têne kişandinê her aliyê cîhanê, nîrxên şaristaniya Rojhilata Navîn jî, bi hezar salan him kişaye tevayî cîhanê û him jî kişaye Ewropa.

PZ di salên 1000an de, dêr serdestî tevaya siyasetê ye. Dêr bi xwe dewlet e. Komên etnîkî yên ku dişibîne hev, ber bi qewmên berfirehtir dibe û rê li ber netewebûna pêşketî vedike. Siftbûna siyaseta li dora dêrê, ji etnîkî ber bi siftbûna netew û têngîna welat ve dibe. Di vî babetî de, netewebûnên serdema navîn yên Ewropa bi saya dêrê ne. Bi taybetî, di warê ziman û çandê hevpar de, dêr roleke mezin listiye. Di warê xwendin û çanda mirovatiyê de, hemû nîrxên ku di destê wê de, fêrî wan dike û Ewropa bi xwendin, nivîsandin û bi çand kiriye. Herçiqas ku olî be jî, teolojiya pêşî û ramana felsefî belav kiriye, kiriye ku aqil û bîrûbaweriyê bi pêş ve pêngav avêtiye, pêşevaniya şewegirtina giyanî ya nû kiriye û bingeha serdemên zanistî û Ronansa vê dawiyê daniye. Digel vê pêşveçûna wê ya bi kûrahî, heta bi çiyayên oral li tevaya parzemîna belav dibe.

Xiristiyanî bi belavbûna ber bi Rojhilat ve, ewqasî serkeftî nebûye. Di vê yekê de, pêşî împeratoriya Pers-Sasanî û dû re, îslamtî bûne asteng. Rola Grekan ya ku xiristiyanî kişandine ber bi Rojava, li Rojhilat Asûrî-Suryanî leyîstine. Bi taybetî mezhebê Nastûrî, di warê xwegirtina dêrê ya li Rojhilat, rola mezin leyîstiyê. Nastûrî, girêdayî klasîkên felsefeya Grek, di pêşveçûna teolojiya xiristiyanîyê û gihandina wê ya îslamtiyê, di rewşekî fêrker û danehev de ye. Rahîbên Nastûrî serdema klasîk ji

serdema navîn re, kirine mal. Ev rewşenbîrên serdema navîn yên ku liser lingan mane. Bêşik di vê de, para çanda Asûr û Babîl ya ku ji Sumer maye, gelek e.

Mirov dikare vê pîrsê bike: Heger ku weke Ewropa, li Asya jî dêreke rewşenbîr û xiristiyani bi sazîbûn û serdest bûbana, gelo dîrok wê çawa pêş biketa? Baweriya însan bi vê yekê tê ku bi windakirina şensê tevgera ronakbûn û ji nû ve şaristanîbûn ya ku pêşî manî (PZ sedsala 3.), dû re rahîbên suryanî pêşevaniya wê dikirin, Mezopotamya gelek tişt winda kirin. Mirov dikare bihizire ku siltanên Emewî û Abbasî, bi hêza îslamiyê ya di destê xwe de, li vê axa ku şaristani jê zayiye, şaristaniyeke hêja pêkneanîne, ketine nava kêf û şahiyên û gelek tişt winda kirine. Dema ku bi levdanên olî yên Ewropa re bê hevberkirin, levdanên îslamî û xiristiyaniyê, rê li ber trajedî û wêrankeriyên mezin vekirîye. Di vê roja me de ku nîqaşên ol û laîkiyê têne kirin, divê ku em bi rexnegirî nêzîkî dîrokê bibin û hinek dersan derînin.

2- Sazîbûn û belavbûna piştî şoreşa îslamê, bi Xanedaniya Emewî pêşve çûye. Bilindbûna Xanedaniya Emewî û desthilatdariya wê, bi şoreşeke dijber, gengaz bûye. Digel ku Hz Muhamed ji eşîra Qureyş, ji bavikê Haşimî ye, Osman û Mûawiye jî ji bavikê Emewî ne. Rêvebiriya Mekkeyê hê bêhtir, ji aliyê vî bavkî ve tê meşandin. Hz Muhamed, rêvebiriya ji destê vî bavkî digire û bi şoreşeke nû vediguherîne şeweya saziyê dewletê. Ev çalakî şoreşger e. Liqasî ku xwedî asoyeke pêşveçûnê ye, ber bi sazîbûnên leşkerî û siyasî ve diçe û qebîletiyê derbas dike, van hemûyan bi bîrdoziyê nû, bi ayet û sinetan pêktîne. Bavkê Emewî yê eşîra Qureyş, piştî ku şoreş giha serfiraziyê îslamî pejirandin. Ev pejirandin bêyî dilê wan, tenê jibo berjewendiyên bû. Ev di nava xwe de, li hember îslamê rikdar bûn. Piştî mirina Hz Muhamed, amadekariyên xwe bilez kirin. Walîtiya Şamê ya Mûawiye, weke navendeke şoreşa dijber xebitî. Mûawiye, di hunera desthilatiyê de bi ezmûn bû, li Şamê hemû dek û dolabên desthilatiya bîzans fêr bûbû. Li cem wî ji êranê, ji kevneşopiya desthilatiya êranê, lawên Bermekî hebûn. Ehlîbeyt, di kesayetiya Alî de dihate temsîlkirin. Alî aligirê duristiyê û yê dadmendiyê bû, herwiha dixwest ku şoreşê weke di derûna wê de, bide meşandin. Lêbelê di hunera desthilatiyê de, bêezmûn û liser duristiya xwe gelekî saf bû. Digel bi hêmaniya wî, ne ligor sazîbûneke dewletê bû. Weke milîtanekî şoreşê, gelekî serkeftî bû, lêbelê di warê sazîbûn û dewletbûnê de, Ligor Mûawiye ne bitêrayî bû. Ji aliyê din ve, wî bawerdikir ku ew jî mîna wî, bi olê pîroz ve girêdayî ne. Wê were fêhmkirin ku di vir de, şelipî ye.

Belkî di dîrokê de, şoreşa dijber ya herî mezin, şoreşa xanedaniya Emewî ye. Li hember îslamê qet durist nebûne, di nava xwe de bi rik xwe tûj kirine, lêbelê jibo berjewendiyên xwe, ji hemû kesî bêhtir dest liser serkeftinên wê danîne, giregirên vê xanedaniyê, bi Osman gevekê pêştir dikevin, bi kuştina Alî û li Kerbelayê qetilkirina Hiseyn ya hovane, bi tevayî desthilatiyê diêxine destê xwe. aêşa vê şoreşa dijber ya stemkar ku PZ ji sala 640î heta bi 681ê domandî, ev 1400 sal in ku hemû ometa îslamê dikişîne. Tiştên kirine ev e ku ji şoreşa îslamê û hêza wê sîd bigirin, herwiha careke din ji nû ve qebîletî û xanedaniyê biserbixin. Vê pêngavê di pêvajoya dîroka îslamê de, paşverûti xweyî kiriye û rewîştên civaka kevin ya bi pekutî û mijokatî bihêz kiriye. Tiştên mayî navê îslamê ye û eslê wê xiyaneta li îslamê ye.

Vê dawiyê bi 12 êmaman, dû re bi Şîî û bi gelek tevgerên batîni, li wê derûna îslamê hatiye gerandin û xwestine ku biparêzin. Lêbelê ev tevgerên ku hewldanên mezin pêkdianîn, biserneketine. Herwiha dema em bêjin dîroka îslamê, pêdivî ye ku em îslama şoreşger û îslama dij- şoreşger ji hev veqetînin û rastiyan deynin holê. Dîrokeke îslamê ya di xêskê rast de, jiberku wê xiyanetê û şoreşa hember veşêre, wê jibo hemû kom û civakên ku dibêjin em îslam in, bibe korîtî. Heta ku ev şoreşa dij, bi hemû encamên xwe ve neyê dahûrandin, ravekirina dîroka îslamê û liser navê îslamê nîqaşên biwate, ne gengaz e. Bi sedsalane kêmberiya rewşenbîrên îslamê, ji ber vê yekê ye. Kerbela ne tenê kêliyêke bi karesat e, dîrokeke binalet ya berdewam e, karesateke mezin e ku di pêvajoya dîrokê de liser navê îslamê tê jiyandin. Hê jî li êran, li Cezayîr û li gelek welatên îslamê, tiştên diqewimin, bi vê rastiya binalet ve girêdayîne û dide nîşandan ku ev şoreşa hember, bi hîkariyêke piçûk nayê derbaskirin.

Tê zanîn ku gelek şoreşan, pêvajoyên wiha derbaskirine. Hê jî bandora şoreş û hember şoreşên herî hemdem yên Fransa û Rûs, berdewam dike. Lêbelê dema ku mezinbûna şoreşa îslamê, gerdûnîbûna wê û dîroka wê, li ber çavan were girtin, ev yek wê gelekî girîng be ku nîqaşêke di vî derbarî de, resene û bersiva rojê be. Pêwîst e ku binyata civakên îslamê ya bi êş, bi qeyran, paşmayî û bi pîrsgirêk yên ku bi vê dîrokê ve girêdayî, xweş werine dahûrandin.

Bi vê rexneyê re, sazîbûn û belavbûna îslamê di dema Emewîyan de, bilez dibe. Rastîbîniya Mûawiye û ya peyhatiyên wî, di vê pêşveçûnê de, xwedî rol in. Ji Okyanûsa Atlas heta bi Hindê belavbûnekê hatiye pêkanîn. Li Bakur gihaye pesarên Qefqasya, li Başûr gihaye heta bi nava Efrîqa yê. Di warê dewletbûn, ango sazîbûna siyasî de, ji kevneşopiya Bîzans û Sasanî sîd werdigire.

Bermekî û gelek malbatên ji binyata xwe ve burokrat, têne serê rêxistinên dewletê. Hê bêhtir giregirên civakan, liqasî ku civaka xwe bi navenda dewletê ve girêdidin, ewqasî di nava dewletê de, bibehre û bihêz dibin.

Nimûnaka împeratoriya Pers, mînak tê girtin. Ji vî aliyê ve, hê zûka bi saziyên koledariya demê re, lihevkirinekê dikin. Weke hemû şoreşên hember ku bi saziyên serdest yê civakên kevin re, lihevkirinekê dikin, li vira mînakeke herî bihêz tê sepandin. Desthilatiye Xanedaniya Emewî ku sed salî domandiye, liser navê îslamê jibo împeratoriyeke bihêz, bi têrayî ye. Libelê di hereketên fethê, dagirkirin û talanê de, wisa xedar û stemkar bûne, zivirîna li hember wan pêwîst bûye. Li hemû aliyên bizavên dijber derketina holê. Li qasî hereketa 12 emaman, xaricî û gelek terîqetên Batînî, vê demê derketine holê.

Berxwedana pêşî ya serketî, li êranê, li herêma Xorasanê çêbû. Li hember Helen, Patan ji li vê herêmê serhildabûn û di encamê de, Xanedaniya Arsekiyan ya ku 500 salî domandî, tê damezrandin. Partan civakeke herêmî ye ku ji Pers û Med yê Aryen cuda ne. Xwedî kevneşopiyeye serhildêr in. Navenda wan Xorasan e. Emewiyan ji bilî hevkarên xwe, rê li ber bizava hemû gelên din û ya Ehlîbeyt (malabata Pêxember) vekiriye. Di nava qebîleyên ereban de, bitaybetî qismên hejar weke Xarîciyan ji mêj ve, di nav serhildanan de ne. Alîgirên Elî weke elewî û şîî, tenê ne di nav ereban de, di nava gelên ku bizorê bûbûn îslam de jî, derketine holê. êran ji dema sumeriyên ve, li hember hemû hêrişên ku ji rojava ve hatin, rawestiya ye û di vî babetî de, xwedî kevneşopiyeye serketî ye. Piştî ku emperatoriya Sasanî ya riziya, bi çend derbeyan têkçû, rê li ber vê kevneşopiyê vekir ku careke din bi keve tevgerê. Eynî weke serhildana Partiya ya piştî Persan, dîsa bi pêşevaniya Ebû Muslim tevgerê berxwedanê ya bi navenda Partiya-Xorasan dest pêkir. Bi tevlibûna Fars, Kurd û Azeriyan, mîna aşîte mezin bû û PZ di sala 750an de, bi hilweşîna emewiyan, serfiraz bû. Ev jibo îslamê, dikarîbû bibe derfeteke nûjeniyê. Bîranînên şoreşê, hê zindî bûn. Lêbelê ev fersend ji aliyê ebbasiyên ku ji emewiyan ne cuda ve, ne hate bicîhanîn.

Bi awayekî hovane, serokê serhildanê Ebû Muslim kuştin. kuştina Ebû Muslim, li qasî ya Elî rolekî neyînî listiye. Paşverûtîbûna feodalîzmê ya zûka, bi van herdu kuştinan ve, ji nêzik ve girêdayî ye. Ebû Muslim û Elî, du kesayetiyan îslamê bûn ku bawerhişkiya wan ya qebîletiyê nebû, ji mafên hejaran re giramgir û dadmend bûn. Jiberku birêxistin nebûn û di nava sînorên terîqetan de, bi awayekî veşartî hereket kirin, gelek encamên nebaş bi xwe re anîn.

Gelek mînak didin nîşandan ku dema bizavên şoreşger bimezhebîdibin, bi kêmayî liqasî ku şoreşa dij were ser desthilatiyê, rê li ber paşverûtîyê vedikin. Bimezhebûn, bêesilbûnê bi xwe re tîne. Jixwe dema ku bizavên şoreşger bisernakevin, sedema vê nebiserketinê, rê li ber bimezhebûnê vedike. Herçiqas ku ev bizav, xwe weke girêdayiyên şoreşê bidine nîşandan jî, ji îstîsmarkirina wê xwe rizgar nakin. Di dîrokê de, çavkaniyeye din ku desthilatiya şoreşa dij xweyî dike, bimezhebûna dijberên şoreşger ya paşverû ye. Di mercên hemdemî de, şoreşên sosyalîst û şoreşên netewî yê demokratîk ku li hember desthilatiya şoreşên dij, van bimezhebûnan dijîn, dide nîşandan ku ev rastî, bûyereke di hemû deman de çêdibe ye. Tiştên ku bi serê gelek bizavên şoreşgerên tirk hatî jî, wiha ye.

Dema Abbasiyan, di dîroka îslamê de, dema gihîştinê temsîl dike. Vê demê şîrovekirina îslamîyê ya olî ku bi felsefê bihêz dike, gelekî pêşvedîçe. Berî Ewropa bi gelekî, klasîkên Grek, di serî de Eflatûn û Arîsto wergerandine erêbî. Di warê felsefê û zanistê de, demeke ronakbûnê destpêdike. Ji her alî ve serdestî ya Rojhilat e. PZ salên 800-1200an, weke serdema îslamê ya zêrîn e. Nimûnaka dewleta navendî, di nava hemû begîtiyan de dimeyê û amadeye ku rê li ber gelek dewletan veke. Ev yek mîsoger e ku evder, di tevaya cîhanê de navenda şaristaniya feodal e. Êslamîyê bandora xwe ji Îspanya heta bi Çînê, ji Sîbîrya heta bi nava Afrîqa, ragihandiye. Jibo bazirganiyê, şebekeyeke ewlekariyê ya mezin û rêxistinên binesazî, rê û xan hetine damezrandin. Bazirganî bi awayekî bêhempa pêşketiye. Li hember xiristiyanîyê, li her qadê serdestiyek xuya ye. Fetihandina Ewropa ya îslamê, bizorê hatiye rawestandin. Lêbelê di warê bandorkirina felsefe, zanist û têgihîna rêvebiriyê de, ti tişt ji hêza xwe winda nekiriye. Jibo Ewropa, Rojhilat welatê xeyala ye. Nîrxên şaristaniya Rojhilat, cîhana xeyalên wan rengîn dike. Gelek pirtûk têne wergerandin û wan qezencî latînî û zimanên din dikin.

Îslam li Rojhilat ketiye Hindistanê. Şaristaniya Hindê, bi îslamê re ketiye demeke nû. Êslambûneke berfireh tê jiyandin. Ev bizav heta bi Çînê berdewam dike. Li navenda Asya, hemû êlên tirk, bilez îslamîyê dipejirînin. Qebîleyên Tirk û Moxol ku yê dîrokê bihejînin, liser zemîn û saziyên ku îslamê pêkanîne, li ber hereketê ne. Di vê demê de îslamî, ji bîrdoziyî heta bi polîtîka û leşkeriyê, ji aboriyê heta bi zanist û felsefeyê, di her warî de, di cîhanê de hêza herî mezin e. Hem ji aliyê erdnîgarî ve bi firehbûna xwe, him jî bi sazîbûn û bîrûbawerîya xwe, rewşa Rojhilata Navîn ya ku di

şaristaniyê de pêşevan in, dema xwe ya dawî ku bihêz dijî. Weke pêşevaniya hemû serdeman ku ji BZ 10 000 salan destpêdike, ev rol bi jiyaneke weke xewnên çirokên hezar û yek şevê yên li serayên Bexdayê, dawiyê (final) dileyîze. Ev xêska şaristaniyê ya ku tîne cîhanê, di dergûşê de mezin dike, hemû neqeriyayên xortaniyê dide derbaskirin û digihîjîne, piştî van reqsan (reqs û reqase, lîstik û lîstikvana vê demê ya bi nav û deng)yê bi serî ve were xwar û piştî demekê wê bi dawî bibe.

3- Şêwegirtina şaristaniya feodal, çi ya îslamiyê û çi ya xiristiyanîyê, gerdûnîyê temsîl dikin. Herçiqas ku li Çînê şaristaniya feodal, pêşveçûnekê nîşan dide jî, dîsa jî li hemû Hindê Çînê û tevî Japonya, ji asta herêmî pêde ti reseniyê îfade nake. Pêşveçûnên li Amrîka, merhaleya neolîtîkê bi kûrahî dijî, sazûmana koledariyê niha nasdike. Afrîqa û Awûstralaya, serdema qebîleyên hoveber dijî. Di asta gurdûnî de, xiristiyanî û îslamiya ji çanda Rojhilata Navîn, mirovatiyê temsîl dikin. Cihûtiya di navberê de û qebîleyên mîstîk, ji marjînalbûnê wêdetir, ti rolê nalîzin. Yekem car mirovatî, bi xiristiyanî û bi îslamiya ku xwe naxe şûna xwedê, xwe weke siya xwedê, qasidê xwedê û dengê xwedê berdidin ve tê rêvebirin. Tiştê ku feodalîzm ji koledarî, ji şêweyên civakî yên ji xwe paşdetir û ji xwe pêşdetir vediqetîne, ev taybetiya wê ye. Saziya xweda-qeran ya şaristaniya koledar, bi kolebûna mirov ya teqez bi encam bûye. Yekem car dîroka mirovatiyê, evqasî bi kûrayî tê dîlgirtin. Rewşeke jiyana mirov ji ya neolîtîkê, heta ji ya peleolîtîkê cudatir, derketiye holê. Gelek taybetiyên toqîn danîne holê. Weke ku xwezayî be, mirovên giyandar ku dixistin tirban, li çarmixê dayin, li qazoxê dayin û danexwarina bi şêrên birçî, çend mînakên toqîn ji va ne. Avahiyên pîramîdan yên erjeng, tirbên qeranan, coyên avê û qesirbendiyên bajaran, mînakên din yên ku hîkarîker in ku aqlê mirov disekinînin. Em dikarin hoveberiya di şeran de û mercên karê koleyan jî tevî van bikin. Jibo ku şaristaniya feodal rast were terîfkirin, ev pêwîst e ku ji nêzîk ve bê dîtîn bê ev mercên berbiçav, yê bandoreke çawa liser binyata giyan û bîrûbaweriya mirovan bikin. Ya rast ev e ku beremberkirin, ne ligor kapîtalîzm û sosyalîzmê, ligor sazûmana koledar, were çêkirin. Jibo têgihîna dîrokeke rast, ev şert e ku him zayîna olên yek xweda û him jî zayîna mîtolojiyê, bi vê sazûmanê re di nava girêdaneke ji nêzîk ve, were dîtîn.

Xwedayên di mîtolojiyan de, ji aliyê rahîbên sazûmanê ve ango ji aliyê afirînerên wan ve, jibo ku sazûmana têkiliyên koledarî, abadîn û bihêz bikin, bi pûteyê (ihtimam) mezin hatine afirandin. Weke taybetmendiyên bîngêh ku jibo sazûmana xwedayan, têgihîna sazûmana mêjînî, abadîn û neguhêrbar, vedana sazûmana erjeng ya koletiya li erdê ye. Li nav sumeriyan ev ewqasî vekiriye, mirovatî çiqasî ji wêjevanên Sumer re spas bike jî, hindike. Bê çiqasî me xwedayên xwe bi destê xwe afirandine û me ew liserê xwe kirina tac, ti nivîskarên din, weke wan wiha xweşik nikarin bînine zimên. Mirovatî, bê ev tac yê bibe çi, ji dîroka nivîskî û virde, her roj hê bêhtir fêmdike. Dema em bînin ber çavên xwe ku dewlet bixwe jî, taceke xwedayî ya ji vê demê ye, emê bêhtir fêmbikin bê liser navê koletiyê bîrûbawerî û hêza dargî ya bîngêh çawa afirandine, herwiha emê bêhtir bibînin bê têkiliyên di navbera wan de ji kê re, suxrê dikin. Çêkerên olên yek xweda yên bi navê pêxember, jiberku di derbarê guherandina vê sazûmanê, pêşî di asta bîrûbawerî û du re jî, di asta rêxistinên civakî û siyasî de, bawerî û aqil pêşve birine, gelekî biqîmet in. Rakirina vê giraniya ku ji hezar salan ve, weke gabûsekê liser giyan û bîrûbaweriya mirovan pelax bûye, baweriyeke mezin, aqil, wêrekî û hêzeke berxwedanê pêwîst dike.

Zanista dîrokê hê hêza ol û bi gelemperî ya bîrdoziyê, bi awayekî rastî terîf nekiriye. Vegotîneke wisa hişk bikaraniye, weke ku bûyer, li derî mirovên jiyayî çêbûbin. Ji ber vê yekê, li qasî ol jî cidî nayê girtin. Heger ku mirov hê jî bi awayekî mezin, bi bîrdoziya pêxemberan ve girêdayî bin, jiberku di bin şêweyên cihêreng de, rejimên Nemrûd û Firewnan jiyî ne. Ev vekiriye ku di van hemû mijaran de, aloziyek serdest e. Divê ev xweş were zanîn, heta ku ronansa çanda Rojhilata Navîn, neyê jiyandin, ev wê neyê derbaskirin. Heta cîhê wê were, emê xweşiktir rave bikin ku ronansa Ewrûpa, serveyîye û xwedî wateyê qismî ye. Ev yek jî ber zemîna ku xwe spartiyê ye. Jiberku zemîna çanda Rojhilata Navîn gerdûnî ye, ronansa wê jî divê ku wergirîtir û gerdûnîtir be.

Bîrdoziyên olên yek xwedayî, ji serî heta bi binî, bîrdoziyên siyasî ne. Ev ji ramanên siyasî yên îroyîn, hê bêhtir bi wate ne. Vegotina olî, xweda û têgînên pêxember û melek (ferîşte), wêjeya demê ya siyasî ye. Di van demên ku em di bêjin de, jiberku siyasî bi vê peyvnasiyê tê çêkirin, ev têgînên bikaranîn. Ji vê hê girîngtir, jiberku bîrûbaweriya mirov, fêrî şêweya ramana olî kirine, ev bilêvkirinên tî bikaranîn. Tiştê tê kirin, têkoşînekî siyasî ya bêeman e. Heger em bêjin, zîmanê zanistî yê îroyîn tîne û em van piçûk bigirin, emê xwe bixapînin.

Wergêrandina kevneşopiya pêxember ya zîmanê siyasî yê îroyîn, pêdiviyê mezin e. Têkoşîna laîkîyê ya biwate, encex bi ronakbûna di vî babetî de, wê encameke serfirazî were bidestxistin.

Divê birasteqînî bê nîrxandin ku şoreşa feodal û sazîbûnên siyasî, azadîbûneke bisînor pêkanîne. Lêbelê divê ev bi beremberkirina sazûmana koledar re, were çêkirin. Heger Hz Brahîm, hê jî weke

kesekî pîroz tê bibîranîn, rastiya di bin vê yekê de ev e ku di rejîma Nemrûd de, sazûmana xwedayê qeranan pûç derxistiye û bûye sembola van çalakiyan. Mirovatî xweş dizane bê qîmet dide çî. Lêbelê têgihîştina rewşenbîrê ku di nava rojevê de xeniqî ye, bişik e. Dîsa heger ku Mûsa weke navekî mezin tê bibîranîn, jiberku li hember rejîma xwedayê firewî serî hildaye û derketineke mezin pêkaniye. Nirxê herî mezin yê êsa temsîl dike ev e ku li dij sazûmana Roma ya erjeng ku liser kesayetî, bîrûbawerî û giyana mirovatîyê, bi awayekî zalimane hatiye damezrandin û li hember desthilatiye pêşgoyên ku navên pêxemberan, jibo berjewndiyên xwe bikardianîn, li berxweda, ji ber vê yekê jî xwe feda kir, li hember hemû nirxên jiyana daringî, bûye rûmet û wijdana mirovatîyê ya mezin, bi serê xwe liser taktîk û stratêjiyan na hizire, bi dengê wijdanê xwe (dibêje vê, peyva xwedê) ve girêdayî dimîne, di bin êşkenceya herî giran de, li hember sazûmana koledariyê bi mirina xwe li berxwe dide. Ji ber vê yekê, ji sê parên mirovatîyê yek, timî wî bi dilnên pîroz, bi bîr tîne. Siyaseta herî mezin, encex bi baweriya xwe, bi aliyê xwe ya mirûz û bi gerdûniya xwe, wê wiha be.

Em werine cem Hz Muhemed, têgihîştina xwedê yên klasîk bin erd dike, bêhtir rê dide aqil, ku bi hêviya wî ve be, yê xwedayê neberbiçav bike utopyake xwedayê quran ya dadmend û afirîner ku herî bilind be. Dema ku koledarî bin erd kir, xweş dizane bê çî dike. Di hişmendiya hezkirina mirovan de ye. Di mercên wê demê de, bisînorbûna azadiya ku hatî pêkanîn, mezinatiya van pêngavan piçûk nake.

Em dixwazin vê yekê jî nîşan bidin: Serdema navîn ku di pêşevaniya xiristiyantî û îslamtiyê de hatî pêşexistin, dema ji serdema nû tê nêrîn -ew jî van demên dawî- belkî tarî were dîtîn. Lêbelê nayê înkarkirin ku Ligor cîhana koledar ya bi hezaran sal domanî, serdemeke ronakbûnê ye. Belkî xiristiyantî, jiberku çanda Grek-Roma ya klasîk nixûmandî, were rexnekirin. Lêbelê dema ku bi temsîlkerê sazûmana koledar yê dawî, bi împeratoriya Roma re were beremberkirin, tevkeriya mîrateyên êsa û Muhemed yên li ser dema navîn, piçûk nayên dîtîn. Serdema navîn, Ligor vê cîhanê li pêş e. Belkî bajarên bişeml ava nekirine, berhemên hunerî nedane çêkirin. Lêbelê kolektî jî bîrûbawerî û giyana mirovan avêtine, bisînor be jî, mirovatî pêngaveke din ber bi azadiyê ve birine. Herwiha nayê înkarkirin ku ev qezenc, ji qezencên daringî gelekî biqîmetirin. Dema ku em serdema navîn, weke dema amadekirina serdema nû binirxînin, wê were dîtîn ku di avakirina bajarên mezin û di çêkirina berhemên hunerî de, para wê gelekî mezin e. Dema em bixwazin ku pêşveçûna dîrokî, di nava girêdaneke diyalektîk de fêhm bikin, rola serdema navîn ya mezin wê derkeve holê.

D- Di şaristaniya feodal de bandev û hilweşîn

Him jibo îslamtiyê û him jî jibo xiristiyantîyê, dema PZ 1000-1250an, derketina bandevê temsîl dike. Li cîhana şareza ku jî xwe ewlekar, desthilatî bi dest xistine û weke ku serdema zêrîn bi dest xistibin, dijîn. Imperatoriya ezmanî ya olên yek xweda, gihaye armanca xwe ya pîroz, her sal ji pîrozkirina salvegera vê serfiraziyê pê ve, weke ku ti karê wan yên din tine ye. Cîhanê zêde ku were fetihandin nemaye. Jiberku dişibîne hev, ketina wan ya şerê tinekirinê, biwate nabe. Jibo serdestbûnê, êdî nîqaşên felsefê wê encaman binin. Jibo her hêza şaristanî, tiştêkî xweza ye ku dema wiha, weke gihîştina armancê û derketina bandevê were nirxandin. Çî rêxistina ku pirograma xwe bi cîh bîne, dikeve nav diln û ramanên wiha. Pêngaveke din jî wê û wêdetir, êdî ketine, ne bilindbûne. Pêngavên pêdivî yên jibo bilindbûnê, tev hatine avêtin. Heger ku em vê weke bezeke maratonê nîşan bidin, 40 km têne qedandin. Dawiya wê, rawestan û ketine.

Weke ku wê pêvajoyê rast derbixin, li herdu şaristaniyan jî, nîqaşên felsefî yên tund têne kirin. Mantîq û ramana Arîsto, dexma xwe li van nîqaşan dixê. Heçku di pêvajoyên zayîn û pêşveçûnan de, herduyan jî giranî dane Eflatûn. Ya rastir, herdu jî, di bandora wê mîrateyê de ne. "Cîhana îdeayan" ku Eflatûn bilind kirî, liser xiristiyantî û îslamtiyê bandoreke mezin dike. Têgîna xwedayê neberbiçav, berhemeke cîhana îdeayên Eflatûn ya herî pêşveçûyî ye. Ti feylesof an jî pêxember, li qasî Eflatûn ne gihane bilindaya "Wate, aqil, raman". Ev di cîh de ye ku weke Skender, bêjine wî jî pêxember. Zêdekirina navên dewlemend ya li têgîna xwedê, encama felsefeya Eflatûn e. Hemû têgînen di derbarê başî (qencî), rindî (xweşkayî) û rastî de, weke pîrozweriyekê di vê felsefeyê de, bûne mijara nirxandinê. Têgîna "Me" ku sumerîyan, weke navê taybetiyên şaristaniyê bikaranîne, tê wateya zagon û ramana bîngeh jî. Li cem Eflatûn, "Me" di wateya "îdea" ango hizir û raman de ne. Li cem êsa, ev têgîn bi navê "giyana pîroz", "Peyva xwedê" têne binavkirin. Liser van têgînan yan olekê yan jî sazîyeke felsefî tê damezrandin. Li cem Hz Muhemed ev têgîn, bi "Hebûna xwedê û yekbûna wî", tê binavkirin. Ji nodûneh navên xwedê tê behskirin. Li cem sumerîyan jî, evqas nav hatine hijmartin. Eflatûn ev neberbiçavî, bi awayekî rêxistinî pêşvebiriye.

Vê demê wate, jibo mirovatîyê gelekî dilniwaz (rakêşer) tê dîtîn. Pîrozîyeke xwedayî, didine pêşveçûna karê wateyê. Bihêzbûna xwedayê Hz Muhemed, jiberku hemû wate û ramanên wê demê,

di heyîneke tenê, di heyîna xwedê de dide hev e. Ramana xwedê atomîze dike. Herwiha pêngavên ku bi navê xwedê avêtine, bandora bombeyên atomê kirine. Dema ku bandora van tênginan, di pratîkê de tê çespendin, nirxekî mezin dane sepandina felsefê ya li ol. Bi taybetî bi alîkariya felsefeya Eflatûn, şîrovekirina ramana olî, jibo amadekariya dorhêla ku xiristiyantî û îslamtî jê xweyî bibin, herwiha di zayîna wan û pêşveçûna wan de jî, xwedî bandoreke girîng e.

Di destpêkê de, xiristiyantiya ku xwedî bîrdoziyeke bi şeweya dogmayên bawerî û rêzikên sinc yên hêsan, bi bandora bizava felsefeya demê Stoaparêziyê, pêdivî bi şîroveyeke felsefî dîtiye. Li qadên ku hereket dike, dibistanên felsefê, ramana mirovan pêşvebiriye. Mirov tenê bi baweriyê têr nabin. Saînt Aûgûstînûs, vê pêdiviyê bi Eflatûnparêziya Nû tîne çîh. ædî xiristiyantiya ku dibe xwedî teolojiyekê, hê bêhtir bihêz dibe. Heger ku em îslamtiyê û Hz Muhemed, weke nûnerê Eflatûnparêziya Nû binirxînin, ev wê ne şaş be. Pîleya aqil ya di îslamtiyê de û navên xwedê yên bihêz, çespînên Eflatûnparêziya Nû yên herî zexm in.

Di merhaleya bandeva şaristaniya feodal de, nîqaşên felsefî ku têne kirin, Arîsto bingeh digirin. Arîsto, berhema merhaleyeke şaristaniyê ya herî pêşketî ku eynî weke di dewleta Atîna ya sîteyê de ye. Feylesofekî wisaye ku berî hilweşînê bi hindikî, heyîna avahiyên mezin ravekiriye û bê çawa yê liser lingan bimînin, li çareseriyê wê geriyaye. Ne dema sazûnan û pêşveçûnê, teorîsyenê pêvajoya bandevê û pêşlêgirtina hilweşînê ye. Tê zanîn ku hewldana wî hemû, jibo şaristaniya Grek û temsîlkerê wê Athena rizgar, bike ye. Ev taybetiya felsefeya siyasetê, di merhaleyên bandev û hilweşîna şaristaniya feodal de, wê weke amûrên nîqaşê werin bikaranîn. Jiberku sazûman gihaye bandevê, gelekî gelicî û tevlihev bûye û nîşanên jihevketinê dide, pêdivî bi teoriyeke siyasî ya bihêz dibîne. Jiberku Arîsto, amûrê felsefê yê herî bikêrhatiye, Vê demê him di xiristiyantiyê de û him jî di îslamtiyê de, ramanên Arîsto liqasî pirtûkên pîroz, binirx in. Demên berê, ramanên wî ku gelekî xeter dihatin, niha weke ramanên rizgarker tînin dîtin. Hewl didin ku wan weke spartekên teolojiyê yên herî bihêz û weke rastiyên teqez bidine pejirandin. Di xiristiyantiyê de, Thomasê Aquînayî pêşevaniya vê dike, di îslamtiyê de jî, êbnî Sîna û êbnî Ruşd bi aweyekî wergirtir, bikartînin.

Ramangêrên demê yên herî pêşketî ku teolojiyê çêdikin, Jiberku asta bîrûbaweriyê demê nîşan didin, gelekî girîng e. Civaka feodal gihîştîye û tevlihev bûye. Gelek saziyên nû û raman berhevbûne û endamên wan hatine perwerdekirin. Asta bawerî û ramana dema zayîn û pêşveçûnê, têra vê rewşa nû nake. Mirov li sedem û encamên her tiştî, li çima û çawayên wan pirsîyarî dike. Şîroveyên felsefî, weke çareseriyê van pirsgerêkên bingeh yên vê dema dawî tînin. Weke pêngaveke parastinê ya dawî ku berî bikevine pêvajoya jihevketinê û hilweşînê, tê dîtin. Piştî ku rola xwe ya di demê de dilîze, êdî dikevin dema bawerhişkî û paşverûtiyê ya pêvajoya jihevketinê û hilweşînê. Felsefe, çîhê xwe bi dest dogmatîzma bawerhişkî û paşverû ve berdide, pêdanbawerkirina bizorê û êşkence dikeve dewrê. Çalakî û nîqaşên bîrdoziyî yên di merhaleyên destpêk û encama her dema dîrokê de, bi şewegirtina sosyo- ekonomîk ya ku li rastî pirsgerêkên domandina xwe tê ve girêdayî ye. Bûyerên di vî babetî de, di nava hev de tîne jiyandin.

Bawerî û ramanên ku bi hêza mezin a îmanê ya di destpêkê de hatibû bilindkirin, eslê wê mizgîniya sazûmana nû ya ku dizê dide. Ev dikarin weke hewldanên zayînê jî, bînin nirxandin. Pirograma sazûmana nû û hêmanên bingeh yên ku şewe didinê, tîne diyarkirin. Tê hewldan ku taybetiyên sazûmana civakî ya ku wê bizê, werin zelalkirin. Jiberku bi hewldanên mezin tê hilatin, ji bitêgînkirinê nû bigirin heta bi derûna wê, dikin ku bi têngîneke olî ya bihêz pîrozwer bikin. Pirtûka pîroz a nû, gotinên sazger, helwestên wî, perestên pêşveçûyî û perestgeh, weke nasnameya bîrdoziyî ya hilatinê, bi piropagandeyeke sift, li bîrûbaweriyê tê neqşkirin û dikine rewşa xwarina bingeh a giyanê.

Piştî ku sazûmana nû birêxistin dibe û dikeve rewşeke bisazî, pirsgerêkên ku derdikevine holê, ji bûyerên ku ji hebûna wê ya hundirîn û derveyî tîne e. Sazûman wê van pirsgerêkan çawa derbasbike û yê hebûna xwe çawa domdar bike? Pirsê bingeh ev e û jiberku ev pirs saziyê hemûyî tînkildar dike, pêwîst e ku nîqaş di asta herî bilind de û gelekî bi wergirî werine kirin. Lewra dijberî û ramanên li hember sazûmanê pêşdikevin, heger ku bi bersivên bawerdêr û têrker neyên bersivandin, xeteriya jêveketinê wê xwe nîşan bide. Dema ku rewşeke wiha derkeve holê, nîqaşên tund ên werin destpêkirin. Ahengî û yekîtiya di destpêkê de, wê çîhê xwe bide dumeylî û dijberiyê. Pêwîst e ev bûyer, bi awayek xwezayî bête pêşwazîkirin. Dumeylî û dijberî, herdem ne xirab in. Li vir herî girîng, weke ku materyalîzma diyalektîk jî dahûrandî, gelo tez û antîteza nû, bi awayek erênî pêşvedîçe yan na. Çawa zayînê zûka, bi mirin bi encam dibin, di mercên dargî ku têr ne gihîştibin de, raman û dijberî jî, dikevine rewşeke wiha. Dîrok, bi bûyerên mîna van tîje ye. Rewşa berevajî vê yekê jî xirabe û rizîbûnê kûr dike. Dema ku saziya sosyo- ekonomîk, ji ber sedemên hundirîn û derveyî, bi serresazî û binesaziyê xwe ne domîne, antîtez ango ramanên nû, ji aliyê

dijberiyê ve weke dumezilyekê pêşnekeve, rizîn û qeyran wê xwe bide pêş. Di dîrokê de ji demên wiha re, pêvajoya qeyran û hilweşînê, tê gotin. Di gelek saziyan de, ev mînak têne dîtin.

Serdestbûna şaristaniya rojava, bi vekirina van girêdanên diyalektîkê û bi vedandina wê ya li çalakiyên civakê ve, girêdayî ne. Bi rêbaziya zanistî, pîrsgirêk li holê têne danîn. Bi pêşniyariyên çareseriyê yên di wextê xwe de, tê hewldan ku bi windakirin û êşên herî hindik, encam werine girtin. Meyldarî li encamên ku bi şideta zêde, şer, serîdanîn, bi rêbazên hevkarîyeke erzan û xayîntî, were bidestxistin, nabe. Tê hewldan ku ligor rêzika diyalektîk û bigihîştina ji antîtezê ya têzeke biwate, bûyera herî kêrhatî, têkilî û sazûman, were pêkanîn. Weke dîrokê bawerî ev e ku di nava van de, rêxistina herî berbihev, şaristaniya demokratîk e.

Nîqaşên felsefeyê yên tund ku îslamtî û xiristiyantiyê di salên PZ 1200an de jiyane, ji ber pîrsgirêkên cidî yên hundirîn û derveyî ne. Saziyên wan her roj, li hember rexne û dijberiya ku zêde dibê tê, jibo bawerdêriyê, ravekirinên destpêkê têr nakin. Civak mezin bûye, pîrsgirêk pir bûne, bîrûbawerî pêşveçûyê û timî pîrsiyariyê dike. Hêrîşên ji derve yên nû, ti carî kêr nebûne. Ew bi xwe jî, bi hêrîşên domdar pêşveçûne. Hêrîş û parastin û hêrîş û parastina hember, hev û din vexwendî dikin. Dema ku pîrsgirêkên saziyê yên hundirîn zêde dibin, mînak çaxê ku weke kevin dewlemendiya aborî çênabe, nifûs zêde dibê û hilweşîna xwezayî pêşveçûyê, hêrîşên ji derve jî, hîkarîkere dibin. Æv hemû wê di bîrûbaweriyê de, vedana xwe bibînin û wê hewl bidin ku çareseriyên pratîk pêkbînin. Jiberku qedera saziyê dabaşa xeberdanê ye, ev nîqaşên hişmendî û çareseriyên pratîk, pêwîst e bi wergirî û bi encamgirtin bin. Di dîrokê de, hatiye hewldan ku bi du rêbazan ev dem werine derbaskirin.

a- Nûkirina sîstemê bi nûsaziyan. Pêwîst e restorasyon jî, tevî vê pêvajoyê bibe. Lêbelê restorasyon ne nûsazî ye, hê bêhtir weke ku li ser heman bingehî, bi heman şeweyê, lêbelê bi guherîna xerc û keviran avahiyeke were çêkirin. Nûsazî jî, weke ku him bingeh û him jî têkberên ku werine bikaranîn -digel ku dev ji rêzîkên sereke neyê berdan- bêne guherandin û liser bingehê nû, avahiyeke nû bête çêkirin e. Bi vê rêbaziyê, gelek sazî temenê xwe dirêj dikin, heta veguherînê kûr dikin û dibine xwedî domdariyeke payîdar.

b- Rêbaza bawerhişk a ku saziyê, bi zorê ji piyan bigire. Di dîrokê de tê dîtin ku ev rêbaz, bi awayekî sift tê sepandin. Ev rêbaz, heger ku der û nava saziyê bi tevayî vala bûbe û baweriyek hebe ku bi gefên ji derve tên re, lihevkiyê nemabe, tê ceribandin. Berxwedaneke li hember a bawerhişk, fetisandina her tiştî û hiç fersendnedana nûjeniyên, ev bi têgihîneke "an serfirazî an jî hiç" ve girêdayî ye. Dema ku sazî behreya xwe ya veguherînê winda dike, rêbazên zordarî û despotîk ên bi her awayî, jibo çiqasî bijî, weke çaraseriyeke dawî dibîne. Di vê rewşa wiha de, hilweşîneke bi şoreşê, jênerêv dibê. Yên ku bi şûn kesayetî û saziyên hilweşayî de mayin, bi tevayî digirine pêvajoya teslîmiyetê. Veqetîna wan a ji nasnameya kevin, ji bingeh e. Ligor sazûmana serdest, nasnameya nû werdigirin. Di sazî û têkiliyên civakî de, yên ku bîrûbawerîya dogmatîk serdest, paşvehiştî û di kevneperestiyê de bi îsrar, ev rêbaz rûyê dîrokê yê trajîke ku bi êş û xwînê derbasbûye. Mirovatî encex têdigihîje ku guherîn û veguherîn tenê, rastiyên payîdar ên xwezayê ne, êdî nûka dev ji vê rêbazê berdidin. Dema fêhmdike ku ya xweşik û baş ne ji bîrûbawerî û helwestên kevneperest, ji guherîn û veguherînên di dema xwe de tên, dev ji wê rêbazê berdide.

êslamtî û xiristiyantiyê, weke hêzên gerdûnî yên şaristaniya serdema navîn, di vê tengava dîrokê de, wêrekî kirine ku dest bavêjine ramana felsefeyê. Sedema nîqaşa felsefê û kesayetiya wan a bîrdoziyî, weke ku hate gotin, ji nêzîkbûna merhaleyên di destpêk û pêşveçûnê de, cuda ye. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku ramana felsefî, di nasnameya herdu olan de jî, di dema hilatîna wan de, hatiye vehewandin. Evana, nasnameyên ku nivî nivî ji têkeliya (lihevixistî) ol û felsefê ne. Di vê demê de, divabû ku têgihînen ol wiha bûna. Pêşveçûna felsefê, di ramanên Hind, Grek. êran, û Roma de, di şiroveyên olî yên serdema navîn de, gelekî zêde tê dîtin. Bi îfadeyeke din, îslamtî û xiristiyantî, weke bîrdoziya serdest ên sazûmana koledar, spartî senteza bi hostayî ya mîtolojiyê û felsefeyê ne, wan di guherîn û veguherînan re derbasdikin, dikin yek û weke nasnameyeke derûna xwe nîşan didin. Di vir de orîjînalîteyeke Sumer tine. Dîsa ne weke hilatîna felsefeya Grek e jî. Taybetmendiyeke bîrdoziya pêxemberan ev e.

Nîqaşa herdu sazûmanan a felsefî, ji ber lawazbûn û xirabûna baweriyê ya ku bi hejîna bingeha sazûmanê vê girêdayî û derketina cudahiyan a li holê ye. Girêdana wan a bi Arîsto ve, ji ber bêhêzbûna mantiqê wî ye. Mantiq û ramana Arîsto, hê jî otorîteyeke ku nayê derbaskirin. Nirxê Arîsto yê mezin, di sazîkirin û vegotina asta bîrûbawerîya mirov de ye. Behreya bîrûbaweriyê û hêza ramanê, ya li bandevê temsîl dike. Ji ber vî wesfê wî ye ku kesên dixwazin bi têgîn û ramanan kar bikin, serî li Arîsto dixin. Ew weke komputera serdemên pêşî, klasîk û navîn e.

Herwiha dema ku ol, ji bandevê ber bi hilweşînê ve diçe, Thomasê Aquînayî, êbnî Sîna û êbnî Ruşd yên ku felsefê li hawara ol tînin, şîrovekerê Arîsto yên demê ne. Evan, teolojî hê bêhtir tevlihev kirine. Tişta ku herî liser xebitîne, ramana çespondina xwedê ya bi mantiq e. Li vir berevajî ku tê fêmkirin, ji xwedê zêdetir, dixwazin ku sazûmanê biçespînin.

Ev yek diyar e ku di derûna çespondina xwedê ya bi mantiq de, armanc rizgarkirina sazûmanê ye. Eynî weke Arîsto ku jibo rizgarkirina dewleta sîte, ramana siyasî pêşexistî, teologên demê jî, bi çespondina heyîna xwedê, dewletên xiristiyantî û îslamîyê yên ku ketine xeteriyê, dewleta li ser rûyê cîhanê ya ku siya xwedê, diçespînin, pîrozwer dikin û domdariyê wê dikine bin ewleyiyê. Ev çalakiyeke ku nasnameyê bihêz bikin. Hebûn û nebûna xwedê, pirsgerêkeke ne berbiçav û ne ewqasî bi wate ye. Eslê wê, çiqas ku weke rasteqîniyeke mezin nîşan bidin û heta bi dawî jî, ji kiryarên xwe bawer bin, tişta ku bi awayek civakî tê nîqaşkirin, "sazûmana serdest heye, ev sazûman, pêwîst e bi tenê hebe an na?" ye. Armanca wan ew e ku sazûmana serdest, bigihînin nasnameya bîrdoziyeke nû. Pêwîst e bi awayekî civaknasî were dahûrandin, bê çima teolog, serdema navîn ewqasî li ser têngîna xwedê rawestiyane.

Di Ahdî Atîk de, bi awayek hîkarîker tê vegotin ku Hz Brahîm û Mûsa, "El" ê ku tê wateya xwedayê ezmên û ji aliyê qebîleyên ereban ve tê nasîn, bêhtir nêzîkî qebîleyên êbranî dikin, ango neteweyî dikin û dikine nîşaneya nasnameya xwe. Ev yek, yekbûn û şewegirtina nû ya qebîleyên êbranî nîşan dide. Navê El jî dikin "Elohîm Yehova", pêşvedibin û ligor vê şeweya nû berbihev tînin. Piştî, dema ku heyîna civakî bihêz dibe, Yehova jî bihêz dibe. Hemû taybetiyên ku civak qezenc dike, vedana xwe di xwedê de dibînin û xweda Yehova jî, wê bibe çavkaniya civakê ku bi xwe ewle bin û baweriya wan bi wan were.

Di Rabê êsa de, taybetiyên cuda vedana xwe dibînin. Rabê wî ne tenê nêzîkî cuhûyan, nêzîkî hemû mirovan e û dibe hêviya rizgariya hemû kesên bindest. Dema ku çîncînîbûna civakî, vedana xwe di wesifdarbûna xwedê de dibîne, dikeve rewşa temsîlkirina çîncînîbûnekê. Têkoşîna di navbera êsa û pêşgoyên hevkarên sazûmanê de, li heyîna rab vedide, ji Yahovayê fermî vediqete, vediguhere rabê tevaya mirovatîyê, di têkoşîna civakî de, dibe formulasyona bîrdoziyî. Menîfestoya civakê ya ku tê armanckirin, dibe çavkaniya îlhamgirtinê.

Bi Hz Muhemed re, ev pêvajoyê hê bêhtir hatiye siftkirin. Bi felsefeya Eflatûn hatiye bihêzkirin û têngîna yek xwedayî ya ku bingeha wî ya civakî bihêztir, bi Hz Muhemed re, weke di Quranê de jî derbasdibe, bi nod û neh navan tê bihêzkirin. Ev têngîneke xwedê ya gelekî bihêz e. Herwiha ji têngîna sereke diyare ku civaka nû jî, yê gelekî bihêz be. Bi nod û neh navan xweda utopya û manîfestoyeke. Vehewandin û danbawerkirina wî ya bi bawermendan, jibo girêdana wan a bi armanca manîfestoyê ve ye. Baweriya bi xwedê, baweriya bi civaka ku çarçova wê hatiye diyarkirin e. Civaka nû yê bi van navên xwedayî pêşvebiçe û serdest bibe. Bi gotîneke demê, pirogram yê bi awayek serkeftî were sepandin û yê bibe hêza desthilatîyê.

Ev yek diyare ku dahûrandina civaknasî ya şeweya ramana xwedê ya serdema navîn û şewegirtina mirûz bi vî rengî ye. Mixabin, ti teologan ev rastiya wiha hêsan, nikariye bîne zimên. Hê xirabtir, ev rastiyeke tahle ku bi navê zanîst û civaknasî, di roja îroyîn de jî, dahûrandineke wiha li dibistanên teolojî û civaknasîyê nayê xwendin. Nîqaş hê jî di navbera pirsgerêka teolojîyê ya "xwedê heye an tine?" û înkara bê teşe ya materyalizma civaknasîyê de derbasdibe. Heçku tişta bête kirin ev e ku rastiya civakê ya di bingeha nîqaşê de were zeftkirin û herwiha neyêne lîstika xweveşartinê. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku çeka mezin a şerê xwedayan, xwe şopandin, bi maske pêşkêşkirin û danpejirandine, lîstika hemû sazûmanên xwedayî ya li ser beniyên, ev e. Heta ku ev lîstik bi serfirazî bimeşe, sazûmana ku hêzê didinê û hêzê jê digirin, yê di nava ewlekariyê de be. Çiqas ku leyîstik xirabibe û maske bikeve, ewqasî sazûman derdikeve rastê û êdî dibe dema wê ya herî zor ku xwe bidomîne. Pêwîst e qet neyê jibîrkirin, çiqas ku maskeyên bîrdoziyî yên sazûmanan bikevin, ew roj hatiye ku êdî ti hêz nikarin wê ji piya bigirin.

Teolojiya Thomasê Aquînayî, pêngav bi xiristiyantîyê daye avêtin, rê li ber protestantîyê û nûsaziya xiristiyantîyê vebûye. Esasê wê ev bûyereke gelekî girîng e, beşa xiristiyantîyê ya din, ya ku kevneperest û çiqas diçe paşverû dibe, hewl dide ku bi engîzîsyonê hilweşandina xwe rawestîne. Hê erjengtir ji ya ku bi êsa hatî kirin, yê bi zilamên dêrê yên alîgirê nûsaziyan, bi rewşenbîran û feylesofên laîk were kirin. Giordano Brûno sax û zindî tê şewitandin. Galîle gotina xwe paşve dikişîne û ji vî cezayî rizgar dibe. Rahîbê Çek Jean Hûss tê şewitandin. Gelek erbabên terîqetên mîstîk, yên bi sêhrebendîyê têkildar û bi hezaran yên ku bizavên dêrê pêkanîn, vê demê tene şewitandin. Dadgeha Engîzîsyonê, weke mekîneyeke qirkirinê ya demê wê bixebite. Ev hemû qaşo li ser navê xwedê, lêbelê li hember mirovên azad ku rabûne ji piya û gelên ku hişyar bûne û xwe naskirine, jibo serdestiya dêrê biparêzin, tene kirin. Pêdiviya xwedayan ti caran, ne bi parastinê û

ne jî bi rizgarkirinê heye. Berevajî vê, pêdiviya sazûmana ku ciqas dikeve tengasiyan, bêhtir maskeyên xwedayan datîne û dikeve rewşeke kerax, bi parastin û rizgariyê heye. Bi taybetî Ewropa, PZ di navbera salên 1000 û 1800an de, şerên giran ên bi maskeyên wiha û berjewendiyan, jiya ye. Li Rojhilata Navîn, jiberku listik ji mêjve tê listin, rêzikên wê diyar in. Lêbelê jiberku Ewropa, cara yekem li hember şerekî wiha tê, piştî astengiyên mezin û gelek xwînrijandinê, ji nû ve rastiyan dibîne. Hêmana laîkîtiyê ya ku Ewropa ji şerê dêrê derandî, ev mercên giran in. Derketin ji du aliyên çêbûye.

a- Nûsaziya xiristiyaniyê, neteweyîbûn û demokratîkbûna dêrê îfade dike. Ev pêvajoya ku bi şûn PZ 1500an ve serkeftî dibe, bi dewleta hiqûq a hemdem bi encam dibe. Çîna civakî ya nûsaziyê ku spartî bûrjûwaziye, weke ku di dîrokê de gelek caran tê dîtîn, diyare ku veguherîneke bîrdoziyî ya jîbo pêşedemê ye. Ev pêngaveke herî girîng e ku li Ewropa şaristaniya serdema navîn a feodal bi dawî aniye.

b- Derketina laîk a zanistî, rêya ramana zanistî ya ku hemû girêdanên xwe ji dêrê qut kirine temsîl dike. Takekesên ku spartî zanistê, bêyî ku serî li xwedayan bide, hewl dide ku qedera xwe bi xwe diyar bike. Eslê wê çîqa ku diçe, hewldana olekî nû derdikeve holê, herwiha olekî zanistî ku gelek xeteriyan di nav xwe de hildigire, tê şopandin. Bizaveke ku yê şêwe bide dema me jî, ev e.

Bi van herdu rêyan re, bi zimanê netewî yê pêşveçûyî, bi çand û wêjeyê û bi şêweya zanistî, takekes bicoş dibe. Civaka ku herî zêde xwedayî dibe û berevajî vê kesê ku bêxweda dibe û xwe dike xweda, rê li ber xeteriyeke din vedikin an jî dikevîne nava xeteriyê.

Dêra ku têkçûyî, yê van bûyeran bihêrs pêşwazî bike, lêbelê yê xwe jî ligor demê biguherîne û yê girêdana xwe bi bîranînên ezîz û ezîzeyên borîn ku jê re gelek binirx, berdewam bike. Hewl dide ku bibe wijdanê durist ê civaka ku bêwijdan bûyî.

Civaka îslamê, di dema împeratoriya Abbasî de, digihe zanista klasîk. Ev şêweya ku ji şîroveya îslamê ya çêker tê, civaka ku bi dewlet û fermî dibe ye. Êslamî ligor derûna xwe ya bîrdoziyî, bilezgînî ber bi monarşiyê ve diçe. Encama xwezayî ya têngîna xwedê ya Hz Muhemed, siltantiyeke bîqudret e. Bi gelemperî bîrdoziyên hemû civakên biçîn, bi çêkirina têngîna xwedê ya di derûna wê de, dika (sehne) desthilatî (otorîte) ya polîtîk amade dikin. Şewşandinên di dîrokê de yên herî mezin, bi maskeyên xwedayan tene kirin. Hemû çalakiyên bixwedakirin û siftbûnên hişmendî, weke ku tê texmînkirin, rasteqîniyê nake armanc. Çiqas ku ji vê bawer bikin û ne di ferqa wê de bin jî, jîbo civaka bi çîn a ku pêşvedîçe, bingehên rêvebiriyê tene amadekirin hêzeke desthilatiyê ya menewî tê afirandin. Heta ku mirovatî ne spartî desthilatiyeke hişmendî û menewî ya bihêz be, desthilatiya polîtîk a bêteşe, ti caran ne pejirandiye. Bi maskekiriyeke bibal, bi taybetî şêweyên xwedayan bingeh tene girtin, herwiha pêşiya desthilatiya daringî tê vekirin û pêşkêşî civakê dikin. Karên rahîbên Sumer û Misrê yên bingehîn, afirandina maskeyên xwedayan ên jîbo desthilatiya polîtîk e. Di mîtolojiyan de, ev gelekî vekirî û hîkarîkar in. Hîttî û Grek vê yekê weke jêgirtiyên duyem, digihînine Rojava, Hindistan vê maskekiriye, bi hezar rengî dike û bikartîne. Di hunera desthilatiya sazûmana koledar de, afirandina mîtolojiyê, çêkirina xwedê, bi vê ve girêdayî çêkirina merasiman, cîhekî girîng digre. Hêza çîna rahîban, jiberku vî karî bi serkeftin tînine cîh e. Serfiraziya van ya di dîrokê de, ji ber vê rola wan e ku di pêkanîn û berdewamkirina desthilatiyê de dilîzin. Ev yê berevajiyê mezin be ku ev rolên bingeh, li ber çavan neyên girtin, weke ku rast be, bi pîrozkirina xwedayekî ne berbiçav, bi nîqaş û bi levdan tevbigerin. Heta ku ev berevajîkirin nebe, ti desthilatiyên daringî û hêzên polîtîk, bi awayekî vekirî hebûna xwe nadomîne.

Baweriya xweda-qeran ku maskeya bingeh a sazûmana koledar, encax bi bîrûbaweriya zarokatiyê gengaz bibe. Çiqas ku pratîka hilberînê ya civaka biçîn pêşvedîçe û têngîliya di navbera desthilatî û mijokatiyê de, derdikeve holê, maske jî diçire û pêdivî bi maskeyên nû û veşartîtir, çêdibe. Çêkirina van hemû maskeyan, ne ku mirovan bi qestî û bi zanîn ji rê bibin. Ev çandeke baweriyê ye. Jiberku bi taybetiyên gelekî bihêz û tabû tene nixûmandin, weke rasteqîniyeke herî mezin, li hişê mirovan dibine bar. Hişmendiya mirovên di destpêka civaka biçîn de, ji vê yekê re bikêrhatî ye. Çewsandina siyasî û mijokatî, bi derûwa herî mezin ku weke rastiya herî mezin tê nîşandan, tê berdewamkirin, pêwîst e ev yek weke rêzikeke civaka biçîn, timî li ber çavan were girtin.

Serdema feodal, bi xwedayên maskeyên dema zarokatî nameşe. Jixwe îdeaya pêxember û feylesofan a bingehîn, mirovên ku nabine xweda ye. Deşîfreyê maskeyên xwedayan ya bi vî rengî, girîng e. Esasê wê, bi pêşveçûna hişmendî û bîrûbaweriya mirovan û bi dîtina wan a van listikan e, ev wiha ye. Pêdivî bi têngînen xwedê yên nû û bi şîrovekirineke wî ya rast, heye. Pêxemberan, têngîna xwedê daxistine yekê, xwedayekî ku ne mirov be sêwirandine û ew şiyandine ji ezman wêdetir, dereke ku neyê nasîn û neyê dîtîn. Rewşeke dîrokî ku jîbo derbaskirina şêweya rêvebiriya Nemrûd û Firewn, mijara axiftinê ye. Mirovatî dixwaze ku ji belaya mirov-xweda û xweda-qeran, gavekî

bidûrkeve. Rondikên ku jibo heyîneke tirsnak têne rijandin, pêşandanên hezkirin û perestîne, bi giranî jibo rizgarbûna ji belayê ye. Di dema neolîtîkê de, jiberku mijokatî nebû, ev bûyer tev weke îfadeyên spasîyê, dihatin bikaranîn. Feylesof, yan xwedê weke sedema yekem berdidin, yan jî bê nêzîkbûneke ku dibêjin di her tiştî de heye û tînine rewşa berdewama xwezayê, herwiha ramana mirov, gaveke din pêştirve dibin, mirov ji tîrsa xwedê (ji desthilatiya rêvebir û mijok) rizgar dikin. Di van herdu mercan de jî, pêşveçûna civaka biçîn, bi rizgarbûna ji merhaleya bîrûbawerîya zarokatî, pêktê. Pêdivî bi têtîngên nû, yê xwedê, ol û felsefê heye.

Têtîngîrîna xwedê ya Hz Muhemed, vê pêvajoya dîrokî werdigire. Terîfkîrîna xwedayekî ku him têtîngên xwedê yê Sumer û Misir ên mîtolojîk û him jî têtîngên felsefeya Grek û Romen, negire nav xwe, nakin suxreya (xizmet) civaka feodal. Ew di vê bîrûbawerîyê de, zorbûneke bîrdoziyî ya mezin diji, dil ji ber diçe û di nava xwîn û xwêdanê de dimîne. Civaka feodal yê gerdûnîbûneke di asta bilind û kûr de bijî. Divûê ku nasnameya wê ya bîrdoziyî liqayî vê were. Bi taybetî, pêwîst e têtîngê xwedê, bawerdêr, tekûz û li her derî amade be, Ji şahdamarê mirov nêzîktir be. Herwiha rêya menewî, li ber seltanet û siltantiya desthilatiya feodal vedibe. Zayîna bîrdoziyîya ramanî tê çêkirin. Weke hunereke rêvebirina çîne, dibêjine xwedê hêza herî mezin û dibêjine desthilatiya feodal, Zîl-ûl-Allah (siya xwedê), herwiha rewşeke berevajî tê jiyandin. Siltaniya ku rastî jî, vedana wê dibe xweda. Nasnameya civakê wiha tê terazkirin, li hember vê nêzîkbûna zanistî, tê fêhmkirin ku bi sed salan nîqaşên xwedê yê hatine kirin, bê çiqasî rê li ber encameke demagojîk vedikin. Li vir armanc ne ev e ku em têtîngê xwedê piçûk bikin, berevajî vê, em dixwazên wateya wî ya rasteqînî bidinê. Têtîng weke heyînen civakî, her yekî rastiyeke û bi hindikayî liqasî aboriyê bi bandor in. Pêşvebirina têtîngê xwedê ya Hz Muhemed, ne hêsan e. Çewtiyên materyalîstên bêteşe, bi hindikayî li qasî kiryarên îdealîstan bi neyînî ne. Ênkara xwedê ya materyalîstan û îdîayên îdealîstan yê rasteqînîyê, derdikevine deriyekî û wateya wê ya rast dişewîşînin.

Afirandina bîrdoziyî ya civaka feodal, ji afirandina pratîk zortir e û karekî ku hostayîyê dixwaze ye. Ev yek weke cudahiya di navbera zayîna zarokeke bi tendurîst û mezinbûna wê ya normal de ye. Di civaka Grek de ku dişibe mirov, zêde ne afirînêr, hê bêhtir maskekîrîneke jibo heyîna federasyoneke qebîleyê, lîser dewletbûna vê dawiyê û demokrasîya Athena bi bandor bûye. Di olên yek xweda de, têtîngê xwedê ya ji mirov cudatir û gelekî bihêz, rê li ber civaka otorîter û seltaneta xanedaniyê vekirîye. Nasnameya bîrdoziyî, bi gelemperî di şewegirtina civakî de û bi taybetî, di çêbûna desthilatiya polîtîk û binyata wê de, rola bîngêhîn dileyîze. Ev jî dibe bersiva vê pîrsa ku dibêjin "di civaka îslamê de, çima demokrasî û komar pêşvenaçe?" Civaka îslamê, ku di bin bîrdoziya heyî de şewegirtî, heta vê nasnameyê derbasneke û laîkbûneke rasterê neji, bi hêsanî demokratîk nabe. Laîktîya birastî, encex bi dahûrandina bîrdoziya kevneşopî û derbaskîrîna wê pêkwere, herwiha pêkhatina komara laîk, civak û siyaseta demokratîk jî wê bi vê ve girêdayî be.

Digel vê yekê jî, rola Hz Muhemed a di derbarê têtîngê xwedê de ya destpêkê, pêşverû ye, afirînêr û liherike, bihêzker û çalakîker e. Ji aliyê hiş ve jî, bilindbûn e. Rola xwe ya dîrokî bi serfirazî listîye. Lêbelê dema ku digihe merhaleya gihîştîne, heyînen pir çandî wê vê têtîngê têxin astengiyê. Qewm û komên etnîk, têtîngên xwedê yê di çanda xwe de, bi xwedê dinixumînin û didin domkirin. Ketine demeke ku li hember xwedê, xapandinan pêktînin. Her civak ligor berjewendî û asta xwe, xwedî têtîngê xwedêye. Digel sunnîtiya fermî, batîniya ne fermî û komên mîstîk ên îslamî gelekî zêde dibin.

Aliyên dijber, di serî de Fatimî û Karmatî, ber bi desthilatiyê ve diçin. Baweriyên gelek cuda derdikevin holê û tesewûf pêşvedîçe. Dema ku civaka îslamê û dewleta wê, digihe merhaleya bandevê, çawa jibo rizgarkîrîna civaka Grek a bajêr û dewleta wê, feylesofê herî mezin, Arîsto derdikeve holê, feylesofê îslamê jî, jibo rizgarkîrîna civak û dewleta îslamê derdikevine holê. PZ sedsalên 10 û 12an şahidên bûyerên bi vî rengî ne. El-Kîndî, Farabî, ëbnî Sîna û ëbnî Ruşd, weke Arîstoyên civaka îslamê, felsefê dikişînin nava îslamîyê. Bi vê yekê ne li çespendina têtîngê xwedê, li rizgarkîrîna dewleta ku îşareta jêketîne dide, tê gerandin. Nîqaşên mezin, qeyranan û qeyran jî bê çawa yê ji vê tomîkê rizgar bibin, îşaret dike. Di hemû deman de, derûna van nîqaşan yek e. Li vir ê were rizgarkîrîna ne xwedayê neberbiçave, dewlet bi xwe ye. Lêbelê têtîngê xwedê, çiqas ku bawerdêr be û çîqa ku bi mantiq were çespendin, ewqasî serdestiyêke bîrdoziyî tê bidestxistin, herwiha jibo domdariya dewletê û hebûna civakê suxreyêke mezin tê pêkanîn. Suxreyên rahîban, ji aliyê feylesofan ve tê meşandin. Êslamîyê li pêşiya xiristîyantîyê, ramaneke felsefî ya teolojîk afirandiye. ëbnî Sîna, li qasî Arîsto xwedî berhem e. Ramana zanistî û danehev, gelekî li pêşya Ewropa ye. Eynî weke îro ku ji Ewropa wergêrên zanistî û felsefî têne kirin, wê demê, Ewropa ji Rojhilat wergêra zanistî û felsefeyî dike. Lêbelê ramana zanistî ku di xiristîyantîyê de serdest dibe,

li Rojhilat vê serdestiyê nîşan nade, şêweya ramana îslamtiyê ya bawerhişk, heyînên felsefî û zanistî jî weke kufr dinirxîne û dorhêlê li nav hev dixê.

Bi êmam Xezalî û Eşarî, dema ramana felsefê bi dawî dibe. PZ sedsala 12an, jibo îslamtiyê destpêka serdestiya dogmayên hişk e, ewleyî bi aqil nemaye, tenê quran û sinet weke rêya zanistê hiştine, herwiha destpêka dema bawerhişkiyê ye. Di xiristiyantiyê de jî aliyek wiha ber bi bawerhişkî û engîzîsyonê diçe, lê ji aliyê din ve, rêyên serbixwe bêhtir li ber nûsazî û aqilparêziyê vedibin. Jiberku îslamtî, rêya aqil ya nûsazîparêz û ji ol veqetiyayî pêşvenabe, dikeve pêvajoya herî tarî ya di dîroka xwe de. Dema ku em di nava pêşveçûna dîrokê de binirxînin, ji dema zayîna civaka neolîtîk BZ 10 000, heta bi PZ 1200an, çanda Rojhilata Navîn ku pêşevaniya hebûna mirovatiyê dikir, Ji vê mêjûyê pêde, wê vê rola xwe bi dest şaristaniya kapîtalîst ya Ewropa ve berde. Peywira girîng a dîrokî, dahûrandina guherîna vê rolê ye. Ev peywir qet nehatiye pêkanîn. Encex bi hewldanên hinek zanistên Rojava (Gordon Childe, S.N Kremer ûwd.) dike ev pêvajo rast bête zanîn. Parastinên olên zuwa, bikêrî tiştêkî nayên. Parastina serdestiya kevin jî, tiştêkî îfade nake. Ya girîng, sedemên paşveçûna dîrokî ye, derxistina vê pêvajoyê ya holê ye.

Heger em derxine holê ku dema paşveçûyîn û bawerhişkiya liser navê îslamtiyê, pêşî di warê bîrdoziyê de destpêkiriye, ev yê me bibe rêbaziyeke rast. Di van sedsalan de, Rojhilata Navîn di warê dewlemendiya daringî, di pêşveçûna civakî û bajaran de, serdestî Ewropa ye. Paşveçûn ne di vê qadê de ye. Di çavên Ewropiyan de, Rojhilata Navîn gelekî şox û şeng e. Dewlemendî û ewrengiya wê, serdestiyeke jiyane temsîl dike. Sedema seferên xaçparêzan, ji serdestiya di vî babetê de ye. Herwiha pêwîst e em sedemên paşveçûnê, di warê bîrdoziyê de bibînin. Ewropa di sedsala 13an de, di warê zanistî de pêngavên girig davêje, di sedsala çardehan de, di warê ol de, pêvajoya nûsaziyan destpêdike. Sedsala 15an serdema ku Ronesansê destpêkiriye. Di civakên îslamtiyê de, rewşeke berevajî vê xwe nîşan dide. Dibistanên felsefê bi zindiqbûn (bêbawerî) tînan tawanbarkirin, deriyê îctîhadê (encamgirtina bi nîqaşan) tê girtin, kesên ku ramanên cuda didine pêş, di êşkenceyan re tînan derbaskirin. Yênan weke Suhrewerdî ku li pey ramana azad û çêkirina felsefê, tînan ji eyarkirin (PZ 1190). Pênewletiya bizanist û aqil, weke pêdiviya îmana zexm tê dîtin. Feylesofên mîna êbnî Sîna û Farabî, bi kafirtî tînan mehkûmkirin. Demeke suxtetî destpêdike ku tenê zanînen wergirtî û rîwayet, jiberkirina Quran û sinetan, weke zanist tê dîtin, ramana aqil a serbixwe karê şeytên tê berdan, derî bi tevayî li zanînen zanistî tê girtin, di Rojhilata Navîn de belkî yekem car, bawerhişkiyeke erjeng a bîrûbaweriyê weke hêjayiyeke binirx, tê dîtin. Ev dema suxtetiyê ya bêsensiya Rojhilata Navîn ku qet ne laîyîqî wê, liqasî ku sedema windabûna dîrokeke bişeml û hişk e, ewqasî jî destpêka bêdîrokbûn, windabûn û paşveçûna vê dawiyê ye jî.

Heger ev dem jibo civakên îslamê û Rojhilata Navîn, weke karesateke herî mezin were nirxandin, ev wê di cîh de be. Ev demeke wisaye ku çandêke nêzîkî 15 000 salan, pêşevaniya mirovatiyê kiriye, serdem vekirine û şaristanî dane destpêkînin, li xiyaneteke wiha mezin rast tê û di tîrbê de tê veşartin. Tenê tîrbên Misir û Sumer yênan bişeml ne girîng in, tîrbên çanda Rojhilata Navîn yênan biêş û payîdar jî di vê demê de vedibin. Tîrbên ku heta îro jî kesek nizane bê çî di wan de veşartîye.

Dema ku li dîroka Rojhilata Navîn bi gelemperî bête nêrin, îslamtî di warê pêşveçûnê de xwedî roleke bişnor e. Ti nirxên wê yê afirandinê, zêde tine ne. Ji aliyê nasnameya bîrdoziyê ve, weke versiyoneke Sumer a sêyemîn, dikare bête şîrovekirin. Rola wê ya di warê pêşveçûna şaristanî de ku ji pir xwedayî ber bi yek xwedayî, ji mîtolojiyê ber bi ol, ji çandîniyê ber bi bazirganî, ji koletiya hişk ber bi koletiya nerm, ji qebîletiyê ber bi qewmîtiyê ve bilind bûye, li ber çavan tê girtin. Lêbelê ev hemû çêbûn, hê ji berê ve di rewşeke pêşveçûyî de bûn. Tiştêkî ku nû afirandî tine. Têgînên "hebûna xwedê û yekîtiya wî, qasidiya pêxember" ku gelekî cîh didinê, çêbûnên hê berê yênan ku bitêgînkirin û sazîkirin, li bîrûbaweriyaya civakê û kevneşopiyê hatine barkirin in. Ji nasnameyên bîrdoziyê, tiştê ku îslamtiyê çêkiriye, takekesê ku bi rêbaziyeke şoreşî, hatiye rewşa serf, lez û hêzê bide şaristaniya feodal. Êslam di vî warê de, gelekî serkeftî ye. Rola îslamtiyê ya di warê bilezbûna feodalîteyê, siftbûna wê, bihêzbûn û bisazîbûna wê û di belavbûneke gerdûnî de, mîsoger e. Di pêşveçûna şaristaniyên feodal yênan Ewropa, Hind, û Çînê de jî, hêza ku navtêdanê dike û zorê dike, dîsa îslamtî ye. Bi gotîneke gelemperî, îslamtî hînardekareke (îxracatkar) feodalîzmê ya herî baş e. Jiberku olê bazirgan, esnaf û yê cotkare jî, vê rola wê disîqilîne (navtêdan). Têgîhîna cîhadê ku evqasî tê mezinkirin, pîrozkirina fethandinê ku ji dagîrkirinê pê de ti wateya wê tine, mirna ku bi şehîdbûn û bi çûna bihiştê tê dîtin, dema ku qazî bimînin parwergirtina zêde ya ji xenîmetan, bi vê hînardekariya feodalîzmê ve girêdayî ye.

Ji demên hilatinê heta bi demên gihîştinê, her ciqas ku sedsalên PZ 7. û 10. weke bi şêweya belavbûna şoreşa feodalîzmê bê nirxandin jî, hemû demên bi şûn de, bi sefer û şerên xanedaniyan û mîrîtiyan yênan berjewendî, xenîmet û talanan, derbasbûne. Ev pêvajo, piştî sedsala 12an werdigere

karesateke mezin. Bilindbûna ol a di destpêkê de jî, êdî jibo berjewendiyên xanedanan û mîran, weke amûrekê tê bikaranîn. sunîti dibe mezhebê fermî yê kevneperest û elewîti ya ku girêdana xwe ji nixrên çanda gel qut nake, weke bizaveke bindest, karker û berxwedêran, pêşvedîçe. Li hember zilm û zorê, gelek mezhebên batinî dertên holê. Dîsa mîstîsîzm û tesewûf bihêz dibe. Eslê wê, razdarî û tesewûfiya ku weke terîqetbûna serdema pêşî, digel ku bizaveke li hember olên fermîne jî, lê li şûna desthilatiya daringî, hêviyên xwe bi desthilatiya axretî ango ya wê cîhanê ve girêdane û îdealîzmê xweyî kirine. Van, bizavên ku piştî têkçûn û bêhêzbûnê derketine holê yên pasîf in û dişibin komên çepgir yên îroyîn. Weke şeweyên desthilatdariya elewîtiyê, şîatiya êranê û fatimîtiya Misrê, digel ku saziyên dewletê damezrandine jî, lê ji pêşvebirina nûsaziyeke îslamtiyê, gelekî dûr in. Di bingeha bîrdoziya wan de, ji "ehlîbeyt"eke teng pêde, felsefeyeke wan a pêşketî û programekî wan ya siyasî tine. Êdiaya wan ya ku biniyeke civakî biafirînin û temsîl bikin, zêde pêşneketiye. Tenê bi gotina "bêmafi li ehlîbeyt hate kirin", reform nayên pêkanîn, sedemên civakî û siyasî yên zilma ku li ehlîbeyt hatiye kirin, nayên dahûrandin. Herwiha her çiqas ku bi zemîneke mafdar û bêguneh ve girêdaye jî, elewîti, ne di asta nûsaziya xiristiyantiyê de ye. Ji wergiriya rola pêşek dûr e. Bizaveke ji hestan barkiriye û dema ku desthilatdar dibe, bi heman qalibên sosyo-ekonomîk ve girêdayî ye û ji aliyê siyasî ve ti cudahiyan hilnagire, hê bêhtir hinekî nêzîkî aliyê çepgiriye ye. Şerê mezheban yên ku bi sedsalan hatine meşandin, ji veqetîn û afirandina rewşeke ku hêza xwe tinekiribin pê de, ti encamên din nedane. Êslamtiya bisînor, tenê bi kevneperestiyê namîne, ji aliyê siyasî ve jî di rewşeke perçebûyî, bixwîn û di nava levdaneke bêwate deye. Ji ber vê aloziyê, aborî û pîşekarî pêşnakeve. Bazirganiya ku li Ewropa xwe dide ber bi merkantîlîzmê, ber bi afirandina çîna bûrjûwa ve diçe, di civaka îslamtiyê de, bazirgan xwe bi selefê ve girêdide û dikeve rewşa çîneke paşdemayî. Rejimên mîrîti ku li ser axa berhemdar hatin damezrandin, pêşiyê li feodalbûnekî normal jî digirin, feodalîteya navendî bihêzdikin û hê di destpêkê de, bûrjûwabûna bajêr difetisînin. Jiberku çîneke bûrjûwa weke ya Ewropa ku pêşveçûna navendparêziyê, bi awayekî serbixwe biteraz bike, derneketiye holê, paşveçûneke hê bêhtir, jênerêv dibe. Navendbûna bi fethê ve girêdayî, dema ku tê dawîya vê derfetê, dikeve rewşa saziyeke herî bê esil, bê wate, ne pêwîst û di Rojhilata Navîn û di civaka îslamtiyê de, dibe saziya herî kevneperest û statûkoparêz. Êdî seltanet di sînga hemû civakan de, wê weke girêbayeke(ûr) nexweşiyê, bimîne. Girêbayeke ku timî laş bikoje û birizîne. Di wateya îslamî bi xwe de, girêdana bi bîrdoziyê û hêmanê re, nemaye. Pêvajoyeke weke şeweya Bîzans a bêesil ku hemû tiştî weke leyîstikên desthilatiyê dinirxîne, mijara axiftinê ye. Dema di navbera sedsalên PZ 12 û 15an de, dema ku ji bandevê ber bi hilweşînê diçe ye. Di dîroka civakên îslamtiyê de, dema di navbera PZ sedsala 15an û 20an de, dikare weke demeke tarî jî bête nixrandin. Di ti aliyan de nîşanên pêşveçûnê tine ne. Hemû taybetiyên ku ji bandevê ber bi hilweşînê ve diçe, derdikevine holê. Naletbûna ku di pirtûkên pîroz de derbasdibe, ji serî heta bi binî, xwe berdaye ser hemû birûbawerî û saziyan. Nakokiya herî dramatîk derketiye holê. Bi înkarkirina înkarkirinê, ketiye pêvajoya herî biêş û qedandinê. Ji hezaran salan ve, di civaka mirovatiyê de, di heyînen birûbawerî û saziyan de, derbaskirina paşdemayinan û zayina nûjeniyên, êdî weke antîtezekê ji aliyê hêzên înkare ve, tî xwarin, qedandin û nava wan tê valakirin. Di dîroka Rojhilata Navîn de, em vê demê tenê bi îslamtiyê ve girêbidin, ev yê bi kêmayî be. Pêwîst e ev bi sedemên kûrtir ve werine girêdan. Şeweya şaristaniyekê an jî çandekê, çiqas ku li herêmekê rahên xwe berdabine kûr, derketina şaristaniyeke nû ango dijberî vê, gelekî zor e. Jibo nûjeniyê, axa nû û xwîna teze pêdivî ye. Heger ku em mînakekê bidin, çanda Magdelîan (BZ heta bi 10 000an) ku merhaleya civaka nêçîr û danehevê ya herî pêşketî, li Spanya û Fransa ya îro tê çavdêrkirin. Digel ku merhaleya dema paleolîtîk a jor, bi kûrahî dijî, derbasî neolîtîkê nabe. Digel sedemên din jî, sedema herî girîng, çanda paleolîtîk a jor, ne xwedî mercên ku xwe red bike ye. Hêzên navîn û derdora wê yên nêzîk, ji taybetiyên derbaskirina wê dûr in. Derbeskirina bi bandora ji derve ve, jênerêv e. Çawa kesekî ku hînbûyî xwe be, ji xwe hez bike, xwe bilind bibîne, becibîne û bi kesekî ne guherîne, heger çandek jî bi kûrayî bijî, xwe bi têrayî navxweyî kiribe û li qasî ku li hebûneke xwe ya din ne hizire eznavendparez bûbe, hêz û çanda ku zora veguherîne lê bike, pêwîst e ji derve bandorê bike. Jevketin û nûjenî yê bibe berhema hêzên derveyî. Jiyandina Rojhilata Navîn bi kûrayî a neolîtîkê, bi erdnîgariya wê, avhewa, rîwek û çandên ajalan ve girêdayî ye. Geliyên Dicle, Ferad û Nîlê yên li bin serê wê, weke nîfşa erdnîgariya girîng a duyemîn, xwedî merce ku sazûmana koledariyê weke alternatîveke neolîtîkê pêşbixe. Ev şensekî dîrokî ye. Du serdemên dîrokî, yê demeke dirêj, di rex hev de, ji hev xweyî bibin û bijîn. Mijara ku yek bala xwe bide ev e ku ji sînga hev û din dernakevin. Di şîroveyan dîroka diyalektîk a hemdem de, nixrandinên bi şeweya sazûmanên li heman cihî li heman derê ji sînga hev derdikevin, ne rast in. Çavdêrî bêhtir nîşan didin ku di bingeha bandorkirinê de, ji derve çêdibin. Koletiya Sumer, bi

mîsogerî, ne li cîhê navenda neolîtîkê pêşvedîçe. Digel bandorgirtineke bişidet jî, dera ku lê derketî holê, herêma lîtav a ku qebîleyên civyar yên herî paşdemayî lê dijîn e. Ev herêma ku weke Mezopotamya jêrîn jî tê binavkirin, neolîtîk qet nasnekiriye, çanda eşîrtî derbasnekiriye, rola axa destlênedayî dileyîze.

Dema nîrxên çanda neolîtîk bi axa ku bête avdan re dibine yek, Sazûmana civakî ya nû derdikeve holê. Mezopotamya jêrîn û ya jorîn ku di ber hev re, dibin zemîna du çandên dîrokî, encama şensekî ye. Ev şense ku ji şaristaniya herî berhemdar re dibe dergûş, dîrokê diafirîne. Şaristaniya feodal, li herêmeke jiderve, li navendeke bajarê çolê, li devê xaçerêyekê ku berhema bazirganiyê, derdikeve holê. Li Mezopotamya û derdora Nîlê, şaristaniya feodal pêşvenaçe. Lewra ev çanda herêmê ku evîndarî xwe ku heta bi qirika xwe ketiye nava bîrûbaweriya koledarî û şeweya jiyana wê, nikare sazûmana nû ji sînga xwe derbixe. Dikare xwe bigihîne merhaleyên pêşveçûnê, lêbelê şertê ku di nava heman sazûmanê de be, derbasdar e. Sazûmana nû û cuda, li derve pêşvedîçe, bandorê dike û bandor digire. Ev yek dabaşa xebirdanêye, herêma ku sazûmana li derdikeve holê, weke ku teqîneke mezin a teknîk û çekeke nû be, sazûmanên berî xwe bêbandor dike. Ya kevin, ji aliyê ya nû ve, li herêma derva ya cîhê damezrandinê li rastî hêrîşê tê, têkdiçe û tê derbaskirin.

Êslamtî, piştî ku weke sêyemîn derketina mezin a Rojhilata Navîn, rola xwe dileyîze, dîrok wê ji bîra bibe, bi gotineke din, yê li rastî xiyaret û naletê were û bête terikandin. Ev encameke xemgîne, lê tê fêhmkirin. Kehaneta Hz Muhemed a pêxemberbûnê, bi wate ye. Dîsa saxbûna li roja mahşerê û derketina Muhemed a jibo Şefaetê, bi vê ve girêdayî ye.

Carna axeke ku pir jê were hezkirin jî, pêwîst dibe bibe şûv. Pêwîst e li şûna dareke rizî, yeke nû were çandin. Tişta gelekî bête bikaranîn, kevin dibe. Bi teqîna li çolê re, ji xwe axeke ku nîrxne din hilberîne nemaye. Hemû daneyên şaristaniyê derketine holê, hêza axê ku were mêhtin, hemû mêhtin e. Dayîk pîr bû ye, nikare şîr bide. Bi niçilandin, bi mêrekî nû, nikare derbasî berhemdariyê bibe. Heta ku karîbû zarok çêkirine, bi şîrê xwarênên zêde xweyîkirine û êdî dema ku dîsa vegere axê ye. Jibo mirovatiyê çî pêdivî be, vê axê hilberandiye û bi awayekî serkeftî, li hemû aliyên cîhanê belavkiriye. Weke Habîl û Qabilê Adem û Hawa, bûne şivan û cotarî. Bûne çar lawên Nûh, li çar aliyan û çar nijadan belavbûne, rûyê erdê ji şaristaniyê re vekirine, rîwekên çandiniyê, ajalên kedî, gund, bajar, dewlet, xweda, hemû pîşe, pirtûkên pîroz, pêxember, wêje, huner, mûzîk, qesirbendî, çek, rê û herwiha jibo mirovatiyê çî pêwîst be, afirandine, xweyî kirine û diyarî çarmedorê kirine. Ev hemû yê biwestînin. Rojhilata Navîn, dayika zayok, dergûşa çandê û mirovatiyê, êdî yê bikeve pişt perdeya xwe, belkî jî tirba xwe, jibo ku careke din şaristaniyeke bi şeml û rengî bize, yê bikeve xew û yê ji nû ve şiyar bibe, Ronesansa xwe Ligor demboriya xwe pêkbîne.

Ev hemû rastî, didin nîşandan ku em tenê îslamtîyê, bi vê paşdemayîn û rizîbûnê tawanbar nakin. Lêbelê dîsa jî, di bin şeweya îslamtîyê de, civak weke ku têkçûyî û bi dev rizîbûnê ve hatibin berdan in. Bi awayekî hovane tê perçiqandin, bi rûmeta wî tê leyîzandin, ji matmayînê dikevîne matmayînê. Rahîbên mezin yên ku mîtolojî afirandin, pêxemberên mezin ku ol afirandin, Sargonên mezin ku împeratori damezrandin, Hemû xwedawendên ku dîrok wan nas dike, yên ku destanên pêşî afirandin, yên helbest nivîsandin, yên ku ahenga herî kûr dane mûzîkê, yên ku heta bi dawiyê xedarî kirine, yên herî biwijdan, tev li vê axê di nav vê çandê dederketine holê, jiyîn, mirin, ji nû ve û ji nû ve hatine cîhanê. Him jî hê bihêztir, hê dewlementir, bi pir rengî û pir dengî. Şaristanî çima ji nû ve heşîn nebe?

Heger bi rastî jî, dîrok bi dersên hînkêr tije be, wî çaxî tişta pêwîst e bête kirin, têgihîştina sedemên naletbûn û rizîbûnê yên rastî ne. Dema ku mirov ji nexweşbûnê ne bi şik be, berî ku rasterast derzîkê lê bidin an jî bi xwarinan têr bikin, pêdivî bi êşnasiyeke (teşxîs) rast heye.

Pêwîst e ev mijar xweş werin fêhmkirin, bîrûbaweriya Rojhilata Navîn a mîtolojîk, perçeperçe ye. Ol ji mêj ve hatiye windakirin. Zanista wê qet çênebûye. Dîsa weke ku li bin Birca Babîl, ji her zimanî bipeyivin û hev û din fêhmnekin, ango gotûbêja kerran, ji nû ve tê jiyandin. Çi xuyabûneke biêş! Li Rojhilatî Rojhilata Navîn, Safawî, li Rojavayê wê, Osmanî, du figuranên dîrokê yên herî bêwate, bêmejî û bêdil in ku weke Hacivat û karagoz jî nabin. Têkiliya wan ne bi dîroka kevin re û ne jî bi ya nû re, qet tine. Ne bi şaristaniya Rojava re û ne jî bi ya Rojhilat re têkildarin. Yekî jibo desthilatiyê, 17 birayên xwe dane xeniqandin û ji mirovatiyê ewqasî dûr ketiye. Mîtolojî, felsefe û zanist ji mêj ve hatiye jibîrkirin. Liser eqarên ku xwediyên xwe windakirine, spekulatoran temsîl dikin. Tenê spekulatortî!

Sedsalên PZ 15 û 20an, serdema bilindbûna Ewropa ya herî mezin e, dema bi coşbûna aqil, zanist û teknîkê ye. Demeke dîrokî ye ku takekes, baweriyê bi perçekirina zirhên koletiyê tine, herwiha pêngavên serkeftî û êmin diavêje. Rastî şaristaniyeke nû û gelekî mezin e, şaristaniyeke ku dihile û mezin dibe. Ma di vê de, para Rojhilata Navîn tine? Çawa tine be? Hemû kereseyên ku hewce, wê

danê. Rojhilata Navîn, 15 000 salan, jibo ku vê zayînê bi Ewropa bide kirin, pîriktî kir. 10 000 salan, pîriktiya neolîtîk, 5000 salan jî, pîriktiya şareza kiriye. Ev rast e ku zaroka çêbûyî hovane, bavnenas û qedirnenas e. Weke ku xweda be, li qasî ku xwedîtîyê li xwe bike qure ye û nefsmezin e. Lêbelê ev jî rast e ku nezane û ber bi kendêl ve diçe. Emê van hemûkan fêhm bikin. Em nabine evîndarê rizîbûna xwe û em jibîrnakin ku dayîka mirovatî em aniye cîhanê û di dergûşa xwe de mezin kirî ne. Bêyî ku em texlît bikin, emê hînbibin. Lêbelê liser xaka sereke ya şaristaniyê, emê weke zarokên wê yê ji rengê wê û ji xwîna wê, jibo zayîne, Ewropa ku pîrbûyî bikine pîrik û zayîna pîroz pêkbînin. Dersên ku emê bi gelemperî ji dîroka Rojhilata Navîn û bi taybetî ji ya îslamê derînin, li hev dicivin û liser Ronesansa Rojhilata Navîn dibine girêk. Pêwîst e em bipejirînin ku nasnameyên bîrdoziyî yê bişeml û hemû nîrxên ku temsîl dike, ji mêj de hilweşiyane, rizîbûna ku demeke dirêj e dijîn jî, hatiye ber dawiyê. Karê pêşî yê jibo ronakbûnê bête kirin, ev e ku hêmanên mîtolojîk û olî yê dema borî, bi pîvanên zanist ên civaknasî ku hatine çespendin, bi awayek wergirî werin dahûrandin. Di bin ronahiya vê de, nîqaşên bi wêrekî û pîralî ku werine kirin, wê bi refgirtineke rast pêkbînin. Diyarbûna refên rast û temsîla rewîştê tekûz, yê dawiyê li pratîka kor, li jiyana bê wîjdan, ne rind û xelet bîne. Liqasî wateya dîrokê ya tekûz, nasnameya bîrdoziyî ya nû ku bi sêwirana rast a pêşerojê ve girêdayî, yê pêşîya pratîka civakê ku pêwîst e bête jiyandin, ronî bike û yê wêrekiya ku pêdivî bide. Pratîka şoreşger bi xwe, heger ku bi derengî be jî, wê Ronesansa Rojhilata Navîn bafîrîne. Mînakên şaristaniya feodal ên Hind û Çînê, ewqas zêde ne xwedî orîjînalîyê ne. Hind û Çînê ji BZ 4000an ve, qalibên neolîtîka Rojhilata Navîn û qezencên şoreşa çandî, girtine pêvajoya xûnifandinê. Herwiha xwe dikişînine heman xêzka dîrokê. BZ di salên 2500an de, li geliyên êndûs û Pencap; Harapa û Mohenjadarô yê ku hatine damezrandin, bi ihtîmaleke mezin weke mêhtingehên Sumer ên pêşveçûyî, derdikevine qada şaristaniyê. Aryenên di merhaleya barbarîtiyê de ku xwe bi tunc çekdar kirin, yê bîngeha şaristaniya Hindê ya ku BZ di salên 1500an de, bînavber ê pêşvebiçe, datînin. Ev pêşveçûn ê li qiraxên Çemê Zer, li Çînê jî bête jiyandin. Sazûmanên koledar ên mîna Sumer, bi derengmayîna 2500 salan, wê dest bi pêşveçûnê bikin. Mînakên bidewletbûnê yê pêşî ku bi giraniya rahîban, wê rejîma xweda-qeranan a bi nevendparêziya hişk derîne holê. Ev rejîmên ku nêzîkî 500 salan, baweriyê bi xwedatiya xwe tinin, pêşî di warê bîrdoziyî de û di warê polîtîk de, yê perçe bibin û bi kevîna nava aloziyekê. Sazûmana koledar ku pêşveçûyî, di navbera salên BZ 250 û PZ 250an de, bi restorasyona xwe ya dawî yê cîhê xwe bide şeweya tîkiliya nû, ango şaristaniya feodal. Konfuçyus û Bûdha, weke pêxemberên nûsazîparêz yê Rojhilata Dûr, wê rola pêşevaniya sazûmana mijokatî û polîtîk a ku hatî nermkirin, bileyîzin. Piştî qewlê qubûnê yê domdirêj, salên PZ 500an, serdema veguherîna feodal e. Pêşveçûnên li Rojhilata Navîn bandora xwe ya ji derve didomîne. Bandorên çewşîner ên îslama feodal, wê feodalîzma li Hind û Çînê bilez û bihêz bike. PZ salên 1000 û 1500an pêvajoya gihîştinê ye, êdî piştî vê, li hember şaristaniya Ewropa ku çîqa diçe bilind dibe, bîndest dibe û dirize. Bûyereke mîna vê, weke xelegeke herî dereng mayî yê li Başûrê Amrîka, di şaristaniyên Aztek û ênka (li Meksîka û Perû) de, were jiyandin. Pêvajoya ku BZ di salên 500an de destpêdike, PZ di salên 1500an de, di bin bandora Spanyolan de serbixwe dibe û bi jevketinê yê bi windabûnê re rûbirû bi mîne.

E- Li şûna encamê

Wesfê sazûmana şaristaniya feodal ê bîngehîn û cîhê wê yê di dîrokê de, girîngiya xwe diparêze. Nakokîya bîngehîn a di hilweşîna koletiyê de, windakirina berhemdariya keda kole û li pêşberî tîkiliyên hilberîna nû, astengbûna wî ye. Weke sermiyan xwedîbûna mirov, di zayîn û pêşveçûna koletiyê de, faktora bîngehîn a ku sazûman pêve girêdayî bû. Lêbelê dema ku hijmara wan, liqasî ku di warê hilberîna de bikarneyînin zêde dibe û dema ku kole dibine bikarên beradayî yê efendiyan, di sazûmanê de rizîbûn destpêdike. Dema ku sedem dibe bêberî, jevketin bilezgin dibe. Pêdivî ye ku bihabûna jiyana bajêr û şer jî tevî vê bibin. Bajarên ku nufûsa wan zêde dibe û pîrsgirêkên xweyîbûnê derdikevine holê, berhemên sazûmanê yê dema bi berhemdar bûn.

Dema ku berhemdarî radiweste, bajarên ku mîna aşîten berfê zêde bûbûn, di warê domkirina hebûna xwe de, dikevin nava zor û zehmetiyan. Bi bajarbûna zêde û jiyana wan a biha, sedemên jevketinê ne.

Ev yek jibo şeran jî wiha ye. Şerên di destpêkê de û di qezenckirina qadên şaristaniyê de ku berhemdarbûn, dema ku werdigerine parastina sînoran û serkutkirina serhildanan, dibine saziyên ku astar ji rû bihatir be. Artêş, êdî ne jibo aramiyê, jibo pêşveçûna aloziyê rolê dilîzin. Bûne amûrên şerên desthilatiya hundirîn. Eqarên çandiniyê yê ku weke cotgehên mezin hatin parvekirin, jiberku tîkiliyên cotarî jê qut dike, ev yek dibe sedemêke bêberiyê ya din. Ev jevketinên di hêmanên

bingehîn ên sazûmanê de ku wergeriyane qeyraneke mezin, saziyên ku li ser lingan mayin jî, bê erk dihêlê. Rewşa ku mîna sermiyanê nayê bikaranîn, rê li ber rizîbûnê vedike, di her astê de tê jiyandin. Ædî hêrişên barbaran ên ku bi serhildanên hundirîn re dibine yek, dibe qedera demê ya dawîlêanîna sazûmanê. Çiqas ku dewletparêzî were sepandin û pêkutî zêde bibin jî, jevketina sazûmanê û zayîna yeke nû, jênerev dibe.

Sazûmana ku nû derdikeve holê, pêwîst e ji sedemên hilwêşandinê re çareseriyekê pêkbîne. Peywirên sazûmana nû yên pêşemîn ev in, koleyê ku ji hilberînê qutbûyî, leşkerê bêkarmayî, axa ku nayê bikaranîn, bajarên ku weke girêbayan mezin bûyin, şerên bêber û dorhêla pêneewle, ji pirsgerêkî derîne. Ev ne pirsgerêkên hêsan in ku bi restorasyona kevin werine çareserkin. Bazdana ji bajarana a ber bi gundewariyê, jevketina artêşên mezin, xwevedana ji şer û qadên nû çêbûyî yên teng lê ewledar, rêya pêşveçûna sazûmana nû diyar dikin. Rewşeke weke xwe paşve kişandinê, tê jiyandin. Eynî weke ku li civaka neolîtîk hatibe vegerandin. Lêbelê ev di xuyabûnê de wiha ye. Digel ku nufûsa wan kêr bûye jî, gelek bajar jiyana xwe didomînin. Cotgehên mezin, di ber parên diyar de, li cotkaran weke niv milkî têne belavkirin û girêdana wî ji nû ve, bi hilberînê re tê çêkirin. Bi hindikayî malbateke serf heye û dikare bibe xwedî berhemên ku salekê têra wî bikin. Xwedîtiya bisînor, hêdî hêdî pêşvedîçe. Vegera ber bi axê û dilînên girêdana bi axê ve, pêşvedîçe. Têgîna dayîka axê, bihêz dibe û veduguhere amûra hilberînê. Ædî şer ne jibo ku bêhtir bibine xwedî kole, jibo axê bidest bixin, têne kirin. Ne mirov, ax dibe xwedîtiya bingehîn. Kesê ku herî zêde xwedî ax, herî zêde xwedî hêz e jî.

Parvekirina xwedîtiya axê ya bi vî rengî, ber bi sazûmaniya begîtiyê ve dibe. Sazûmana gund a komunal a dema neolîtîkê, ji mêj ve hatiye derbaskirin. Begîti Ligor saziya xwedîtiyê tê bikaranîn û cotarî weke nivkoleyekî, bi têtikiliyên serftiyê, bi beg ve tê girêdan. Şeweyeke weke têtikela sazûmana koletî û neolîtîkê, derketiye holê. Li dora begîtiyan, encex bajarokên piçûk çêdibin. Bajarên împeratoriya koledar, çiqas ku diçe vediguhêrine kavilan, bajar û bajarokên nû yên ku hilberîna nû bingeh digirin, bi hêdî be jî, pêşvedîçin. Him gundewarî û him jî bajar, bi bingehên nû têne birêkûpekirin. Bêyî ku paşkevin, ber bi pêş ve pêngavê diavêjin. Paşketina zêde, ti caran bi vegeirîna neolîtîkê bi encam nabe. Dema ku pêşveçûna zêde bi paşketina zêde re, bi teraz dibe, destpêka sazûmana nû tê girtin û ber bi jor ve, dibe xêzka jiyana nû.

Ev terîfîkirina feodalîzmê, jibo têtigihîştina me dibe alîkar, bê çima di warê mîtolojîk, olî û felsefî de, zayînen orîjînal pêknayên. Rewşa sazûmaneke têtikela, bîrdoziyêke têtikela pêwîst dike. Sazûmanên orîjînal, rê li ber şeweyên ramana orîjînal vedikin. Jiberku feodalîzm spartî şeweyên neolîtîk û civaka biçîn ên pêkhatî ye, hebûna nasnameyên wan ên bîrdoziyî jî, ji xwe re bingeh digire. Ti hêz û taybetmendiya wê tine ku nûjeniyê derêxe holê. Hebûnên bîrdoziyî yên ku bi wesfê herî şoreşger, têne xuyakirin jî, ji versiyoneke duyemîn, sêyemîn wêdetir, nabin xwedî wateyekê. Evan encex wateyekê nûsaziyê digirina nava xwe. Ev rewş, encex heyîna mantiq, bawerî û mirûzê sazûmanê, weke şeweya jêgirtiyêke dema bûrî, rave dike. Pêşveçûna herî mezin a serdema navîn a di warê mantiq de, heta dawîya temenê xwe, êncex fêhmîkirin û şirovekirina Arîsto ya bisînor e. Ti hêza aqil tine ku Arîsto derbas bike. Fermandarê aqil Arîsto ye û mantiq hemû girêdayî wî ne. Ustadî Azam ê ku dibêjin ew e.

Ji aliyê baweriyê ve, ji bilî ku dogmayên ol jiberbikin pê ve, ti rolên mirovan yên din tine ne. Yên ku pirtûkên pîroz dinivîsin û jiberdikin, weke zanist û zanyarên ol, tèn dîtin. Belaya dogmatîzmê ku bi hemû hêza xwe, bîrûbawerîya mirovatiyê dîtêpisîne, herî zêde di vê demê de çêdibe. Qet fersend nade dayin ku ramanêke afirînêr, hişîn bibe. Metafizîk û îdealîzmeke zuwa, bi baweriyên zuwa re dikine yek, rûyê serdema navîn ê ku em dibêjin tarî, derdixine holê. Ji mirovê koleyê xweda-qeran, paralelî derbasbûyîna mirovê siya xwedê, destûra zayîna viyanêke mirov a lawaz tê dayin. Viyana azad û sinc, hê gelekî li dûr in. Mirovatî, encex li qasî siya xwedê, wêrekiyê dike ku ji xwe re be.

Pêwîst e eshiya tarîbûna serdema navîn a ku serdema nû terîf dike, baş bête vekirin. Vê tarîbûnê ji gelek aliyên ve tarîtir dikin û tê berdewamkirin. Di bingeha tarîbûna serdema navîn de, windakirina nasnameya bîrdoziyî, heye. Bîrdoziya ku bi gelemperî pêvajoya zayîna sazûmanan ronî dike û giyanê dide, dema ku sazûman dibine xwedî hêza daringî, dibe xwedî saziyên aborî, siyasî û civakî, girîngiya xwe winda dike û tê veguherandin. Heger ku tevgerêkeke ronahîkirinê tine be, ev rewş tê wateya tarîtiyê. Bîrdoziya kevin ku ji derûnê tê qutkirin, jibo berjewendiyên taybetî tê bikaranîn, jibo civakê, rê li ber deformasyon û şewşandinê vedike. Lîstikên peyvnan, bimezhebûnên sexte, şeweyên vegotina demagojîk ku derdorê di nava derûwan de dihêlê, bi taybetî navendên bîrdoziyî saziyên perestgeh û dibistanan, wergeriyane amûrên ku terîtiyê belav dikin.

Tarîtiya berbiçav a serdema navîn, bi windakirina girêdana xwe ya bi ronahîbûna serdema klasîk re û hê xetertir bi wergerandina felsefeyê ya weke amûreke çespanîna teolojiyê re, tê çavdêrîkirin. Bi

vê rewşê, tarîbûneke bi du perdeyan çêdibe. Yekemîn, mesaja olî ya ku saf û bi wateya wijdanekî diyar, ligor dema xwe ku rêyeke derketinê vedike û helwesteke sincî gengaz dike, tê windakirin. Herwiha bingeha sazûmanê ya meşrû namîne. Tişta dimîne, berjewendiyên dardingî yên diyar in, levdan jibo vê yekê ye. Duyemîn, jibo ku valahiya bîrdoziyê bête dagirtin, tolojiya felsefî ku hatiye pêşvebirin, rewşa bîrûbaweriyê bêhtir tevlîhev dike. Bizavên mîstîk ku li hember vê yekê pêşdikevin, perçebûna bîrdoziyê bi paşve dikişînin û pêşvedibin, herdu çewtîti hev û din xweyî dikin, û tariyê tarîtir dikin. Handîkapa serdema navîn a bingeh ev e.

Dahênanên şoreşa çandinî ya orîjînal û yên sazûmana koledar, jibo bîrûbaweriyê qezenc bûn, bi ragihandina van a bi şeweya jiberkirinê, wateya xwe ya derûn winda dikin, werdigerine dogmayên vala û jibo bîrûbaweriyaya mirovatîyê, dibine karesateke herî mezin.

Di vê xalê de, pêwîst e serdema navîn, bi tarîbûnê bête mehkûmkirin, jebikeve û rêya ku bête derbaskirin were nîşandan. Ev serdem, bi berevajîbûna li bîrdoziyên xwe tenê namîne, di heman demê de, nava hişmendîya mirovatîyê ku 15 000 salan dabûn hev, vala dike, dixwe rewşa leyîstikên peyvyan, fantazyên mantiq, ekol û mezhebên sexte, li rûxandina herî mezin diqelibîne, rê li ber tarîtiyeke kûr û biyanîbûnê vedike. Di demên dawîya koledariyê de, derketinên felsefî û olî yên zêde, jixwe bîrûbawerî avêtine nava xeteriyê. Serdema navîn, çiqas ku diçe vê kûrtir dike. Di vî babetî de, serdestiya şaristaniya Ewropa û nîrxê wê yê ronayîker, roleke krîtîk dilîze. Bingeha Ronesansê ev e ku xwezayê bi kûrayî lêkolîn dike û bişik nêzîkî dogmayan dibe. Rewşa bîrûbaweriyê ya ku di nava tarîtiyê de hatiye fetisandin û takekesê ku viyana wî hatî tinekirin, ji du alîyan ve destê xwe diavêjiyê, bironî û wêrek dike û meşa wî ya azadî amade dike. Rêbaza zanistî, jibo ronîkirina hiş, rêya herî zexm e. Lêgerînên takekesî yên azadiyê ku ji dogmatîzmê qutbûyî, yê sinc û viyana azad pêşvebibe.

Pirseke girîng ev e ku bête kirin, "sazûmanên şaristaniyê yên ji Rojhilata Navîn, gelo derketineke wiha ji nava xwe naderînin?" Jibo îro jî, pîrsa ku li bersivê digere ev e. Eslêwê, jibo ronayîbûna Rojhilata Navîn, di sedsalên 10 û 12an de, di kesayetiya El Kîndî, Farabî, êbnî Sîna, Suhrewerdî û Halac Mansûr de, fedekarî û hewldanên mezin hene. Gera li rasteqîniyê, ya bi van re, evîn e. Heta tê zanîn ku ev di ser berjewendiyên aborî û siyasî re jî, hatiye girtin. Evîna rasteqîniyê, li Rojhilata Navîn, weke ku di ti deman de çênebûbe, tê ziman. Tesewûfvanên mezin yên mîna Mewlana û Mûhîdînî Erebnî, ango bi ferasetê (pêhesî) rênasên rasteqîniyê digihîjin. Di zanistan de jî, pêşveçûn hene. Di lêgerînên Matematîk, tip, ezmannasî (astronomî), rîwek û ajalan de, pêşveçûn tene pêkanîn. Di hemû waran de, serdestiya li ser Ewropa, nayê nîqaşkirin. Serdestiya di wêjeyê de, hê bêhtir hîkerîker e. Wêjeya destanan a serdema navîn, bi klasîkên Leyl û Mecnûn û Şahname, xwe çespandiye. Felsefeya Dîrokê ya êbnî Haldûn, nêzîkî materyalîzma diyalektîkê ye. Digel vê jî, Ronesansa Rojhilata Navîn, pêşvenaçe. Digel evqas mercên bikêrhatî, Ronesansa ku bingeha nasnameya Ewropa ya nû danî, bê çima li Rojhilata Navîn pêşvenaçe, bêhtir girîng dibe. Di vê de, em dikarin behsa bandora hêrişên moxolan bikin. Lêbelê ev nabe sedema diyarker. Sedema vê ya bingehîn, digel hewldanên mezin jî, valabûna bîrdoziyê, serdestiya dogmatîzmê ya bi giraniya betonê ku li ser hişan û kûrayiya saziyên siyasî ne.

Dogmatîzma xiristiyantiya ku ji binyata Rojhilata Navîn, bi awayek berbiçav, li ser bîrûbawerî û rewîştên gelên Ewropa, roleke erênî dileyîze. Gelên ku kevneşopiya barbariyê, hê jî bi awayekî zindî dijîn, bi senteza ku bi xiristiyantiyê, serve çêkirine, biqezenc derdikevin. Pêwîst e neyê jiberkirin ku xiristiyantî jibo Ewropa, diyariyeke çanda Rojhilata Navîn a herî mezin e. Xiristiyantiyê di çêbûna bîrûbaweriyaya Ewropîyan de, gavên mezin dane avêtin û bi mîsogerî, sincê wî jî afirandî ye. Ramana zagon, dîsîplîn û xwendin û nivîsandin jî, xiristiyantiyê aniyê Ewropa. Heger bingeha ku xiristiyantiyê avêtî nebe, Ewropa şareza jî yê tine be. Xiristiyantî nebûna, belkî Ewropa bi hezaran salan, di nav pencên koledariyeke paşverû de, bijiyabana. Xiristiyantiyê, jiberku qezencên şaristaniya Rojhilata Navîn, bêyî ku Ewropa koledariyê bijî, kişandine, roleke mezin lîstiyê. Şensê Ewropa di vir de ye. Qezencên xwe standin e.

Herwiha, di bingeha hewldana şaristaniya nû de, daneheva zanistî ya xiristiyantî û Rojhilata Navîn û zindîbûna civaka barbar, heye. Ya girîngtir, liser bîrûbaweriyê, bi kûrayî betonbûneke bîrdoziyî çênebûye, sazîbûneke dewletê ku ji hezar salan ve tê jî tine. Ev yek dibe şensekî wan ê mezin ku Roma jevdikeve, Bîzans û dû re jî Osmanî, serdestiya xwe pêşvenabin. Prenstî û konfederasyonên siyasî yên sist, Ligor Rojhilata Navîn, dorhêlê hê bêhtir bikêrhatî dikin. Bi betbonbûna siyasî û bîrdoziyî ku pêşneketî, tê wateya zemîneke jibo bîrûbaweriyaya azad û şewegirtina takekes a gelekî bikêrhatî. Bêşensiya Rojhilata Navîn jî di vir de ye. Ango mijarên ku ji Ewropa re dibine şens, ji Rojhilata Navîn re bêşensî ne. Çiqas ku çanda siyasî, weke çinekê fersendê nade bûrjûwabûnê,

federasyon û prenstiyên sist jî, derfetan nadin. Dogmatîzma ku rahên xwe berdane kûr, digel ku derfetê nade derketina takekesê azad, dema israrê dike jî, bi awayekî stemkar ciza dike.

Dema ku dîroka Çanda Rojhilata navîn a weke çinareke bi temen, kişiya Ewropa, weke şitleke ku ji çiqê xwe bûbe, binirx e. Li vir bi niçilandinên (tamkirin) teze, dibe dareke nikûnû, berekî gelekî zêde dide. Di vî babetî de, Ewropa ne Berhema Ewropiya ye. Ewropayî şitla şaristaniyê li axa xwe diçînin û bi saya behreyên niçilandinê, nûjenbûnê biserdixin. Di vî babetî de jî, Ewropa berhema Ewropiya ye. Di babetê danûstandina şaristaniyan de, çêkirina van cudatiyan, jibo ku ya rast bête fêhmkirin, gelekî girîng e. Kesayetiya Rojhilata Navîn ku mêjî belav bûye, digel ku nizane xwediyê çiyê, ewqasî jî nizane bê çî daye Ewropa û pêwîst e bê çî ji Ewropa bistîne jî. Jiberku cudabûn û tercih ne rast in, çend sedsal in ku ji vê çavkaniyê ne bironayî dibe û ne jî dest bi Ronasansê dike.

Ev yek vekiriyê ku di bêçareyîya Rojhilata Navîn de, sedem gelekî kûr in û pêwîst e wiha bête dîtin. Li çinareke bitemen, çiqas ku hûn niçilandineke nû bikin jî, weke dareke teze bi jiyana nabe, di heman şeweyê de, hûn vê darê bavêjin aliyekî û şitlên teze (zanist, teknîk, qalibên jiyane) ku hûnê ji Ewropa bistînin, li derdorê qurmê vê darê biçînin jî, hûn bisernakevin. Jiberku wihaye jî, şaristaniya Rojhilata Navîn xwe nûjen nake.

Em li sedemên vê yekê digerin bê çima, bîrûbaweriya civakên Rojhilata Navîn, bi veguhêzîna teknîk û zanistiya ji derve, em venakin. Çîn Japonya û Hindistan, bi tiştên ku ji Ewropa wergirtine, tercihên xwe pêşvebirine. Çîna sosyalîst, Japonya lîberal-muhafezekar û Hindistana demokratîk, didine nîşandan ku bi merc û derfetên dargî yê ku pêşvedîçin, yê bikaribin di rêya şaristaniya Ewropa de pêşveherin. Çawa ku evan demekê, hemû qezencên neolîtîk û şaristaniya Rojhilata Navîn xûnifandin û rê li ber pêşveçûnê bihêz vekirin, li hember Ewropa jî pêşveçûneke wiha pêktînin. Lê belê Rojhilata Navîn û yê mîna wê, di nava berxwedaneke mezin de ne. Ne bi derfetên derûnî û ne jî bi destekariya ji derve, li Rojhilata Navîn guherîn pêknayên. Eslê wê, divê xweş bête fêhmkirin ku pirsgirêk gelekî ji kûr tê. Ya li ber xwe dide dîrok e, çand e û civak bi xwe ye. Di dawîya parastina van rastiyan de, ezê hewl bidim ku bi kûrahî vekim.

Vekirina têgînên evîna xwedê, evîna rasteqîniyê ku ji dema Hz Muhemed ve, tiştêk ji girîngiya xwe wînda nekirine, xwedî roleke kilitê ye. Tê bawerkirin ku bi rêya ol, nêzikî rasteqîniyê dibin. Felsefeya Grek, rêyeke nû vedike û dide nîşandan ku rêya rasteqîniyê yê bi rêya aqil were zanîn. Ewropa jî dibêje, rêya herî rast ya ceribandî ango rêya ezmûndare, herwiha rêya zanist a ezmûnî vedike.

Lêgerînên sift ên li evîne, liqasî cîhana ku hatî windakirin, cîhana pêşerojê ya ku tê xeyalkirin îfade dike. Li mîtolojiya windakirî, li nakokiyên civakî yê neçareserkirî, li sirên xwezayê yê bêserî û bêbinî û li zelaliya mirov digere. Di destpêka serdema navîn de, guman dikirin ku ev lêgerîn bi xwedê hatiye dîtin. Bi têgînî nodûneh nav li xwedê tên barkirin. Hemû xeyalên mirov, ji xwedayê ku yê evîndarî wî bibin re dikine mal, weke pêxemberê wî yê xoşewîst û beniyên wî, li şefaetê digerin. Tiştê ku ji evîndara herî nêzik neyê xwestin, ê ji xwedê were xwestin. Cîhanêkê bîrdoziyî tê afirandin, ji hemî nakokiyên rizgar dikin û xwestek tene têrkirin. Tiştê dimîne, rêzikên perestîne (îbadet), zagonên şerîetê û bi diyarkirina sepînerên wê yê bihêz, yê bi cîh binin. Hz Muhemed bi xwe, dema ku ber bi jinê diçe, şeweyeke vedana evîna xwedê diji, piştê ev jiyana evîne ku yê têxine rewşeke nenasbûyî, Ligor dema xwe, bilindkirina jinê û ya malbetê ye. Navbera evîna xwedayî û evîna jinê, ne gelege. Lêbelê bi windakirina derûnê re, ev têkilî jî yê gelekî were şewşandin û yê bibe amûra sepandinê herî rezîl. Lêgerîna evîne ku di serdema navîn de, bêtir sift dibe, eslê wê hemû nîrxên şaristanî yê raborîna windakirî bi bîra mirov tînin. Liser van nîrxên ku di demeke kin de yê werine windakirin, tê girîn. Hemû lavayên ku ji xwedê tene kirin, bi van windakirinan ve girêdayîne. Di çanda Rojhilata Navîn de, xiyaneta ku gelekî kûre, kêmasî û windakirînê biêş, îfadeyên xwe di helbestê evîne de, bi awayekî sift bikartîne. Trajêdiya Halac Mansûr û ya bi sedan yê mîna wî, diyar dike bê ev rastî çawa bi takekes re tê jiyandin. Mesnswî ya Mewlana, êlahiyên Evîne ya Yûnûs Emre, newayên biêş yê hemû nîrxên windabûyî ne. Pêwîst e ev were gotin: Dema ku çanda Rojhilata navîn, cîhê xwe dide ya Ewropa û binerd dibe, êşêke mezin dikişîne, şehîdan dide, destanên xwe dinivîsîne. Wêjeya serdema navîn a biesil, tenê bi vê giryanê ye. Fûzûlî helbestvanê vê yê dawî ye. Ev, awazên helbestvanên Sumer ên ku BZ di salên 2000an de gotin, bibirtînin. Di vê wêjeyê de hevî tîne ne. Di dawîya hemû evînan de, şewat û xwelîbûn (arîbûn) heye. Leyl û Mecnûn, Kerem û Asli, Ferhad û Şîrîn, Mem û Zîn, şeweyên vê rastiya ku di wêjeya gelêrî de, derketine holê ne.

Heger em salên di navbera sedsalên 10 û 15an de, weke dema perpitîna dawî ya mezin, şîrove bikin, piştî sedsala 15an, ser nîrxên çanda 15 000 salan a ku hatî binerdkirin, timî yê were betonkirin. Tiştê ku mayin jî, moxolî bi awayekî lezgînî û bi şidet binerdikin, êdî Osmanî jî, ji notirvaniya tîrbên Rojhilata Navîn pêde, ti rolên din naleyîzin. Piştî çend ferfitînen Fatîh Siltan Mehmed, êdî ew jî bi

Sofi Beyazîd re, li ser tirban duayan dixwîne. Jê û bi şûn de, dişibe bedewiyên ereb ku liser nîrxên şaristaniyê mîz û gûyê xwe dikin, carna jî weke reqsên hoveberên Afrîqîyan, bi nezanî direqisin. Sazûmana serayên osmaniyan, bêdengiyêke mirinê ye. Ev ewqasî vekiriye ku jibo desthilatîyê zarok, têne kuştin. Ti têkiliya vê yekê bi îslamiyê re tine. Di têgihîna Ehlîbeyt de, hemû takekesên malbatê, tîn parastin û hezkirin. Şêweyên desthilatîyê yên ku herî bêesilbûne, ne bi jiyanê ve , bi kuştinê ve girêdayî ne. Di derketina xiristiyanîyê de, ev desthilatiya mirinê ku li ser ësa hatî sepandin, bi Neronê Roma bi nîşane dibe, bi Bîzansan, di nava tarîtiyêke sift de tê meşandin. osmaniyan bi sîqala (cîla) îslamiyê, perdeya sêyemîn a dawî ya vê şanoya mirinê dileyîzin. Helbest û mûzîka seraya osmaniyan, weke ku zewaca girî û zewqa rezîl a ne rewa, tîne ziman. Tiştê em dixwazin bibêjin ev e: Nîrxên şaristaniyê yên wînda, digiriyênin, jiyana gewzege a li ser tirbên wan, reqsa hoveber a liser miriyan temsîl dike. Qehra jiyana Rojhilata navîn a ku nayê kişandin, tenê ne ji ber germiya wê, bêkariya wê, ji nakokiyên wê yên bê wate û ne ji nezanîya wê ne, hê bêhtir, ji nebexşandin û tolgirtina xiyaneta ku lê hatiye kirin e.

Herwiha dahûrandinên teng ên ji çavkaniya feodalîteyê, bi taybetî nîrxandinên di derbarê pêvajoya tarî de, ne bi têrayî ne. Vegotîneke rast a dahûrandina dîrokî û civakî ya wergirî û bi gelemperî, karekî pêşîkî ye. Tenê bi şûnwarnasiyê, gihîştina belgeyên serdeman ne bes e. Belgeyên êş û hezkirinên mezin, ên qehremantî û xiyanetan, ên nalet û pêrozweriyan, gelekî kêr in. Xaka Rojhilata Navîn ku herî bêhtir gihîştîye pîrozweriya xwedayan, êdî bi çîrokên xiyanetê, bi çîrvanokên derew, bi maskeyên xwedayî ku nava wan vala, bi qambostên ku ji qeşmeriyê re dileyîzin, dabeşî welatên bêweç û binalet bûye. Hemû ewqas ne ji dil, ji dîrokê re ewqas birêz, ji sozê re ewqas xayîn û ewqasî xerîbî rastiyêne ku jibo berjewendiyên takekesî û malbetî yên herî piçûk, dikarin hemû nîrxan bifiroşin. Desthilatîyên welatan ewqasî ketine. Êdî pêwîstî bi ti dojhên din tine ye. Ji dojhên ku di pirtûkên pîroz de derbasdibin, hê xirabtir têne jiyandin. Şervaniyêke piçûk weke ya Êsraêl û Filistîn bi xwe dide fêhmîkirin, bê çawa li ser axa pîroz a dîroka binalet, bi awayekî erjeng bi tolgirdan, veguheriyê bêweçiyêke ku neyê jiyandin. Ya ku heyf û tolê digire, nîrxên şaristanî yên ku em ne layîqê wan e.

Careke din em bi bîr bînin ku Xwedawend ênanna, cara dawî derdikeve pêşberî xweda Enkî yê xasûk û fêlbaz, dibêje "Me yên min bidine min" (nîrxên ku şaristanî afirandine), digel ku xwe dilewitîne jî, van nîrxan ji Erîdû distîne û bi awayekî serkeftî dikeve orûk. Xwedayên xasûk tim dizîne û firotine. Bi tevayî bi jinê dane windakirin. Çiqas ku bi jinê dane windakirin, hejarbûna civakê, xwe weke qederekê da pêş. Dawî, êdî mirov kirine benî. Li ser wî hemû zordestî, derew û mijokatî, anîne rewşa mafekî pîroz. Yên ku pîstre hatin jî, sîqalkirin û pêşvebirina van herdu karên bêoxir, weke hunereke jiyanê dîtin. Bi awayek erjeng kuştin, amûrên mirinê yên toqîn pêşvebirin. Xweda û xwedawendên ku di ber mirovan re û hêz didane wan, veguherandina cansitênên erjeng û tolgirdê. Jiyana cîhanê ya bihiştî, wergerandine dojhê. Rojhilata Navîn wiha binalet bû û welat wiha bêweç bûn.

Hemû tişt, bi qedexenayên ku ji devê maskeyên xwedayan ên mirî derdikevin û bi temsîlvandên wan yên bêgiyan têne bilêvîkirin, tê rêvebirin. Weke ku ti çalakiyên mirov, têkiliyên civakê û bûyerên ku ji berêde nehatibin biryardan, neman e. Bi awayek azad û nûjenî, li ti deran, ti bûyeran û ti têkiliyan nayê nêrîn. Nêrîn, ji mêj ve di çavan de hatine cemidandin, deng ji zû ve hetine birîn, qedexeyên maskeyan yên bê wate ku jiyanê dikuji, di meriyetê de ne.

Li Rojhilata Navîn dîrok, weke xelekên zincîrekêye ku li aliyekî hêzên jiyana civakê pêşvedibin û li aliyê din hêzên dijberî van e. Di nivê serdema navîn de, ev zincîr weke ku qetiya bû. Xeleka nû çawa wê lê bi keve û bilind bibe? Dema em şaristaniya ku li Ewropa pêşvedîçe, ne weke pozber, weke alîkar bibînin, emê gaveke girîg bavêjin. Şaristanî, timî bi hev re şer nakin, gelek caran dibine dost. Lêbelê ew, bi teqezî, yê mêjiyê xwe bi guherînin, yê dilê xwe bi wêrekî û azadî, ji her tiştan re vekin, yên Ronansa xwe, li ser navê hemû mirovatîyê û bi hêjayiyêke nîrxên nijada xwe pêkbînin, yê xaka ku hatî bêweçîkirin, wergerînine wargehên jiyaneke pîroz.

BEŞA SÊYEM BEŞA SÊYEM

ŞARİSTANIYA SERDEMA KAPİTALİST ŞARİSTANIYA SERDEMA KAPİTALİST

Terîfkirina civakîti ya weke kategoriyeke daneheva hêzekê, bi têtînkirineke di asta herî bilind de ye. Pêdivî bi dahûrandina vê têtîne heye. Mirovê bi serê xwe ku ajalekî herî bêhêz, çawa çêdibe û wêrekiyê dike ku serdestiyê li hemû hêzên xwezayê bike? Bersiva vê pirsê, di civakîbûnê de ye. Pirsê ku hê girîngtir ev e, civaka ku takekes evqasî bihêz dike, çêbûneke çawa ye? Tê çavdêrîkirin ku di xwezayê de, gelek gumlatên (komik) weke hev, çî giyandar û çî bêgiyan, li cem hev in. Nayê xweşnedîtin ku mirov jî weke gumlateke fizîkî, li cem hev bin. Lêbelê ya ku xweşneyêdîtin ev e: Hemû gumlatên li derî mirovan, ji nava xwe yê ku bihêzeke cuda, na afirînin. Di xwezaya xwe de, her yek ji wan çawa be ew e. Bigumlatbûn, di nava xwe de cudabûnê na afirîne. Atoma hîdrojenê li her derî eynî ye. Çîmen li her derî çîmen e. Mûrî tim eynî mûrî ne. Li vir nayê nîqaşkirin ku peresîn, veguherîn û cudabûnê diafirîne. Di nava gumlatan bi xwe de, cudahiyên ku ji xwezaya wan tînen hene. Herçiqaş ku ev resenî bibîrbînîn jî, hemsîbandina wan a bi civaka morov re, ewqasî hînkê nabe. Resenîtiya civakî, bi serê xwe cudabûneke wesifî, digire nava xwe, berî her tiştî, gelekî afirîner dibe. Biriheî dikare bête dîtin ku ji mûriyê heta bi meymûnê, afirîneriyeke her gumlateke bigiyan a pêşveçûyî tine. Di civaka mirov de, çîqaş diçe, afirîneriyeke ku lezîne qezenc dike, di hemû deman de derbasdar e.

Pirseke sêyemîn a girîng ev e, gelo pêwîst e çîqaş pêşdatirî bidine takekes û civakê. Civakîbûn heta bi kûderê jibo takekese û li kûderê li dijî wî ye? Berevajî vê, takekesbûn jibo civakê çîqaşî bifêde û pêwîst e, li kûderê û çîqaşî biziyan e? Têkiliya takekes û civakê, pêwîst e rast bête dahûrandin. Belkî weke pirsgerêkeke dahûrandinê ku li qasî xweser (otonom), dêrîna wê û bi yek kirina wê, ne gengaz e mirov ecêb nebîne ku evqasî, di derbarê mijareke jiyânî û diyarker de, nezan be an jî bi zanînen gelekî çewt, bijî.

Di terîfkirina civaka kapîtalîst de, weke têtîneke kilîtê, girîng e ku em van sê pirsên bingehîn bikin. Heta ku em negihîne bersivên van yênen rast, terîfkirinên civaka kapîtalîst, wê serveyî bimînin. Herwiha hemû hewldanên di derbarê bitêtînkirin û bi teorîkirinên wê de, yê tengbûn û kêmasiyan bi xwe re bîne. Herwiha dema ku bihêzbûn a ku civakîbûnê derandî holê û afirîneriya vê bihêzbûnê ya bi lezîna û domdariya wê, tiştên ku takekes bi vê civakîbûnê qezenc kirin û tiştên ku wînda kirin, heger ku bi awayekî têtînkirî bête dahûrandin, wê dikaribe civaka kapîtalîst û takekesî jî, werine terîfkirin.

Ev yek derketiye holê ku dahûrandinên sosyalîzmê, yênen li ser kapîtalîzmê, ne bi têtîyî ne. Têtîkîrînen ku sosyalîzm dijî, ne ji ber bêmafîbûna wê ne, jiberku ne bi têtîyî ne bi zanistî ye. Sosyalîzm bi gelemperî jî têtîhîna herênaya civakê û bi taybetî ji ya takekes û civakê, dûr maye. Serdestiya civaka kapîtalîst a li civaka sosyalîst û serdestiya takekesê kapîtalîst a li takekesê sosyalîst, ne hatiye niçilandin. Li vir, paşdemayîn û kêmasiya bîrûbaweriya rast, rolê dilîze.

Civakîbûn, li dij takekesê dîrokî, xûnifandineke erjeng pêwîst dike. Dema ku em bibêjin erjeng, tenê rêbazên çewsandinê yênen bêteşen nayênen bîra mirov. Aliyên bi erênî û aliyên kişîner û rêbazên ku qet kêman nabin, di nava hev û din de ne. Di pêvajoya çêbûna civakê de, tiştên ku hatiye çavdêrîkirin, jibo kedîkirina takekes, tirsandin û xelatkirin û amadekirina jibo endamtiyê ye. Ev têtîkîneke wisa bêemane ku pêdiviyên wê bi cîh neyên, di serî de mirin û ji gelek aliyên din ve, windakirin li pêşiya mirov e. Ya rastir, jiyân encex bi pêdiviya endamtiya civakê, gengaz dibe. Heger Ligor pêdiviya endamtiyê neyê çêkirin, jiyân nayê meşandin. Weke ajalekî herî bêhêz, mirov-takekes jî tinebûnê rizgar nabe. Çêlîkekî çivîkan, dikare di pazdeh rojan de, bifire û bijî. Lê jibo zarokeke mirovan, ev ne di bin deh salan re ye. Heger bi serê xwe bimîne, yê were dîtin ku zaroka mirov, jî çivîkekê jî bêçaretir e. Lêbelê dema ku endamê civaka eşîreke piçûk be jî, dikare bibe qeranê hemû ajalên. Dema ku ev yek hate fêhmîkirin, civakîbûn bi hêzeke wisa derasayî derdikeve holê ku şeweyên ramanên yekemîn, bi têtînen ol û xwedê têtîne îfadekirin. Ango derketina ol ya holê û têtîna wî bingehîn a xwedê, vedana nasnameya vê bihêzbûna derasayî, ya civakê ye. Civakîbûn, xwedabûn bi xwe, bingeha wî ya daringî ye. Hêza derdikeve holê, taybetiya xwedê ya sereke ye ku derfetê dide hemû afirîneriyan. Çî dimîne ku civakîbûn na afirîne? Di be ku bibêjin mirov nikare ji tinebûnê hebûnê çêbike, lêbelê heger em bînin ber çavan ku hebûna jî tinebûnê, ne hatiye çespendin, yê xwedayiya afirandina civakî, bêhtir were fêmkirin.

Herwiha, hêza mezin ku civakîbûn dide, çiqas were fêhmkirin, yê bêtir qedir bi civakîbûnê were dayin. Bi civakîbûnê, mirov ji xişokiyêke (marîjokiyê) xwezayê, ji afirîdeyekî pasîf rizgar dibe, berevajî vê, çiqas ku pêşvedîçe, tê hêzeke wisa ku serdestiyê li hemû nirxên xwezayê dike. Ji ber vê yekê, merhaleyên destpêka dîroka civakê, hebûneke wisa derdixê holê ku civakîbûneke zêde çêdibe, ji şeweyêke bin werdigere şeweyêke raser, ji beşekî derbasî beşekî din dibin. Hemû pirsgerêk û astengiyên ku xwe nîşan didin, bi çêbûna şewegirtinên civakê, têne bersivandin. Zanînen kin ên civaknasî, nîşan didin ku rastî, bi vî awayî herikiye û hatiye, pêşveçûneke bê navber û domdar hatiye jiyandin. Perçebûn, veqetîn û tinebûnên carcaran di navê re, ne di wê hêzê de ne ku pêşveçûn û mezinbûna wê, ji holê rakin. Belkî jî ev, weke pêdiviyên peresîna civakî, zêdeyî û bermayiyên kevn in ku li hember yên nû erka xwe winda kirine. Helandina takekes a di nava civakiyê de, rêzika bingehîn e. Di tekilî û nakokiyên di navbera bihêzkirina çêbûna civakê û ya takekes de, timî gerdîşa civakî serdest e. Gerdîş weke zagoneke civakê ye. Çêkirina gerdîşê ya kevneşopiyêke hişk, li dij însiyatîf û enerjîya takekes e. Piştî merhaleyekê, jibo takekes, civak û gerdîşa ku rêya ewlekarî û mayîna li jiyane ya bi tenê, êdî digihine bandeveke bihêz ku êdî wî zincîrê dikan.

Di civaka biçîn de, rêzîkên dewletê yên fermî ku di ser gerdîşê re, dema ku pêwîst be, yê şidetê bisepîne û bi awayek hişktir, bide mêşandin. Girêdana takekes, yê wergere dîlbûn û koletiyê. Bindestî, ne tenê di mercên civakê yên hilberîna dargî de, yê di bîrûbawerî û cîhana dîlînan de jî, were biserxistin. Mercên bîrdoziyî û dargî, di hemû beşên civakê de, yê weke vedanên sazûmana xwedayî, bi awayekî pîrozwer werine pêjirandin. Çiqas ku derfetên mijokatiya çînê zêde bibin, têkiliyên bindestiyê yên ku vê gengaz dikan, him bi çewsandinên dargî û êşkenceyan, him jî bi mîtolojiyên ku tîrsa menewî û mizgîniyê dide, tîn hişk kirin. Êdî yê bi takekes re, bîrîkirineke rizgariyê çêbibe, yê pêvajoya reva (bazdan) ji giraniya civakê ku gihaye bêterazeke mezin, destpêbike. Di civaka ku komkomî dibe û lêferzkirina bindestî û koletiyê de, jevketin bilezgîn dibe. Mirov pêşî behsa êşên xwe yên piçûk dikan û dû re, êdî çîqa ku here, wê gilî bike û ber bi serhildanê ve here. Yê li hember hêzên sazûmana fermî, li derfetên berxwedana xwe bigere. Lêgerînen xwedê yên nû û bihevrebûnên civakî, di vê pêvajoyê de, yê cudahiyên pêdivî li hişan bicîh bike. Civaka dijber, nêzîktirî takekes e. Pêvajoya azadiyê, biherketbûna civakî ya nû ye, lêgerîna wî ya nasnameya bîrdoziyî û sazûmanê ye. Heger bîrdoziya nû û civak, digel sazûmana ku bi ezmûn dijberiya wê dikan, bijîn û berhemdariya xwe bidine çespendin, derfet wê jê re cêbibin ku bikeve şûna ya kevin. Li hember sazûmana koledarî, dibe bila olên yek xweda bin û dibe bila terîqetên niv olî-felsefî bin, ev bizava ku pêşvedîçe, weke ku di mînakê esa de tê dîtin, bi mesîhtî, ango weke bizaveke rizgarker diyar bibe. Piştî demêke ku civakîtiyê gelekî domdirêj dikişîne, hiş û wijdanê takekes hişyar dibe. Rizgariya ji qeydên gerdîşparêziya civakî, ya ku sed hezar salan domandî, mukirhatina çêbûna civakî ya ku gelekî zêde çûyî ye. Ev rêbaz, dema ku sazûmana civaka feodal derdixê holê, ranaweste. Evîna xwedê, an jî evînen klasîk ên serdema navîn, reva takekes a ji civakîbûna gelekî zêde û lêgerîna wî ya li azadiyê îfade dike. Ev lêgerînen wiha yên li evîne, çespînen hikarîker in bê çiqasî mehkûm dijîn. Ji civakê tê revîn, xwe diavêjin xwedê, ji evîna takekes alîkarî tê hevîkirin. Lêgerînen felsefeyê û yên terîqetê jî, di vê pêvajoyê de, didomînin. Digel ku bisînor û bi armancên çewt be jî, takekesê ku serî hildaye, êdî nayê zeftkirin.

Dema ku em di vî babetî de, li takekesiya ku kartêkereke bingehîn a derketina kapîtalîzmê ye, binêrin, yê bêtir were fêhmkirin bê liberalîzma bûrjûwa, çiqasî xwedî hîmên civakî û dîrokî yên bihêz e. Ligel vê yekê, digel hemû mafdariya wê jî, bê çima civakparêziya sosyalîzma zanistî, serdestiyê bi dest naxe, bi berfirehî tê fêhmkirin. Heta ku civak hebûna xwe, weke dendikeke pola bidomîne, liberalîzma takekesî yê tim serdestî sosyalîzmê were. Dema ku jevketina civaka kevin a dendikî pêkwere, wî çaxî di têkiliyên civak û takekes de, yê mercên terazeke îdeal, derkevîne holê.

Li vir em di asta terîfkirîne de, ji bizavên ku kapîtalîzm derandine holê diaxivin. Bêşik, takekesîti di serê van bizavan de ye. Sedema bandorkeriya wê ya evqasî, civakîtiya ji sedhezar salan ve ku giraniya xwe dide ye. Takekes hatiye helandin. Civak bi xwe, dişibe dendikeke atomê ku elektronên dora xwe xwaribin û li ber perçebûnê be. Êdî takekesî, weke perçekî piçûk ku ketibe nava sazûmanê û rê li ber reaksiyonên zincîrkî veke, rola perçekirina civaka bêteşe, cangiran û werimî, dileyîze. Kapîtalîzma ku wê bize, hêza xwe ji vê teqîne digire û rê li ber encameke dîrokî ya herî mezin vedike. Esasê wê kapîtalîzm, hêz û enerjîya xwe ji civaka ku bi sedhezar salan mezin bûye û bi levdana bi takakas re jevdikeve, distîne. Sira afirînêriyê di vê de ye. Çiqas ku diçe, hê bêtir tê fêhmkirin ku sosyalîzma zanistî, di vî babetî de, gelekî teng dihizire, dikeve rewşa civaka kevin û berevajî bizava azadiya ku diparêze, dibe.

Terîfkirina zayîna civaka kapîtalîst, ligel bizava takekesî, di warê dem û cîh de jî, yê hînkêr be.

Çawa ku daringek, bêyî rewşa dem û cîh, neyê hizirandin, civaka ku çêbûneke daringiye jî, bi rewşa dem û cîh ve, hişk girêdayî ye. Şeweyeke civakî ku dema xwe danegirtibe, ji holê ranabe. Liqasî ku ji holê ranabe, dema ku şeweya bi şûn xwe ve rast digire, derfetên derbasbûneke zexm bi dest dixê. Heger ku rewşeke wiha peyda nebe, veguherîn pêknayê. An bi helandin an jî bi jevketinê, mercên dawîbûna wê, yê derkevin holê. Heger bi berxwedan serkeftî bibe, yê ji piya bimîne. Wê bi keve pêvajoya pêşveçûna xwezayî. Heger ku bi ser nekeve, wê ji kesayetiya xwe derkeve. Jibo civakekê, dema normal, encex şewegirtinên xwezayî li pey hev werin ê were jiyandin. Di encamê de, civaka ku di vî babetî de herî serkeftî, giyana demê digire, yê weke ku tiştê pêdivî gihîştandibe, were berdan. Herwiha di şewegirtinên civakî de, ji klanên hoveber qet qevastina kapîtalîzmê pêknayê. Hinek klan bi kapîtalîzmê re bibine yek jî, ev nayê wê wateyê ku sazûmênên koledar û feodal ên di navê de, hatine derbaskirin. Berevajî vê, jiberku van sazûmanan demên giyana xwe dagirtine û cîhê xwe dane kapîtalîzmê, êdî hemû şeweyên kevin, dikarin di nava şeweya nû de were daqûrtandin. Lêbelê weke şewegirtinên ku werine şopandin, najîn. Cudahiya çêbûn û daqûrtandinê di vira de ye. Ti şewegirtinên civakî, heta ku giyana demê neji, bi nasnameya xwe nagihe gihîştineke pêdivî. Herwiha şewegirtina civaka kapîtalîst, encex weke xelesa dawî ya şewegirtinên berî xwe ku hev û din pêwîst dikirin, pêkwere. Xelekên berê, li kûderê û çiqasî jiyabin jî, kapîtalîzm encex weke xelesa dawî, bi ser wan ve bibe. Reva ji bandora demê, ne gengaz e. Weke ku tê bilêvkirin, çawa darig bê dem çênabe, sazûman jî bê dem çênabin û nayên ser hev.

Ev nirxandina me, ji ber vê yekê girîng e: Weke ku kapîtalîzma Ewropa, li parzemîna Ewropa, ji erdê mîna kîwarkan (fiqeroşk, kûmik) derketibe, pêşkêşî mirovan dikan. Serdestiya bîrdoziya emperyalîst, herî zêde di vî babetî de, xerakirinên zanistî û jirêderxistinê pêktîne. Herwiha Ewropa, weke sazûmaneke bêhempa ku ne deyndarê ti kesan û heta hetayê yê biçê, tê pêşxistin. Di dîrokê de, bi taybetî civakên ku xwedî rewîştê emperyalîst, di nava nêzikayiyên wiha de ne. Ev, timî hertîştî ji xwe didine destpêkirin û xwe weke navend dibînin. Evên din parekên (veser) hêsan û biçik in. Ev nêrinên bi vî rengî, dîroka civakî nefêmbar dike. Digel hemû îdiayên zanistî jî, bîrûbaweriya civaka îroyîn, ne xwedî têgihîneke dîrokî ye. Ev jî tê wateya ku zanistiya civakî ya rast, pêşveçûyê. Weke di hemû çêbûnên xwezayê de, ti çêbûnên bêyî demê tine ne. Di hemûkan de, dewsa dîrokî ya xwezayê heye. Çiqasî û çawa çêbûne, encex bi dîrokê, ango bi demê gengaz e. Ji teqîna beşeneke (cisim) ezmên bigirin, heta bi çiçikeke ku ji hêka mirîşkê derdikeve, pêdiviya her çêbûnekê, bi demê heye. Ligor ku civakî jî çêbûneke daringî ye, bi demeke çêbûnê ve girêdayî ye. Dîrokeke civakî ya cidî, dema ku bi awayek rastî, şewegirtinên civakî li kûderê, di çi demê de û bi çi taybetiyan çêbûne, pêşikî û encamên wan bûne çi, deyne holê, wî çaxî yê mafê îdiayê hebe ku hatiye rewşa zanistiya civakî.

Em dikarin jibo rewşa cihkî ya civakî jî, nirxandineke wiha pêşvebibin. Ev şewegirtina civakî, bi awayekî hişk bi mercên cîh ve girêdayî ye. Berî her tiştî, mercên fizîkî yên ku nîfşên mirov, karibin li berxwebidin, bingeş in. Ligor ku yê li cemsereke qeşayê, an jî li çolê nikaribe bijî, şeweyên civakî qet çênabin. Şewegirtinên civakî yên pêşî, dikarin li derên ku derfetên danehev û nêçîrê hebin, pêşvebiçê. Li cîhên ku ev nebin, ti şeweyên civakî çênabin. Şewegirtineke weke ya civaka neolîtîkê, ya di merhaleke bilntir de, encex li cîhekî ku jibo kedîkirina ajalan û çandina rîwekan bikêrhatî be, derkeve holê. Di heman demê de ev cîh, weke pêşemerc, hebûna civakên ku xwe bi danehev û nêçîrê xweyî dikan, pêwîst dike. Ev jî rastiyeke din e ku ev pêşemerc, li cîhên gelekî bisînor, digihine hev. Heta ku xelekên neolîtîkê, yên bi pêkanînen mezin çênabin, derbasbûyina şeweya civaka biçîn, pêknayê. Dîrok dide nîşandan ku encex, civaka gundî ya ku li qewsên hundirê Zaxros-Toros û li geliyên Dicle-Ferad çêbûyî, bi girêdanêke bi hev re, yê bikaribin rê li ber şoreşa bajêr vekin. Encex, derfetên avdan û axa berhemdar ên korta Dicle-Ferada jêr, jibo vê şoreşa bajêr, cîhekî bikêrhatiye û pêşî yê li vir pêkwere. Xelekên zincîra civakî, hê bêhtir himbiz bûne. Di civaka neolîtîk de, bi çêbûna civaka koledar a biçîn, di nava girêdanêke diyalektîk de, xelegeke din a bingeşin ê were çêkirin. Ev şewegirtina nû, piştî ku bi kûrayî, ji aliyê cîh ve jî bi berfirehî bijî, heta bi merhaleke ku bi nakokiyên di nava xwe de bête derbaskirin, yê bi hêza ku ji vê navendê bigire bijî. Jibo şewegirtina civakî, weke demê cîh jî gelekî girîng e.

Pêwîst e were têgihîştin ku di çêbûna civakî de, tiştê sereke û ya dawî, bi navenda pêşevan û pêşveçûnên derdor di nava tavayîyeke diyalektîkê de, xwedî rastiyeke ne. Ev rêzika ku xwedî nirxekî zagonî, dide nîşandan ku heger rewşa dem û cîhê şewegirtinên civakî, li ber çavan neyên girtin, yê neyên fêhmkirin. Digel ku ya rastî ev e jî, taybetiya nasnameya bîrdoziyî ya civakan, ku xwe cihêreng û orjînal nîşan didin, astenga herî mezin a li pêşya rastgotina dîrokê ye. Eznavendparêzî dibe armanca şerekî bîrdoziyî. Xwe pirolekirin (zêderûyî) û înkarkirina yên li derî xwe, weke serdestbûnekê tê têgihîştin. Wisa tê gumankirin ku çiqasî rastiye bi şewşînin, wê ewqasî

serkeftî bin. Ji serdema pêşî û heta weke dema me, hemû şêwegirtinên civakî, weke rêbazeke ku xwe bidine jiyandin, timî ev bikaranîne. Di totemtiyê de, her komik, encex pûtê xwe herî hêja dibîne. Di warê mîtolojiyê de, gaveke din bi pêş de tê avêtin. Civak, behreya temsîlkirina xwedayê ku li ezmên rûniştî, qezenc dike. Jiberku bajar, navendên herî girîng ên civakê ne, rê li ber xwedayê herî bihêz ê ku bajêr diparêze, vedike. Sazûmana ku navendî dibe û bajarên ku dibine yek, di navbera xwedayan de jî, navendîbûnekê derdixe holê. Gihîştina împeratoriyeke gerdûnî, jibo yek xwedayî, zemîneke polîtîk amade dike. Li erdê yek qeran, li ezmên yek xweda, di hişan de cîhê xwe digire. Digel van pêşveçûnan, him di nava civaka biçîn de û him jî yên li dijî wan, ango berxwedanvanên li derî wan, ên bixwazin ku nîşane û kevneşopiyên xwe bidomînin. Di têkiliyên hilberîna doringî de jî, pêşveçûnên bi vî rengî yên berdewam bibin. Dîroka mirovatiyê bi van hemû aliyên xwe, weke çemekî mezin ku bi rûbarên piçûk xweyî bibe, yê taybetiyeke herikandinê qezenc bike. Dîrok, weke hêzeke çemê liherik ku dem û cîhê wî heyî yê dem, cîh, zemîn û qadê ji xwe re bigire û zorê li nûjeniyê bike, biherike.

Çawa çemekî bi coş, ber bi jor û berevajî nikaribe bi herike û herka wî ya ber bi jêr, a di coka xwe re, zagoneke fizîkê be, rewîşteke civakan jî ya di nava reseniya wan de, bi vî şeweyî heye. Dîroka civakî, organîzmayeke bigiyan e ku dikare hemû rûbarên ku bigihinê, li xwe bide hev û bi hêza çemekî biherike. Heyîneke ku hiş, xeyal, hêzên wê yên rêvebir, viyan û aqlê wê heye. Pirsgirêk ev e ku bête zanîn ev çemên diherikin, li kûderê, kengî, çiqasî bi hêz û çiqas rê qût dike, herwiha ev yek yê me bibe hişmendiya dîroka rast. Ya ku em li vir dixwazin bikin ev e; têgihînên ku gelan, kedkaran û tevkarîvanên nirxan yên bê hijmar, jibîrdikin û zorlêkirinên bîrdoziyî ku weke dîrokê didine pêş, nabine dîroka rast. Di vî babetî de, di roja îroyîn de, pirsgirêka herî cidî ya zanistî, nivîsandina dîrokê ye.

Navendên bîrdoziyî yên civaka kapîtalîst, ên ku di pêşveçûna zanistî de xwedî para mezin, di çêkirina dîrokê de, ewqasî pûte pê didin ku şewşandinên ji berê bêtir, bawerdêr bikin. Di dîroka Ewropa de, serdema neolîtîk ya ku 10 000 salan bi navenda Heyva Berhemdar, roleke pêşevanî lîstiyê û gelek tişt dane mirovatiyê, nayê dîtin û weke ku tine ye. Heçku, em xweş dizanin, heger ku afirînêrên serdema neolîtîk ên ku ajalvanî û çandiniya pêşî pêşvebirin, yên ku gundên cîwarbûnê damezrandin û yên ku ev weke pêşavaniyan li tevaya cîhanê belavkirin nebûna, ji mirovatî û pêşveçûna mirovatiyê ne dihate behskirin. Tiştê ku civaka biçîn a ku bi Sumeriyan destpêkirî û hemû serdema şaristaniya koledar gengaz kirî, merhaleya civaka neolîtîk e. Heta çalakiyên vê demê yên afirînêr ku bi hezar salan berdewamkirin, li ber çavan neyên girtin, dîrok nayê nivîsandin.

Şaristaniya Greko-Romen a ku di bingeha şaristaniya Ewropa de, bandeva şaristaniya Sumer û Misrê temsîl dike. Ji hemû bûyerên dîrokê diyar e ku çêbûna vê şaristaniyê ya bi serê xwe, ne gengaz e. Ji haletê bikartîne heta bi tekelek, ji nivîsê heta bi matematîkê, ji sifir heta bi hesin, ji camê heta bi raçandine, ji aşîkê destan heta bi aşê avê, ji hemû rîwekên bingehe heta bi ajalên kedî, ji qesirbendiyê heta bi peykertiraşiyê, ji helbestê heta bi mûzîkê û ji mîtolojiyê heta bi olê yek xweda, hemû nirxên şaristaniyê yên bingehe, ji şoreşa neolîtîk a Heyva Berhemdar, bi Misir û Sumer ve girêdayî hatine afirandin, bi rêyên ku dîrok jî diçespîne, hatine kişandin û xûnifandin. Ev kişandin tenê ne gihîştina sazûmana neolîtîk a heta bi Ewropa, ya di BZ salên 5000an de ye. Dîsa heta PZ salên 1500an, herî dawî bi nirxên şaristaniya îslamiyê, hatine kişandin. Di vê kişandinê de, ji şêwegirtina civakan heta bi çandên seresazî û binesaziyê jî tevlê ne. Dema ku ev nirx tene kişandin, hê Ewropa jî jiyana civakên hoveber, rizgar nebûb.

Ev vegotina kin jî dide çespendin ku ji amûrên hilberînê, heta bi formên bîrûbaweriyê yên bingehe, ji nirxên mirûz heta bi baweriyên, şaristaniya Ewropa ku girêdayî wan, di mercên dem û cîhên cuda de, hatine afirandin. Rewşa dem û cîhê şaristaniyê, weke kindireke ji pola, nirxên ku hatine ser hev ku veqetîne qet naxwazin, dikişîne û hêzên wê yên ku her nûjeniyê di sînga xwe de, radigirin e. Heger em bi zimanê mîtolojîk bibêjin, hêzên xwedayî ne.

Di zayîna şaristaniya kapîtalîst de, nirxên şaristaniyên demên borî ku ew dane mercandin, heger rast werin diyarkirin, tenê ne ji aliyê dîroka rast ve, ji aliyê hêjayiya nirxên ku herikandine çemê Ewropa ve jî, rêbaza herî rast e. Pêşvebirina dahûrandinên me yên bi vê rêbazê, yê gelekî hînger û qezencdar bin.

A- Bûyîna şaristaniya kapîtalîst û nasnameya wê ya bîrdoziyî

Ev terîfkirin û nêrîneke tê pejirandine ku taybetiyên herî bingehe, ên ku sazûmanên civakî diwesifîne, mercên hilberîna doringî û bi vî ve girêdayî, têkiliyên xwedîtiyê ne. Çi derfet, herî bêhtir tevkarîyê li hilberînê bike, şeweya civaka ku li dora wê pêşdikeve jî, bi wî navî tê binavkirin. Di sazûmanên hoveber ên komunal de, jiberku amûrên ji keviran hatine çêkirin, rol dileyîzin, ji van

deman re kevirê bêteşe û kevirê nû (paleolîtîk û neolîtîk) hatiye gotin. Di demên civaka biçîn de jî, jiberku kole di warê hilberînê de, rola herî mezin dilîze, ev sazûman jî, bi navê civaka koledar tê binavkirin. Di nava hemû amûrên hilberînê de, yê herî berhemdar, kole ye. Hemû amûrên din jî bi wî, rê li ber hilberînê vedikin. Di serdema navîn de, ya ku berhemdariya wê zêde bû ye, ax e. Bi taybetî belavbûna gêsîne hesînî û vekirina axê ya ji hilberînê re, xwedîtiya li ser kole bisînor dike û ev jî hê bêhtir, tevkariyê li hilberînê dike, ev rewş şeweya civaka feodal dide wesfandin. Tiştê ku civaka kapîtalîst bi şewe kiriye, di qada hilberîna daringê de, hilberîna endustriyê -karxane- ya ku serdestiyeke mezin bi destxistiye. Di vê hilberînê de, ax û hêza mirov, ketiye pilana duyem. Hilberîna karxanê ya li ser hev û bi têrayî, piştî ku serdestî li ax û pîşeyên ku bi hêza çeng dihatin xebitandin kir, sazûmana nû ya ku li derdora wê hatî damezrandin, bi navê civaka kapîtalîst tê binavkirin.

Di wateya sermiyan de, şeweya kapîtalê ya herî sift, dibe karxane. Tê zanîn ku di destpêkê de, sermiyan bi bazirganiyê (merkantîlîzm) re, di nava girêdanên nêzik de pêşveçûye, ev yek bûye daneheva sermiyan a hoveber, binyata wê digihe heta bi Sumeriyan. Hilberîna karxanê, ji sermiyaniya bazirganî ya hoveber a bi şeweya hilberîna pîşeker (bi hêza çeng e), derbasbûyina hilberîna bi teknîka mekîneyê, tê pêkanîn. Bi gotineke din, ji manîfakturê derbasbûyina karxanê, di şeweya hilberînê de, rê li ber hilberîneke zêde vedike ku heta wê rojê, ne hatibe dîtin. Digel ku naveroka terîfkirina me ya civaka kapîtalîzmê eve, kêmasiyên cidî jî bi xwe re hildigire, heger ku ev kêmasî neyên tinekirin, yê şaşiyên mezin, bi xwe re bîne.

Nêzîkbûnên materyalîzma bêteşe, sedema jevketina reel sosyalîzmê ya zûka ye. Ev terîfkirina ku em didin, kapîtalîzmê û civakê bi tevayî, bi paşde û teng digire. Rola bîrdoziyê û ya mirûz, têgihîna dîrokê û terîfkirina dewletê, gelekî hesan tê daxistin. Nêzîkbûneke bi vê şeweyê ku di asta terîfkirinê de, evqasî kêmasiyan bi xwe re tine, rê li ber şeweya civakeke alternatîf venake. Ev nêzîkbûn, ji sepîna komunaleke teng ku di dîrokê de gelekî tê dîtin û wêdetir naçe. Ji van re mezhebbûna mîstîk û terîqetbûn tê gotin, çiqas ku di roja îroyîn de, xwedî bîrdoziyiyên cuda bin jî û çiqas ku ji wan re çepgir û rastgir jî were gotin, ji taybetiyên ku sazûmanê derbasbikin, gelekî dûr in. Bi piranî, ji xûnifandina sazûmana serdest û ji parastina wê ya bêeslî, rizgarnabin.

Ji ber vê yekê, di çarçova zayîna kapîtalîzmê de, terîfkirinên wergirî pêdivî ne. Têgihînen çep û rast ên ku serneketina wan, gelek caran derketiye holê, terîfkirinên civaka kapîtalîst û derbaskirina wê, karê wan ê yekemîn e. Herwiha kesên ku civaka kapîtalîst bi berfirehî ne nirxînin, nabine xwedî têgihîneke dîrokê ya rast jî. Şeweyên civakê yên ku ev weke alternatîfekê pêşniyar dikin jî, ji xeyalê û wêdetir naçin, bi zorlêkirinên zêde, bûyerên trajî-komîk yê derkevin holê. Trajedî û komedî, îfadeya hunerî ya herî kevin a zayîn û mirinên berî dema xwe ne.

Encameke herî xeternak a terîfkirina bi kêmasî a civaka kapîtalîst, meşandina têkoşîneke çewt a li hember wê û rê li ber vekirina serneketinê ye. Ev rewş, kapîtalîzmê hê bêhtir bawerhişk dike û dijberên wê li widabûn û êşên giran rast tine. Bigelemperî, jiberku çêbûna civakî nayê terîfkirin, rê li ber mîtolojîbûnê û têgihînen olî û felsefî vedike, ev jî jibo mirovan jiyaneke trajî-komîk derdixe holê. Şerên cîhanê yên mezin ku bi sazûmana civaka kapîtalîst ve girêdayî, ji nêzik ve, bi van rastiyan ve girêdayî ne. Li her derî û hemû deman, kêmasiya zanist û zanîne, pîrika nezanîn û levdanên kor e. Ji ber vê yekê, di binyata zanîne de, hewldana herî bingeh, derbaskirina nezanîne ye. Çiqas ku nezanîn were derbaskirin, çêkirina hemû karan a rast wê gengaz bibe. Mirin bi xwe jî, bi zanîna têr, ji çavkaniya êşê tê derxistin. Hemû tirs û pêve girêdayî, çavkaniya tevgerên pasîf û bi levdan, dîsa ji zanîna kêma û çewt û ji asta zanistê ye.

Terîfkirineke civaka kapîtalîst a tekûz, encex bi vehewandina nasnameya bîrdoziyî yê were çêkirin. Buyereke ku qet ji ber çavan dûr neyê girtin ev e ku sazûmanên civakê, berî her tiştî bi hiş û viyanê ve girêdayî, derdikevine holê û tene meşandin. Mercên hilberînê yên ji ber xwe ve, çiqas ku bikêrhatî bin jî, civak nayê meşandin. Heta ku nasnameya bîrdoziyî diyar nebe û serdestiyê li viyanê neke, mercên hilberînê, ji daringên bêgiyan pêve nabine ti tişt. Sedema bingehîn a ku civaknasiya îro rola xwe nalîze, zayîna sazûmanan û civakên herî piçûk bi hiş û fermana wî ya li ser viyan û kiryarê ku cudahî û girîngiya wê li ber çavan nagire û bi hinek sedemên din rave dike ye. Nexweşiya civaknasiyê ya herî bingehîn ev e ku rola nasnameyên bîrdoziyî, bi awayek rast danayne holê. Bi hindikayî, liqasî ku oldar berpirsiyariyê digirine ser xwe, pêwîst e yên ku bi civaknasiyê re têkildar jî, berpirsiyariyeke pîroz bigirine ser xwe.

Lebikîna bi civakê re, naşibe lebka bi fizîkê re. ædî li wira jî ezmûneke çewt, dahênaneke ku ne di bin çavdêriyê de be, dikare rê li ber karesateke mezin vebike. Bombeya atomê, mînaka vê ya herî hîkarîker e. Qada civakî, bi tevayî weke perestgeheke pîroz e. Têgihîştina her têkilî û sazîyê ya bi nazîkî û diyarkirina bê çawa nêzîkayî lê bête kirin, bi hindikayî li qasî bijîjkiyeke tibê,

berpirsiyarbûn û xwedîbûneke bi hostayî, pêwîst dike. Jiberku ev yek nayê kirin, qedera civakê ya trajîk, derdikeve holê, diçine berbi hemû şeweyên şetiyê, êşkenceyên erjeng û heta bi şerên giran. Ev yek girîngiya xwe nîşan dide ku xwerexnekirinên herî meyin, pêwîst e ji aliyê civaknasiyê ve, bêtine dayin.

Derseke herî girîng a em karibin ji terîfikirina kêma ya Marksîzmê derînin, ev e ku nêzîkbûnên zanistî yên di derbarê civakê de, pêdivî bi kesayetiyên zanist yên mîna pêxemberan heye.

Pirsgirêkeke din a derbarê şewegirtina civaka kapîtalîst de, gelo çima ne li navenda şaristaniyê, li Rojhilata Navîn, li Ewropa, li peravên Atlantîk derketiye holê ye. Di bingeha ku civaka kapîtalîst li Rojhilata Navîn pêşveçûyî de, ev yek heye ku, kevneşopiyên bîrdoziyî û siyasî yên şaristaniyê, bi îslamtiyê re, hemû naverokên xwe xilas kirine. Ji dema sumeriyên ve, him di biolîkirina mîtolojiyê û him ji gihandina desthilatiya siyasî ya deverên herî pêşveçûyî de, îslamî rola herî mezin lîstiyê. Êslamtiyê di baxaja sazûmana şaristaniyê de, çi hebe, heta bi dawî bikaraniye. Tiştê bi şûn de mayî, qaşûl û tovê wê yê hişk ku li vir û dera din reşandî maye. Gelekî xweş tê zanîn ku di nivê serdema navîn de jî, him di mercên hilberîna daringî de, him di warê desthilatiya siyasî de, him jî di warê zanist, felsefe û olî de jî, îslamî û Rojhilata Navîn, Ligor xiristiyantî û Ewropa, di derawayeke reser de ne.

Eynî weke êmperatoriya Roma ku jevketina hundirîn bûye sedema hilweşîna wê ya bingeşîn, ev rastî ji îslamtiyê re jî, derbasdar e. Çawa ku çend hêrîşên barbar, ne sedemên hilweşîna êmperatoriya Roma bin, çend derbên moxolan jî, ne sedemên hilweşîna êmperatoriya êslamtiyê ne. Li hundir derûn qediya ye, nirxekî wê yê zêde ku bide jiyandin nemaye, ligel van, rêxistinên siyasî ku weke qaşûlê sazûmanê, çiqas ku diçe hişk dibe. Ev hemû, qedera Rojhilata Navîn a di qada şaristanî de, diyar dikin.

Dera ku sazûmanek, bi hîm lê bijî, bi awayekî hêsan rê nadi sazûmanên nû. Berhemên nû û pêşveçûyî, ne li erdên ku timî têne çandin, li axa destlênedayî digihîjin. Hemû şanîder nîşan didin ku şaristaniya Rojhilata Navîn, di nivê serdema navîn de, bi westandineke mezin, xwe xilas kiriye. Em çêtir têdigihîjin ku îslamî bi xwe jî, bi hêza xwîna teze ya qebîleyên çolê ku xwe ji şaristaniyê re vekirin, derketineke bizorê û ji zêdeyî ye. Nirxandina Hz Muhemed ya bi pêxembertiya dawî jî, bi hêza sazûmanê ya ku bi dawî bûyî ve girêdayî, dikare bête bi watekirin. Êslamî himêna şerîtiya dawî ya Rojhilata Navîn e. Ji kevneşopiya şaristaniya hezar salan, gotina "Ji min heta bi vir!" e. Vî dengî, hê di zayîne de, bi xiyaneta Emewî, temenkinbûna xwe nîşan da. Lêbelê dîsa, nîfşê şaristaniya mezin ê dawî jî, bandora xwe digihîne hezaran. Yên ku li dawî man, êdî bêxêrên ku nizanin bixwin, him ji derûna bîrdoziyî û him jî ji derfetên daringî sîd wernagirin, mîratexwerên rezîl in. Liser bîrdariyên bişeml, zirîna xwe ya keran jiyân dihesibînin, bi şeweya mirovan lê dehbeyên ji ajalên pêşdetir in. Pêvajoya jevketina Rojhilata Navîn a serdema navîn wihaye, êdî yê çawa ji şaristaniyê nû re, bingehiyê bike? Dayîka heftê salî, yê çawa zarokê bîne cîhanê?

Sazûmanên civakî yên mezin, bi pîrikatiya yên kevin, hê bêhtir liser axa destlênedayî dizin. Axa Rojhilata Navîn a dawî ku destlênedayî, Mekke û derdora wê ya li nivê çola Erebaştanê bû. Piştî ku bi îslamtiyê, zayîna dawî hate pêkanîn, jibo pêngava şaristaniyê, axa wê ya ku şaristaniyê derêxe holê nemabû. Ji Derya Spî heta bi Okyanûsa Mezin, hatibû kişandin. Li nava Efrîqa, gelekî zêde balav bûbû. Gihabû pesarên Sibîrya û li giravên Endonezya rawestiyabû. Awûstralya û parzemîna Emrîka, hê ne hatibûne dîtin. Hemû tîran, weke axa destlênedayî ya şaristaniyê, Ewropa nîşan didan.

Berî her tiştî Ewropa, ji BZ salên 5000an ve, bi nirxên neolîtîkê hatiye xweyîkirin. Ji BZ salên 2500an ve jî, şaristanî naskiriye. Şaristaniya Greko-Romen, li peravên Derya Spî, jibo ku jê re bibe dergûş, rewşa rûşeym (embrîyon) derandibû holê. Eslê wê şaristaniya Greko-Romen, weke zayîneke zûka ya şaristaniya Ewropa û zayîna zaroka dawî ya Rojhilata Navîn e. An jî weke berhema zewaceke qeranê bi temenê Rojhilata Navîn a bi keçika teze ya Ewropa re ye. Zarokên van ên ku yê çêbibin, yê Ewropa rastî amade bikin. Piştî ku xiristiyantiyê weke hêzeke Rojhilata Navîn, Ewropa ji barbariyê derand û biterbiye kir, jibo zayîna nû amade dike û dixwe rewşeke besbûnî. Piştî ku ji îslamtiyê jî zanînen dawî yên felesefeyê û zanistî hatin standin û hinekî di ser Spanya û Balkanan re tengesî lê hate kirin û rola pîrikatiyê hate leyzandin, êdî jibo zaroka şaristanî ya Ewropa nezê, ti sedemên din namînin. Lorîka bi navê Ewropa ya delal (Europa keça qeranê Fenîke Egonor e, mîtolojiya Grek dibêje ku keçeke saf û çeçleqî ye). Çîroka zayîne, bi beremberkirineke bi vî rengî û hatina wê ya ji binyateke wiha, birasteqînî ye. Çîrokên mîtolojîk, her dem weke vegotinên rastiyan ên pêşîn e, herwiha pêwîst e ti caran, ji ber çavan dîr neyên girtin.

Piştî ku me Ewropa di derawayê bûyerên dîrokî û civakî de nirxand, em dixwazin êdî taybetiyên nasnameya wê ya bîrdoziyî ku rê li ber zayîna wê vekirî bibînin:

1- Di zayîna şaristaniya kapîtalîst de, taybetiya herî berbiçav, Bîrûbaweriya bi zanîna zanist ve girêdayî ya di şeweya ramanê de ye. Di serdema kapîtalîst de, bîrûbaweriya mîtolojîk a serdema pêşî û şeweya ramana serdema navîn a bi giraniya ol, tèn derbaskirin. Şeweya ramana zanistî ku yê rê li ber şeweya ramana felsefeyên serdema pêşî û serdema navîn veke, di vê demê de giraniya xwe nîşan dide. Derûna vê şeweya ramanê ev e ku têkiliyên xweza û civakê ne bi destekariya hinekan ji derve, bi zagonên wan ên hundirîn, rave dike. Cudabûna di navbera wê û felsefeyê de ev e; felsefe digel ku hewl dide, bi têtîngên gelemperî hemû heyînan rave bike, zanistê di qada çêbûnên bisînor de, şeweyeke ravekirina ku bi kitekit û karibe bête ezmûnkirin, bingeh digire.

Digel ku taybetiyên wan ên li dij hev hene jî, di navbera pêşveçûna şeweya ramana wan de, girêdanên diyalektîkî hene. Di bîrûbaweriya Anîmîst de, hemû xweza bigiyane, giyana hemû tiştî heye. Di navbera bigiyan û bêgiyan, xweza û civakê û mirov û ajalan de, ji aliyê bigiyanîyê ve ti cudabûn nayên kirin. Vê şeweya ramanê rê li ber teknîka sêrebendiyê vekirîye. Tê gumankirin ku bi sêrebendiyê yê bikaribin bûyeran kontrol bikin û wan bînin derawayeke ku çawa dixwazin. Esasê wê di pratîka civakî de, hunera sêrebendiyê ku pêşbînî û hunerweriyê dixwaze, li rastî rêberîtiya civakî ya pêşî jî tê. Sêrebend ê ku herî pêşbîn û hunerwer e. Herwiha rêber e. Di mercên teng ên jiyânê de, yekî wiha ku ji nava civakê derdikeve, bi awayek derasayî tê pêşwazîkirin, giramgirî û baweriyeke mezin tê nîşandan. Lewra tevkarîyeke van a bi sînor jî, jîbo civakê tiştêkî jiyânî diyar dike. Civak him jî van dipelîkîne û him jî pêdiviya wan pê heye. Dema ku sêrebend vê rewşa civakê dibîne, xwe dixwe derawayeke taybet û bîrêxistin dike. Belkî jî rêxistina civakê ya herî pêşî, sêrebendî ye.

Navekî din ê sêrebendiyê şamanîzm e. Cudabûna di navbera wan de, şaman bi awayek tekûztir bi rêxistin bûne. Di hemû civakên dema paleolîtîk de, şeweya raman û sepîneke bi vî rengî xuya dike. Şeweya ramana dema neolîtîka ku pêşveçûneke civakî îfade dike, binyate olekî ku niv anîmîst û totemîk e. Qebîleya ku bingeha civakê, çêtir tê vawêrkirin (dîtin). Girîngbûna endamtiya qebîleyê, tê fêhmkirin. Di nava qebîleyê de, afirînêrî û rêberiya dayîkê dikeve pilana pêş. Hinek heyîn, ajala kedî û rîwek, ji hemû heyînen din bêhtir tene nasîn û pêdivî tene dîtin. Herwiha bêhtir girîngiyê didine giyana van heyînan. Vedana van mercan a li ser ramanê, şeweyeke ramanê wiha derdixwe holê: Di dema daykanî de, jin rola dayîka xwedawend dilîze, her qebîleyek weke nîşaneyekê, bi totemekî tê temsîlkirin, hemû rîwek dar, ajal û alavên girîng, heryekî bi xwedayekî tene temsîlkirin. Totem hê bêtir weke nîşaneyekê qebîleyêye ku wê îfade dike, weke xweda nayê dîtin. Weke nivxwedayekî ye. Lêbelê hemû temsîlên din tene xwedakirin. Li pêşiya tevan jî, dayîka xwedawend tê. Lewra damezrînera civaka nû ye, afirînêr, hêza zayok û parêzkera wê ye jî.

Civaka neolîtîk ewqasî bigiraniya jinê ye, mêr qet xûya nake û hatiye heşifandin. Eynî weke di roja me de, ku jinê hêza xwe wînda kiriye. Jin vê hêza xwe di gihandina rîwekan de, di kedîkirina ajalan de, di damazrandina malan de, di raçandin û hêrtinê de, di zayîna zarokê û mezinkirina wê de, nîşan dide. Ev bihêzbûna derasayî wisa li raman vedide ku îro jî hêmana mê ya di hemû zimanan de, xwedawendên zêde yên di mîtolojiyan de û giramgiriya ji dayîkê re, ji vê dema dîrokê tene. zimanê sumerî bi xwe jî, di destpêkê de, bi rewîşteke mê ye. Parêzkerên bajaran ên pêşî, xwedawend in. Peykerên pêşî hemû yên jina ne. Di têtîng û navan de, serdestiyeke jinê ya mezin heye. Parzemînen Asya û Ewropa jî di mîtolojiya Grek de, navê jina ne.

Di şeweya ramana neolîtîk de, bi hêmana mê ve girêdayî, Ligor pêdiviya civakê, bi rêzkirineke hemû tiştên ku tene xwedakirin, ramaneke mirov-xweda tê serdestkirin. Di hemû astan de, raman û baweriyeke bi dayîka xwedawend ve girêdayî, tê pêşvebirin. Yekem car dayîka xwedawend bi navê Sterk an Star li Heyva Berhamdar, bilindî ezmên dikin û nemir dibe.

Li nav Sumeriyên ku civaka biçîn dane destpêkirin, şeweya ramana bingehîn mîtolojî, ango sazûmaneke ku digihe efsane û vegotinan. Mîtolojî him di nava civakê de û him jî di xwezayê de, weke hêzeke herî pêdivî û girîng, çavkaniyên hilberîn û yên jiyânê bi rewşa cîhana xwedayan nîşan dide. Cûdahiya di navbera sazûmanên xwezayî û civakî de, tene fêhmkirin. Ligor çîncînîbûna di civakê de, cîhaneke xwedayan a ku kole û efendî nîşan dide, tê cêkirin. Ligor vê yekê, têtîngîneke gerdûnê ya mîtolojîk û bîrêkûpêk, serdest dibe. Belkî diyariya sumeriyana a herî mezin ku daye mirovatîyê ev e, nasnameyên sazûmanê li ezmên ku neyên guherandin çêkirine û weke raman û baweriyeke bingehîn serdestî bîrûbaweriya mirov kirine. Olên yek xweda jî di nav de, afirînêr û temsîlkarê şeweya ramana olî yê herî mezin, rahîbên sumer in. Mîtolojî, ol, pêxember û rahîbên vê dawiyê, tene ev nasnameyên afirandî cîgeyî kirine û veguherandine.

Di şeweya ramanê de, merhaleya dîrokî ya sêyemîn, şeweya felsefî ye. Felsefe di wateya hezkirina zanîne de, li rastî pêvajoya terîfkirina bûyerên xweza û civakê yên bi rasteqînî tê. Di pratîka civakê de, encex dema ku şeweya ramana mîtolojîk, weke wêjeyê bête nîrxandin, pêdivî bi şeweyên

ravekirineke rast çêdibe. Di BZ sed sala 6an de qenc tê fêmkirin ku hêza Zeûsan, weke ku tê gumankirin tine ye. Bi awayek cidî, ji xwedayan guman tê kirin. Ev rewş, demeke bîrûbaweriya wisaye ku pratîka hilberîneke pêşveçûyî û cudabûna di navbera kategoriyên bingeh, civak-xweza û bigiyan-bêgiyan de, xweş tê fêmkirin. Ravekirinên mîtolojîk jibo vê rewşa bîrûbaweriyê gelek pêkenok tên, herwiha şîrovekirinên nû û şeweyên ravekirinên nû xwe ferzdikin. Heyîna civakê ya tevlihev, zanînen ku di derbarê cîhanê de zêde bûne, bûyerên ku di derbarê wan de bi awayek pratîk, digihine agahiyên berbiçav, ravekirinên ku pêdivî bi xwedayên mîtolojîk nayîne, bi xwe re tîne. Şeweyeke ramana ku ol û xweda tevli kar neyên kirin, pêşvedîçe.

Ji vê pêşveçûna ku em dikarin bibêjin ramana laîk a pêşî re, ramana feylesofî tê gotin. Taybetiyên vê şeweya ramanê ev in ku weke xwediyê ramanê mirov dike bingeh, li derî perestgehê pêşdikeve, yekem car rê li ber rêxistinên akademî û lîse vedike. Bingeha dibistan û perwerdeya laîk, bi vî rengî tê avêtin. Lêbelê em nikarin bibêjin ku bi temamî ji mîtolojî û ol veqetiyaye.

Em dixwazin vê jî binin zimên: Cudabûna di navbera ol û mîtolojî de ev e ku ol. Bawerî û perestina bi zorê dide pêş, lêbelê di mîtolojiyê de zoreke wiha tine ye. Di felsefeyê de, ne baweriya bîzorê û ne jî şeweya efsaneyan, tine ne. Felsefe şeweyeke ramanê ye ku hinek taybetiyên ji dilîniyê wêdetir, bawerdêr û bi çespîn dikişîne bîrûbawerî û mantiqê mirov. Ewlekariya bi bîrûbaweriya mirov û qîmet pêdana mirov, derdixe pêş. Takekesîtî û humanîzm jî, bi ramana felsefeyê ve girêdayî ne. Herwiha felsefe, jibo şeweya ramana civaka kapîtalîst, dibe merceke herî girîng. Çiqas ku levdana di navbera ramana felsefeyê, ya ol û mîtolojiyê de, pêşvedîçe û ev levdan bi serkeftina felsefeyê bi encam dibe, rê li ber qevastina şeweya ramana zanist vedibe. Şeweya ramana zanist, liser şopa felsefeyê pêşvedîçe. Şeweya ramana felsefeyê, hê bêtir berhema jiyana bajarê pêşveçûyî ye. Ev ne rasthatiniyêke ku dera lê derketiyê holê, bajarên herî zindî ne. Bajarên serdema pêşî yên pêşketî, bûne navendên pêşveçûna şeweya ramana felsefeyê. Mîletos a ku weke cîhê felsefe lê çêbûyî tê zanîn, di dema xwe de, navenda jiyana bajêr a herî girîng e. Piştî vî bajarî re, Athene, Roma û Skenderiye derdikevine pêş.

Ev yek ne piçûk e ku felsefeyê rê li ber zanistê vekiriyê. Lêbelê ne rêyeke bi tenê ye. Rêya ku bêhtir hîkarîker, zanînen pratîk ên ku bi teknîkên hilberînê ve girêdayî, timî zêde dibin e. Pratîka hilberînê û jiyana bi xwe, bûyeran û têkiliyên di navbera wan de, dide nasîn û ber bi sazkirina girêdana sedem-encamê ve dibe. Teknîkên ku têne bikaranîn, timî vedîtina (kefş) taybetiyên xwezayî jî, zêde dike. Herwiha, mîtolojî û ramana olî ku di destpêkê de serdest bûn, bi rêya felsefê têne lawazkirin, zanista ku bi felsefeyê re di nava hev de timî pêşvedîçe, girîngiya xwe zêde dike. Sêbareya tez, antîtez, senteza ku li vê qadê tê sepandin, berwerî (leh) zanistê bi encam dibe. Teza yekemîn, mîtolojî û ramana ol e, antîtez felsefe ye. Têkoşîna di navbera wan de, bîrûbaweriya zanist diderîne holê. Dema ku em vê di nava demê de nîşan bidin, salên BZ 3000-500an, serdema ku mîtolojî û ol serdeste, salên di navbera BZ 500 û 1500an de, dema ku felsefe derketiyê holê û ketiyê pêş, salên 1500an û dû re, weke serdema ramana zanistî, dikare were nirxandin. Şerê mezin ê di bîrûbaweriya mirovatiyê de, bi serfiraziya ramana zanistî bi encam bûye.

Ji van herdu aliyan, danehevên zanîne ku ji felsefeyê û pratîkê hatine bidestxistin, PZ di sed sala 13an de, li Ewropa dema qewlê qubûnê dijî. Di vê sed salê de, zanîngêhên ku hatine damezrandin, ji bandora dogmayên olî fîlitîne û bi rêyeke ezmûnê pêngava pêşî diavêjin. Roger Bacon, di vê demê de, kêlikeke kilometre ye. Weke pêşevanê, serdema zanist a ezmûnî, rolê dileyîze. Ronesansa ku piştî sed sala 15an pêşveçûyî, hiş û giyana mirovan ji dogmayên olî rizgar dike, ber bi aliyê mirov û cîhanê de dike xêzkekê û herwiha rêya zanist, heta bi dawî vedibe. Di vê rêyê de, di serî de Gîordano Brûno û gelek şehîdên din jî hatin dayin. Lêbelê di heman demê de, ev şehîdbûn têne wateya serfiraziya ramana zanist. Mirovatî bi şeweyeke jiyane ya nû re, rûbirû ye. Ev gotineke teng e ku em bibêjine serdema zanist, şaristaniya kapîtalîst. Jixwe ev ne serdemeke ku civaka kapîtalîst, derandiye holê. Berevajî vê, bîrûbaweriya zanistî a ku serdestî qezenc kirî, rê li ber lezgînî û serdestiya şaristaniya kapîtalîst vedike. Ji aliyê bîrûbaweriya mirov ve, qezenckirina serdema zanistî ya di rêya dirêj a pêşveçûna civakî de, pêwîst e qezenceke girîng bête dîtin. Bi vê yekê, dema xwedayên ku zagonan ferman dikin û ya temsîlkerên wan ên li ser rûyê erdê tê girtin, serdema ku mirov bi xwe rêzikên rêvebiriyê çêdikin û disepînin ango serdema civakî vedibe. Di vî babetî de, destpêka serdema civaka zanistî, tê jiyandin.

Herçiqas ku bibêjine serdema me, serdema zanîne û ragihandinê jî, di rêxistinên siyasî û hemû rêxistinên seresazî û binesazî yên civakê de, zagon û têkiliyên koledarî yên ku ji serdema mîtolojiyê mane, di meriyetê de ne. Di dawiya dahûrandina me ya şaristaniya kapîtalîst de, emê baştir bibînin ku kevneşopiya civakî ya ku rêxistina dewletê navenda wê dagirkirî, ji pênc hezar salan ve ne hatiye guhertin û timî hatiye bihêzkerin. Ev birêxistinbûn, bi zanistiyê re di rewşa dijayetiye de ye. Dema

zanistî tê çekirin, bûyina wê ya hêmana bingehîn ku sazûmana civakî diyar bike, tê astengkirin. Ji ber vê yekê, nakokî di navbera dewleta ku di warê bîrdoziyî de (mîtolojî, ol, îdealîst felsefe) têkçûye, lê weke rêxistineke pêkutyê hebûna xwe didomîne û zanistiya ku civakê li ser bingehê zanistî rûnîne de, derbas dibe.

Serdema zanîne ya ku di roja îroyîn de, gelekî tê bikaranîn, hê dirûva xwe ya civakî ne afirandiye. Zanistî bi xwe jî, hebûneke ku timî pêşvedîçe ye. Digel vê yekê, sincê zanistiyê hê di asta hêman de jî, ne hatiye diyarkirin. Herwiha zanistiyeke bêkontrol, ne bê derfet e ku rejîmeke ji xwedayên mîtolojîk û temsîlkerên xwedayên ezmanan ên li ser rûyê erdê xetertir, derîne holê. Hatiye dîtin ku sazûmanên rêvebiriyê, ên ku ji sincê civakî yê bi zanistiyê ve girêdayî qût dibin, dikevin rewşeke otorîter û totalîter.

Ev encameke sereke ye ku zanistî, çavkaniyên hêza xwezayê pêşkêşî bikaranîna civakê dike. Ev yek diyar e ku civak, ji roja bûyî û heta îro, bê zanîn û zanistî nabe. Mirov dema ku kevir û çemikê pêşî bikaranî, giha zanistiyê. Rêzikeke fizîkê ku were plankirin û jibo bikaranîna hilberînê, were pêşêxistin, heger ku ne hatibe formulkirin jî, dide nîşandan ku zanistî hatiye çekirin. Divê ev bê gotin: Civak ji roja ku derketiye holê, bi hebûna zanistiyê re, di nava têkilî û nakokiyên de ye. Çiqas ku nakokiyên ji holê radike, têkilî vediguherine zanistiyê. Ev jî nîşan dide ku bi ronahîbûna di zanistiyê de, hebûneke domdar e. Pirsgirêk, asta qiyaskirina wê ya di pêvajoya serdeman de ye. Para zanistiyê çiqas zêde be, ronahîbûn jî ewqasî pêşvedîçe. Nîşandana wê hebûnê, weke pêşveçûneke dema civaka kapîtalîst, ne rast e. Tenê dikare bête behskirin ku para civaka kapîtalîst zêde bûye. Divê xweş bête zanîn ku şaristaniya kapîtalîst, tenê ne pêşveçûna zanistiyê, rê li ber bisînorkirina zanistiyê jî vekiriyê. Nakokiyên di sînga wê de, bikaranîna hemû hêza zanistiyê, asteng dike. Bi taybetî li hember civaknasiyê, di derawaya rejîma herî kevneperest de ye. Lêbelê di nava hemû şeweyên civakan, ên ku heta îro hatine pêkanîn de, bi zanistiyê re sazûmana ku herî bêhtir seresazî û binesaziyên xwe bihêz kirine, civaka kapîtalîst e. Ev taybetiya wê, rola demên Ronesans û ronahîbûnê ya di zayîna kapîtalîzmê de, nîşan dide. Civaka herî pêşveçûyî ye ku hêza xwe, ji pêşvebirin, bisazîkirin û birêvebirina zanistiyê werdigire. Ev ne rasthatiniyeke, civakên ku bi zanistî dibin, dikevine bandeveke herî bilind. Zanistî, tê wateya bihêzbûnê. Ya rastir, zanistî ronahîbûn e. Ronahîbûn çekirina karê baş e. Çêkirina karê baş, serfirazî ye, çekirina hilberîna zêde û hêja ye. Hilberîna zêde û hêja, ji aborî û heta bi siyasetê ya di her astê de, bihêzbûn û derbasbûyina derawaya pêşengiyê ye.

Di şewegirtina nasnameya bîrdoziyî ya şaristaniya kapîtalîst de, derketina pêş ya aliyê wê yê zanistî, dikare di vê çarçovê de bête terîfkirin. Ev hê jî derawaya xwe, ya bi têkilî û nakokiyên sift, didomîne. Ji nasnameyên bîrdoziyî yên din, ji ol û felsefeyê bi tevayî qut ne bûye, ne di behreya qutbûnê de ye. Feraseta (kapasîte) wê ya civakî, mehkûmî ol û felsefeya îdealîst dike.

Pirsa dawî û ya bi bingeh ev e: Zanistî bi serê xwe, dikare bibe hêzeke rizgarker? Dikare mirovê di xwezaya mirov de, bi tevayî ji holê rake? Ma zanistî her tişt e? Pirsra hîkarîkertir ev e: Mirovên pêşî, hê di detpêkê de ku ber bi ramana xwedê çûn, ya herî rast kirin? Ango, ma zanist xweda ye? Gihîştina zanistê, bi xwedabûnê re yek e? Di vî babetê de, baweriya "enelheq=ez xweda me" gihîştina derûna zanistê ya bi hêza pêhesiyê, ne dibe girêdana bi teolojiyê ve? Êslamtiya ku xweda weke her tiştî dizane îlan kirî, formula 'zanist=xweda' hê ji berê ve îlan nake? Hê gelek pirsên bi vî rengî, dikarin bêne gotin. Heger em hêza zanistê ya ku dike xweda, jibo berjewendiyên mirovatî yên hevpar, mafên wan û bingeh girtina ewlekariya wan, bi hêmana sincî ve, anga hêmana helwesta bingeh ve girênedin, em ji saziyên otorîter ên ji dema nemrûd û firewnan xetertir û ji jiyana koletiya mîna ya wê demê, rizgarnabin. Di sedsala 20an de, rola şerên bisaw ku zanist herî zêde li wan tê sepandin, derandiye holê ku ev xeterî rojane ye û di wesfê derandina qiyametê de ne. Dema ku temsîlkerê olên yek xweda, yên mîtolojiya koledar û feodal ê li ser rûyê erdê, yek bû û mirovatî hê jî ji serdestiya wan rizgar nebûye, gelo otorîtetî û totalîterîtiya mirovên bê hijmar ku zanist ê wan bike xweda, yê neyê wateya mehşerê?

2- Takekesîti, bingeha taybetiyên giyana sazûmanê, ya ku civaka kapîtalîst derandiye holê ye. Çawa ku zanist, rewşa bingeh a bîrûbaweriya wê civakê îfade dike, takekesîti jî, taybetiya giyaniya wê diderîne holê. Takekesîti, di zayîna kapîtalîzmê de, takeksê ji zincîrê filitiye ku ji berjewendiyên xwe pêde ne xwedî ti pîroziya ye, xwebûniya (kesayetî) wî, hêza sereke ya kaşker e. Weke hêzeke pêşdatirî zanistê jî, rola xwe dilîze.

Takekesê kapîtalîst, tevgera ku ji hebûna civakê tolê bigire ye. Bi taybetî di pêvajoya zayîne de, azweriya (ihtiras) takekesparêz, ti sînoran nasnake. Bi qutkirina ji girêdanên dema borî, bawerdike ku azad bûye. Hêza dirav, bi xwedê re wekhev digire. Ango formula dirav=xweda, herî bêhtir li civaka kapîtalîst tê. Dirav, îfadeya berbiçaviya giyana sazûmanê ye. Hêzeke bisêr e, ti nîrx tinene ku

lê neyê vegerandin. Di şeweyên civakên berê de, nîşaneyên wan totem, xweda û xweda-qeran bûn. Lêbelê di şewegirtina kapîtalîst de, hêza ku giyana takekesî dikişîne, dikare jibo wî her tiştî bike, dema pêdivî be bikişîne şerê ku mirovatîyê tine bike, dirav e. Nasnameyeke giyan ku li dora dirav şewe digire, derbasdar e. Bi coşbûna takekesîtiya evqasî, ji bizivîna li hember civakîbûna sedhezâr salan tê. Hemû sazûmanên berê, civakîtî ligor berjewendiyên xwe pêşvedibirin. Divê bila eşkere, divê bila veşartî be, divê bila bidaxwaz, divê bila bizorê be, civakîkirin çalakiya pîroz a herî jêneger e. Pêwîst e hemû ol, sinc, hilberîn û siyaset, bi vê armancê ve were girêdan. Her kevneşopî û herkes, bangeşekerên (bangeşe=propaganda) vê rêzîkê ne. Dema ku hate merhaleya kapîtalîst, civakîkirina bi barê zêde, bi takekesîtiyê tê teqandin û gihîştina hêzeke bêhempa (perçebûna atomê), weke ku hatibe vedîtin. Bi bombeya takekesîtiyê, ku civak ji derên nazik bête teqandin, rê li ber mewdaneke (serwet) girsehêz vedike. Dema ku ezmûnên pêşî, encamên serfiraz bidin, tişta li dawî dimîne, sazûmankirin e. Dergehê takekes, êdî ne perestgeh e. Rudên ber bi xwedê nayên wergerandin. Gunehkarî, ji holê hatiye rakirin. Kabeya nû karxane ye, xwedayê nû dirav e, tişta pîroz berjewendiya takasî ye. Gunehkarî, li pêşiya kardariyê (biqezenciye) asteng e.

Helbet, kapîtalîzm li vir bi tevayî ne bêmaf e. Bi sedhezâr salan, takekes ji civakê re hate qurbankirin. Birastî jî gelek olan, hebûnên xwe yên herî hêja zarokên xwe, çavneşikandî ji xwedayên xwe re, kirine qurban. Di wijdanê civakê yê reş de, bi navê ol, rê wiha vebû. Bi pêşkêşkirina qurbanên bêsinor, ji takekes tol hate girtin. Di vî babetî de, dîroka civakê jibo rizgarkirina civakê, wergeriya dîroka qurbankirina takekes. Hemû şer, perestî û merasîm, jibo vê hatine kirin. Li vir tişta ku li ser navê civakîtiyê hatiye kirin, digihe asta şetiyê. Binpêkirina rêzikeke herî piçûk, heger ji daxwazeke bêguneh û bimaf jî hatibe, dikare weke gunehkî herî mezin bête îlankirin. Weke ku dojekirina ser rûyê erdê ne besbe, li ser navê cîhanê din jî, bi dojeheke din, pêvajoya ezab tê domdarkirin. Dîlkirina takekes ewqasî pêşve hatiye birin ku li sîya xwe jî, xwedî dernakeve û ketiye derawaya siya siyê. Bi navê civakîtiyê, takekes kirine vê rewşê.

Di vê xalê de, pêvajoya nasnameya bîrdoziyî, ya ku rê li ber kapîtalîzmê vekirî, bi takekesîtiyê, xala herî girîng zeftkiriye. Belkî jî, hay jê heye ku bi derêxistina takekes a li pêş, ê terazeke takekes û civakê ya bi dad damezrîne. Diyar e ku ev pêvajo, hêz û bimafiya xwe, ji vê daneheva dîrokî digire. Civaka kevneperest û paşverû ya ku li dij takekes hatî werimandin, bi qedexeyan hatî fetisandin, ji mêjîn heta bi abadîn mehkûmî jiyaneke robotkirî bûbe, hay jê heye ku çiqas were jevketin, ewqasî yê rola şoreşgerî û azadkerî bilîze. Derawaya pêşverû û bimaf a di dîrokê de, wiha derdikeve holê. Hebûna civakî ya ku di damezrandinê de, hêzeke xwedayî ya kesnedîtî, derandiye holê, niha jî berevajî vê, hêza takekeskirinê derdixê holê. Takekes bi xwe, ber bi xwedabûnê dibeze. Di vê dema dîrokê de, derfetên teraza takekes û civakê ya bimaf û pêwîst, derdikevine holê. Şayîşeke (endîşe, fikar) kapîtalîzmê ya bi vî rengî, bi taybetî di dema zayînê de, gelekî bisinor e. Herî bêhtir, di merhaleya bizava sosyalîzmê de, yê li ser teraza tekekes û civakê, bête rawestandî. Lêbelê jibo gihîştina vê jî, ev mîsoger e ku pêwîstî bi derketinên takekesiyake bihêz heye. Şoreşa takekesî, weke berhema vê pêwîstiya dîrokî, derdikeve holê.

Çiqas ku takekes, zincîra koletiyê diqetîne, haya wî ji jiyaneke derasayî çêdibe. Cîhan bi xwe dibe bihişt. Daxwazên ku weke gunehkar hatine îlankirin, vediguherînine şeweyên jiyanê yên herî rind. Laîkbûneke girsehêz destpêdike. Ædî hay jê hene ku bi huner, jiyana tê rindkirin. Êlhamgirtina ji berhemên bi şeml ên hunera serdema pêşî, zayîna nû, Ronensansê gengaz dike. Bi wêrekiya ku zanist dide, bêyî tîrsa serdestiya dogmayan, cîhana ku bi huner tê rindkirin, û hezkirin, hêzeke mezin dide takekesbûnê. Takekesbûn jî, ber bi ramana azad, jiyana ligor kêfa xwe û wêrek, ber bi hezkirin û evînê dibe. Gihîştina têgîna welat, bûyina dewleteke netewî ku ji têgîhîna ometê derbasî têgîhîna netewî bûbe, cîhanîbûn, dewlemendbûn, li vê cîhanê girêdana bi jiyanê ve, nirxdayina hemû hunerên ku rind dikin, pêşdatiriyên Ronensansê, yên nasnameya bîrdoziyî ya nû ne. Qutbûna ji kevin wisa bi hîme û girêdana bi şeweya jiyana afirînê a nû ve, ewqasî bihêz e ku li hember vê yekê ti tîkilî û sazî, nikarin bibine asteng.

3- Di nasnameya bîrdoziyî ya şaristaniya kapîtalîst de, nirxdayina bi mirov, derxistina mirov a pêş, ango hêmana humanîzmê, taybetiya girîng a sêyemîn e. Di hemû şewegirtinên civakî yên berê de, mirov hatiye daqûrtandin. Di nava civakê de hatiye helandin, ji bilî tişta ku deynin ber çêbike û wêdetir, ti rola wî ya din tine. Girîngî û mezinayiyê hemûyî didine yê xwedayî. Li dij mirovê ku herî tê bilindkirin, ji bilî maskeyek an jî sêwiraneke nasnameyê ku ne titiştî din, totem û xweda ne. Bi van çalakiyên bîrdoziyî, eslê wê dixwazin ku civakê domdar û bihêz bikin. Lêbelê ev ne bi pêşvebirina têgîna mirov, bi afirandin û bilindkirina hayînên ku qedera wî diyar bikin, bi nasnameyeke bîrdoziyî ya sexte, tê çekirin.

Di merhaleya civaka biçîn de, mirov hê jî tê nizmkin, di kesayetiya Adem û Hawa de, tawanbar tê îlankirin û abadîn mehkûmî nasnameyeke bi şeweya beniyên xwedayan dikan. Sucên wî timî tene zêdekirin û li hember vê, tenê rizgarbûna bi suxrevaniyê datînine ber. Daxistina mirov a timî, jî du aliyan ve tê pêşvebirin: Li ser navê heyînên neberbiçav, li hember civakê tê daxistin. Herwiha ti îdia û girîngiya wî namîne. Her tişt jibo mayîndetiya (beka) civakê ye. Ti nirx tinene ku jibo civakê neyên fedakirin. Ligor ku yê civakî dibe mirov e, di serî de yê ew were fedakirin. Aliyê duyemîn ê girîng, li hemberî rastiya çîna serdest, jibo ku îdiaya xwe bi tamamî winda bike, mirov negirîng, xwedî sûtê giran, encex layîqî suxrevaniyê tê dîtin. Herwiha li cem çîna efendiyan ku weke xwedê hatine mezinkirin û bi vê yekê jî mirovatî hatine derandin, mirov dibin weke ajalên bixwedî ku timî werin xebitandin, ango sazûmana benî û koleyan tê damezrandin. Ev nêzîkbûnên ku li dij heyîna mirov, di pêvajoya hemû serdeman de, hatine pêşvebirin.

Di olên yekxweda de, di pêvajoya ku civaka neolîtîk li hember koletiyê li ber xwe dida, heger bisînor be jî, rûmet û wijdanê mirov tê parastin. Têgîneke mirovatiyê ku pêwîst e bête rizgarkirin, çêdikan. Yekem car bi navê rûmet û wijdan, serî tê hildan. Şoreşa sinc a Zerdeşt, nûsaziya Bûdha a ku dişibe, felsefeya Grek a ku mirov derdixê pêş, pêngavên din ên girîng in. Ji mirovê ku êş û azarê pê didin kişandin, wî didine jibîrkirin û yê xwedî ked, haydar dibin. Evqas xwedîbûna li êsa, jî ber pêşveçûnên bi vî rengî ne û jiberku vê yekê zemînek bi destxistiye. Bê cudahî, jibo hemû mirovatiyê, weke bangeke rizgarker tê dîtin. Hz Muhemed, mirov weke "eşrefî mehlûqat" ango aferîdê herî bi şeref, îlan dike û gaveke din pêştir ve dibe. Di pejirandina îslamtiyê de, ev nirxên ku bi mirov tê dayîn, rolê dilîze.

Digel van pêngavên dîrokî, mirovê ku bi koletî û serfityê hatiye nizmkin, bi tamamî jî bidestxistina girîngiyê navendî dîr e. Jin hê jî di kûrahiyê de ye, kirine xwedî nasnameyeke kêr, bêaqil weke xizmên şeytên ku timî mirov vexwendî gunehan dike, wisa bi qedera xwe razî, li hêlekê rawestiya ye. Digel ku mirovatî hinekî tê pêşvebirin jî, ew jî mirov nayê hesibandin. Tebeqeya serdest û mijok, bi navên xwedayî tene binavkirin û jî nijada mirov ku hatiye nizmkin cudatir, weke hebûneke din tene nîşandan, di vî derbarî de, nasnameyên bîrdoziyî weke karekî herî girîng, tene pêşvebirin, Qîmetê ku şaristaniya dema borî bi mirov daye û rastiya wê ev e.

Di zayîna serdema kapîtalîzmê de, bûyera sêyemîn a herî girîng ku tola wê tê girtin, ev rewşa mirov e ku êxistinê û ev yek di cîh de ye. Bi bilindkirina mirovatiyê, ango bi humanîzmê, jî civak û çîna serdest ên kevin, tol tê girtin. Humanîzm, li hember domkerên civaka kevin, çeka têkoşînê ya herî hîkarîker e. Mirov bi ramana humanîzmê, yê derfetê bibîne ku rabe ji piya, azad bibe, bigihe zanist û rûmetê. Humanîzm têgîneke nasnameya bîrdoziyî ya nû ya bingehîn e.

Li navenda nasnameya bîrdoziyî ya civaka kevin, xweda hatiye danîn. Bi vê yekê, serdestiya bîrdoziyî ya çîna serdest û mijok, bi awayek tekûz tê pêkanîn. Hêza zagonên xwedayan, weke senaryoyên ku rê jî zagondanîna serdestan re veke, rolê dibînin. Pêşdaraziyên ku weke zagonên xwedayî tene bilêvkirin, rêbazên herî bi bandor in ku hişmendiyê dîl digirin û çawa bixwazin didine xebitandin. Siya viyanên biyanî, jî ser mirovatiyê kêr nabe. Dîlîtiya bîrdoziyî, rajêriya (bindestî) herî xeter e ku mirovê bêviyan û robotbûyî diderîne holê.

Humanîzma nû, mirov jî serdestiya vaqas siyan rizgar dike. Afirandina mirovê herî baş, erka bîrdoziyî ya bingehîn e. Erkên bîrdoziyî yên kevin hemû, afirandina heyînên li derî mirov ên weke xweda, totem, qehreman, cin, şeytan û firîşte ne. Erka bingeh a van heyînan jî, bê bandorkirina mirov e. Ev weke amûrên serdestiya bîrdoziyî, di mêjiyê mirov de, bandora koledariyê çêdikan. Di humanîzmê de, ev hemû heyînan çêkirî, tene înkarkirin û weke nirxên herî bilind, mirov û taybetmendiyên wî tene danîn. Yekem car bi awayek wergirî, nêrîneke bi çavê mirovê azad ku civaka nû dike bin bandora xwe, serdest dibe. Mirov jî bilî ku ji dogma û xwedayan re bibe dîl û benî, êdî jî wan tê qutkirin, dibe xwedî nasnameyeke ku bi viyana xwe, xwe perwerde bike û biafirîne. Şeweya ramanê nû ku di hiş de serbixwe û ji ramanan re vekirî, serdest dibe. Bi pêhisiyên xwe, reng, deng, çêj û germiya ku bixwaze hildibijêre û rê li ber nîgaşeke cîhanê ya bi wateya hîkarîker vedike. Cîhana ku serdestan li ber mirovan girtî, bi hemû şemla xwe jî nû ve dihile. Hemû aliyên xwezayê bisêrin (efsûndar) û li benda vedîtinê ne. Afirînêriyê jî karê xwedê derdixê û dike taybetiyêke mirov. Ædî dikevîne demeke ku mirov bi xwe, qedera xwe diyar bike. Mirovê ku bi sedhezêrê salan, jibo berjewendiyên kesên din hatiye beralîkirin, êdî digihe tekûziyêke ku dixwaze xwe bi xwe bi rêvebibe. Maskeyên beraliyî mirovan, yek bi yek diqetin, lîstikên li dij wan xirabdibin û rê li ber dema ku bibine efendiyan xwe, vedibe. Ev taybetiyên ku hê jî em dikarin bikine rêz, şoreşêke humanîst a wergirî îfade dikan. Şoreşên heta niha timî, jî sazûmanêke serdestî û bindestiya mirovatî, dibirin û dikişandine ber bi sazûmanêke din a serdestî û bindestî. Şoreşa nû, mirov jî hemû bindestiyan rizgar dike û wan dixê pêvajoya ku xwe bi xwe ve girêdayî bin.

Di rewşa mirovatiya nû de, dîsa teraz dikeve rewşa pirsgirêkeke girîng. Mirovê ku hemû bendên xwe qetandibin, ma nabe ajal? Bê terazbûn û zêdekariya civakî ya ku mirov dike mirov, rê li ber koletiyeyeke ji ajalî xirabtir vedike, takekesê ku di nava civakê de bihêz bûyî û niha jê vediqete, ma ji cinawirêkî dirinde, xetertir nabe? Mirovê ku bi zanist û dirav hatî bihêzkerin û mirovê ku cîhanê weke qadeke xenîmetê dibîne, ma ji mirovê ku civakê ew bindest kiriye, bêhtir bifikare nabe? Ev pirsên wiha ne vala ne. Di serdema takekesîtiyê de, li hember mirovan, liser navê mirovatiyê, komkujiyên mezin ên bi tevayî, qirkirin û jenosîd hatine meşandin. Di serdema herî bi xwîn a dîrokê de, çêbûna du şerên cîhanê yên mezin û gelekên herêmî, cîgeyî, çûnî, etnik û olî, dide nîşandan ku ev xeterî ne bedguman ên (waswase) vala ne. Mirovê ku ajalê di nava xwe de, bi awayek bihêz hişyar kiriye, bi lewitandina dora xwe, dawiyê li xwe tîne, bi sazûmaneke bêsinç ku perestiyê ji borsa yê re dike re, rûburû ye.

Dema ku nasnameya bîrdoziya kapîtalîzmê û binyata sincê wê, şêwe digire, bi rastî jî aliyê wê yê zanist bi giranî ye. Digel ku takekes bingeş digire û mirovatiyê bilind dike jî, rewîşteke ku hemû xeteriyên bi xwe re tîne, hê di zayîna wê de, xwe nîşan dide.

Di zayîna şaristaniya kapîtalîst de, Ewropa ku dergûşiyê jê re dike, pêwîstiyê bi dahûrandineke nêzîktir dike. Digel ku vegotina heta niha çarçovê dide jî, pêşveçûna ku derûna wê diderîne holê, daneheva dîrokî, mercên erdnîgarî yên bikêrhatî û heyîna wê ku di civaka bi çîn de kûr ne bûyî, rola diyarker dilîze. Di civakên ku ji pêvajoyeke dîrokê ya dirêj ve, şaristaniyên kevin dijîn, şeweyên nû encex bi destekariya ji derve pêşvedicin. Xûnifandina şeweya nû ya ji berxweve ne hêsan e. Heyîna ax û avhewayê jî, di şewegirtina nû de, dibine hêmanên bibandor.

Dema ji vê çarçovê bête nêrîn, hemû danehevên dîrokê, di salên PZ 1000an de, gihane Ewropa, ji şoreşa çandinî heta bi şoreşa bajêr a koledar, ji vir jî heta bi hemû qezencên şaristaniya feodal, çî tiştê ku hatiyê bidestxistin, kişandine Ewropa. Kişandin, hemû pêşveçûnên bîrdoziyî, zanistî û teknîk digire nava xwe. Nirxên şaristaniya îslamî ku bandeva şaristaniyê ya dawî ne, heta bi sedsala 15an, ji derve anîne. Dîsa ji Çîn a ku barûd, kaxez û çapxane ji mêj ve dahênandine, di derbarê van de zanîn û kerese têne standin. Derfetên bazirganiya ku zêde bûyî, Ewropa digihîne berhemên li çar aliyê cîhanê. Liavhewayeke bikêrhatî û axeke berhemdar, ev zanîn û berhem, rê li ber berhema zêdek a bê hempa vedikin. Pêşveçûna berhema zêdek, xebatên pîşeyî, bazirganî, zanist û felsefî, ji zêdebûna pêdivî zêdetir didin. Xwendewar zêde dibin û dibine xwedî nifûseke ku herî perwerdebûyî.

Bûyereke bi bingeş ya di bin van pêşveçûnan de ev e ku li Ewropa civaka biçîn, bikurayî ne hatiye jiyandin. Sazûmana koletî, ji nîvgiravên Grek û êtalya wêdetir, zêde neçûye. Encex li hinek çaryanan, mîna mêtîngehan pêşveçûye. Şaristaniya feodal hê bêtir nû ye. Encex PZ di serê salên 1000an de, li tevaya Ewropa belav bûye. Ev dem di heman katê de, gihîştina çîna bûrjûwa ya li bajaran e. Ya girîngtir ev e ku şaristaniyên neolîtîk, koletî û feodal, ji koka Rojhilata Navîn in û bi hînardekirina (îxracat) wan, ne bikêrhatîne ku bibin kokên zêde. Eşîrên Germen, Frank û Norman ku di merhaleya barbariyê ya herî bilind de dijîn, li hember van sazûmanan bibizav in. Azadiya xwe bikurayî ji dest bernedane. Ew jî weke xaka Ewropa, di warê çînçînîbûnê de, demeke destlênadayî yê dijîn.

Dema ku ev tezebûn û qutnebûna wan a ji azadiyê, bi danehevên şaristaniyê yên amade re dibine yek, li xaka Ewropa li ser navê mirovatiyê, dikare rê li ber senteza herî mezin veke. Esasê wê ev tez û antîtezên ku şaristaniya Ewropa derandine holê, di bîrûbaweriya mirov a ku gihaye asta xûnifandineke baş de, rê li ber sentezeke pêşveçûyî vedike. Weke ku hemû kerese amade bin û tenê bimîne çêkirina aşûre yê. Rewşenbîr, hunermend û bawermendên ol ên Ewropa, di sedsala 15an de Ronensan, di sedsala 16an de nûsaziyên di warê ol de û di sedsala 17an de jî, di felsefeyê û zanist de, tevgerên mezin ên ronahîbûnê didine destpêkirin. Herwiha di dîrokê de, bi serdema şaristaniya sêyemîn a mezin, dexma xwe li afirandina şaristaniya Ewropa dixin.

Di mînaka Ewropa de jî tê çespanandin ku her şaristanî, berî hertiştî, şoreşeke bîrûbawerî û giyan pêwîst dike. Bazirganî û hunerên bi serê xwe, şaristaniyê dernayînin holê. Bêyî wan jî çênabe, lêbelê zayîn, divê ku herî pêşî di warê bîrûbawerî û giyanî de xwe bide çespanandin, êdî piştê bi heyînen aborî û civakî yên ku hêzê didinê re, bi şoreşeke siyasî û lezginî pêktînin. Ev jî pêşveçûneke rast a heyîna diyalektîkê nîşan didin û diçespînin.

B- Pêşveçûn û sazûmana şaristaniya kapîtalîst

Derûna sazûmana kapîtalîst ev e ku xwediyên kedê yên ku serbest mayin, di bergîdana miz (ucuret) a ku berî tê diyarkirin de, di nava saetên diyar de, têne xebitandin. Di sazûmana koletiyê de, takekesê kole bi hemû tiştê xwe ve, heta ku bimire jî, yê xwediyê xwe ye. Xwediyê koleyan, bi xwaze

yê wî bifiroşe, yê bide xebitandin, heta dikare bikuje jî. Cudabûna kole ya ji ajalekî tine. Sazûmana serfîtiyê ev e ku serf mîna hevparekî axê, bi axê ve tê girêdan. Bi xwediyê axê re, bi pareke diyar, dibe hevpar. Di derawayeke nîv azad de ye. Dikare bibe xwedî malbat. Lêbelê qutbûna wî ya ji axê gelekî bisînor e. Di kapîtalîzmê de weke takekes, bi ti kesan ve ne girêdayî ye. Dilê wî kê bixwaze, dikare keda xwe di bergîdana mizeke diyar de, bifiroşe wan. Serfîtî, ligor têkiliyên xwe, pêngavekê bêhtir azad bûye.

Mijara duyem a ku di pêşveçûna sazûmanê de diyarker, rewîştî hilberînê ya pîşesaziyî (endustrîti) ye. Hilberîna karxaneyê bingeh e. Pêşveçûnê kapîtalîzmê ya herî girîng, derbasbûyîna ji manîfakturê ya karxanê ye. Hilberîna manîfakturîtiyê, bi giranî dezgehên ku ji dema neolîtîkê tîne û bêhtir bi hêza çeng tîne bikaranîn in. Karxane bi xwe, taybetmendiyê kapîtalîzmê ya hilberînê ye. Bi bingehê teknîk u xebata pêvrayî ve girêdayî ye.

Hêmana sêyemîn a bingeh ku kapîtalîzmê diyar dike, heyîna teknîk a ku pêve girêdayî ye. Li qasî ku teknîk, di pêşveçûna şeweya hilberîna kapîtalîst de, rolê dileyîze, ewqasî jî ji wê bandor digire û xwe pêşvedibe. Em bi berfirehî liser mijara teknîkê rawestî, yê baştir be. Em dikarin têkiliya mirov a pêşî ku bi xwezayê re danî, weke teknîk binavbikin. Çemik û kevirê herî pêşî, bikaranîna teknîka pêşî ye. Mirov bêhtir bi vî aliyê xwe, ji ajalan tê veqetandin. Aliyê mirov ê girîng ev e ku teknîk kiriye navbera xwe û xwezayê û dest bi fethandinên mezîni kiriye. Bûyera ku li hember xwezayê, hêzeke bêsinor daye mirov, teknîka ku bikartîne ye. Mijara ku mirovan çima teknîk bikaraniye, hê jî ne hatiye dahûrandin. Ji ber girîngiya xwe, di diyarkirina serdemên mirovatiyê de, hêmanên teknîk ên bingehî, rola sereke dileyîzin. Serdema paleolîtîk, bi kevirên ne nicirandî ku weke çekên nêçîrê û amûrên parastîne bikaranîne, tê naskirin. Mirovatiyê, ji dema ku çêbûyî ve, jiyana xwe ji sedî nodûhêşt di vî serdemê de borandîye. Ev dema ku danehev û nêçîr bingeh bû, kevir weke teknîka herî girîng di suxreya mirovan de ye.

Serdema duyemîn a girîng dema neolîtîk, bi kevirên nicirandî, tê nasîn. Kevirên ku bi şeweyên cihêreng hatine nicirandin, di gelek qadan de tîne bikaranîn. Bi vî teknîkê derbasî şoreşa çandinî û kedîkirinê dibin. Kevirê nicirandî di xepartina axê de, li hember ajalên dirinde, di bikaranîna mîna çekê de, di avakirina malan de û di birrîn û qûlîkirinê de, weke teknîka herî bingeh rolê dileyîze. Di destpêka sazûmana koledar de, kevrê şîn, amûrên ku ji madena tûnc a ku ji tîkeliya pîl û sifir dertê holê, di hilberînê, bazirganî û şeran de, rola herî girîng dilîze. Tûnc amûra herî teknîk e ku dibe amûrên tûj, weke gêsî û bivîr tîne bikaranîn, dibe firaq û amûrên çekan. Herwiha navê vî serdemê, serdema tûnc e. Serdema neolîtîk, dema navbera BZ 10 000 û 3000an digire nav xwe. Serdema tuncê jî, ji BZ salên 3000an heta 1000an didomîne. Serdema hesin, dema ku amûrên hesin tîne bikaranîn û serdemeke pêşveçûyîtir, nîşan dide. Amûrên teknîk ku ji hesin hatin çêkirin, di çandinî, pîşe û leşkeriyê de, rola herî mezîni dileyîze. Ji BZ salên 1000an, heta bi dema me, girîngiya xwe parastîye û rola xwe ya teknîk a sereke, domandiye. Di pêşveçûna kapîtalîzmê de jî, yê girîngiya xwe bidomîne. Dezgehê hesin, gêsîne hesin û zirxên hesin, teknîk û alîkarên pîşekar, cotar û leşkeran e. Digel ku ligor serdema wiha tê diyarkirin, teknîkê ji destpêkê û heta weke roja me, weke rîsteke geometrîk pêşveçûna xwe domandiye û bi teknolojiya atom û fezayê, gihaye bandevê. Di sazûmana kapîtalîst de, di wesfên teknîkê de jî, şoreş tîne jiyandin. Bi taybetî teknîka makîne, bi kapîtalîzmê ve girêdayî, ketiye dewrê. Pêvajoya ku bi makîneyên lokomotîf û yên hilmê (dûkel), destpêkirî, rê li ber serdemeke teknîkê vedike. Liqasî ku di şoreşa teknîkê de, şeweya hilberînê diyarker e, ewqasî jî, rola şoreşa zanîst diyarker e. Zanîst û teknîka ku bi awayek serbixwe, hatin heta bi vî demê, êdî di nava hev de, pêşvedicin. Yek ê ya din xweyî bike. Weke ku zanîst rê li ber gelek teknîkên nû vedike, teknîk jî, jibo gelek bûyinên zanîst, dibe çavkaniya îlhamê. Şoreşa kapîtalîst ku şoreşêke teknîkê ye, bi navbera ku zanîstê derbaskirî ve tîkildar e. Cara yekem ku zanîst û teknîkê di nava hev de hev û din xweyîkir, rê li ber hilberîneke mezîni vedike, gelek rezervên xwezayî, ji suxreya mirovan re vedibin. Li gel enerjîya av û bayê, enerjîya elektrîk û ya dendîka atomê jî derandiye holê. Bi teknolojiya dawî destkariyê li cîhana giyandaran dike û hewl dide ku mucîzeyan pêkîne.

Rexneya ku mirov dikare li teknîkê bike, derketina wê ya ji kontrolê û xeteriya ku veguhere rewşa cinawirê ye. Hê jî niha ve, jiyana mirov ku bi teknîkê ve girêdayî, di bin gefa gelek nexweşîyan de ye, mirov bi tînekirina taybetiyên xwezaya wî re, rûbirû dihêle. Liqasî takekesiyê, aliyê wê ku gefan li jiyana mirov dike, timî pêşvedice. Liqasî mirovê takekesî, kontrolkirina aliyên teknîkê yên xeter û jibo vî yeke jî bi sînorkirineke sincî, pêdivî ye.

Bi kinayî em bibêjin, şeweya hilberîna kapîtalîst, bi teknîka makîne re, di dîroka hilberînê de, rê li ber pêşveçûnên mezîni vedike. Şaristaniya kapîtalîst, liqasî nasnameya bîrdoziyî, bi hilberîna xwe jî, derketiye bandevê. Êdî ne hilberîn, berxwarin dibe pîrsgirêk. Di civakên ku kapîtalîzm serdest de, hilberîna zêde, pîrsgirêkên cidî derdixê holê. Dema kevin, pîrsgirêk ji hilberîna gelek derdiketin,

lêbelê niha ji kêmayiya berxwarinê derdikevin. Jibo hilberînê, zêdebûna derfetên daringa xam, pêşveçûna sazûmanên bazarên derve bi xwe re tîne. Hilberîna erzan jî di van bûyeran de, xwedî rol e. Digel ku kapîtalîzmê, derfetên gihîştina çavkaniyên hilberînê dane jî, sazûmana ku bi mijokatiya bi şeweya kar ve girêdayî, vê potansiyalê vala derdixe. Herwiha têkiliyên hilberînê, dikevîne derawaya bisînorkirina hêzên hilberînê. Şeweya xwedaniya li ser teknîkê, zorê li hilberîna bi karê gelekî zêde dike. Dema ku pêdiviyên mirov yên mecbûrî, berevajî zagonên karê zêde dibin, wê gavê terk dikin û derbasî qadên karê zêde dibin. Careke din mirov rûbirû dimîne ku behreyên xwe ne jibo suxreyên xwe, Ligor kêfa xwediyên kar, diyar bike.

Digel vê neyîniya wê jî, sazûmana hilberîna kapîtalîst, bi çespondineke mezin, li bandeva dîroka mirovatîyê rûdine. Dema ku aliyê wê yê bîrûbaweriya zanistî, giyana takekesî ya afirînê û mirovatî û aliyê wê yê ku di warê hilberînê de xwe daye çespondin, têne cem hev, serdestiya civaka kapîtalîst bènîqaş e. Nasnameya wê ya bîrdoziyî û weke şeweya hilberînê, nasnameya wê ya daringî, gelekî li pêşiya wan sazûmanên berê ye.

Têkiliyên sift ên bîrdoziya zayî û hilberînê, di warê civakî û siyasî de, rê li ber serûbinîbûnên mezin vedikin û rêxistinên siyasî û civakî yên Ligor derawaya xwe diderînine holê. Digel ku bi zêdekarî statuya civakî û siyasî bi peresîn tê diyarkirin jî, dema ku statuya kevin helwestên hişk û kevneperest nîşan bide, dikare bi çalakiyên şoreşgerî were perçekirin. Dema ku statuyên kevin, peresîn û nûsazîbûnê ne pejrînin, pêvajoyên şoreşa civakî û siyasî, yê bêhtir werin rojevê. Di van rewşan de, qeyrana civakî hê bêhtir kûr dibe. Dema ku bîrdozî û rêxistinên kevin têt nekin, bîrdozî û rêxistinên nû jî statuyê qezenc nekin, ev qeyran dibe merhaleya derbasbûyî. Şerê di navbera kevin û nû yê di her astê de, îfade dike. Ji aliyekî ve ya kevin rê li ber rizîbûnê vedike, ji aliyê din ve ya nû dixwaze ku weke şitlekê bigihîje. Dem dikeve rewşeke pozberîtiya şoreş û şoreşa li dij. Şoreşa li dij, rejîmeke hişk disepîne, lê dema ku şoreş bi ser bikeve, sazûmana nû bi awayek lezgînî şewe digire. Di şewegirtin û naveroka rêxistinan de, di warê lihevkerîna şeweya daringî de, guherînan nû yên ku bikaribin suxreyan çêtir bikin, çêdibin. Pêşnûmayên bîrdoziyî, bi sazîbûnê statuyeyeke fermî bidestdixin. Şeweya hilberînê, bi saya biryar û hêza rêvebirina rêxistinên nû, bilezgînî digihe derawayeke berhemdar.

Li vir bêhtir tê fêhmkirin ku rêxistinbûnên civakî û siyasî yên bi serê xwe ti wateyê îfade nekin, ji ser ve bandora biber a nasnameya bîrdozî û ji bin ve jî, mercên aborî ku zorê didin, hebûneke nû ango dewletê derdixîne holê. Dewlet bi serê xwe amûreke nêtare (notr, bêalî), Di bin bandora nasnameya bîrdoziya ser û hêza aboriya bin de ye. Hêza aborî û civakî, bi nasnameya bîrdoziyî ya ku ligor tekiliyên berjewendiyên xwe dibîne re, yekîtiyê çêdike û şeweya dewleta nû derdixin holê. Heyînen ya kevin hildiweşînin û li şûna wê, rêxistinên bi şeweya nû avadikin. Di vê rewşê de, bingeha çînî û civakî ya dewleta ku nû şewe digire û îfadeya bîrdoziyî, fermî dibê, dibe hêza sazûmana hemû civakê ya zagonî û bi piropagandeyeke sift, pêjirandina wê ya ji aliyê hemû kesan ve, tê pêkanîn. Dewlet weke dezgeheke herî bilind tê pîrozwerkirin û di bin ala wê de tê silavkirin. Nûbûna hemû civakên biçîn, di pêvajoyeke wiha re derbasdibe. Mantîq eynî ye, lêbelê şewegirtin ligor mercên dem û cih, tê guhertin.

Tê çavdêrîkirin ku civaka çîna kapîtalîst, bigelemperî xwe spartîye danehevên hemû şaristaniyan, di mercên ku bîrdoziya feodal û mercên hilberîna wê dikevîne astengîyan de, danehevên xwe yên derûnî bi rêya peresînê, demeke dirêj pêşvedibe. Qerantîyên monarşîk ku di nûsaziyên siyasî de dereng dimînin û helwestên kevneperest nîşan didin, di sedsala 17an de sala 1640an, li îngilîztan, di sedsala 18an de sala 1789an li Frensa, di sedsalên 19 û 20an de li gelek dewletên Ewropa û li dewletên cihanê yên din, rê li ber qeyran, alozî û bûyerên bixwîn vekirine. Van şoreşên bi serokatiya çîna bûrjûva, derûn û şeweya şaristaniyê bi pîvaneke mezin guherandine. Çîna civakî ya nû ku kesayetiya xwe qezenc dike, rola xwe ya bingehîn bi afirandina rêxistinên xwe yên siyasî û resene, nîşan dide. Bi wateyêke din, çîna civakî ya nû, gihîştina xwe, bi dewletbûnê dide çespondin. Nasnameya çîna civakî ya ku ne bûye dewlet, yê bibe mijara nîqaşê. Ya rastir, di statuyeyeke bêbiryar û demî de ye. An yê serdest bibe û têtêkeve rewşeke çîna siyasî û fermî, an jî yê têtêkeve rewşa çîneke ku ji bin ve were rêvebirin û ligor berjewendiyên sazûmana fermî, betê xebitandin. Çîn û qismên ku di hilberînê de rola herî mezin dileyîzin, weke tebeqe û çînen sazûmanê yên bingehîn, yê ji nû ve sengerên (mewzî) xwe bigirin. Çîn û tebeqeyên kevin jî, yê bikevîne derawayeke marjînal.

Di pêşveçûna şaristaniya kapîtalîst de, saziyên ku di nava xwe de guherînan dijîn û girîngiyê qezenc dikin, ev in: Welat, netew, komar, hemwelatîbûn, laîktî, demokrasî, hiqûq û mafê mirovan. Ji van hemûyan têtîna mafê mirovan, roj bi roj bi vebûnên nû, berfireh dibe. wateyên van hemû têtînan ên di destpêk û pêşveçûnê de, di mercên îro de têtêne derbaskirin û wateyên nû diderînine holê.

Heger em van tégîn û saziyên bingehîn yên jiyana civakî, ji nêzîk ve bibînin, yê tégihîştina civaka kapîtalîst, hêsantir bike.

1- Welat, Sazûmana civakî ya ku qismên civakê yên dişibine hev û girêdana wan a organîk heyî, bi hevparî tê de dijîn, cîhên erdnîgarî yên ku liqasî danehevên dema borî, hêviyên pêşerojê jî digire nav xwe û ji ber dewlemendiyên xwe dibe zemîna girêdanê. Di sazûmana civaka komunal a hoveber de, tégîna welat pêşveveçûye. Jiberku civak timî, li pey nêçîr û heyînên danehevîyê beziye, pêwîstî bi girêdana bi derekê ve nedîtîye. Herwiha tégîna welat dernakeve holê. Jiberku di navê de, nîrxên ku jiyana xwe pêve girêbide çênebûne, hebûneke welat a siftbûyî û bisazîbûyî jî pêşnakeve. Bi şoreşa çandinî re ku jiyana gund a niştecihî derdikeve holê, girêdanekê hişk a bi axê re pêwîst dike. Ædî cîh jibo jiyana civakê, tê wateyê jêner. Rîwekên ku têne çandin û ajalên ku têne xweyîkirin, wî cihî û wê axê bêhtir biqîmet dike. Civaka ku li dora dayîkê sift dibe, bi heman şeweyê bi axa ku weke dayîkê berhemdar ve jî, tê girêdan. Ax û dayîkê dişibînine hev. Qadên ku civak û gund lê zêde dibin, resene dibin. Welat hêdî hêdî weke tégîneke ku êdî bêyî wî jiyana nebe, di hişan de, cîh digire. Erdnîgariya ku bi hev re bîranînan, mercên hilberînê yên dîngî û xeyalên pêşerojê dijîn, tê pîrozwerkirin. Di vî babetî de, çêbûna tégîna welat jênerê dibe. Welat dibe perçeyek ji jiyana civakê ya menewî û dîngî.

Bi sumeriyana re, tégîna welat merhaleyê girîng qat dike. Heta di bin navê "Dîlmûn" de, bi bihiştê re tînine heman wateyê. Di mîtolojiya Sumer de, Dîlmûn welatê bihiştê ye. Ji wê rojê û heta îro, vê tégîne girîngiya xwe domandiye. Ti civakan weke sumeriyana, axa xwe û bajarên xwe evqasî gewre nekirine. Di vê yekê de jî, para diyarker a berhemdariya zêde û pêkanîna jiyana bajêr, heye. Li hember vê, bê welatî an jî xirakirina welat û dagirkirina wî, weke karesatê hatiye nîşandan. Sumeriyana, giryanok û destanên herî dilsoj, di hilweşîna şaristaniya bajarên xwe de pêşvebirine. Windabûna welat, derûna hemû destanan digire û heta weke îro jî weke berhemên wêjeyê yên resene, cîhê xwe diparêzin.

Di derbarê tégîna welat de, pêngava duyemîn a mezin, di mercên zayîna civaka kapîtalîst de, em dibînin. Utopya ya Thomas Moore û Welatê Rojê ya Campanella, cîhana me ji siya bîrdoziyên dogmatîk ên ku ev cîhan kirine mîne dojhê û qada gunehkariyê, diderînin, ramana ku cîhana me û civaka ku tê de dijîn wergerînin cîhên jiyane, geş dikin. Herdu rewşenbîr digel ku êşeke mezin dijîn jî, ji utopyayên nû yên mirovatiyê, tawîz ne dane. Di nasnameya bîrdoziyî ya Ronesanê de, cîhanbûn, damezrandina civaka îdeal û azadiya takekes, di nava hev de ne. Xeyala bihiştê, careke din li cîhanê tê vegeandin. Li qasî sumeriyana, li hember jiyana nû, xiroşbûneke bi coş tê jiyandin.

Hilberîn û sazîbûna dewletê ya civaka kapîtalîst, tégîna welat berbiçavtir dike. Jiberku rewşa bazara netewî, zîmanê hevpar û hişmendîya dîrokê, ji nêzîk ve bi tégîna welat re têkildar in, pîrsgirêkên sînor hê bêtir cidî dibin. Liser "bostek axa welat", şer dibine dabaşa xebirdanê. Mercên kapîtalîzmê, li dor heyîna kar çiqas ku diçe, şerê di navbera welatan de, germ dike. Çiqas ku axa zêde tê wateya karê zêde, welatparêziya di dîstêkê de ku di hate wateya pîroz. Vediguhere dilnên nijadperest û êrîşker, paşverû dibe û rê li ber şerên bêmaf vedike. Herwiha, zêdekariya kapîtalîzmê ya di tégîna welat de, bi neteweperestiya zêde re, rê li ber şerên di dîroka şaristaniyê yên herî bixwîn de vekirîye. Di mercên îroyîn de, ezperestiya kapîtalîzmê ya berjewendîyan, dixwaze ku bi pêşveçûneke berevajî, bi "kadîbûnê", xelefê vegeîne (telafî bike).

Digel vê yekê, civakên ku li dor çandekê hevpar, bi hev re dijîn, ji ber dogmatîzma serdema navîn û nijadperestiya kapîtalîzmê, dagirkeriya wan a yekser û neyekser, derfet nedîtine ku bigihîjine perçeyek axa welatê azad. Jiyana azad a li welatê azad, weke armanceke jiyaniyê, timî di rojê wan de ye. Dema ku ev bi rêya aştiyê negihîjine vê armancê, hewl didin ku bi rêya şerê mafdar bigihîjin. Jiyana li derên biyan û bê welat, dibe sedema herî bingeh a naletîbûnê, rê li ber bê rûmetiyê, ramanên çalexwarî vedike, dikevin pey şopa giyanên rezîl, bê wate û ajoyên jiyana kor, bêesil dibin û diçin.

2- Netew, tégîna netew, di mercên civaka kapîtalîst de, tégîn û çêbûneke civakî ya herî pêşveçûyî ye. Bi gotîneke din, bi hişmendîya netewbûnê û weke çêbûneke civakî, pêşveçûna girêdana netewî, dibe taybetmendîyeke civaka nû ya bingehîn. Kapîtalîzm, him di pêşvebirina hişmendîya netewî de û him jî di pêşvebirina heyîna wê de, ji hemû şeweyên civakî yên din bêhtir, rolê dileyîze. Netew, yekem car e ku di nava kapîtelîzmê de pêşveçûna xwe pêktîne.

Dilîna xwemalî (aîdîbûn) ya bingehîn, li şûna ku ji heman olî bin, êdî ku ji heman netewê bin e. Girêdanên olî dikevin pilana duyem û girêdanên netewî dikevin pilana pêş. Fanatîzma olî cîhê xwe daye fanatîzma netewî. Pêşveçûna netewî, di warê şikandina bandora feodalîzmê, lawazkirina tégîhîna ometê ya serdema navîn de û li şûna van, di pêşvebirina bazara netewî, hişmendîya dîrok û çanda hevpar de, roleke pêşverû leyîstîye. Di vê de, bandora şeweya hilberîna kapîtalîst bi erênî ye.

Libelê werdigere cudahiye û dibe weke olekî nû, herwiha paşverû bû ye. Bi têngihîneke nijadperestî, neteweperstî ku xwe ji neteweyên din bilindtir digire, bingeha dijminatîyên nû datîne. Li şûna şerên ol û mezhebên kevin, şerên netewetîyê destpêdikin. Çîna kapîtalîst, jibo ku berjewendiyên xwe veşêre û balê bikişîne derên din, weke hemû çînên serdest yên mijok, serî li leyîstikên berevajîkirina nasnameya bîrdoziyî dixê. Çiqas ku têkoşîna çînî germ dibe, ev leyîstik ê hê bêtir were leyîzandin. Ango maskeyên ol û xwedayan, bi netew û qehremanên wê ve dikin û leyîstik tê domandin.

Gelên ku ne gihîştine nasnameya netewî jî, bi hişmendîyeke netewî û piştgirîya hev, yê bikaribin ber bi azadiyê gavên erênî bavêjin. Bi gelemperî neteweperestîya zêde, yê valayîya ku ol di jiyana takekes de hiştî, dagire û bi vekirina rêya li ber dilînên nijadperestî, yê rola neyînî bileyîze. Bi taybetî ev rewşa ku di sedsala 20an de giran bûyî, weke zadê bîrdoziyî ya şerên herî bixwîn, di cîhana mirovatîyê de dabeşbûnê, nijadperestîyê û rikdariyê diafirîne, Yê civaka navnetewî bijehrîne û helwesteke berevajî humanîzmê, pêşvebibe. Tê çavdêrîkirin ku neteweperestîya roja me, bûye weke nexweşiyekê.

Bizaveke ku bi têngîna netewe re pêşveçûyî jî, têngihîna dewleta neteweyî ye. Dewleta neteweyî, di derûna xwe de, bûyereke ku tine ye. Çawa ku dewleta tevaya civakê tine be, dewleta tevaya neteweyê jî çênabe. Hê bêtir, dexmeya çîna ku ji aliyê aborî û civakî ve, di derawayê rêvebirîyê de, li ser dewletê heye. Di destpêkê de, dema ku berjewendiyên tevaya civakê, li hember monarşîya temsîlkerê çîna kevin dibine yek, mirov dikare behsa dewleta netewî bike. Lêbelê çikas ku cudabûna berjewendîyan kûr dibe, dewlet ji netewîbûnê derdikeve, werdigere amûreke berjewendî û çewsandina çîna serdest. Çiqas ku weke têngîna ol, li ser têngîna netew jî dileyîzin, werdigere maskeyeke ku berjewendiyên berbiçav veşêre.

3- Komar, Ev jî aleke din a girîng e ku çîna bûrjûva, li ser navê neteweyê hemûyî, jibo hilweşîna monarşîya dewletê, hejandiye. Digel ku tê wateya rêvebirîya gel, lêbelê ti caran pêşveçûneke Ligor derûna xwe, ne jiyaye. Lêbelê dema ku bi qerantî, tîrantî û rejîmên olîgarşîk re, were hevberkirin, dîsa rejîmeke ku herî bêhtir di pêşveçûna civakê de rol leyîstîye komar e. Rejîmên komarê ku di serdemên pêşî û navîn de, di qadeke bisînor de mabûn, pêşveçûnên xwe yên rastî, bi Şoreşa Frensa re nîşan dan.

Jiberku hemû qismên civakê, dikişîne nîqaşên siyasî, zorê dike ku partiyên xwe damezrînin û wan teşvîqî fêrbûna hunera siyasîyê dike, gelekî perwerdeker e.

Bizavên komarparêziyê, li dijî rêvebirîyên monarşîk, olîgarşîk û dîktatorîyê ne. Ji vî aliyê ve, pêşveçûna şoreşgerî û demokratîk temsîl dikin. Ji aliyê bîrdoziyî ve jî, li dij hemû dogmayên olî, laîk e. Nûnerîya bingehê bîrdoziyî ya ronak û cîhanî, bingeh digire. Li hember tarîtiya serdema navîn, Ronasansê, nûsazîyê û ronahîbûna zanistî dide pêst xwe. Digel ku bi van wesfên xwe, rêxistinêke siyasî ya gelekî girîng e, ji aliyekî ve jibo berjewendiyên çîna kapîtalîst ên ezperest, ji aliyê din ve ku naxwaze bi çînên xebatkar re, rêvebirîyê parve bike, ji aliyê demokrasiyê ve, pêşveçûna wê radiweste, werdigere pergaleke ku nava wê vala û kevneperest. Di nav rejîmên îro de, yên ku di gotinê de ne komarbin, nemane. Lêbelê rejîma ku herî ji derûna xwe jî qut bûye, dîsa komar e. Jibo komarê xeterîya mezin ev e ku bikeve rewşeke bi şeweya dewletên kevin. Komar tenê bi ezperztî, li dijî berjewendiyên netewê, bi veşartîna berjewendiyên derdorên teng, namîne, dikeve rewşa pergaleke xapînok ku hemû rêvebirîyên olîgarşîk xwe têxin siya wê. Heta gelek dîktatorên ku civakê difetisînin jî, xwe weke serokomar nîşan didin.

Ev hemû sedem nîşan didin ku komar bûye rejîmeke qeyranê. Dema ku pîvanên demokratîk pêşbikevin, yê bikaribe komarê ji vê qeyranê rizgar bike.

4- Hemwelatîbûn: Têngîneke din a girîng, hemwelatîbûn e. Dema ku em di nava pêşveçûna dîrokî de, binêrin, ji endamtiya qebîleye pêşî bigirin, heta bi endambûna dewletbajarên pêşî, ji wira jî heta bi hemwelatîbûna împeratoriye û heta bi endamtiya heman ol û mezhebî, takekesê ku endamtiya derawayên cuda cuda jiyayî, encex di sazûmana dewleta bûrjûva de, bi awayek wergirî sepan dîtiye. Ev têngîna ku weke hemwelatîbûna komarê, bi awayek berfirehî hatiye bikaranîn, di derûna xwe de, tê wateya endamtiya dewletekê. Ya rast jî ev e. Naxwe endambûna eşîrekê, bûyina ji ometa olekî, bûyina beniyekî împeratoriyeke, bi hemwelatîbûnê re lihevna. Pêwîstîyeke hemwelatîbûnê ya herî bi hindikayî, wekhevîya hiqûqî ye. Di endamtiya hemû civakên din de, ev wekhevî bihêsanî nayê pêkanîn. Digel ku naveroka wê ji aliyê azadiyê ve pêşveçûyê jî, hemwelatîbûn pêngaveke lipêş û erênî ye. Pirsgirêk ev e ku nava wê bi nirxên komarê werin dagirtin. Ev yê bi azadiya takekesî, ronahîbûn û weke tevlibûna siyasî, yê di mijarên bingehîn de, bi xwegihandinê, werin bidestxistin. Weke têngînen bingehîn, demokrasiyê jibo gel, hemwelatîbûna azad jibo takekes, sazîyên sereke yên ku girîngiya wan a siyasî, zêde dibin e.

Di pêvajoya dîrokê de, hemû desthilatîyên civakî, liser takekes, ligor berjewendiyên xwe, polîtîkayeke helandinê sepanandin e. Armanca wan ku takekes, ligor tore û zagonên civaka xwe birast bikin. Ji mîtolojiyan bigirin, heta bi zîndan, ji hemû qadên baweriyê, heta bi saziyên ku cezayê daringî didine kişandin, armanca bingehîn ev e ku takekes têxin derawayake ku ew bixwazin û wî rêvebibin. Di mercên civaka kapîtalîst de, polîtîkaya ku bi destê dewletê liser takekes tê meşandin, hê bêtir tevlihev bû ye. Tenê bi leşkerî û baca ku datînine ber, na qede, bîrdoziyeke fermî ku ji dogmayên ol ne pêşdetir, liser tê barkirin. Bi derfetên teknîkê, şewegirtina hiş û giyana wî, hê berî tê pilankirin û dixwazin hemwelatîyekî çêkirî biafirînin. Sazîbûna ku dibêjin koletîya hemdem, bi vî rengî tê pêşvebirin. Eslê wê derketina takekes a ku di zayîna kapîtalîzmê de, bi dogmayên bingeh ne hatiye kontrolkirin, êdî bi awayek zexelî û şeweyeke nazik, tê berevajîkirin. Bi taybetî bi saya teknîka ragihandinê ya bêhempa, civak û takekesê kontrolkirî ku ti daman ne hatibe dîtin, tèn afirandin. Xeteriya herî mezin ji vê yekê tê. Dixwazin ku takekesiyeke şêr, bi kontrolbûna civakê ya şêr, bête terazkirin.

Sazûmana şaristaniya kapîtalîst a herî mezin ku dijî, di pêvajoya vê terazê de ye. Hemwelatî di nav xwezabûna xwe de, yê bi zimanê xwe, bi çanda xwe, bi hişmendiya bawerî û dîroka xwe, bi hêviyên pêşeroja azad, yê çiqasî bikaribe qedera xwe çareser bike? Civaka fermî yê çiqasî bikaribe bi qalibên xwe, serdestiyê damezrîne? Civaka şarwer (sivîl), mafên mirovan, rêxistinên derdor, weke rêxistinên li derî dewletê ku vê demê derketine holê, hewldidin ku terîfkirineke nû ya hemwelatîbûnê çêbikin. Di dîrokê de, di demên bi vî rengî de, nêzîkbûnên terîqetên gnostîk û mîstîk ku gelekî zêde ne, bizava xwe ya li hember sazûmanê tînin zimên û li statuyeyeke takekes digerin ku hinekî bêhnê lê fireh bikin. Nasnameya hemwelatîbûnê ya pêşveçûyî û pilankirî, ji jor ku ji aliyê desthilatîyê ve tê ferzkirin û nasnameya azad a ku civaka şarwer dide pêş, bi hev re, di nava pozberî û gengeşiyê de ne. Ev dikarin tevkarîyekê bi zayîna nasnameyeye bîrdoziyî re bikin ku rêya pêşveçûna şaristaniya nû, diyar bike. Bi taybetî ne serketina Marksîzma ku teng maye û hê bêhtir di warê aborî de, ketiye nava nîqaşan û lêgerîna nasnameyê, di dema nû de, nîqaşeke ji hemû aliyên ve, di her warî de, bi dahûrandîneke amûrên zanî û ragihandinê yê pêşveçûyî, yê serketîtir bibe.

5- Laîqî, hêmana herî girîng û şoreşger a ku çîna bûrjûva, jibo ku xwe him ji aliyê polîtîk û him jî ji aliyê bîrdoziyî ve, ji dorpêça dêrê rizgar bike, sepandiye. Lêbelê em nikarin bibêjin ku bi awayekî kûr, alternatîfeke wê hatiye pêşexistin. Em dikarin bibêjin ku weke tevgereke bizavî, pêşveçûye. Di destpêkê de, hêza bîrdoziya çîna bûrjûva, di dahûrandîneke rast a ol û xwedê de, bisînor e. Derketina wê ya herî tundraw, ji înkarkirina ol û xwedê wêdetir, ne ti tişt e. Ev nêzîkayî, ji aliyê Marksîzma ku xwe weke nûnerê çîna karker dibîne ve, bi heman rengî hatiye standin, herwiha vê yekê rê li ber netêrayiyên bîrdoziyî yê cidî vekirîye.

Aliyê laîktîyê yê herî lawaz, dahûrandîneke ol a rast pêknayîne. Di mercên ku zayî de, civaknasi beşeke zanistê ya ku pêşveçûbû. Nêzîkbûnên rexnegiriyê yê di derbarê ol de, hê nû pêşdiketin. Wêrekiya zanist, bigelempêrî hewl dide ku ji dogmatîzma olî veqete. Di demên pêşî de, bi awayek stemkarî, di engizîsyonê de dihate cizakirin. Vê tirsê rê li ber derketinên zanistî yê dilnî û serhildêr vedikir. Felsefeyê rewşeke bi vî rengî, li hember ola Athena jiyabû. Sokrates bi dijîtiya ol tê tawanbarkirin û bi mirinê tê cizakirin. Arîsto, bi revê xwe ji mirinê rizgar dike. Ev yek dibe qedera gelek feylesofan.

Demên berê, olên yek xweda yê ji koka Hz Brahmî jî, li hember rejîmên ku pûtperestî kiribûn ola fermî, rewşeke bi vî rengî jiyabûn. Derketina zanistî ku di bin tawanbariya bêolî de, hewldide pêşvebiçe, yê gelek şehîdên zanistê bide. Di zayîna civaka nû de, merhaleya herî zor, şerê zanistî yê li hember dogmatîzmê ye. Laîktî aliyê siyasî yê vî şerî ye. Heger ku bingeha wê ya zanistî ne bi hêz be, şensê wê yê tine be. Tişt a ku pêwîst e bête kirin, hê dema rahîbên Sumer, dewleta bi nasnameya bîrdoziyî ve girêdayî ku li dora perestgehan çêkiribûn, were pirsîyarkirin.

Dewlet, ji zayîna wê heta bi pêşveçûna wê ya di pêvajoya dîrokê de, dahênana serdest a dogmaya olî ye ku herî bêtir tê bikaranîn. Hêmana dewletê, ji aliyê sumerîyan ve, hatiye danîn. Taybetiya wê ya herî girîng ev e ku mirov dike benî û bi şeweya koletî, mecbûrî suxrevaniyê dike. Ev hêmana ku heta îro jî ne hatiye guhertin, bi hezaran maskeyên rengo rengo hatiye pêşvebirin. Sazûmana ezmên a ku rahîbên Sumer bi esehiya wê nizanin, bi mîtolojiya ku bi mantiqê wê yê bê teşe ve girêdayî û dewleta ku vedana wê ya siyasî, eslê wê sazûmana koledarî ya ku li ser keda mirov, mijokatiyeke bêsinor daye destpêkirin, ji vê derûna wê tê ku dibe amûreke bêmafîya herî zêde, derew û zordestiyê. Dema ku dewlet tê afirandin, bi zanîna sazûmanê ya herî bêteşe ve girêdayî ye, dibe îfadeya viyana xwedayî ya ku xwedî viyaneke bêsinor a li ser rûyê erdê. Dema dewlet tê afirandin, bi şewe û hêmaneke wiha hereket dike ku ji herkesî hesab dixwaze û ew qet hesab nade

kesekî. Afirandina dewletê wisa pîrozwer e ku dikare her tiştê kesan, heta bi giyana wan jî, bêbergîdan bistîne.

Rahîbên Sumer ku cinawirên herî har yê civakî afirandine, qet tedbîrek jî ne girtine. Têgîneke weke 'mafê benî' jî, nayê holê. "Dewlet hertişte, tekekes ne titişt e", hêmaneke Sumer e. Dogmatîzm, bi kinayî wiha bi dewlet dibe. Dewlet, bi xwedayên bi maskeyên derew, bi hêza bêteşe û zordest ku tenê hesab dixwaze, didarizîne û qaşo ji xwedayan pêve hesab nade ti kesan, bi dozger û dadmendên xwe, bi karmendên bacê yên talanker, derketiye holê. Aferîd di dema zarokatiya xwe de, wiha ye, êdî piştî dema ku di nava civakê de, bi derew û zordestiyê, derfetên mijokatiyê zêde dibin, yê hê bêhtir were pêşvebirin. Jibo ku maske nekeve û neyê fêhmkirin, timî yê were bodrakirin û yê bi bizmaran were asêkirin. Marksîzma ku bi angaşt (îdia) hilweşîna wê derketiye holê, dikeve derawayeke xapandinê, bi awayek bêhempa bizmaran li wî maskeyî dixwe û ji bihêzkirina dewletê pêve tiştêkî din ne kiriye. Tiştê ku vê ezmûnê çespandiye ev e: Dewlet tenê hêza zordestiya mêrokî ya bi hezar maskeyî, temsîl nake, bi maskeyên fahîşeyan ên kişîner ku timî bodra dike, hemû beniyên xwedê ji rê dibe, dide nîşandan ku aferîdeke bi du zayendan a ne rewya ye. Ew tenê ne ya bûrjûva, dibe evîna bi duzayendan a karkerên ku dilketinê.

Tiştê xerîb ev e, perestgehên Sumer ku bûne malzaroka dewletê, di heman demê de, dibine cîhê ku mêr û jinên fahîşe pêşî lê derketine holê. Bi şeweya Sumer, heta ku dewlet jin û mêr bi temamî fahîşe neke, dizane mijokatiya ku li ser civakê dimeşîne, nikare bi hêsanî bide domandin. Digel ku rastî ewqasî li ber çava ye, teorî û têgînên bêhijmar, tene pêşvebirin ku gelekî hindikê wan vê rewşê rexne dikin, lê yên herî zêde, bi ramênên mîtolojîk, felsefî, olî û zanistî, vê mijokatiyê dipejirînin û vedişêrin. Lewra çiqas ku rastî bête veşartin, mijokatiyê yê ewqasî dirêj bidomîne.

Hêmana laîktiyê, jibo ku rola xwe bi temamî bi leyîze, pêwîst e dewleta bi şeweya Sumer bike armanc. Hêza zanîna bûrjûvaziyê û berjewendiyên wê, jibo vê ne bi kêrhatî ne. Di mercên kapîtalîzmê de, sepînen reel sosyalîzmê jî, ne di wê mebestê de ne ku şeweya Sumer derbasbikin, heta nîşandane ku sepînerê vê şeweyê yên herî baş in. Nîqaşêke laîktiyê ya rast, hê jî gelekî girîng e. Laîktî herî zêde pêwîst e ku di derbarê derûn de, bête pêşvebirin. Ango tenê li dijderketina dewletê ku ol, ji siyasetê re dike amûr, ne bes e. Laîktiyêke ku dewletparêziya Sumer a bi dogmayên olî ve girêdayî, bike armanc, dikare roleke dirokî bilîze. Tiştê ku şaristaniya Ewropa, di vî babetî de dike, tenê rexnekirine hinek maskeyên dewletê yên bê wate ne. Li hember vê yekê ji veguherîneke derûnî dûr e. Tê dîtî ku ji hinek aliyan ve, diêxe rewşêke xeter û bi hêz dike. Dema ku dewleta bi bombeya atomê bi dewleta xwedayê bi maske re bête hevberkirin, derdikeve holê ku ya herî toqîndar û bi saw e. Tiştê Ewropa dike, bi fahîşeya xwe re zewaceke rewya ye. Encamên ku rê li ber vekiriye (du şerên cîhanê, gelek şerên herêmî û yên cîgeyî) çiqas ku serkeftiye, di pêşerojê de, yê kîjan xeteriyên bi xwe re bîne, ev yek mijara nîqaşê ye.

Jiberku dewleta ji dogmayan tê, berhema Rojhilata Navîn e, laîktî, yê pîrsgirêka herî mezin be ku bibe sedema nîqaş û levdanan. Heta ku li hember koka dewleta dogmatîk, neyê derketin, ji têkoşîneke laîktiyê ya rast nayê xeberdan. Heger ku Ronesanseke Rojhilata Navîn, jênerev be, mercê di serî de ev e ku dewleta dogmatîk, ji zayînê û heta bi îro, bi hemû aliyan ve, bi awayek rexnegirî li ber çavan bigirin, dahûrînin û taybetiyên wê yên ku bêtine derbaskirin diyar bikin, yên ku bikevîne şûna wan jî bi pîrogram bikin. Ji ber vê yekê jî, berî her tiştî pêwîst e ku jibo azadiya raman şer were kirin û bi qîmetê wê were zanîn. Dîsa herçiqas ku bi sînor be jî, hisdike bila di bîngeha laîktiyê de û hisdike bila di bîngeha olî de be, di pêşvebirina hewldanên demokratîkbûnê de, pêwîst e nîrxên mezin werin dayîn û xebatên jibo serkeftinê, gelekî girîng in. Qedera Ronansa Rojhilata Navîn, herwiha qedera legerîna şaristaniyên nû jî, bi encama vê têkoşînê ve girêdayî ye.

6- Demokrasî, saziyêke girîng ku kapîtalîzmê pêşvebiriye jî, demokrasî ye. Bîngeha sazûmana demokratîk ku rêvebiriya wê ji aliyê hemû hemwelatiyan ve tê hîlbijartin, heta bi ji hev veqetîna civakên qebîleyan diçe. Ev kevneşopiyêke demokratîk e ku rêvebirî di erêkirina tevaya qebîleyê re derbas bibe. Bi civaka biçîn re, demokrasî, hê bêhtir bi temsîla giregirên çîna serdest, tê îfadekirin. Ligor hêza wê, ji diyarkirina birêvebiriye bigirin, heta bi rola organa şewrê, di her civaka biçîn de, bi sazîbûnekê tê dîtî. Lêbelê rola qerantiyê ku di demeke kin de zêde dibe, kevneşopiyê demokratîk, jî holê radike. Digel ku di sumeriyên de, mînakên wê yên pêşî tene dîtî jî, esasê wê, demokrasî pêşveçûna xwe ya girîng, di dewlet bajarê Athena de, nîşandide. Demokrasîya Athena ku bi mîrên çîna serdest a koledar ve girêdayî, şeweya pêşî ya klasîk digire. Rewiştê wê jî nîqaşên fireh re vekirî dide çespanandin ku him ji ramana felsefî bandor girtiya û him jî jibo pêşveçûnê xwedî mercên bikêrhatî ye. Li derekê çiqas demokrasî hebe, li wira ewqasî pêşveçûna nîqaşan û ramanên cuda heye.

Digel ku komar jî xwedî organên rêvebiriyê yên bi hîlbijartinê ve girêdayî ye, jiberku hemû hemwelatî tevî hîlbijartinê nabin û hêzên hê berî hatin diyarkirin ku yên tevî hîlbijartinê bibin, bi awayek vekirî nayên erêkirin, rewîştê wê ya demokratîk bisînor dike. Weke ku her komar ne demokratîk e, her demokrasî jî ne mecbûre ku bibe komar. Qerantiyên demokratîk jî dikarin hebin. Tiştên jibo demokrasîyê diyarker ev in, demokrasî pêwîst e berjewendiyên gel hemûyî li ber çavan bigre, derfetê bide diyarkirina siyasetê, yên ku jibo rêvebiriyê hîlbijartin venihêre (kontrol) û bi navberiyên birêkûpêk sazûmanê bi hîlbijartinê ezmûn bike. Bi vî aliyê xwe, weke şeweyeke rêvebiriyê ya herî baş tê nixandî. Heta ku ya baştir derkeve holê, xuyadike ku ev yê vî navî hilgire. Digel ku terîfkirina wê wihaye jî, pirsgirêkên wê hê bêtir ji sepandinê tên.

Digel ku çîna bûrjûva komar ber bi çav aniye jî, bi heman lezê pûte bi pêşvebirina demokrasîyê ne daye. Lewra dizane ku demokrasî yê desthilatiya çînê teng bike. Dema ku karê zêde dibe dabaşa xeberdanê, dengê saziyên demokratîk tê birrîn. Dema ku qeyranên giran û hilweşîn dibin dabaşa xeberdanê jî, jiberku bi tevayî ne hilweşîn, bêhtir nêzîkî çareseriyên demokratîk dibin. Çîna ku demokrasîyê pêşvedibe, bi xwe ewlekar e û xwedî taybetiyên ku bizanibe bibe xwediyê ezmûn û asoyeke siyasî. Çîna bûrjûvayên Ewropa, jiberku ev behre nîşan daye, di dîrokê de hêz daye proje û saziyên demokrasîyê yên herî berfireh. Liqasî li hember bermayiyên civakên kevin, li hember gelek qismên civakî yên di angaştê ku nû temsîl dikin jî, bi ezmûnên temsîlkirinê yên domdirêj, bi dahûrandina xwe ya têkiliya siyaset û hêzê, bi tecrûbeyên dewlemend yên şoreşê, serdestiya xwe daye pejiwandin. Bi sepandinê li Ewropa derketiye holê ku demokrasî, rejîmeke xwedî taybetiyên ku herî pêşvedibe ye. Çiqas ku diçe, dibe saziyeke herî hemdem ku tê armanckirin. Di vî babetê de, gotina serdema me ku dibêjin serdema şaristaniyê, rastiyeke îfade dike.

Aliyê demokrasîyê yê girîng, ji heyîna wê ya rêvebiriyê zêdetir, ji şeweya çareseriyên pirsgirêkên civakê tê. Rejîmên heta weke niha ku rêvedibirin, heta ku bi hêzeke dijber dihatin terazkirin, an pirsgirêk bi zorê ji holê radikirin an jî bi serîdanîne bi encam dikirin. Mantiqê dîrokê yê klasîk timî wiha bûye. Heçkû şeweya çareserkirina demokratîk, mafê yê herî lawaz, ewlekariya jiyana wî, azadiya raman û pêşveçûna wî, parastina heyîna wî ya çandî, gengaz dike û di vî babetê de bersivê dide gelek pirsgirêkên binîqaş û levdanê. Serdestiya Ewropa, esasê wê bi vî şeweya çareseriyê ve girêdayî ye. Ji kûvê lê bête nêrîn bilabe, ji berku bêhtir mirovî ye, zanistî ye û nimûneke ku berjewendiyên tevaya civakê li ber çavan digire ye, sazûmana herî berhemdar e ku çareseriyên tîne. Asta zanistîya mirovatiyê û hêza wê ya teknolojîk, dide nîşandan ku bêtir pêdiviya şoreşên bixwîn, krîterên demokratîk dikarin her pirsgirêkê çareser bikin. Jibo sepandina demokrasîyê ya bi temamî, asta pêşveçûna zanist û teknolojîyê ya ku tê xwestin, derketiye holê. Bi gotineke din, asta zanist û teknolojîyê bi sazûmanake demokrasîyê ya rast re bête yekirin, mercên dargî yên ku ji her pirsgirêkê re yê bibine çareserî, hatine girtin. Belkî jibo sazûmana sosyalîst ku demekê gelekî di hate nîqaşkirin, mercên dargî halo an jî wilo bêtir nixandî. Lêbelê guman nayê kirin ku şaristaniya hemdem jibo demokrasîyê mercên îdeal amade kirine. Ev rastî dide çespendin ku veguherînan şaristanî jî di nav de, hemu guherînan di dorhêla rejîmeke demokratîk de gengaz e.

7- Hiqûq, Rêvebirîya dewletê ya bi serdestiya hiqûq ve girêdayî, sazûneke din a girîng e ku di vî demê de pêşvedibe. Di her dema bi dewlet de, sazûmaneke bi navê hiqûq ku bi rêzikên bi mûeyîde ve girêdayî, heye. Dewlet bi xwe jî, rêxistineke ku sazûmana rêzikên hêzên serdest, birêvedibe ye. Cudabûna wê ya ji hemû birêxistinbûnên civakî yên din, hemûkan digire nava xwe û di derawayeke fermanker de ye. Bi wateyeke teng hiqûq, rêzikên rêxistina dewletê yên vesazkirina nav xwe û rêzikên di navbera wê û hemwelatiyan de, di navbera hemwalitiyan xwe bi xwe de ne. Ev hemû rêzik bi zagon tene binavkirin. Ev zagonên ku hêzên dewletê tenê di dema xwe de, Ligor berjewendiyên xwe diafirînin, bi hiqûq bête binavkirin, evê terîfeke bikêmayî be. Çavkaniya hiqûqê hê firehtir e. Bîngê demborîne yên toreyî, ango kevneşopî, xebatên teorîk û pratîk ên zanyaran di warê hiqûq de û mijareyên (mewzûat) hiqûq yên ku ji demên borî mayin, di çêbûna hiqûq de, çavkaniyên bîngê in. Ev çavkanî di wêfê ku dewletan jî girêbidin de ne.

Mijareke din a hiqûq, di derbarê girêdana dadê de ye. Rêzikên dewletan ên ku bi dadê ve ne girêdayî bin, ji wan re hiqûq nayê gotin. Dad di derûna xwe de, diyarkirina viyana azad a hemwelatiyê ye. Herwiha, dema ku hiqûq bi viyana azad a hemwelatiyan ve girêdayî be, mirov dikare ji rejîmeke hiqûq a rastî xeber bide. Dewleteke ku viyana hemwelatiyên xwe ya azad, tine bihesibîne, ne dewleta hiqûq e. Di dîrokê de gelek dewlet, bi vî rengî ne. Dewletên ku azadiyê nadine heyîna hemwelatiyên xwe, berevajî vî yeke wan dibinisînin, gelekî zêde ne. Hiqûq, hêrî zêde bi têkoşîna li hember dewletên bi vî rengî, tê afirandin, bi têkoşîne maf tene standin. Pêşveçûnên bi vî rengî, hiqûq xweyî dikin.

Heyîna civaka kapîtalîst a tevlihev, mercên ku hilberîn pêve girêdayî, bazirganî, têkoşînên mafên karker û qismên civakî yên din, nifûsa ku zêde dibe û çavkaniyên kêm, pêdiviyê bi sazûmanake hiqûqê ya gelekî pêşveçûyî nîşan didin. Ev rewş di heman demê de, pêwîst dike ku dewlet jî, ji nû ve xwe birêxistin bike. Herwiha di sîstema kapîtalîst de, niqêşeke hiqûqê e destpêbike. Ev pêvajoyê bi şewegirtina sazûmanên zagona bingehîn û zagonên hiqûqê e bingehîn, rola xwe dileyîze. Hiqûqê hewl dide ku levdanên hundirîn û derveyî nerm bike, berjewendiyên hemû qisman, bêtir ku rê li ber şidetê veke, li ber çavan bigire, mafên hemwelatîyan ên bingehîn nas bike û civakeke hiqûqê a di nava aştiyê de pêkbîne.

Ev yek diyar e ku di dema me de, şaristaniyên ku sazûmana hiqûqê a bi vî rengî pêşvedibin, bêhtir pêşvedînin. Şeweya hiqûqê şaristanî ku Ewropa pêşevaniyê dike, pêşveçûneke bêhempa bidestdixe û cîhanê tevî dike bin bandora xwe. Helbet di vê de, berjewendiyên çîna serdest û yên netewê, yên welat heta yên blokê jî, tim li ber çavan tên girtin. Dev ji rêbazên zordestî yên dema mijokatiya bêteşe berdide, bêhtir bi serdestiya xwe ya zanistî, teknîk, hilberîn û siyasî, di warê bazirganiya serbest de, hewl dide ku hiqûqekî navnetewî biafirîne û sazûmana hiqûqê ku damezrandî gerdûnî bike. Hiqûqê navnetewî, tê vê wateyê ku hiqûqê hundirîn li yê derve bête vedan û herwiha bête temamkirin.

Ev hiqûqê ku di vê çarçovê de tê terîfkirin, dema ku bi demokrasîyê re dibe yek, rasteqîniya bingehîn ku derdikeve holê, dewleta demokratîk a hemdem a hiqûqê e. Bi awayekî bi kapîtalîzmê ve girêdayî ye, lê dîsa jî, bi gelek aliyên xwe jê derbasdibe, sazûmana şaristaniya bingehîn a civakê şeweya xwe ya herî pêşveçûyî dibîne. Civaka ku bi rejîma hiqûqê demokratîk tê rêvebirin, layîqî navê civaka herî hemdem a şaristaniyê ye. Tê bawerkirin ku çiqas pirsgerêkê wê çêbibin jî, di nava aştiyê de bi bikaranîna mekanîzmeyên xwe yên siyasî û tim bi girtina hiqûqê a li ber çavan, yê bigihe hemû çareseriyên.

8- Mafê mirovan, hiqûqê mafê mirovan, saziyeke bingehîn a şaristaniya hemdem e ku nû pêşvedîçe, sepandina hiqûqê a li takekes û li nasnameya civaka wî ye. Mafê mirovan bi çêbûna kapîtalîzmê re, sazûmana bi hiqûqkirinê ya naskirina nîrxên bilind dibin, ango ramana azad, vîyana bawerî û jiyane bingeh digire, îfade dike. Nîrxên takekesî ku bilind dibin, weke maf û hiqûqê bêhtir berbiçav bi awayek vekirî hatine diyarkirin, gihandina pêbaweriyê zagonî, herwiha bi awayek bihêzkirî layîqî takekesan tê dîtin.

Dema ku em behsa mafê mirovan dikin, cudahiya çîn, netew, ol, zayend, koma etnîk û nijad nayêkirin, tenê jibo ku mirov in, hemû azadiyên ku pêwîst e hemû kes lê xwedî bin, tê aqilan. Jibo ku takekes bi awayek azad pêşvebiçe, ev mafan bingeh in. Ji van mafan yên yekemîn, azadiya raman, bawerî û îfadeyên mafê birêxistinbûn, civîn û pêşandanê û mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê ye. Mafên duyemîn ên aborî û civakî ne û mafên sêyemîn, ên gelan e ku bikaribin çanda xwe bi azadî pêşvebibin û bijîn. Herwiha ev maf dibine sê beş. Di warê gerdûnî de, ev mafên ku pêwîst e li wan bi xwedî bête derketin, maf û sedemên ti kesan tine ku li dij derkevin. Di serê van mafan de, mafê jiyane tê. Li derî rewşa şer, mafê dewletan û kuştinê tine.

Mafê mirovan ku di rewşa pêşveçûnê de ne, di nava hewldanê de ye ku takekes li hember dewleta mîna teniya bidon biparêze. Di demeke wîha ku venêrana dewletê zêde bûyî de, parastina takekesê ku bi tenê dimîne, gelekî girîng dibe. Di demên berî civaka kapîtalîst de, takekesên ku di nava eşîran, ol û weqfan de xwedî ewleyî bûn, bi lawazbûna van saziyan re, gelekî bêhêz dibin. Zorbûna jiyana bi serê xwe, ne pêbaweriyên di warê perwerde, tenduristî û kar de, takekes dixwe nava xeterî û astengiyên. Malbatê ava nake, ava bike jî, nadomîne. Ji bin barê pirsgerêkên perwerde û tenduristiyê zarokên ku çêdibin dernakeve. Eslê wê ev hemû pirsgerêk, jiberku şeweyên civakên kevin li hember kapîtalîzmê jevdikevin û civaka nû nayê xûnifandin, derdikeve holê. Têkiliyên ku jevdikevin, takekes li hember kapîtalîzma hov, têxe nava rewşeke zor. Takekes di navbera nû û kevin de, mehkûmî bêçareyiyê dibe. Hiqûqê mafê mirovan, weke berhemeke vê valahiyê pêşvedîçe. Hiqûqê mafê mirovan weke berhemeke vê valahiyê pêşvedîçe. Em nikarin bibêjin ku takekes him ji aliyê hiqûqê netewî û him jî, ji aliyê hiqûqê raserî neteweyan ve gihaye ewlekariyê.

Têgînên dawî ku weke beşekê ji mafên mirovan pêşketine, mafên jin, zarok û yên derdorê ne.

Jin weke çîna herî li bin û kevin, mijara çewsandin û mijokatiyê ye. Pirsgerêka jinê ku nûka pêşya wê vedibe, mijareke wisa berfireh e ku di nava civaka kapîtalîst nahile. Azadiya jinê, weke pîvana hemû azadiyan, hê amadekariya pêngavên xwe yên pêşî dike. Ji serdema jinê derbasbûyina serdema mêr, gelekî bi jinê daye windakirin. Dîroka civaka biçîn a pênc hezar sal, herî bêhtir bi jinê daye windakirin. Çewsandina ji hemû aliyan ve, heqaret, cudakirina zayendî, ne wekheviya bi hemû rengî, layîqî jinê hatiye dîtin. Ædî nûka hewl didin ku ji bin xweliya (arî) jina ku şewitiye û hatiye şewitandin, wê paqij bikin û derînin. Herçiqas pêwîst e ku mafên takekesî bêmerc, pêşî bidine jinê

jî, lêbelê herî li dawî û bisînor tê rojevê. Ev mijar liqasî ku bibe beşeke zanista civaknasiyê girîng e û pêwîst e bi serê xwe bi pîlan, bi bername, bi rêxistinî bikeve nava têkoşîneke siyasî, demokratîk û hiqûqî. Ji têkoşîna netewî û çînî, him ji aliyê derûnî û him jî ji aliyê şêwe ve resenetir e.

Di roja me de encex navê pîrsgirêkê hatiye danîn, naveroka wê jî ne hatiye diyarkirin. Bername, stratejî, şêweyên rêxistinê û çalakiyan, di rojevê de rûneniştine. Çawa dîrokê, di bingeha koletiya zayenda jinê de, bi zordarî, mijokatî, şer û derewan dest bi dîroka şaristaniya civaka biçîn kiriye, bi têkoşîna azadiya jinê û serkeftina wê, yê bi azadî, aştî, wekhevî û rastiyê, dîrokeke nû bête afirandin û nivîsandin. Hemû şanîder nîşan didin ku di şeveqa şaristaniya nû de, azadiya jinê yê rola diyarker bileyîze û careke din, di asteke bilind de, serdemeke jinê yê were jiyandin.

Mafê zarokan jî, mijareke wisa girîng e ku bi dev dê, bav û dewletê ve neyête berdan. Di nav hemû çêlikên ajalan de, yê herî bi zorê pêşvedîçe, zaroka mirov e û nêzîkbûneke gelekî taybet û bi zanistî pêwîst dike. Sazûmana bi serdestiya mêrê hov, piştî jina kole û karkeran, herî bêhtir zarok tine kiriye. Sazûmana mêr liqasî ku zarokê nasneke kor, bê wijdan û zalim e. Di salên destpêka civaka biçîn de, timî zarok ji xwedayan re dihatin qurbankirin. Belkî niha bi awayek fizîkî nayên qurbankirin, lêbelê qurbankirina menewî berdewam e. Jina ku psîkolojiya zarokê ji mêr bêhtir dizane û bêhtir biwijdan e, ji ber nezanî û bê derfetan weke dayîkê rola xwe bi temamî naleyîze. Rêbazên dewletê yên jor ku fermanker, ji cîhana zarokê re gelekî xerîb in. Ev çarçova ha jî dide nîşandan ku pêwîst e mafê zarokan bi awayek wergirî werine bi rêkûpêkkirin. Pêdiviya danezaneke mafê zarokan ku perwerde, tenduristî, leyîstik, hezkirina dayîkê û aştîyê bingehe bigire, rojekê berî rojekê were bi cîhkirin.

Mafê derdor, pêşgiriya hiqûqî yê li hember bîr û baweriya kapîtalîzmê ya karin ku bi zêdebûna nifûs û teknolojiyê sererd, bînerd, atmosfer û avhewayê dike nava xeteriyê ku giyandar nikaribin tê de bijîn. Nakokî êdî ne tenê çineke mijok a di nava civakê de ye, bi armanca cîhana jiyane ya bişeml jî, veguherandina nakokiya civakê û xwezayê. Di warê gerdûnî de, hatiye ferzkirin ku civak hemû, têkeve nava têkoşîneke mafên derdor. Di serî de menîfestoyêke mafê derdor û bi vê ve girêdayî, rêxistineke derdor a navnetewî, pêwîst e bête seferberkirin.

Têgîna mafê mirovan, ji çarçova hiqûqê ya teng derbasbûye, êdî weke heyîn û sazîbûneke sincî û polîtîk, pêdivî ye felsefe û siyasîbûn dest bavêjîyê û ji nû ve were nirxandin. Ji serî de weke ku em li ser radiwestin, nakokiya di navbera civakî û takekesîtiyê de, heta ku di asteke bilind de neyê dahûrandin, qeyrana şaristaniyê ku kûr bûyî, nayê derbaskirin.

Çawa ku qeyrana serdema neolîtîk, bi senteza civaka biçîn a Sumer û derbasbûyina dewlet û serdema nû hate derbaskirin, niha jî ev qeyran û pîrsgirêkên ku serdema şaristaniyê tê de, encex bi pêngaveke mirovatiyê ya nû ku sentezeke takekes û civakê ya bi azadî û wekhevî pêkbûne, yê werine rakirin. Hinek vê pêngavê weke postmodernîzm (şaristaniya hemdem, piştî modernîzmê) dinirxînin, hinek jî weke dawîya dîrokê dinirxînin. Herdu têgîn jî, bi naveroka xwe ne bi têrayî ne. Ev yek nêrîna çîna bûrjûva bingehe digire, astengiyên şaristaniya kapîtalîst û bi dawîbûna wê, weke dawîya mirovatiyê nîşan dide. Berevajî vê, liberalîzm û faşîzmê weke sazûmana abadîn, bibîrtîne.

Ev yek derketiyê rastê ku çareserî û bi rêxistinbûnê biçîn û neteweyên teng ve girêdayî, nakokiyên civaka kapîtalîst derbasnakin. Tê fêhmkirin ku hemû civakên biçîn û bidewlet, ne xwedî behre ne ku bi dewletbûnê re, qeyran û pîrsgirêkên derdikevine holê, çareser bikin. Rewş ne "postmodernîzm" ne jî "dawîya dîrokê" ye. Ketiye demeke dîrokî ku êdî bi mantiqê şaristaniyê yên klasîk, ango bi afirandina sazûmana çîn û dewletên nû, pîrsgirêk çareser nabin. Di vê de dîsa weke her demê dîrokê, asta teknîk û zanistê, rola diyarker dilîze. Zanist û teknîkê, mantiqê klasîk ê çîn û dewletê ne derbasdar kiriye. Serdema zanîn û ragihandinê, aliyekî pêvajoyê yê girîng tîne zimên. Lêbelê serdema tê jiyandin, tenê bi mafên zanîn û ragihandinê û serdema hişmendîya derdor, nayê binavkirin, pêdivî bi derketinê dîrokî heye ku van hemû bûyeran li ber çavan bigire. Di vî babetê de divê ku rexneyên rast yên van derketinan, werine kirin, nasnameya bîrdoziya nû bête çêkirin, bi pevrariyêke pratîk a bi vê xebatê re, jibo bi rêkûpêkkirineke nû ya aboriyê û sazûmana giştî, amadekirina bernamêyê û diyarkeriyên stratejîk û taktîk, yê derketina mirovatiyê ya nû diyar bikin. Di encama derbarê şaristaniyê ya parêznameyê de, emê hê bêtir bi awayek dahûrînerî, nêzîkî vê mijarê bibin.

C- Belavbûn û serdema bandeva şaristaniya kapîtalîst

Taybetiyêke bingehin a serdemên mirovatiyê ev e ku çîqa diçe, pêşveçûna wan bilezgîn dibe. Di vê de, pêşveçûna asta zanîn û teknîka civakê, rola diyarker dilîze. Serdema paleolîtîk ku di derbarê xwezayê de, xwedî zanîna zarokî û xwedî bingeheke kevir û çemik (rot) e, heta dema qeşayî ya dawî, peresîneke gelekî bê hediya nîşan daye. Digel vê yekê, demeke herî domdirêj e ku ji sedî nod û heşt,

ji temenê mirovatîyê digire. Dema mezolîtîk ku demeke navber e, salên di navbera BZ 20 000 û 10 000an digre nava xwe. Jiberku dema neolîtîk, xwedî zanîn û xwedî xemla teknîka ku şaristaniyê diderîne holê ye, demeke hê bêhtir pêşveçûyî ye. Jiberku zanîn û teknîk hev û din ji nêzîk ve xweyî dikin, di hilberîn, jiyana civakî û hêza rêvebirîyê de jî, rê li ber pêşveçûnên bilezgînî û sift vedike. Digel ku salên navbera BZ. 10. 000 û 3000an digire nava xwe, dema paleolîtîk ku bi sed hezar salan domandiye, gelekî bêhtir, xwedî pêşveçûn e. Bi taybetî pêvajoya di navbera salên 6000 û 4000an de, di Heyva Berhemdar de, mirovatîyê digihîne hêza zanîn û teknîka ku qedera wî ji binî bi guherîne. Hemû amûrên teknîk û teorîk yên ku sumerî bikartînin, di van salan de û li vê erdnîgariyê hatine pêkanîn. Digel ku temenê serdeman kin di bin jî, pêşveçûnên ku di nava xwe de pêktînin, gelekî mezin dibin.

Merhaleya koledarî ya civaka biçîn, xwedî temenekî li qasî salên di navbera BZ 3000 û PZ 500an de ye. Digel ku xwedî demeke hê bêhtir kin bûyî ye jî, di warê bajar, rêxistinên civakî û siyasî, mîtolojî, ol û felsefeyê de, demeke ku herî diyarker nişan dide. Jiberku serdema feodal salên di navbera PZ 500 û 1500an de digire nava xwe, tê dîtîn ku temenê wê hê bêhtir kin bû ye. Weke risteke geometrîk, çiqas ku dem kin dibe, berevajî vê yekê gelek qadên daringî û entelektuel hê bêhtir pêşve diçin.

Taybetiyeke bingehîn ya din a serdema mirovatîyê, pêkanîna belavbûna wan a gerdûnî ye.

Li hemû parzemînan jiyandar, civakên paleolîtîk hatine dîtîn. Ev civak xwedî taybetiyeke ku herî domdirêj û belavbûyî ye. Civaka neolîtîk jî, ji Heyva Berhemdar a ku jê zayî ye, li hemû herêmên cîhanê yên jiyandar belav bûye. Di vê de dîsa teknîk rola diyarker dilîze. Di dîrokê de, hê bêhtir bi awayek berbiçav tê çespanandin ku civaka koledar a Sumer, di şopa neolîtîkê de hê bêhtir pêşveçûye. Serdema feodal ku teknîka hesp û hesin bêhtir bi berfirehî bikaraniye, bi taybetî di bingeha îslamî û xiristîyantîyê de, belavbûnên herî bilezgînî pêkanîne.

Dema ku em serdeman dinirxînin, pîrsgirêkeke din ku pêwîst e bête dahûrandin, rewşa mêtingehkarî û emperyalîzmê ye. Her sazûmana civakî ku di derûna xwe de pêşverû û pêşveçûyî, heger ku ne xwaze jî, yê xwedî taybetiya belavbûnê be. Lewra zanîn û teknîka pêşveçûyî, xwedî serdestiyeke belavbûnê ne. Tovê civaka neolîtîk ên Aryen ku wekhevîxwaz, îro jî li hemû aliyên cîhanê şîn tînin. Ev vekirî ye ku jê re emperyalîzm nayê gotin. Di heman demê de, civakeke neolîtîk ku li herêmeke paleolîtîkê cîwar bibe, dibe ku weke destpêka mêtingehkariyê, jê bête xebardan. Lêbelê jibo hemû serdeman, pêwîst e ev neyê ji bîr kirin ku belavbûna mêtingehî bisînor e. Nifûseke gelekî hindik hereket dike. Tiştên ku herî bêhtir hereket dike, zanîna nû, şeweya teknîk û hilberîna ye, bi vê ve girêdayî heyîna ol û mîtolojiyê ye. Ravekirina dîrokê ya bi koçberiyên mezin, nêrîneke ne rast e. Her serdema serdest, ne bi awayek fizîkî, hê bêhtir bi saya hêza zanîn, teknîk, bîrdoziyî û rêxistinî dibe xwedî taybetiya belavbûnê.

Di mêtingehkariyê de, tiştên herî derbasdar, belavbûneke bazirganî û koçberiyêke fizîkî ku ev pêwîst dike ye. Venêrana navenda serdest, bêhtir ji amûra şidetê, bi serdestiya teknîk û hilberîna ve girêdayî ye. Emperyalîzm bi xwe, hê bêhtir rejîmeke serdestî û dagirkeriyê ye ku bizorê dest liser datîne. Bi hindikayî, di destpêkê de, zor ji emperyalîzmê re bingeh e. Ev çespanîneke dîrokî ye ku sepandina emperyalîst a herî pêşî, ji aliyê Sargon ê ku Xanedaniya Akad a Sumer damezrandî ve hatiye pêkanîn. Lêbelê hê berî jî tê dîtîn ku gundek bi temamî tê dagirkirin. Dema ku dewlemendiya daringî tê ser hev, ya komên cîran ên gelekî hejar, an jî navendên ku gelekî dewlemend û bihêz, vê derê talan û dagir dikin. Di dema koledar û feodal de, emperyalîzm hebûneke gelekî bihêz e. Ev serdem bi xwedayên xwe, bi bîrdozî û wêjeya xwe, bi teknîk û artêşên xwe, di heman katê de, serdema emperyalîst a belavbûn û talanê ye.

Li vir ev yê ne rast be ku em belavbûnê, tenê bi zorê ve girêbidin. Tê çavdêrîkirin ku rêxistinên serdeman yên hilberîn û siyasî, ji sazûmanên civakên berî xwe ne bihêztir bin, ti caran tenê bi zorê, nagihîne hêza belavbûnê. Heger ku têkiliya hilberîna ye di navê de serdest be, zor belav dibe û payîdar dibe. Bingeha zanîn û teknîk a ku hilberîn bi wan ve girêdayî û serdestiya birêxistinbûna siyasî û civakî, dema civaka ku li ser axa wê bizorê niştecîh bûne li gor berjewendiyên xwe bikarbîne, pêdivî bi zorê namîne û herwiha ev belavbûn tê xûnifandin û cîgeyî dibe. Eslê wê serdema nû tê pejirandin. Jibo civakan emperyalîzma herî xeternak, a ku ti sazûmanên pêşverû bi xwe re nayîne û tenê tevgerên dagirker û talanker in. Di dîrokê de gelek tevgerên bi vî rengî hene û tê dîtîn ku roleke gelekî wêranker listine. Em dikarin di vî babetê de, moxolan mînak bidin. Dîrok liqasî belavbûnên ku rola pêşverû leyîstine, bi dagirkeriyên ku rola paşverû jî leyîstine tije ye. Dîsa dîrok li qasî dagirkeriyên ku bi zorê hatine meşandin û hê jê zêdetir jî, gelek dagirkeriyên ku bi saya nixê bilind ên ku bi xwe re dianîn, bi dilekî xweş dihatin pêkanîn.

Di belavbûna sazûmanên civakan de, mijareke din ku tê çavdêrîkirin, di derbarê cîgeyîbûn û resenebûnê de ye. Hêzên dagirker dema ku li cîhên vala an jî li civakên lawaz rast tên, him fîzîkî û him jî çandî cîgeyî dibin û dibine hêza wir a cîgeyî. Heger hêza dagirker, ber bi cîwarbûneke mîna xwe belav bûbe, di demeke dirêj de ev hêz, ji aliyê civaka cîgeyî ve, tê xûnifandin. Tiştê derdikeve holê, sentezeke di asta bilind de ye, lêbelê dexme û bandora çanda cîgeyî li ser e. Berevajî vê yekê, dema ku hêza dagirker navendên şaristaniyê dagir bike, ji aliyê çanda serdest ve, di demeke kin de tê daqûrtandin. Tiştê ku encamê diyar dike, sazûmana li pişt hêza dagirker e, gelo ev sazûman li hember civaka cîgeyî, di derawayeke raser an a rajêr de ye. Rastiyeke din a dîrokê ev e, heger ku kesayeti û civak teslîm bibin jî, çand bêhtir payîdar û berxwedêr in û bi behreyên xûnifandinê nûjeniyê diderînin holê.

Serdestiya civaka kapîtalîst, di sedsalên 17 û 18an de hatiye çespanandin. Peravên Atlantîk ên Ewropa, xwe amadeyî fethandina cîhanê hisdikirin. Her sazûmaneke ku birêxistin dibû, heya dawî bi xwe ewle bû û li şûna şaristaniyên kevin, li navendên xwe derdiketin holê. Ji Qeran Sargon heta bi Dariûs, Skender û Sezar, ji wan jî heta bi fethandinên îslamê, kevneşopiya ku domandî, vê carê jî li peravên Atlantîkyê bi vebîner (kaşîf) û fatîhên Portûgal, Spanyol, Ingilîz û Hollandîyan tê domandin. Sedemên fethandina kapîtalîzmê yên bihêz hene. Di serî de zanîn û teknîkê, dû re sazûmana xwe ya siyasî, civakî û bîrdoziya xwe dikişîne tevaya cîhanê. Sedsalên 15 û 16an, hê bêhtir bi vedîtina cîhanê ya bi rêyên deryayê derbasdibin. Amrîka û Awûstralya, weke du parzemînen nû tene vedîtin. Bi rêya deryayê digihine Hindistan û Hindîçînê. Di sedsalên 17 û 18an de, mêtîngêhên bazirganiyê li her derên cîhanê bi cîh dibin. Li pişt wan , şirketên sermiyan yên bihêz hene. Bûrjûvaziya ku li welatên xwe bi peresîn û şoreşê gihîştîye rêxistinên bihêz û payîdar, gihaye asta ku ne tenê mêl, êdî raman, şeweya jiyane û rêxistinên wê yên siyasî jî hînarde (îxrac) bike. Bi qadên şaristanî yên kevin re, tiştê ji cîhana destlêndeyî xweyî dibe, tê fetihandin. Heta vê demê nêzîkî 15 000 sal, Ewropa ku di serî de ji şaristaniyên Rojhilata Navîn û ji cîhanê xwe xweyî dike, jibo hêrişê li hember bike, xwedî her tişt e. Weke ku bi zanist û ola ku ji derve anî, fêrî tevaya cîhanê bûye, şoreşeke mezin a zanist û teknîkê jî pêkaniye û li hember hemû qadên cîhanê yên din, gihayê cihêrengiyê mezin. Ligor şertên demê, dereke cîhanê ku bi gihîyê ne gengaz e.

Di vê ceribandina Ewropa de, rastiya ku careke din hatiye çespanandin, belavbûna şaristaniyan a ji navendên ku lê çêdibin, ber bi qadên din e. Li her alî, ji pêşveçûnên biteraz zêdetir, çend navend derdikevine holê, sazûmana nû li van deran tê ceribandin. Piştî ku serdestbûna wê tê çespanandin, an bi zorê yan jî ji ber xwe ve, bi bazirganiyê belav dibe. Di belavbûnê de bazirganî, hê ji dema sumerîyan ve, bi hindikayî liqasî belavbûna leşkerî, belkî jî ji wê hê bêhtir û sifftir xwedî rewîşteke fetihker e. Di şeweya belavbûna Ewropa de jî, vê rasteqîniyê xwe nîşan daye. Di sedsala 18an de, belavbûna bazirganî gihaye xala bandevê. Sedsalên 19 û 20an, dema ku bi bazirganiyê re, derbasî hînardekirina sermiyan bûne. Hînardeya sermiyan, di derûna xwe de hînardeya sazûmanê ye. Dema ku tevaya cîhanê, ji şaristaniya kapîtalîst re vebû ye. Li her welatî bûrjûvaziyeke hevkar ku hijmekarî efendiyan dibe, derdikeve holê.

Di dîrokê de, belkî hevkarên yekemîn, bi hejmekariya çanda çandinî ya Aryen yên Heyva Berhemdar, derketine holê. Hevkarên sumerîyan, hê baştir tene şopandin. Ji belgeyên nivîskî xweş tê fêhmîkirin ku heta bi ziman, çand û şeweya jiyane, hevkarên cîgeyî Sumerî lasayî (teqlîd) kirine. Di destpêka şaristaniyê de, Anatolya, Grek, êtalya û Hindistan ji lasakerên (teqlîdker) Sumer û Misir tije ne. Heta ku di perwerdeya rahîbtiya Sumer û Misrê re derbas nebin, di rêyên bazirganiyê re neborin, şeweya jiyana wan nasnekin, xweda qeranên wan heta bi mêjîyê xwe hisnekin, vekirina navendên şaristaniyê yên nû li dera han, derketina ji bandora civaka barbar ne gengaz e. Dema ku belavbûna şaristaniyan bête lêkolîn, pêwîst e ev rastî neyê ji bîr kirin. Li ser şopa Sumer û Misir, pêşî persan û dû re helenan, bi şewandinên şaristaniya bi rengê xwe, dexme li dîrokê xistine. Dewên wan, hê jî di genên me de dijîn. Di dema Roma de, bi taybetî di serdema Paks Romana de, armanca herî mezin ew bû ku bibin hevkarên Roma an jî numûnekeke Roma ya piçûk çêbikin. Di afirandina statuya hevkarên serdest ên cîgeyî de, xêzkeke payîdar hevkarîya bi Roma re ye. Şaristaniyên Bîzansa xiristîyan û îslamê, di belavbûna xwe de, di cîhanê de di afirandina sazûmanên hevkarîyê yên di nimûnakên xwe de, dewên payîdar hiştine. Di encamê de, pêşveçûnên hevkarîyê yên ku bi belavbûnên ji serdema neolîtîk ve girêdayî, bi hînardekirina sermiyan û bazirganiya kapîtalîst re, digihe qada bandevê.

Cîhana me ya ku bi her sazûmaneke belavbûnê re, pêngavên kadîbûnê diavêje, di çaryeka dawîya sedsala 20emîn de, pêngava herî mezin avêtiye. Cîhan veguheriye qadeke belavbûnê ku sînor jê hatibine rakirin. Heta di bikişîna sermiyan de, pêdivî bi bikaranîna zorê namîne. Tê daxwazkirin ku sermiyan bi lavakirîne, bête kişandin. Gengaz e ku em bibêjin cîhan, jibo sermiyan bûye dewletek.

Fethandina sermiyan hatiye tamamkirin. Ji vê û bi şûn de, mezinbûna çendanî û leyîstikên destguhertina domdarî ne.

Dema ku em li cîhên belavbûnê binêrin, hinek çêbûnên hîkarîker xuya dikin. Ewropa ku du şerên cîhanê derbaskirin, gelek şerên navxweyî jiyayî û li derve jî ketibû nava şerên mêtinkariya klasîk, gelekî westiya ye. Eslê wê xwe ji aliyekî ve dikişîne nava cîhanê, lêbelê nûhîn û westandineke mezin ku ji serfiraziya wê tê, dabaşa xeberdanê ye. Piştî şerê cîhanê yê duyemîn, temsîlkerê şaristaniya kapîtalîst, mîna Ewropa nezan a demekê, bûye DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka). Amerîka bakur, hema bibêjin bi tevayî (Pêwîst e Kanada weke eyaletekê bête berdan), dike navend, êdî berfirehkirina belavbûnê û rêvebirin, peywira DYA ya dîrokî ye. DYAyê, şoreşa teknîk û zanîstê kûrtir dike û potansiyeleke ku bikaribe Ewropa jî derbasbike, bi destdixe. Bi teknîka Atom, feza û înternetê, derbasî serdestiyê bû ye. Rêbaza wê ya di warê belavbûnê de, mêtinkarî ye. Rê û rêbazên ku di serî de tên evin: dixwaze ku ji aliyê derûnî ve, para sermiyanê sazûmanên kapîtalîst ên cîgeyî, mezintir bike, ji ber vê yekê jî, derî heta bi dawî li ber tevgera azadiya sermiyan veke, çanda kapîtalîst li hemû deveran belavbike û di vî babetî de, amûrên înfomatîk û çapameniyê heta bi dawî bikarbîne. Herwiha DYA hewl dide ku cîhanê ji nûve bi fetihîne, di vê de jî gelekî bi serdikeve. Dixwaze ku dewleta netewî ya li pêşiya wî asteng, derbasbike û vê pêvajoyê bi temamî li cîhanê rûnîne. Dewleta netewî, weke bermayinên feodalîzmê ku di bûne asteng, têne dîtî, jibo ku globalbûn bê asteng were rûniştin, dive ku bandora dewletên netewî, bête şkandin. Herwiha DYA, weke hêzeke emperyalîst a dawî ya dîroka şaristaniyê, cîhanê bi temamî ji kapîtalîzma gihîştî re vedike û peywira xwe ya dîrokî, bi awayek serkeftî dileyîze. Di sawiya sedsala 20an de, bi serneketina reel sosyalîzmê, ev pêvajoyê hê kintir be. Eslê wê ev pêvajoya ku Ewropa tamamkirî, ew di revîzyonê re derbasdike û restore dike. Bi taybetî bêyî cudakirina rejîman, desteka ku dida hevkarên xwe, çîqa ku diçe bi mfê mirovan û pêşveçûnên demokratîk ve girêdide. Ji xwe dûrbûna kapîtalîzmê ya ji rewîşteke talanker, bi vê ve girêdayî ye. Bikaranîna welatê xwe ya weke mêtîngehekê, weke sepîneke sedsala 19an divête were derbaskirin. Dewleta netewî jî, weke amûreke ku ji vê sedsalê mayî, dive ku jibo sazûmanê têxine rewşeke bikêrhatî. Guherînên di cîhanê de yên di derbarê kadîbûna kapîtalîst de, di vê çarçovê de ne. Pêla kadîbûnê ya dawî ya herî mezin, ji Çînê heta bi Brezîlya, ji Argentin heta bi Tirkîyeyê, ji Rûsya heta bi Endonezyayê, tê dîtî ku yê çandên dewletên Ligor xwe azad jî bigire nav xwe û di demeke kin de, bigihe bandevê û temam bike.

Bi rastî jî gelek birhan hene ku her şaristaniya heyî, digihe rewşeke mîna ya bandevê Him hevberkirinên dîrokî û him jî, bastûra (bunye) sazûmanê ya hundirîn, nîşan dide ku êdî ji vir û wêde, qeyran û çêbûna nû ye. Jibo ku pêvajoya qeyrana sazûmanê were têgihîn, pêwîst e dema belavbûn û gihîştina wê, bi awayek kitekit were dîtî. Belavbûna ji navendê ya ber bi derve de, ji aliyekî ve çespîna gihîştina sazûmanê ye, ji aliyê din ve jî, weke rêbaza ji navêrakerina qeyranên ku rê li ber wan vedike û nakokiyên ku derdikevin holê, di dîrokê de timî tê dîtî. Berhemdariya ku rê li ber vedike, digihîne derve û hê bêtir nîrx û berhemana dide qezenckirin. Mantiqê di bin mêtîngehkariyê de jî ev e. Lêbelê ya herî girîngtir ev e, berê têkoşîna ku liser nîrxên derketine holê pêşvebiçe, bidin derve û nerm bikin.

Di nava hemû sazûmanên şaristaniyê de, civaka kapîtalîst herî xwedî behreye ku vê rêbazê bi kûrayî bisepîne. Di derêxistina derfetên mijokatiyê yên derve û hundirîn ên holê de, di pejiwandina van a bi reklaman de, ser hemû sazûmanên din re ye. Belavbûna bi firehî ji aliyê dîrokî ve hatiye tamamkirin. Li derî fezayê, ti qadên bikar ku fetih bikin nemane. Teknîka ku rê li ber leşkeriya serdest a sazûmana şaristaniya kapîtalîst vekirî, bandoreke berevajî nîşan dide. Bi taybetî NATO ya ku li hember Rûsya hatî avakirin, erka xwe ya dîrokî qedandiye. Teraza toqîn ku bi bombeyên nûkler hatiye damezrandin, derneketinekê îfade dike. Jibo xwe ji vê rizgar bikin, sazûmana fuzeyên mertal ku li ser dihizirin, ji kûrkirina derneketinê wêde, ti rola din na leyîze. Birêxistinbûn û teknolojiya leşkerî, barekî giran û mesrefeke mezin derdixe holê. Bi vê yekê, xwe di rewşeke vala de dibînin. Peyana (teşebus) artêşa Ewropa, niyeta rizgarbûna ji vê derneketinê, îfade dike. Ev artêş hê bêhtir, jibo nelihêvkinên herêmî weke hêzeke mudaxileyê tê hizirandin. Em dikarin bêjine vê, hêza operasyonê ya aşîyê payîdar bike.

Weke me nîşan de, di bîngeha van pêşveçûnên leşkerî de, nûkirina pêvajoya fetihandin û parvekirina cîhanê û tamamkirina wê, bi teraza toqîn a nûklerê jî, gihandina wê ya aramiyê ye (îstîkrar). Pêvajoya piştî wê re, biçêkbûneke di pîvana kêma de û aşî û aramiyê ku kêma biha be, tê armanckirin. Rewşa cîhanê jî jibo vê yekê berbihev e. Berevajiyên ku rê li ber artêşên mezin û teknîkên biha vedikirin, hin bi bin tên derbaskirin. Levdana blokên kapîtalîst-sosyalîst, li paş ma.

Şerên rizgariya neteweyan ên klasîk jî, gihane armanca xwe û rolên xwe anîne cîh. Şerên çînî yên hundirîn, hatine asta ku bi demokrasî û amûrên aştiyane werin meşandin.

Bi van bûyer û pêşveçûnên dîrokî, em dikarin bîlançoya sed sala 20emîn weke serdemeke ku ji hemû serdeman bixwîntir, binirxînin. Ti sedsal weke vê sedsalê ku rê li ber mirinan û wêrankeriyên vekirî tîne ne. Bi wateyêke din mirovatiyê roja xwe ya heşrê jiya ye. Rêzgirtina ji mirovatiyê re, nirxandinên bi vî rengî pêwîst dike. Di dema damezrandina şaristaniyê ya pêşî de, heşra xweda qeranên Sumer û Misrê ya ku tenê bi mîtolojiyê ve girêdayî û cîhana wan a bihişt û dogehê, di sed sala 20an de, li tevaya cîhanê bi hêza zanist û teknîka bêhempa, bi destê mirovkên ku xwe dikin xweda, birastî hatiye afirandin û hatiye meşandin. Dema ku mirov mîtoloji û zanistê hevberî hev bigire, pîrsa kîjan ji wan xeter e, tê bîra mirov. Mezinbûna bîlançoya toqîna ku zanistê rê li ber vekirî, dide nîşandan ku bersiva pîrsê, li dereke din e.

Sed sala 20emîn a kapîtalîzmê, rawestîna li bandevê îfade dike. Ev mîsoger e ku şerên mezin ne pêdivîne û ne jî dibine amûra çareseriyekê. Dema ku were sepandin, ev yê were wateya ku sazûman xwe bi xwe dîkuje. Şerên ji nûve parvekirinê, him ji aliyê zanist û teknîkê ve û him jî, ji ber sedemên sermiyanê ku azadiya bêsinor qezenc kiriye, bêwate, neberhemdar, heta ketiyê rewşeke ku gelek zirarê bi xwe re bîne. Naxwe ev rewş, ne ku ji mirovhezîya kapîtalîzmê tê. Dîsa zagona kar diyarker e. Dema ku kar zêde bike, kapîtalîzm dikeve şerê herî şê. Lêbelê jiberku şer gefê li kar dike, ji ber heman zagonê, vê carê aştiyê ferz dike. Ev teraza ku di navbera kar û teknîkê de hatiye damezrandin, bi awayek berbiçav, şerên parvekirinê nepêwîst dike. Dema ku baweriyê bînin ku yê rê li ber karê mezin veke, ew ji şer na revin. Ev rastî, zora pêvajoyêke derbasbûnê li kapîtalîzma li bandevê dike.

Tê çavdêrîkirin ku hemû sazûmanên şaristanî, di sisê demên dîrokê re derbasdibin: Damezrandin, bisazîbûn û bibandevbûn. Merhaleya damezrandinê, zayînê û pêşveçûnê, ango zaroktî û xortaniyê, sazîbûn ciwantî û bi kasayetîbûnê, bibandevbûn jî dema bitemenbûnê ango ixtiyariyê îfade dikin. Tê çavdêrîkirin ku di dîrokê de, sumeriyên, misriyan, romayan, persan, çîniyan, hindiyên û îslâmê, ev dem bi awayek hîkarîker û bi heman şeweyê jiyane. Hemû sazûmanên şaristanî yên girîng, di demên xwe yên dawî de bi herênayekê re rûbirû dimînin. Rûxandina ku ji kevinbûna wan tê, hewl didin ku bi restorasyon an jî bi nûsaziyan derbasbikin. Li hember hêzên ku dixwazin wê hilweşînin, herdu rêbazan jî bikartîne. Restorasyon, şeweya paşverû îfade dike. Di têkoşîna li hember hêzên ku rola şoreşê dileyîzin de, ku şoreşa hember biserbikeve, dema ku nû hatî damezrandin û rejîma nû tê de dijî, bi navê restorasyon tê binavkirin. Xanedaniya ór a sêyemîn a sumeriyên, dema qerantiya nû ya Misrê û dused salên Roma yên dawî, mînakên restorasyonê ne. Di van deman de, şemla kevin careke din tê pêkanîn, li ser heman bingehê hê bêhtir xwe digirin. Dewletparêzî tê pêşvebirin, rêzik bi awayek hişk tîne sepandin, ber bi sazûmana korporatîfê diçe. Bi têgînkirineke gelemperî em bibêjin, ev rejîmên ku jibo sazûman jevnekevin, tîne pêşvebirin, faşîzm in. Cudahiyên di navbera wan de, ji taybetiyên sazûmanan tîne.

Nûsazî, pêvajoyêke cuda ye. Ji dêvla ku bi zorê bête hilweşandin, sazûman bi hêzên dijber re lihevdiqe û hêdî hêdî sazûmanê diguherîne û bi awayek nû dide şewandin. Tê dîtîn ku di dîrokê de, ev mînak jî gelekî hatiye jiyandin. Di rewşa ku şoreş û şoreşa hember, reda hev nabin, an jî jibo ku pêşiyê li pêvajoyên wêranker û bixwîn bigirin, rêbaza nûsaziyê jênerev dibe. Rewşeke dawî jî, serkeftina şoreşê ye. Li şûna rejîma kevin a ku hilweşiyayî, bernameya hêzên civakî yên şoreşger, bi awayek lezgînî û bi pêşgiriyan bi kok, gav bi gav tê sepandin. Bi awayek himbiz tê dîtîn ku di dîrokê de, gelek guherînên mezin, bi şoreşê hatine pêkanîn. Helbet, jiberku jiyan tenê ne reş û spiye, pêvajoyê û rêbaz di nava hev de tîne jiyandin, derbasbûyînan bi lezgînî ji yekê diçîna ya din û rewşên tehlîhev jî tîne dîtîn. Derbasbûyînan sazûmanan ên bi vî rengî, pêwîst e xweş ji hev werin derxistin, ev yek jibo nirxandinê pêdivî ye.

Heger em sazûmana şaristaniya kapîtalîst, Ligor deman raqetînin, PZ sed salên 12-16an çêbûn û pêşveçûn, sed salên 17-19an bi sazîbûn û belavbûn, sed sala 20emîn jî, bandev û dema ji nû ve parvekirina cîhanê ya bi şer e. Hêman û bi sazîbûn, di herdu demên pêşî de, tê pêkanîn. Merhaleya bandeva her bûyerekê, jibo çêbûnê pişt xwe re, zemînekê pêktînin. Di bandeva sazûmana kapîtalîst de jî, pêşveçûnên bi vî rengî tîne jiyandin. Nakokiyên sazûmanê yên bingehî, qenc digihîjin û sentezên nû di paşla xwe de xweyî dike. Veguherîna nakokiyên a bi levdanê, bi çêbûna ya nû ve girêdayî ye. Seriyên ku hê teze û di nava hev de, hewceyî hev in. Rejîma kevin a qaşûl, hê ne hatiye avêtin. Levdana di navbera wan de, dikare herdukan bixeniqîne. Di vê rewşê de, dema ku herduk li dij qaşûlê sazûmana kevin derkevin û perçe bikin, yê derfetên pêşveçûnê azad bibînin. Li hember feodalîzmê heta bi demên şoreşa bûrjûva, du çînen bingeh, bûrjûvazî û proleterya xwedî

berjewendiyên hevpar in. Piştî serketina şoreşê, bi pêşevaniya çîna bûrjûva û bisazîkirina civakê ya ji nû ve, ev bihevreyî bi dawî dibe.

Mîna keke bisazîbûn û belavbûnê ya tîpîk, Şoreşa Bûrjûvayên Fransa û seferên belavbûnê yên di bin serokatiya Napoleon Bonaperte de ye. Restorasyona bermayiyên sazûmana kevin, ên di salên 1815-1830an de, hêrişê sazûmana feodal a dawî ye. Digel hemû tedbîran jî, bermayînen sazûmana kevin, nikarin pêşiyê li belavbûn û bisazîbûna şoreşê ya li cîhanê bigirin. Ædî li dika dîrokê, merhaleya bûrjûvayên civaka biçîn di meriyetê de ye. Ji bîrûbaweriyê heta bi şewegirtina giyanî, ji aboriyê heta bi siyaset û leşkeriyê, her qad Ligor pêşikiyên çîna serdest ji nû ve tene şewandin. Dem dema ku çîn di kesayetiya xwe de, temenekî bêsinor ji sazûmanê re çêdike ye. Ti tişt tine ku di bin pirsîyariya xwe de nebîne û dest navêjiyê. Hemûkan bi nêrinên xwe dinirxîne, Ligor zagonên xwe dadirizîne û Ligor şeweya jiyana xwe birêxistin dike. Bûrjûvazî ne tenê dipeyive û dihezire, di heman demê de viyana herî rawe ya ku dide meşandin e. Yekîtiya bûrjûvaziyê ya bi çînen karker ku wan xweyî dike re, bi dawî bûye û ketiye dema levdanê. Di bîrdozî, di pratîkên civakî û siyasî de, çiqas ku diçe ji hev dêran xwe nîşan dide. Di vî babetî de, sedsala 19an, sedsala dêran e û zelalbûna nasnameyên çînî ye. Li ser navê bûrjûva lîberalizm û li ser navê çînen kedkar sosyalizma ku wekhevîyê bingeh digire, vebûneke bi lezgîni nîşan didin. Têkoşîna bîrdoziyî, ji têkoşîna di navbera bîrdoziya çîna feodal a bi şeweya olî û bîrdoziya bûrjûvazî ya di bingeha xwe de laîk û pozîtîvist de, derketiye. Lîberalizma bûrjûva û sosyalizma kedkaran, nasnameyên levdana bîrdoziyî yên nû ne. Têkoşîna kedkaran, di dîrokê de yekem car, rêberekî xwe yê bîrdoziyî ku bi bingehê zanistî ve girêdayî, dibîne. Tiştê ku êsa bi Incîlê kirî, Karl Marks dixwaze bi Kapîtalê bike. Li navendên şaristaniyan, sed sal bi têkoşîna kedkaran, tije derbasdibe. Enternazonala yekemîn û duyemîn tên damezrandin. Tevgera nû ya cîhanî, ya kesên ku tînen perçiqandin, hêviyêke mezin a mirovatî çêdike.

Li qadên belavbûnê yên derî navendê, eynî weke demên serhildana qebîleyan, bizavên rizgariya netewî ya civakên pêşveçûyî destpêdikin. Derdor, bi çekên şaristanî yên ku ji navendê peyda kirine, hewl dide ku xwe biparêze û rizgar bike. Di qada bîrdoziyî de neteweperestî, di qada teknîkê de çekên bi agir, bi têrayî hatine bidestxistin. Sedsala 20an, yê bibe şahidê tevgerên rizgariya derdor ên berfireh. Li Rûsya, hevgerîtiya tevgera kedkar û tevgera netewî, yekem car di mercên şaristaniyê de, yê pêngaveke ku wekhevî û azadî ji aliyê hemû kesan ve bête parvekirin, bi serkeftin bavêje. Lêbelê piştî 70 salan, şaristaniya ku bi civaka biçîn a hezar salan ve girêdayî, vê ezmûnê weke xwe diguherîne û bi awayek serketî wê ji nava wê ve dipelişîne. Herçiqas ku ev ezmûn serketî ne bûye jî, di rêya serfiraziyê de, bi dersên ku dane, bûye rawestgeheke girîng ji yên dîrokê. Şaristaniya kapîtalîst, ji vê bûyerê saw digire û yekem car dest bi restorasyoneke cidî dike. Nasyonalizma Alman a ku Hîtler serokatiya wê dikir, bersiveke kapîtalîzmê ya ku ji sosyalîzmê tirsîya bû, di mercên şoreşa dijber de, pêkanîna restorasyonê îfade dike. Bi vê pêngavê, pêşevaniya kapîtalîzmê ji Ewropa dikeve destê DYA. Di pêncî salên dawîya sedsala 20an de, navenda kapîtalîzmê ya herî li pêş, Amerîka Bakur û DYA ye. Dewletên netewî, li tevaya cîhanê nexşeyêke nû çêkirine. Reel sosyalîzmê digel lawaziyên di bingeha xwe de jî, serkeftinên dîrokî nîşan dane. Li DYA û li Ewropa piştî faşîzmê, pêşveçûna demokratîk pêngavên mezin davêje. Ji faşîzma restorasyonê, derbasî demokrasîya nûsaziyê dibe.

Sedsala bîstan, liqasî ku di ti deman de nebe, bi rêbazên emperyalîst û rizgariya netewî, sosyalîst û demokratîk, şoreş û şoreşa hember, restorasyon û nûsazî, derbe û derbeya hember, derbasbûye û weke sedsaleke herî bixwîn di dîrokê de cîh girtiye. Em dikarin bibêjin, ev dem ya ku mirov herî şêr kirine. Di vê demê de, çekên herî erjeng hatine bikaranîn. Hemû bawerî û nirxên mirûz li erdê xistine. Tenê ne nava civakê, derdora xwezayî ku lê niştecih jî, di pêvajoyêke wêrankirinê re derbasbûye. Azweriya (hêrs, çavçilûsî) kar a sermiyan, weke viyana xwedayî ya di bin van bûyeran de, rola xwe dileyîze. Di damezrandina sazûmana koledar a pêşî de, berhema zêdek a bêhempa, xweda-qeran derandine holê. Nirxê zêdek ê sermiyan jî, ev çêbûn gihandiyê bandevê û qeranên bêxweda li serê mirovatiyê kirine bela.

Jiberku sedsala 20an nû qediyaye, nirxandîneke bigelemperî yê zû be. Lêbelê ev yek qet nayê înkarkirin ku bi taybetî şaristaniya kapîtalîst û bi gelemperî hêzên şaristaniya civaka biçîn bi awayek hovane hêrişê berdane xeyalên ku kedkaran jibo cîhanê wekhev û azad dikirin. Hêrişêke bi vî rengî, dema ku şaristaniya Roma li bandevê, hatibû pêkanîn. BZ di salên 70yan de, serhildana artêşa koleyan a Spartakusê Gladîyator, ji aliyê koledaran ve tê perçiqandin û pênc hezar kes bi ristik, li çarmixê (çarsingê) tene xistin. Dema ku gef li dilê sazûmanan tînen kirin, şetiyên wiha bikartînin.

Ev yek rast e ku sosyalîzm, şoreş û tevgerên netewî, bi paşve kişiyane an jî heyamek bi şûn xwe ve hiştine. Lêbelê ev jî rast e ku kapîtalîzma mayî jî, ne kapîtalîzma kevn e. Herwiha ne şoreş bi

serketiye û ne jî şoreşa hember, ne emperyalîzm serfiraz bûye û ne jî tevgerên rizgariya neteweyan. Restorasyon û nûsazî jî, ji serfiraziyê dûr in. Encama sedsala 20an, bi her awayî rewşeke nû ye. Ev yek rast e ku kapîtalîzm, dewletên sosyalist ên kevin jî di nav de, hewl dide ku li her derê pêşvebiçe. Li Çîna ku bi angaştê li ser lingan maye jî, tiştê ku tê sepandin, di bin venêrana dewletê de, pêşveçûna kapîtalîzmê ye. Li tevaya Asya, Afrîqa û Amerîka Başûr, li hemû dewletên piçûk û mezin, dîsa kapîtalîzm weke sazûmanekê hewl dide ku xwe birêxistin bike. Bi kûrayî sepandineke sazûmanê dijî. Lêbelê dîsa xûya dike ku rewş, ji serdema kapîtalîzmê ya di şaristaniya dîrokê de, cudatir e. Bêşik gelek şanîderên ku vê pêvajoyê destnîşandikin hene. Di serî de, şoreşa zanist û teknîkê ya pêncîh saliya dawîya sedsala 20an, tê. Tê çavdêrîkirin ku di veguherîna şaristaniyan de, timî zanistî û teknîkê rola pêşengî dileyîze. Asta zanîn û teknîkê ya nû, jibo kar, rewşên cihêreng afirandine. Teknîka înfomatîk û ya ragihandinê, mînakê ya herî hîkariker e. Sermiyanê ku bê astengî, li her derê dikare kar bike, pêşveçûneke dîrokî ya cuda ye. Di saetên xebatê de hindikayiyên cidî çêbûne. Mêhtingehên kevin, bisînor be jî, xistine rêya pêşveçûna kapîtalîst. Hemû bi sermiyanê darayî ve hatine girêdan. Bi rêya borsayê, sermiyanê darayî di cîhanê de serdest bûye. Ti rêvebirî û hikûmetên ku serî jê re ne danîne, tine ne. Dema kevin, şer jibo kar armanc bûn, lê di rewşa îro de asteng in. Jibo kar, pêdivî bi kapîtalîzmeke ku birêkûpêk bixebite heye. Bêguman, di bingeha van pêşveçûnan de, zanist û teknîkê rola diyarker dileyîzin. Ev ne rast e ku ev hemû pêşveçûn, bi viyane kapîtalîzmê ya yekalî ve girêdayî bin. Di serî de bi reel sosyalîzm û têkoşînên rizgariya neteweyan, mafên kedkarên li navendên kapîtalîzmê yên bi hêz, di zagonên bingehîn de, gihandine pêbaweriyê zexm, bi qezencên xwe yên aborî, civakî û siyasî ku berhemên têkoşîna wan e, bi hindikayî li qasî zanist û teknîkê rolek leyîstine, viyana xwe bi ya bûrjûvaziyê re anîne yek astê. Dîrok şahidê vê yekê ye ku di dawîya sedsala 20an de, ne serfiraziya aliyekî, lihevhatineke herdu aliyên derketiye holê. Di dîroka şaristaniyê de, yekem car e ku hêzên civaka biçîn, her çiqas ku ne di mercên wekhevî de bin jî, di nava aştiyekê de, di bin rejîmeke demokratîk a herî berfireh de, di warê diyarkirina qedera xwe ya serbest de, weke ku lihevkiyane. Şaristaniya demokratîk, ne xeyal e, rastiyek e.

D- Qeyrana şaristanî ya gelemper û serdema şaristaniya demokratîk

Herçiqas ku têgîna "dawîya dîrokê" ne rast be jî, ev nêzîkbûneke rastiye ku em dikarin, behsa dawîbûna taybetiyên bi rewîştê çîna şaristaniyê ve girêdayî, bikin. Heger ku em dîrokê, tenê weke têkoşîna çîn binirxînin, di vî babetê de, têgîna "hatina dawîya dîrokê" jî, yê bi wate be. Bingeha ku esasê wê şaristanî derandiyê holê, hêza teknîka ku civaka neolîtîk afirandiyê. Vê hêza teknîkê, li axa berhemdar û li erdnîgariya ku mercên avdanê heyîn, rê li ber berhema zêdek vekiriyê û zayîna civaka biçîn amade kiriyê. Cudakirina rêvebir û yên tene rêvebirin, çêbûna dewletê gengaz kiriyê. Ev çêbûna civaka pêşî ya li Mezopotamya jêrîn, şaristanîbûnê îfade dike. Ev vekiriyê ku di derûna şaristaniyê de, teknîkê heye. Derfetên pêşveçûna teknîkê ku çêdibin, tê wateya pêşveçûna bi wê re. Teknîka ku di bingeha çîn de, zorê li dabeşbûna civakê dike, rê li ber bandoreke du alî vedike. Di merhaleyê pêşî de, bingeha teknîkê a lawaz, zorê li çînçînîbûneke kûrayî dike. Mirov bi xwe weke amûreke teknîkî tê bikaranîn. Kole bi xwe weke teknîkeke herî pêşveçûyî dibe mijara xwedaniyê, ev yek jî, civakê bi navê kole û xwediyên kole, dike du şîq. Koletiya mirov, encama bingeha teknîkê a lawaz e. Çiqas ku teknîkê pêşvebiçe, cudayiya di navbera asta çînçînîbûnê de jî, yê kêmtir bibe. Di merhaleyên koletiyê yên dawî de, bi taybetî bi pêşveçûna teknîkê û amûrên ji hesin, kûrayiya di cudayiya çînî de, kêmtir dibe. Lêbelê mijara hê girîngtir, girêdana di navbera asta teknîkê û çînçînîbûnê de ye. Zanîna ku teknîkê di kîjan astê de rê li ber çînçînîbûnê vedike, jibo têkoşîna azadî ya civakê, gelekî girîng e. Di vî babetê de, pêşvebirina teknîkê, dibe zemîna dargî ya pêşvebirina azadiyê. Dema civaka kapîtalîst ku hilberîna karxanê, şûna hilberîna manîfaktur digire, di tîkiliyên çînî de, rê li ber guherînên bingehîn vedike. Teknîka karxanê ya pêşveçûyî, tîkiliyêke koletî ya li ser kesên karker, nepêwîst kiriyê. Tîkiliyêke bi vê şeweyê, berevajî hilberîna karxanê ya derûnî ye jî. Hilberîna pêşveçûyî, bisînor be jî, rê li ber karker vedike ku keda xwe, bi awayekê azad bikarîne. Bazargariya kedê ya azad, hêmanekê ji ya sazûmanê ye. Lêbelê zemîna dargî ku ev gengaz kiriyê, karxane ye.

Di dîroka teknîkê de, dema kapîtalîst şahida bûyerên mezin e. Yekem car qutbûna di navbera zanist û teknîkê de, ji holê radikin û vediguherînine kartêkerên ku hev û din xweyî bikin. Bi taybetî di sedsala 20an de, şoreşeke mezin a zanistî û teknîkê tê jiyandin. Di vê sedsalê de, teknîka elektronîk û nûkleerê, li teknîka mekanîkê tê zêdekirin. Bi van herdu teknîkên ku kirine suxreya civakê, hemû nîrxên kevneşopî serûbinî hev kirine. Ev yek bi taybetî, di warê siyasê, dewlet û leşkeriyê de, veguherînên mezin ferz dike.

Dewleta ku weke siyaseta siftbûyî û bisazîbûyî, dahênan û amûreke serdema koledariyê ye. Civaknasiya Marksîst ku dewlet hê bêtir di bingeha kapîtalîzmê de dahûrandiye, di vî babetî de, rê li ber netêrayîyan vekirîye. Yê ku şewe û hêmana dewleta pêşî destnîşan kirine, rahîbên Sumer in. Bingeheke vê ya zanistî tine. Dewleta mîna amûrekê ku mijokatiya çîn a bê teşe dide meşandin, ji bîrdoziya ol paşdetir, bi ramana mîtolojiyê ve girêdayî ye. Ligor çavdêriyên rahîban dewlet, mînaka sazûmana ezmên a sabît a li ser rûyê erdê ye. Xweda çawa ezmên rêvedibe, pêwîst e dewlet jî ser rûyê erdê wiha rêvebibe. Rêvebiriya xwedayan ku bi pîrozweriyê re yek tê girtin, jibo rêvebiriya dewletê jî wiha derbasdar e. Ramana pîrozweriya dewletê, ji baweriyên rahîbên Sumer ên mîtolojîk, heta bi roja îroyîn ku hatiye, nêrîneke herî xeternak e ku mijokatî û çewsandinê diparêze.

Em dikarin bibêjin ku hemû dîroka civaka biçîn, di derbarê dewletê de, ev nêrina Sumer, hê bi hêztir domandine. Her çîna serdest a nû, ev hê bêhtir tekûz kiriye. Belkî jî di nav amûrên kevin de, ya ku nayê guhertin dewlet e. Hê jî di nav rastiyên civakê de, ya ku mirov di derbarê wê de nezan, dewlet e. Digel ku olan bi xwe jî gelek guhertin derbaskirine, dewlet timî bi kemna pîrozwerî hatiye pêçan û parastin. Ji ber girîngiya wê ya jibo çîna serdest û mijok, ev yek tê kirin û wiha tê nirxandin. Nêzikbûnên di warê siyasat û leşkeriyê de jî, ji ber têkiliyên wan ên bi dewletê re, bi vî rengî ne. Dewlet bi erka siyasat û leşkeriyê, sazûmana mijokatiyê ya ku bi bingeha teknîkê û heyîna wê ya civakî rêvedibe. Dema ku pêdivî be, zor jî yê were bikaranîn û ev erka wê yê bête tekûz kirin.

Dewleta ku kapîtalîzmê wergirtiye, bi her tiştên xwe ve çêkirineke rahîbên Sumer e. Her çîna serdest û mijok, jiberku herî bêhtir li pêbaweriyaya dewletê digere û jiberku dizane rojekê jî, bêyî dewletê nikare bijî, perestiyê (îbadet) ji dewletê re dike. Naxwaze ku dewletê pirsîyar bike û dahûrine. Hê bêtir Ligor nasnameya xwe bi cil û berg dike. Ev kevneşopiyeye wisa bi hêze ku dema şoreşa Sovyetê, gelek hêzên ku di angaştaya sazûnaya dewleteke kedkaran de, ji teslîmbûna heman dewleteke rahîban, rizgar nebûne. Ev ne rasthatiniyeye ku dewletên bi şeweya Sovyetê, herî bêtir dişibîne şeweya rahîbên Sumer û Mîsrê. Tiştaya ku şoreşgerên reel sosyalîzmê pêkanîne, perçekirina cil û bergên li dewletê ku ji dema Sumeriyan ve lê hatine kirin. Bi derengî be jî hatiye fêmkirin ku ramana dewleta pîrozwer a ku bi çewsandin û bi zorê dide xebitandin, di bin navê "Diktatoriya Proleterya" de were pêşkêşkirin, bi vê yekê tenê yê xwe ji rê bibin. Perçekirina cil û bergan weke perçekirina wê hatiye fêmkirin.

Dibe ku têkiliya dîktatoriya proleterya, ji aliyê peyvê ve bi kedkaran re hebe, Têkiliya hemû dîktatoriya bi mijokatiyê re heye. Dîktatoriya ku rojekê jî bi dome, dibe amûra mijokatiyê. Tiştaya ku sosyalîzma Sovyetê hilweşandî, şaşiya di derbarê dewlet û dîktatoriyê de ye. Ti caran, pêdiviya çînen kedkar ên ku tînen perçiqandin, herwiha pêdiviya civakan bi amûra dewletê çênabe. Lewra dewlet amûreke ku çîncînîbûne dide domandin e. Sedema hebûna dewletê, civaka biçîn e.

Bi vê nirxandinê, em dewleta klasîk dikin armanc. Em dixwazin bidin nîşandan ku, şeweyên Sovyetê jî di nav de, ev amûr ne hatiye guhertin. Dema ku em di bêjin dewlet ne hatiye guhertin, em li ser hêmana çêbûn û erka wê ya bingeh radiwestin. Di pêvajoya dîrokê de, hebûna şeweyên rêvebiriya dewletên cihêreng, nayê niqaşkirin. Hewldanên gelek şoreşgerên ku ji dil, jibo cîhaneke mirov tê de bê çewsandin, bi wekhevî û azad bijî têdikoşin, çima bi avê de çûn? Ji ber raman û çalakîyên wan ên şaş, ên di derbarê dewletê de bûn. Gelek sazûmanên ku damezrandine, belayên herî mezin anîne serê wan. Lewra heyînen rahîbên Sumer ên herî pîrozwer, bi rastî fêmkirine. Ev amûreke wisaye ku, têgihînen civakê yê telpî (mirdikî) yê herî hişk û bi nezani, lêbelê weke nîşaneke xwedayî ku nikaribe serî lê were girtin, timî di nava taybetiyeye şaşkirin û şewşandinê de ye. Ev heyîna ku herî bi temen, lêbelê bi meqyajên ku çedike, xwe xweşik û ciwan nîşan dide, heyîneke wisa ye ku bi tecrube û ezmûnên xwe herî bi bandor û bi du zayenda ye, ji ber vê yekê jî heyîneke ecêbe ku nayê dabêşkirin. Bi vê gotinê, armanc ne ku em dewletê bi neyînî nîşan bidin. Heta ku rastiya dabêşbûna çîni bidomîne, dive bête zanîn ku ji ber sedemên teknîk, bêyî dewletê nayê jiyandin. Di rewşeke wiha de, daxwaza jiyanêke bê dewlet, encex bi vegerîna serdema kevir an jî bi bûyîna anarşistiyê, gengaz e. Di mercên civakî yê îro de, Ligor ku herduk jî ne gengaz in, jiyan bi dewlet ê bidomîne.

Di vê pêvajoyê de, pîrsa ku pêwîstê bête kirin ev e: Di pêvajoya pêşveçûna kîjan teknîkê de, dabêşbûna çîni, herwiha dewlet û sazûmana şaristanî ya bi wê ve girêdayî, yê na pêdivî bin? Pîrsa ku bête bersivandin ev e.

Ligor ku teknîkê çîncînîbûn derandiye holê, di asta pêşveçûneke diyar de, tiştaya ku wê derbasbike, encex dîsa yê teknîk be. Dîrok dide çespendin ku, her pêşveçûneke teknîkê, cudabûna çînan teng dike û derfetên azadiyê zêde dike. Kesek nikare înkâr bike ku teknîka amûrên hesin, derfetên azadiyê yê mezin dane mirovan. Mînak, jibo gelên ku sûrê erzan bi destxistin, cotkarên ku gêsî li

haletê xwe xistin, pîşekarên ku dezgehên xwe ji hesin çêkirin, derfetên azadiyê yên mezin afirandine. Dîrok ji van mînakên tije ye.

Di vî derbarî de, pîrsgirêkeke din ku pêwîste were çareserkirin eve ku, di bingeha pêşveçûna teknîkê de, rewşa pîşekarbûnê û koordînasyona kar, weke çîncînîbûn û pêşveçûna dewletê nayê nîrxandin. Zêdebûna pîşeyan û pêdiviya koordînasyonê, çîncînîbûna klasîk û bidewletbûnê nepêwîst dike. Rêvebiriya pîşe û koordînasyonê, pêdiviya derbasbûna dewletê derdixê holê.

Encama dîrokî ya herî girîng a şoreşên zanist û teknîka ku di sedsala 20an de pêkhatine, ji holêrakirina bingeha daringî ya çîncînîbûnê ye. Pêwîste ev yek, weke bûyereke dîrokî ya herî girîng bête nîrxandin. Heta ku em bandora vê ya li ser pêşveçûnên civakî, neyînin ber çavan, domandina nêzîkayîyên teorîk yên di derbarê tekilî û nakokiyên di navbera çînan de, yên ku Ligor teknîkên sedsalên 18 û 19an şewegirtin, yê rê li ber şaşiyên girîng veke. Tiştên ku kapîtalîzmê ji feodalîzmê qut dike, pêşveçûnên zanistî û teknîk in. Tê zanîn ku vîna di serî de dewleta netewî, komar û laîktî û gelek sazîbûnên siyasî û civakî, bi xwe re derandine holê. Encameke din a vê bûyerê, rêvekirina wê ya li ber têkoşînên çînî û netewî ne. Dikare were derpêşkirin ku, encamên leşkerî, siyasî û civakî yên şoreşa zanistî û teknîka duyemîn a di sedsala 20an de, yê hê mezintir û payîdar bin. Tiştên ku vê gengaz dike, mezînatîya şoreşa zanist û teknîkê ye. Encamên vê hê nû derdikevin holê. Yekem jevketina blokan e. Belavbûna Sovyetan, encama girîng a pêşî ya vê şoreşê ye. Digel ku hinek sedemên din jî hene, lê ya herî girîng ev şoreş e. Encama girîng a duyemîn eve ku dewleta netewî, girîngiya xwe ya kevin wînda kirîye. Ji xwe sînoran wateya xwe wînda kirine. Ev yek diyare ku teknolojiya ragihandinê, bi awayek derasayî, roleke şoreşger leyîstîye. Çûyîna ber bi civaka zanîne, ji hemû deman bêtir, bi lezgîn bûye. Ænternet bi serê xwe bûyereke şoreşî ya herî mezin e. Bi kurtayî di teknîka mekanîk, elektronîk û nûkleer de, şoreşa ku hatiye jiyandin, ti dahûrandinên teorîk ku encamên wê yên aborî, civakî û siyasî, li ber çavan ne girin, yê nikaribin dema ku tê de dijîn, bi rastî bi nîrxînin. Heger ev nîrxandina rast jî neyê pêşvebirin, bernameyeke siyasîya rast, stratejî û taktîk nayê pêşvebirin. Di van mijaran de, pêdivî bi nîqaşên kûr, bi rexne û xwerexnekirinê heye. Sedemeke girîng a di derbarê qeyranên bîrdoziyî de, lawaziya asta nîrxandinên di vî babetî de ne.

Heger şoreşa zanistî û teknîkê bi awayek jênerev zorê li guherîna civaka bi çîn bike, wê hingê gelekî girîng dibe bê nasnameya bîrdoziyî ya nû û bernameya siyasî pêwîste yê çawa bi pêşve were birin. Dîrok dide nîşandan ku di van deman de, nîqaş û lêgerînên mezin pêşdikevin.

1- Kapîtalîzm bi xwe weke sazûmana şaristanî, di rewşa jevketinê de ye. Ne tenê reel sosyalîzm jevketiye. Têkçûna faşîzmê, têkçûna kapîtalîzmê ye. Têkçûna li mêtîngehan, perçeyekî din ê vê ye. Têkçûna DYA ya li Wîetnamê, têkçûna mêtîngehkariya nû ye. Yên di şerê çîhanê yê duyemîn de têkçûne, eslê wê heyînen herdu sazûmanan ên bi teknîk, zanistî û felsefeya kevin ve girêdayî ne. Ev heyîn hê bêtir, bi şîroveyên ramana felsefî û zanist û teknîka mekanîkê ve girêdayîne. Asta teknîk, sepandinên zagonên mekanîk ên li karxanê ne. Bi awayek zêde pêdivî bi hêza çengê karkeran heye. Asta zanistî encex bikaribe pozîtîvîzmê xweyî bike. Ev yek li holê hate danîn ku bi dozîne (teorî) yên kevin û bi nêzîkbûnên mîtolojîk nîrx dane siyasîyê. Lîberalîzma bûrjûva bi faşîzmê û bi neteweperestiya şoven bi encam dibe, sosyalîzm jî bi dewletparêziyeke ku asta otorîter û totelîteriya wê herî zêde û bi neteweperestiyeke civakî bi encam dibe. Şerê çîhanê yê duyemîn, ne şerekî ketûber e, bi armanca restorasyona şaristaniya kapîtalîst a ketiye pêvajoya qeyraneke kûr ve girêdayî ye. Şeweya korporetîf ku her sazûmaneke civaka bi çîn, di pêvajoya jevketina xwe de, jîbo li ser lingan bi mîne, bikartîne, dişibe dewletparêziyeke gelekî zêde. Ji aliyê din ve, Sosyalîst Enternasyonala Sêyemîn ku bi armanca kapîtalîzmê bi şoreşê hilweşîne hatibû damezrandin, digel ku di şer de tÊkneçûbû û piştî şer di gelek waran de pêşve çûbû jî, ji ber venekirinên bîrdoziyî, ji jevketinê rizgar ne bûye.

Heger bi bal bête nêrîn, herdu sazûman jî qeyrana ku tê de, ne bi serkeftinên xwe, bi rewşa terazê derketine. Tiştên hatî çespendin, tÊgihîna ku kapîtalîzm bi şer heyîna xwe bihêz nake ye û rastiya ku serdestiya bi sînor êdî li paş maye. Bûyereke din a girîng, xeletiya tÊgihîna herdu blokan a ku derketiye holê ye, ya rstir eve ku xeletî û ne tÊrayiyên tÊkoşîna di navbera çînan û gelên bîndest û emperyalîst kapîtalîzmê de, derketiye holê. Encam ne "dawiya dîrokê" ye û ne i serdema dîktatorîtiya proleterya ye, di derûna xwe de bi civaka bi çîn ve girêdayî, qeyrana kûr a ku sazûmana şaristanî, di merhaleya xwe ya dawî de, bi kapîtalîzmê dijî ye. Çespendina vê qeyranê eve ku piştî şer, mirovatî hemû ne gihandine xemla bîngêhîn a daringî û menewî, encamên şoreşa zanistî û teknîkê ku mercan dide dewlemendî û berhemdariyê jî ne kirine suxreya mirovatîyê. Heger bîrdozî û polîtîkayên serdest nebin, bîngêha teknîk ku yê nakokiyên çînî û netewî bê şer çareser bike û bi gihiîne berhemdariyê, amade ye. Lêbelê rêxistinên seresazî yên sazûmanê û tÊkiliyên wê yên xwedanî, astengiyê ji derketina sazûmana nû re çêdikin.

Sazûmana karê çê ya sermiyan, borsa ya navnetewî ye, dema kar a bi rêya borsayê ku kapîtalîzm pêve girêdayî, qezenckirina diravên mezin a bê xebat, îfade dike. Ev tewatera ku sazûman xwe li leyîstika qumarê diqewimîne. Ti amûr wiha xweş nîşan nadin ku sazûmanek, bi vî rengî nepêdivî û nepêwîstiya xwe diyar dike. Ev rewş, ango têtikiliyên xwedaniya ketî, hebûna têtikiliyên hilberîna serdest, tenê rê li ber şeweya qumarê ya ku bandora bi zerar li civakê dike, na sekine, ya ku hê jî bi neyînî, şensê zayîna sazûmana nû timî bi paş ve dixê. Civakê fêrî qezencên hesan (borsa, repo, bono, tahvîl, dovîz hwd.) dike, herwiha bê sinc û kevneperest dibin, wan derdixê hemberî pêşveçûnên afirîner û nûjenker. Sazûmana ku ketiye vê rewşê, ne rewşeke cîgeyî ye, tiştêkî ku bi gelemperî tê jiyandin e. Sermiyanê heyî û bingeha teknîk ku jibo pêdiviyên, derdor, tenduristî, perwerde û kar bête bikaranîn, him cudahiya çîn ê herî hindik bi mîne, him jî çareserîya hemû nakokiyên ku yê derkevîne holê, bi awayekê bê şidet ê gengaz bibe. Mijareke girîng a ku pêwîste li ber çavan were girtin, damezrandina sazûmana şaristaniyê ya bi civaka bi çîn ve girêdayî, çawa bi encameke teknîkê çêbûbe, asta nû ya ji holê rakirina wê jî, bi encama pêşveçûna teknîkê, ketiye rojevê. Teknîk çawa bûbe hêzeke banga şaristaniya koledar, niha jî dibê hêza banga nepêwîstiya civaka bi çîn.

2- Di vê rewşê de, rawestîna li ser xêzkên sereke yê alternatîfa ku pêdiviyê bi keve rojevê, mijareke girîng a di rêza duyemîn de ye. Ev yek diyare ku tiştê pêdivî, ne şoreşên bi xwînin, ya rastir eve ku bingeha teknîk ev rêbaz jî nepêwîst kiriye. Teknîka înfomatîk û ragihandinê ku dikare şivanê li serê çiyê, di kêliyê de, bi telefona destan bigihîne tevaya cîhanê, di mercên ku hemû qedexeyan wateya xwe wînda kirin de, ev yek diyare ku li derî rewşa xweparastina mecbûrî, çareserî û encamên bi xwînrîjandinê, wateya xwe wînda kirine. Ji mînakên li hemû deverên cîhanê tê fêmkirin ku, rêvebiriyên dewletên herî hişk jî, êdî nikarin vê hêza teknîkê bişkinin. Teknîk tenê ji hilberîna berhemdar re, derfetên bê sînor nayîne, di heman demê de, jibo ku astengên siyasî ji pêşiyê rabin, ji aliyê bîrûbawerî û birêxistinbûnê ve jî, derfetên bêhempa pêşkêş dike. Bi vî aliyê xwe jî, rêvebirîya civaka bi çîn, bêçare û nederbasdar dike.

Di nîvsedsaliya pêşî ya sedsalên 19 û 20an de, he berî jî, di pêvajoya dîrokê de, jiberku derfetên teknîkê yê bi vî rengî tine bûn, birêxistinbûnên veşartî, serhildan û şerên domdirêj weke rêbazên pêwîst rola xwe dileyîstin. Di nîvsedsaliya paş a sedsala 20an de, şoreşên ku di dîrokê de yekem car pêkhatin, dawî li vê rewşê aniyê. Hinek zanyar, di dîrokê de sê demên bingeh dihijmêrin. Yekem, şoreşa çandinî û dema civaka gund, Ji BZ 10 000an heta bi 3 000an dema ku dewlet bajarê pêşî derketibû holê didomîne. Duyem, pişekariya bajêr, manîfaktur û dema civaka bajêr ku pişesazî senayî derkete pêş, ji BZ 3 000an destpêdike û heta bi PZ salên 1950an berdewam dike. Dema dîroka nû, ango sêyem, piştî sala 1950an bi şoreşa zanistî û teknîk a herî mezin xwe diyar dike. Ev dabeşkirina bi vî rengî, digel kemasiyan jî, jiberku têtikiliya di navbera hilberîna teknîk û civakê de, bi sedemên wê yê bingehîn nixandiyê, dive ku li ber çavan were girtin.

Ev yek diyare ku, rewîştê çînen heyînen nû yê bi asta zanist û teknîkê ve girêdayî, yê ne diyar bin. Şeweya civaka nû, hê bêtir yê ji aliyê tekûziya pişeyî ve were diyarkirin. Wesfê siyasî jî, yê mîna berê ne diyarker be. Hê bêtir rêxistinên weke endezyariya dezgeh (karsazî) û koordînasyona gelemperî, yê bingeh bête girtin. Pîrsgirêk ne xebitandin û rêvebirina bi zorê ye, Ligor behreyan nixandineke rast a pişeyî û rêvebiriyê berhemdar e. Ya rastir demê bîzorî û bêdilî derbaskiriyê, êdî dem dema ku xebat bi kêf û zewq were kirin û bibe hînbûyîneke jiyane ku bi dilê xwe tevî rêvebiriyê bibin e. Bi wateyê rastî, jibo sazûmana sosyalîst, sazûmana xebatê ku tê derpêşkirin, were derbasdarkirin. Mirovatî, yekem car gihaye bingehê zîstî û teknîk ku sazûmanekê xebatê ya bi vî rengî gengaz bike.

3- Piştî şerê cîhanê yê duyemîn, rewşa dîrokî ya derkete holê, ev yek nîşan daye ku sazûmana şaristaniyê bi siyaseta klasîk û şeweyên dewletê, nayê rêvebirin. Di vê de rola şoreşa zanistî û teknîkê ya diyarker, li holê hate danîn. Sedemêkê din a girîng jî eve ku, asta teknolojiya leşkerî gihayê, ji rê vekirina li ber bûyerên nû wêdetir, gihaye wê astê ku mirovatî yê tine bike. Siyaseta klasîk û têtigihînen dewletan, dane çespanî ku bi derxistina şerên li tevaya cîhanê, behreyên rêvebiriyê wînda kirine, pêwîstiya derbaskirina birêxistinbûnên siyasî, derketiye holê. Bi wateyê rastî, îflasa sincê siyaseta şaristaniya kevin û hêza çareserîya wê, dabaşa xebirdanê ye. Sazî û têtigihînen wan ên bingehîn û têtikiliyên hilberîne yê serdest ku pêve girêdayîne, nedomdariya xwe derandine holê. Bi wateyê rastî, îflasa sincê siyaseta şaristaniya kevin û hêza çareserîya wê, dabaşa xebirdanê ye. Sazî û têtigihînen wan ên bingehîn û têtikiliyên hilberîne yê serdest ku pêve girêdayîne, nedomdariya xwe derandine holê. Bi blokên û rewşa teraza di navbera wan a bi têtigîna nûkleer ve girêdayî de, bi jevketina sazûmana Sovyetê re xuya bû ku payîdar nabe. Ev ê nerast be ku ji vê yekê, encama serkeftina bloka hember, bête derxistin. Vê jevketinê daye çespanî ku, îna di

nederketinê de, nabe çareserî û qeyran, xwedî rewîşteke bi hîm e. Vê yekê îflasa nimûnakên çareseriyên piştî şerê cîhanê yê duyemîn û ne derbasdariya wan, derandiye rastê. Tê fêmkirin ku ezmûna Ewropa ya artêşa piçûk û lêgerînên DYA yên mertalê fuzeyan, ji çareseriyên hîmî zêdetir, armanc derbaskirina rojê û ewlekariya hinek berjewendiyên wan e.

Rastiyên ku van nirxandinên kin daniye holê ev e, êdî demeke derbasbûyinê ya dîrokî pêdiviye. Ev pêdivî, jiberku bermayînen xwedî bandora bi hêz ên sazûmana şaristaniya kevin û pêngava mirovatiyê ya derketinê, hê diyar ne bûye. Di dîrokê de, demên derbasbûyinê yên bi vî rengî, gelekî hatine jiyandin. Heta hinek sazûman di rewşa împeretoriyê de, vê temsîl dikin. Di navbera şeweyên bi rêxistinbûnî yên şaristaniya koledar ên pêşî û bi rêxistinbûnên pêvajoyên bandev û hilweînê de, mînakên demên derbasbûyinê yên hîkarîker hene. Di navbera demên damezrandina împeretoriyên Sumer û Misir ên pêşî û dema împeretoriya Greko-Romen ku gîhabû bandevê de, Hitîtiyan, Hûrri-Mîtaniyan, Fenîkeyiyan û Frîgyayîyan, di her qada pêvajoya derbasbûyinê de, rola kişandina aborî, civakî, siyasî, mîtolojîk, teknîk û zanistî dileyîzin. Qezencên şaristaniya Rojhilat ên mezin, dikişîne Rojava û qadên cîgeyiya xwe. Ji ber vê yekê jî, di rewîştên merhaleya derbasbûyinê de ne.

Mînakeke din a girîng eve ku împeretoriyên Bîzans û êran-Sasanî, rola merhaleya derbasbûyinê ya di navbera şaristaniya koledar û şaristaniya feodal de leyîstine. Herduk jî di navbera serdema pêşî û ya navîn de, di derawayê xelesa jî koledarî derbasbûyîna feodaliyê de ne. Mînakeke din a girîng eve, monarşiyên Rojavayê Ewropa ku di navbera feodalîzm û kapîtalîzmê de, roleke weke pirê leyîstine. Monarşî merhaleyên navbera feodalîzm û kapîtalîzmê, ango şeweyên derbasbûyinê ne. Çarîtiya Rûs û împeretoriya Osmanî jî, digel hinek cudahiyan xwe, mînakên di derbarê pêvajoyên derbasbûyinê de ne. Demên derbasbûyinê yên bi vî rengî, di navbera şaristaniya kevin û şaristaniya ku nû dihîle de, dibe pir, serê herdukan jî di sînga xwe de dike yek. Ji xwe pêdiviyeke felsefeya zanistî eve ku yekîtiyeke serîkê kevin û yê nû, merhaleyêke pêwîst e. Hemû bûyerên di xwezayê de, pêwîste di merhaleyêke wiha re, derbasbibin.

4- Ev merhaleya derbasbûnê ya ku qeyrana sazûmana şaristaniya kevin a kûrbûyî û domdar û derketina şaristaniya nû ya diyarnebûyî, bi navê Serdema Şaristaniya Demokratîk werin bi navkirin ê di cîh de. Di dawîya sedala 20an de, weke rejîmeke lihevkerinê, rejîmên demokratîk ku serdest bibin, ne terciheke kêfî ye, encameke mercên ku tên jiyandin e. Di hatina vî rewşê de, para îflaskirina faşîzmê û totalîtarîzma reel sosyalîzmê, diyarker e. Terciha faşîzma kapîtalîzmê, tenê bi şeweya hitlerparêziyê nayê nirxandin. Ev pêvajoyêke ku rastiya rejîma bi xwîn a kapîtalîzma ku bi temamî paşverû bûye û sermiyanê finansê ku ketiye rewşê serdestiyê, derandiye holê. Tê zanîn ku kapîtalîzm ne tenê li navendên xwe, hewl dide ku di tîkiliyên derdor de û li dewletên qiraxên xwe jî, belev bibe. Faşîzma ku dîrok wê weke rejîma herî hişk nasdike, tîrsa ku mercên hilweşîna wê dide, rewîştên wê ya şoven ku bawerhişkiya olî ya neteweperestiyê jî, li paş dihêle û ji ber îhtimala ku sosyalîzm ê bibe sîstemek derdikeve holê. Di bingehe biserneketina wê de, serfiraziya mirovatiyê ya asta azadiyê û şoreşên zanistî û teknîk hene. Vê rewşê zora azîna (alternatîf) nû li kapîtalîzmê kiriye. Ligor ku serfiraziya faşîzmê ya bi temamî ne gengaz e û weke hilweşînê jî nayê pejirandin, sazûmaneke lihevkerinê ya domdirêj jênerêv dibe. Ev rejîma ku bi demokrasî tê bi navkirin, zêde ne xerîb e. Bi taybetî serkeftinên şoreşa teknîk ê mezin, çespnîna demokrasiyê ya ku rejîmeke herî pêşvedibe, rê li ber ewlekariyê zêde ya kapîtalîzmê vedike. Demokrasî, digel sepandinên xwe yên di destpêkê de ku bisînor, di dawîya sedala 20an de, weke sazûmaneke ber bi gerdûnî ve diçe û weke şeweya rêvebirî û jiyanê ya herî pêkhatî, tê pejirandin û belav dibe.

Reel sosyalîzm ku ber bi totaliteriyê ve diçe, nakokiyê bi hêmana azadiyê ya sosyalîzmê ve derdixe holê. Takekesiya ku li ser navê civakê tê hilandin, herçiqas ku bi arranca wekhevîyê ve bête girêdan jî, dema ku li qasî lîberalîzma bûrjûva afirîner neke, ne serfiraziya wê yê jênerêv be. Di koletiyê de, wekhevîya herî tekûz heye. Tiştên di koletiyê de tine, azadî ye. Ji wê demê ve, hemî çalakiyên mirovatiyê yên girîng jibo hinek azadiya din e. Reel sosyalîzm, rejîma rahîbên Sumere a ku li demê sepandin e. Koletiya pêşî ya pevrayî, rahîbên Sumer pêkaniye. Ev dibe koledariyêke dewletê û gelekî dişibe dewletparêziya reel sosyalîzmê. Divê bila ji aliyê çepgir û divê bila ji aliyê rastgiran ve hatibe pêkanîn, dibe ku suxreya sazûmanên di bingeha dewletê de hatibin damezrandin, jibo wekhevîyê çêbûbe, lêbelê ev bi mîsogerî bi fedakirina azadiya takekes gengaz dibe. Dewlet bi xwe, di mercên civaka biçîn de, înkarkirina azadiyê ye. Weke sepîneke hê bêhtir sift û berfireh bûyî, dewletparêziya reel sosyalîst, azadiya takekes ji kapîtalîzmê paşvetir xistiye.

Serkeftina rejîmên ku azad nakin a li hember rejîmên ku azad dikin, encex bi rêya zorê pêkwerin. Sazûmana Sovyetê, esasê wê di vî babetî de wînda kiriye. Helbet li pişt vî rasteqîniyê, xeletiyên nasnameya bîrdoziyî hene. Heta ku takekes nêzîkbûneke felsefî ya ku nasnameya wî li qasî kapîtalîzmê azad bike pêkneyîne û vîna bi tîgîhîneke wekhevî re neke yek, behskirina ji

şaristaniyeke nû yê şaşiyek mezin be. Piştî ku felsefeyeke materyalist a bê teşe, weke rêbereke jiyane bistine, êdî yê xwe bi sazûmaneke koletiyê re, rûbirû bibîne. Dema ku hebûneke weke jiyana mirov a gelekî tevlihev, daxîne çend klîşeyên materyalist ên bê teşe, yê derî li ber afirandina mirovê ku mehkûmê dozînen xwe, heta bi dawî veke. Ezmûna Sovyet, hinekî jî çespîna vê rastiye ye. Ji her cureyê neteweperestiya ku di sedala 20an de, bi coş bûyin, ji qebîletiya hemdem wêdetir, ne xwedî naverokeke din in. Weke qebîletiya ku ji aliyê wesf û çendanî ve mezin bûyî, neteweperestî ti tevkariyê li şaristaniyeke nû nake. Dema em demokrasiya hemdem dahûrînin, divê ku em bi van rastiyan bingeh lê binêrin. Di terza nûkler a toqîn de, bi dewletparêziya herî totalîter, hemû mirov an dibin leşker an jî dibin karker. Ev pêşveçûnên ku hemû pîvanên civaka biçîn ên ku mirov bikaribe bikişîne, heyînen şoreş û şoreşa hember ê xitimî ne, erka rejîmeke normal nabînin. Bi çêbûnên bi vî rengî, ne ti şoreş û ne jî ti şoreşên hember, demeke dirêj nikarin liser lingan bimînin. Gelek mînanan daye çespanîna ku namînin.

Di derbarê demorasiyê de, gelek terîf dikarin werine kirin. Dikarin li ser rewîştên çîn, lihevkerina wê û aştiwaziya wê, bi berfirehî bête rawestandî. Pêşveçûna wê ya teorîk û pratîk dikare bi kûrayî bête vekirin. Dikare were nîşandan ku bi serê xwe ne sazûmaneke şaristaniyê ye jî. Lêbelê herçiqas ku ne bi têrayî be jî, gengaz e em bibêjin ku, yekem car hemû gelan, çandan, li ser navê tercîhên bîrdoziyî, aborî û polîtîk, bi hev re di nava aştiyekê de pêşveçûn û derfetên pêşbaziyê, pêkanîne. Demokrasiya ku di dawîya sedsala 20an de, serfiraziya wê mîsoger bûye, dikare were diyarkirin ku rewîştên çîn a teng derbaskirîye. Hemû demokrasiyên ku heta vê demê hatine sepandin, dexmeya çîneke teng hildigirin. Em dikarin bibêjin ku heger di şewe de be jî, demokrasiyê hemû hemwelatîyên fermî ne girtine nava xwe û ji şeweyeke rêvebirîya komek hemwelatîyên dewlemend wêdetir ne çûye. Weke demokrasiya Athena ya pêşî, rastiyan çînî bingeh in. Lêbelê piştî sedsala 20an, sazûmana demokratîk a ku mîsoger bûye, di asteke pêşketî de, ev tengayî hemû derbaskirine. Tenê bi berfirehkirina wergirîya çîn namîne, derfetê ramaneke berfireh, bawerî, jiyana çandî, cudahiyan aborî, partîbûnên siyasî, îfadeya azad û bi rêxistinbûnê. Hemû hember, bêyî ku zorê bikarbînin, hindik an jî gelek, xwedî şens in ku xwe biguherînin û pêşvebibin. Di vir de, di qadên çînî û netewî, ramanî û bawerî, aborî û çandî, civakî û siyasî de, têkoşîna hember û hevkarî na qede. Têkilî û nakokî nayên cemidandin. Tenê dema meşandinê ya bi şeweya aştiwaz û bi zagonên derbasdar ve girêdayî derdikeve holê.

Ev mîsoger e ku demokrasî bêhtir derûneke mirovatî hildigire. Ev kevneşopiyekê civaka bi çîn a herî barbar e ku rijandina gelek xwînê, weke pîvaneke egîdî û mezînatîyê tê bikaranîn. Mezinkirin û pîrozwerkirina wê ya bi vî rengî, eslê wê jibo veşartina rastiyeke bi nalet e. Serfiraziyeke ku bi qirkirinên erjeng hatibe qezenckirin, ti caran pîrozwer nabe. Heger ku em ji pîrozweriyekê behs bikin, li derî qolincên zayîne yên jibo xêra mirovatîyê, pêşveçûnên ku bi êşeke herî hindik pêktên, dikarin layîqî vî navî bibin. Herwiha demokrasiya hemdem, di pêvajoya dîroka civaka biçîn de, şeweyên rêvebirîyên wê yên bi xwîn derbasdike, derfetên xwefedakirineke azad dide herkesan, her koma etnîk, olî, zayendî, aborî, siyasî, ji ber vê yekê, şeweya rêvebirî û jiyane ya herî nêzîkî pîrozweriyê ye.

Pêşveçûna demokrasiya hemdem, ji hundire û peresînî ye. Xwe bi encamên hîkarîker na deyne holê. Lêbelê dema ku mirovatî bi xwaze hiş û giyana xwe bi pêşveçûnên afirîner dagire, em dikarin nîşan bidin ku rejîmeke ji vê çêtir nabîne. Digel ku bersiva pîrsa, demokrasî yekem car çima ev qasî pêkhat, hatibe dayîn jî, em dikarin dîsa dubare bikin ku, şoreşên zanistî û teknîkê yên ku derfetên dargî yên derbaskirina qeyrana kûrbûyî û domdar, derandîye holê.

Rastiyeke girîng a ku dahûrandînen me yên şaristanî, hewl didin biçespînin, çêbûna çinan û ji holêrakirina wan, bi zorê çênabe. Li vir herî bêhtir, zerengiya (kapasîte) teknîk diyarker dibe. Dema ku civakek, bi berhemdariya teknîkê derfetên pêşveçûna xwe biçespîne, çêbûna çîn jênerev dibe. Lewra ji vê pêşveçûnê herkes sûd werdigire. Dema ku di destpêkê de sazûmana koletî hate damezrandin jî, mercên jiyane jibo gelek koleyan, Ligora kevin ewlekartir e. Tiştên ku çînçînîbûn derandî holê, ev derfetên dargî ne. Di pêvajoya dîrokê de, hemû diyalektîka pêşveçûna çînî, vê yekê bei awayek rasteqînî diyar dibe.

Herwiha di dema şaristaniya kapîtalîst de, çiqas ku bi şoreşê û bi zorê, jîholêrakirina fizîkî gengaz be jî, ji aliyê rêxistinî ve, çîn ji holê nayên rakirin, dema ku derfetê bibînin, yê ji nû ve bizên, ev yek bi taybetî ji ezmûnên reel sosyalîzmê tê fêhmkirin. Reel sosyalîzmê jî, bi zorê hinek çîn ji holê rakirin. Lêbelê nikarîbû pêşiyê li çêbûna hinek çînen nû bigire. Sedema vê yekê dîsa asta teknîk e. Çêbûneke civakî ku asta teknîk destûrê bidîyê, çêbûneke civakî ku rê li ber pêşveçûna wê vekirî, encex dema ku di asta teknîk de nepêwîst bibe û ji pêdivî derkeve, yê ji holê rabe. Dibe ku çêbûnên civakî bi şoreşê, bi zorê, bi şoreşa hember werin astengkirin, lêbelê ji holê nayên rakirin. Herwiha

di nava civakên ku heyîn de, him bi seresazî û him jî bi binesaziya xwe, encex pêşveçûnên teknîk bikin ku ji holê rabin an jî yê veguherine şêweyê civakî ya din. Şêtbûnên ku berî demokrasiya hemdem dihatin kirin, jiberku ev rêzik li ber çavan ne dihate girtin bû. Ji ber vê yekê him sazûmanên totalîtarîzma faşîst û him jî ya reel sosyalîst biserneketin. Lêbelê teknîka ku pêşveçiçe, gelek pêşveçûnên ku wan dixwest lê pêknetanîn, heçku ku di destê Hîtler de, çekên nûkleerî weke îro gihabane hev, yê kesên ku ne xwesta tine bikira. Lewra bingeha teknîk heye. Ædî pêdivî bi çînen karker û gundiyan ên qerebalix tine. Lewra pêşveçûnên teknîkî, heyîna van çînan di vî babetî de pêwîst kiriye. Di encamê de, ya diyarker ne zor e, teknîk e.

Di vê rewşê de, demokrasiya hemdem dibe rêya herî rasteqîn ku derfetê dide neqandina teknîkê, herwiha pêşveçûnê, him jî di vî bingehî de bêyî ku zorê bikarbîne, di nava xwezayê de û bi şêweyê rêya neqandina civakî, derfetê dide ku ji holê rabe an jî veguhere. Hêza demokrasiyê ya bingeh, ne ji ber yê ku jidil pêve girêdayîne, ev hêz ji rêyên çareserîya rast tê. Xebatên zanistî ku tên kirin, datîne holê ku di navbera demokrasî û pêşveçûna aborî de, korelasyoneke zexm û payîdar heye. Bêşik sedema bingeh a di bin vê de, temsîlkirîna rawestina civakî, ya herî nêzikî sazûmana çêbûna xwezayî ye. Em li vir behsa şêweya xwezayê ya wek a rahîban an jî pêşveçûna bi şîroveya materyalîst a bêteşe nakin. Weke xwe, yê zagonên wê yê resene jî li ber çavan werine girtin. Zagonên veguherîna civakê, encex di nava çarçova teoriya peresîna gelemper de bin. Bûyereke civakî ya li derî wê an jî yeke ku jê derbasdibe, di destê nezaniya mirovan de, yê rê li ber şêtbûnên mezin veke.

Ev yek girîng e ku em, hinek taybetiyên serdema demokratîk ji nêzik ve bibînin.

a- Demokrasiya hemdem: Berhema qeyrana sazûmana şaristaniyê, ew sazûmana bi civaka bi çîn ve girêdayî ku ji dema koledariyê ve çîqa çûye, tekûz bûye ye. Sazûmana dewletê ya bi hemû hêman û rêxistinbûnê, li hember şoreşa zanistî û teknîkê, ketiye nava netêrayîyan. Ev rewş, ji qada aborî heta bi qada bîrdoziyî, serûbinîhevbûnekê îfade dike. Ji hemû hêmanan şik tên kirin û rêxistin bê erk dibin. Li hember vê yekê, sazûmana civakî ya nû, ji berbiçavbûnê dûr e. Kesek nizane bê nasnameya wê ya bîrdoziyî û rêxistinên wê yê bingeh, ên çî şêweyê bigirin. Restorasyona faşîst a kevin û heyînen Sovyetîk ên şoreşgerên nû, dane çespendin ku nabine hêzên çareseriyê. Demokrasiya hemdem şêweya rêvebirî û jiyane ya vê merhaleya dîrokî ye.

b- Şoreşên zanistî-teknîk: Jiyana şaristanîbûn û bi şêweya civaka biçîn, ji lêferzkirinê ango ji pêwîstiyê derandiye. Teknîk ne çîncînîbûna bingeh, bêçîncînîbûnê derbasdar dike. Digel ku şaristaniya biçîn, bi asta teknîkê ve girêdayî pêşveçiçe jî, asta teknîka ku heyî, êdî vê şêweyê li pêşya civakê, astenga herî bingeh dibîne. Teknîk, înkara civaka biçîn pêwîst dike, zorê li civakê dike ku ji civaka biçîn ber bi civaka pîşe ve bibe, ango ber bi kategoriya civakî ve zorê lê bike. Binesaziya demokrasiya hemdem, bi bingeha teknîk a ku civaka biçîn ji mecbûriyetê derdixe ve girêdayî ye. Bi gotineke din, şoreşa teknîk bingeha herî bihêz a demokrasiya hemdem e. Di navbera demokrasiya hemdem û şoreşa zanistî û teknîkê de, girêdaneke diyarker çêbûye. Di ti demên dîrokê yê berê de, pêşveçûnên bi vî rengî, derneketine holê. Herwiha demokrasiya hemdem ne azîneke (vebijark, alternatîf) kêfî ye, bi hêza daringî ya teknîka ku civaka birêxistin û hişmendî gengaz dike ve, girêdayî ye. Herduka jî asta ku hev û din xweyî bikin wergirtine. Pêdiviya van bi hev heye û hev û din pêşvedibin.

c- Jiholêrakirin anjî veguherandina çînan û hemû şêweyê çêbûnên civakî ne bîzorê ne, encex yê bi guherîna asta teknîk û zanistiyê, gengaz be. Liqasî ku çêbûnên civakî bîzorê nayên afirandin, ji holê jî nikare bête rakirin. Di veguherandinê de jî, tişta diyarker ne zor e, bingeha zanistî û teknîkê ye. Dibe ku hinek çêbûnên çînî û civakî, bi awayek fîzîkî ji holê werine rakirin anjî werine çêkirin. Lê jiberku bi zorê ve girêdayî ne, ev li hember hinek zorên din, jiholêrakirinê rizgar nabin. Di bingeha zorê de, nezaniya rola diyarker dilîze. Çiqas ku pratîk û zanist nezaniyê derbasbike, bêwateyiya zorê hê bêtir derdikeve holê. Di dîroka mirovatîyê de zor, berhemeke ku pratîk û zanist pêşneketinê ye. Divê teoriya ku dibêjin, zor pîrikeke civaka li ber zayîne ye, rast bête fêhmkirin. Di qolinca danzayîna dayîkekê de, peywira pîrikê, alîkariyê ku bihêle zayîneke bêqolinc û bi tenduristî pêkwere ye. Lêbelê di dîrokê de, wesfa zorên ku hatine sependin ev e, zarokên ku bi tenduristî zayîn, ango mirovan bêhtir piçûk bike, ji pêşveçûna azad bêpar bihêle, wan têxe nasnameya keriyên pez û gelek caran jî wan tine bike. Bi pîrikêyê ve zêde tîkiliyên wê tine ne, bêhtir bi celadiyê û bi dîlgirtinê re tîkiliyên wê hene. Di dîrokê de bikaranîna zorê ya bê eman û gelekî zêde, peresîna gel a xwezayî derbasdike û zorê lê dike. Paşvema yîna teknîk û pêşveçûna zanist, sedemên vê yê bingehî in. Zora ku di bin fermana şaristaniya civaka biçîn de, di serî de dewlet, encex bi derbaskirina vî bingehî re, yê wateya xwe wînda bike.

Ev dema dîrokê bûye rastiye. Herwiha teoriyên civakê yên şoreşa hember, paşverû û kevneperest, veguherîna bîzorê û tinekirin, ji biwatebûnê derketine. Demokrasiya hemdem, veguherîna civakê ya ligor peresîna xwezayî bîngeh digire, di wê hişmendiyê de ye ku bîngeha vê ya zanistî û teknîk, bi awayekî zexm heye. Di vê yekê de encameke bi vî rengî dernakeve holê ku bibêjin, demokrasiya lihevkiyê zora şoreşger û şoreşa hember e. Nêzikayîyên wiha bimîsogerî çewt in. Di derûna demokrasiyê de, lihevkiyêna bîzorê tineye. Berevajî vê, demokrasiya derêxistinê zorê ya ji rojeva civakê, bîngeh digire. Têkiliya vê yekê bi serîdanîyê re jî tine. Wiha tê bawer kirin ku pêşveçûna herî azad û rast, yê di dorhêlên ku zor lê ne derbasdar be, pêkwere. Herwiha demokrasiya hemdem, xwerexnerkirina hemû heyînen şaristanî yên bîzorê ve girêdayî, pêdivî dîke. Demokrasiya rejîmêke bihîm a xwerexnerkirinê ye. Li hember zorê helwest, ne taktîkî û stratejîk e, hêmanî ye. Hêmana demokrasiyê ya bîngeh, bawerîya bi hebûna demeke dîrokî, ya ku zorê hêmanî dîke ye, bi hêza zanistî û teknîkî digihe vê. Ev hêman, bîngeheke felsefî ya kûr îfade dîke. Stratejî û taktîkên siyasî û rêvebirî bîngeh nagire, vana hê bêtir, weke sedemên pratîkî dinirxîne. Ev nêzikayîya ber bi zorê, rewîştên aştîxwaz a demokrasiya hemdem derdixê pêş. Aştîya civakî, weke şeweya pêşveçûna xwezayî, tê têgihîştin, bi vê tê bawer kirin. Pêwîst e aştî ne weke serîdanîyê bête fêhm kirin. Berevajî vê, wateyeke wê ya ku zorê ji dewrê derdixê heye. Ji civakekê û cîhana şaristanîyê ya bêşer bawer dîke, vê bîngeh digire.

Parastina rewê, hemanêke din girîng a demokrasiya hemdem e. Civakên ku têkiliyên demokrasiya hemdem lê tinene an jî hêrîş li demokrasiyê tînin kirin, di bîngeha parastina rewê de, parastina wê ya hebûna xwe mafê wê ye, him jî mafê wê yê zagonî yê bîngehî e. Serîdanîna ji zagonên ne demokratîk û rejîman re, ne helwesteke demokratîk e. Ev nêzikayî, bi hêrîşa hember, hêzên antîdemokratîk tine nake. Herî bêtir, hişmendîyê civakê ya gelemperî, rêxistinî û mafê pêşandanê domdar dîke û derbas kirina bêmafîyê derpêş dîke. Berxwedana ku tê sepandin, dîkeve mafê parastina pîroz û derûna hiqûqî teşkil dîke. Parastina rewê, biçekbûn jî di nav de, çavkaniya xwe ji hêmanên demokratîk ên hemdem digire. Her çalakiya ku vê derbasdîke, nakeve nava parastina rewê.

d- Di wergiriya demokrasiyê de, ne çîn, komîçk û netewa serdest, civak hemû bîngeh e. Di pêvajoya dîrokê de, gelek rêxistinên demokratîk, bîngehên çîn, komîçk û etnîk derbasnerkirine. Em bibêjîne van demokrasiyên çîna klasîk, yê rastir be. Lêbelê demokrasiya hemdem, berevajî vê, hemû nasnameyên bi civakê re tîkildar rewê dibîne, yekê ji wan jî qedexe nake, mafê wan yên wekhevî û azadî, diparêze. Cudahiyên di navbera nasnameyan de, weke pîrsgirêk nabîne, weke dewlemendiyêke dipejirîne, heta pêşveçûna wan destek dîke. Demokrasiya hemdem bi vî aliyê xwe, sazûmanêke dînamîk e ku, zorê bikarnayîne, bi cudahiyên bîrdoziyî, çandî, civakî, aborî, siyasî, nijadî û zayendî, bi rêxistinbûnê û çalakiyan ve girêdayî ye. Zemîna wê, mozaîkeke civakî ya ku bi vî şeweyî hatiye rêxistin bîngeh digire. Bizavên ku tim an reş an spî derdixîne pêş, weke bizavên ku gefê li demokrasiyê dikin dinirxîne, helwestên rejîmên totalîter û otorîter ên bi vî rengî, ji hebûna xwe re xeternak dibîne. Sazûmana demokratîk, li hember van xweferz kirinan, mafê xweparastina bîngeh digire. Nêzikayîya li civakê ya bi vî şeweyî, hêza demokrasiya hemdem a rasteqînî teşkil dîke. Hemû qismên civakê yên ku dixwazin bijîn û pêşvebiçin, yên bawer dikin ku yê bi hevûdîngirtinê dewlemend bibin, parêzvanên demokrasiyê yên herî bîbiryar, herwiha hêzên wê ne. Di vî babetê de, demokrasiya hemdem, civaka demokratîk bîngeh digire. Her raman, her bawerî û hebûna çandî, di nava civaka demokratîk de, bi azadî bîrewer dibe birêxistin dibe û çalakiyên zagonî pêktîne. Di rewşên ku civak tepisandî be, bîrêxistin û bîbîrûbawerî hatibe hiştin, û ji tîrsa vîyana xwe ne deyne holê de, ji demokratîkbûna civakê nayê xebirdan. Dema ku civaka demokratîk jî nebe, ji demokrasiya hemdem jî nayê xebirdan.

e- Demokrasiya hemdem, dewleta demokratîk pêdivî dîke. Dewleta demokratîk, organên xwe yên bîryar û bîrêvebirinê, girêdayî hilbijartina civakê, peywîrdarkirinê bîngeh digire. Peywîrdarkirinê bi şeweya xanedanî û bi xweferz kirina hêzeke otorîter, yên ku tîkiliya wan bi hilbijartina gel re tine ne, rewîştên dengdana demokratîk a dewletê tîkildar dîke. Teorî û sepandinên klasîk ên dewletê, xwe weke vîyana xwedayî û di ser civakê re dibînin, xwe bi maskeyê pîroz ku ji bavên xwe, an jî ji hinek otorîteyan standin, pêşkêş dikin. Şaristanîya dîrokî bi vî aliyê xwe, dewletê li hember civakê weke dîroka antîdemokratîkbûnê nîşan dide. Ev yek bûye hunera dewletê ku xwe derêxe raserî civakê, civakê binisîne (bitepsîne), xwe veşêre, bide bawer kirin ku ji çavkaniya xwedayî ye û xwe nefêambar bike. Dewleta herî baş, dibe dewleta ku civakê herî bêtir kontrol bike, ligor kêfa xwe bîrêvebibe, bimije û şer pê bike. Şaristanî pêşveçûnê xwe yên girîng di kiryarên dewletê yên bi vî rengî de dibîne.

Demokrasiya hemdem, wesfên dewletê yên bi vî rengî, werdigerîne awayek berevajî. Çavkaniya xwe bi têkiliyên civakê yên tevlîhev ve girêdide, pûte pê dide ku xwe têxe rewşeke vekirî û şefaf, dixwaze jê neyê tirsandin lêbelê bibe amûreke pêbaweriyê, Divê ku pêbaweriyê bide parvekirineke dadmendî (adîl) lê ne mijokatiyê. Bi wateya klasîk, ji dewletê derdikeve. Hewl dide ku sazûmana têkiliyên civakê yên tevlîhev, di asta herî bilind de, ahengdar bike. Di warê ewleyiya gelemper, perwerde, tenduristî, ragihandin û dîplomasî de, yên ku civak ji heq nayê der, weke karên ku neyên xwemalîkirin, biryar û hêza birêvebirinê, vesazîbûneke nû bingeh digire.

Di roja me ya îroyîn de, ji têgihîna dewleta klasîk ber bi têgihîna dewleta demokratîk a hemdem ve, têkoşîneke sift a guherîn û veguherînê tê jiyandin. Rêxistina ku ber bi demokrasiya hemdem ve herî zor tê veguherandin, dewlet bi xwe ye. Bêşik di vê yekê de, para rêxistin û kevneşopiyên wê yên li qasî dîroka şaristaniyê kevin, hene. Lêbelê çiqas dibîne ku li hember şoreşa zanist û teknîkê, nikare zêde liberxwebide, dibîne ku ji veguherandinê pêde ti çareyên din tine ne, herwiha di tevaya cîhanê de, pêşveçûnên bi vî rengî bi lezgînî bûne.

f- Di demokrasiya hemdem de saziya siyasî, ber bi demokratîkbûna dewlet û civakê ve vediguhere, di navbera dewlet û civakê de, rola pirekê dileyîze. Demokratîkbûna siyasî, girîngiyê qezenc dike ku ji dewletê ber bi civakê û ji civakê ber bi dewletê coyên herikandinê pêşdikevin û bisazîdibin. Ev rewş, rê li ber têgîna siyasî ya dînamîk û sepanîna wê, vedike. Demên berê, li derî civakê rola siyasî û organên wê hatibûn diyarkirin û saziyeke zenûn ku rêzikên wê kevneşopîbûyîn bû. Ev rastiyên siyasî, guherîna bizorê ango guherîna biderbeyê ferz dike. Ji ber vê yekê guherîn him bizorê û him jî bixwîn tene pêkanîn. Lêbelê siyaseta demokratîk, bi hîlbijartinên bipergal, bi têgîna partiya piranîparêz, di bin raman û bernameya ku tê xwestin de, bi şensê ku dide her komê û her çandê ku xwe di nava dewletê de bibîne û dibe saziyeke ku guherînen aştixwaz û bilezgînî pêktîne. Him şensê guherînê û him jî rêbaza wê, ji her kesî re vekirî tê hiştin. Ev rewş, jibo partîbûnên demokratîk, lobî û saziyên civaka şarwer (sivîl), li ser organên biryara siyasî, rêya bi bandorbûnê vedike. Qadeke sêyemîn derdikeve holê.

Ev qada ku ez dibêjim, amûrên siyaseta demokratîk, pêşveçûnên nû pêktîne. Di serdemên kevin de, ev amûr jiberku hatine qedexekirin, bi awayek veşartî xebitîne, êdî di demokrasîyên hemdem de, ketina derawayeke jêneger. Di serî de partiyên siyasî û ev saziyên ku bêhtir di warê pişeyî de xuya dikin, weke aborî, çandî, hunerî, civakî, sportîf, zanistî, derdorî û di qadên teknîkê de, bitevayî bi 'saziyên civaka şarwer' tên bi navkirin. Saziyên civaka şarwer, weke amûrên pêşveçûna civakî yên herî girîng, di navbera dewleta klasîk û civakê de, amûrên demokratîk ên herî jêneger in. Ev yek girîng e ku bi 'qada sêyemîn' tê bi navkirin. Di dîrokê de, qada sêyemîn yekem car bi vî şeweyî derdikeve holê. Ji ber vê nûbûn û giringiya wê ye ku wesfê şaristaniya demokratîk daye serdemê

g- Di pêşveçûna demokrasiya hemdem de mafê mirovan û azadiya jinê, mijareke ku herî girîngiyê bi xwe re tine ye. Evê nixandineke bi kêmayî be ku mafê mirovan û azadiya jinê weke saziyeke civaka kapîtalîst were dîtin. Berevajî vê, mafê mirovan û azadiya jinê, di pêvajoya derbaskirina şaristaniya kapîtalîst de, bi diyarbûna ku rêvebiriya wê ya kevneşopî û rastiya jiyana wê ne bi têrayî, pêşveçûne. Mafê mirovan û azadiya jinê, du perçeyên bingehîn ên demokratîkbûna gel in. Çiqas ku çarçova şaristaniya klasîk tê derbaskirin, şensê pêşveçûnê zêde dibe û di rêya ku ber bi pêşveçûna şaristaniya nû ve diçe de, dibîne du heyînen bingeh ên ku pêvajoyê diyarker bikin. Ne berhemeke mercên civaka kapîtalîst in, berhemên pêşveçûna civakî, yên ku ew bi şûn ve hiştin e. Bi vî aliyên xwe, di wî wesfî de ne ku bersivê bidine pîvanên demokratîk yên hemdem. Pêşveçûna demokrasiya hemdem, xwe herî bêhtir di mafên mirovan û azadiya jinê de nîşan dide. Wisa xûya dike ku di diyarkirina derketina şaristaniya nû de, herdu mijar ên rola sereke bileyîzin. Di pêvajoya dîrokê de, mafên mirovan û azadiya jinê ku ji deftera civaka biçîn hatibûn derxistin, weke qadên nûjenbûnê berendamên pêşveçûyînen mezin in. Çarçova zagona şaristaniya nû di bingeh de, mafên mirovan diyar dike, zemîna wê ya civakî jî, yê ji aliyê azadiya jinê ve were teşkîlîkirin. Pêşveçûna di van herdu qadan de, yê peresîn û kûrbûna demokrasiya hemdem, diyar bike.

h- Di warê bingehên felsefî yên şaristaniya demokratîka hemdem de vekirîbûn, ji aliyê bawerîbûn û tevlîbûna hişmendî ve, pir girîng e. Demokrasî ne sazûmaneke wiha bê hêman e ku ligor berjewendiyên her qismî bête şîrovekirin. Xwedî nêrîneke cîhanê ya birêkûpêk e ku felsefeyeke wê ya bi zanist ve girêdayî, bi hêman, bi bername û têgihîna wê ya çalakî heye. Rêzika wê ya materyalîzma diyalektîk a bi hebûna dijan, yekbûn û veguherîna wan ve girêdayî, palpişt (spartek) demokrasiya hemdem a herî bihêz e. Dijîtiya bingeh a demokrasiya hemdem, dijîtiya ku rastiyên şaristaniya bi civaka biçîn a kevin ve girêdayî û rastiyên ku çêbûnên şaristaniya nû derandine holê ye. Ango em şaristaniya kevin weke têz, şaristaniya nû jî weke antîtêz binirxînin, sentêza ku yê derkeve holê yê merhaleya pêvajoyê ya dawî be. Jiberku demokrasiya hemdem di destpêka

pêşveçûna xwe de dijî, çêbûnên şaristaniya kevin zêdetir in, lê jiberku di nava qeyranê de ne, rûxyane û bêhêz bû ne, digel vê yekê, çêbûnên ku zorê li pêşveçûnên şaristaniya nû dikin hindikin, lêbelê jiberku pêşerojê (pêşedem, dahatû) temsîl dikin, ciwan, zindî û bihêz in. Bi saya hebûna mercên teknîk û krîterên demokratîk, yê were pêkanîn ku bêyî zoreke ku ev hêzên dijber li hev bikin, hê bêtir bi zoriyên mîna qolincên zayînê, yê bi sentêzeke di asteke bilind de, bi encam bibe.

Ev hêmana felsefê ya bingehîn, tê wateya têgînên çêbûn, têkilî û vegûherîn ên ku demokrasiya hemdem bi wan dide. Materyalîzma diyalektîk a dîrokî, digihe sazûmaneke civak, siyaset û dewletê ku ji demokrasiya hemdem re vekirî û bikaribe bête sepandin. Sazûmanên girtî yên bi zora bêteşe ve girêdayî û bê peresîn ku ji nêrînên materyalîst ên bêteşe û îdealîst tên, civakê, siyasetê û dewletê dixin nava bêçareseriyên, dirûxînên. Lêbelê dîsa di encamê d, jevdikevin û nikarin ji rêzika diyalektîka dîrokê birevin.

Di encamê de, serdema şaristaniya demokratîk; vê yekê îfade dîke ku, serdemên şaristaniya biçîn, bi peresîna zanist û teknîkê bitemamî ne hatine derbaskirin, pêvajoyeke dîrokê ya domdirêj tê têgînkirin ku ya nû jî hê qenc ne hatiye diyarkirin. Nû û kevin di nava hev de, lêbelê derpêşdikin ku bi şêweyê aştxwaz veguherînê pêkbînin. Asta teknîka heyî, di vê nêrînê de ye ku, bêyî serîlêdana zorê, jibo zemîneke dargî ji hemûveguherînan mercên gelekî bikêrhatî pêkanîne. Vê yekê derdixe pêş ku, dewleta klasîk û civaka girtî hatine derbaskirin, weke qada sêyemîn civaka şarwer çalakî bi dest xistiye. Di navbera qadên yekem û duyem, dewlet û civakê de, derketina qada sêyem a civaka şarwer, rêvebirîya federatîf û şêweya jiyana wê derdixe pêş. Cudahiyên bîrdoziyî, aborî, civakî, etnîk, zayendî, nijadî û siyasî, weke dewlemendiya civakê tên hizirandin, her kom weke xwedî îfadeya azad, bi çî hişmendî û rexistinî bi xwaze, dikare tevî jiyana civakî, aborî, çandî û siyasî bibe. Êfadeya herî rast a bi vê şêweya rêvebirî û jiyane, gihîştina dewlet û civakê ya saziyên di bingehê federatîf de ne. Çiqas ku şêweya rêvebirî û jiyana monolîtîk, otorîter û totalîter, berevajî nixê demokratîk ên hemdem tê, ewqasî jî şêweya federatîf û jiyana wê ya bi saziyên civaka şarwer ve girêdayî, li demokrasiya hemdem tê. Bi vê ve girêdayî, dema ku em serdema me bigelempêrî bi têgînbikin, em dikarin bibêjin Serdema Federasyona Demokratîk a Cîhanê.

5- Bi civaka biçîn ve girêdayî, şêweya dîrokê ya ku herî dawî girtî, serdema şaristaniya kapîtalîst e. Di dema hilweşîna wê serdemê de, bûyera herî girîng a derketiyê holê ev e ku, li derî mercên parastina rewa ya şoreşên zanist û teknîkê yên pêkhatin, di veguherîna civakê de, rola zorê nederbasdar kiriye. Heçku di dîrokê de zor, ji bilî di suxreya hêzên serdest û mijok de rûxandinan pêkbîne pêve, bikêrî tiştêkî din nehatiye. Qismên rêvebir ên di tîrsa ku ji rewîştên dizîya xwedaniyê digirin de, jibo ewleyîya xwe zor dîtine û zor pîrozwer kirine, pêdivî dîtine ku bi gelek çîrokên qehremaniyê, timî bilind bikin. Heta di mîtolojiyên pêşî de, xwedayên ku qet bizorê nizanin, bi pêşveçûnên civaka biçîn re, bi taybetî di serdema feodal de, navên herî cîza didin û qehrdikin, werdigirin.

Rola zorê, di veguherînên civakî de, ne liqasî ku tê texmînkirin e. Di demên pêvajoyên qevastina civakî ya çawanî de, jiberku astengiyên kevneperestî werin derbaskirin, zor roleke veguherînê dileyîze. Çalakiyên zorê yên bi vî rengî, qevastineke domkin û çawanî pêktînin, lêbelê dû re, tene derbaskirin. Heçku di pêvajoya dîrokê de, zora ku bi şêweyên fethandin, dagirkirin û talankirinê pêkhatî, bêmafîyên mezin bi xwe re anîne, rê li ber wêrankerî û rûxandinên mezin vekiriye. Jibo vê yekê vêsêrin jî, tê gotin ku ev çalakiyên bi vî rengî fermanên xwedê ne, heger bimirin bi şehîdbûn û bimînin bi xazîbûn tên pîrozwerkirin, ev jî têrêneke, bi xenîmetên mezin tên xelatkirin, herwiha dîrokeke wiha ya bi nalet tê nivîsandin. Yên bi vê wateyê hatine nivîsandin, weke dîroka herî binalet tên nixandin, bilindkirina stembaran (mezlûm) a weke wijdanê mirovatiyê yê rast û qehremanên kedê, tê wateya nivîsandina dîroka rast. Parastina sazûmanên pêşverû û pêşvebirina wan, bi mercên ku ji derûna wê ya rast re dilsozbin, xwedî bilindayîyeke bi vê şêweyê ye.

Dahûrandinên zor ên dîroka şaristanî, ji çekirineke rastî dîr in. Tiştê ku dexma xwe li dîrokê daye, bandora giran a nêrînên bîrdoziyî, olî û felsefî ne ku bilndkirina çîna serdest û mijok bûyina wê ya rêvebir, îfade dîke. Bi bandora van nêrînan dîrok, bi awayek bêmafî xwediyên rolê yên herî rast berevajî nişan dide, bûyerên ku bi rastî jî yên bibin dîrok dîrîçav digire. Herwiha ji deqên wêjeyî yên spekulatîf ku herî xeternak pêde, tiştêkî îfade nake. Berî her tiştî pêwîst e ku dîroka wê dîrokê ya bi rastî were nivîsandin. Heger ku ev peywîr bi serfirazî were cîh, encex wê hingê, şensê nivîsandina dîrokeke dahûrîner derkeve holê. Belkî jî di dîrokê de, bêmafîya herî mezin, bi nivîsandina dîroka bi vî rengî hatiye kirin e. Ya herî neyînî, herikandina bêmaf a zîncîra çalakiyên kes û saziyên ku bi navê dîrokê dilivin û di bandora wê dîrokê de mane. Dîroka ku çewt hatiye nivîsandin, timî çewt dide kirin. Ji ber vê yekê mercên pratîkeke rast, têgîhîneke dîrokê ya rast e. Têgîhîneke rast a dîrokê jî, pêngava destpêka dahûrandina şaristaniyê ya rast e.

Bi vê parastinê ez hewl didim ku, di pêvajoyeke bê eman de, heger di asta pêşnûmayekê de be jî, tevkarîyêkê li dîrokeke rast û çareserîya şaristaniyê bikim. Dema ku bêmafîyeye mezin û kompoyek li holê hebe, karê ku herî pêşî were kirin ev e ku, bîngeha bêmafî ya dîrokî û şaristanî derînim rastê, herwiha maskeyên wan kompovanên nêmerd ku qaşo dîrokê çêdikin daxînim jêr. Ev yek yê were wateya parastina mirovatîyê ya mezin ku, xwedîyên vê kompoyê yên li navendên Rojhilat û Rojava yên girîng û nêrînên cîhanê yên li pişt wan û jiyana wan ya rezîl derînim holê. Herî dawî, pêvajoya ku serdema şaristaniya kapîtalîst jiyayî, bûye mijara hinek nîrxandinan. Yên ku xwedî nêrînên dîroka kevneperest, vê demê weke 'dawiya dîrokê' dinîrxînin, yên ku bi nêzîkayîyên şoreşgerî lê dinêrin jî, weke 'serdema sosyalîzmê' dinîrxînin. Felsefeya li pişt van herdu nêrînan, jibo ya yekem îdealîzmeke rawestiyayî, jibo ya duyem jî, materyalîzmeke bêteşe ye. Ev hemû jî, ji dîtina tevliheviya serdemê û dahûrandina wê dûr in. Nêzîkayîyên şaristaniya postmodern jî, nêrînên bêdilî yên bi zêdeyî pragmatîk ku ketine nava jiyanê rojîkî de ne. Ev nêzîkayîyeye rast e ku, şoreşên zanist û teknîk, pêvajoyê bi kûrayî diyarker dîkin. Bîngeha dîringî ya pêşveçûnên ku veguherîna hemû sazûmanên civakî diyarker dîke, asta teknîka ku gihîştinê ye. Lêbelê ev nayê wateya ku teknîk bi serê xwe veguherîne bike. Li vir tiştê ku pêdivî ye bikeve dewrê, pêvajoya nasnameya bîrdoziyî ye. Heger ku zayîna bîrdoziyî çênebe, derbaskirina sazûmana kevî û derketina sazûmana nû qet pêknayê. Em dikarin vê bişîbînine vê yekê: Heger ku zevî nebe tov şîn nabe. Em zevîya vekirî ya nû bişîbînine teknîkê, tov jî dişibe nasnameya bîrdoziyî.

Nasnameya bîrdoziyî ya serdema kapîtalîst, PZ di sedsalên 15 û 16an de, bi Ronesanê şêwe girtiye. Jiberku em gelekî li ser rawestiyabûn, careke din dubare nakim. Di sedsalên 17., 18. û 19an de, pêşveçûna xwe ya herî mezin, bisazîbûn û belavbûnê pêkaniye û qedandiye. Ev mijar jî bi xêzkên stûr hatine nîşandan. Di sedala 20an de, jibo ku ji qeyranê derkeve, bi şerên parvekirinê tê birewiştîkirin. Lêbelê ev hatiye çespendin ku bi du şerên cîhanê û gelek şerên herêmî, sazûman bi rêbazên klasîk xwe domdar nake. Şêweya kevî a mijokatiya kedê, sepandinên klasîk û mêhtîngîyên nû, xwe ji derbasbûyîne rizgar nekirine. Lêbelê ev nayê wateya ku şaristaniyeye nû ango weke tê angaştîkirin, serdema sosyalîst destpêkîrîye, hê bêhtir tê wateya ku hilberîn, parvekirin û rêvebirî veguherîne. Ev rastî hê bêhtir di dawîya sedala 20an de zelal bûye û weke şaristaniya demokratîk tê terîfkirin.

Di pêvajoya demokratîk a hemdem de, sazûmana kapîtalîst ji holê ranabe, lêbelê ew serdema serdestiya berê ya bêsinor, li paş hiştiye. Serdestî, mijokatî û şêweya jiyana wê bi asteke li pêş, tê bisînorkirin. Krîterên demokratîk a hemdem bi xwe, pêşîlêgirtin û binisandina kapîtalîzmê yên parvekirina hêza wê ya mijokatî û rêvebirîyê, bi kedkar û gundiyan re ye.

Bêguman digel ku têkoşîna kedkar û gelan di vê yekê de rolê dilîze jî, encex ev yek bi pêşveçûna teknîkê ya herî pêşketî de, pêkhatîye. Di pêvajoya dîrokê de, kedkar û gelan têkoşînên mezin dane. Lêbelê pêş li mijokatiya desthilatiyan a di asta bilind de, negirtin. Kartêkera girîng a di vê de, ne têkçûna wan e. Jiberku asta teknîkê derfetên parvekirin û tevkarîyê nedida wan bû. Encex di pêncîh salên dawîya sedala 20an de, dema ku şoreşên mezin ên zanist û teknîk, li ser desthilatiya siyasî û berhema zêdek tene asteke ku derfeta parvekirina ji nû ve û tevkarîyê çêbikin, mercên berbiçav ên bisînorkirina mijokatî û desthilatiyê, derdikevî holê. Demokrasiya hemdem, piştî van mercên berbiçav, pêngavên mezin davêje. Him ji aliyê nasnameya bîrdoziyî û him jî ji yê bisazîbûna siyasîyê ve, xwebisazûmankirina wê, bi van mercên berbiçav ve, girêdayî ne.

Herwiha demokrasiya hemdem, tê vê wateyê ku hemû mekanîzma û sazîyên mijokatî û rêvebirî yên şaristaniya kapîtalîst, ji aliyê kedkar û komên gel ve, jibo parvekirin û tevkarîyan ji nû ve werin birêkûpêkirin. Di vê sazûmanê de, ne kapîtalîzm bi serê xwe mijokatî û rêvebirîyê bi dest xwe dixê û ne jî, gel û kedkar sazûmana kapîtalîst hildiweşînin û sazûmana xwe ya şoreşger disepînin. Berevajî vê herdu alî jî, utopyayên xwe yên hişk û yekalî bisînor dîkin. Jiyanêke Ligor mercên dewleta demokratîk a hiqûq û di nava aşitiyê de, bîngeh tê girtin. Berhemdariya ku teknîkê rê li ber vekirîye, nîrxê zêdek û hemû hilberînên nîrxên di qadên din de, bi bikaranîna mekanîzmayên siyasîyê yên demokratîk, ji nû ve tên parvekirin. Ji ber vê yekê jî, mafê tevlihbûna desthilatiya siyasî jibo her beşî tê dayîn. Herçiqas ku hinek deman zorî û hişkbûn çêdibin jî, lihevkarîna li ser vê sazûmanê, ji windabûneke di nava levdanan de, çêtir tê girtin. Ya rastir ev e ku teknolojiya çekan a pêşketî ku dikare mirovatîyê bitemamî tine bike, bi vê ve girêdayî, nêrevîna ji hêriş û şerên fethandinê ku yê bi herkesî bidine windakirin tê.

Di nava pêvajoyeke wiha ku bîngeheke berbiçav qezenckirî de, ev yek diyar e ku kapîtalîzm nikare şêweya xwe ya klasîk ferz bike. Asta azadiyê ya ku him bi teknîk, him jî bi têkoşîna kedkar û gelan hatiye qezenckirin, gihaye wê asta hişmendî û rêxistinîyê ku destûrê nade vê yekê. Pêvajoyeke nû dabaşa xeberdanê ye ku ne tercîhên kêfî, mercên heyîn wê diyarker dîkin. Ev rastî, razîbûna

kapîtalîzmê ya bi veguherîna demokratîk e. Kapîtalîzm ji dêvla ku bi xwînrijandinê qezenc bike û tine bibe, pêdivî dibîne ku di nava pêvajoyeke peresînparêz de, qezenc bike û heta bikaribe parvebike. Bi van yekan ne kapîtalîzma klasîk vedigere rojên kevin û ne jî bi şoreşan tine dibe.

Di nava pêvajoyê de, çiqas ku şeweyên şaristanî yên nû pêşvebiçin, tê bawerkirin ku veguherînek çêdibe. Bingeha vê dîsa di pêşveçûna zanist û teknîkê de tê dîtîn. Di dawiya sedsala 20an de, di bingeha bandora demokrasiya hemdem a hevqasî de, dîsa bersiva wê ya resteqînî ku dide vê pêvajoyê heye. Teknolojiya înfomatîk û ragihandinê ya ku derfetên hişmendiyê bêhempa daye civakê, hêza ku civaka şarwer a weke qada sêyemîn a mezin, qezenckirî û vebûna siyaset û dewletê ya ji kanalên demokratîk re, liqasî ku derfetê nedine çînî, tevlihev û bihêz e. Civaka ku demokratîk dibe, ewqasî pir reng e ku nikare herêna ya reş an spî hilgire. Heger ku gelek sazîyên teknîk û pişeyînebin, tenê bi rêvebirîya siyasî, karên civakê rojekê jî nayê meşandin. Ya herî bingehî, takekesê ku azad dibe, ji ber sedemên teknîk, êdî bi têgihîna otorîter û totalîtera klasîk, nayê birêvebirin.

Di encamê de, şaristaniya kapîtalîst di nava pîvanên demokratîk de, xwe ji nû ve dide terîfkirin, hewl dide ku nasnameyêke bîrdoziyî qezenc bike, di hemû sazîbûnên aborî, civakî û siyasî de, bi beşên civakê yên têkildar re, lihevdiqe û bi vê ve girêdayî, şeweyêke rêvebirî û jiyanê dipejirîne. Ev rewş dide çespendin ku serdemên mijokatî û serdestiyê yên bêsinor li paş mane û dide nîşandan ku pêşveçûnên şaristanî yên nû ketine rojeva dîrokê. Bêşik di diyarkirina çêbûnên şaristanyên nû û têkiliyên wan de, pêşveçûna zanist û teknîk, bingeha mercên berbiçav teşkîl dike. Bi vê zemînê ve girêdayî, çêbûnên nasnameyên bîrdoziyî yên afirîner, çêbûnên rêxistinî yên ku yê bikaribin rewîştî qeyranên bingehê serdemê, bidin derbaskirin, yê çêbibin û pêşvebiçin.

6- Bîrdoziya sosyalîst û sazûmana sosyalîst a ku rê li ber vekirî, ya ku li hember sazûmana kapîtalîst çêbûyî, biserfirazî nehatiye rewşa şaristanyêke cihêreng. Divê bila ji nasnameya wê ya bîrdoziyî wer, an divê bila di encama zayîneke nû an jî çewtiyêke ku kirî de be, daxwaziyên kedkaran û gelan ên azadî û wekhevîyê veneguherandiyê çêbûneke şaristanî ya cihêreng. Digel angaşten di vî derbarî de, di encamê de ji kapîtalîzmeke dewletê wêdetir neçûye. Di dîrokê de, gelek bizavên bîrdoziyî û tevgerên civakî yên bi vî rengî hatine jiyandin. Herçiqas ku di bingeha olî de be û bi sazûmanên qebîleyan ve girêdayî be jî, derketinên Hz Brahîm û Mûsa, bi rewşa xwe ya pêşî, sosyalîzma qebîleyê ne. Li Rojhilata Navîn a di serdema pêşî de, civakên ku serdestiya Asûr ew serûbinîhev kirin, cîhên wan daye guherandin û ew kirine nava toqînê, encex bi şeweya terîqetên mîstîk û sazûmana jiyaneke pevrayî, hebûna xwe berdewam kirine. Sazûmanên rahîbên Misir û Sumer ên pêşî, mînakên pêşî û pîrozwer ên sosyalîzma dewletê ne; sazûmana aboriya dewleta ku dişiba sazûmanên Sovyetê, rêya şaristanyê vekirine. Di civaka neolîtîk a berê de, di nava civakê de, li dora jina dayîk, bitemamî sazûmanêke civaka komunal hatiye çêkirin. Ev sazûmana civakî ya ku em dikarin bibêjin sosyalîzma hoveber, liqasî ku dewletê nasnake jî, bi hezaran sal domandiye. Mirovatiyê haveynê xwe yê bingehî, ji vê sazûmanê standiyê, bi têgîna bihişteke ku xeyalên wê yên azadî û wekhevîyê xweyî bike, timî xwestiyê ku bi bîr bîne.

êsa û tevgera xiristiyantiyê ya sêsed salên pêşî, bi domandin wergiriya xwe, mîna keke sosyalîzma olî ya herî rewneqdar e. Hînkêrên vê demê, pratîk û bîrdozî di kesayetiya xwe de, wisa temsîlkirine ku heta wê demê di dîrokê de, mînakên wiha kêmtê dîtîn.

Derketina îslamtîyê mîna keke şeweya komunal a bijarte ye. Wekhevî û rêzgirtina di navbera endamên wê de, bi şeweya malbateke pîrozwer e. Omet bi rewşa xwe ya saf, şeweyêke sosyalîzmê ya dema feodal e. Him xiristiyantî û him jî îslamtî, piştî ku bidewlet dibin û rola kesan û xanedanan zêde dibe, ji sosyalîzma ometê dûr dikevin. Xwedaniya taybet a ku pêşvedîçe, rewîştî sosyalîst a di destpêkê de, bê esil kiriye û ew xistiye qaşûlekî bîrdoziyî ku nava wî vala be. Li hember vê taybetîbûnê, gelek mezheb û terîqetan sazûmanên xwe yên jiyana pevrayî, demên dirêj berdewam kirine. Di gelek tevgerên serdema navîn ên ku di rewşa olî de, tiştî tê jiyandin, li hember sazûmana serdest û mijok, sazûmana pevrayî ya kesên bindest temsîl dike. Lawazbûna bingeha teknîk a van tevgeran, wan nayîne rewşa sazûmanên wekhevî û azadî yên alternatîf. Digel ku hinek ji wan bi sedsalan dijîn û di asta dewletê de, tene rewşeke otoîteya siyasî jî, jiberku bingeha wan a zanist û teknîk lawaz e, nayêne rewşa nimûneyêke şaristanî ya alternatîf. Ji aliyê din ve, nasnameyên wê yên bîrdoziyî, di derûna xwe de, sazûmana civaka biçîn digire nava xwe. Herwiha encex di xeyalên xwe de, daxwazên xwe yên wekhevî û azadî zindî kirine. Di vê bingehê de, ber bi evînen xwedayî û mirovî ve çûne, xeyalên bihiştê xweyî kirine, bêrikirina biratiyê zindî girtine û veguherandine kevneşopiyêke sincî û wêjeyî ya bihêz.

Pêdivî ye em dibistanên feylesofan jî, tevli van mêldariyan bikin. Dibistanên di bingeha felsefî de, nêzîkayîyên sosyalîst ên bihêz temsîl kirine. Partiyên felsefî yên ku bi sed salan domandine,

çêkirine. Gelekan ji wan li hember hêrîşên hovane, bi lehengî li berxwedane. Ji ber parastina bawerî û hişmendiyê, ev şer weke tevgerên civakî yên bi naveroka wekhevî û azadî werin terîfkirin, yê bi rasteqînî û di cîh de be.

Di zayîna kapîtalîzmê de jî, "Utopya" û "Welatê Rojê" xeyalên sosyalîzmeke îdeal zindî dikin. Li ser rêya xeyalên azadiyê yên ku kapîtalîzm derandine holê, mirov û civakên bêhijmar, li hember dogmatîzma olî bi lehengî şer kirine. Dema ku ev şer kirin, ne ku jibo berjewendiyên takekesan suxreyan bikin, di wê baweriyê de bûn ku jibo wekhevî, azadî û biratiyê hereket dikin. Dirûşmeya bingeh a şoreşa bûrjûva Fransî bi xwe jî, "wekhevî, azadî û biratî" ye.

Damezrînerên sosyalîzma zanist Karl Marks û Friedrich Engels jî didine nîşandan ku, di damezrandina nasnameyên xwe yên bîrdoziyî de, felsefeya Alman, Sosyalîzma Frensa û tevgera çîna karkerên Ingilîz, bingeh girtine. Ev vegotina kin jî nîşan dide ku, ji sazûmana hoveber û komunal a serdema neolîtîk, heta bi merhaleya sosyalîzma zanistî, kedkar û gelên bindest, çawa jibo bîrdoziyeke bi naveroka wekhevî û azadî û jiyaneke komunal a bi biratiyê ve girêdayî, têkoşînê dikin, êşên mezin dikişînin û bilehengî li berxwedidin. Heger van sazûmaneke mafdar ne damezrandibin, sedema vê ne bawerîya hindik û ne jî têkoşîna hindik e, jiberku ne xwedî mercên teknîkî ne, armanca xwe ya pîrozwer pêknayînin.

Tevgera çîna karker a ku di rêberîya manîfastoya komunîst de, tê meşandin, di vê zincîra dîrokî de, tevgera azadî û wekhevî ya dawî ye. Nivîskarên manîfesto bi rewîştên utopîk a tevgerên berî xwe, dizanin. Ji ber vê yekê, dixwazin ku zanistî bin. Lêbelê ev zanistî, bi serdema wan bisînor e. Kapîtalîzm dema xwe ya herî gihîştî dijî, hê nû bi qeyranan re rûburû dimîne, ewleyiya wê ya bixwe, bêsînor e. Dîrokê ji xwe dide destpêkirin û bêdawî dike. Herçiqas ku zanistiyê jî bigire nav xwe, vê sosyalîzmê hê xwe li ser lingan ne girtiye. Tevgera çîna karker, hê di merhaleya zarokîtiyê de ye. Deng ji tevgerên rizgarî ya mêhtingehan nayê. Digel vê yekê, ji nivê sedsala 19an û pêde, bi damezrandina enternasyonal a yekem û duyem, bi awayek bîrdoziyî û pratîk û bi wêrekî, helwestên çîna xwe îlan dikin. Aliyê wan ê ku giramî (rêzdarî) jê re were girtin, rawestîna wan a zanistî, di her mercî de gera wan a li mafê kedê û parastina wê ye. Aliyê vî karî yê pêxemberî li vir e. Nîqaşên ku stratejî bikêrhatiye an na, nabe zimanê demên wiha. Êsa bê çek, tenê bi bawerîya xwedayê xwe, li dijî sazûmana Roma ya erjeng derdikeve, ne di wê rewşê de ye ku li stratejî û taktîk bihizire. Lêbelê ji gavavêtina ku mirovatîyê û serdema azadiyê bigihîne merhaleyeke bilind, paş de namîne. Bi gavavêtinên bi vî rengî, pîrozwerî tê bexşandin. Di vî babetî de, tevgerên lehengên ku sosyalîzm damezrandine û alîgirên wê yên civakî, pîrozweriyê nîşan didin. Serketina siyasî an jî windakirinên bi êş, digel derûna wê, dibine pîrsgirêkên di asta duyemîn de.

Serneketina Komuna Parîs, an jî hilweşîna enternasyonala duyem, sosyalîzma zanistî ji armanca wê dûr naxe, bi merhaleya Lenînîst yê bigîhe hêzeke mezin, hêzeke dewletê. Bi terîfkirineke klasîk yê were îlankirin ku di cîhanê de ji sisêyan yek, proleterya û gelên bindest, derbasî serdema şaristaniya sosyalîst dibin. Yê were derpêskirin ku di her qadî de, bi kapîtalîzmê re berberî tê kirin. Bi rastî jî, di dîrokê de yekem car, komara azadî û wekhevîyê ya kesên bindest, yê demeke dirêj, li ser lingan bimîne. Lêbelê hê sed salî temenê xwe ne dagirtin, hê negihan dawîya sedsala 20an, ev komar jevdikevin û girîngiya xwe ya dîrokî winda dikin. Zanyarên bûrjûva yên bi armanca propagandayê, yên vê bûyerê weke îflaskirina sosyalîzmê îlan bikin, marksîst jî, yê weke xiyanetê darizînin û ji aliyê bawermendên sosyalîzmê ve, yê weke hilweşîna xeyalên pîroz were nixandin. Lê jibo kesên ku bi awayek zanist nêzikî mijarê dibin, ne di berdema yê miradê ya mezin û ne jî darizandina xiyaneteke ne berbiçav, jibo çareserîyeke hêsan dibe dabaşa xebirdanê. Tiştê çêbûyî, jiberku pêdivî bû çêbibe, çêbûyê. Tiştê ku hatî xwestin û hatî xeyalkirin, di derûna wê de, ji ber layîqî wê ne bûne û ew temsîl nekirine, jevketiye. Ji dêvla ku bi vê şa bibin an jî xemgîn bibin, bi pîrsiyariyeke ku, rastî di kûdera wê de ye û lêgerîna vê rastiyê, timî bûye rêya zanistî. Bi serkeftinî, di vê rêyê re hatiye meşandin.

Ezmûna (ceribandin) Sovyet, bi kûrayî nehatiye dahûrandin, ya girîngtir, encamên jevketina wê, hê jî xwe nîşan nedane. Gelek mijar di tariyê de ne, an jî li benda dema nû ne. Dema ku li bûyerên li holê bête nêrîn, felsefeya sernekeftî û sependina wê diyar dibe. Ev pîrsiyarî hê nû pêşdikeve ku, gelo ya hatî sependin sosyalîzm e, neteweperestî ye, azadî ye, totalîtarîzm e, wekhevî ye an jî kapîtalîzma dewletê ye. Ev pîrsgirêk, lehengên bêhijmar û bi milyonan mirovên kedkar ên bi bawerî û hişmendîya sosyalîzma zanist ku bi awayek pîrozwer têkoşîn dane meşandin, girîngiya wê ya dîrokî, qet hêsan nake û nabêje ev têkoşîn bi avê de çû. Berevajî vê, rêya rastî ya ku li van nixan were xwedî derketin, wiha datîne holê ku, ev pratîk di parzûnê zanistiyê re bête derbaskirin û rast were dahûrandin. Di wê baweriyê de ye ku ev peywir bi awayek serkeftî neyê cîh, meşên serkeftî yên bi azadî û wekhevîya pîroz ve girêdayî, nayên pêkanîn. Di dîrokê de, bi şaşiyên xeternaktir,

gelek caran berevajî armancên ku jibo wan şer dihat kirin, li encamên din jî rast dihatin. Hê jî yê lê rast werin. Lêbelê heta ku jiyana mirov hebe, Yê îfadeyên zanistî ya van îdealên wekhevî û azadiyê, rastir çêbike û di rêya rast a vekirî re, yê bimeşe û biserbikeve. Terîfkirineke reel sosyalîzma ku rastiyeke serdemê ye, yê çêtir ronî bike.

a- Sosyalîzma zanistî, weke nasnameyeke bîrdoziyî, di wateya asta dîrokî, civakî û teknîk de, netêrayiyên cidî werdigire nava xwe. Damezrînerên wê, ne xwedî danahevên zanînê bûn ku bikaribin, dahûrandineke şaristaniyê ya gelemper bikin. Jibo zanînen pêdivî, lêkolîn bisînor bûn. Di derbarê sumeriyên de, hê zanîneke bi qirşekî derneketibû holê. Serdema kevnare (antîk) bixwe jî, ji nîrxandinê gelekî dûr bû. Di derbarê civaka neolîtîk de, ne xebateke cidî ya şûnwarnasiyê û ne jî nîrxandineke teorîk hebû. Digel ku "Civaka Kevin" a Morgan, li ber çavan hatibû girtin jî, ev tenê ne bes bû. Civaka kapîtalîst ku dihate nîrxandin, di serdema gihîştinê de bû. Hê bêhtir binyata wê ya hilberînê dihate dahûrandin. Dahûrandinên dewlet û nasnameya bîrdoziyî, gelekî bisînor bûn û gelek çewtîti digirtin nav xwe. Bi felsefeya materyalîst a bêteşe nêzîkî van herdu bûyeran bûne, weke vedanên aborî yên hêsan, hatine nîrxandin. Di avakirin û dahûrandina reel sosyalîzmê de, bandora vê nêzîkaiya felsefî diyarker e.

Heta ku dîroka şaristaniyê, bi temamî neyê dahûrandin, heger şaristaniya kapîtalîst ku perçekî piçûk jê digire, bi giraniya aborî were dahûrandin, encex liqasî ku alfabe were dahûrandin, yê nîrxekî îfade bike. Ev yek vekirî ye ku, bi vîna civak hemû nayê ronahîkirin û ji aliyê veguherîna şoreşger ve, jibo bername û çalakiyê yê ne bi têrayî be. Vê dawiyê bûyerên ku derketin holê, dane nîşandan ku, ev çewtîyên ji van netêrayîyan tîne, sedemên neserkeftinê ne.

Bernameyên tenê bi çîna karker ve girêdayî, hê di serûrî de xwe ber bi cihêgirtinê (tecrît) ve dibe. Ji aliyê din ve, tîkiliya di navbera civakê û rastiya çîn de, ji dahûrandineke kûr dûr e. Çîna bûrjûva bixwe jî, di rewşa çiqilekî piçûk ê civakî ye. Têgihîneke wisa serdest bûye ku, mirov dibê qey weke du çînen ne berbiçav, tenê karker û bûrjûva rastiye cihanê ne. Heçku çêbûna civakê, pêşveçûneke dîrokî ya ku bi sed hezar salan şewe digire ye. Çêbûna çînçînîbûnê, demeke ve ya bisînor û perçeyekî wê tîne meydanê. Evan weke du organên laş yên kevin ku xwe nû kiribin û bihêz bûbin. Ne guherandin û ne jî tinekirina van herdu organan, veguherîn û hebûna civakê pêknayîne. Hisdike bila bi nêzîkaiyên teng ên çîna bûrjûve be û hisdike bila bi nêzîkaiyên teng ên çîna karker be, pêvajoya avakirina şoreş û şoreşa hember ku weke faşîzm û reel sosyalîzmê jevketin, ne ji zora ku ji der tê, jiberku berevajî rastiye civakê yên bingehe dikevin e. Hêza civakîtiyê ya dîrokî, sepandinên endezyarî yên bi vî rengî, bê wate dîtiye û bi hêza xwe bixwe, çareserkiriye. Xebatên endezyarî, heger bi dahûrandineke berfireh a rastiya civakê ve ne girêdayî bin, yê ji xaniyên temenkurt û wêdetir ti tiştî îfade nekin.

Jevketina restorasyona faşîst a kapîtalîzmê û avahîkariya civaka sosyalîsta reel a sosyalîzmê, mînakên hîkarîker ên ku ve nîrxandinê rast derdixin e. Herwiha di dîrokê de, gelek saziyên weke terîqetan ku dişibin van avahiyan, ji marjînalîyê rizgar nebûne. Veguherînen civakî yên ku herî domdirêj jiyane, timî yên ku bûne xwediyê asta teknîka civakê û sazîbûna wê ya bîrdoziyî û polîtîka wê. Hisdike bila bi rewîştîna çîna serdest û mojobe û hisdike bila çîna bindest ku tê mêhtin be, ev rêzik ji hemû hêzên civakî derbasdar e. Asta teknîk a sedsala 19an, ji gihîştina ku têra sepandina bernameya sosyalîzma zanist bike, dûr e. Asta vê teknîka ku zemîneke daringî nade civaka bêçîn, bi jevketina avahiye sosyalîst careke din hatiye çespendin. Em dikarin bibêjin ku sosyalîzm, di pêncîh salên duyemîn ên sedsala 20an de, bi awayekî bihêz gihaye asta teknîkê. Di vê de, rola şoreşa zanist û teknîk a pêkhatî, diyarker e. Ti nasnameyên bîrdoziyî, ne di wê hêzê de ne ku bi serê xwe, di ser asta teknîka heyî re, pêşveçûnekê pêkbinin. Herçiqa ku angaştên xwedayî û zanistî jî hilgire, ev rêzik derbasdar e.

b-Tê çavdêrîkirin ku, di nêzîkaiyên çêbûna bi gelemperî zor û bi taybetî zora şoreşger de, sosyalîzm xwedî tengaiyên cidî ye. Nîrxandina zorê ya bi zêdekarî, ji rola "pîrika di zayîna civaka nû de", tê fêhmkirin. Şideta ku di şoreşên sosyalîst û di sosyalîzma reel de, tê sepandin, ji peywira pîrikeke alîkar, gelekî wêdetir e. Hê bêhtir weke berdewama xêzikeke Sargon, Hamûrabî, Skender, Zesar û Napoleon e. Parastina sazûmanê ya bidîwar û tîlstriyên ku hatine kişandin, ji serî heta bi binî zorê tîne bîra mirov. Di van mercan de, dayîkek ji dêvla ku zaroka xwe bine cihanê, yê ji ber zor û bînefesiyan bimire. Di sepandinên reel sosyalîzmê de, ev rastî bizêdeyî hatine jiyandin. Sazûmaneke bi baweriya ku jibo berjewendiyên mirovatîyê heye, dîwaran li dora xwe ava nake. Tîlstriyan nakişîne. Encex sazûmanên ku bi xwe ne bawer, pêşgiriye ku zorê digirine nava xwe pêktînin. Berevajî vê, heger ku ewleyiya wê bi nasnameya bîrdoziya wê were, pêwîst e ku jibo cihanê bikşîne nava xwe û mirovên xwe bişîne hemû derên cihanê, hêsanîyê nîşan bide. ædî derkete holê ku, jibo ji pêşbazîya biçekbûnê, li paş nemîne, tiştî hate kirin, ji jevketinê wêdetir ti rolên bi

wate ne leyîstiyê. Ango nirxandina zorê û sepandinên bi wê ve girêdayî, dane çespandin ku bi çewtîyên herî bingeş, sazûman jevketiyê. Hemû kes di vê yekê de hemramana ku di jevketina reel sosyalîzmê de, polîtîkaya biçekbûnê, rola sereke leyîstiyê.

Bilindkirna zora şoreşger jî, bi zêdekarî û bi çewtîtiyan tije ye. Di vir de, ji rola pîrikê wêdetir, rolên zayîna bi sezeryanê, heta zayîna jiberçûnê, hatine leyîzandin. Sepandinên zora zêde, bi gelemperî rewîştên çînên serdest ên mijok in. Ev zor, encama tîrsa dilê wan û dizekiya wan e. Jibo ku wê tîrsê ji dilê xwe bavêjin, timî çekên nû bi dest dixin, bi awayek himbiz mêrkujîyan dikin û komkujîyan pêktînin. Şerên ku her yek ji wan çalakiyên qirkirinan, jibo xweşiya civakê û li ser navê xwedê, pîrozwer dikin. Di rastiye de, ev dizî û talaneke birêxistin û bikaranîna mêrkujîyê ye. Zora ku jibo xweşî û veguherîna civakê were parastin, encex zoreke bi armanca parastina rewa be û bi hiqûqê gerdûnî ve girêdayî be. Zora li vir dabaşa xeberdanêye ku, li hember hewldanên jibo veguherîneke civakê ya pêşverû, ji der an ji hundir tinekirina ku tê ferzkirin, helandin û veguherîna bizorê, xwe biparêze û bistirîne. Ji bilî vê yekê, hemû zorên ku ji vê armancê derbas dibin, heyînen civakî yên din dagir dikin, dest li ser nirxên wan ên dargî û menewî datînin, bizorê vediguherînin û dişîbînine xwe, bi wesfên paşverûne û pêwîst e mirov ji wan paş de bimîne. Çalakiyên zorê yên bi vî rengî, ne li ser navê xwedê, ne li ser navê welatê pîroz, an jî ne li ser navê rizgariya netewî, qet nabine bi wesfê pîrikîyê û ji wesfê zordarekî an jî talankerekî komkuj wêdetir tiştêkî din îfade nake. Sosyalîzma reel û gelek tevgerên rizgariyê yên ku di şopa wê re dimeşin, di bûyera zorê de, gelekî zêde çûne, encex ji mehkûmbûna sazûmaneke parastinê ya ku bizorê ve girêdayî, rizgar nebûne. Ev nêzikayî bimîsogerî, rewîştên kesên serdest û mijok nîşan dide. Jiberku bikaranîna zorê li ser navê sosyalîzm û pêşverûtiyê tê kirin, bêesilbûneke cidî bi xwe re tîne. Dîrokê ev careke din di mînakên sosyalîzma reel de çespandiyê ku, ev nêzikayîyên zorê nabin şeweyên kedkar û bindestan. Mafê parastina rewa, di her astê û her demê de, çiqas ku li hember nirxên jiyânî, kiryarên bêmaf çêbibin, mercên ku mirov tê de çawa jîbin, ya pêwîst e ku were kirin, parastina heyîna xwe, mafê pêkanîna azadiya xwe û çalakiya wê ya pîroz e.

Di parastina rewa de, mafê bikaranîna zorê, encex dema ku hêrîş li hemanên dargî û bîrdoziyî yên heyîna civakî çêbibin, di pêvajoyên pêşveçûnên azad de, bitaybetî di kêliya veguherînen çawanî de, ango di demên zayînen şoreşgerî de, li hember zora hêzên ku bixwazin bi zorê pêşiyê lê bigirin, derdikeve holê. Di çarçovê de, bikaranîna zorê rewa û pêwîst dibe. Bikaranîna zorê ya ku ji wê were derbaskirin, yê rê li ber qezencên bêmaf, windakirinên vala û bêesliyên cidî veke. Di gelek mînakên de hatiye çespandin ku, di gelek bûyerên bi sosyalîzma reel ve girêdayî, liqasî ku sepandinên bikaranîna zorê yên zêde hene, hêzên ku şerê hebûna xwe û pêşveçûna xwe ya azad didin, alîkariyê wê nabînin. Teoriya zorê, mijara sereke ya ku sosyalîzma zanistî xistiye nava şaşiyê ye. Di jevketina sosyalîzma reel de, ev şaşî kartêkerên diyarker in.

c- Saziyên siyasî û dewletê yên serdema sosyalîst, reseniya xwe nedanîne holê. Teşegirtina sovyetîk, ji şeweyê jiyânê bêhtir, wek propagandeyê dewletê rol leyîstiyê. Eslê wê ev amûra ku pêwîst bû li ser dewletê giraniyek wê hebûna, bûye amûra derbasbûyîna dewleta totalîter û herwiha bûye amûra herî girîng a bêesilbûnê. Heyîna siyaseta bi yek partiyê, bûye amûreke ku heyîna civakê ya tevlihev, veguherîne herênayêke sipî û reş ku encex di sepînen faşîzmê de werin dîtin. Gelek alî û baskên ku bi wê amûrê ve girêdayî, ketine heman rewşê. Di encamê de, ev amûrên ku pêwîst e, daxwazên civakê yên demokratîk bigihînin dewletê, bûne amûrên dewletê ku civakê bitemamî dagir bike. Dewleta ku pêwîst e bibe amûreke kordînasyona gelemper, gihîştîye otorîteyê raserî dewleta bi têngîna xwedayî, herwiha bûye amûreke ku têngîna rêvebirîya totalîter bi awayek sift bisepîne. Bi têngînen komar û demokratîk, ji windakirina têngîliyên xwe rizgar ne bû ye.

Heçku pêdivîbû ku sosyalîzma reel, cudabûna xwe ya ji sazûmana kapîtalîst, di wê qadê de pêşvebibe. Berevajî wê, li welatên kapîtalîst pîvanên demokrasîyê derdikevin pêş, li welatên sosyalîst yên reel, hişkbûn û ber bi dewleta otorîter û totalîter ve çuyin çêdibe. Sazûmaneke dewletê an jî partiyê ku dibêje ez ya gel im, encex dikare bi tevkariyên li sazûmaneke pîranîparêz a demokratîk ku sepînen sazûmana kapîtalîst derbas bike, xwe bide çespandin. Ji dêvla ku pêşveçûnên bi vî rengî pêkbîne, sepînen berevajî ve, sedemeke din a ku sazûman jevketiyê. Dîktatorîya proletarya û di bin navê "dewleta gel" de, xebatên teorîk ku hatine kirin, ji zanîstbûnê dûr mane, ji armanca propagandayê wêdetir neçûne. Bi wê rewşê, gelekî bi şûn Marks û Engels de jî mane. Dewlet, ji veguherîna amûreke teng a burokratîk û hêzeke kapîtalîst ku xwe biparêze, talan bike û xwe bide jiyandin, rizgar nebûye. Di warê siyasî û bisazîbûna dewletê de, serdestiya li sazûmana kapîtalîst li dera han, ji paşdemayîna gelekî zêde û ji şibandîna şeweya rahîb-qeran ên Sumer û Misrê rizgar nebûne. Ne gengaz e ku ev têngîn bi civaka sedsala 20an re girêdana xwe biparêze û jevnekeve.

Sosyalîzma reel a dîrokî, hê danehûrandiye bê çawa, di siyaset û teoriya dewletê de û di sepandina wê de, xwe şibandîye şeweyên koletiyê yên herî li paş. Ev pratîk, encex bi dahûrandina kûr a şaristaniyê, ya ku siyaset û dewlet rola navendî dileyîzin, bi şeweyeke zanistî û bi serkeftin were cîh û hemû pêvajoya civakî û dîrokî bigire nava xwe, yê were derbaskirin. Encex bi vê merhaleyê re, şeweyên teorîk û sepîna şaristanîbûna nû yê pêşvebiçin. Nasnameya nû ya bîrdoziyî û sazîbûnên siyasî, yê watedar bibin.

d- Di sosyalîzma reel de, civaka demokratîk û sazîbûnên şarwer nehatine pêkanîn. Di vê demê de, sazûmana kapîtalîst hewl dide ku ji sepînen faşîst, bi saziyên demokratîk û şarwer rizgar bibe. Lêbelê li welatên sosyalîst yên reel, berevajî vê yekê pêşveçûn çêbûne. Çend bermayînen demokrasiya xwezayî jî, ji holê tên rakirin, saziyên şarwer veguherandine saziyên sîxuriya dewletê. Heçku hêza sosyalîzmê, wê bi hişmendiya demokratîk a civakê û bi gihîştina rêxistinbûn û şeweya jiyanê, derkeve holê. Ya ku pêwîst e bihêz bibe wê ne dewlet, civak be. Rêya vê û navê vê jî, civaka demokratîk û şarwerîti ye. Xerakirina herdu çebûnan, encex bi têgihîna dewleta rahîb a Sumer ku raser, were hevberkirin. Kapîtalîzma dewletê encama mercên welat yên herî li paş in, sazûmana siyasî ku yê bisepîne jî, wê heyîna dewleta kapîtalîst a herî li paş be. Ev şewê jî, ji têgihîna otorîter û totalîter pêde, derfetê nade ti sepînen din. Encama vê sepîne ev e ku fersendê nade pêşveçûna civaka demokratîk, saziyên civaka şarwer, têxe rewşa amûrên propagandaya dewletê. Çespîneke din a girîng ev e ku, sosyalîzma reel ne sosyalîzm e.

Ligor derûna sosyalîzmê, pêdivî bû ku civaka demokratîk herî bêhtir pêşvebibe. Ev derpêşiyek teorîk e ku sosyalîzm, encex di encama demokratîkbûnê de wê pêkwere. Di civakên ku demokrasi pêşneketî de, avabûna sosyalîst çênabe. Weke amûrên demokrasiyê yên çalak, saziyên civaka şarwer girêdayî dewletê nabin, berevajî vê, pêdivî ye ku mîna koma pisporên venêrînê, timî dewletê kontrol bikin. Heta ku vê rola xwe ne leyîzin, venêrîna têkiliyên dewlet û civakê yên ku tevlihev, gengaz nabe. Di jevketina sosyalîzma reel de, civaka ku pêdivî bû lê xwedî derkeve, berevajî vê jîboku jê rizgar bibe, ji tevgerên civakî yên berfireh, paş ve nemaye. Eslê wê ev bi hereketîbûn, ji kapîtalîzmeke bê demokrasi nermetir, derbasbûyina kapîtalîzma ku ji demokrasiyê re vekirî, îfade dike. Li vir xiyanet û jirêbirina girseyan tine ye. Berevajî vê yekê, bi dersên ku gel ji pratîka jiyanê derandin, daxwaza kapîtalîzmeke hê bêhtir demokratîk, nîşan didin. Ji vê û wêdetir, bi awayekî vekirî derketiye holê ku kapîtalîzma dewletê çawa bûye mafya hovane. Hatiye çespendin ku ne xwedî behreyeke kapîtalîzma hiqûqî ye jî.

Careke din, bi vê mînakê re tişta hatiye rastkirin ev e ku, heta demokrasiyêke pêşketî nebe, sosyalîzm pêknayê. Heta ku demokrasiya bûrjûva ya herî pêşketî jî neyê derbaskirin, demokrasiyên gel pêşnakevin. Heta ku demokrasiyên gel, bi heyînen xwe yên piranîparêz, bi viyanên xwe yên rasteqîn, bi hêzên xwe yên venêrîna dewletê û bi helwestên xwe yên aştxwaz xwe nedin çespendin, nikarin di angaştê derbaskirina demokrasiya bûrjûva de bin. Şanîderêke bingehîna a ku yê rewîştê sosyalîst a rejîmekê diyar bike, demokrasiya ku disepîne ye. Şanîderên ji bilî vê, hemû di asta duyemîn de ne. Jiberku sosyalîzma reel, di ezmûna demokrasi de serneketiye û înkara demokrasiyê dijî, ji aliyê gel ve bi hêrseke mezin, encama wê çibe bila be, hatiye jevxistin.

e- Sazûmana aborî ya sosyalîzma reel, weke parçeyekî gelemper, kapîtalîzma dewletê derbasnekiriye. Ev kapîtalîzma ku demên pêşî, weke merhaleyêke navîn dihat hizirandin, çiqas ku diçe, tevaya sazûmanê dorpêç dike. Digel bikaranîna kedêke koledarî ya hemdem, ji paşdemayîna pêşveçûna klasîk a kapîtalîst, rizgar nebûye. Di vir de, ev yek roleke girîng dilîze ku takekes, liqasî kapîtalîzma taybet jî, têr nake. Takekesê ku ji encama keda xwe bêgane dimîne, çiqas ku diçe bêberhemdar dibe. Di encamê de, weke koletiya serdema pêşî, kasûltî (ecizbûn) û reveke ji kar destpêdike. Heçku di sosyalîzmê de kar, weke pêdiviyekî tê nirxandin û bi dilxweşî tînin cîh. Rewşa hêmana sosyalîzmê ya di ked û xebatê de ku tê sepandin, nîşan daye ku şeweyêke angarya ye. Herwiha di dema jevketinê de, rewşêke biêş derketiye holê ku li hemû derên cîhanê, di karên herî zor de, bi rojaneya herî kêr, weke ku dîtîneke xwe bibînin, dixebitin. Sedem çî dibe bila bibe, hemwelatiyekî sosyalîst nakeve vê rewşê. Dema ku bikeve vê rewşê, wê bi çespîne ku ew ji bilî sosyalîzmê rejîmekê din ya bêsilbûyî ye.

f- Pêvajo û dewletên rizgariya netewî ku navendên sosyalîzma reel, weke çebûnên polîtîkaya derve lê dinêrin, ji mînakên bêkalîteyî û bêsilbûna ji sazûmana bingeh zêdetir, rizgarnebûne. Dema ku ji mêhtingehkariya klasîk rizgar bûne jî, rejîmên ku hatine rûniştandin, ji rejîmên mêhtingehkariya klasîk paşdetir in. Jiberku welatên bi vî rengî, versiyonên destê duyemîn ên kapîtalîzma klasîk û sosyalîzma reel in, li ser serê civak û gelên xwe bûne belayên mezin. Em dikarin bibêjin ku, gelên di kontrola rejîmên bi vî rengî de, bi rastiya herî bi nalet a di dîroka xwe de, rûbirû mane. Ev rejîm, şeweyên stemkar û herî rezîl li ser gelên xwe disepînin, pêkutî û çewsandinên mezin li tarîtiya ku ji

dema feodaliyê ve tê de ne, zêde dikin. Civakên di bin vê rejîmê de, bi her awayî bêganeyî xwe bûne. Belkî jî di ti demên dîroka xwe de, ev civak hevqasî bêganeyî xwe nebûne, ji hêza xwe bêbawer nebûne, ji hişmendiya dîroka xwe dûr neketine û asta sincê wan hevqasî daneketiye. Ev civak di serdema me de, civakên mirovatiyê yê herî bi qeyran temsîl dikin.

g- Heyîna takekes û mafên wî ku pêdivî ye di pêvajoya dîrokê de, weke pîvaneke azadiyê bête nirxandin, di sosyalîzma reel de, weke pirsgirêkê ne hatine dîtin. Çi di zayîna kapîtalîzmê de û çi di serdema qeyranê de, mijareke ku herî li ser hatiye rawestandin, azadiya takekesî ye. Eslê wê takekesê ku ji aliyê hiş û giyan ve, ji destê hemû cureyên dogmatîzmê filitiye, pêşveçûneke gelekî girîng îfade dike. Ev çêbûneke ku ne tenê bi kapîtalîzmê re têkildar e. Pîvana her pêngava bi pêş de, bi pêşveçûna asta rûmeta takakes, diyar dibe. Nirxê şoreşeke dîrokî, bi pêşveçûna ku di heyîna mirovatî û rûmeta takekes de pêktîne, tê pîvan. Yê xwe di hişmendiya takekesê ku afirandî de, di evîna jiyana wî de, di afirêneriya wî de û di berhemdariya keda wî de, xwe nîşan bide. Pîvana herî zexm a pêşveçûnê an jî ya berevajî wê ev e ku, gelo takekes ji rewşeke çawa, aniyê çi merhaleyê. Ev di heman demê de, krîterek e ku asta azadiya civakê jî, diyar dike ye.

Di mijara takekes de, pêşveçûnên bi navtêdana kapîtalîzmê, hîkarîker in. Ev mijareke ku bi aliyên xwe yê erênî û neyînî, were nirxandin e. Sosyalîzma reel, takekesiyê weke ku mijareke kapîtalîzmê ya ne baş be, dide nîşandan. Herwiha, vê dawiyê êdî di warê mafê takekesî de, dikeve derawayeke gelekî li paş. Heçku pêdivî ye ku sosyalîzm, ji kapîtalîzmê gelekî bêhtir bi vê mijarê re, têkildar be. Heta ku terîfkirina takekesê sosyalîst, birasteqînî çenebe û neyê pêkanîn, pîvanên civaka ku yê were damezrandin û şaristaniya ku yê were çêkirin, yê ne fêambar bimînin. Lewra nirxê rejîmekê, encex bi nirxê ku bide takekes yê were pîvan. Ji pîvanê hêja û mezintir, ti nirxên din tine ne. Nexasim, jibo sazûmaneke di vê angaşê de be ku bibêje ez, di warê azadiyê de herî pêş temsîl dikim, ji vê pîvanî zexmtir û pîroztir tiştekî din tine.

Ev ne rasthatineke ku sosyalîzma reel, di qada takekesîtiyê de windakiriye. Lewra, xiyamet û bêmafiya herî mezin, di warê takekes û mirov de, nîşan daye. Digel hemû kêmasiyên kapîtalîzmê, heger ji sosyalîzma reel çêtir hatibe girtin, ji ber helwesta wê ya bi erênî ku li derba takekes û mafê takekesîti nîşan daye. Azadiya takekes, ne mijarek e ku tenê bi dev kapîtalîzmê ve, were berdan. aêdî kapîtalîzmê bi xwe jî, bi derketina ji serdema navîn û bi zayîna bi ronensansê re, bi derêxistina takekes a li pêş, bi hêz bûye.

Di vê mijarê de zelalbûn, gelekî girîng e. Takekesîti û takekesparêzî mijarên cihêreng in. Takekesîtbûn çiqas ku girîng be, takekesparêzî taybetiyeke ku pêwîst e mirov jê dûr bimîne ye. Kapîtalîzmê ji takekesîtiyê, takekesparêzî derandiyê. Ev herduk, rê li ber encamên gelekî cuda vedikin. Bêtakekesîbûn, sosyalîzm pêknayê. Bi kesayetiya feodal a ku ji serdema navîn mayî û bi kesayetiya takekesparêzê kapîtalîst, ne dibine demokratekî dirist û ne jî sosyalîst. Bûyina takekesî, mijareke gelekî berfireh e. Şaristaniya Rojava ku di vî derbarî de, pêngavên mezin avêtine, gelekî pêşveçûye. Takekesîbûn, berî her tiştî pirsiyariyê li helandîna ku di nava civakê de, ji sed hezar salan ve pêkhatî, dike. Ev pirsiyarî gelek girîng e ku, heta bi kûderê civakîti pêdivî ye û bisûd e, li kûderê bêwate û fikardar dibe. Endambûna heta bi dawî ya civakê, qebîleyê û eşîrê, an civaka ol an jî laîktiyê, yê çi bide qezenckirin û çi bide windakirin. Bersiva ku bête dayin ê girîngiya takekesîbûnê, bêhtir bi awayek rastî deyne holê. Bersiva sazûmana koledar ku daye vê, takekesekî ku li siya xwe jî nabe xwedî, dema qeran bimire pîre tê veşartin û hatiye tinekirin e. Civaka koledar, viyana takekes hevqasî şikandiye, kiriye rewşa amûreke hêsan û heyîneke daringî ya mijara xwedaniyê.

Serdema feodal û civaka wê, asta vê koletiyê nermtir kirine. Takekes li qasî ku li siya xwe xwedî derkeve, bûye yê xwe. Dibe ku ev weke pêkeniyekê were dîtin, lêbelê ev pêşveçûneke girîng e. Divê neyê ji bîrkirin ku, siltanan bi xwe jî navê xwe "Zil-ul-Allah" ango siya xwedê, danîbûn. Serdestiya dogmatîzmê, gelekî bihêz e. Qedera mirov jî, ji vê dogmayê hatiye biryardarkirin. Hê mirov nehatî cîhanê, qedera wî tê biryardan. Qederparêziyeke kûr, birûbawerî û giyan şehitandî ye. Pêdivî bi raman û afirandinê tine. Çawa be, viyana mezin, biryara her tiştî daye. Hewldaneke vala ne pêdivî ye . Tişta nivîsî yê were serî. Xwedê çi nesîb kiribe, ew yê were qezenckirin. aêdî bi taybetî, di dema ku şaristaniya Rojhilata Navîn kevneperest bûyî de, qederparêziya ku rê li ber bandoreke kujer vekiriye, wiha derketiye holê. Esasê wê ev têngihîn, bi felsefeya Eflatûn ku kirine rewşa teolojîyê re, derketiye holê. Li ser navê îslamtî û xiristiyanîtiyê, vê dawiyê weke pêdiviyên viyana xwedê, ramanên pêşî, "îdea" yên pêşî, bûne dogma û derketine holê. Lêbelê bi hezar salan birûbaweriya mirovan cemidandiye û giyana wan amadeyî tiraliyê kiriye. Derûna dogmayê wiha ye.

Dema ku takekesîtiya Rojava derketiye holê, şerekî hêl bi dogmayên dêrê re kiriye. Felsefeya Arîsto û ya Eflatûn ku di demên xwe de, roleke pêşverû leyîstine, di vê demê de bi rêya mizgeft û dêrê, jibo armanca ku mirovan teslîm bigrin, anîne rewşa baweriyên dogmatîzmê.

Bi pêşveçûna rêbaza zanistî û bi zayîna Ronesanse re, heger bisînor be jî, ev dogmatîzm hatiye derbaskirin. Mirovatîyê mîna bendaveke ku bendên xwe hilweşîne, bandora dogmayan hildiweşîne, dilê xwe bi cîhanê xweş dike, afirîner dibe, hez dike û dibê yê xwe. Kapîtalîzm bi hêza vê takekesîbûnê, li hember civakê çeka takekesparêziyê bikartîne û vebûneke mezin pêktîne. Vê carê, takekesparêziyeke wisa pêşketiye ku, pêşilêgirtina wê bûye pirsgirêk, xweda-qeran yek bû êdî niha bûne hezar. Teriqandina ji seriyekî heta bi seriyê din, hatiye pêkanîn. Lêbelê diya jî, tiştê hatî pêkanîn şoreşeke mezin a dîroka mirovatîyê ye. Takekesê ku ji siya dogmayan û xwedayên çekirî rizgar bûyî, wisa lezgin bûye, vê carê jî bisînorkirina kapîtalîstê ku kar ew şet kirî, dibe pirsgirêkeke gelekî mezin. Teraz hatiye windakirin. Pêdivî bi pêşgiriyan hember hene. Naxwe bi takekesparêziya kapîtalîst, civakîtiya ku bûye îfadeya keda sed hezar salan a atomîze bûyî, yê ber bi hewa were firandin.

Di vî babetî de civakîti, dibe pêdiviyeye dîrokî ya jêneger. Pêşveçûna ramana sosyalîst û teoriya sosyalîst a zanistî, berhema vê pêdiviya dîrokî ye. Dema ku nêzîkayîya têng a çîn were derbaskirin, wê hingê dîrokê li ser navê civakê, li hember kapîtalîzmê di vî babetî de bi leyîze, li ser berjewendiyên mirovatîyê yên jiyani, li hember takekesparêziya kapîtalîstê hêza ku bibêje raweste, îfade bike.

Lêbelê bizava ku li hember takekesparêzî û karparêziyê, hatî nîşandan, dûrkirina girîngiya takekesîtiyê ya ji ber çavan, bi xwe re anî. Bi taybetî sosyalîzma reel, takekesîbûnê weke leyîstikeke propaganda ya şaristaniya Rojava dît. Mijarên takekesîbûnê û mafê mirovan, kire mijara hêrîşeke bîrdoziyî û pêdivî dît ku li hember van têngan pêşgiriyan pêkbîne. Ev helwest, sedema jevketina sosyalîzma reel a di bingeha takekesîbûnê û mafê takekesîyê de ye. Derbeya dawî di vê mijarê de dixwe û jevketêna wê bêtir bilez dibe.

Gengaz e ku em rexneyên sosyalîzma reel, di çend xalên cihêreng de, hê bêtir pêşvebibin. Armanca van rexneyên ku di asta terîfîkirinê de, weke ramanên pêşnûma tene kirin, bêşik, derxistina terîfa takekesê sosyalîst û civakê, ya holê ye. Liqasî aliyên wê yên neyînî, veguherîna serdema dîrokê, ji bûyina utopya derbixe û tixe rewşa pirsgirêkeke teorîk. Pêvajoya jevketinê, çewtiyên ku hatine kirin datîne holê û rastiyên ku pêdivî ne jî ronahî kirine. Tiştê hilweşiyayî, utopîstiya xwedî bingeha bihêz a dîrokî û felsefeya materyalîst a ku mîna birayê wê cewî ye. Ev yek diyar e ku herdu nêzîkayî jî, nabin îfadeya sosyalîzma zanistî. Berevajî vê, dema ku sosyalîzma zanistî, hemû şeweyên utopîstiya dogmatîk derbasbike, felsefeya materyalîzma diyalektîk ji materyalîzma bêteşe paqij bike, yê bikaribe jibo mirovatîyê, di rêya derketina şaristaniya nû de, "nasnameya bîrdoziyî" weke rêbera jiyane, bi awayek çalak damezrîne. Di nasnameya bîrdoziyî ya nû de, takekesîti û civakîti, azadî û wekhevî, di bingeha derfetên ku teknîk pêşkêş dike de, tên terazkirin. Veguherînên civakî ku tene armanckirin, vê carê bi awayek payîdartir, yê di derketina şaristaniya nû de, rola xwe bilîze. Yê vê rola xwe, bi rûniştina li çepê yê şaristaniya demokratîk a hemdem, pêkwerîne. Heta ku şaristaniya demokratîk a hemdem neyê jiyandin û pêdiviyên wê neyên cîh, yê bizanibe ku ev îdeala bilind a mirovatîyê "ligor behreya xwe, li qasî pêdiviya wê/wî" nayê pêkanîn. Yê heta dawî, baweriyê bi heyîna şaristaniya demokratîk bîne, pêdiviyên wê bîne cîh û yê serfiraziya sosyalîzma zanistî, mîsoger bike.

BEŞA ÇAREMÎN BEŞA ÇAREMÎN

NASNAMEYA BÎRDOZIYÎ YA PÊŞVEÇÛNA ŞARİSTANIYA NÛ CÎH, DEM Û MERCÊN

WÊ ME

Di terîfkirina serdema ku em dijîn de, hê em ne gihane nêzikayîyeke bitemamî. Çawaniya serdemê vê derfetê nade. Sazûmana şaristanî ku bi gelemperî, bi civaka biçîn ve girêdayî, bi taybetî kapîtalîzma ku şeweya wê ya dawî, di nava qeyraneke kûr û pêvajoyeke jevketinê de ye. Di vê nirxandinê de, temamiyek heye û gelekî hindik şik jê tê kirin. Şîroveyên cihêreng, hê bêhtir di terîfkirina şewegirtinên nû de, tene kirin. Di sedsala 20an de, bi taybetî di pêncîh salên duyemîn de, şoreşên zanistî û teknîk ên pêkhatine û bi lezgîni hêza sepînê dîtine, di diyarkirina veguherîn û çawaniya serdemê de, rola bingeh dilîze. Di dîrokê de veguherîna serdeman ên biwesif, di demên nûjeniyên mezin ên ku bi pêşveçûnên bîrûbawerî û teknîkê, derketine holê, pêkhatine. Dîtina tunc û hesin, dahênana halet û tekelek, û vedîtînen teknîk ên weke nivîs, matematîk, mekanîk, çapxane û barûdê û çiqas ku ramanên girîng ên weke olên yek xweda, felsefe ûwd. Pêşvedîçin, di wesfê serdemê de jî, veguherînen mezin tene jiyandin.

Tê zanîn ku teknîka kapîtalîzm gengaz kiriye, bigiranî pêşî motora ku bi hilmê û vê dawîya ya ku bi petrolê xebitiye. Motora ku hêza çeng xistiye pîlan duyemîn, di vesazbûn sazûmanê ya jî nû ve û bi hêzkirin û berdewamiya wê de, rola bingeh dilîze. Di vê de, para pêşveçûna zanistî û felsefeya li pişt a ku derûna diyalektîka xwezayê datîne holê, ne kême e. Ev nûbûna di binyata teknîkê de, li hemû qadan vedide û şeweyeke hilberînê ya ligora xwe, sazîbûneke siyasî û di çêbûna bîrûbaweriyekê de, zemîna dargîngî ya bingehîn çêkiriye. Ev teknîk û pêşveçûnên ku rê li ber wan vekirî, bi beşa mekanîk a zanista fizîkê ve girêdayî ne. Sepîn û teoriyên di derbarê mekanîkê de, bi şeweya karxanê bingeha şoreşa pîşesaziyê (endustrî) ne.

Di serê sedsala 20an de, bi taybetî dahûrandinên Albert Eînsteyn ên li ser veguherîna enerjî û dargîng, rê li ber şoreşên zanistî û teknîkê yên di dîrokê de herî mezin, vekiriye. Enerjiyên elektromanyetîk û nûkleer ku bi sepînen teknîkê, ketine bin kontrolê û ji bikaranînê re hatin vekirin, wesfê serdemê ji bingeh guherandiye. Him di bîrûbawerîya mirovatiyê de û him jî di jiyana wî ya pratîk de, rê li ber pêşveçûnên serûbinîhev vekiriye. Bi teknîka înfomatîk û ragihandinê ya ku di wesfê berdewama vê şoreşê de ye, şivanekî li navsera çiyayekî û karsazekî li Newyorkê, xwedî heman derfetên agahdarbûnê ne. Cîhan gihaye serdemeke kadîbûnê ya herî berfireh ku bîstûçar saetan dixebite. Teknîkê, ji binyatên civakî, siyasî û bîrdoziyî yên ku heyîn gelekî pêşdetir, qevastin pêkaniye. Di gelek qad û kolanên cîhanê de, bermayînen ji serdema navîn mayîn û sazûmanên ku ji navendên cîhanê yên girîng paş de mane, bersivê nadin van qevastinên teknîkê. Di rewîştên nakokiyê de, guherînen mezin çêdibin. Heger ku ev nakokî bi awayek rastî neyê nirxandin û pêşgiriya pêdivî neyên bikaranîn, ev navberên nakok ên hê bêtir mezin bibin. Pêşgiriya ku em behs dikin, veguherînen aboriya ji bingeh, civakî û siyasî ne. Teknîka heyî, bi sazûmana aborî, civakî û siyasî ya li ser kar re, di nava lihevnekirinekê de ye. Derfetên bêsinor ên ku rê li ber wan vekirî, bi rasteqînî nayên bikaranîn. Ev teknîk, bi rêbazên hilberîn, parvekirin û rêvebirina civaka kevin û kapîtalîzma klasîk, bi şeweyeke ku rê li ber xeteriyên mezin veke, tê îstîsmarkirin. Mînak, bikaranîna bombeya atomê, bêmîrêskirina derdor, guherîna avhewayê, nexweşiya AIDS, teqîna nifûsê, cudahiyên di perwerde û tenduristiyê de, hinek ji van îstîsmar û fikareyên sereke ne.

Di dema kapîtalîzma klasîk de, nakokî hê bêtir di nava civakê de û bi giranî di warê parvekirineke dadmendî de pêşketibû. Di dema nû de, wergeriya rewîşteke di navbera xweza, derdor û rêvebiriyên civakî de. Di mezinbûna vê nakokiyê de, hêzên serdest ên netewî û navnetewî ku pêşveçûna teknîkê, ji ber berjewendiyên xwe yên çîni civatî û takekesî, jibo tevaya civakê û derdor bi awayek rêkûpêk bikarnayînin, rola mezin dileyîzin. Bi taybetî, hêzên siyasî û civakî yên ku ji dewleta netewî û ji sazûmana navnetewî ya bêteşe û bêerk berpirsiyar, di serê hêzên ku gefan li serdemê dixwin de tînin. Hê jî, rêvebiriyên ku çareseriyê di teraza nûkleer û fuzeşikênan de dibînin, tene ser kar. Ji ber pêşbazîya biçekbûnê, berberî û nexweşiyên herêmî, germ dibin. Ji teknîkên ku derdor xera dikin re, çav tînin damirandin. Li hember nifûsa zêde dibe, bê perwerdetiyê û nexweşiyên ku ji teknîkê tînin, digel ku teknîk derfetê dide jî, budçe û diravdayîna (tahsîsat) pêdivî nayê veqetandin. Di berdewamiya vê rewşê de, bêşik binyata hilberîna kevin û sazûmana siyasî berpirsiyar in. Ji ber vê yekê nakokî û têkoşîna di navbera hemû mirovatî û hêzên ku siyasî

kontrol dikin, ên ku dirav weke dostikên (metres) xwe yên bêmirês, zemt dikin de derbasdibe. Lewra kontrola di binyata aboriyê de jî, êdî di binyata siyasî de, ji mekanîzmayên kontrola sazûmana kevin rizgar bûye û ketiye rewşeke herî xeter. Weke rêvebiriyên oligarşiyên teng û tîranan, ên ku di pêvajoya qeyran û hilweşînên hemû serdeman de, li ser kar bûn, rêvebiriyên dîkta û oligarşîk ên hemdem ku bi maskeya demokrasî, li ser kar in. Li aliyekî krîterên demokratîk ên hemdem ku xwe ferz dikin û li aliyê din, berevajî vê sazûmanên otorîter û oligarşîk, di nava hevûdin de têne jiyandin. Di warê aborî de, çend simsarên borsayê, yên ku bi hilberînê re têkiliyên wan gelekî kêr, bi hemû cure amûrên manîple, karê mezin lêdixin, komeke berjewendî jî, bi hêza medya oligarşiya ku dixwaze tîne ser desthilatîyê.

Di navbera mirovatîyê û xwediyên sazûmana oligarşîk ên ku wiha pêşvedîçin de, nakokîya herî berfireh derketiye holê. Ev nayê nîqşkirin ku rê li ber xeteriyên mezin hatiye vekirin. Tenê ne mirinên ku ji ber birçîbûn, nexweşî û şerên herêmî çêdibin, derdor û avhewayaya ku ber bi nejiyandinê de dibeze, takekesparêziyeke ku ji zincîra xwe flitiye û ber bi ajalbûnê ve diçe û bi zêdebûna nifûseke bêhempa, ber bi qiyameteke rastî ve diçe. Eslê wê, em bi "rêbaza şeytên" a ku di dîrokê de gelekî tê behskirin re rûbirû ne, lêbelê wê rola ku didinê ew dileyîzin. Wisa zexel bûne û maske danîne ku, hemû ne qencî û neyînîyên ku navê wan ê derûnî ne, ji şeytanekî xeyalî re dikine mal, xwe jî bi saya hêza derasayî ya huner û medya weke ferîşteyan dide pêşkêşkirin. Nakokî, bi maskekirineke ne baş û bi pêwana yên ku mêjî û giyan dişon, bi hemû mirovatîyê tê daqûrtandin. Demên kevin, tenê ji bêhişkirina ol di hate behskirein. Li cem van maskeyan ol, bûye nîmetekî binûr. Hilweşîn û helandinên ku bi hêza teknîkê ya derasayî birêxistin dibin, ji serdemên kevir xetertir, têne meşandin. Bîrûbawerî û giyana mirov, bi naverok û şêweyêke ku di ti demên dîrokê de ne bûye şahid, ji aliyê sazûmanekê li dijî wî ve, bê navber tê bombabarankirin û mehkûmî têkçûnê dikin.

Serdestiyeke teknîkê ku yekem car di dîrokê de, yê bikaribe xeyalên mirovatîyê yên bihiştê gengaz bike, ji aliyê hindikayîyêke bê pirsîyar ku ji berjewendiyên mirovatîyê yên bingehîn qutbûyî ve, werdigere rewşeke dogehê û vediguhere cinawirekî ku bikaribe afirînerê xwe daqûrtîne.

Di vê çarçovê de, nakokîya rojane, di navbera xwediyên şoven ên dewleta netewî ku veguheriyê qebîleyêke hemdem û temsîlkerên kozmopolît ên sermiyanê darayî yê raserî netewan de, pêşvedîçe, ji aliyê din ve, di navbera hemû gelan û van herdu hêzan de derbasdibe. Hêzên dewleta netew, yên ku dinava xwe te girtî, ji aliyekî ve gelên xwe ji bandora demokrasiya hemdem û dewlemendbûna pêşveçûna teknîkê re digirin, ji aliyê din ve bi sermiyanê darayî yê raserî netewan re, dikeve qayîşkêsiyê. Di herdu mijaran de jî, roleke paşverû dileyîze. Dewleta netew, herçiqas ku dirûşmeya serxwebûna netewî, ya ku di demên kevin de li hember emperyalîzmê, xwedî pêşvertiyeke bisînor bû, bikartîne jî, jiberku mercên vê demê ne li holê ne, dewleta netew bi awayek berbiçav, dikeve rola amûreke mêtîngeha sazûmana raserî neteweyan. Dema ku astengî lê tê kirin, bi pareke gelekî hindik, ji dema kevin xetertir xwe pêşkêş dike. Di navbera emperyalîzma sermiyanê darayî û temsîlkerên netewî yên hevkar de, sazîbûna sazûmana nû di vê çarçovê de, ji nû ve tê pêkanîn.

Serdema înfomatîk û ragihandinê, ya ku rê li ber bandora bêwateyiya sînoren siyasî û derfetên ji ragihandina zanînê ya bîstûçar saetan re vekirî, gel hemû kişandine nava nêzikayî û enternasyonalîzmeke ku ti deman ne hatiye dîtin. Derfetên alîkariya enternasyonalîst, gelekî zêde bûne. Ev pêşveçûna ku teknîkê rola bingeh lîstiyê, di derbaskirina nakokiyên derveyî û yên hundirîn de, rewş û derfetên nû derandine holê. Ev yek, ji aliyekî ve demokratîkbûna civakê pêktîne û saziyên civaka şarwer tîne rewşeke xwedî hêz, ji aliyê din ve, alîkariya navnetewî, bi amûrên herî pêşketî, gengaz dike. Ev rewş, ji nakokî û şêweyên çareserîya sedsala 20an, heta sedsala 19an, gelekî cuda ye. Ev yek jî, zorê li oligarşiya serdest dike ku rîayetî krîterên demokratîk ên hemdem bike. Rewşa nakokiyê ku ji hev cuda bûyî, rêyên çareserî yên ji hev cuda têxe dewrê. Krîterên demokrasiya hemdem, weke amûrên çareserî yên gelemper, çarçova lihevkerîne ya herî hindikayî pêktîne. Ji ber vê yekê, rêbazên şoreş û şoreşa hember ên ku berhemên nakokiyên kevin bûn, hatine derbaskirin. Dîsa rejîmên faşîst û sazûmanên sosyalîst ên reel ku berhemên van rêbazan, hatine jevketin.

Rojeva sereke ya mirovatîyê, ya di sedsala 21an de, ji aliyê lêgerînên nasnameya bîrdoziyî ya ku van nakokî û tekiliyên bingehîn şêwe dayîne û ji aliyê sazîbûnên polîtîk ên nû ve, tîne destnîşankirin. Bêşik, ê ku van nakokî û tîkiliyan destnîşan dike, asta ku pêşveçûna teknîka zanistî gihayê de ye. Tê hewldan ku nixandînen rewşê, ji nû ve li ser van bingehên objektîf werine kirin. Nîqaşên ku têne meşandin, ji serî heta bi binî, her mijar girtiye nava xwe.

1- Nasnameya bîrdoziyî ya salên 2000an, yê felsefeya di bingeha şaristaniya kapîtalîzma klasîk de û ya di sepînên sosyalîst a reel de, derbasbike û şêwe bigire. Qeyrana domdar a sazûmana sosyalîst, ne bi nimûneyên restorasyonên faşîst û ne jî bi şêweyên sosyalîzma reel, têne derbaskirin. Sepînên

şeran, şoreş û şorêşên hember, qeyran hê bêhtir kûr kirine. Ev jî dide nîşandan ku, nasnameya bîrdoziyî, asta teknîkê weke kartêkereke diyarker, bingeh nagire û zayîna wê bi rastqînî pêknayîne. Him têkçûna nasnameya bîrdoziyî ya faşîst û him jî têkçûna bingeha bîrdoziyî ya ku rê li ber sosyalîzma reel vekirî, di vî derbarî de du çespînên girîng in. Encama ku derketî holê, jênerewiya nasnameya bîrdoziyî ya ji nû ve ye. Pirsgirêk ne bi gihîştin an jî rizîna mercên teknîkî, ne jî bi yê aborî, civakî û siyasî ve têkildar e. Di hemî qadan de gihîştin û rizîn, bi awayek zêde tê jiyandin. Ya herî girîngtir, jibo zayînen nû, danehevên teknîk û bîrdoziyî, weke ku bi ti deman re neyê hevberkirin, bikêrhatî bûne. Bi gotineke din, jibo derketina dîrokî ya nû, liqasî ku mercên berbiçav bi têrayî ne, bi rizîbûnê re, jibo derketinê delîlên girîng jî pê re dijî. Pirsgirêk, ji diyarkerkirina nasnameya bîrdoziyî ya rast û tekûz derdikeve. Perçebûna di bîrûbawerî û binyata giyanî de, ji têkçûn, teslîmbûn û bêsilbûnê tê. Herwiha, karê ku pêdiviyê herî pêşî were dahûrandin, pêkanîna zayîneke wisaye ku, nasnameyeke bîrdoziyî ya di bîrûbawerî û giyanê de ku bikaribe têkbibe, berxwedanvan û orîjînal be. Hê jî em berbiçav bikin, di nava temamiya dîrokî û civakî de, dahûrandina teorîk a mercên berbiçav, rast werin çêkirin, pêwîst dike ku xeta bername, stratejî û taktîkê bête rastkirin. Di vî babetî de, gotina "Heger teoriya rast nebe, çalakiya rast çênabe" hê jî derbasdar e.

Hemû serdemên dîrokê yê girîng, girêdayî nasnameyên bîrdoziyî yê bihêz in. Kulta dayîka xwedawend a civaka neolîtîk, nasnameya bîrdoziyî ya bingehîn a vê serdemê ye. Mîtolojiya Sumer, nasnameya bîrdoziyî ya hemû serdemên civakên biçîn, a pêşî û bingehîn e. Ev mîtolojî, çavkaniyeke pirtûkên pîroz, pêşveçûna felsefeyê û wêjeyê ye.

Felsefeya Grek û olên yek xweda, dexmeyên xwe li hemî nasnameyên bîrdoziyî yê serdema kasîk û navîn, xistine. Demên Ronasans, vesazî û ronahîbûnê, merhaleyên bingeh ên ku nasnameya bîrdoziyî ya şaristaniya kapîtalîst derandine holê ne. Bîrdoziya sosyalîst, xwestiyê ku bibe nasnameya bîrdoziyî ya şaristaniya civaka bêçîn. Dema ku em li van hemû nasnameyên bîrdoziyî dinêrin, em dibînin ku levdanên pêş, ên sazûmanên civakên ku dizên û pêşvedîçin, nîşan didin. Qedera sazûmanan, pêşî di şerê nasnameya bîrdoziyî de tê tayînkirin. Em nebûne şahidê sazûmaneke civakî ku di şerê bîrdoziyî re, derbasnebûbe. Nasnameya bîrdoziyî, dişibe zarokeke ku bikeve malzaroka dayîkê. Zayîn û mezînbûneke bi tenduristî, pêşî bi şewegirtina di malzaroka dayîkê de, tê diyarkirin. Civak û şaristanyên ku van pêşveçûnên diyalektîkê ne jiyabin, ji rewşeke biperçe, çêkirî û sosret rizgar nabin. Dema zayîna di malzaroka dayîkê de seqet be, çawa ku ev di dumahîka jiyane de, yê bandora xwe bidomîne, sazûmanên civakî, yê bi nasnameya bîrdoziyî ya seqet jî, heta ku li jiyane ne, yê di bandora vê yekê de bin. Hêza sazûmaneke civakî, ji nêzik ve bi nasnameya bîrdoziyî ve, girêdayî ye.

Di roja me de, aliyê nasnameya bîrdoziyî yê herî girîng, dahûrandinên teorîk in. Di civakên kevin de, mîtolojî, ol û têngîhînen felsefî yê cur bi cur, cîhê teoriyê digirtin. Pêşveçûna ravekirina zanistî ya têngîliyên xweza û civakê, rê li ber pêşveçûna teoriya ya di bingeha zanistî de, vedike. Teorî, jibo civaka ku tê de were jiyandin, yê bi çî teşeyî be û çawa yê were guherandin, bigelempêrî dinirxîne û bê yê çawa şewe bigirê, texmîn dike. Çiqas ku rast texmîn bike, pêşveçûna pratîk jî, yê hewqasî bitenduristî û serkeftî be. Di civaka Sumer a ku şaristanî daye destpêkirin de, rahîban di xebatên xwe yê perestgehan de ku hezar salan domandiye, bi karên nasnameyên bîrdoziyî yê sazûmanê lebigîne. Zayîna pêşî, di hundirê perestgehê û derdora wê de, hatiye pêkanîn. Rahîbên Misrê, ev hê bêhtir hîkarîker kirine. Feylesofên pêşî yê ku rê li ber zayîna felsefeya Grek vekirine, perwerdeya pêşî ya cidî, di van perestgehan de dîtine. Wan jî ji van nimûnakan best (îlham) girtine û di bin navê akademî û lîseyan de, ji nû ve şewandine.

Dêr û mizgeftên serdema navîn, berdeamiya vê kevneşopiyê ne. Di zayîna serdema nû de, ev kevneşopî bi şeweya dibistan û zanîngehan tene damezrandin. Naveroka wan bi pêşveçûnên zanistî tê dewlemendkirin. Ev yek diyar e ku, hêza vê kevneşopiyê nebe, ji pêşveçûnên şaristanî nayê xeberdan.

Lêbelê pêwîst e ku, nêzikayiyên teorîk ên hemdem, van nasnameyên kevneşopî bi awayek rast dahûrine. Bi gotina "ol e fyon e", ji bin vî karî nayê derketin. Heta hêza nasnameyên mîtolojîk û olî ku bandor li hezaran salan kirine, ya di jiyana civakê de, li holê neyê danîn, bê çî temsîl dikin neyê vegotin û cîhê wê yê di nava dîroka ramanê de, neyê diyarkirin, dahûrandinên ku werine kirin, yê gelekî bikêmayî bin. Di çêbûna kapîtalîzmê de, tevlihevîkirina pêşveçûna takekesî ya bi takekesparêziyê re, çewtiyeke bi heman rengî ye. Bi hindikayî, liqasî têngîliyên daringî, pêwîst e têngîliyên menewî jî werine dahûrandin. Ji xwe di navbera herdukan de, demîngirtineke mîsoger heye. Marksîzma ku giranî daye dahûrandina aboriyê, di gihîştina sosyalîzma reel û jevketina wê de, rola vê nêzikayiyê mezin e. Dema ku teorî ne tenê rojaneyiyê, pêşveçûna dîrokî û civakî bi pîvanên

bîrdoziyî û aborî, bi çêbûna polîtîk re di nava hev de, giraniya yekê ji wan xemsar neke û bêyî ku zêde bike, weke xwe nîşan bide, dikare bête behskirin ku rola xwe ya bîrdoziyî rast lîstî ye. Yê li ber şewqa ku deyne holê, rastiyan bibîne û bi hêsanî bi pêş ve here.

Jibo çareserîya pîrsgirêkên aborî, polîtîk û bîrdoziyî yên ku civakên roja me bi wan re rûbirû û nêzîkayîyên teorîk û bîrûbawerî yên ku nikarin terîfeke wan a bi rastî bikin, pêwîst e ku disiplînên ramana mirovatiyê, girêdayî pêvajoyên çêbûna dîrokî, ji nû ve di ber çavan re werin derbaskirin. Nêzîkayîke wiha berfireh a dahûrandina teorîk, sazûmanên civakên heyî, yên siyasî, aborî û ramanî, lêkolîneke heta bi koka wan, ferz dike. Ev yek liqasî ku bergehekî berfireh jibo roja me û dîrokê çêbike, tê wateya dîrokeke nû afirandî jî. Ev rêbaza dahûrandin û pakhatina dîrokî, di dahûrandina dawî de her dem mirov, şaristanî û binyata ramana wî, herwiha li ser Rojhilata Navîn bibingeh dibe. Şaristaniyên Rojhilata Navîn, ên bi civaka biçîn ve girêdayî ku çavkaniya bîrdoziyî û daringî ji civaka çandinî (neolîtîk) ya wekhevîxwaz digirin, ji aliyê hemû mirovatiyê ve, orîjînal in. Bi vîna, binyata zayîna sereke, dabaşa xeberdanê ye. Di mercên roja îroyîn de, lêkolîna dîrokeke zanistî, dikare bi hêsanî vê rastiye biçespîne. Daneyên şûnwarnasî, olî, wêjeyî, siyasî û aborî yên di dest de, bi awayek zêde derfetê didine vê.

Me di dahûrandina xwe ya Rojhilata Navîn de, xwest ku çend mijarên girîng, derxine ronahiyê. Digel ku nirxandina me ya tevayî tevlihev e jî, em dîsa li ser van mijaran rawestin, yê çetir be.

a- Şaristaniya Ewropa ku li çavkaniya xwe ya dîrokî, di şaristaniya Grek û Roma de digere, rê li ber şaşîti û kêmayiyên mezin vedike. Lewra, pêşveçûnên şaristaniya Grek û Roma, şewegirtina dawî ya merhaleya koletiyê ya şaristaniya Rojhilata Navîn temsîl dike. Ji dayîna derûnê dûr e. Çavkaniya bingehîn, Sumer û di pîleya duyemîn de, civaka biçîn a Misrê ye. Jiberku orîjînalê temsîl dike, lêkolîna Sumer gelekî girîng e. Tenê ne dîrok li Sumer destpêdike. Bi du aliyên sereke de pêşveçûn çedibe, di nava civakê de, dabeşbûna yê mijok û yê tê mêtin, yê serdest û yê bindest jî dide destpêkirin. Dîroka vê dawiyê êdî di van herdu aliyên bingeh de pêşvedîçe: Rojhilat û Rojava, yê mijok û yê tê mêtin. Di bingeha cudatiya Rojhilat û Rojava de, bajar û mijokatiya çandinî rolê dileyîze. Bajar rê ji şeweyên pêşdetir re vedike û zorê dike ku çandiniyê jî, li xwe biguncîne. Herwiha, nakokîya ku bi vî rengî dest pêkirî, heta weke îro berdewam dike. Şaristaniyên ji binyata Rojava, rola navendên rêvebirîya olî û cîhanî, pîşekarî û bazirganî yên bi giraniya bajêr, pêşvedibin. Şaristaniyên Rojhilat, bi gund û bajarokan ve girêdayî, cotkarî, koçber, eşîr û begîtiyên axê bingeh digire.

b- Ev pîrsgirêk a herî girîng e ku, vedana pêşveçûna dîrokê ya di bin vî şeweyî de, li şeweyên îfadeya bîrdoziyî, rast were diyarkirin. Vedanên bîrdoziyî yên di çavkaniya Sumer de, şeweyên ku herî li ser bête rawestandî digire nava xwe. Heta ku binyata bîrdoziyî ya Sumer neyê dahûrandin, ne olê yek xweda û bîrdoziya wî, ne şeweya felsefî bîrdoziyî û ne şeweya ramana zanistî, bi awayek dirist nayê nirxandin. Terîfa bîrdoziyê ya mîsoger, encex ji çavkaniya wê ya orjînal, bi awayek rasteqînî bête çêkirin. Heger ev yek bingeh neyê girtin û bi dîroka olan re têkilî bîn danîn, felsefe orjînal were berdan, herî dawî jî bibêjin, "dîtina rastiyan tenê di serdema zanistî de gengaz e", yê zorê li şaşîyan, qutbûnan bike û vesaziyên bîrûbaweriyê têxe şûna rastiye. Dîrok bigelemperî vê kêmasiyê digire nava xwe, pêşveçûna wê ya pratîk, di bin şewşandinên mezin de çêbûye. Sedsaliya 20an ku hewldide vê rastiye fêhm bike, belkî jî sedsala vê dîrokê ya herî bixwîn e. Heger ku mikurhatinek jibo sedsala 20an çêbibe, divê ku berî her tiştî, bergeha li dîrokê bi zanistê were bi hêzkirin û bê çawa bi serê mirovatiyê de vereşîye, bête nîşandan. Belkî jî di hemû sedsalên pêşî de, jiberku derfetên zanistiyê bisînor bûn, ne di wê rewşê de bûn ku xwerexne bikin. Lêbelê jibo xwerexnekirina sedsala 20an, derfetên zanistî bi zêdeyî hebûn. Ev sedsal herî tawanbar e ku ji dêvla mikur were û xwerexne bike, rê li ber hêrîşkeriyê û sedsala herî bişidet vedike. Heta ku mirovatî sedsala 20an danehûrîne, li tawanbariya xwe mikur neyê û bi şoreşeke sincî ya mezin xwerexne neke, yê ji sazûmana civaka herî binalet rizgar nebe. Pêşveçûna şaristanî ya nû, encex bi dahûrandina vê civakê yê pêkwere.

c- Çar şeweyên ramanên mezin, bi hev re di nava girêdanêke diyalektîkê de ne û di derûna xwe de, dîroka civaka biçîn nîşan didin. Esasê wê ev nîşandan, bergeha beşên mijok û serdest dide. Li hember vê, beşê mehkûm ku tê mêtin, şeweya xwe ya ku ne fermî, ya ku hê bêtir veşartî bikartîne, berdewam dike.

Şeweya bîrdoziya ku çîna mijok a pêşî bilind kirî, bigelemperî bi ezmên ve ango bi bilindayiyê ve girêdayî, mîtolojî ye. Bi îfadeyeke rastir, ezman û bilindayî weke navê çîna serdest pêşdikeve, jibo çîna ku tê mêtin jî, nizmîtî, bin erdê û dogeh tê derpêskirin.

Di şeweya ramana mîtolojîk de ya ku ligor berjewendiyên çîna serdest û mijok hatiye veguherandin, rahîbên Sumer xwedî rola diyarkerin. Ya ku dexma xwe li şeweyên ramana vê dawiyê jî xistî,

şeweya rahîbên Sumer e. Ev şewe, bi çêkirina civaka biçîn ve ji nêzik ve girêdayî ye. Digel ku di serî de, hemû kesayetî û navên xwedê yên serdest, xwezayê temsîl dikin, çiqas ku diçe, dadixine taybetiyên çîna mijok. Xwedayên Sumer, bi çûyina ber bi yek xwedayiyê de jî, diyarker in. Çiqas ku ji dewlet bajarên ber bi împêratoriyê peresîn tê nîşandan, hijmara xwedayan jî kêm dibe û dibe yek. Ji taybetiyên wî yên xwezayî, taybetiyên civakî distîne.

Çiqas ku civaka bajêr û guherîn pêşvedîçe, yek xwedayî jî pêşdikeve. Yek xwedayî, bêhtir li rewîştê civaka bazirganî tê. Weke tîgîn û nasnameyê, di pêşveçûna ramanê de, rawestgeheke girîng e. Civaka bazirganî ku pêdivî bi ewlekariya mîsoger û rêzikên guherîna heye, dixwaze ku vê pêdiviyê bi olîkirina mîtolojiyê, bîne çîh. Jiberku mîtoloji girêdayî efsaneyê ye, mîsogeriya pêşkêşnake, ne di nîrxê zagonê an jî fermaneke olî de ye. Çêtir li civaka çandîni tê. Lêbelê jiberku rêjeyên (nîspet) guherîna girîngiya mezîna qezenc dikin, bazirgan mecbûrî baweriyeke bi hikmê mîsoger an jî olekî dike. Rêzikên olekî bi hikmê mîsoger, di nîrxê zagonê ku bimîsogerî bawerî yê pê bînin û rêzikên wî bînin çîh de ne. Ev taybetî, karê bazirganiyê gelekî hêsan dike. Ev yek ne rasthatineke ku olê yek xweda, di nava qebîleyên semîtîk yên ku di navbera şaristaniyên Sumer û Misrê de, bi bazirganiyê debara xwe dikirin, pêşvedîçe, ev bi vê rastiya ve girêdayî ye. Şeweyên fermî yên ol û mîtolojiyê, hê bêhtir ligor berjewendiyên çîna serdest û mijok hatine birêkûpêkirin. Di van afirandinan de, rola yên mehkûm û yên ku tîna mîhtin, pasîf e. Çawa bête pêşkêşkirin, ew mecbûr in wisa bixûnîfinin.

d- Di gel vê yekê, hemû beşên ku kirine bin sazûmana mijokatiyê (kedxwariyê), timî bişik li ol û mîtolojiya fermî nêriyane. Wan çavkaniyên ola xwe ya sereke spartine civaka neolîtîkê. Ola dayîka xwedawend a civaka neolîtîk, bandor li hemû şeweyên ramana veşartî (mîstîk) yên vê dawiyê kiriye. Ev şeweyên olan, ji aliyekî ve bizavên çînen bindest diyar dikin, ji aliyê din ve jî, zayenda jinê, taybetiyên jiyane, ola xwezayê, dostîtiya xweda-mirov û rewîştê wî ya aşîxwaz nîşan dide. Bêhtir xwedî nêzikariyêke çîhanî û laîk e. Di pêvajoya dîrokê de, hemû navendên perstîşa (îbadet) veşartî, hewl dane ku bêhtir wekhev û nêzikî terîqet, beşên bindest û jinê bin. Lêbelê ji mijarbûna îstîsmareke sift, rizgar nebûne. Di vê de, teknîka li paş û pêşveçûna ramana zanistî, rola bîngeh dilîze. Terîqet, bi navê beşên bindest, di serdemên pêşî û navîn de, rola dijayeti listî ye. Digel ku di dîrokê de belavbûneke mezîna pêkanîna jî, yên ku li pêş, an bi êşkenceyên stemkar hatine tînekirin an jî hatine kirîn. Herwiha bûne mijara bêsilbûn û êşên girîng. Lêbelê ev rastiyeke e ku, ji civaka neolîtîk û heta dema îro, terîqet û mezhebên dijber, herî bêhtir berxwedan, bawerî û şeweyên jiyana beşên mirovatiyê yên bindest, nîşan dane.

e- Şeweya ramana felsefî, li rastî merhaleya ku civaka bajêr û berhema zêdek pêşveçûyî, tê. Di merhaleyeke ku pratîka civakî, hêzên xwezayê û civakê xweş dide nasandin de, tîrkirina ramana mirovan a bi ol û mîtolojiyê, zor dibe. Pêdivî bi şeweyên ramana ku bêhtir îqna bike, çêdibe. Edî gelek hikmên ol û mîtolojiyê, pêkenok tîna. Çiqas ku erd û ezman tê nasîn, çiqas xwedayên ku digotin li ezmana ne, li wira nayên dîtin, pêdiviya tîgîhîna zagonên xwezayê, derdikeve pêş. Pirsyariya bi şeweya "Gerdûn ji çî çêbûye? Daringa pêşî çîye? Ev curbicuriya ku tê dîtin çawa çêbûye?", ramana felsefî derdixê holê. Ji aliyê din ve rêvebirîya xweda-qeran tê pirsyarîkirin. Çiqas tê fêhmîkirin ku qeran nabin xweda û zagonên wan berjewendiyên wan îfade dikin, raveya civakê ya felsefî jênerêv dibe.

Ramana felsefî, bi vê taybetiya xwe di dîroka ramanê de, piştî ol û mîtolojiyê merhaleya sêyemîn a pêşketî îfade dike. Di navbera ol û zanist de rol derbasbûyîna dibîne. Felsefe ji aliyekî ve dike ku şeweya ramana ol, bêhtir were asteke ligor aqil, ango rê dide teolojiyê. Ji aliyê din ve jî, hêzê dide zanistên xwezayê yên bi ezmûnê ve girêdayî. Ew bi xwe jî, çiqas ku zanist pêşvedîçe, di warê ku zanist bikêmasî dimîne de, hewl dide ku şeweya îfadeyên gelemper û zagonên wê pêşvebibe. Felsefe jî weke ol û mîtoloji, ligor berjewendiyên çîna serdest tê bikaranîn. Lêbelê rawestîna wê a li nêzikî rastiya xwezayî, derfetê nade ku liqasî ol û mîtoloji were bikaranîn. Encex şaristaniyên pêşveçûyî, dorhêlê ji felsefeyê re çêbikin. Weke ku felsefe bi olên fermî re bûye yek û rê li ber teolojiyê vekiriye, yekbûna wê ya bi terîqetan re jî, ew nêzikî bindestan kiriye. Yekbûna terîqetan a bi felsefeyê re, ji ya olên fermî bêhtir e. Bigelemperî jiberku berjewendiyên bindestan, bi rastiyan re dibine yek, yekbûna bi felsefeyê re, hêsan dibe. Ji ber vê yekê terîqetên serdema navîn, bi taybetî Batîniyê, felsefe weke çekeke bîhêz bikaraniye. Zayîna ramana zanistî, herî bêhtir ji heyîna van terîqet û mezheban tê.

f- Ramana zanistî, dema ku nasîna xweza û civakê bêyî destekariya (mudaxele) derveyî, mîsoger dibe û raman bi ezmûnan tîna rastkirin, derdikeve pêş. Girêdayî pêşveçûna pratîka civakî ye. Çiqas ku civakek tevlihev, bajarî, bazirganî û pîşesazî be, ewqasî pêdivî bi şeweya ramana zanistî çêdibe. Di navbera zanist û civakê de, girêdaneke bi vî rengî heye. Çîna serdest a mijok, ji hêza hilberîna zanist sîd werdigire, lêbelê jiberku berjewendiyên wê xera dike, ji ronahîkirina wê direve. Xwe li

bîrdoziyên ku mirovatîyê di tarîtiyê de dihêle, digire. Bi vî aliyê xwe ramana zanistî, jibo beşên mirovatîyê yên ku têne mêhtin û bindest, weke çavkaniyeke xeteriyê didomîne. Bi serê xwe nabe azadîker. Rêvebiriya çînî ya zanistê, diyarker dibe. Bandora zanista ku girêdayî rewîştî rêvebiriya çînî, li ser beşên civakê cuda cuda dibe. Çiqas ku berjewendiyên çînî û paşverûtî zêde dibe, pêkutiya (çewsan) li ser civakê û derdor û jevketin jî, zêde dibe. Berevajî vê, hêza rêvebir ya civakî ku bi berjewendiyên gelemperî ve girêdayî û bi rewîştî pêşverû, bêhtir derfetên hilberînê, azadîkeriyê û wekhevîkeriyê, dide zanistê.

g- Sazûmana ramana Rojava jî, berhema van şeweyên dîrokî ye. Bi peresîneke cuda, heta weke îro pêşveçûna xwe domandiyê. Şewegirtina nasnameya Sumer a mîtolojîk ya li Anatolya û Grek, derûnekê bi xwe re hildigire ku, hikim li veguherînê û viyana takekes nikare bike, derfetê dide azadiyeke bisînor. Di dema BZ 1500-500an de, kulta Zeus ku hîkarîker, gelekî nêzikî şeweya mirov dibe. Tirs û hêviya ku bi xwedê ve hatî girêdayî, ji bandora mirûz wêdetir wateyekê îfade nake. Rastiya çînçînîbûneke ku ne hişk be, îfade dike. Xweza bi awayek lezgînî ji îradeya xwedê derdikeve û serbixwe dibe, têgihîna ku zagonên civakî jî, encamên viyana mirovin, rahên xwe berdide. Çînen serdest bi kulta Zeus têne temsîlkirin, gelên ketûber jî, Kulta Dîonysos, cudabûna di nava civakê de temsîl dike. Ev rewş cudabûna di navbera xwedayan de, nîşan dide. Bigelemperî piştî BZ salên 500an, mîtolojî cîhê xwe dide ramana felsefî. Takekes, bi felsefeyê bêhtir ronahîbûn û viyanê qezenc dike. Bi benîbûna di çanda Rojhilat re, rêyeke cuda û berevajî digire. Qutbûna pêşî ya cidî, di navbera kesayetiya Rojhilat û Rojava de, Li nav Grekan kûr dibe. Dera ku qutbûn lê pêkhatiyê, Medya ye. Bakurê rojavayê êran û Mezopotamya jorîn, cîhê pêşî yê ku cudabûna xêzkên Rojhilat û Rojava lê derketine holê ye. Kevneşopiya Zerdeşt, hemû hêza xwe ji gengaz kirina vê xêzkê werdigire.

Li Împeratoriya Roma viyana xwedayî, hê bêhtir lawaz dibe. Rewîştî laîk derdikeve pêş. Felsefeya Stoeparêz a xwezayî, bi rewîştî xwe ya kozmopolît, pêşya xiristiyantîyê vedike. Dîsa bi felsefeya Grek, şirovekirina deqên (nivîsar) pîroz ên cuhûyan jî, hîmê felsefî yê baweriya xiristiyantî û îslamîyê teşkîl dike. Di salên PZ 500-1500an de, dêra di wê angaştê de bû ku, li hember desthilatiya cîhanî desthilatiya xwedayî temsîl dike, esasê wê, li cîhana Rojava bingeha bîrdoziyî ya feodalîzmê, teşkîl dike. Di vê dema dawî a serdestiya şeweya ramana Rojhilatparêz de, di sinc û ramana civaka Ewropa ya ku di merhaleyêke barbar de, rê li ber veguherîneke hîmî vedike. Lêbelê li vir bi terîqet û mezhebîbûnên bi gel ve girêdayî re, dikeve nava têkoşîneke hişk û stemkar. Bi vê rewşê, ji wê êşewîtiya saf gelekî dûr dikeve, bi berjewendiyên çîna serdest re dibe yek. Ji PZ 1400an pêde, serdema zanistî ku lezgîn dibe, dev ji şeweya ramana teolojîk berdide û tenê dadixe asta helwestên sincî. Di vê demê de, bîrûbaweriya Rojava, bitemamî ji ol serbixwe dibe. Bi ewleyiya hêza xwe ya derûnî pêşvedixe. Bi vê pêşveçûnê re, takekes bi awayek bêteraz ji kontrola civakê derdikeve. Hezkirina takekes a ji xwe ku gelekî zêde, rê li ber nexweşiyêke berevajî dogmatîzmê vedike. Takekesê kapîtalîst, bi hindikayî liqasî xweda-qeranên Sumer, xwe xwedî hêz dibînin. Di rêyeke cuda re, xwe xwedayî dike, xwe datîne derawayeke raserî civakê. Nexweşî û xeteriya bingehîn a di çanda Rojava de, ev e. Hê ji vê nexweşiyê re, çare ne hatiye dîtin.

Di vê demê de, beşên bindest ku tên mêhtin ên Rojava, berê xwe didin sosyalîzma ku aliyê wê yê zanistî giran e. Sosyalîzm nasnameya bîrdoziyî ya nû ya kesên bindest e. Lêbelê jiberku ji sînga civaka biçîn derketiyê û bi taybetî ji bandora siyasî rizgar nebûye, kesayetî û şeweya rêvebiriya xwe bisazîbûn nekiriye, berevajî vê yekê, xwe şibandiyê saziyên çîna serdest, di demeke kin de, rê li ber bêesilbûna wê vekiriye. Di serdema pêşî û ya navîn de jî, gelek çêbûnên bi vî rengî, ji aliyê şeweya çîna serdest ve an hatine xeniqandin an jî hatine xûnifandin. Ev yek careke din bi pratîka sosyalîzma reel, hatiye dubarekirin.

h- Şeweya ramana Rojhilat, rêyeke cuda girtiye. Yan xwe xwedayî kiriye, yan jî ber bi ramana yek xwedayê bihêzkirî peresîn nîşan daye. Peresîna olî ya yek xweda, ya di ramana Rojhilata Navîn de, nîşana navendîbûna hêza aborî û siyasî ye. Di paşdemayîna Rojhilat û Rojhilata Navîn de rola sereke dilîze, lewre gelekî zêde hişk dibe, weke fermanên xwedê û baweriyên, dike zagonên ku ji wan re rajêrî (îtaat) bête kirin. Bi vê rewşa xwe, dikeve nava kesayetiyeke ku ji sumeriyên jî, paşdetir be. Xwedayên Sumer, zêde ne hişk in û ne bi zagon in. Bawerkirin, cizayekî an jî lawaziya mirûz dernaxe holê. Belkî jî, ji grekan nermtir û mirovahîtir xwedî têgihîneke ol û xweda ne. Esasê wê hişkbûn, bi dagîrkirina bajarên Sumer a ji aliyê qebîleyên çolê Amorîtên Semîtik ve, tê destpêkirin. Xêzka Akad-Babîl-Asûr, bi pêkanîna hêza siyasî û aborî a di bingehêke bişidet de, di têgihîna ol û xweda de, ber bi yekbûnê û têgihîna xwedayê ku ciza dike, dibe. Girîngiya bazirganiyê ku zêde dibe, zagonên hişk pêwîst dike. Yekîtiya qebîleyê jî. Di vê pêşveçûnê de xwedî rol e. Baweriya xwedayê gelemper "æl" ê qebîleyên Semîtik, piştî van pêşveçûnan bi Hz Brahîm

destpêdike û bi Hz Muhamed diqede, bihêz û nod û neh nawan heta bi têngîna "Allah", pêşveçûnê nîşan dide. Eslê wê "Allah", li nîvgirava Erebaştan, nîşana ramanêke navendparêziya qebîleyan a beriya 10 000 sal e. Heta ku vediguhere dawereke (sembol) hêza gelemper a qebîleyên Semîtîk, gelek merhaleyên derbasdike, bi Hz Muhamed re digihe bandevê, weke nasnameya bîrdoziyî ya çîna bazirganî, şeweya xwe ya mîsoger digire. Allah, xwedayeke ku aliyê wî yê neteweperest, bi giranî ye. Vedana bîrdoziyî ya herî raser a hêza civakî ya Samî û Ereba e.

Digel ku Allah, weke îfadeya hêza xwezayê tê bikaranîn jî, esasê wê di asta herî bilind de, temsîla bîrdoziya hêza civakî dike. Taybetiyên têngînê, him ên koleker û him jî yên azadker, di nava hev de ne. Bi qutkirina mirovan a ji xweda-qeranan, li hember koledariya serdema pêşî derdixe. Girêdana bi ramanêke xwedê ya ne berbiçav ve, ligor perestîşa xweda-qeran, pêngaveke pêşve ye û suxreyê ji azadiyê re dike. Lêbelê jiberku ramana benîtiya gelemper bi hêz dike, şeweya bindestiya mercên feodal, bi asteke nû birêxistin dike. Dibe nasnameya bîrdoziyî ya bingeh a sazûmana feodal ku di serdema navîn de bihêz bûye. Bîrûbawerî û berjewendiyên dargî yên bazirganî ku di civaka Ereba de, bûne çîna serdest, bi şeweyeke herî baş tîne zimên. Tegîna xwedê ku Hz Muhamed weke Allah pêşvebiriye, Ramana felsefî ya Grek û ramanên olên xiristiyantî û cuhûtiyê, ji xwe re mîrate digire. Lêbelê veguherînên ku ku mercên civakî pêdivî dibînin jî pêktîne. Allah şeweyek manîfestoya feodal a serdema navîn e, zagona bingehîn û danezana wê ye.

Ev derpêşiyêke girîng e ku, Hz Muhamed îslam weke ola dawî îlan kiriye. Eslê wê rave dike ku gihîştina dawîya serdema ol û xwedayan. Berevajî ku tê fêhmkirin, têngîna xwedê ya Hz Muhamed, ji nêzîkbûna ol zêdetir, têngîneke ku nêzîktirî felsefe û zanistê ye. Gelek wesifdanên weke, xweda ji reha maxasê nêzîktirî mirov e, mêmî û abadîn e, afirînê e, ne hatiye afirandin, xwediyê her tiştî ye ûwd., dide nîşandan ku nêzîkî zagonên diyalektîk bûye. Weke komînekeke zagonên tevaya xweza û civakê, tê terîfkirin. Merhaleyêke ku cemidî, an jî weke xwedayên Sumer û Misrê ku timî jin îstîsmar kirin û mirov bîzorê kirine suxrevan, ji mêmî ve li paş maye. Ketiye rewşa heza zagonî ya berfireh a civakeke rûniştî û bihêz. Diyar e ku pêşveçûneke girîng temsîl dike.

Ji serdema navîn û heta roja îro, nîqaşa "xweda heye an tîne ye", şewşandîneke. Pirsyariya bi vê şeweyê çewt e. Ya rast, pêdivî ye ku nîqaşeke xweda vedaneke civakê ya çawa ye, çî temsîl dike, çawa peresînê derbasdike, û di encamê de yê veguhere çî rewşê, bête çêkirin. Hê li Rojhilatir, li Hind û Çînê bersiva vê, ramana xweda-qeran û perestîşa vê ye. Li Rojava, rêyeke wiha girtine, ji ezmanan anîne xwer û kirine nava mirovan, herwiha nêzîk kirine. Vê rêyê di dawî de, birine zanistê û rêvebiriya demokratîk. Li Rojhilata Navîn, jiberku binyata wî bihêz e, di ser serê civakê re weke şûrê Demokles hatiye girtin, anîne rewşeke ligor mercên feodalîzma serdema navîn û serdestiya bîrdoziyî ya çîna serwer, zexm kiriye. Şîroveya îslamtiyê ya sînî, teolojiya fermî îfade dike û bazirganê bilind bûyî û zadeganiya (arîstokrasî) axê temsîl dike. Li hember vê Hemû mezheb û terîqetên Batînî, Şîî û Elewî, ku xwe davêjin maskeya Ehlîbeyt, şîroveya yên bindest û yên tene mêmîtin teşkîl dikin. Ev bizavên nîv veşartî yên ku koka wan digihe civaka neolîtîk, şeweya têkoşîna etnîk û çînî ya serdema navîn datînine holê. Têkoşîna çînî û qewmî ya bi taybetmendîya serdema navîn, encex di bin kemna van terîqatan de çêdibe. Di gel ku têkoşînên mezin didin û çalak jî dibin, sedema ne payidarbûna wan ev e ku, çîncînîbûnê hê serdema xwe ne dagirtiye komkujî û bêesilbûn jî rola xwe dileyîzin.

Li Rojhilata Navîn, binyata bîrûbaweriyê, di dema gihîştina îslamtiyê de, PZ sedsalên 8-12an, ketiye pêvajoya paşdeçûyîneke mezin. Dema ku li Rojava bingeha Ronasans û zanistê avêtin, Rojhilata Navîn ji aliyê hişmendî ve, dikeve merhaleyê herî kevneperest û paşverû. Jiyanêke bê hêman ku tenê bi leşkerî ve girêdayî, serdestî hemû aliyên dibe. Êslamtiyêke ku bi axatiya şer a feodalî re, hatî yekkirin heta bi roja îro hîkarîker dibe.

Î- Ev rewşa gelemper, şoreşeke bîrdoziyî pêwîst dike. Lêbelê divê ku ev jî neyê jîbîrkin ku, hemû bizavên çepgir û rastgir ên hemdem, jiberku kesayetî û nasnameya bîrdoziyî ya serdema navîn derbasnekirine û nûhandine, ji sexteyî û çêbûyîneke rizgar nebûne. Şerê nasnameya bîrdoziyî yê Rojhilata Navîn, weke xwe disekine. Nasnameyên bîrûbawerî yên neteweperest, komunîst û îslamtiyê, jiberku ne spartî derbaskirina kesayetiya serdema navîn in, ji ti nûjeniyên re rê venakin. Li Rojhilata Navîn, tişta ku pêşdetir pêwîst, berdana nasnameyên bîrdoziyî û kesayetiyan paşverû ye. Heger ku ev neyên kirin, yê jîneke bûrjûva li pîreka feodal were zêdekirin. Tê dîtin ku dused sal in encam, sernekeftî ne.

Di dahûrandina xwe ya şaristaniyê de, tişta em hewl didin bikin ev e, em tevkariyêke bikin da ku pîrsgirêk, bi rasteqînî li holê were danîn. Vê yekê jî em di asta terîfkirinê de dikin. Heger ku em Rojhilata Navîn, di nava wergiriya dîrokê de nasnekin, çî pîrsgirêkên ku em dest bavêjinê, ji pîrsgirêkên mezintir ku derêxe holê pêde, ti encamên din nade. Ji binyata wê ve, ev yek wiha ye.

Şerê Iraq û êranê, şerê Erebb û êsrael, nakokiyên ereban ên di nava xwe de, trajêdiya ermenan û trajêdiya kurdan a bi herkesî re, ji van wêdetir şerên ku rûmeta mirov li paş dihêlin, vê rastiyê bi tevayî diçespînin. Pirsgirêkên herêmê weke firaqên (firax) bi hev ve, pev girêdayî ne. Heger bi hev re û bingeha wê ya dîrokî, bi awayek zexm bête dahûrandin, destpêkeke nû dikare were pêkanîn. Nêzikariyên klasîk ên weke neteweperestî, îslamiya nû û çepgiriya, pirsgirêk hê bêtir gelicandine ku ji nav neyê derketin. Encex derbaskirina van platforman, yê rê li ber çareseriyên nû veke.

Ev encamên ku dahûrandina me gihayê, bijarteya gelan a bêhtir nêzikî wekhevî û azadiya şaristaniya demokratîk ku ji dema civaka neolîtîk ve, di cîhê xwe de ziq rawestiya ye, ji telpa dîroka biçîn paqij dike, bi wateyê hemdem ji nû ve çêdike û weke tevgerê demokratîk a bi zanist û teknîkê ve girêdayî berbiçav dike. Careke din ber bi şaristaniyê nû, lêbelê şaristaniyê ku wekhevî û azadiyê bingeh digire, ji axa ku dîrok afirandî û dîroka ku ji gelên li ser vê axê destpêkirî, weke hêviyê mezî, di rojê me de bi cîh bû ye. Himbêzkirina vê ya bi evîneke Ronensansê û serkeftin, hêjayî kişandina hemû êş û azarê ye.

2- Bername, armancên nasnameya bîrdoziyî yê pêşerojê datîne holê. Wesfên şeweya civaka ku tê daxwazkirin diyar dike. Di ronahiya teoriyê de, asta teknîkê ji çavan dûr nagire û jibo veguherîna civakî ya bi pêşveçûnê pak, tevkarîyan dike. Bi rêkûpêkirina aborî, civak û siyasetê çawa dixwaze, newîn dide (wad dike), xwe li hember raya giştî ya derve û hûndir, girêdide.

Bernameya derketinê nû, li ser rexneyên demborîna nêzik, bingeha xwe çêdike. Bi taybetî bernameyên lîberal ên sosyalîzma reel û kapîtalîzmê di vê angaşê de ne ku şaristaniya civaka bêçîn, dane destpêkirin, rexne dike û armancên xwe yê ku ji wan cuda dike, datîne holê. Girêdana xwe ya bi demokrasiya hemdem re û bê di çî warî de yê wê pêşvebibe, bi awayek vekirî diyar dike. Pîvanên demokratîk ên hemdem, bi serê xwe bernameyek in. Derketina nû, herî hindik divû ku vê bernameyê bipejirîne. Mînak, pêwîst e vê ji xwe re peywira sereke bibîne ku, krîterên demokratîk li sazîbûnê civakê, siyaset û dewletê bisepine.

Pêwîst e azadiya jinê ya ku di nava çarçova şaristaniya kapîtalîst de, ne hatiye çareserkirin, parastina derdor û venêrana (kontrol) li ser teknîka ku bûye cinawir, weke xalên herî girîng ên bernameya nû, nîşan bide.

Azadiya jinê, yê di şewegirtina şaristaniya nû de, rola herî terazdar û wekhevîxwaz, bilîze. Ji dema ku civaka neolîtîk jevketî ve, jina ku di nava civakê de tine bûye, yê careke din di mercên girambar, azad û wekhevîxwaz de, cîhê xwe bigire. Jibo vê yekê, yê hemû xebatên teorîk, bernameyî, rêxistinî û çalakî, werine kirin. Rastiya jinê, ji têgînên çîna proleter û neteweya bindest bêhtir, mijareke ku were dahûrandin û berbiçav e. Dikare were gotin ku, veguherîna civakê ya herî bihîm, yê bi veguherîna ku jin pêkbîne, bête diyarkirin. Jin çiqas ku azad û wekhev be, hemû beşên civakê jî, yê wekhev û azad bin. Di bicîhbûna demokrasî û laîkîyê de, bi awayek payîdar rola demokratîkbûna jinê, diyarker dibe. Di derbarê jinê de, ev terîfkirina kin a bernameyî jî dide nîşandan ku, tevgera civakî ya di rengê jinê de, yê rewşê sereke bijî.

Pirsgirêka derdor ku di armanca bernameyê de hatiye danîn, mijareke girîng a derketina nû ye. Derketiyê holê ku, bi hindikayî liqasî nakokiyên civakî yê hundirîn, nakokiyên ku bi xwezayê re têne jiyandin jî, xwedî giraniyê ne. Esasê wê parastina derdor, parastina axê, şînahiyê, avê, hewayê û avhewayê ye. Di van mijarên bingehîn de, pêşgiriya herî zexm ên parêzker, pêwîst e weke xalên bernameyê yê jêner, cîh bigirin. Parastina ajalan û li hember gurandina ajalan ya hovane jî, pêdiviyê ku pêşgiriya di vê bernameyê de, cîh bigirin.

Di mercên civaka kapîtalîst de, ji aliyê ve teknîkê tê tiralkirin, ji aliyê din ve jî, vediguherîna cinawirê ku zor bête kontrolkirin. Polîtîkaya teknîkê ku bikêrhatî, pêdiviyên mirovatiyê û li hember pêşveçûna teknîkê ku gef û guran dike, pêwîst e nêzikariyê bi hêman di baweriyê de cîh bigire. Derketina şaristaniya nû, asta teknîkê û bikaranîna wê ya berbihev, yê diyarker bike. Di serî de di warê enerjîya nûkleer, bandora sera xwarinê hormonî û teknolojiya gen de, li hinek qadan venêranê sifî û qedexeyî pêşveçûn, ji aliyê din ve pêwîst e di qadên plankirina nifûsê, pêşgiriya nexweşiyên, perwerdeyî ûwd. de, xebatê bêtin kirin û weke xalên bernameyê werin sepandin. Pêdivî ye qada teknîkê û aboriyê, bi demokratîkkirina civak, siyaset û dewletê re, di nava hev de were hûnandin.

Pêwîst e rewşa zarok û ixtiyaran jî, bi nêzîkbûnê haydar, di vê bernameyê de werine îfadekirin. Ev mijar wisa girîng in ku, bi dest malbatê re nayên berdan.

Pîvanên etîk û sinc ên nû, bi mîsogerî pêdivî ye werin terîfkirin û bi awayek torîkî di bernameyê de cîh bigirin. Zagonên sincê nû û rêxistina wî, yê bibe aliyê derketina dîrokî yê herî resene û pêdivî. Divû bête zanîn ku, ti pêşgiriya polîtîkê û zagon, nagîhine hêza sinc, herwiha pêwîst e ku rola wî were terîfkirin û sazîbûna wî were pêkanîn.

Di civakê de jevketina sinc, çespîna qeyrana kûr a ku tê jiyandin e. Dema ku em dibêjin sinc, em tenê behsa toreyên kevneşopî û rêzikên olî nakin. Sinc, helwesteke civakî îfade dike ku bawerî bi xweşikayî û rastiya wê tê. Bi girêdana dil û wijdan ên herî kûr, tê şopandin (teqîbkirin), ne mecbûrî zagonan, lêbelê ji zagona herî bihêz, bihêztir î ligor pêdiviyê tê jiyandin. Liqasî sincê paşverû û kevneperest, sincê ku pêşvedibe û azad dike jî heye. Bernameyêke ku vê yekê li ber çavan bigire, yê roleke perwerdeker û veguherîner bilîze. Em dikarin vê yekê bi navê bisazîbûna civakê ya menewî, binavbikin. Sincê ku qeyranê ew jihevexistiye, encex bi saya sexbêriya (qitûti) sincê nû, yê nû bibe, di derbaskirina qeyranê û di gihîştina civaka nû ya nîrxên parastinê de, yê roleke payîdar bilîze. Eslê wê sinc, jibo hemî sazûmanên civakê, bi taybetiyên rewîştên rast a kesayetiyê, di leyîstina rola hunera weke cileke xweşik ku qenciya nava wê bi xweşikayî temam dike, di derawayaya pirekê de ye. Herwiha di jiyana civakî de, pêwîst e cîhê huner jî bi hindikayî, li qasî yê sinc were terîfkirin. Civaka bêhuner, weke laşê tazî û hoveber e. Jê û wêdetir, qutbûna xwe ya ji bîrûbaweriya rast a giyan û fizîkê, îfade dike. Bîrûbaweriya rast, sazîbûna bernameyê ya aborî, civakî û siyasî diyar dike, armancên ku danîna holê, heger bi huner û armancên wê re nebîne yek, yê seqet, tazî û nexweşik (kereh) bimînin. Civakeke bê huner qet nabe. Huner, ji kesên bijarte bêhtir, pêwîst e weke zimanê bersiva gel a ku dide mîtolojî, ol û felsefeyê, were fêhmkirin. Raman û sincê ku ji aliyê bîrûbaweriya raser û viyanan ve tê zayîn, li qalibkirina ku gel têbigihe û pê bike, îfade dike.

3- Nasnameya bîrdoziyî, bi tekûziya stratejî û taktîke gihîştî tê temamkirin ku dixwaze bi kîjan rê û rêbazan, bigihe binyata bernameyê.

Teorî bîngeha zelal û safî îfade dike, bername jî armancên kin û safî yên ku ji teoriyan hatin parizandin û di parzûnê rexneyan re hatiye derbaskirin, derdixe holê. Lêbelê bê yê bi çî amûran û çawa bigihe vê armancê, weke rêyeke rast stratejîyê û bi wateya meşa pêngavên zexm, taktîkê diyar dike. Stratejî, ji gelek rêyên ku diçine armancê, hunera hilbijartina rêya herî rast e. Rêyên derneketinê hene, rêyên biêş, yên ku gelek xwîn tê herikandin hene. Digel vê yekê, rêyên ku hê ne gihayî armancê diqedin jî gelek in. Herwiha stratejiyêke rast rêvebiriyeke wiha îfade dike ku, ev rêyên bi fikare werin rewakirin û armancên ku ne rastbin werin sererastkirin (revîzekirin), civakê jibo gengaziya dîroka wê ya mafdar û pêkanîna wê rakine meşê, bikişînin û bigihînin. Civak û rêxistinên ku ji stratejî û rêvebiriyeke bi vî rengî bêpar (mehrûm), weke ku di dîrokê de gelek mînakên wan tene dîtin, en di rêyên derneketinê de, an jî di rêyên biêş û bixwîn de, dikavine nava rewşa trajîk û sernekeftinê. Hunera ku pêşiyê li vê yekê bigire, bi wateya hunera rêvebiriya rast, stratejî ye.

Stratejî, rêvebiriyeke wisaye ku, bi kîjan hêzên bîngehîn û bi cîgiran (yedeke), rêhevalên xwe baş diyar bike, bi awayek rasteqînî ber bi armancê ve, bi windakirin û êşên herî hindik, meşeke bi serkeftin e. Civakê an jî rêxistineke ku ev hêz pêkneanîbe an jî nizanîbe bikarbîne, enerjîya jiyanê beredayî (belesebeb) xerc dike, yê li paş bimîne û belav bibe û birize. Jibo civak an jî rêxistinekê çêkirina stratejiyê, weke çêkirina hêza mêjî ye. Tê zanîn ku heyînên bê mejî an jî yên bi awayek hoveber çêbûyî, di asta herî hoveber de dimînin. Herwiha watedarbûna nêrîneke stratejîk an jî bernameyêkê, bi hêza rêvebiriya stratejîk gengaz dibe. Ev yek jî, di hemû merhaleyên girîng de, bi girtina biryarên stratejîk û dîrokî û bi hêza birêvebirinê bi derfet dibe. Ev jî pêwîst dike ku, dema pêdivî be, sedemên stratejiya ku na meşe û bisernakeve, deynin holê, ya rast jî nû ve pêşbixin û bizanibin birêvebibin. Ev vê yekê îfade dike ku, ligor vê terîfkirinê çarçova stratejîk, çêbûna tekûz a fermandarî û saziya serokatîyê, hêza afirîner di xwe de dibîne û birêvedibe. Civak an jî rêxistinên ku ji vê hêzê bêpar, ji veguherîna komên ku di cîhê xwe de dimînin, nizanin bi pêş de an jî bi paş de diçin, herwiha bêesil dibin û dirizin, rizgar nabin. Berevajî vê, civak an jî rêxistinên lawaz ên ku vê hêzê bidestdixin, xwe didine hev, çalak dibin, digihine armancê û vediguherin, jî nû ve mezin û bihêz dibin. Di nasnameya bîrdoziyî de hêmana (unsûr) stratejîk, hevqasî jiyanî ye û ji aliyê pêkhatinê ve jêneger e.

Hêmana dawî ya nasnameya bîrdoziyî, bi têgîna taktîkê tê zimên. Taktîk, jibo meşa ber bi armancê, enerjî û organên ku pêdivîne, îfade dike. Ji bilî mejî, tê wateya hemû organên laş. Çawa ku jibo jiyana rojane, pêdivî bi xebata van organan a bi awayek hevkar heye, pêdiviya civak û rêxistinên jî, bi organên bi vî rengî ku di nava tevayiyekê de bixebitin heye. Dewletek jibo ku bigihîje polîtîkayên ku kirine armanc, di warê birêxistinbûna zagonçêkirin, rêvebirin û daraz de, hewl dide ku rêxistinîyên aborî û leşkerî bikarbîne. Amûrên civakan jî yên bi vî rengî hene. Pêdivî û armanc, amûrên ku pêwîst e hebin diyar dike. Jibo derketina civakan a ji qeyranê jî, bê pêdivî bi xebateke rêxistinên a çawa heye, ji aliyê taktîkê ve tê diyarkirin. Pirsgerêkên bi şidet an jî bê şidet, bi hêrîş an bi parastin, bi hêzên gelek an bi hêzên hindik, bi lezgînî an jî bi hêdîka, mijarên rêvebiriya taktîkê ne. Rêvebiriyeke taktîkê ku dixwaze biserbikeve, van pirsgerêkan bi awayek rasteqînî dinirxîne û

hewl dide ku biserbikeve. Naxwe, yê bi mêjîyekî mezin, lêbelê yê bikeve rewşeke ku ji hemû amûrên destek û sepînê bêpar. Ti civak, hisdike bila di qeyranê debe û hisdike bila di firehiyê de be, bê taktîk nikare bijî. Ji aliyê rêxistinan ve jî, ev wiha ye. Civakek an jî rêxistineke ku bê hêza taktîk be, behreya taktîkê winda kiribe, çiqas ku teorî, bername û stratejiya wê bi hêz be jî, yê winda bike. Herwiha weke organên laş ku rola xwe dileyîzin, hemû rêxistinên civakî jî, pêwîst e jibo jiyana rojane, baskên xwe yên bierk û şeweyên xwe yên çalakî, diyar bikin. Ya rastir, divê xwe bi organ û rêxistin bike û bide xebatindin.

Birêxistinbûn û çalakiyên ligor pêdiviyên armancê, ji qada giyanî heta bi qada leşkerî, dewlemendiyekê digirine nava xwe. Her şeweya ku bikêrhatî tê dîtin, tê sepandin. Ji aliyê çalakî ve, ligor armancê, ji ya herî aşîxwaz heta bi ya herî bi şidet, ji xebata aborî heta bi xebata siyasî, dewlemendiyê teşeyî bi xwe re hildigire. Rêxistinên ku ber bi armancê diçin, heger ku amûr û şeweya xebatê bi awayek rast diyar nekin, ji bêesilbûn û têkçûnê rizgar nabin. Yê ku dema pêdiviyê, birêxistinbûn û çalakiyan li şûna hev nizanibin bikarbînin, di çaxê wê de, yê nû pêşvenebin û tempoyeke bi têrayî nîşan nedin, nikarin ji serokatiyê taktîk a zexm xeber bidin. Civak an jî rêxistinên ku ji aliyê xebata rojane, hêza rêvebirîya çalakiyan û amûrên wan ve, serokatiya taktîk pêşvenebin, yê winda bikin. Lêbelê yê ku vê rolê bi serkeftin bi cîh bînin, ye bi mîsogerî biserbikevin. Çawa nasnameyên bîrdoziyî ku bi têrayî amûr û şeweyên çalakiyan pêşvenabin, hêmanên wan ên teorîk, bernameyî û stratejîk ê pûç bibin, berevajî vê yê ku van hêmanan bi lezgîniyê û bi awayek rêkûpêk bikarbînin, yê ber bi armancê bi serkeftin bimeşin. Leyîstina rola taktîk, xwegihandina wê hêzê ya rastî û hebûnê ye.

Di encamê de, zayîna bîrdoziyî girîngiya xwe diparêze. Qeyrana şaristaniya bi civaka biçîn ve girêdayî, ya di rastiya berbiçaviya kapîtalîzmê de, bi awayek kûrbûyî tê meşandin. Digel ku çend ezmûn hatine çêkirin jî, ji pêkhatina zayîneke bîrdoziyî a bi tendurîstî, dûr e. Hebûna daneheveke bihêz a di qada berbiçav û neberbiçav de, şensê vê zayîne zêde dike. Pêwîst e ji mîtolojiyan heta bi sosyalîzma zanistî, nêzikariyên bîrdoziyî di nava tevayiyêke diyalektîk de, werine nîrxandin. Divê bête zanîn ku peyveke tenê jî nîrxekî pîroz hildigire, herwiha ji daneheva mirovatiyê re, rêz were girtin. Ev yek pêdivî ye ji yê ku têkildarên pêvajoyê re, bibe pêngava yekemîn. Nêzikariyên tawanbarî û xebardana (sixêf, çêr) ji nezaniyê tên. Heta ku ramanek bi kurayî û weke xwe neyê fêhmkirin, bi gotinên mezin were erêkirin an jî tawanbarkirin, yê ne sexbêriyêke rast be. Ev helwest nayê wateya ku li hember çewtiyê û kêmasiyê, bêdeng dimînin. Berevajî vê, bersiva vê bi vê gotinê dikare bête dayîn: "Helwesta herî bihêz encex bi ya herî rast were pêkanîn"

Rewiştî serdema me ya bingehîn, qeyrana şaristaniyê a bi civaka biçîn ve girêdayî û jevketina wê û taybetiyên merhaleyêke derbasbûyîna ku nasnameya civaka nû şewe digire, di nava hev de, hildigire. Digel ku taybetiyên cuda yê herdu cîhanan, li hember hev şerên mezin dikin jî, Hezeke wan ku hev û din derbasbikin an jî tine bikin, nîne. Ædî ev herênayên reş û spî, bi zagonên xwezayê yê bingehîn re di nava nakokiyê de ne. Xweza û rastiya civakê ya ku şeweyek ji ya wê, di navbera dawî û bê dawiyê de, timî veguherîne derbasdike. Nîrxandina şeweyên civakê û dirêjbûna wan ên şaristanî, di nava tengahiyeke herênaya reş û spî de, yê rê li ber jirêderketina bîrdoziyî ya ku çewtiyên herî xeter bi xwe re tîne, veke. Eslê wê reş û spî, du rengên di serê xalên rangan de ne ku herî zû tene guhertin. Beşa rastiye ya herî mezin, ango hemû dewlemendiya rangan, di navbera van herdu rangan de, bi ristîk in. Dîtina veguherîna civakî û şaristanî ya di nava vê dewlemendiyê de, jibo zayîna bîrdoziyêke rast, xwedî girîngiyêke jiyaniyê ye. Gotina "an ezê reş an jî spî bizê", dibe gotina "en ezê faşîst bim an jî sosyalîstê reel". Başê emê çi ji wan rengên din ên bişeml û dewlemend bikin?

Ketina vê tengahiye ya li ser navê sosyalîzma zanist, bingeha hemû çewtiyên di sepandinê de ne. Encam rûxîn e. Lêbelê dîsa jî, pêwîst e ev weke peywireke hêzên ku dixwazin nûjeniyê derînin holê, were dîtin ku, hebûna xalên di seriyan de li ber çavan bigirin û şeweyên herî bikêrhatî destnîşan bikin.

Rastiya dîrokê ya sedsala 20an, bûye şahid ku herdu xalên di seriyan de, bi hemû hêrsê xwe li mirovatiyê ferz kirine. Zor li mirovatiyê hatiye kirin ku, di bin hêza agirbarana teknîkê de, di bin ala an reş an jî spî de û di bin fermanê de, bibe ristîk. Æş û azarên erjeng hatine jiyandin û xwîn hatiye rijandin. Lêbelê herka diyalektîkê ku ne tenê rengê gewr, hemû rengên jiyane di nav de, ev zor vala derêxistine. Hisdike bila sazûmana reş a civaka biçîn ya ku xwedayê tenê, serdest û bi xezeb ferman dike be, hisdike jî bila sazûmana ku berevajî wê xuya dike, lêbelê di derûna xwe de jê ne cuda "komunîzma spî" be, digel ku carcaran nêzikî pratîkbûnê dibin jî, ev sazûmanên utopîk in (spekulatîf) ku qet mirovatî nikare tê de bijî.

Mirovatî jî weke xwezayê, yê dewlemendiya rengan di civakê de pêkbîne û bijî. Di vî babetî de, ligor olên yek xweda mîtolojiya Sumer, bêhtir nerm û mirovî ye. Lêbelê ji alînan ve, sazûmana xwedayan ango sazûmana reş a qeranan e. Dema ku temamê dîroka mîtolojî û olan were lêkolîn, li wan dera biteqezî sazûmaneke reş tine. Digel hemû aliyên wan ê dogmatîk jî, ji pejirandina dewlemendiya hemû rengan, rizgar nabin.

Esehîkirina zanistî ya vê rastiye, di sedsala 20an de bi berfirehî hatiye nîşandan. Veguherînên daring û enerjîye, teoriyên peresanê, fizîka Kuantum, îzafitiya dem û cîh, bi zêdekarî dane çespendin ku reş û spî ne du reng û sazûmanên ku neyêne guhertin in.

Dema ku di bin vê çarçova zanistî û felsefî de, li rastiya civakê bête nêrîn, hê bêtir tê fêhmîkirin ku, dijên hev demên dirêj, bi hev ve girêdayî û pêdiviyî hev dijîn. Serfiraziya ku demokrasiya hemdem, di dawîya sedsala 20an de qezenc kirî, ji rewîştaya wê ya ber bi rastiye ve tê, felsefeya ku şewegirtina xweza û civakê ya dewlemend bingeh digire û di pratîkê de, derpêşdike ku veguherînên peresanî bingeh in. Hêza xwe ji zanist û felsefê distîne. Şaristaniya demokratîk a hemdem, bi têngîştina zagonên pêşveçûnê û bi bandorkirina guherînên civakî, ji hemû mirovatiyê re bûye mal. Ev ne rasthatiniyeke, encameke herî girîng a hêza zanist e. Lewra zanist, demokrat e. Lêbelê dîsa, hinek binyatên ku bi dogmayên civaka kevin ve girêdayî, hebûna xwe diparêzin, hinek çêbûnên utopîk ên civaka nû jî yê hebûnê bi dest bixin û xwe biparêzin.

Bi vê yekê re, heger em demokrasiya hemdem weke lihevkirina herdu seriyan, li ber çavan bigirin, ev yê şasiyeke mezin be. Mijara ku herî girîng û bête zanîn, digel ku du-sê nêzîkayîyên wê hene jî, lêbelê çiqas ku bi krîterên demokratîk ên bingeh re bimîne, mafê wan jî û yê jiyane heye. Lêbelê ev mîsoger û bingeh e ku, ya herî berfireh curbicuriya civakî ya bi rengên dewlemend e. Demokrasiya hemdem, hê bêtir bi dewlemendiya şewegirtina civakî ve girêdayî ye. Ji lihevkirina du serikan wêdetir, weke sazûmanekê tê nîrxandin ku, ji şeweyên dewlemendiya ku civak dijî û yê hê jî bi jî re, rêzgîr (giramgîr), di xwe îfadekirina azad û xwe jîndarîkirinê de, nêrîna di asta hêmana bingehîn de, bingeh digire. Dozîneke dewlemend a teorîk, pêşveçûna pratîk û şewegirtinê îfade dîke. Ne teoriyeke ku desthilatiyeke siyasî ya hêsan destnîşan bike. Li şeweyeke partiya siyasî jî nayê vegerandin. Şeweyeke şaristaniyê ya domdirêj û berfireh e. Sazûmaneke wisaye ku, him hêmanên biçîn û him jî yên bêçîn vedihewîne, Lêbelê spartî vê yekê ye ku, herî bêhtir tonên vê yên têkel (lihevxiştî), bi şeweyeke bêsînor û azad destnîşan bike û jiyane bike. Teorî û pratîka pêşveçûna azad a jiyane ye. Dema ku van hemûkan pêktîne, li derî parastina rewya ya ligor hiqûqê, sazûmaneke ku zorê qet nahebîne ye. Sazûmaneke ku, hemû beşên civakî, bi taybetî hemû çînan kevin, û weke zayend jin û zarok ên ku bindest, xwe bi azadî îfade dikin. Ev sazûman tenê ne nakokiyên nava civakê, dahûrandina nakokiyên kû bi derdor re jî, bi pêşveçûna teknîka zanistî re, bingeh digire. Sazûmaneke ku, pêkanîna guheran û veguherînê di mercên aştiyane de, bingeh digire.

Terîfkirina demokrasiya hemdem ku em timî dubare dikin, jiberku nasnameya wê bîrdoziyî ya nû, çarçoveke herî girîng teşkîl dîke ye. Di ala nasnameya bîrdoziyî ya serdest a sedsala 21an de, şaristaniya demokratîk a hemdem dinivîse. Di bin vê alê de, ji heyînen kevin jî sûd werdigire û di suxreya civakê de, herwiha ya nûbûnê de, bikartîne. Di bin vê alê de, çiqas ku hûn bixwazin dîrok û çiqas ku hûn bixwazin pêşerojê hûn dikarin bijîn. Çiqasî hûn bixwazin jî hûn dikarin rojanî (aktuel) jî bibin. Lêbelê bi hişmendiya kûr a krîterên bingehîn û bi naskirina hêzên sazûmanan, bi rêzgirtinî weke ku hûn perestîşê bikin, hûnê girêdanê nîşan bidin û bijîn. Naxwe ev kesayetiya jiyana demokratîk, takeksparêziya ku nihiçka (tehn) karê kapîtalîst ew şet kirî, ne jiyaneke ku hûn dixwazin e. Ku hûn bibêjin, ev jiyaneke ligor pêdiviyên utopya pêşeroje ye` û hûn terîqetbûneke patolojîk (binexweşî) ferz bikin jî, yê ne jiyaneke be. Heta ku hûn bixwazin yê takekesên azad hebin, lêbelê hûnê xwe bi dîroka wê û afirandina zanistî ya pêşerojê ve, girêbidin û xwe pêkbînin. Hûnê ne bibne dîlên dogmayan, ne jî mehkûmê utopyan.

Encex dîrok û pêşeroj bi zanistî bin, nûka hûnê zanibin ku jiyana azad gengaz e. Ne hûnê jibo xatirê dogma û utopyan, di takekesê azad biborin û ne jî hûnê xeberan ji wan re bidin, ku bibine mandeleker (înkarak). Hûnê bizanibin ku, encex takekesê azad bi hêza dogma û utopya bizanibe, lêbelê serî ji wan re daneynê, hêza zanistî û felsefeyê bigire û bijî.

Di nasnameya we ya bîrdoziyî ku hûnê bipejirînin de, ev hikim nivîsî ne. Ev ne hikmên qedere, ne jî yên bêserûberiyê ne. Heta bi dawî hikmên zanistî û yên azadiyê ne.

Piştî kesayetiya nasnameya bîrdoziyî, qada duyemîn girîng, pêşveçûna civaka şarwer a hemdem e, ango zayîneke ji nû ve ye. Heger em bibêjin qada şarwer, qada sêyemîn, ev yê bibe pêngaveke têngîkirinê. Dikarin bibêjin ku, şaristaniya hemdem, li ser sê lingan bilind dibe. Evan civaka demokratîk, siyaseta û dewleta in. Lêbelê demokratîkirina civaka kevin, pêvajoyeke zor û bi pêşveçûneke hêdiya ye. Demokratîkbûna dewletê, ji ber klasîkbûna wê ya herî zor e. Zoriya hestyarî

ya demokratîkbûnê li demokrasiya hemdem, têkoşînên mezin pêdivî dike. Di demên pêşî de, raperîna civakê ya gelemper, ber bi vê yekê ve dibir. Lêbelê dewleta ku serdestiya bîrdoziyî û pratîk bidest xistî, bertekiya (refleks) demokratîkirina gel, zêde mevred kiriye.

Tepisandin û ji rê derxistina rêbazên klasîk, zor e. Di vê yekê de, paşdemayîna mercên şoreşa klasîk û şoreşa hember jî, roleke girîng dileyîze. Ædî dor digihe siyaseta demokratîk, amûr û şeweyên çalakiyên wê, yên ku di navbera dewlet û civakê de ji mecbûrî erk qezenc kiriye.

Di dîrokê de, qadên dewlet û civakê gelekî hatine nasîn. Hêza serhildana gelan, weke deng û daxwaza civakê rol dileyîze, dewleta ku weke otorîteya kevin hebûna xwe dide hiskirin, weke qederê ye. Mirov dibe qey ji bandora wê rev tine. Bi taybetî civak û dewletên klasîk ên ku li derî navendên şaristaniya kapîtelîst, bi şeweyeke herî neyînî ku dikirîşîne nava xwe, kevneperestiya wan hê bêtir bi berhevdan e. Terazeke kevneperest a nû tê damezrandin. Hatibû bawerkin ku ev teraz ê bi şoreşê were şikandin. Hinek mînakên wê yên serkeftî, biribû ber bi encama ku şoreş ê berfireh bibe. Lêbelê pêşgiriya ku statukoya kapîtalîst-empyralîst standin, bandora vê rêveberiyê bi sînor kir. Ligor ku dewleta dema kevneperestiyê jî, nikare xwe bi xwe demokratîk bibe, mecbûr dimîne ku qadeke nû bi keve hereketê. Têgihîna dewleta ku li navendên kapîtalîzma dema qeyranê jî, kevneperest bûye û derdor xera dike, li vanderan jî, hereketa qada sêyemîn pêdivî dike.

Qada sêyemîn, qada siyaseta demokratîk e. Mercên şaristaniya ku ketiye nava rewşeke aloz jibo herkesi pêdiviya wê ku xwe ferz dike, amûreke şarwer pêwîst bû. Ev amûr ne amûrên şoreşê yên hişk bûn û ne jî qayîşên ragihîne yên ku dewlet dirêjî civakê dikirin. Ev amûr, rêxistinên serbixwe yên ku xwedî nasnemeyekê, di navbera dewlet û civakê de ku li hember herdukan jî bi navbereke diyar rawestiyayî û ligor pêdiviyên şeweyên digirin e. Ne li dijî dewletê ne, ne jî hevkarên wê ne. Di fermana pêdiviyên de ye. Ev ne rêxistinên civakî yên bingeşînin jî. Ne saziyên ol an jî yên sincin jî. Endamên wê bisînor in û ligor peywirên ku bi cîh tînin şeweyên girtine. Bi qadandina peywirê re, ew jî diqedin, ligor peywirên nû vediguherin. Vê nimûnekê, ji herkesî re weke rêyeke pêdivî ku ji qeyrana şoreş û şoreşa hember derkevin, hebûna xwe bi bandor domandiye. Jiberku pêdivî, ji qada aborî heta bi çandê, ji sporê heta bi derdor, ji aştîyê heta bi mafê mirovan xwe ferz dikan, girîngiya vê qadê, roj bi roj zêde dibe.

Terîfkirina qada sêyemîn a di vê çarçovê de, ne bese. Qad, pêdivî dibîne ku derawaya xwe ya teorî û pratîk hê bêtir zelal bike.

Çiqas ku diçe, pêdivî bi teorî û pratîka qada sêyemîn, çêdibe. Teorî, bername, stratejî û taktîka xwe pêwîst dike. Ev pratîkbûneke nû ye. Ji têgihîna partiya ku bi ranta dewlet û civakê ve girêdayî, zorê li derbasbûyîna partiya fonksyonî ku ligor pêdiviyên diyar dibe, dike. Partiyên klasîk jî di nav de, hemû rêxistinên bi têgihîna rantê, ligor teoriya civaka şarwer, bi veavabûna nûjen re rûbirû ne.

Serkeftina şaristaniya demokratîk a hemdem, hê bêtir di vî warî de rola wê were terîfkirin û ligor wê bigihe şeweya rêxistin û çalakiyê. Dewlet û civakên ku qada sêyemîn pêşvenebin, ji meşeke kulek rizgar nabin. Rêbaza cudaxwaz û şideta ku zorê dike, encex bi azadbûna vê qadê û leyîstina rola wê ku bi temamî bîne cîh, yê ji pîrsgirêkî derkevin. Bi vî aliyê xwe, ev çêbûna ku em dibêjin qada siyaseta demokratîk, ji siyaseta xitimî, deriyekî ji siyaseta ku çareseriyên dibîne re vedike. Çiqasî ku saziyên civaka şarwer cirbicur û bi erk bin, qada siyaseta demokratîk a ku herî germ û berhemdar yê ewqasî çareseriyên bibîne. Rêya tenê ne şoreş û ne jî şoreşa hember e. Herî bêhtir rêya çareserî ya siyaseta demokratîk ku gelek alternatîfên çareseriyê vedihewîne ye. Çiqas ku diçe jîyan, jibo pêşvebirina civaka şarwer, çêkirina pêşnûmayan (proje) û sepîna wan, derdixe pêş. Kî, kîjan sazî û partî xwediyê van pêşnûma yên civaka şarwer, rêxistin û xebatên wan be, yê bibe xwedî derfetên ku civak û dewletê demokratîk bike. Vî karî, partî û saziyên ku dûrî siyaseta rantê, yên ku nixan hildiberînin û vê digihînine civata demokratîk û dewletê, yê pêkbînin. Ædî dîrok rola veguherîne, bi kes û saziyên ku xwedî teorî, bername, stratejî û taktîkên bi vî rengî, dide leyizandin. Encex kesên ku ji xweferzkirina dewletê û daxwazên civakê yên ne rast re, ne be amûr, yê di pêşvebirina pîvanên demokratîk ên hemdem de û jibo civak û dewletê suxreyên herî sûdmend de, rola xwe bileyîzin.

Ev tê vê wateyê ku, civaka dema qeyranê dikeve nava derneketinê û têgihîna dewletê ya ku vê derneketinê kûrtir dike, şensê çareseriyê dikeve destê teoriya qada sêyemîn de. Ev rêyeke teorîk û pratîk e ku li ser çiqasî rast û tekûz were xebitandin û pêdiviyên wê werin bicîhanîn, serkeftin ê ewqasî mezin be.

Ev hemû ravekirin jî didine nîşandan ku, şaristaniya demokratîk a hemdem, ji merhaleyeke statukoparêz gelekî dûr e û ji endezyariya civakê ya utopîst û serencperestiya ku mehkûmî dewletparêziyê dike, cuda ye. Di şaristaniya demokratîk a hemdem de, dewlet nayê hilweşandin û perçekirin, hêdî hêdî dikeve rewşa kereseyeke xurde û davijine selika kerşê (sergo) ya dîrokê. Ya

rast û ya ku yê pêkwere jî ev e. Ev ne dewleta nû, amûra çewsandinê ye ku li şûna amûra şaristaniyê ya kevin hatiye damezrandin. Ev amûreke kordînasyonê ya gelemper e ku, spartî keda hilberîna herkesî, civakê û saziya ye, pîvanên dadmend û azadî yên gelemper di asta herî bilind de temsîl dike û vedinihêre. Darê wê yê lêdanê, çaka wê ya kuştinê û zîndana wê ya ku tê de asê bike, çenabin. Çiqas ku roj bi roj nêzîkî parvekirina "ji her kesî re ligor behre û pêdiviya wî" bibe, yê bibe civakeke ku bermayînen dewletê yê dawî jî, bavêje muzeyeke alavên kevnare. Şoreşên teknîk û zanistî, ji hemû deman zêdetir mirovatî, nêzîkî van xeyalên rasteqînî kiriye. Ya kevin, mertalê şaristaniya demokratîk a hemdem bû. Ligor ku dîrokê ew jî derbasî dewrê kiriye, serfirazî ji hemû deman zêdetir, yê mafê kedkar û gelên bindest.

4- Lêrastanîna şaristaniya demokratîk a hemdem jî, pirsgirêkeke aloz derdixê holê. Ev mîsoger e ku her serdemek giyanêke xwe ya bi dem heye. Serdemên civakî yên ku di ser demê re bin an jî bi demê ve girêdanên wan nebin, tine ne. Dem bi xwe, çalak û hêmanêke çêker e. Bi hemû aliyên din ên bingehîn re dixebite. Demên serdema civakî, rastiyeke in û pêwîst e birastî bête dîtin. Çiqas ku taybetiyên serdema û bandorên wan ên diyalektîkî yên li ser hev, bi awayek rastî li holê were danîn, derfetên terifikirina zanistî yê dîrokê, herwiha yê civakê, ewqasî zêde dibin.

Taybetiya jihevderxistina serdema civaka neolîtîk ev e, qezenckirina derawaya çandiyar û xweyîkirina ajalên kedî, bi pêkanîna teknolojiyêke ku ev gengaz kiriye, derdikeve holê. Taybetiyên bingehîn ên vê serdemê, ax, rîwekê û darên curbicur ku tînen hilberandin, ajalên kedî ku tînen xweyîkirin, gundên cîwarbûyî, civaka daykanî ku li dora jinê şêwe digire, bixwedakirina heyînen ku di jiyana de rola mezin dileyîzin û dişînine ezmanan û tîgihînen ol û mîtolojiyê yê bi vî ve girêdayî ne. Tevrik, bivir (tevir), halet, tekelek, amurên dest ên raçandinê, aşîkê destan, amûrên necirandina keviran, ker, dewar û ajalên piçûk, amûrên hilberîna yê herî li pêş in. Civak bi şêweya qebîleyan, di sazûmanêke bi xwedaniyêke pevrayî de, dijî. Bazirganî û veguherîn di asteke hêsan de, veava dibe. Cureyên ziman bingehîn ên dîrokê çêdibin û ji hev tînen dêran. Dema serdemêke wiha, weke bêdawî tê û bi hêdiya dixebite. Hestên pêşî û yê paşî zêde pêşveveçûne. Bîrûbawerî û hesteke wiha pêşdikeve ku, ji mirov weye cîhan, di destpêka serdema jiyaneke mîna bihiştê de ye. Di navbera mirovan de, hestên xisimtiyê yê ku pêşveveçûne, êdî pêşvedîçe. Cîh ji zoreke birêkûpêk û bi armanca talanê re, tine. Di civaka daykanî de, çanda bingeh di vehûna (tevînek) aştîyê de ye. Biyanîbûna li bîrûbaweriyê ku hevûdin tine bikin û talanker bin, dabaşa xeberdanê ye. Ziman helbestkî ye. Ji ber vî yekê jî, ji vî serdemê re `dema jiyana mirovan a helbestkî`, tê gotin.

Dem an jî serdema civaka koledar, bi kolekirina mirov ve girêdayî ye. Amûra hilberîna ya herî berhemdar, mirov bi xwe ye. Civaka qebîletî ya ku xisimên hev, bi şêweya çînçînîbûna koledarî tê perçekirin, pêwendiya rêveber û yê tînen rêvebirin bi awayek berfireh, serdest dibe. Ev çêbûna ku yekem car tê pêkanîn, di hişê civakê de rê li ber guherînen kûr vekiriye. Li hawîrê rêveberan, bajar û dewlet-bajar derdikevine holê.

Beşeke mezin ji mirovan dikine suxrevan, beşeke herî piçûk ku pêdiviyên wan ji aliyê suxrevanan ve tîne cîh, xwediyên jiyaneke rihet û bi awayek efendîtî, tîne bilind kirin. Vê veguherîna civakê ya bi derasayî, di bîrûbaweriyê de, rê li ber serdema mîtolojiyê vekiriye. Di derûna mîtolojiyê de, du sedemên girîng rolê dilîzin. Şêweya hilberîna koledar ku bi awayek derhoze (mucîze), berhema zêdek pêşkêşî beşa serdest dike, bi vî ve girêdayî sedema duyemîn, tê çespendin ku civaka bi vî rengî sazûmana xwezayî bi xwe ye. Hilberînerên mîtolojiya Sumer, ev peywira xwe bi awayek gelek ciwan anîne cîh. Xwedayên afirîner ên li ezmên û li erdê mirovên benî yê ku afirandine, xweda tim tîne bilindkirin (yê tîne bilindkirin efendî ne) û mirovên daxistî (kolebûn vî pêdivî dike). Ev hemû karên ku rahîbên Sumer pêkanîne. Derdikevine Ziggûratan, xebata ezmên a birêkûpêk, tevgerên heyv, roj, stêrik, demsal, şev û rojê ku timî tîne dubarekirin, dibînin û vî yekê jê diderînin. Zagonên ezmên vîyana xwedayan nîşan didin, hêzên ku li ser rûyê erdê zagonan didine meşandin jî, temsîlkerên xwedê, rahîb-qeran an jî qerantiya xanedanan e. Ew xwedê, xweda jî wan bihêz dike.

Ziman û ramana vî rastiye, bi mîtolojiyê tê binavkirin. Jiberku di asta gotegotê de maye, hê nebûye ol. Piştî demê çaxê ku veguhêzkarên cîhê rahîbên afirîner girtin, ev ên weke rêzikên ol ên mîsoger, yê li ser serê mirovan bibin kom. Nasnameya sêwirana mîtolojîk, dexma xwe li serdema koledar a ku bi hezar salan domandî, xistiye. Ev serdema ku di bin dagirkeriya civaka neolîtîk de, lêbelê çiqas ku diçe, kûr û berfireh dibe, di cîh de ye ku bi navê serdema mîtolojiya were binavkirin. Qalibên bingeh ên bîrûbaweriyaya mirov, bi efsaneyên mîtolojîk hatiye dagirkirin. Weke ku koletiya fîzîkî ne bes bû, êdî koletiya hişmendî jî tê bi cîhkirin û serdest dibe. Mirovatiya ku hiştine mîna zarokê, bi çîrvanokên mîtolojîk dixapînin û rêvedibin. Ev serdem, serdema ku qeran û xanedan bi awayek bêhempa hatiye hildan e. Ji ber vî yekê, fêhmkirina dîrokê, bi dahûrandina zimanê mîtolojiyê û serdema wê ve, ji nêzîk ve girêdayî ye. Kesê ku jibo serdema mîtolojiyê bibêje, efsane ye û bi kene

bibore, bi zanîn an jî bi nezanîn ji rejîma benîtiya binalet re, suxreyê dike. Serdema mîtolojiyê, dergûşa ku ol welidandiye. Kevneşopiyeke bingeh û orîjînal e.

Di dema feodalîteyê de, jiberku olîtî serdest e, bi serdema teolojiyê tê bi navkirin. Sazûmana pêwendiyê ku ji koletiyê hatiye standin, hinekî tê nermkirin, lêbelê bi rêzikên hişk ve tê girêdan û tê berdewamkirin. Keda ku bi axê ve girêdayî, hêmana ku herî bêhtir berhema zêdek dide ye. Herwiha têtikiliyên serf-senior, gundî-derebeg û mîr-xulam, rewşa xwe ya bingeh didomîne. Herênaya xweda-benî jî, weke nîşana pîroz a vê pêwendiyê, bi bilindkirin berdewam dike. Yekbûna xwedê û hebûna wî, hatiye çespendin. (Eslê wê, mîsogeriya çînçînûbûnê û rejîma qerantiyê nîşan dike)

Peywira ji mirov re dimîne ev e ku, ji xwedayê (efendiyên xwe, mîrê xwe, bavê xwe) xwe yê bi tenê û yê herî bihêz re, jibo ku ew ji neyîniyê afirandiye, timî spas û perestîşê bike.

Ligor rêzik û baweriyên ol, girêdana bi sazûmanê ve, ji nû ve bi pîrozwerî tê berdewamkirin. Şeweya nû ya civaka biçîn, monarşî û siltantî, bi nîrxandina weke temsîla sazûmana ezmanî ya li ser rûyê erdê, berdewam dike. Di bingehên hê bihêztir de, di bîrûbaweriya mirovatîyê de, di sazîbûnên polîtîk de, tê serdestkirin. Ji baranê direve û li terezê rast tê, berevajî vê ji berf û terezê direve, li baranê rast tê. Êslamî û xiristiyantî di serî de, hemû nasnameyên bîrdoziyî ku li feodalîzmê hatine anîn, him mîtolojiya kevin û him jî şeweya ramana felsefeya ku nû çêbûyî, di suxreya ol de bikartînin û serdema teolojiya bişeml a serdema navîn diderînine holê.

Derketinên feylesofîk û pêxembertiyê, di derbaskirina koletiyê an jî nermkirina wê de, roleke dîrokî ya mirovatî listine. Lêbelê mebesta wan çibe bila bibe, li ser mîrateya wan olên ku gihandina avahiyên perestgehan (mizgeft, dêr, kenîşte, xelwetxane), weke kemna serdema feodal suxreyê dikin. Hiş û giyana mirovatîyê, di dagirkeriya xwedayan de didomîne. Serdema teolojiyê ku bi kurahiya bêwateyîyê, ji aliyê felsefeyî ve ji helbestê tê qutkirin, bi taybetî di dema hilweşînê de, werdigere qabûseke ku bûyina serdema tarîtiyê heq dike. Bi hindikayî liqasî serdema mîtologiya were dahûrandin, yê dîrok were ronahîkirin, herwiha gel ê hê bêhtir were fêhmkirin. Dema ku em helbestiya neolîtîkê, mîtologiya koletiyê, teolojiya feodalîteyê, bi ziman û mantiqê wan bi awayek zanistî dahûrînin, emê civakê, gelan û mirovatîyê bi awayek watedar bigihînin serfiraziyê.

Dema kapîtalîst, bêhtir weke serdema felsefeyê tê nîrxandin. Şerê raman ê mezin teolojî jevxistiye. Ev kemna li ser civakê kişandiye û di warê têtîgîştîneke rast de, pêngaveke bêhempa avêtîye. Bi vî aliyê xwe feylesof, di rola pêxemberên serdema me de ne. Cudahiya wan a bitenê, xwedê zêde tevî karê xwe nakin, pêvajoyên xwezayî û civakî, bi zagonên xwe yên hundirîn rave dikin. Ramana bi vî şeweyî, mirovatîya ku bi tekûzbûna pratîkê asta hişmendîya gelemper qezenckirî, îfadekirina vê ya di asta herî bilind de ye. Ezmûna di derbarê xweza û civakê de, ravekirina bi nêzîkbûnên mîtolojîk û teolojiyê, anîbû rewşeke pêkenî. Takekesê ku di destê dogmatîzmê de, azadîbûna xwe winda kirî, hewl dide ku li xwe bigere, bi bêzarbûna (ecizbûn) ji xwedayan, dixwaze ku qedera xwe têxe destê xwe. Meşa ber bi takekesîtiyê, wêrekîyê pêdivî dike. Mirov hê nûka ji sîbûnê derdikeve û hewl dide ku were rewşa kirde. Ji ber vê yekê jî, ji ewlebûna bi xwe pêde ti çareyên wî tine ne. Bi ewlebûna bi xwe, wî wêrekî ramanê dibe ku ol tevî karê xwe neke. Felsefe merhaleyeke ramana azad e ku, pêvajoyeke bi xwe ewlebûn û wêrekîyê rê li ber vekirî, derandiye holê. Ædî di nava kar de, xweda tine ne. Weke zarokan hûn xwe na spêrine mezinekî û najîn. Hûnê hewl bidin ku bi hêza nefsa xwe, bi daxwazên hişyarbûyî û ramanên xwe, cîhanê şîrove bikin û bijîn.

Felsefe şeweya ramana demeke ku takekes, hêz qezenc kiriye. Encex bi şeweyên ramana ku zarokan bi ewiqîne alozbûna civakê, qanîkirina serdemên ku bajarîbûn mezin dibe û belav dibe, ne gengaz e. Felsefeya ku di dema dawîya koletiyê de, li bajarên pêşvecûyî zayî, piştî ku di suxreya olê serdema navîn de, tê bikaranîn, encex di serê serdema nû de digihe azadiya xwe. Serdema felsefeyê, dema ku mirovatî serdema mîtolojîk û olî ya zarokatiyê derbas dike û qedera xwe bi dest xwe digire, nîşane dike. Li şûna xwedayan, bi çêbûnên xweza û civakê re, li hesêbdîtînin û lihevkerîne digere. Felsefe ketina serdema rastiyê ye, aqilkirina ku ji hêzên xwezayê bêhtir sûd bigirin e. Ev mîsoger e ku dema felsefeyê, serdemeke ku mirovatî bilind kiriye.

Ev nayê mandelekirin ku pêşvecûna zanistî, bi felsefeyê lezgînî qezenc kiriye. Ev jî ne gengaz e ku em bibêjin, zanist felsefe derbaskiriye û felsefe ji pêdivî derketiye. Lêbelê ev jî rastiyeke ku, di dema gihîştina kapîtalîzmê de, girîngiya xwe ya kevin berdewam nake. Liqasî ku em felsefeyê weke şeweyeke ramanê ya taybetmendîya kapîtalîzmê bibînin, pêwîst e em ne nîrxînin ku kapîtalîzm jî têtikiliyên xwe ji felsefeyê qut dike.

Ev mîsoger e ku kapîtalîzmê helbestî, mîtolojî û teolojî, ji hundir ve ne jiyaye. Ev rastiyeke ku helbest, mîtolojî û teolojî, li mandelekirineke bêteşe rast aniye, xwe hê bêtir bi aqil û rasyonel nîşan daye. Dema ku temsîl dike, ne şahidê bandorkeriya helbestê ye, ne yê lehengiya mîtolojiyê û ne jî yê pîrozweriya teolojiyê ye. Bi rastanîna van serdeman ya li mandelekirineke bêteşe, mirovatî hejar

kiriye. Serdema aqil ku bilind kiriye, ji têkirina ajoyên xweperestî yên birasyonalîzm û mantiqekî pêşveçûyî, wêdetir ne çûye. Kapîtalîzm bi vî aliyê xwe, rejîmeke ku herî bêhtir rexneyan heq dike ye. Serdemên ku mirovatî bi hezar salan hilgirtin, ji çavan dût digire, ya xeternaktir têxe derawaya malê muzeyê, mehkûmî dema herî serkî (rûxarkî) dike. Afirîneriya giyana mirovatîyê, hişk kiriye. Wisa li mirovên vê serdemê kiriye ku, jibo xweperestiya xwe, hemû tiştî qurban bike. Bi hesabê berjewendiyên zûwa, bi leyîstikên borsayê, veguherandiye qumareke gelemper. Bi taybetî rewşa qeyrana gelemper ku dijî, hisdike bila bibêjin `dawiya dîrokê` û hisdike bila bibêjin `serdema postmodern`, mirovatî aniyê ber tinekirinê ku dişibe serdema nezaniyê. Dema ku serdema nû dest pêdike, girêdanên berjewendiyên sazûmana bişeml, bi hejarkirineke mezin a giyanî û bîrûbawerî re rûbirû tê. Bi xwe ewleyiya takekesîtiyê, ramana afirînê, ronahî û romantîzm, cîhê xwe didine tîrsa takekesîtiyê, şik, reva ji raman û felsefeyê. Giyanîtiyeke ku teslîmî ajoyên xwe bûye û berjewenperestiyeke ku ji zincîrên xwe filitî, gel li hemberî qeyranê û derdor jî bi xirabûneke mezin re rûbirû hiştiye. Herwiha heger em dema kapîtalîzmê bi "dema xwedayên piçûk" ku hemû dîrok, civak û cîhan bi qurbanî berjewendiyên xwe yên piçûk kirine, bi nav bikin, ev yek yê bisosret be.

Di zimanê vê demê de, hemû peyv veguherandine davikan (xefik). Peyv û ramanên ku bi wan ve hûnandî, mirov dibê qey jibo xapandina xwezaya bingeh a mirov û bîrûbawerî û giyanîtiya wî hatine birêzkirin. Bi rêzkirineke bi xayintî û rezîlî. Jiberku evan peyvan hinek rastiyan temsîl dikin, xeterî mezin bûye. Tîknîk û zanist, bi mantik û zimanê kapîtalîzmê weke ku her kêlî dest davêje namûsa mirovatîyê û ketiye rewşeke nehîsguh. Çawa ku demekê rahîbên Sumer, kole bi qeranên mirî re binerdkirine û ev yek weke pêdiviyeye xwedayi ya sazûmana ezmên nîşan dane, mantiqiyeta kapîtalîzmê ya berjewendiyên zûwa, jibo berjewendiyên xwe yên hêsan, ti pîrozî û bilindayî namînin ku destê xwe navêje namûsa wan. Ketûberbûn û bêsilbûna ku di demên qeyrana sazûmanan de, di kapîtalîzmê de digihe xalên herî serik. Serdema takekesîtiyê ya bişeml, veguheriya serdema takekesparêziyeke bêsiinc, berjewenperestiyeke ku hişk tê parastin û dizîyeke bi xayintî ku hatiye fermîkirin.

Ev mîsoger e ku ji demên bîrdoziyî, dema herî bêsil û bi qeyran tê jiyandin. Serdemên dogmatîk bi xwe jî, xwedî cîhaneke mantiq a ligor xwe ne. Xwedî toreyên jiyaneke di nava xwe de lihevkirî ne. Demên wan ên ku di warê felsefeyê de, him ji aliyê têgihîna gerdûnî û him jî ji aliyê etîk ve, mirovatîyê temsîl dikin hene. Di serdema qeyrana gelemper a şaristaniyê de, takekesparêziya ku xwe kiriye navenda hemû tiştî, digel hemû mantiqê xwe yê berjewenperest, ne ji nirxên dîrokî û ne jî ji xeyalên utopîk ên pêşerojê re, giramgir e. Reveke ber bi takekesparêziyeke şet heye ku, bi rojane tenê xwe dijî, herî serkî bêaso, ji dîrokê qut û ajoyên xwe têxe şûna azadiyê.

Di serdemên dogmatîzmê de, takekes di nava civakê de hatiye helandin û hemû tiştê wî ji berê de hatiye diyarkirin. Zêdekariya di vî warî de, sedema berbiçav a bilindbûna serdema nû ya di bingeha takekesîtiyê de ye. Di serdemên qeyrana kapîtelîzmê de, bervajî vê, nirxên civakê yên biwate, di nava takekesparêziyê de hatiye helandin. Vebizava li hember vê ya di bin navê sosyalîzmê de, rê li ber sosyalîzmeke rahîbên Sumer a hemdem vekir. Ev mînakên hikarîker in bê çawa zêdekarî hevûdin xweyî dikin.

Piştî şerê cîhanê yê duyem, veguherîna serdemê jibo mirovatîyê, ne dihat hizirandin. Sedema vê ya teknîk û sereke, enerjîya nûkleer ku bûbû çek e. Şoreşa zanistî û teknîk ku kûr bûyî, piştî pênçil salên dawî yên sedsala 20an, yê zorê li afirandina giyaneke demê bike. Şaristaniya civaka biçîn a ku di kesayetiya kapîtalîzmê de, dema dawî ya herî mezin dijî, ji qeyrana ku kûr û domdar dibe, nikare ne bi şer û ne jî bi civakeke nû ya biçîn, derketinekê çêbike.

Di sînga jevketin û hilweşînê de, serdemeke nû herçiqas ku hêdî hêdî be jî, gav bi gav pêşve diçe. Ev yek ji karê rêxistinên şoreşger ên ku xwe piçûk û hişk hûnandine zêdetir, destpêka serdemeke ku teknîk rolê dileyîze ye. Teknîka heyî, di şerê gelemper de, rewşek derandiye holê ku ne yê têkbir û ne jî yê têkçûyî hebe. Ædî bi şeran, ne şaristanî tînen hilweşandin ne jî tîne afirandin. Encex bi hev re, tev yên werine tinekirin. Ji aliyê din ve bi teknîka heyî, astek hatiye girtin ku hemû nakokiyên civakî, bêyî ku serî li zorê bixin, yê bikaribin çareser bikin. Asta teknîka ku hatiye girtin, şeweyên civaka biçîn jî di nav de, dikare pêşnûmaya her veguherîneke civakî pêkbîne, ev yek aliyê darning e ku serdema nû xwe dispêriyê. Veguherîna darning a şoreştî, sedema herî vekirî ya guherîna rewîştê demê ye. Dema veguherîna serdema darning a bi vî rengî, yê bibe serdemeke din.

Ev serdema ku bi berfirehî me çarçova wê terîfîkirî, şaristaniya demokratîk a hemdem e.

Berî her tiştî ev serdem, serdemeke ku di dîrokê de yekem car gelan, giraniya xwe danîne ser siyasetê ye. Demokrasî (demos kratya), tê wateya rêveberiya gel. Herwiha, bi gelek aliyên xwe pêktê. Hemû demên kevin, bi navê çîna serdest, dihatin diyarkirin. Weke serdemên koledar, feodal, kapîtalîst ûwd. Di wan deman de, hebûna gelan tine tê hesibandin. Dîrok bi navê qeran û

xanedanan tê nivîsandin. Ji afirînerên rast, ti agahî tine ne. Bîrdozî bi xwe jî nîşandana rasriya rêvebera ye. Dema ku desthilatiya daring têr nedikir, desthilatiya menewî û hêza xwedayî, timî li ber seriyan amade bû. Di kapîtalîzmê de, neteweperwerî bi xwe bi awayek lezgîn bi şovenîzmê lihev tê xistin û weke heyîneke daringî, li serê netewê dikine bela. Li şûna berjewendiyên rast ên netewî, bi neteweperestî berjewendiyên çînî yên herî qirêjî tene veşartin.

ædî sepîneke sazûmana demokratîk a ketûber jî, dide çespendin ku aktorê bingeh gel e. Serdema serdestiya kesan, xanedanan û çînan ê bêsînor, derbasbûye. Bi hemû dewlemendiyên çandî, gel di dewrê de ne. Dîktatorên ku dibêjin her tişt ez im, bi xwe jî encex dema ku gel li pişt be, bibe xwedî hêzek. Gelan di serdema neolîtîkê de, rewşa goştperê (embrîyon, rûşeym) dijiyan. Bi derbasbûyina civaka biçîn re, di erdê de çikayî man. Çi efendiyên civaka biçîn ku nû hatin, heta bi dawî ew bikaranîn, dan xebitandin û dane şerkirin.

Eslê wê ew çêkerên dîrokê yên rasteqîn bûn. Lêbelê navê wan jî nedihat bîr anîn. Xwediyê her tiştî û afirînerê wan, efendî û sazûmana wan a xwedayî bû. Di bin navê dîrokê de, derûyên mezin bi vî rengî tene nivîsandin, lê ew bi bédengî û bikûrayî, biêş û zehmetî, ji zanîna demê timî fêr bûn û mane li benda hatina serdema xwe.

Li hember jehrdayîna neteweperestî û faşîzma kapîtalîzmê, hilatina gelan êdî ne dihat derengxistin û astengkirin. Di vî babetî de, piştî şerê cîhanê yê duyem, dikare bibe mîlada hilatina gelan a jî nû ve. Dawiya sedsala 20an, timî dibe şahidê serfiraziya demokrasiyê. Lewra serdem bi xwe, jibo desthilatiya gelan, serdema şaristaniya demokratîk a hemdem e ku binasaziya teknîk û saziyên polîtîk bingehin.

Di ketina serdema gelan de, gelek berdel hatine dayin. Di pêvajoya dîrokê de, hemû barê şaristaniyên ku spartî çînçînîbûnê, gelan kişandin. Li ser wan hemû curên çewsandin, komkujî, mijokatî, talan, koçberkirin û bişavtin, hatiye sependin. Bi vî jî ranewestiyên, xweferzkerîna menewî û bîrdoziyî, heta bi dawî hatin ceribandin. Bi navtêdanê, bi hevûdin dane qirkirin. Nijadkûjî (jenosîd) hatin jiyandin. Bi taybetî di şerên cîhanê berfireh, yên di sedsala 20an û di gelek şerên herêmî û cîgeyî de, dîsa yên ku hatin qirkirin, gel bûn. Di serdema navîn de, şerên ku li ser navê ol hatine meşandin, di serdema kapîtalîzmê de, li ser navê neteweperweriyê hê berfirehtir û stemkartier hatine meşandin.

Gel jî di van hemû serdeman de, vala ne rawestiyên. Serhildan û hêrîşên qebile û eşîran ên li hember koledariyê, şeweyên berxwedana civakên olên yek xweda, yên nivî olî û ya gelên kevna û navîn, ti caran kêr ne bû ye. Di vî babetî de dîrok seranser, weke dîroka berxwedana gelan a di bin kemna eşîrtî, olî û mezhebî de, berdewam kiriye. Ev dîroka ku ne hatiye nivîsandin, ji rê hatiye derxistin û ji hineke din re kirine mal, dîroka gelan a azadiyê ye.

Tevgerên berxwedanê yên gelan ku hemdemtir, di sedsala 20an de, dexma xwe li dîrokê dan. Digel hemû çewtîtiyê sosyalîzma reel, şerên ku li ser navên sosyalîzmê hatin meşandin û şerên rizgariya neteweyan, di derûna xwe de şerên berxwedan û azadiya gelan e.

Di van hemû berxwedanan de, çanda gelen ku hatî tepisandin û hewl didan ku tine bikin, li ser lingan man. Digel ku berxwedana gelan, di warê siyasî de serneketibe jî, sernedanîna çandan, serfirazî û payidariya wan daye çespendin. Ji aliyê din ve, piştî şerê cîhanê yê duyem, temsîla gelan a di saziyên siyasî de, pêşve diçe. Di dawiya sedsala 20an de, di tevaya cîhanê de, ya serfirazbûyî ne kapîtalîzm, demokrasiya ye. Demokrasiya hemdem, jibo bi cîh hatina xeyal û hêviyên gelan ên hezar salan, pêngaveke pêşî û girîng e. Mînaka reş û spî ya desthilatiyên çîn, zêdekariyê. Rêya herî bikêrhatî ya ku mijokatî ji cîhana rast bête rakirin, pîvanên şaristaniya demokratîk a hemdem ku werine xebitandin e. Divê ku demokrasiya hemdem, weke rejîma rêveberiya gel a herî rast were dîtîn ku, jirêderketinên çînan ên zêde rast bike, cîhana gelan a dewlemend bi xebatbarî bike û cîh bide kevneşopiyên biratî û aşîtiyê. Gel kesayetiyan xwe yên esîl, di bin sazûmanên demokratîk ên ku, lihevkerî û bi rastî tene sependin de, pêşve dibin. Di dema kevinde, lihevixistin û şerên netewî, etnîk û olî yên ku, rê li ber cudabûn û şidetê vedikirin, di rejîma demokratîk a hemdem de, di nava aşîtiyê de tene çareserkin. Heger ku bi daxwaza gelan be, jiyanê di "federasyoneke cîhanê" de, îdeal e. Dewletên piçûk, ne îdealên gelan, îdealên begîtî û beşên bi rewîştên şoven ên neteweperest û etnîk in. Federasyonên berfireh ên herêmî, weke şeweyên demokratîk ên hemdem ku, hemû veqetînan cudabûna çandan, veqetîna ziman, ol û nijadan bê wate dibînin, hebûna xwe didomînin û pêşve diçin. Dewletên herî pêşketî û demokratîk, di bin navên DYA (Dewletên Yekbûna Amerîka), YE (Yekîtiya Ewropa) û KYD (Koma Yekbûna Dewletan) de, kom bûne. Ya ku zor li vî yekê kiriye jî, hebûna gelan a çandî û hêza wan a tevlîbûna siyasî ye.

Li her aliyê cîhanê, tiştên ku dexma xwe li rojevê xistiye, hişyarbûna çandan, gihîştina wan a şeweyên hemdem û hatina wan a rewşa hêmana bingeh a jiyanê ku jêneger bû ne. Gel, yekem car ji

çewsandina bîrdoziyên dogmatîk û utopyayên vala rizgar dibe, li heyînên xwe yên ku ji serdema neolîtîkê ve hatine bin erd kirin, xwedî derdikeve û wan himbêz dike, wan bi jiyana dike. Bi hemû heyînên xwe, dikeve pêvajoyeke mezin a hemdemîbûnê.

Ev rastiyeke derketiye holê ku, şaristaniya demokratîk a hemdem, veguheriya Ronesanseke gelan û pêdivî ye wiha pêşvebiçe. Ev qezenckeke gel a herî mezin e ku, dîktatoriye çînî yên hişk û rejîmên otorîter û totalîter ên weke îfadeyên wê yên berbiçav, paşvedîçin û ji holê radibin. Hebûnên gelan û demokrasî jihev in. Herduk jî di nava girêdaneke diyalektîk de ne ku, ji hev nayên veqetandin.

Civaka demokratîk, siyaset û dewlet, encameke zêdeyiya çalabûna gelan e. Heger liqasî ku di ti demên dîrokê de ne hatî dîtin, di civakê, siyaset û dewletê de, demokratîkbûn bûbe rojeve herî lezgîn, heger ev pêdivî li hemû derên cîhanê were jiyandin, ev rastî ji mikurhatina hişyarbûna gelan, ronakbûna wan û hatina wan a rewşa hêzeke siyasî pêde, nayê ti wateyên din. Faşîzm, dîktatoriya kapîtalîzmê ya bi zêdekarî bû. Sosyalîzma reel, fanatîzma çîna bindest bû. Lêbelê demokrasîya hemdem, rejîmeke gelan a rêveberî û jiyane ya ku, gihîştîye, bîngeha wê ya dîngî rast e, herwiha payîdarî û serfiraziya wê, domdar e.

Ev terîfîkirin, bi awayek vekirî didine nîşandan ku, digel rewîştên kapîtalîzma serdema me ya bi qeyran ku jêvekirî û hildiveşî, berevajî wê, serdema şaristaniya demokratîk a gelan, weke hêzeke dahûrîner pêşve diçe.

Em hewl bidin ku careke din taybetiyên serdema şaristaniya demokratîk bi kurtayî bînin zimên:

a- Spartî bîngeheke teknîka berbiçav, zanistî û bîrdoziyî ye. Digel teknîkên ji koka fizîka mekanîkê, teknîkên di bin kontrola enerjîya nûkleer de, bîngeha civakê ya dîngî ji binî guhertiye. Heger ku bi rasteqînî û di cîhê wan de werin bikaranîn, evên zincira hejariyê ya ku ji newekheviyên civakî û çînçînîbûnê tê, perçebikin. Ev tesbîteke zanistî ye ku, çavkaniya çînçînîbûnê û newekheviyên civakî, ji teknîk û amûrên hilberîne yên paşdemayî tê. Şoreşên teknîk, ên di pêncîh salên dawî yên sedsala 20an de, civak ji vê mehkûmbûnê rizgar kiriye, zemîna dîngî ya sazîbûnê bi newekheviyê ve girêdayî, perçekiriye. Heger bi gihînin pêwendiyên rêveberî, yên aborî û siyasî ku di suxreya hemû civakê de were bikaranîn, di bin vê bîngeha teknîkê de, mirovatî yê azadî û wekheviyê bi hev re pêşvebibe. Dema kevin ev dihate xeyalkirin. Lêbelê di serdema şaristaniya demokratîk a hemdem de, êdî amûrên pêkanîna vê xeyalê, derketine holê. Di vî babetî de teknîk, kartêkera azadker a bîngeh e. Di rewşa berevajî de, di destê hêzên xweperest û paşverû de, cinawirêkî tineker e. Ji aliyê din ve, teknîk hemû li dema şaristaniya demokratîk hatiye wergerandin. Pîrsgirêk, pêkanîna civak, siyaset û rêveberîyeke dewletê ya demokratîk e ku, teknolojiyê bi awayek berhemdar, di suxreya civakê de bikarbîne.

Şoreşên zanistî û civaka zanîne, taybetiyeke din a girîng a serdemê ye. Zanîna ku dema kevin derdoreke teng pê dilebikî, bi saya teknolojiya ragihandinê, bi awayek lezgîn digihe civakê. Rastiya civaka zanîne, ji vir derdikeve holê. Bi vê yekê hêza xwerêvebirîne û demokrasî tê qezenckirin. Civak, siyaset û dewleta ku bi zanîne hatine arastin, pêwîst e zîlal (şefaf) bin û li hember hev, venêraneke demokratîk bijîn. Pêşveçûnên di navbera zanist û teknîkê de ku himbiz bûne û rê li ber hevûdin xweyî kirîne vekirine, bi lezgîn bûne. Ev çêbûna ku yekem car pêkhatiye, di mercên hilberîne de, rê li ber teqînên mezin vedike. Hemû fizîk, kîmya, bîyolojî û zanînen civakî gelekî pêşvedîçin, jibo civakê vediguherîne mezintirîn (gewretirîn) çavkaniyeke hêzê. Pîrsgirêk eve ku, weke rêveberîya teknîkê, di bikaranîna zanistê de jî rêveberîyeke demokratîk were pêkanîn.

Rola bîrdoziyê ya bîngehîn, hilweşandina dogmatîka kevneşopiyê ye, çêkirina hêviya utopya û zîndî girtina wê ye. Dema kevin, herî bêhtir dogma serdestî bîrûbawerîyan bûn, di serdema kapîtalîzmê de, futurîzm û curên utopîstiyê pêşveçûn. Herdu şeweyên bîrdoziyê, li ser bîrûbawerî û hemû curên sazûbûnan, fikareyên girîng derandine holê. Bîrdoziyên bi rengê dogmatîzmê, astengiyan çêdikin. Digel ku utopîstî hindiktir fikaredare (bifikare) û rê li ber afirînerîyeke bisînor vedike jî, qutbûna ji rastiye, bawerîya vala, xeyalperestiyeke zûwa û kesayetiya hêvîdar, diderîne holê. Dûrbûna herdu şeweyên bîrdoziyê ya ji cîhana çêbûnê rast û ji afirînerîyê, xalên hevpar ên bîngeh in. Herduk jî nabine bîngeha bîrdoziyê ya serdema şaristaniya demokratîk.

Pêwîst e ku serdem, zanistiya bîrdoziyê û afirînerîyê, bîngeh bigire. Ji xwe, di navbera herdukan de, girêdaneke hişk heye. Çêbûn û têkilî, çiqas ku bi zanistê werine ronahîkirin, rêvekirina ji afirînerîyê re jî ewqasî bi derfet dibe. Takeksê ku bi zanîna dîrok û civakê hişmend bûyî û aqlê wî digihe xebata diyalektîka xwezayê, tê wê wateyê ku bîrdoziya serdemê girtiye. Hêza dogmayê nas dike, lêbelê teslîmî wê nabe. Utopya wî heye, lê bi zanistê ve girêdayî ye. Serdema me ya ku spartî bîrdoziyeke di vê bîngehê de bilind bibe, jiberku yê bi zanîna rast a çêbûn û têkiliyan bilive, yê bi awayek tekuz bigihe hêza sincî û hunerî ya başî û rindiyê.

b- Weke serdema demokratîkkirina civakê, sazûmana şaristaniya demokratîk dabaşa xeberdanê ye. Bi vî aliyê xwe, pêwîst e ku gel, bi nasnameya xwe, bi hişmendî û viyana xwe ya azadî têkevin dewrê. Nasnameyên ku ji hezar salan ve hatine nivandin (xewandin) û binisandin (tepisandin), yê hewl bidin ku li xwe xwedî derkevin. Heyînên çandê yê weke mîrateyên herî binirx werin pejirandin û yê bibine xerca jiyana nû ya bingehîn. Heta niha, hewldanên ku jibo kesan, xanedanan, heyînên olî û berjewendiyên komên teng, dihatin kirin, êdî yê jibo hayina civakî bi xwe, jibo were nasîn û bi jiyana bibe, were bikaranîn. Ev yek tê wateya, demokratîkkirina civakê, weke civaka zanîne berjewendiyên xwe bizanibe, vê têxe rewşa daxwazê û bigihîne saziyên siyasî. Bi vê yekê, ji viyana ku hatî binisandin, digihe dînamîzmeke çalak ku dixwaze û vedinêrîne (kontrol dike). Di vê çarçovê de, civak di dîrokê de yekem car, bi awayek zanistî xwe nas dike, digihe hişmendiya ku xwedî mafe, tê rewşeke ku qedera xwe bi azadî diyar bike. Ev rastî dide çespendin, bê çima şaristaniya demokratîk, serdema demokratîkbûna civakan e.

c- Hêmaneke bingehîn a ku serdema şaristaniya demokratîk diyar dike, demokratîkkirina siyaseta ye. Siyaseta ku di pêvajoya dîrokê de, siftbûna hêza rêvebirîya herî raser û hunera bikaranîna wê, bi rizgarbûna ji cilên xwe yê teng û maskeyên xwe, pêşveçûneke bişeml a di serdema me de, pêkhatîye. Ev yek tê wateya ku, ev siyaseta ji ezmanan ji cem xwedê, hatiye ser rûyê erdê. Nîqaşên di derbarê çavkaniya wê de bi dawî dibin û mikur tînan ku çavkaniya wê ya bingeh, civak bi xwe ye. Siyaseta ku bi sed salan, bi bilindahiyê sexte hatî nixûmandin û jibo ku mirovan bike mîna kerî û bixapîne, hatî pêşvebirin, êdî ketiye rewşeke amûra civakê a herî hêsan. Encex gihane wê hişmendiya ku, di dema dirêj de û weke amûra berjewendiyên jiyaniyê, dikare nirxekî îfade bike. Amûra xwedayî ya van sedsalan a bisêr û bihêz, gihaye wateya xwe ya rast û daye pejirandin ku amûreke jibo suxreya gel e, herwiha hatiye rewşa taybetiyeke serdema şaristaniya demokratîk a li ber çavan.

Di navbera dewlet û civakê de, weke qada sêyemîn siyaseta demokratîk, gihaye rola saziyeke herî zayok û nûjenkirinê. Weke xelesa navbeynkar a bingeh, nirxên ku pêdivî ye ji dewletê veguhêzin civakê û ji civakê veguhêzin dewletê, di serî de partiyên siyasî û saziyên hemdem ku rewîştên demokratîk û dadmend ên van nirxan diyar dikin, ji aboriyê heta bi polîtîkayê, ji mafê mirovan heta bi derdor, ji çandê heta bi tenduristiyê, ji perwerdeyê heta bi aştîyê, di her warî de, heger ku ev amûrên siyaseta demokratîk nebin, ne ji demokratîkbûna civakê û ne jî ji pêşvebirina hestyariyên dewletê yê di vî warî de, tê behskirin. Ev saziyên civaka şarwer ku weke civaka sêyemîn a qada sêyemîn bilind bûne, ketine rewşa jênegiriyên serdema me. Ev hatiye çespendin ku, di serdema şaristaniya demokratîk de, siyaseta demokratîk, serdema her cure saziyên civaka şarwer e.

d- Pêşvebirina hestyariya dewletê ya demokratîk, taybetiyeke din a serdema şaristaniya demokratîk e. Ev amûra di dîrokê de herî kevin û yê ku bidestdixwe dibe ejdeha, gihandina wê ya saziyên demokratîk, pêşveçûneke şoreşger a herî girîng e. Ev amûra ku weke temsîla heyina ezmanî ya li ser rûyê erdê, timî tê bilindkirin, ji amûra kordînasyona civakê ya di asta herî bilind pêde, nayê ti wateyên din. Ev yek bi têrariyê zelal bûye ku, dewlet jibo morov û takekes heye, pêwendiya wê bi xwedayî re qet tine, di pêvajoya dîrokê de, ewqas dijwarî û harbûna wê, jiberku ji takekesparêziyê, xanedanperestiyê û fanatîzma komên teng re, bûbû amûr. Ev jî xweş hatiye fêhmkirin ku, çî tiştên ku dewletê weke heyîneke neberbiçav bilind dike, rezîl e, berevajî vê, çî civaka ku dewletê weke amûra kordînasyona gelemper a civakê bide nîşandan, yê bilindkirina bi rastî be. Ligor vê terîfkirinê, pêwîst e dewlet bête veguherîn, têkeve venêranê, ev yê bibe qezenc û rastiya serdema şaristaniya demokratîk a herî girîng. Veguherîna dewletê ya jibo amûra suxreyê, bilindkirina wê ya weke saziya bingeh a siyaseta, nirxandineke layîqê îfadeyeke di asta bilind de ya serdema şaristaniya demokratîk e. Veguherîna şeweya dewleta demokratîk, pêşveçûna bingeh a dema me ye.

Pirsgirêka şeweyên dewleta demokratîk, di asta duyem de girîngiyê qezenc dike. Lêbelê jiberku bi awayek nerm hatiye avakirin, ji şeweyên konfederatîf heta bi şeweyên unîter, bi awayek berfireh xwedî behreya vebûnê ye, ji aliyê rewîştên çareseriyê ve, girîngiyê bi xwe re tîne. Ligor mercên welat û civakan ên berbiçav, dikarin şeweya herî pêketî biryar bidin. Wesfê pirsgirêkên tevlihev, gelek sazîbûnên çareseriyê demokratîk û amûrên wan, ji xwe kartêkerên ku demokrasî derandine holê. Jiberku dewlet mecbûr e xwe bispêre van saziyan, wateya xwe ya klasîk winda dike, di navbera van saziyan de, weke amûreke kordînasyonê ya herî bilind, rolê dileyîze. Rewîştên bingeh a dewleta bi vî şeweyî, demokratîkiya wê ye. Jiberku demokrasî rejîma saziyê ye, zorê li dewletê dike ku pluralîst û di derawayê piranîpariziyê de be. Bi taybetî organên cîgeyî ku girîngiya wan zêde dibe, navendparêziyê dike rewşa barekî herî giran. Hêz, herikandinê ji navendê ber bi cîgeyî û ji nivînda (odak) bingeh ber bi nivîndên cîgeyî pêwîst dike. Herka gelemper a serdemê jî, ber bi vî alî de ye. Ji civakê heta bi malbatê, ji dewletê heta bi aboriyê, di her astê de belavkirina hêz û derfetan ên

dadmendî û çêbûneke piranîparêz a bi azadiyê ve girêdayî pêşvedîçe. Ev çarçov, ji aliyekî ve peresana demokratîk a dewletê pêşvedibe, ji aliyê din ve, weke armanceke girîng a tevgerên zagonên bingehîn, ji konfederasyonan heta bi çêbûnên demokratîk a unîter, ber bi şewegirtineke dewlemend ve dibe. Ev çêbûn, liqasî ku fikareyên ji têgihîna yekîtiya bîzorê tîn, tine dike, di encamê de fikareyên dewletên piçûk, ku bi hemû aliyan dide windakirin jî, ji holê radike. Çêbûnên weke DYA, YE û KYD, aliyê peresana dewleta demokratîk a hemdem nîşan didin, ev di derûna xwe de, pêşveçûnên dîrokî ne ku civaka nû û siyaseta demokratîk pêwîst dike.

e- Serdema şaristaniya demokratîk, li qasî nû hilatina gelan, hê diyarkertir serdema hilatina jinan e. Jina ku hêza xwedawenda zayok a civaka neolîtîk, di pêvajoya dîroka civaka biçûn de, timî bi windakirinê re rûbirû maye. Dîrok êdî bi civaka biçûn a ku bilind dibe re, dîroka mêrê serdest ê ku hêzê bidestdixe ye. Rewîştî çînî ya serdest, bi rewîştî mêrê serdest re çêdibe. Li vira jî rêzika derbasdarderûyên mîtolojîk û cizakirinên xwedayî ne. Di bin vê de jî, zora bêteşe û rastiya mijokatiyê heye. Rewîştî mêrê serdest ê civakê, heta weke roja îro, fersend ne daye ku heyîna jinê bi zanistî jî bête nirxandin. Ji ol bêhtir weke qadeke tabûyî tê berdan. Di bin navê namûsê de, rastiya jinê a ku mêr bi zexelî, bi xayîntî û bi zorê xesp kiriye, tê veşartin. Jina ku di pêvajoya dîrokê de, ji nasname û kesayetiya wê bêpar hatiye hiştin û bûye dilê mêr, çêbûneke ku ji çîncînîbûnê neyînîtir, derandiye holê. Dîlîtiya jinê, pîvana koletiya gelemper û ketinê ye. Pîvana derew, dizî û zoriya ku di nava civakê de belav bûye. Pîvana hemû şeweyên xulamtiyê û qirêjbûnê ye.

Wergelandina vê dîrokê ya berevajî, yê encamên civakî yên herî kûr bi xwe re bîne. Hilatina jinê bi azadî ya ji nû ve, yê di hemû saziyên civakê yên ser û bin de, azadîbûneke gelemper, ronakbûn û dadmendiyê pêwîst bike. Yê qanî bike ku, ji dêvla şer aşîti hêjaye û pêdivî ye bête bilindkirin. Jina ku qezenc dike, di her astê de, tê wateya ku civak û takekes qezenc dike. Ev çarçova teng jî nîşan dide ku, demokratîkbûna di warê maf û azadiyên jinê de, gelekî dîrokî ne. Di vî babetî de sedsala 21an a ku serdema jina hişyarbûyî, ya azad û bi hêz dibe, dide destpêkirin, çêbûneke ji rizgariya çînî û netewî jî girîngtir e. Dema şaristaniya demokratîk, yê bibe serdemeke ku jin ji hemû deman bêhtir bilind dibe û qezenc dike.

Mijareke ku çanda mêrê serdest bi xemsarî nêzîk dibe jî, helwesta bê berpirsiyarî ê bê hişmendiya li hember ixtiyar û zarokan e. Ew daxistine rewşa jineke duyem an jî sêyemîn. Li hember zarokan cîhaneke ne hestiyar û zalim ferz kirine. Sazûmana bi serdestiya mêr, psîkolojî û cîhana wan qet nayîne hesêb, bi hovane ji nirxên wekhevî û azadî dûr, bi xiyamet e li xeyalên bilind, kesayetiyan xwe yên ku qediyane, bi şev û ro diherikîne hiş û mêjiyê zarokan, ji vê yekê natirse û êşê nakişîne. Nêzîkbûna wî ya li zarokan, ji çewtîti û xeteriyan tije ye. Ev rastî, ji malbatê heta bi dibistanê, ji sikakê heta bi cîhên leyîstîkê, serdest e û bi sazî bûye. Gabûs serdestî cîhana zarokê kirine. Cîhana ixtiyaran jî bi heman rengî, bi tenegehîniyê hatiye dagirkirin. Di navbera wan û lawên wan de, dîwarekî ji pola hatiye hûnandin. Ne hestiyariyeke ku civaka biçûn pêşvebiriye jî, di vê qadê de ye. Dîrok di vê qadê de jî hikmê xwe dide meşandin. Bê wijdaniya gelemper û ne hestiyarî, êşa pêvajoya ixtiyariyê zêde dike.

Ev herdu qadên civaka demokratîk, pêwîst e ji nû ve werin birêkûpêkkirin. Jiyan ne tenê ciwaniya nezan û hovane ye. Cîhaneke zarokan a resene heye ku, pêwîst e qet xiyametî lê neyê kirin, timî rêzdarî jê re bête girtin û pêdiviyên wê bi cîh werin anîn. Xiyaneta li vê cîhana zarokan, timî bi civakê daye windakirin. Cîhaneke ixtiyaran a ku di parzûnê ezmûna jiyanê re derbasbûyî, ya zanakî heye. Civakeke ku ji vê cîhanê dersan negire, ne gengaz e ku bi tenduristî bihizire û bijî. Herwiha zaroktî û ixtiyartî, ne cîhanên berxwarinê ne. Cîhanên berhemdariyê û dewlemendker in. Ev herdu cîhan jî, pêwîst e ku di mercên civaka demokratîk de, di bingeha derawaya wan a resene ku maf û azadiya wan, pêdivî dike de, ji nû ve bi rêxistin bibin û werine qezenckirin. Ev peywirek e şaristaniya hemdem a jênerew e. Di heman katê de, şaristaniya demokratîk, serdema ku zarok û ixtiyar bihezkin û rêzdarî tîne bi bîranîn û bi vê hişmendî û sexbêriya sincî, bi civakê re dibe yek e.

f- Serdema şaristaniya demokratîk, yê bibe demeke ku, mafê mirovan û takekesîti herî bilind bibe û yê bibine taybetiyên şeweya jiyanê nû yên jêneqetîn. Mirovatî û takekesê ku di siya dogma û utopya de, herî bêhtir wîndî kirî, jîbo ku bi xwe were, demeke dirêj derbasdibe, herî bêhtir bi ronensansê pêngaveke dîrokî hatiye avêtin. Lêbelê di takekesparêziya kapîtalîzmê de, dîsa bi windakirinê re rûbirû maye. Encex şoreşên zanistî û teknîk ên sedsala 20an, takekes û mirovatiyê pêwîstî humanîzmeke gihîştî û takekesîtiyê dîkin. Tenê divê ne sedsaleke bixwîn ku li hember mirovatî û takekes bi erjengî û xiyametê dabe windakirin, pêdivî ye ku bi hişmendiya zanistê û derfetên teknîkê, humanîzm û takekesîti weke nirxên jênerew, werin qezenckirin û serdestkirin. Hêviya mirovatî û takekesbûna ku liqasî dîroka mirovatiyê bi temen, yekem car bi saya zanistiyê serdemeke ku were pêkanîn û zemîneke daringî ya zexm bidestxistiye. Mirovatiya ku timî bi taybetiyên etnîk, olî û

netewî tê dabeşkirin, êdî pêdivî ye ku bi teknîka hevpar, zanist û zimanê demokrasîyê re bibe yek. Derfetên vê yekê, liqasî ku humanîzmeke rast xweyî bikin, dewlemend in. Enternasyonalîzm liqasî ku bi ti deman re neyê hevberkirin, ketiye rewşa jiyandinê û bûye saziyeke jêner. Mafê mirovan ne tenê bûye qada hiqûqê yê herî delal, di warê takekesî de jî, gihaye hişmendîyeke ku bi civakê re terazeke herî optîmal (bikêrhatî) pêkbîne û bisazî bibe.

Liqasî dive civakîti û liqasî dive takekesîti, yekem car li navenda jiyana hemdem, bi hiqûq hatiye rûniştandin. Di dîrokê de, belkî jî pêşveçûna herî biwate eve ku, rewşa optîmal a civakî û takekesî, ber bi pêkhatinekê ve diçe. Herwiha, ji ber van sedeman be jî, ev yek yê rast be ku em bibêjine dema şaristaniya demokratîk, serdema humanîzma rast, mafê mirovan û takekesî.

5- Bûutên cîhê şaristaniya demokratîk, di rewşa destpêkên teze de ne. Lêbelê dikare bête gotin ku, yekem car merhaleya şaristaniyeke ku mercên erdnîgariyê pêwîst kirin, di rewşeke li paşmayî de ne. Ev rastî, xwe di wateyeke ku pêşveçûna şaristanî ya nû, mercên erdnîgariyeke diyar pêwîst nake. Hemû serdemên şaristaniya kevin, bi pêşveçûn û belavbûna xwe, di bin bandora erdnîgariya bi şidet de mane. Bi serdema kapîtalîzmê re, ev dem bi dawî bû ye. Di vê rewşê de, digel ku kapîtalîzm di her perçeyê cîhanê de, bê teraz radiweste jî, pêdivî yê bi perçeyek ax dibîne ku lê veguhere û belav bibe. Tiştê lê digere, hê bêhtir di bin navê kadîbûnê de, jibo xwe mercên hiqûqekî ku li hemû cîhanê derbasdar, bide afirandin. Bêhtir ji erdnîgariya pêkhatî, li hiqûqekî pêkhatî digere. Herwiha hiqûqa ku jê behs dike, sazîbûnên aborî û siyasî ku ji heyînen asteng rizgar bibin e. Bi vê yekê kapîtalîzma hemdem, ne neteweperestî, kozmopolîtîzmê dike. Kapîtalîzmê demên berê, neteweperestî û dewletên netewî ferz dikirin, kapîtalîzma ku gerdûnî bûye, edî ku ne gelekî pêwîst be, pêşîkiyê nade neteweperestî û dewletên netewî û van weke asteng dibîne. Yekem car, teknîka zanistî ji derfetên şoreşan sûd digire û hewl dide ku kadîbûnê ligor berjewendiyên xwe birêxistinî bike. Edî ne pîvanên netewî, pîvanên kadî derbasdar in. Her tişt ligor pîvanên kadî tene kêşan (wezinandin) û ligor wê nirx dibîne. Dema ku nirxên netewî ahengê nişan nedin, davêjin muzeya berhemên kevin. Ev pêngava kapîtalîzmê ya hemdem, ne çareserîyeke ku wê ji wê qeyrana kûr a di nav de, rizgar bike. Armanca kapîtalîzmê ev e ku, temenê xwe hê bêhtir dirêj bike û di nava vê demê de, veguherînen pêdivî pêkbîne, herwiha di nava şaristaniya demokratîk de, ji nû ve bibe hêzeke diyarker. Di vî babetî de em dikarin bibêjin ku, pêdiviya veguherîne di asta teorîk û pratîkê de, hê zû hiskirîye û derêxistiye hişê xwe. Ji ezmûnên (tecrûbe) dîrokî jî sûd digire, di warê pêkanîna guherînen ku zanistî û teknîk ferz dikin de, berî sosyalîzma reel helwesta xwe nişan dide û serdestiya xwe diçespîne. Ev hê bêtir, ji navendên kapîtalîzmê yê pêşveçûyî re derbasdar in. Di dawîya sedsala 20an de, tevî sosyalîzma reel, cîhan hemû di bin navê globalîzmê de, weke derdorekê bi xwe ve bi girêçkiriye. Pêwendiyên navend û derdorê, pirsgerêkên germ ên kadîbûna nû, derdixin holê.

Heger ku YN (Yekîtiya Netewan) xwe nû neke, yê weke nimûneyeke navdewletan ku mehkûmî derbaskirinê be, rawestiyayî bimîne. Yekîtiyên parzemînî û herêmî yê bi vî rengî, bi pêdiviya nûjeniyê re, rûbirû ne. Di qada siyasî de, têgihîna yekîtiyên navdewletan ên nimûnakên kevin, ne ji kadîbûna kapîtalîzmê re, ne ji pîvanên şaristaniya demokratîk re, nabine bersiv. Evan berhemên teraza kapîtalîzma klasîk û sosyalîzma reel bûn. Ligor ku ev dem hatiye derbaskirin, çêbûnên wan ên siyasî jî, yê werin derbaskirin.

Weke saziyên leşkerî yê bingehîn, pêdiviya ku NATO û Peymana Warşova jî, bi dawî bibin. Ligor ku Peymana Warşova ji mêj de bi dawî bû ye, eslê wê NATO jî ketiye rewşeke bêerk. Dema van û peymanên leşkerî yê bi vî rengî, bi dawî hatiye.

Di serî de IMF û Banka ya Cîhanê, saziyên aborî jî ku xwe nûjen nekin, çiqas ku diçe, xweparastina wan zor dibe. Mantîqê van saziyan ev bû ku, welatên reel sosyalîst ji aliyê aborî ve tecrît bikin û aboriya welatên paşvema, navendên aborî yê bi hêz ve girêbidin. Ligor ku cîhana bi vî mantîqê bêteşe jî hatiye derbaskirin, birêkûpêkkirineke aborî ya nûjen, jênerê dibe. Dijberiya kadîparêziyê, eslê wê ne li dijî kadîbûnê ye, hê bêhtir li dijî vê birêkûpêkkirina wê ya kevin ku ne bi dadmendî ye. Kapîtalîzma hemdem ku di hişmendîya van rastiyan de ye, di bingeha dersên ku ji şerê cîhanê yê duyemîn, gelek şerên herêmî û yê cîgeyî girtin de, bi temamî têgihîştîye ku faşîzm nabe rêbaza ku ji qeyranê derkeve. Ji demokrasîya bûrjûva ya kevin jî sûd digire û qanî bûye ku him jibo navendê û him jî jibo welatên derdor, xwe li pêşveçûna şaristanî ya nû bîne. Ev yek kartêkerê e ku şensê pêşveçûna şaristaniya demokratîk, herî zêde dike. Navendên kapîtalîzma kevin ku, ji demokrasîyê direvîn û xwe li faşîzm û paşverûtîyê digirtin, piştî pêncîh salên duyemîn ên sedsala 20an, weke çêirdîtineke (tercîh) gelemper, xwe li sazûmana demokratîk pêçane. Digel ku dev ji pîvanên çîna xwe û pêşîkiyên xwe bernadin jî, jiberku bi temamî jî windanekin, pêwîst dibîne ku bi pîvanên demokrasîyê jî bike.

Şaristaniya demokratîk, bi mîsogerî ne çêbûn û afirîneke kapîtalîst e. Weke ku me berê jî anî zimên, jîbo derketina ji qeyranê, demeke gelemper a dîrokî û civakî û xweferzîkirina wê ye. Di vir de, serfiraziya kapîtalîzmê, têgihîştina lezgîn û xwelêanîne (adaptasyon). Sosyalîzma reel ku ev hişmendî nîşan ne daye, ji hilweşînê rizgar ne bûye. Lewra mantiqê serdemê û hêza wê ya her kê, kartêkera herî diyarker e.

Bûutên wargehî yên şaristaniya demokratîk ku dikevîne pilana dawî, ber bi pîrsa "pêşikîyên wê çine" ve dibe. Di vê de, kartêkera ku di serî de tê, wesfê gerdûnî yê pêşveçûna teknîk û zanistî ye. Zanist û teknîk, weke malê tevaya mirovatîyê yê hevpar, nîrxên civakî yên herî bingeş in. Li qasî ku ji ti şaristanî, çîn û neteweyê re, nebe mal, bi rewîşteke pevrayî (kolektîv) ye. Para tevaya mirovatîyê di vê pêşveçûnê de heye. Di serdemên hoveber de, çend pêngavên ku komên qebîleyên pêşî avêtin, ji girîngiya xwe ve, ne kêmtî pêngavên zanistên DYA an jî yên Ewropî ne. Di pêşveçûna zanist û teknîkê de, dîrok dide nîşandan ku, tiştê BZ di navbera salên 6000- 4000an de, di heyva berhemdar de hatine pêkanîn, demeke weke vê demê, encex PZ di salên 1600an de derdikeve holê. Ev nêrîneke bi gelemperî tê pejirandine ku, zanist û teknîka neolîtîk him ji aliyê demê û him jî ji aliyê berfirehiyê ve, jîbo mirovatîyê encamên gerdûnî derandine holê û dane jiyandin.

Jiberku zanist û teknîk, xwedî taybetmendiyên gerdûnî ne, parvekirina cîhanê ya weke şeweya kevin, bêwate dike. Ev bi wergiriya xwe çêbûnê ku yekem car pêktên e. Ev çêbûnê didine nîşandan ku di navbera pêşveçûn û belavbûna wargehî de, girêdanê bi şeweya kevin nayê pêkanîn. Ev rasteqînî dide nîşandan ku, şaristaniya demokratîk weke berhema herêmekê nayê nîrxandin, pêwîst e mîna zanist û teknîkê weke afiraneke gerdûnî were fêhmîkirin. Şaristaniya demokratîk, ezmûna mirovatîyê ya hevpar e ku di pêvajoya dîrokê de parzîniye û berhema şaristaniyê ya herî hêja ye. Jiberku li ser pêşveçû, wergirî û şewegirtina wê em rawestiyabûn, em dubare nakin. Hê bêtir li ser rewşa pêkhatina wê ya di asta gerdûnî de, rawestin.

Gihîştina şaristaniya demokratîk a herî zû, navendên kapîtalîzmê yên bihêz pêkanîne. Ev taybetî, girêdana di navbera şaristaniya demokratîk û pêşveçûnê aborî, siyasî û civakî de jî, diçespîne. Ya rast, bandora şaristaniya demokratîk a diyarker ku li ser pêşveçûna ye. Ew welat û sazûmanên civakî ku vê pêşveçûnê bi berfirehî dijîn, binyata xwe ya aborî û polîtîk bêtir berhemdar û jîndarî dike. Navendên kapîtalîzmê yên pêşveçûyî, jiberku herî zû vê yekê dibînin, rêberiya pêşveçûnê dema nû jî bi dest xwe girtine. Di lêkolîn, xûnifandin û sepîna teorî û pratîk a demokratîk de, gelekî pêşveçûne.

Di vî warî de, Ewropa rola pêşengiyê dilîze. Digel ku di navbera wan de cudayeti jî hene, hemû dewletên Ewropa, têgihîştine ku pêwîst e sazûmana demokratîk bête xûnifandin û hê bêtir were pêşexistin. Bi taybetî, şerên olî û neteweperestî ku bi sedsalan domandî û encamên wan ên bixwîn, Ewropa ber bi rewîştê lihevkerin û aşîxwaziya demokrasiyê bîriye. Çiqas ku aloz dibin bila bibin, taybetiya girîng a çanda siyasî ya nû ev e ku, pîrsgirêkên xwe bi sedema sînorên siyasî, ol û bîrdoziyên cihêreng, etnîk û nijadî venaguherînin levdanê û çareserdikin. Êfadeya vê pêşveçûnê ya herî berbiçav, çêbûna Yekîtiya Ewropa ku pêşvedîçe ye. YE ne tenê yekîtiyeke siyasî ye, prensîba şaristaniyê ya gelemper e. Pîrsgirêkên yekîtiyê yên firehbûn û kûrbûnê hene. Yekbûna hemû welatên Ewropa ya di bin banekî federal de, dibêtiyeke bihêz e. Ev nayê hizirandin ku yê rê li ber Ewropayeke paşdetir veke. Ev di rojevê de ye ku Ewropa, yê bandora xwe bi vê pêşnûmayê li cîhanê bike. Çiqas ku şaristaniya demokratîk kûr û berfireh bike, yê derawaya pêşengiya xwe ya di cîhanê de, hişktir bike. Lêbelê ji ber heyîna mercên ku kapîtalîzm derandine holê û jiyana kapîtalîst ku rahên xwe berdane, ev pêşveçûna wê, ne xwedî potansiyelê ye. Yê hêzên rastgir ên pêşveçûna şaristaniya nû, temsîl bikin. Weke ku di gelek pêşveçûnên şaristanî yên din de jî, tê dîtîn, rola navenda nû, encex bi yê dûrî wê re, an jî yên ku di derawayeke nakokî wê de re, pêşvebiçe. Vê rolê, ji mercên erdnîgariya qadê bêtir, yê mercên çandî diyarker bikin.

Şaristaniya Ewropa, weke ku potansiyela xwe bi zêdeyî bikaraniye, tê berdan. Nûjeniyên zêde ku derêxe holê neman. Jiberku bîrûbawerî û giyana kapîtalîst, tevînekên xwe yên hişk çêkirine, vebûna wê ya ji kesayetiya şaristaniya nû re, yê bisînor be. Lêbelê dîsa ji ber nakokiyên nava wê, gelek kes û hêzên nivend, di qada şaristaniya nû de yê roleke tevkarî bilîzin. Mandelekirina hemû taybetiyên Ewropa, encex bi paşverûtiyê gengaz bibe û ev yek derfetê nade pêşveçûnê. Tiştê bête kirin, bi nêzîkbûneke rexnegirî, qaşûlê wê yê kevneperest were perçekirin û avêtin. Jiberku Ewropa bi bertekiyên xwe, nikare rê ji şaristaniya nû re veke, rola wê encex di asta tevkarîyê de be. Sexbêriya herî rast ev e ku, ne li hêviya rola yekî rizgarker bin ne jî mandele bikin. Dahûrandin û derbaskirina bi nasnameya bîrdoziyî ya nû, pêwîstiya vê sexbêriyê ye. Ewropa, yê bi keve rewşa ku navendên Sumer, Misir, Grek û Roma demekê jiyabûn. Eslê wê, ketiye vê pêvajoyê. Pêwîst e vê

pêvajoyê, bi kûrayî bijî. Hê ji niha de gelek derdor, Ewropa navendî bi derbaskirinê re, rûbirû tinin. Yê ku tîne cîhanê digihîjin û ew ixtiyar dibe.

DYA, lawê Ewropa yê li parzemîneke din aniye cîhanê ye ku herî hovane ye. Erdnîgariya Bakurê Amerîka ya destlênedayî û kêrhatî, rê li ber mazinbûna wê ya bilez kiriye. Erdnîgariya ku bûye şahidê serencperestiya Ewropiyan, di destpêkê de, bi qirkirinên çermsoran re rûbirû maye. Piştî serhildanan, di dused salên dawî de serbixwe dibe û di gelek qadan de serdestiya xwe nîşan dide. Koçberiyên ku ji hemû aliyên cîhanê herikîn vira, nimûnake cîhanê danîne holê. Em dikarin bêjine vê, cîhana nûgihîştian. Hovîti û nedîtîbûna wan ji vê taybetiya wan tê. Jiberku li welatê xwe windakirine, nifûsa ku bi hêrs û rik hereket dike, cîhanêke wisa çêkirine ku, stemkar, her tiştê wan drav, di her pîvanê de berjewendî û pragmatîzm bingeh tê girtin û bi giyeneke bê wijdan. Herênayeke wisa derandine holê ku cîhan li aliyekî û DYA li aliyê din. Ev sedsal ku sedsala Amerîka ye, bi hinek aliyên xwe rast e. Di pêşveçûna zanist û teknîkê de, tevkarîya wan li pêş e. Di pêşveçûna şaristaniya demokratîk de jî, rola wan ne hindik e. Du herdu qadan de jî, weke vesereke Ewropa û temamkera wê ye. Lêbelê di kadîbûnê de, xwedî pêngavin mezintir e. Di dawîya sedsala 20an de, xwe li bandevê dibîne. Libelê ev yek mîsogere ku di nava xwe de, rizîbûnekê dijî. Herçiqaş ku ne şibe rojên dawî yê Roma jî, dîsa ne îşaretên bilindbûnê yê hilweşînê derbasdarin. Mêtîngêkariya nû ku dixwest jibo cîhanê pêşvebibe, bi Wîyetnamê hatiye derbaskirin. Pêngavên kadîbûnê jî, bi taybetiyên xwe yê heyîn, hê bêtir bizavan dikişîne û tê tecrîtîkirin. Serdestiya cîhanê ya bi NY, NATO û IMF, bi giranî dimeşe û betan ji rû bihatir tê. Ev serdestî, di sedsala 21an de, yê were derbaskirin û yê bikeve pilana duyemîn.

Ev rewş weke vedana Ewropa jî dikare were dîtîn. Tiştê ku dayîka navend dijî, zarokên wê jî yê bijîn. Ti nûjeniyên ku DYA ji şaristaniya demokratîk re pêşvebibe, tine ne. Dîsa jî, di tevaya cîhanê de, bisînor be jî rola ku yê bileyîze bi ya YE re, dibe yek. Xweyîkirina wê ya hinek aliyên otorîter û faşîst, ji ber berjewendiyên wê ne. Hêza wê ya ku mudaxleyên vekirî bike, tine ye. Ev yek jî xwe re kiriye stratejiya bingeh ku, bi hêza xwe ya zanist û teknîkê, di nava kemna demokratîkê de, xwe bi kadîbûnê bide domandin. Ev mîsoger e ku him ji der û him jî ji hundir ê were pirsyarkirin û bandora wê yê were bisînorkirin. Di dîrokê de rewşa ku demekê, Grek li hember Roma jiyaye, em di herênaya Ewropa û DYA yê de dibînin. Weke ku dubareyîya dîrokê dabaşa xebirdanê ye. Qedera wan ku dişibe hev jî tiştêkî xwezayî ye. Çawa ku hêrîşên barabaran, ber bi Roma bûne û jevketina wê bilezgîn kirine, heger em ne bêjin hemû barbarên cîhanê jî, lêbelê hêrîşên bi vî rengî jibo qeyran û jevketina DYA yê, roleke wiha dileyîzin. Sedsala 21an bi diyalektîkeke bi vî şeweyî, rewşa ku rûsan bi sosyalîzma reel jiyabûn, dişibe ku yê bi serê DYA jî were.

Asya ku parzemîna sereke ya şaristaniyan, dibe şahidê pêşveçûneke bi perçe. Li bakûr û li navê bloka bi pêşevaniya Rûs, Li Rojhilat û Okyanûsa Mezin, Çîn, Li Başûr jî Hindistan. Ji derawaya Japon û Awûstralaya ya resene nayê behskirin. Ji rewşa niçikiya şaristaniya Rojava û wêdetir ti rola wan tine.

Rûsî û Rûsya: Ne bi rewîştê Asya û ne jî bi ya Ewropa, herênayeke kûr dijîn. Ji resenîbûnê dûr in. Bi pêşevaneya sosyalîzma reel ku xwe lê qewimandin, him jibo wan û him jî jibo cîhanê gelekî biha hat. Di wêrankerî û xwînrijandina sedsala 20an de, rola wan girîng e. Hewl dane ku, şeweyeke dogmatîzm û utopîstiyê ya herî bêwate, di bin navê sosyalîzmê de weke qutikekî dînan, li mirovatiyê bikin. Dema ku vê yekê cîh ne girtiye jî, weke ku qet berpirsiyariya wan tine be, bi awayek bê şerm çivdan û reva xwe weke polîtîka berdane û ketîbûna xwe çespendine. Fikare nekirine ku ji komunîzmeke serik, ketine serikê din ê şeweya kapîtalîzma mafyaperest. Rewşa wan a vê hingê, dişibe ya gêjan, nayê fêhmkirin bê yê ber bi kûve biçin. Lêbelê tê dîtîn ku yê herênaya di rewîştê xwe de, berdeham bikin. Ji aliyekî ve yê kapîtalîzmê kûr bikin û ji aliyê din ve jî yê rewşa xwe ku dişibe sosyalîzma reel, bijîn. Dema ku xwe bidine hev, di serî de li Kafkasya û Navenda Asya, yê bi xwazin ku bi bandor bibin. Lêbelê nayê hêvîkirin ku yê di sedsala 21an de, werine asta xwe ya sedsala 20an. Ev jênerve ku weke navendeke derdor, yê derawaya xwe zexm bikin û yê kedîbûnê bijîn. Di warê zanist, teknîk û şaristaniya demokratîk de, yê xweziya xwe bi DYA û YE yê binin û yê hewl bidin ku bişîbine wan. Tevkariyeke wan a resene nayê hizirandin.

Çîn: Yê bibe mijara bûyerên balkêş. Ji niha ve, di warê aborî de bi kapîtalîzmê re û di warê siyasî de bi sosyalîzma reel re, zewaceke kirêt berdeham dike. Zewaceke ne rewşa. Nifûsa wan a mezin û jêhatîbûna wan, yê rê li ber mezinbûneke bêhempa veke. Ne diyar e bê ev şaristanî yê çiqasî resene be. Di dîrokê de rola çînê eve, xwedî behreye ku şaristaniyên mezin bi awayek tekûz teqlîd dike. Dikare were gotin ku Çînî zor teqlîdker in. Japon û gelên din ên Hindî Çînî jî, tevî vê pêlê ne. Teqlîdkirina wan a sosyalîzma reel jî, gewre û bi serfirazî bû ye. Hê jî ji hemû sazûmanan, ên sûdmend werdigirin. Li hember vê yekê, bê yê çî bidine cîhanê, ne diyar e. Gengaziya aramî û aştîyê

bilind e. Lêbelê ku bi hêzeke cîhanî re bikevine nava lihevdanê, yê rê li ber karesatên mezin vebike. Ev jênerewe ku yê bibe hêzeke mezin a sedsala 21an. Mijareke herî meraqdar, bê ev zewaca kirêt ê çawa bi encam bibe ye. Lêbelê nayê hêvîkirin ku yê bibe navenda derketina şaristaniyeke cuda. Çînî, bi cambaziya ji kapîtalîstekî herî kapîtalîstir, ji komunîstekî herî komunîstir, encex di warê teqlîdkirinê depêşvebiçin. Pêwendiyên wan bi sentezeke nû re tine ne.

Hindistan: Ji reseniyekê zêdetir, xuya dike ku yê kûrbûna dagirkeriya çandên ku di dîrokê de jiyayî, berdewam bike. Hindistan demekê bi dengê çanda Aryen a bişeml olan da û pêşveçû. Gihîşte heta bi Brahmanîzmê. Bûdha afirand. Çanda îslamtiyê jiya. Feodalîzm bi awayekî kûr ji xwe re kire mal. Ti dagirkerî neman ku nasnekirin û ne xûnifandin. Dişibe jineke ku bi hemû dagirkeran re rakeve, lêbelê wan ji xwere bike mal. Xuya dike ku zewaca kapîtalîst a bi mêrê wê yê Ingilîz re, bikêrî wê hatiye. Dikare demokrasiya lîberal bisepine. Di warê zanist û teknîkê de, dikare bigihe DYA yê. Xwedî mozaîkeke gelan a aştîxwaz e. Weke çandêke pir reng, yê di kevneşopiya Asya de, cîhê xwe biparêze. Lêbelê ji pêngaveke şaristanî, gelekî dûr e. Yê di xêzika Ingilîz de, pêşveçûna xwe bi dilsozî bidomîne. Di vê çarçovê de, yê nasnameya xwe ya dîrokî biparêze, pêşvebiçe û hebûna xwe berdewam bike.

Gelek çandên Asya ên marjînal jî hene. Weke tirk, îranî û Endonezya. Lêbelê ev pêkhatîne ku di hev kêşeya Rojhilata Navîn de, cîh bigirin. Nayê hêvîkirin ku Rûsya, Çîn û Hindistan di boteyeke hevpar a Asya de, bibine yek. Ji ber derûna wan, bûyina mîna DYA an jî YE, di vê hingê de, ne gengaz e. Yekbûneke wan a bigelemperî jî, xuya nake. Bê Asya di dîrokê da çawa bûye, dîsa yê wisa be. Yê eniya mezin a pişt hemû şaristaniyan be. Lêbelê ji derawayaya xwe ya bi dîmenê mîna dêwekî jî, naqere.

Amerîka Latîn: Niçikeke bi çeq a Ewropa û DYAyê ye. Pêwendiyên wê yên bi herduyan re, rê li ber melezbûneke tekûz vekiriye. Melezbûna nijad, çand û sazûmanan aliyên wan ê xweşik jî di nav de, çiqasî hikarîker in? Derketina reseniyekê ji vê, gelekî zor e. Lêbelê çandêke herî zêde, ji qehremantiya takekesî û reseniyên re vekiriye. Dikare derxistina Bolívar, Zapata, Cheyan û Castroyan, berdewam bike. Nayê hêvîkirin ku weke Hindî Çînê teqlîdker bin. Serhildêr in, lêbelê bi kesayetiya wan a niçilandî, derandina wan a şaristaniyeke nû zor e. Lêbelê dîsa jî bi derketinên şoreşgerî, yê bibin hêviya nûjeniyê. Bi hêsanî dev ji kesayetiyan hêviyê û birûmet ên kesên di astengiyê de, bernadin. Lêbelê hêza wan dest nade ku sazûmanekê bi afirînin. Divê ev yek jî jibo wan serkeftinek be ku şaristaniya demokratîk a hemdem, di sedsala 21an de bixûnifnin.

Afrîka Reşik: Yê mîna kesên herî li bin, berdewam bikin. Nijada reş, yê weke pîrsgirêka herî mezin raweste. AIDS dawereke (sembol) vê rastiyê ye. Heçkû, parzemîn xwedî her tişt e ku bibe dayîkeke bişeml. Lêbelê ji bin destê mêrên ne baş, him ên cîgeyî û him jî yên biyanî, bi hêsanî rizgar nabe. Lêbelê ku bi derengî be jî, hilatîna wê yê bi şeweya dayîka reş a xweşik be. Yê ne bi rengê mêr, yê bi rengê jinê hile û yê bibe qada ku şaristanî herî hêsan lê belav bibe. Hindistan û Amerîka Latîn ên vê yekê bişopînin. Kevneşopiya her sêyan jî ya dayîk û jinê bihêz e û hêviyê wad dikin. Heger bi derengî û zor be jî, Afrîka yê li berxwebide, belkî jî kesayetiya xwe ya rastî, yê di serfiraziya pêşveçûna şaristaniya nû de, bigire.

Di aliyê pêşveçûna şaristaniyê de, hêza dogmatîzma ku berdewama kevin û ya utopîstiya ku xeyalên diyarkirina nû îfade dike, li şikestinên girîng rast hatinê. Behreyên wan ên kaşker, bişik û guman tîpîkî pêşwazîkirin. Em di dîrokê de, dibin şahidên demên bi vî rengî. Di dawiya BZ salên 2000an de, hilweşîn û veguherîna sumerîyan, di salên mîladî de jevketina bergêhen koledarî û di dema hilatîna ronensansê di salên PZ 1500an de, di derbarê dema borî de şik û guman zêde dibin. Di derbarê pêşerojê de, reşbînî û lêgerîn di nava hev de pêktê. Cîhana 2000an, rewşeke bi vî rengî dijî. Dogmatîzm li ber canê xwe dide, di rewşa ku utopya ketinê de xeyal tev diçin, bandora pragmatîzmeke tenik, mirovan bêperos û bêçare dihêle. Afirandina xeyalên nû ya kapîtalîzmê, ne gengaz e. Encex xeyalên bi vî rengî di cîhana filmên Hollywood de werine afirandin, bi van jî ewiqandina mirovatiyê ya demeke dirêj, ne gengaz e. Ev yek, berevajî derûna pragmatîzma bi civaka berxwarinê re dimeşe ye ku kevneşopiyeke felsefî ya bi him pêkbîne û xeyalan biafirîne. Jibo hertîştî jiyana rojane derbasdar e. Ev yek têgihîna demên qeyranan a roj bi roja xwe ye. Seqetbûna di bingeha utopîstiya komunîzmê de ev e ku, berevajî armancên ku îdealîze dike, pratîkê nîşan dide. Vê yekê di mînakên sosyalîzma reel a nebaş de, rê li ber şik û gumanên li hember dilniwaziya sosyalîzmê vekiriye. Pêdiviya sosyalîzmê bi hewldanên xwenûkirin û veguherînên binyatî heye.

Li hember vê rastiyê, pêwîst e mirovên serdema me, ji nû ve bikevine nava lêgerînekê. Bi ya di destê xwe de, dikare roja xwe biqedîne. Lêbelê nikare pêşerojê ji bingeha ava bike. Gihaye wê hişmendiyê ku êdî ji dogmatîzmê alîkariya zêde hêvî nake. Dîtine û ceribandine ku ketina pey utopyayên bê bingeheke teknîka zanistî jî, ti encamên ji dogmatîzmê cudatir nade. Digel van jî, serdema herî

mezin a şoreşên teknîka zanistî dijîn. Şaristaniya demokratîk a ku ev bingeh gengaz dike, cîhanê dorpêç dike. Lêbelê şaristaniya demokratîk jî ji vê yekê dûr e ku, merhaleya xwe ya hovane nerm bike, bi platformeke kêrhatî ya lihevkerinê çareseriyê hêsan bike û payîdariya xwe domdirêj û bi hîm bigire. Merhaleya ku heyî, merhaleyêke dîrokî ya ku lêkolîn û lêgerînan kûr bike û demeke herî dirêj e ku çareseriyên binyatî werine dîtin. Heger ev merhale neyê jiyandin, nayê derbaskirin. Bervajî vê, ji Komuna Parîs heta bi gelek mînakên bi karesat ên sosyalîzma reel, pêşî li encamên wêranker ên çareseriyên negihîştî, nayê girtin.

Encamên bi êş ên ku gelek pratîkên şoreşger û hewldanên pîroz li wan rast tên, bi vê rastiye ve girêdayî ne. Senteza mirovatiya nû ya di dema şaristaniya demokratîk de, tez û antîtezên aloz û pîralî, yê bi têkoşîneke mirovatî ya pir reng ku ji mafê rewa yê parastina hiqûqa gerdûnê pêde, cîh nade şidetê, yê derkeve holê. Digel ku serdema me li gelek navendên cîhanê, xwedî daneheva pêşveçûnên bi vî rengî ye jî, ji sentezeke ku derêxe holê dûr e. Ev yek wesfekî çareserker bi xwe hildigire ku, em hêza têgihîn û çavdêriya xwe, ji nû ve bidine Rojhilata Navîn ku bûye dergûşa şaristaniyê û xortaniya wê afirandî, herwiha em hêza potansiyala wê ya senteza nû ku derêxe holê, binirxînin.

BEŞA PÛNCEMÎN BEŞA PÛNCEMÎN

GELO KEVNEŞOPİYA ROJHİLATA NAVÎN DİKARE BİBE SENTEZA ŞARİSTANIYA GELO KEVNEŞOPİYA ROJHİLATA NAVÎN DİKARE BİBE SENTEZA ŞARİSTANIYA NÛ?

Weke mercên qada erdnîgariya ku şaristanî derandine holê, ev yek yê ne rast be ku em jibo dema pêşya me, ji rola Rojhilata Navîn a dîrokî xeber bidin. Berevajî vê yekê, ji ber çolbûn, germî û bê aviyê, dê bikeve derawayeke ne bikêrhatîtir. Kanên petrolê yên dewlemend jî, ji ber dabeşbûn û şeran, erênî ne leyîstine. Ji têrkirina berxwarina çend dewlemendên ne afirîner pêde, ne xwedî nixx in. Bi dawîbûna van kanên petrolê ya di demeke kin de, jênerev e. Di serî de Ferad, Dicle û Nîl, çemên ku şaristanî afirandine, hê bêhtir ên rê li ber lihevnekirinan vekin. Pêşveçûnên çandinî yên bi avê ve girêdayî, bi teknîkên nû re, dikare pêşvebiçe. Çavkaniyên dewlemend ên bi vî rengî, jibo mîsyona dîrokî ya herêmê, rola hêmana bingeh nikarin bileyîzin. Ji vî alî ve, gelek qadên cîhanê hê bêhtir xwedî şens in. Weke ku bi kurtayî em dixwazin dahûrîn, senteza mirovatiyê ya dîrokî, ya dema pêşya me, yê ne bi diyarkirina mercên erdnîgariyê bin. Şaristaniya dawî ya ku erdnîgarî rola diyarker lîstiyê, şaristaniya kapîtalîzm a Ewropa ye. Piştî vê demê êdî diyarkerî bi hêmanên din pêkhatiyê.

Teknîka zanistî, bi serê xwe senteza şaristaniyê ya bingehîn diyar nake. Ji vî alî ve, hêza hemû civakan, gihîştina zanist û teknîkê, ji avantajbûnê hatine deranîn. Tenê êdî dikare zanîna daringî ya kêrhatî, ya zayînên nû were çêkirin. Vê rola xwe jî, dikare di bûtên gerdûnî de bileyîze. Her civak dikare bigihe vê yekê. Ev nabe îmtiyazeke herêmê an jî civakê. Teknîka înfomatîk û ragihandinê bi xwe, derfetê nadine vê. Hê bêhtir dikare ya zayî û afirandî, bi lezgînî û bi teraz bikişîne bûtên kadîbûnê.

Rewîştî şaristaniya demokratîk û rola wê ya sereke, li holê hate danîn. Ev şaristanî di sedsala 21an de, di tevaya cîhanê de, bi kûrayî û berfirehî yê belavbûna xwe bidomîne. Ev yek jênereve ku, ev şaristanî yê ji aliyê mirovatiyê ve, yê bi berfirehî bête jiyandin. Dikare were hêvîkirin ku, di şeweyên rêveberî û jiyânê de, ber bi şeweyên dewlemend û gihîştinê ve, peresînê nîşan bide. Lêbelê bi serê xwe ne sentezek e. Tiştî ku sentez derandiye holê, çarçov û şêwe ye. Bêşik di navbera şêwe û derûn de, temamiyêke diyalektîk heye. Lêbelê wekkirina hev a herdukan, yê were wateya ku ber bi metafîzîkê herin. Herwiha pêwîst e ku di çêbûnên din de, li senteza mirovatiyê ya payîdar were lêgerîn.

Me anî zimên ku dema em tê de dijîn, dema lêgerînên bingehîn e. Zanîna ji niha de bê ev dema me yê çawa bi encam bibe, kehanetiye dixwaze. Ev tê wateya ku mirov têkeve dogmatîzm û utopîstiyêke bê bingeh. Lêbelê lêgerînên me jî bê encam namînin. Çiqas ku jiyân berdewam bike, diyalektîk yê hikmê xwe bide meşandin. Ya girîng ev e ku, mirov bi zanibe bê ya ku yê derkeve holê, yê bi kîjan danehevan ve girêdayî be.

Dema ku me navendên cîhanê yên herî girîng nixxandin, me dît ku rêgehên xwe ligor sedsala 21an nîşan da ne. Heger ku ti mercên derasayî dernekevîne holê, derketina wan a ji vîna, ne gengaz e. Ev gengaziyeke bilind e ku, bi jirêketinên piçûk yê di rêgeha ku hatî diyarkirin re, sazûmana xwe ya demokretîk bi kûrayî û berfirehî pêşvebibin û bijîn.

Rojhilata Navîn, Di bin perspektîfa vê cîhan û serdemê de, derawaya herî cuda diyar dike. Me ev yek danî holê ku ev ne bi erdnîgariyê ve girêdayî ye. Herwiha kartêkerên bingeh ên ku vê cudatiyê diyarker dikin çi ne? Ya herî rast ev e ku bersiva vê, di kevneşopiya çandî de were lêgerîn. Bandora erdnîgariyê jî, encex bi vedana xwe ya di çandê de, bi wate bibe. Piştî ku çand çêdibe, girîngiya mercên derdora derve, timî davêje pilana duyemîn. Diyarkeriya wê derbasî dînamîkên (livdarî) derûn dibe. Ev nêrîneke tê pejirandin ku, dîroka şaristaniyê jî, dîroka pêşveçûn û danehevên çandî ye. Li vir ya herî girîngtir, terîfa çandê û derawaya wê resene ya di pêşveçûna şaristanî de ye. Cîhê Rojhilata Navîn ê di dîroka şaristaniyê de, roj bi roj bi lêkolînan, hê bêhtir tê ronahîkirin. Nêzîkî 10 000 salên neolîtîkê, di vê erdnîgariyê de, bi rola wê ya zayokî derbasbûne. Ev tesbîteke neyê nîqaşkirine ku, hemû şaristanî deyndarê neolîtîkê ne. Şaristaniyên herî pêşî, yên Sumer û Misrê, ya bi navê heyva berhemdar jî, ji afirînên herêmê yên neolîtîkê tên. Me anî zimên ku, PZ di navbera sedsalên 10 û 15an de, Rojhilata Navîn ketiye qeyraneke kûr û ji wê demê heta weke niha, bi kûrayî berdewam dike. Hilweşîna Rojhilata Navîn ku naşibe hilweşîna li aliyê cîhanê yên din, ji rewîştî wê ya hilatina sereke tê. Hêrema ku nêzîkî 15 000 salan, di pêşveçûna mirovatiyê de rola zayok lîstiyê,

bi pêvajoya hilweşînê re, taybetiyên xwe yên cudabûna ji herêmên cîhanê yên din, ji wesfên dîrokî yên dirêj û diyarker distîne. Bi vê wateyê, Rojhilata Navîn kesayetiyeke e. Heger ku bi berfirehî were terîfkirin, kesayetiyeke dîrokî ye ku, hemû pêşveçûna xwe ya dîrokî, ji mirovatiyê re kiriye mal. Em nikarin heman tiştî, ji herêmên cîhanê yên din re jî bibêjin.

Minak, Çîn, Hind, Rûsya, Amerîka Latîn û heta bi Ewrûpa û şopînerên wan, weke ku cilan (kinc) biguherînin, dikarin sazûmanan li xwe bînin. Ango sazûmanên şaristanî jibo wan, mîna cilên ku car caran bi guherînin e. Dema ku kevin bibin an jî yên hê çêtir derkevin holê, guherindina wan nabe pirsgirêk. Lewra ewan bi kûrayî ew navxweyî nekirine. Lêbelê jibo kesayetiya Rojhilata Navîn, şaristanî ne cil, jiyan bi xwe ye. Bi şaristaniyên ku dijî re, bi goşt û hestî dibe. Heta bi genên xwe wan navxweyî dike. Yên ku wan dijî, mîna cilan navêje bi aliyekî de. Ev rewş, li ti aliyên cîhanê yên din, bi vî rengî nehatiye jiyandin û navxweyîkirin. Li Rojhilata Navîn, dîrokê û çandê, şaristanî û jiyanê, weke ku neşibe ti aliyên din ên cîhanê, civak û kesayetiyan cuda afirandine. Çanda çandinî ye hezar salan, genên xwe yên civakî afirandine. Şêweyên olî û mîtolojîk, bi hezar salan di hişê civakê de, hatine jiyandin. Dogmatîzm û qedereparêzî, bûne perçeyek ji yê jiyanê. Ramana resene û afirîner, demeke dirêj raketiye. Diyarkeriyên xwedanasîyê (îlahiyat), weke tabûyên pîrozwer, tenê jibo bawerîya bê guman in. Derketina ji derî gotinên ku pirtûkên pîroz dibêjin, gunehê herî giran e. Çîrokên dema mîtolojiyê yên ku li ser zimanan digeriyan, bûne rêzikên herî bawerhişkiyê, bûne olek û xwedayekî ku sêwiran, xeyal û bîranînen afirînerên dîrokê, dîl bigirin.

Dema ku mirov dibine dîlê destê yên ku wan afirandine, tenegehîştine bê çawa ketine nava biyanîbûna dîrokê ya pêşî û mezin. Çandeke wisa çêbûye ku, Afirîneran dike aferînek û aferînekan dike afirîner, vê yekê dikine mijara bîngeh a baweriyê û banîtî û perestîşa ji vê sazûmanê re, kirina kesayetiya mirovatiyê ye herî baş. Gumankirin û şika ji vê yekê jî, kirine gunehê herî mezin. Ji aliyê din ve, bi hêza dewletbûna yekem re, mîtolojî û baweriyên gel jibo berjewendiyên serdestan, vediguherînine rewşa xwedayî û weke çekê li hember wan rêvebirine. Dema ku afirînekên wî him di warê daringî û him jî di warê menewî de, berevajî wî dibin û wî dîl digirin, êdî civaka Rojhilata Navîn û mirovên wê, li ser navê hemû mirovatiyê, xwe dike qurban. Şaristaniya ku li ser vê biyanîbûnê bilind dibe, di serdemên pêşî û navîn de bandoreke wisa kiriye ku, ti aliyên cîhanê xwe nikarin ji vê bandorê rizgar bikin. Çêbûna ku em dibêjin kesayetiya dîrokî ev e. Bi hinek hevberkirinan, emê bêhtir bikaribin rewşê bidin fêhmkirin. Kesayetî û mirina dayîkê, bi welidandinên wê pêktên. Dar mezin dibe, derdora xwe bi tovên xwe û bi berhemên xwe di xemilîne û dimire. Eslê wê mirin, pêdiviyeye zêdebûnê ye. Darberûya Rojhilata Navîn jî, çêbûneke bi vî wesfî ye. Ew dareke ku rahên xwe berdane, Tovê wê li çarmedorên cîhanê geriya ne. Jiberku di rewîştên darberûyê de ye, ciqas ku çiqil û qurmê wê jêdibe jî, li ser rahên xwe bêhtir şîn dibe û dixwaze ku bêhtir bijî. Darberû, li Rojhilata Navîn, dara çandê ya herî pêşî ye.

Çanda Rojhilata Navîn, bi hilweşîna salên PZ 1000 û 1500an, ku ketiye nav de, orîjînalîtiya xwe wînda kiriye. Hê rasttîr, dişibe dareke berûyê ku heta bi rahên wê jî hatine qutkirin. Bi gotineke din, bûye goristana mirovên ku afirandine. Eynî goristaneke weke pîramît û zîggûratan, wisa mezin. Nêzikî hezar salane, tiştên ku diqewime, ji bêdengiya mirinekê û wêdetir, ti wateyeke din nade. Bi nûhîna ku gelekî welidandiye, êdî nikarê di warê afirîneriyê de, gavan bavêje. Dema rêvebirîya osmaniyan, notirvaniya vê goristanê ye. Peywira wan ev e ku mirinan timî domdar bike û bexşandinên wan xwe xweyî bike. Ol, bangdan û selewat hemû bixemgînî ne û ji mesajên banga mirinê pê de, ti armancên wan ên din tine ne. Tirsandina bi mirinê, bi mesajên dojeh û bihiştê amadekirina mirinê, bûye şêweya şaristaniya vê dawiyê. Zanist û teknîk ji mêj ve hatiye berdan. Civak û siyasat ji mêj ve weke qalibên cemidî, tînen dubarekirin. Weke gêjan, mîna ku li dora bîrê (çalê) bizîvire, aqlê wan qet ti meşên din nakişîne. Ev tevna dogmatîzm û qedereparêziyê ya hevqasî kûr ku bi ser vê şaristaniya mezin û afirîner dakirîye, gelekî fetsînok û bi têkdan e. Lêbelê ev tablo rast e. Çîroka Rojhilata Navîn vedibêje. Evînen Rojhilata Navîn ku hemû di dawî de dihelin û dişewitin, bi vê rastiyê ve girêdayî ne.

Were 15 000 salan dayîktiyê bike, hemû tiştan jibo mirovatiyê bafirîne û di dawî de, bikeve rewşa benîyeke bêçare! Bi be welatê ku xwedawendên herî pêşî lê derketine holê, hemû tiştî jibo mirovatiyê bi welidîne û bi afirîne û weke paçekî were bikaranîn û bila bavêjine hêlekê! Hemû xwedayan û mezinan bafirîne, di dawî de bibe beniyê hemûkan ê bêçare! Hemû pişeyên ku mirovatiyê têr dike bafirîne û di dawî de birçî bimîne! Hemû deran bi hewîng bike û bila welatekî te ku tu lê vehewe tinebe! Bibe mûmeke ku herkesî ronahî bike û tu di tarîtiyê de bimîne! Ji herkesî re bibe deng, muzîk û helbestê bafirîne û bibe kerr û lal! Ji herkesî re zanist, rêzgirtin û teknîkê bafirîne û tu herî bêçare û nezan bimîne! Ji herkesî re seray û xanan bafirîne û hewceyî quleke ku tu serê xwe bêxîyê bibe! Êdî şaristaniya Rojhilata Navîn, navê van nakokiyên mezin û dramatîk in.

Evînên ku çima dişewitînin û dikine xwelî, di van nakokiyan de veşartîne. Bi hevqas nirxan mezin bibe û êdî bibe qambost! Encex şewat vê yekê paqij bike. Gihîştina hev a xweda û xwedawenda pêşî pêkbîne û dûre bibine jin û mêrên parsek ên herî nizm! Encex şewat û şewitandin vê yekê paqij bike.

Gelên Rojhilata Navîn, pir digrîn. Piştî afirandina hevqas nirx, winda bike, ji xwe yê gelekî bête giryandin. Rojhilata Navîn bi taybetî van hezar salên dawî, li ser bédengiya mirinê digrî. Bangdan, dîlok, stran û saz, bixemgînî bang dikine mirinê. Yek ji van jî ne rasthatine, tişta ku diqewime tînine zimên. Heger berevajî vê bête kirin, yê bêwate be. ædî çêtir tê fêhmkirin bê li dinyayê çî diqewime, çima Rojhilata Navîn têkildar nake. Yê ku bingeha wan û tirba wan evqasî kûr be, kesên din fêhm nakin. Ew venexwarî timî serxweş in û dema ku bûyine mirî ne. Demborîn evqasî perçiqînere û nabexşîne. Diyar e bê çima nabexşîne. Ev şaristanî wiha li erdê nayê hiştin. Yên ku wiha dihêlin, di nava xiyanetêke mezin de ne. Xiyanetên şaristaniyê mezinin û xayinên wê gelek in. Ji ber vê yekê hereketên tolhildanê jî mezin û gelek in. Lêbelê ma ev yê çî rizgar bike? Nêzîkbûna bimire û bikûje, ji mezinkirina goristanan pêde bi kêrî çî te? Li Rojhilata Navîn, bi levdanên olan, levdanên namûs û malbatan û levdanên mal û xwedaniyê, xwîn weke coyê tê herikandin. Ev hêncet in. Di bingeha van xwînrijandinan de, windakirinên mezin û xayîntî hene. Kevneşopiya tolhildanê ne hêsan e. Digihe demborîneke wiha û bingeha xwe dibîne. Mêrkûjiyên toreyan gelek tene pêkanîn. Bingeha vê dîsa ev dîroka binalet e. Dest li ser hemû nirxên şaristanî danîne û dest avêtine namûsa wê. Ev rastî weke ku di gelek tiştan de tê pêkanîn, lêbelê di jin û qîzê de, wateya dawerê didinê. Tişteke bi dawerê were, weke ku pîrozweriya mezin qirêj bûbe, tê berdan. Ji ber vê yekê jî, cizayê wê gelekî giran e û bi şeweya ku neyê pejirandin e. Trajedî çavkaniya xwe ji vira, ji vê dîrokê digire.

Rojhilata Navîn tirba di nava tirbê de û girêka di nava girêkê de ye. Cîhan diguhere û ew naguhere. Pêwîste ew weke xwe bi mîne. Ew dara berûyê ye û tim stûr dibe. Hûn çiqas ku bikesixînin, ew weke xwe dimîne. Ji heşînbûna wê jî hêvî nayên qutkirin. Rojhilata Navîn, warê hêviyê ye. Di destê Rojhilata Navîn de, tenê hêvî maye. Kevneşopî perçiqîner û bê bexşandine û hêvî li benda şînbûna rahên berûyê dimîne. Jiyana tenê weke hêviyêke mezin maye. Nequtbûna ji kevneşopiyê, ji hêza wê ya mezin tê. Lêbelê jiberku xwe ji nû ve nahilberîne, rizîbûnê pêşvedibe. Hemû herêmên cîhanê xêzka pêşveçûna xwe diyar dikin, lê mayîna Rojhilata Navîn a weke xwe, ji ber bandora şaristaniya derbasbûyî ku hê jî dewsên wê kûr in. Ev rewş, jiberku pêşveçûnên hemdem bi awayek serkeftî naxûnifîne, derdikeve holê. Dewsên şaristaniya kevin û şaristaniya hemdem pozberiyê dikin. Ya rastir, pêdiviya çêbûna senteza nû datînin holê. Jibo Hindistan, Çîn, Afrîka an jî Amerîka Latîn, ji senteza nû zêdetir, pêşveçûna wan a di bingeha varyantên kapîtalîzma ku ketinê de, dabaşa xebirdanê ye. Ji berxwedanê zêdetir, pêvajoya xûnifandinê derbasdar e. Ji aliyên cîhanê yên din re jî, rewş bi vî rengî ye. Zemîneke çandê ya bihêz ku pozberîtiyê û sentezeke nû pêwîst bike, tine ye. Heger ku hebe jî, an dihele an jî ji aliyê çanda serdest a ku tê ve, tê veguherandin. Li Rojhilata Navîn, ne helandin û ne jî veguherandin bi hêsanî nayê jiyandin. Li vira jî tê dîtin ku, potansiyela kevneşopiya çandî, ya di warê afirandina nûjeniyê de, girîngiyê bi xwe re tine. Li hemû aliyên cîhanê, digel ku hemû pirsgirêkên olî, etnîkî û netewî ber bi çareseriyê ve diçin jî, dîsa li Rojhilata Navîn, di vî babetê de cudahî xwe nîşan dide.

Heger ku pirsgirêk bi rêbazên şaristaniya hemdem nayên çareserkirin, rastiya di bin vê de, berxwedana rikdar a cudahiya kultûra di kûrayiyê de ye.

Pêwîst e ev rasteqînî ne bi neyînî were nirxandin. Berevajî vê, jibo derketina ji qeyrana kapîtalîzmê ya ku gelemper û domdar dibe, weke derfetekê bête nirxandin, yê rastir be. Nakokiya di vir de, kevneşopiya Rojhilata Navîn ku xwe na dahûrîne û hemdem nake. Gelek kartêkerin der û hundir, astengiyê ji çalabûna potansiyele wê re derdixin. Binyata wê ya bi hêz, astengiyê derdixê û nahêle ku der navxweyî bike. Encam levdan û kûrbûna derneketinê ye.

Ev pêvajo, di navbera PZ salên 1500an û 2000an de, bi kûrbûn berdewam dike. Heta bi salên 1500an, serdestî û teraz bê navber, 15 000 salan di destê çanda Rojhilata Navîn de ye. Vê serdestiya Him doringî û him jî menewî, di hemû seresazî û binesaziyên civakê de, ew gelekî ji xwe qayîl kiriye û bawerkiriye ku ew navenda cîhanê ye. Bawer nake ku şaristaniyêke ji wê pêştir yê derkeve holê, xwe weke tevaya cîhanê dibîne. Hemûyên din weke gawûrên biyanî dibîne. Pêncsed salên ku derbasbûne, têra şikandina vê dogmayê nekirine. Serdestiya şaristaniya Rojava dibîne, hêza wê ya doringî û menewî ferq dike, lêbelê bi awayek duristî mikur nayê û nêzîkî xûnifandina vê şaristaniyê nabe. Di vir de çîncînîbûnên ku li dora sermiyan çêbûne jî, bandora xwe dikin. Ev weke pêkhatinên çêkirî tene dîtin. Ne di wê hêzê de ne ku li ser wan kûr bibin û bi bingeha wan a dîrokî re, hesêb bibînin, ne jî red bikin. Ji wê behreyê dûrin ku dahûrînin û bikine kereseya sentezeke din. Lewra di

derawaye niçikeke hêsan a derve de ne. Pêkhatinên bi vî rengî, dibine asteng ku bibine hêzên cîgeyî jî.

Li Rojhilata Navîn, hê jî modernbûna kapîtalîst bi çanda cîgeyî re gutûgoyek (dîyalog) pêkneaniye. Weke acenteyeke biyanî radiweste. Civak hê qalibên neolîtîk ên beriya 10 000 sal dijî , ji aliyê din ve, bi her awayî qalibên feodal û yên koledar jî dijî. Hatina sosyalîzma reel û kapîtalîzmê ya bi ser van de, pêvajoyên zor ên ku ji nava wan neyê derketin pêkhatin. Rewşeke gêrevêre tê jiyandin. Li holê ne bizav hene ne jî saziyên bi bandor. Pêvajoyeke ku mirov jê bireve û jê bigere tê jiyandin. Kijan sêxberî çivokî (laderî) û xiyanete û kîjan biesilbûn û dilsozî ye, tevlihev bûye.

Pêwîst e ku girîngî bi qeyran û hilweşîna Rojhilata Navîn bête dan. Şaşiya mezin a şaristaniya Rojava ev e ku, hêza hêrêma di bingeha xwe de, bi awayek rêkûpêk nanirxîne. Binyata xwe tenê heta bi şaristaniya Greko-Romen dirêj dike. Heçku, şaristaniya Greko-Romen, merhaleyê Rojhilata Navîn e. Mafê sazûmana neolîtîk ku ew xweyî kirine jî nadin. Di vir de bi awayek ezperestî dilivin. Jiberku ev şaşiya wan, fersenda guftûgoyeke bi demên borî re çênake, nikare di rastiya rojane de jî, girêdaneke diyalektîk a bi wate çêbike. Li qasî naskirina rabirdû (dema borî), jibo diyarkirina senteza dahatûyê (pêşeroj) jî, girêdana diyalektîkê ya ku yê were sazîkirin pêdivî ye. Dema ku em Ewropa weke têzekê bipejirînin, antîtez ne DYA, ne Rûsya, ne Çîn ne jî çanda herêmeke din e. Weke ku di xwezayê de tê dîtîn, tez, antîtezen xwe li qada ku jê re bûye çavkanî çêdike. Hemû herêmên cîhanê yên li derî Rojhilata Navîn, dibe ku niçikên teza Ewropa bin, lêbelê nabine antîtez. Jibo vê yeke cudahî û dirûvtiya wan a pêdivî jî tine, an jî liqasî ku nebîne antîtez dûr in. Di encamê de an niçikên wê ne an jî veserbûnên wê ne. Jibo ku bibîne tez û antîtezen hev, pêwîst e ku çavkaniya wan a berê yek be. Ev jî Rojhilata Navîn e.

Ev nirxandina kin, pirsar emê çawa Rojhilata Navîn bikine antîtez, derdixê holê. Di pêvajoya sedsala 20an de, hewldanên dirûvandîne yên ku hatine ezmûnkirin, encameke serkeftî nedane. Him neteweperestiyê û him jî sosyalîzma reel, her yekî weke tezen şaristaniya Rojava, li herêmê ji temsîlkirîneke pêkhatinên çêkirî rizgar nebûne. Êslamtiya ku ji mêj ve hilweşiyayî û wateya xwe windakirîye jî, bi xwe pêşandaneke ketûber, dikare van tezan vala derbêxe. Bi serê xwe nikare antîteze bafirîne. Saziyên şaristaniya demokratîk, ji ber kevneşopiyên civak û dewletê yên heyîn, bi awayek hêsan nikarin werin sepandin. Saziyên şaristaniya demokratîk, Ronesanseke hindikayî, di ol de nûsazî û şoreşa ronahîbûnê pêdivî dike. Ev sê pêvajoyên bingeh ên dîrokî, di çanda Rojhilata Navîn de, ne hatine jiyandin. Herwiha parastina ku saziyên şaristaniya demokratîk ên bi hêsanî belav bibin, yê me ber bi şaşiyan bibe. Ev sazî ji roleke ku li derve hatibîne montekirin pêde, bikêrî tiştêkî din nayên. Mînakê Êsraêl veserbûneke, hê navxweyî nebûye. Partiyên lîberal û partiyên komunîst ên reel jî, perçeyên veserbûnê ne. Bi dîrok û çandê re, di nava kûrahiyêke biyanîbûnê de ne. Zindîkirina îslamê, rê li ber ti çêbûnên afirîner venake. Encex yê bîranîna dîrokê ferz bike, ev jî ji jibîrkirina bi temamî çêtir e.

Mudaxeleyên ku li Rojhilata Navîn têne kirin, weke nexweşekî di komayê de be û bi asprînan were tedawîkirin e. Ev yek hatiye çespendin ku, ji bizavên îslamê heta bi partiyên komunîst, ji neteweperestiyê heta bi lîberalîzmê, heta bi şeweya îsraêl mînakên komple yên xweferzîkirinê, gelek bizav û partiyên ku li berxwedidin, ji geşkirina agirê pîrşîrêkan pêde, ti rolên din ne leyîstine. Ev rastî jî nîşan dide ku, êşnasî û tedawî ji rastiya bunyeyê gelekî dûr in. Bi têgînên çêkirî, hebûna çêkirî hatiye pêkanîn. Bi êşnasî û tedawiyê, ew guman dikin ku yê kar bikin. Li Rojhilata Navîn di bin navê moderniyê de, tiştê ku hikim bike, ji rola makêtekê û wêdetir ti rolên din nalîze. Hê herêm xwe nasnake. Di derbarê dîroka xwe de, di nava nezaniyêke reş û biyanîbûneke kûr de ye. Civak, weke ku bi beton bûye. Saziyên siyasî û yên dewletê, di rola girêbaya (ûr) pençeşêrê (kansêr) de ne. Xeyalên tarî yên mezinên demekê digerin. Ji wêrankirinên Asûr û moxolan gelekî bêhtir, wêrankerî û rizîbûn têne jiyandin. Rojhilata Navîn dişibe nepenî û hevkeşeke ku hê nehatiye dahûrandin.

Dahûrandina Rojhilata Navîn, bi girêdana wê ya bi Ewropa ve ku rast bête danîn, gengaz e. Ku ev yek di nava tevayiyêke diyalektîkê de, were holê yê wateyêke rast bide. Cîqas ku pêdivî be, Ewropa li bingehên şaristaniya xwe di şaristaniya Rojhilata Navîn de bigere û rastiye derîne holê, ewqasî jî pêdivî ye ku bermayînen şaristaniya Rojhilata Navîn jî, şaristaniya Ewropa rast nas bikin û antîtezen xwe ligor vê yekê çêbikin. Pêdivî ye em bi girîngî bibêjin ku naskirin, bi teqlîdkirînekê an jî xûnifandînekê, yê ne bes be. Di van dused salên dawî de, tiştê hatiye kirin, ji teqlîdekê ne wêdetir e. Digel ku merhaleyê teqlîdkirîne jênerev be jî, encex bibe rêbaza yên herî paşvemaî û hoveber. Ti wateya dubarekirina vê pêvajoyê ya di dema me de, nemaye. Derbaskirina asta teqlîdkerîya heyî, mercê yekemîn ê qezenckirina rûmet û rêzgirtinê ye.

Pêvajoya xûnifandîna Ewropa, hê jî tê jiyandin. Ne gengaz e ku em bibêjin xûnifandîneke rast tê pêkanîn. Ne di wê behreyê de ne ku di vî warî de, biserkevin. Herî bêhtir xûnifandîna û bûyina

antîteziyê, yê bi hev re bimeşin. Derpêşkirina xûnifandinê ya weke pêvajoyeke heta bi dawî, yê were wateya ku mîrateya şaristaniya Rojhilata Navîn a herî mezin û hêza wê, nayên naskirin. Çend hêzên bîrdoziyî, siyasî, etîk û hunerî ku ev yek ceribandine, ji serneketinê rizgar nebûne. Sedema vê ne ji bê behreyî û ne jî ji hewldanên kêma e. Ev ji vê yekê tê ku, mîrateya şaristaniyê ya di bîngeha xwe de û hêza wê nasnakî û nizanî ku ev hêz heta bi dawî teqlîd û xûnifandinê napejirîne.

Pêwîst e ev mijar neyê jibîrkin: Heta ku di xebatên stratejîk de, veguherîneke temamî bîngeh neyê girtin, rola layîqî dîrokê nayê leyîstin. Têvgerên dîrokî ku dixwazin li Rojhilata Navîn rolê bileyîzin, pêwîst e ku teqlîd, dirûvî û xûnifandinê derbasbikin û antîtezen xwe çêbikin. Yên ku di vî warî de bisernekevin ê werine derbaskirin. Ev derbaskirin an yê bi windakirina hêza berxwedana paşverû an jî yê bi redkirina teqlîd û xûnifandina ji aliyê mîrateya çandê ve, pêkwere. Têkiliyên bi Ewropa re, bi taybetî yê dused salên dawî, ev yek rast derxistine. Hewldanên modernbûna serveyî (rûxalî) yê dused salên dawî, di roja îroyîn de di rewşa têkçûnekê de ne. Him jî bi rezîlî û bi bêrûmetî. Encam, pêdivî bû ku ders ji vê yekê bihatana girtin. Lêbelê ev tê zanîn ku pêdiviya rezîl û bêrûmetan bi standina dersan tine ye. Yê mane jî, xwe ber bi eşîrtiya ku beriya salan şêweyê berxwedanê bû, dikişînin û vê yekê weke rûmetê berdîdî. Hê jî, bi vî rengî, bi awayek neteweperest û dewleta piçîk a netew, xwe dikine şûna qehremanan, ji vê yekê qet şerm û fedî nakin, heta şanaz dibin.

Heçku, eşîrtî û şêweyê wê ya hinekî hemdemtir neteweperestî, li ba mîrateya çanda Rojhilata Navîn a mezin, gelekî hêsan dimîne. Di dîrokê de, berxwedana Horrît û Amorît, qebîleyên çiyê û çolê, ya li hember şaristaniya Sumer, belkî wateyê xwe ya dîrokî hebû. Wan berxwedanan rê li ber destanbêjiya eşîretan vekirîye. Dîsa berxwedana qebîleyên ëbranî, li ser navê olê yekxweda li hember Nemrûd û Firewn, wateyê xwe ya girîng hene û pirtûkên pîroz derandine holê. Di diokê de, behreyên xwe nîşan dane û tevkeriya xwe li çêkirina tez û antîtezan kirine. Lêbelê berxwedana îro ya eşîrtî, olperest û neteweperest, a li hember şaristaniya Ewropa, ne xwedî taybetiyên bûyina tez û antîtezan e. Tiştê ku tê armanckirin, teqlîdkirineke serkeftî, xûnifandineke pêşdetir û cîgeyîbûn e. Dibe ku li ser xatirê rabirdûyê rîhê berdî û poşiyê girêbidin, herwiha xwe weke antîteze nîşan bidin, lêbelê ev yek veguherîna ji teqlîdkeriyê ya qeşmeriyê ye. Xûnifandina ku di cîgeyiyê de bi serdikeve, ne xwedî taybetiyê ku hêza derûn û antîtezekê bafirîne. Tenê di veguhastinê de kûrdibin û dikarin angaş bikin ku nîrxên cîgeyî dîniçilînin.

Ji vî alî ve, monarşî û komarên ku hene, di warê xûnifandinê de jî gelekî paşdemayî ne. Ne xwedî monarşî û komarên bi rengê Ewropa ne. Komara demokratîk û laîk, encax di asta pêyve de dimîne û bi awayek demagojîk nîrx dibîne. Ji têgîna şaristaniya demokratîk gelekî dûrin ku nikarin bigihîne wateya wê jî. Mijarên ku di wan de kûr dibin, eşîrtî, malbatî, neteweperestiya hoveber û şoven û berjewendiyên xwe yê takekesî vedîşêrin, bi rêbazên herî bêsinc bi girseya gelen didine daqûrtandin. Ne gengaz e ku em bibêjin, seresaziya civakê ya serdest di nava xebatên biesil de ye. Ev yek rast e ku bi vî aliyê xwe, gelekî li paşya biesilbûna qebîletiya beriya 4000 salan jî mane. Li Rojhilata Navîn siyaseta fermî, bi seresazî û binesaziyên xwe bi teqlîdkeriyê herî hoveber, di bin navê pêşverûtiyê û modernîzmê de, pişavtineke hêl li ser girseya gel ku dibin çewsandineke erjeng de hiştine, bikartîne. Di kûrahîyê de bi talankerîya kapîtalîzma hoveber, danehevê dike. Nayê gotin ku yê serdest, ji şaristaniya xwe ya rabirdû, tiştê hîn nebûne. Dema ku pêwîst be, dikarin rîhê berdî û kincên kevin li xwe bikin. Lêbelê nûvedana wan bûye ev ku, moderntiyê û cîlaya Ewropa bikişînine ser rêveberiyên despotîk ên dema koledariyê û padîşahtiya ku ji têgîna seltanatiya serdema navîn mane. Hinek dibêjine vê nûsazî û hinek dibêjin şoreş. Eslê wê û bi mîsogerî, ev ne nûsazî ne û ne jî şoreş in. Statuko hê bêhtir hatiye bihêzkerin. Perçe û bizmarên Ewropa yê nû tînan kutan, lê çanda Rojhilata Navîn, şoreş li dera han, hê nûsazî nasnekirine. Bi veserbûnên ku ji derve tînan ferzkerin, ne nûsazî mêtîngehkarî tê damezrandin. Dibe ku di vê yekê de pêşveçûn hebe. Lêbelê qet nayê gotin ku ev nûsazî an jî şoreş e. Li welatên ku herî kûrbûn lê hatine çêkirin jî, mêtîngehkariya nû ne hatiye derbaskirin, hê behtir weke armanckê didine pejirandin.

Tiştê ku jibo nîrxên şaristaniya Rojhilata Navîn were gotin, şûnwarnasî û bermayî derdixine holê. Ev yek jî serkeftina Rojhilatnasên (oryantalîst) spartî şaristaniya Ewropa ne. Bi şîroveyên wan ên bisînor û yê çewt, bi hev re tê meşandin. Li derî vê zanîst û teknîk hê ne hatiye sepandin. Çavkaniyên dîringî ku tîne pêşkêşkerin, didine nîşandan ku hê aboriyê di asta kapîtalîzmê de jî, nehatiye damezrandin. Weke ku me gotî, saziyên siyasî bi despotîzm û şêweya siltantiyê lê bi şêweya leyîstikên hemdemî tîne meşandin. Ji aliyê bîrdoziyî ve, bandora betonkirina mîtolojiya kevin û rastiyên olî, serdestî hişmendîyan kirine. Liqasî ku vê bandorê naşikînin, berevajî vê bi zanîsta hemdem û felsefeyê re tevlihev kirine û anîne rewşê xetertir. Bi kurtayî em bibêjin, bandorgirtina dused salên dawî ya ji şaristaniya Ewropa, ji mînaka cîhanê ya herî neserkeftî rizgar ne bûye. Digel çavkaniyên şaristanî û dîringî yê dewlemend, jiyandina vê rewşê, kûrbûna nezaniyê û

xerabûnê nîşan dide. Careke din ev nêrîn tê rastkirin: Heta ku şaristaniya Rojhilata Navîn, bi şaristaniya Ewropa ya ku pêdiviyeye diyalektîka serdemê re, şeweyeye pêwendiya tez û antîtezê pêkneyîne, rabirdûya mezin, cîgeyî û rojaneya ku xerabûne nabexşîne.

Ev rewş, mijareke ku bi derûna şaristaniyan ve girêdayî ye. Kesên ku li Rojhilata Navîn, bi nixxên şaristaniya Ewropa re di warê tez û antîtezê de, girêdana diyalektîkê damezrînin, tenê ne jibo herême, yê jibo tevaya cîhanê bibine hêza pêngaveke dîrokî. Di dîrokê de derketinên mezin, di vê wateyê de ne. Gilgamêş, Sargon, Brahîm, Mûsa, Zerdeşt, Sokrates, esa, Muhemed û Ronensansparêz, mînakên ku tene bîra me ne. Rojhilata Navîn, çanda ku derketin û destpêkên şaristaniyên nû, yên bi vî rengî jiyaye, vedihewîne. Di vê çandê de, mezinayiyên dîrokî xelek xelek in. Lêbelê ev hezar salan zêdeye ku di van xelean de, qutbûn çêbûye. Vê navberiya dirêj, zingargirtin û rizîbûn bi xwe re aniye.

Pirsa herî bingeş dîsa ev e: Heyîna çanda Rojhilata Navîn a ku bi derketinên mezin hûnayî, gelo dikare xelegeke hemdem veser bike û bi zindîbûn xwe bigihîne dahatûyê? Ya herî girîngtir, gelo dikare li kevneşopîya mîtolojiya rizgarker a ku hêviya mirovatîyê, xelegeke nû zêde bike? Gelo dikare bi xûnifandina Ewropa tenê raneweste û bigihe wê hêzê ku tez û antîteza xwe çêbike? Rojhilata Navîn, an yê ji vê peywîrê re hêzeke xwe çêbike û xelegekê li xelekên derketina dîrokî zêde bike, an jî yê ji jiyana naletbûneke kûr rizgar nebe. Heman dîrok, rê nade rêyeke sêyemîn. Ev dîrok dibêje, "Tu nebe Rûsya, Çîn, Hindistan an jî Amerîkayeye nû. Ew weke derdorên navendê, yê timî li hêvya derketina dîrokî ya nû bin. Dîrokê qedera wan wiha hûnandiye. Lêbelê qedera te, meşa şaristaniya mezin a ku bi derketinên nû hatiye hûnandin e. Herka weke Nîl û Feradê ya bihêz e. Ey lawê bêesil û bi nalet, heger tu nebe weke wan, ez te nabexşînim." Heman Rojhilata Navîn, weke welatê xwedawendan wiha dibêje, "Ey mêrê mêr ê xurîfî û ketandî! Ez bi te re nabim. Ezê bişewitim bibim xwelî lê vê xiyaneta jiyane, bi te re parve nakim." Weke welatê xwedayan wiha dibêje, "Ey qambostno, ez we bi benîtî jî napejirînim. Hûn bi naleta xwe, encex layîqê şewata dogehê bin." Hozanên mezin dibêjin, "Edî ez dîlokan nabêjim û helbestan nanivîsim, li sazê naxim û destanan nanivîsim. Lewra we, giyana fireh û xweşikaya wêje û huner winda kir, we xiyanet kir." Hemû hozanên mezin, li hember dîrokê rawestiyanê û dibêjin, "Em we nabexşînin."

Şaristaniya Rojhilata Navîn, vê yekê bi bêdengî dibêje. Bi hejandina milên xwe, bersivê dide xweferzkirinên derve. Venaguhere û mayîna xwe ya mîna kevîrê, weke rûmetê dihesibîne. Bi hezar salane, lawên xwe dev bi tîkçûnên bi hemû rengî û rezîliyê ve berdane, herwiha tolê distîne û wiha bersivê dide. Belkî bersivên wê yên hîkarîkertir hene, wan jî jibo dahatûyê dihilîne û amadeyî bersivên ku qet kêr nebin, disekine, "Ey beşa dîrokê ya binalet û rojaneyîtiya qambostbûyî! Ji van rawestî û pirsan re, bersiva te yê çibe? Heger tu egîd bî, bi namûs bî, rabe û bersivê bide."

Di derbarê bêdengî û berxwedana şaristaniya Rojhilata Navîn de, dikarin nixxandinên berfireh bêtine kirin. Jibo balkêşiyê, ez bawer dikim ev yê bes bin. Em hewl bidin ku nêzîkî mijara girîng bibin. Yê bi şaristaniya Ewropa re, tîkeve pêwendiyên tez û antîtezeke bi çî rengî? Me nixxandinên xwe yên di derbarê hilatin, pêşveçûn û belevbûna şaristaniya Ewropa de, kirin. Me encamên nêzîkbûna wê, yên mêhtingehkarî û pişavker ên li Rojhilata Navîn jî, bi xalên sereke dîtin. Heger li vê erdnîgariya ku jîyan û şaristanî welidandî û mezin kirî, li Rojhilata Navîn bi awayek birûmet û biwate yê bidomîne, ev diyar e ku yê bi bersiva bidine pirsar "Çawa Bijîn" derbasdar bibe. Heta mêjî û giyanên ku ji sedsalan ve, bi beton bûne û bûne girêkên kor, neyên vekirin, ti bersivên rast nayên dayîn.

Pêwîst e were terîfkirin ku, weke alîgîrê, rola Rojhilata Navîn a di tez û antîtezan de bileyîze, tê çî wateyê. Şaristaniya Ewropa, di tevaya cîhanê de di her astê de, ji mêj ve gihaye tezên bihêz. Ji aboriyê heta bi bîrdoziyê, ji huner heta bi siyasê, ji teknîkê heta bi dîrokê, di her wateyê de, bi tezên xwe yên ku bingeşa wan a zanistî bihêz û hatine ceribandin, bi ewlekarî û bi hêz radiweste. Li cîhanê, di rewşa diyalektîka cîgeyîbûn û kadîbûna kûrbûyî de, belav dibe û bi xûnifandinê xwe dike mal. Lê li Rojhilata Navîn, belavbûneke bi vî rengî pêknayîne. Li vir berxwedan heye. Dîroka ku Ewropa jî welidandiye, bi awayek yekalî bi teqlîd an jî bi xûnifandinê, nabe ku teslîm bibe. Mîrateya mezin a dîrokî, dixwaze ku xwe di rewşa antîtez û sentez de, ji hêzekê re bike destpêk. Dixwaze ku ji derketineke nû û layîqî dîroka wê re, bike xwedî. Antîtezbûna li hember tezên Ewropa, nayêne wateya redkeriyeye bêteşe. Mînak, ti nixxên antîtezbûna derketinên îslamîyê tine ne. Heger ku angaştê wan hebe jî, hêz tine ye. Nêzîkbûnên neteweperestî û komunistiya reel, antîtêzî li dera han, ji sepînên hêsan ên teqlîdbûnê wêdetir, ti rolên din ne listine. Li qasî rojhilatnasan jî, tevkariyek li ronahîbûneke erênî nekirine. Kesên ku jibo hevkarîya Ewropa hewl didin, ji karmendiya hêsan û sîxurtiyê wêdetir, naçin. Herwiha peywîra antîtêzbûnê, li benda bixwedîbûnê ye.

Bi antîtezê ya ku were terîfkirin ev e: Emê çawa heyîna şaristanî ya Rojhilata Navîn, bi çêbûna şaristaniya Ewropa re, veguherînine tezên hember ku rê li ber angaşteke nû an jî derketinekê, vekin. Bi têkildanîna herdu şaristaniyan, çêbûneke çawa ya hember an jî cuda yê were derxistin? Dema ku kesek di nav de nehele, an jî kesek bi awayek bêteşe red neke, li qasî pêdiviyê û hê bêhtir ji xwe tiştina tevlî bike, wê hingê emê bikaribin antîteza ku mirovatî lê digere, ya teza diyalektîkê pêkbînin. Dor ne bûyina sentezê ye. Ev wateyeke wisa digire nava xwe ku, pêngava hember a ku yê cîhanê ji çolbûneke mezin rizgar bike û bigihe hêzeke ku wê di derawayeke hê bêtir lê were jiyandin de bihêle. Kadîbûn û cîhanîbûneke tenê bi tezên serdest ve girêdayî, heger ku bi şeweya herî demokratîk be jî, rê li ber xeteriya teşeyek faşîzma reş-spî, vedike. Herêmen cîhanê yên li derî Rojhilata Navîn, di warê xûnifînê de, bi awayek mezin lihevkirine, teslîmî van tezan bûne û pêdiviyên wan bicîh tînin. Encama vê yê bibe şeweya demokratîk, faşîstbûn an jî çêbûneke bi van rengan. Ji aliyê mirovatîyê ve, ya herî bi fikare ev e. Weke ku tê gotin, heger ku wiha bibe, birastî jî yê bibe "dawiya dîrokê". Nebûneke wiha, bi afirandina antîtezê ve girêdayî ye. Reel sosyalîzma ku bi pêşevaniya rûsan hatî ceribandîn, jiberku veneguherî antîtezê û bi rizîbûneke xerab teslîm bû, jibo mirovatîyê nebaş bûye. Divabû ku ew berxwedanên erjeng û pîroz, ew êşkişandin, xwînrijandin û hevî, ne bi vî rengî bi encam bûbana. Sedema vê ya herî bingeheve ku, hê nebûne antîtez, bi sextekarî behsa utopya komunîst dikin û dikevîne nava şaşiyê. Her şaşiyek dawîya dawî, dibe xiyaret û teslîmîyetê.

Em timî dubare dikin ku, rastiya dîrokî ya Rojhilata Navîn, destûrê nade xûnifîneke ketûber. Lewra, nîrxên bermayiyên şaristaniya Rojhilata Navîn, encex bi antîtezekê werine ser xwe. Herwiha di mercên nû de, dikarin humanîzma di rewîştê ve şaristaniyê de, dîsa jibo mirovatîyê bînin rewşa hêviyekê. Pejirandîneke ji vê û bi xwar de, bi mandelekirina (înkarkirin) xwe bi xwe, gengaz dibe. Yên ku ev ceribandîne gelek in. Bê hebûn bikêrî çî tîn jî, li holê ye û diyar e. Rojhilata Navîn, van hebûnên çêkirî jî, napejirîne. Zikê wê yê çandî têrê nake. Tevaya cîhanê bixwe jî, ew naxwe. Ew dixwaze bibe nîrxekî nû. Ji ber rewîştê û derûna wê, ev wiha ye. Edî yê çawa bikeve rewşa antîtezê? Bi xalên sereke û bi kûrayî, bê jirêderxistin, emê hinek ramanên xwe careke din bi kurtayî, pêşkêş bikin.

Nûbûna nasnameya bîrdoziyî, peywireke dîrokî ya sereke ye. Ronesansa ku di çanda Rojhilata Navîn de heta niha pêknehatî, pêwîst e nûsazî û tevgerên ronahîbûnê bibîne yek û weke tevgerekî were pêkanîn. Veguherînen ku di van hersê qadan de werin çêkirin, yê nasnameya bîrdoziyî ya nû diyar bikin. Ev yek veguherîna bingeheve a di qada bîrûbawerî û giyanî de, îfade dike.

Şaristaniya Ewropa, bi vê şoreşa bîrûbawerîya ku ji sedsala 15an heta bi sedsala 18an berdewamkirî, encex bisazîbûn bûye. Merhaleya dawî ku ev gihayê, şaristaniya spartî bisazîbûnên demokratîk e. Rojhilata Navîn, hê newêre ku van tîgînan nas bike. Lêbelê di vî derbarî de, pêwîst e em hinek şaşiyên derbasbikin. Veguhastîna zanist û teknîkê, damezrandîna pîşesaziyê û bixwedîbûna hinek sazîyan, ne pêkhatîna nûsaziyê, ne ya ronansê û ne jî ya ronahîbûnê nîşan dide. Ev pêşveçûnên bijartekirin ku dil nagirin, ji makêteke bi bîrûbawerîya vekirî, ya ku di çarçova mêhtingehkarî û bişavtîne de çêbûyî wêdetir, ti nîrxî îfade nakin. Di merhaleya ku pêvajoya dused salên dawî yên rojavabûyîne gihanê de, em dibînin ku li derî vê yekê, ti pêşveçûnên resene nehatîne jiyandin. Êslamîtiya ku weke bizavekê pêşketî, ji neteweperestîyeke ku rengê xwe guhertî wêdetir, ne xwedî ti wateyên din e.

Resenebûn, encex bi pêkanîna şoreşa bîrûbawerî ya sêlibî gengaz bibe. Yê were dîtin ku rêyeke din a cude tine, herwiha yê were fêhmîkirin ku di berbiçaviya Rojhilata Navîn de, ji pêkanîna vê şoreşa ku maye derng pêde, ti çareyên din tine ne. Li Rojhilata Navîn, jibo şoreşa sinc û bîrûbaweriyê, pêwîst e derba pêşî li qada ol bête dayin. Em di xwazînan diyar bikin ku pêwendîya vê nêzîkbûna me, qet bi laîkperestiyê re tine. Têgihîneke ku pêdivî ye derb lê bikeve jî, ev laîkperestîya sexte ye. Dîsa pêwendîya vê yekê bi beşa oldar re jî tine. Berevajî vê, evan heyînen herî bi nîrxên çanda Rojhilata Navîn ku hê venebûne. Dîsa pêwendîya vê, bi ol, mandelekirina xwedê û xeberdana ji mizgeftê re jî tine. Berevajî vê derpêşdike ku çêbûna van nasnameyan a dîrokî, bi dahûrandîneke zanistî pêkbîne. Tiştê bête kirin ev e ku, dahûrandîna heyînen mîtolojîk ên ku binyata wan, sewiranên nasnameya rahîbên Sumer in, rast were kirin. Pêdivî ye ku pîrozwerîya xwedanasî (îlahiyat), ya berhema dema çînçînîbûna hoveber, ku pêşî rewîştê mîtolojîk û dûre ya olî qezenc kirî, weke kereseyeke wêjeya dîrokî were hizirandin.

Sumerîyan timî mîtolojî û ola xwe guherandîne. Xwedayên xwe kêmîkirine û nav û wesfên wan cihêreng kirine. Kevneşopîya Hz Brahîm, ya "El" ku bi xwedê re gulaş digire, bi biryardariya Allah, tê guherandin. Mûsa ev aniye rewşa xwedayê qewmê xwe. Lêbelê êsa vegeeriyaye tîgîna "xwedayê sêbareyî". Hz Muhemed jî ber mecbûrî û pêdivîya wê desthilatîya yek û hevgirtî, gihaye xwedayê

ku bi nod û neh navan bihêz kirî. Ev dubareya kin jî nîşan dide ku, ol û xweda timî di nava guheranekê de ne. Êslamtî, yekîtiya mercên berbiçav ên dema ku hilatiye û ramana olî ya li holê, îfade dike. Şeweyên perestîşê jî, ji bihêzkirina kesayetiya xwe ya nû pêde, nayê ti wateyên din. Vê dawiyê jî, bûye mijara guheranên sift. Cihûtî û xiristiyantiya ku ji heman binyatê, timî guheran derbaskirine. Di roja îroyîn de jî, bêhtir weke çavkaniyeke wêjeyê û nîrxê sincî tê nêrîn. Nûsaziya wan di ol de, domdar e. Ev nûsazî di bin pêşevaniya zanist de pêşvedîçe. Tê zanîn ku ji vêna çiqasî bi qezenc derdikevin.

Di serî de îslamtî, kevneşopiyên di derawayên bi vî rengî de, guherandina peyvekê jî, weke gunehêkî herî mezin tê nîşandan. Ev rewş, lîstika dîlgirtina hişmendiyê ya erjeng e. Di dîrokê de, pêxemberên afirîner jî di nav de, jibo ti kesan û ti deman ol evqasî nebûye amûra bêsilkirinê. Ol bi vî wê şeweyê, li ser navê pîroziyê di diroka wê de, xistine derawa ya herî paşverû û binalet. Ev ne mafê ti desthilatiyên siyasî û menewî ye ku ol têxine vê rewşê. Di şehtkirin (felçkirin) û jehrdana hişê civaka xwe de, sepîneke ji vî xetertir nayê hizirandin. Civakên Rojhilata Navîn, bi taybetî di van hezar salên dawî de, bandora berdewamiya vî xeteriya ku çîqa diçe zêde dibe, jiyane. Ev şewegirtina bîrdoziyî ya herî xeternak ku hiş werimandiye, bêgiyan kiriye û herwiha pêşveçûna giyanî hişk kiriye, di roja me de li pêşya hemû çavkaniyên paşverû tê. Jiberku bi awayek rêkûpêk li ser nayê xebitandin, nayê zanîn bê vî çiqasî û çawa civak şehtkiriye. Lewra yê herî laîk jî di nav de, hemû desthilatiyên cîgeyî û navendî, weke amûreke rêveberî û mijokatiya herî hêsan, vî mijarê bikartînin.

Dema ku îslamiyet di merhaleya hilatin û belavbûnê de bû jî, timî di nûsazîbûna pêdivî re, hatiye derbaskirin. Şîatiya îranê, elewîtiya kurdan, bektaşîti û mewlewîtiya tirkî û gelek terîqet û mezhebbûnên bi vî rengî, nûsazîbûn e. Ev pêvajoyê di salên PZ 1100an de hate cemidandin û di bîngeha statukoyê de, bi awayek hişkkirin anîne heta bi roja îroyîn. Xeteriya wê, ne ku çîqas çewtî û rastî di nava wê de hene, xeteriya wê ev e ku, ramandina azad rawestandiye û takekesîti tîne kiriye. Mirovê ku bi azadî ne hizire û jiyanêke takekesî xeyal neke, tê wê wateyê ku afirîneriya wî mirî ye. Civakên ku bi takekesî bi vî rengî hûnandî, xwedî çavkaniyên jiyanê yê hişk in. Karesata jibo civakên Rojhilata Navîn ev e ku ev rewş, bi hêzeke herî mezin li ser lingan tê girtin. Hemû zordestên der û yê hundir, dikarin ji vî yekê sûd wergirin. Lêbelê jiberku civak û welêt, nîrxê afirîneriyê wînda kirine, timî ji tînebûnê û zûwabûnê rizgar nabin.

Herwiha him jibo bi encamkirina nûsaziyên di ol de, yê ku dereng mane û him jî hê girîngtir, jibo ku rê ji takekesê azad re were vekirin, pêdivî ye em pêngava ku dogmaya olî bitememî vebike pêkbînin. Rêya vî yekê jî ev e ku, em hemû pirtûkên pîroz weke çavkaniyên wêjeyî binîrxînin, bi dahûrandinên civaknasî û sincî, ber bi sinckî azad ve di veguherînekê re derbasbikin. Pêwîst e bimîsogerî, em ol ji dogmayên ku li takekesê tîne ferzkirin derînin. Ji dêvla şeweyên perestîşê yê bi vî ve girêdayî, bi zimanekî ku gel hemû têbigihîje, di bîngeha tîkiliyên pirtûkên pîroz a bi mijarên dîrok, civaknasî, siyasî, aborî, mijokatî, azadî, zanist, pêşîti, paşîti, diyalektîka materyalîst, metafîzîka îdealîst, ehlaq ûwd. de, pêwîst e pêşvebirina dahûrandinên kûr, bîngeh bîn girtin. Pêdivî ye şîroveyên sinet û ayetan, di vî bîngehê de werin pêşvebirin.

Em bi vî yekê ne şorindên (weaz) zuwa, yê ku propagandaya sazûmanê dikin, nîşan didin. Di vir de, nûsaziyeke binyatî tê derpêşkirin. Mizgeft û cîhên bi vî rengî, dikarên rola navenda zanist û huner a wan deveran bilîzin, dikarin lîstikên şano yê bîsil bidin leyîzandin. Divê neyê jîbîrkin ku nimêj bi xwe jî, şeweya leyîstikên drama yê pêşî ye. Nimêj bi xwe jî bi wateya gelemperî, şano ye. Ev gelekî girîng e ku ev gotinên me ji aliyê bawerhişkan ve neyê berevajîkirin. Ez dubare dikim: Bila çavkaniya rojî, nimêj, qurban û cejnan were lêkolîn. Wê hingê yê were dîtin ku binyata wan, pêşandeyên gel ên demsalî ne. Perestîş, şeweya wan pêşande û şanoyên pêşî (dram, trajedî, komedy) yê ku vî dawiyê ligor pêdiviyên hatine veguherîn e. Herwiha pêwîst e ku, pêdiviyên serdema me li ber çavan werin girtin û ligor vî, veguhere şeweyeke ku, hiş azad berde, dîrokê bi kûrayî bide tîgîhandin, bi gihîne zewqa huner û sinckî sûdmend gengaz bike. Ligor dema xwe, nimêj, rojî, qurban û merasimên diyan ku pêşgiriyan civakîbûnê bûn, pêwîst e di vî bîngehî de werin veguherandin. Wê hingê wateya di çavkaniya olan de ya dema ku çêbûne, yê were pêkanîn. Rêya vî ya herî rast jî ev e ku, mizgeft û derên mîna wê, bibîne akademû û şanoyên ku gel li wan perwerde bibe. Pêwîst e zanar, hunermend û zanayên derdor ên herî pêşketî, li vî dersê bidin û gel bê perwerde nehêlin.

Jibo şeweyên perestîşê yê din jî, birêkûpêkkirinên bi vî rengî pêdivî ne. Ji dêvla qurbanên ku wergeriyaye hovîtiyeke bêhempa, dikarin bi diravên wan, jibo hejaran û karên din ên bixêr, fon were damezrandin. Ev yê bêhtir bixêr be. Rojî, jibo terbiyekirina nefsê dikare bisînore were sepandin. Bi kurtayî, hemî şeweyên perestîşê, pêwîst e ku ligor pêdiviyên serdemê, ji nûve werin

sererastkirin. Hinek dikarin bibêjin, "xweda li kûderê ma?" Ez ji van re ji serî de, vê yekê dibêjim: Xweda, weke nasnameyên ramanê yên sêwiranên rahîbên Sumer, bi pêşveçûna civakî re, timî pêşketine. "El"ê Brahîm, bihêzbûna qebîleya wî ye. Yehova yê Mûsa, jibo yekîtiya îsraîl ango qewmê Cihû ye. Rabê ësa, senteza olê hoveber û wijdan ê bindestên wê demê ye. Xwedayê Muhemed, pêdivîya yekîtiya qebîleyên sereke û bihêzbûna wan, îfade dike, sêwirana qebîleyên Bedewî yê hevpar e, hêza yekbûna Ereba a qebîleyan e. Her kom û civakê, ligor ku wan bihêz bike, ji nû ve xwedayê xwe sêwirandine. Rasteqîniya civakî û dîrokî ev e. Xwedayê roja me jî, derûna zanistê ye. Xweda edî di bingeha diyalektîka gerdûnîti de, her tiştê ku xwe bi xwe dixebite, li guheranên bêdawî rast tê û rast tîne ye. Gelo ji vê mezintir ramaneke xwedê tê hizirandin?

Utopîstiya bêbingeh a ku li bîrûbaweriya Rojhilata Navîn raselîtiye, pêwîst e were perçekirin. Dîsa xeyalên utopîk ên weke bihişt, dogeh, sirat, mahşer, bendewariya rizgarker, netewa raser û şêweya reş û spî ku afirandên rahîbên sumerin, pêdivî ye bêtin terikandin. Êdealîzekirina xweperestiyê ya hevqasî, rê li ber şêweyên çewsandin û mijokatiya ku qet ne hatibe dîtin, vedike. Weke hêza dogmayan, hêza utopyayan jî, herî bêhtir ji bihêzan re dibe amûr. Li derî gengaziyên pêkhatina zanist, utopyayên di derbarê payîdariyê de, hiş dîl û tiral dikin. Heger ku ev bi bengeha ol bin, hê bêhtir rê li ber bandoreke cemidandinê vedikin. Çiqas ku raman û pêşnûmayên spartî bingeha teknîka zanistî, pêdivî ne, yên bêbingeh jî ewqasî fikaredar û nepêdivî ne. Heta ku paşverûtiya dogma û utopya ku di çanda Rojhilata Navîn de, gelekî bi hêz, neyê şikandin, pêkanîna Ronesanê gengaz nabe. Ev sêwiranên ku berhemên beriya hezar salan berê, yên pêşveneçûna zanist û teknîkê ne, lêbelê ewqasî jî bi mercên ferzkirina newekheviyeke civakê ku hatine pêşvebirin, heger ku îro jî dibine mijara pîrozî û perestîşê, ev yek nexweşiya civakê û takekes a herî mezin e.

Heta ku ev nexweşî neyê derbaskirin, divû neyê hêvîkirin ku hişmendî, wijdan û giyan ê bi xwe werin. Çanda civakeke ku keçîka pazdeh salî, jiberku ji xortekî hezkiriye bikûje, bi erjengî nexweş e. Divû neyê jibîrkirin ku her qada jiyanê, wiha tê kûştin. Ev ax û çanda ku demekê, xeyalên xweda û xwedawendan çêdikirin, jiberku veguherîna pêdiviya afirîneriyê nîşan nedaye, edî rê li ber çoleke zûwa, bêgiyaniya welatekî bêweç ku xeyalan na afirîne, vekiriye. Best (îlham) nade, helbestê na afirîne û evîne pêşvenabe. Lewra ji mêj de bûye fosîl, di destê dogma û utopyan de zûwa bûye, cemidiye û ketiye rewşa welatê bêweç. Şoreşa Ronesanê, yê were wateya ku, ev ax careke din heşîn bibe, bibe besta evînen mezin, rê li ber destanan veke, dengê şadîbûne bi hawîr bikeve û bi xewnên bihiştê yên nû û rast şiyar bibe. Yê were wateya ku, bîrûbaweriya cemidî, giyana zûwa bûyî, wijdanê hişkbîyî yê şewîşî, hestên dadmend ên windabûyî, xwe her roj ji nû ve bafirînin. Jibo bîrûbaweriya zanistî, merc bikêrhatî ne. Ji qezencên Ewropa, gelek tişt dikarin werin wergirtin. Teknîk jî amade ye. Hê hêsantir dikare were bidestxistin. Ev rasteqînî, şens û hêza Ronesansa Rojhilata Navîn, diyarker dikin. Heger ku dogmayên rabirdû û xeyalên dahatûyê, di bingeheke zanistî de dahûrîne, dîrok ê bibe sulav û ber bi dahatûyê, bicoş biherike. Wê hingê, bi rastî jî hêvî yê veguhere hêzê û bibe şape, biherike.

Bi zanistê danehevên bihêz ên ronahîbûnê çêbûne. Tiştê kêr, beralîkirina van a ber bi dîrok û berbiçavîyê ye. Bi bîrûbaweriya zanistî, dîrok yê bigihîje vegotîneke dewlemend. Dahûrandina roja me, yê rê li ber zindîbûnê veke. Dahûrandina mirovekî me bi tenê jî, yê jibo fêhmkirina cîhanê bes be. Li derekê çiqas ku ketin pêkhatibe, ewqasî jî derfetên bilindbûnê hene. Çiqas ku tarîti sift bûbe, ronahî jî ewqasî nêzik e. Li hember her tiştî, pêwîst e em rexneyî bin. Lêbelê divû ku em hêviya dîtina rastiyê jî, winda nekin. Pêdivî ye em dev ji eşirtî, malbatîtî, mêmîtî, jinîtî, neteweperestî û oldarîtiya xweperestîya kevin, berdin. Pêwîst e em veqerîne têgihîna mezin û dewlemend a mirovatîyê ku di yekî de me teva û di me tevan de yekî dibîne. Di humanîzmê de, pêdivî tine ku ji derve bistîne. Dewlemendiya vê axê ya herî mezin, mirovatîparêziya wê ye. Divê ku em vê rakîn ji piyan. Pêwîst e careke din, em rêya evînen mezin vekin. Divê ku em teoriya wê ya xwedayî û pratîka wê ya pîroz hezar carî tobe bikin û em zanibin bê dilsoziya mezin çî ye, çiqasî bi nîrxê şaristaniya xwe ve û bi hêjayîya mirov ve girêdayî ye û em hewl bidin ku bijiyani bikin. Pêdivî ye em bibînin ku, Leylayan û Mecnûnan, Kereman û Asliyan, Ferhadan û Şîrînan, serên xwe ji tirbên xwe rakîn û bê mirin, careke din evînen xwe ji dera ku mayî berdewam bikin.

Divê ku em herin kevintir, heta bi Gilgamêşan. Divê ku ew jî rabe, bibîne ku şaristanî ne mirî ye û Enkidû hê dijî. Divê ku em nîşanî wî jî bidin ku, evîna bawermendan bi dawî nabe. Pêwîst e hemû pêxember jî rabin, divê em nîşanî wan bidin bê olên wan, şiyandarin çî tiştan bafirînin û mirovatî çikası bilind kirine.

Divê ku êbnî Sînyan, êbnî Ruştan û El Kîndîyan jî rabin, bê bi hewldanên xwe çî tevkarî li zanistê kirine û zanist çiqasî pêşketiye bibînin, divê em nîşanî wan bidin ku ew ên wan hişên xwe yên mezin, bikaribin têr bikin. Kawayên Hesinkar, Hallacı Mansûran, Suhrewerdiyan, Babekan,

Mazdekan û Koroxliyan jî, divê rabin û divê em nîşanî wan bidin ku berxwedanên mezin, egîdî û êşên giran, belaş neçûne, mirovên layîqî wan li ser karin.

Ev ne xeyalên erzana in, ev mezinayiyên me ne ku pêdivî ye me ji mêj de, bi ronansa xwe re, rakiribana ji piya. Pewîst e dîroka me ji serî heta bi binî, bi wêjeya hemdem, ji nû ve were zindîkirin. Ya herî girîngtir, pêwîst e em wêjeya serdema neolîtîk pêkwerînin. Bi taybetî divê ku em civaka daykanî ya ku her tiştî diwelidîne û dafirîne, dayîkê, dayîka xwedawend, giyana wê, hişê wê, xeyal û hêviyên wê, çawa bin em wisa zindî bikin. Heger em dîrokê wiha nas bikin, emê xwe nas bikin. Em ji bilî dîrokê çi ne! Li derî dîrokê, ji ne titiştî pêde em çi ne! Li Rojhilata navîn, gelek têgînên weke mîtoloji, ol, mezheb, terîqet, xanedan, eşîr, mîr, xulam, benî, xweda, xwedawend, şêx, reîs, beg, dayîk, bav, zarok, hesinkar, hesp, şûr, halet, bivir, kan, talan, şer, evîn, pêxembertî, rahîb, sofî, zana, xayîn, rezîl, rûmet, namûs, pîrozî, qeder, hêvî, cejn, mirin, bihar, zivistan, havîn, çiya, cem, çol, rê, hêştir, se, ganêr, bizin, mîh, çêlek, kerî, şivan, cotkar, nivîskar, siltan, emîr, leşker, fermanîdar, zanyar, xweşikayî, nerindî ûwd. Divê bi zimanê wêjeya hemdem, ji nû ve werin jiyandarkirin, ev jî peywira hunerî û zanistî ya şoreşa Ronansê ye. Wêjeya heyî û bîrûbaweriya zanistî, ji rastiyan dîrokî û civakî ya Rojhilata navîn qut in, nêrînen bijarteker, fenteziyên bêrêkûpêk û bê bingehe ên kes û komên ku bi mêtîngêkarî hatine xunifandin, îfade dike. Binyata bîrûbaweriya civakê, hê sehtbûna xwe diparêze. Wêjeya bi binyata dogmatîk a ku rê li ber vê vekirî, di wesfê pesindanên Bêwateyî de ye. Ronansa di wêjeyê de, jibo hilatina kesayetiya azad, bingehe e. Rizgarbûna ji dogma û xeyalên bê bingehe, ne bes e. Pêwîst e bi bandora zindîkeriya wêjeyê, bi nûkirinê re bête temamkin.

Di encamê de, tişta derkeve holê ne oleke nû ye. Ol bi xwe yê bête ser qada sinc û yê were derawaya ku layîq, yê wijdanê dadwer û azad bafirîne. Bi qada zanist re zêde têkildar nabe, yê wê ji felsefeyê re, bihêle. Jibo felsefeyê û zanistê, pîrsgirêk ne ji nû ve çêkirina wan e. Yê bi hişmendîya dîrokê re bibe yek û hêza ronahîbûna ku pêdiviyê serdestî bîrûbaweriya azad û afirîner bike, derêxe holê. Dema ku qezencên Ewropa yê zanistî û felsefî, bi rastiya dîrokî ya Rojhilata Navîn re bibine yek, Dîroka cihanê ya gelemper û bîrûbaweriya mirovatiyê, yê bigihîje ronahiyeke pêşveçûyîtir. Pêşveçûna antîtezê jî, tê vê wateyê. Rojhilata Navîn a ku li xwe dihizire, antîtezek e. Nîşandana vê hêzê, encex yê bi berfirehkirina şoreşa Ronans û ronahîbûnê, gengaz bibe, Hewldanên çend kes an jî yê çend koman, têra vê yekê nakin. Derketina holê ya afirîneran ji her neteweyê û koma çandê, û bandora wan li ser civaka wan, yê were wateya Ronans û ronahîbûna herêmê.

a- Taybetiyeke vê pêvajoyê ya diyar, derketina holê ya rewşenbîr û takekesê rast e. Li Rojhilata Navîn ev çêbûn, ji hilatinê dûr in. Bûyina rewşenbîrî û takekesîtiyê, ji bûyina partî û tevgera dijber zortir e. Pêşveçûna takekesîtiyê, nîşana şînbûna civaka azad e. Carinan takekesekî rewşenbîr, civakekê temsîl dike. Çanda civat, eşîr û benî, bi hêsanî fersendê nade vê pêşveçûnê. Dema ku meşa rewşenbîr û takekesê tê baş çêbibe, bereka (îstîqamet) civakê ya sed salan yê pêkwere, karê ku gelek partî û şeran pêkneanî, yê were pêkanîn. Divê em tim bi bîra xwe bînin ku, hozan, pêxember, feylesof û zanyar, her yekî ronans û meşa rewşenbîr a dema xwe ne. Civaka bê rewşenbîr, weke karwanê ku rêberê xwe wînda kirî ye. Rêyên çewt ku yê li ser hev bikeve wan, ê wî bi sedsalan ber bi bê armancîyê bibe û ji armancê dûr bike. Ronans û şoreşa ronahîbûnê, jibo civakan hevqasî jiyani ye. Timî, jibo kesên ku nûka bi kevine ser rêyekê re, rêberêkî ku serkêşiyê bike pêdivî ye. Dema ku çandek an jî civakek nûka bi xwe were, tişta herî pêdivî ev kesên rêber in. Di dema tê jiyandin de, pêdivî bi van kesayetiyan wiha gelek e. Takekesîti, bêhtirî ku li xwe bihizire, tê wateya kesê gihayî hêza ku civakê di xwe de û xwe di civakê de pêktîne. Kesê ku xwe dicibîne û li dû berjewendiyên xwe dibize, ne takekes e. Kesên hêsan û berjewenperestên xwepere, nikarin takekes temsîl bikin. Dema ku takekes çêbibe, yê bigihe afirîneriya hunerên curbicur û pêşvebiçe. Takekes û huner hevûdin pêdivî dikin. Dema yek ji wan hebe, yê din jî yê bibezê cem. Huner bi baskbûna hiş û giyan e. Ædî ji dêvla meşê ve difire. Firîn, jibo civakekê, jibo şaristaniyekê, tê wateya ku bigihîje hêza derûnî û ber bi serfiraziye bimeşe

Li Rojhilata Navîn, di derbarê, ronans, nûsazî û ronahîbûnê de, gengaz e ku nîrxandinên berfireh werine kirin. Lêbelê jibo mijarê, bê pêdiviyê çi were fêhmkirin, ev bes e. Ev ji kesên ku bixwazin, li ser binyata xwe bi rasteqînî bihizirin, di derbarê pirsên "dive çawa bin" û "çawa bijîn" de biryareke azad bidin, jibo vê jiyane hêza pêdivî nîşan bidin û yê ku bibine tez û antîtezeke bi angaşt re, bingehe e. Serkeftina di vî babetê de, yê were wateya meşa bi serfirazî ya di rêya Ronansa mirovatî û ronahîbûna wê de. Çiqas ku dereng be jî, heta ku li Rojhilata Navîn antîtez neyê afirandin, şaristaniya Ewropa bi serê xwe, rê li ber senteza ku tê wateya şaristaniyeke nû, venake. Antîteza Rojhilata Navîn, şaristaniya Greko-Romen bû. Têz û antîtezen van herduyan, senteza Ewropa çêkin. Ædî tez niha şaristaniya Ewropa ye. Antîtezê ê bi Ronansê li Rojhilata Navîn were çêkin.

Yekîtiya diyalektîk a herduyan, yê jibo cîhanê senteza nû çêbike. Diyalektîka dîrokî tim wiha ye. Heger ku careke din, çerxên xwe di bingeha yekîtiya dîyalektîkê de bizivîrîne, yê bikariba rê li ber derketina dîrokî veke.

b- Çêbûna din a bingehîn ku pêdivî ye li Rojhilata Navîn, bi hilatina ji nû ve û ronahîbûnê re, di nava hev de bête jiyandin, an jî teza şaristaniya Ewropa, pêşnûmaya şaristaniya demokratîk e. Jiberku li ser şaristaniya demokratîk, bizêdeyî hatiye rawestandî, pêdiviya vekirinê tine ye. Lêbelê lêanîna vê ya li Rojhilata Navîn û çêkirina antîteza wê, pirsgirêkeke berfirehtir e. Digel ku nûbûna bîrûbawerî û giyanî bingeh e jî, li hember dewlet û civakê hinekî bi navber e. Hê bêhtir li derî wan pêktê. Takekesên hindik û derûn werdigire. Lêbelê teza şaristaniya demokratîk, berevajî vê civak û dewletê bingeh digire. Divê ku bi herdukan re, hesêb bide dîtî.

Di vî derbarî de, bersiva ku Rojhilata Navîn ê bide teza Ewropa, di asta nîqaşê de jî, ne ketiye rojevê. Bersiva sosyalîzma reel a sernekeftî, rewş him zor kiriye û him jî çêkirina vebijarkê, ferz kiriye. Baskê Ewropa yê şaristaniya demokratîk, eslê wê rastgiriye temsîl dike. Bi gotineke din a rast, Şaristaniya Ewropa, baskê rastê yê şaristaniya demokratîk ku ew derbaskiriye, teşkîl dike. Ev rewş, ji hêza kapîtalîzmê tê. Ewropa, weke navenda klasîk a kapîtalîzmê, ji rastê venaqete. Ji wê bêhtir, pêşvenaçe. Paştirî wê faşîzm, pêştirî wê jî sosyalîzm e. Ji ber vê yekê rastê, derawa aqlî (rasyonel) ye. Sosyalîzma reel, baskê ezmûnîtiyê vala hiştiye. Welatên bi navê hindikî pêşveçûyî, nikarin vê valayîyê dagirin. Heger ku niçikbûnê jî pêkbûnî, ev yê jibo wan serkeftin be. Pirsgirêkên Çînê û yên mîna wê yen bi vî rengî tine ne.

Antîtezbûna Rojhilata Navîn, bi rûniştandina pêvajoya demokratîk a him di qada siyasî û him jî di ya civakî de, gengaz e. Çêkirina vê ya bi nûsaziye an jî bi şoreşê, derûnê naguherîne. Demokratîkbûna civakê, rojeva herî lezîtiye. Weke ku di hemû tevgerên şoreşger, ên girseyî de tê dîtî, pêşevaniya vê jin û ciwan dikin. Ev herdu hêz, di rewşa hêmanên demokratîk ên herî bihêz de ne.

Di serhildana demokratîk a Rojhilata Navîn de, cîhekî jinê yê resene heye. Weke hêza neolîtîkê ya afirîner, kêmxistina ji aliyê civaka biçîn ve, ti carî di xwe de nabihêre. Jinê timî bi şik, li serdestiya mêr nêriya ye. Hay jê heye ku mafê wê tê xwarin. Bêcareyiya wê, wê di nav êşên kûr de dihêle. Di wê hişmendiyê de ye ku, ne layîqê vê rewşa têde ye. Eslê wê ew bi awayek veşartî, alîgirê çanda xwedawendê ye. Ti caran bi awayek cidî, baweriya xwe bi xwedayên mêr ne aniye. Di hişmendiya ku timî di nava valayiyê de ye. Bi êş û hêrs, his dike ku rêzgirtin û hezkirina mafê wê, nayê nîşandan. Qet ne bexşandiyê ku hevqasî, bi hewcedarî kirine destê mêr, hê bêhtir jî, xwe ne bexşandiyê. Hay jê heye ku mêr ji hezkirinê gelekî dûr e, hov û bêsinc e. Dizane ku ji hêza evînê jî bê par e. Qurbanbûna wê ya hevqas nakokî, weke tê zanîn ew ne ber bi nezaniyê, ber bi zanabûnê biriye. Dema ku bawer bike, kesek nikare weke wê, girêdana xwe ya herî bihêz nîşan bide. Bi gelemperî hemû jin, bi taybetî jinên Rojhilata Navîn, bi van taybetiyên xwe, hêza civaka demokratîk a li serxwe û çalak e.

Serfiraziya civaka demokratîk a dawî, bi jinê gengaz e. Ji dema neolîtîkê ve, gel û jinên ku li hember civaka biçîn, di erdê de çikiyane, weke xwediyên rastî yên pêngava demokratîk, him ji dîrokê tola xwe digire, him jî li baskê çepê yê şaristaniya demokratîk ku bilind dibe, cîhê xwe digire û antîteza pêdivî çêdike, di çuyîna ber bi civaka azad û wekhev de, dibe sparteka civakî ya herî zexm. Li Rojhilata Navîn, bûyina antîtezê ya demokratîkbûna civakê, yê bêhtir bi saya jinê û dû re, bi ya ciwanan pêkwere. Şiyarbûna jinê û weke hêza pêşeng a civakê, cîhgirtina wê ya li qada dîrokê, di nîrxê antîtezekê de ye. Cîhana jinê, hişmendî, wijdan, hezkirin û parastina wê, berendam e ku nîrxên şaristanî yên cuda derêxe holê. Ji ber rewîştî çîna şaristaniyan ku bi serdestiya mêr pêşvedicîn, ji vî alîve jî jinê, tîne derawa antîtezeke bihêz. Him derbaskirina cîhêrengiya çînen civakê û him jî bidawîkirina serdestiya mêr, ji antîtezbûnê wêdetir, di nîrxê senteza nû de ye. Herwiha, di demokratîkbûna civaka Rojhilata Navîn de, rewşa jinê ya pêşeng, di tevaya cîhanê de him antîtez û him jî di derawayî sentezê de, taybetiyên dîrokî hildigire.

Rola ciwanan jî, hinekî dişibe ya jinan. Ciwanên ku bilezginî cîhana hemdem têdigihîjin, di rastiya Rojhilata Navîn de, ji ber bêcareyiyan ku ketinê, gelekî bi hêrs dibin. Teknîka înfomatîk û ragihandinê, ciwanan ber bi hişmendiyekê ve dibe. Zarok bi xwe jî, bi awayek lezginî derawayeke hêza demokratîk, jiberku ciwanên ciwanane, distînin. Bêzariya civaka Rojhilata Navîn a ji eşîrtî û neteweperestiyê, neçareseriya ku herduyan rê li ber vekirî û ji ber dewşên çandî yên hevpar û dîrokî, di derûna demokratîk de, nêzikî rastiyeke radiwest e. Rojhilateke Navîn a demokratîk, ligor rastiya civakî û dîroka gelên wê ye. Erdnîgarî û çanda di nava hev de, pêdiviyên aborî, gihanî û çavkaniyên avê, federasyoneke demokratîk a hevpar, dike alternatîf. Ji xwe rabirdûya dîrokî ya Rojhilata Navîn,

di wesfê federasyona gel û qebîleyan de ye. Fedrasyona ku rejîma ligor mercên civaka Rojhilata Navîn e, ji ber vê yekê ye.

Gelan bi hemû pêwîstiyên xwe yên dîrokî û civakî, hezeke demokratîzma tundraw e. Bi vê derawaya xwe, di baskê çep yê şaristaniya demokratîk de, rastiyeke cîhanê ye ku herî nêzîkî çêkirina antîtezê ye. Bi gel û jinên xwe, vebijarka demokratîk a Rojhilata Navîn, di derawaya herî bi angaşt de ye ku, antîteza şaristaniya Ewropa pê hewce, derêxe holê. Xwezaya rasteqîniyên wê, vê antîtezê çêdikin. Çep û rastê navenda du şaristaniyên bi hêz, bi yekîtiya diyalektîkê ku tez û antîtez çêkirine, careke din weke di rabirduyê de, jibo sentezeke nû ya mirovatîyê û destpêka xebateke derketinê, bi peywira xwe ya dîrokî re rûburû ye.

Dîroka gelên Rojhilata Navîn jî, weke dîroka jinê ye. Ew jî ji dema neolîtîkê ve ji dewrê hatine derxistin û di erdê de hatine çikandin.

Astengiya di pêşya pêşveçûna wî de, dewleta despot a ku li navenda saziya siyasetê rûniştiye. Lêbelê jiberku şaristaniya kapîtalîst, kadîbûn ji xwe re bingeş girtiye, şensê vê dewletê yê ku mîna Kevin xwe bidomîne, kêmkirîye. Li derve kadîbûn û li hundir dijberiya gelan ku bi teknîka înfomatîk û ragihandinê zêde dibe, dişibe ku yê vê amûra despotîk jihev bixin. Yekem care ku dîrok, jibo perçêkirina vê girêbaya di sînga civakê de, dixebite. Herwiha, berxwedana siyaset û dewletê ya li hember demokratîkbûnê, domdirêj nabe. Di pêvajoyeke dîrokê ya kin de, ji holê rabûna wan jênerev e. Weke şensekî dîrokî, derfet û pêwîstiyên dewlet û civakê, yên demokratîkbûnê ku di nava hev de, dişibe ku bi vî aliyê xwe yê vebijarka şaristaniya demokratîk, bilezgiyê bigihijîne. Ev pêşveçûneke ku çêbûna antîtezbûnê, bihêz dike. Herwiha dema ku em dibêjin him bîrûbawerî û him jî şoreşa demokratîk, şensê bûyina antîtezê bi awayek bihêz, dide şaristaniya Rojhilata Navîn, ev rastî diyarker dibin.

c- Li Rojhilata Navîn, pêşveçûna şaristaniya demokratîk, bi teoriya qada sêyemîn û pratîka wê ve, ji nêzîk ve girêdayî ye. Di bin vê rewşê de, binyata kevneşopîya dewlet û civakê, rola bingeş dileyîze.

Binisandina zêdekar a civaka kevneşopî, bi awayek zêde biyanîbûnkirina wî ya xwe bi xwe û bi vê yekê re jiyandina wî ya bi şeweyeke kevneşopî, rê li ber windakirina dînamîkên wî yên derûnî, vekirîye. Modernîtiya serveyî ya bi kapîtalîzmê ve girêdayî, ev rewş hê bêhtir neyînî kiriye. Dewleta kevneşopî ku rola kapîtalîzmê ya pêşverû nîşan nade, bi taybetî çanda ronahî û dema ronahîbûnê venaguhêze nava civakê, berevajî vê, têgihînin totalîter û neteweperestîyeke zêdekar ên dema paşverû, bi binyatên despotîk ên kevneşopî re dike yek û bi cîlayeke rêxistinî ferz dike, rizîn û neçareserîya di binyata civakî ya Rojhilata Navîn de, gelekî zêdetir kiriye. Rewşa dewleta kevneşopî, hê bêhtir paşverû û kevneperest e.

Ev herdu hêman, bandoreke neyînî li ser civaka şarwer û pêşveçûna şaristaniya demokratîk dikin. Ya rastir, gelekî zor e ku civaka klasîk û dewlet, bi serê xwe behreyên demokratîkbûnê nîşan bidin. Di vê rewşê de, civaka şarwer û demokratîkbûn ku qada sêyemîn e, girîngîyeke mezin bidestdixin. Di navbera herdu hêmanan de, weke hêmana sêyemîn civaka şarwer û demokratîkbûn pêşvebiçe, şensê veguherînê yê derkeve holê. Belkî jî jibo vekirina kilîtûna Rojhilata Navîn, herî bêhtir pêdivî bi pêşvebirina teorî û pratîka qada sêyemîn heye. Binyata rêxistinî û bîrûbawerîya Rojhilata Navîn a bi kûrayî kilîtîkirî, weke qada sêyemîn çêbûna civaka şarwer û pêve girêdayî hebûna demokratîkbûnê, tîne rewşa hêmana çareserker û pêngava herî girîng. Heta ku ev pêngav biserfirazî neyê avêtin, hêviya dahûrandîneke ji dewlet û civakê ya ji ber xwe ve an jî bi mudaxleyê, ne rast e. Ev yek yê rizîbûn û neçareserîyê kûrtir bike. Rêxistin û çalakîyên hişk û bişidet ku dixwazin têxine şûna van, hê bêhtir rê li ber kilîtûnê vedikin. Dewlet bi rêbazên herî hişk xwe bihêz dike û civak hê bêhtir tê binisandin. Çêbûnên weke çepên tundraw û rastên tundraw, kevneşopîyeke şidetê xistine dîroka herêmê. Di sedsalên berê de jî, nêzîkbûnên bi şidetê sernekeftine. Ev rewş ne bê wateyîya berxwedanê, girîngiya şeweya berxwedanê datîne holê.

Ev ne vala ye ku şaristaniya demokratîk a li tevaya cîhanê serfiraz bûye, herî zêde xwe dispêre civaka şarwer. Hetiye çespendin ku di tevaya cîhanê de, kevneperestîya dewlet û civakî ya bandorker, encex bi vê rêyê were derbaskirin. Jibo Rojhilata Navîn, bi tundî pêdivî bi tevayîyeke teorî, bername, stratejî û taktîka civaka şarwer heye. Pêdivî ye ku ji aborî heta bi teknîk û derdorê, ji qada civakî heta bi hiqûq, çand û zanîstê, ji sporê heta bi hemû beş hunerê, ji bîrdoziyê heta bi siyasetê, civakeke alternatîf a nû, belavbûyî û birêxistin were pêkanîn. Civakeke şarwer a alternatîf ku ne niçika dewletê û ne jî ya civaka kevneşopî be, nêrîneke wê cîhanî ya serbixwe hebe, di navbera wan de kordînasîyoneke wê ya gelemper hebe, xwedî bernameyên bikitekit be, ligor pêdiviyê birêxistinbûnên erkî û jibo bigihe armancê bi şeweyên çalakîyên herî bikêrhatî hatibe arastin, him di warê vekirina kilîtê de û him jî di diyarkirina rêya ku yê bişopînin de, yê roleke jiyânî bilîze.

Taybetiya teoriya qada sêyemîn a girîng ev e ku, heyînên dewlet û civakê yên ku rê li ber kilîtbûnê vekirine û çareseriyê nakin, hilnawesîne, sazûmana hiqûqê ya derbasdar hemberî xwe nagire, lêbelê kêmasî, çewtî û valayiyên wan dibîne, xwe birêkûpêk dike û çuyina ber bi encamê bingeh digire. Bi têgihîna "Tu nekarî çêbikî, ezê çêbikim" xwe dide pêş. Teoriyên şoreş û şoreşa hember ên berê, hilweşandin û jevxistina civak û dewletê û çuyina encamê ya bi vî rengî, bingeh digirtin. Bi zêdeyî hat dîtî ku evan ji rewşa bixwîn û ji serkeftinên biguman, qet rizgarnebûn. Ev rêbazên veguherînên ber bi paş an jî ber bi pêş ku ji paşdemayîna zanist û teknîkê, an jî ji meşandina çinçînîbûna bizorê dihatin, di dawiya sedsala 20an de, ji ber şoreşên zanistî û teknîkê girîngiya xwe winda dikan. Teorî û pratîka civaka şarwer, bi şoreşa zanistî û teknîkê ya ku di pêncîh salên duyemîn ên sedsala 20an de pêşveçûyî ve, girêdayî ye. Derketina bingeha daringî ya bi van şoreşan re, şensê serfiraziya civaka şarwer zêde dike. Ev saziyên ku dema kevin awerte (îstîsna) û marjînal bûn, êdî bûne bingeh. Wekî ku teqîneke şoreşî ya civaka şarwer hate jiyandin. Girîngiya rêxistinên civaka şarwer ên di roja me de, ji ber sedema dîrokî, zanistî, teknîk, civakî û dewletî ye. Pêwîst e di dîrokê de, komên olî, felsefî û pişekar ên ku marjînal mane, ji civaka şarwer bêtine hesibandin. Lêbelê lawaziya derfetên wan, astengî li alternatîfbûna wan dikir. Dîsa gelek kesên ku di van saziyên marjînal de gihîştibûn, vê dawiyê di rêveberî pêşvebirina dewlet û civakê de, rola herî girîng leyîstine. Cudahiya girîng a roja îroyîn ev e ku, hêza civaka şarwer a ku gihaye asta alternatîfbûnê ye. Rêya veguherînên civakî û siyasî yên spartî civaka şarwer, heta bi dawî vebûye.

Jibo Rojhilata Navîn, pêwîst e rastiyên dîrokî civakî û siyasî li ber çavan werin girtin û ev nimûne bête berbiçavkirin. Ev çalakiyên ku di dîrokê de, weke rêxistinên keleşan (eşqiye), cureyên terîqetan û loncayan, dihatine meşandin, dîsa bi şeweya nixûmandina terîqet û loncayan, ji pêşverûtiyê bêhtir, dikevin rewşeke pêşverû. Di vê yekê de para ku şaristaniya demokratîk danahûrînin, pir mezin e. Divê weke peywireke girîng were dîtî ku, ev çêbûnên marjînal ên ji kevin ve mane, werine demokratîkirin. Lêbelê ya herî pêdivî, afirandina saziyên civaka şarwer a hemdem e.

Heger ku bi xalên sereke em diyar bikin, em dikarin van bibêjin:

Di qada aborî de, di serî de qada berxwarinê jî di nav de, bi rêxistinbûna civaka têkildar, civat û komên gel, yê hêzeke girîng a veguherînê derêxe holê. Di civakên pêşveçûyî de jî, birêxistinbûna berxweran, rê li ber bandorkerîya wan vekiriye. Heger bi taybetî koperatîfên berxwarinê, şirketên gihaniyê, bişirketbûnên turîzm û geştê (seyahet), hevgirtinên (yekîtiyên) hilberînê, piştgirî, birêxistinbûnên weqfan, yekîtiyên bazirganî û darayî, bi bingehên xwe yên hiqûqî û bi sedemeke aborî ya berbihev, were damezrandin, ev yek diyar e ku yê hêza herî girîng çebikin. Wê hingê civaka klasîk û dewlet ên bikevine pîlana dawî. Herwiha evê bibine amûrên herî girîng ên ku demokratîkbûnê bidine meşandin. Civak û beşên gel ên ku xwedî kooperatîfên hilberîn û berxwarinê û yên ku otobus, otêl, banka, ode, weqf û fonên piştgiriyê birêxistinîkirin, dewlet ê mecbûr bimîne ku bi van re lihev bike û wan cidî bigire.

Civaka ku di serî de, di warê perwerde û tenduristiyê de û di qada civakî de, bi hêza xwe ya derûnî birêxistin bûbe, yê bibe hêza diyarker a cîhê ku lê dimîne. Dîsa civaka şarwer a ku saziyên xwe yên çandê, şano, sînema, wêje, muzîk, wêne, film û dokumanter birêxistinîkirî, gelekî bandorker û rakêşer (dilniwaz) be. Di qada sporê de, bi taybetî jibo girseyê, ciwanan û jinê, salon, holk (seha), pîstên bezê, mercên meşa çiyê û çolterê, ji aliyê tenduristî û zindîtiya hiş ve jî, girîngiyeke mezin bi xwe re tînin. Bi taybetî di mercên bajarên ku pêşveçûyî de, rê vekirina li ber spora girseyî, pêdiviyeye mezin e. Ji dêvla spora temaşeyî ya fermî ku girseyan ditevizîne, spora bi vî rengî ku civaka şarwer tevî dibe, berendama saziyeye civaka şarwer a herî hemdem e.

Birêxistinbûna civaka şarwer a di qada hiqûqî de, ji ber bêhiqûqiya ku zêde dibe û bi gelemperî hişmendiya lawaz a hiqûqî, saziyek ji ya jêneger e. Gihandina hemû yekîtiyên civaka şarwer û komên gel a buroyeke hiqûqî, karekî jiyani ye. Buroyên hiqûqê, him hişmendiya hiqûqê didin û dikişînine rêya rast a siyaseta demokratîk, him jî li hember bêhiqûqiye, weke saziyên bingeh ên têkoşinê, sazûmanên hiqûq ên gerdûnî rûdinînin. Herwiha ev di wêfên saziyên civaka şarwer ên herî girîng de ne. Ev yek jibo serkeftina civaka şarwer diyarker e ku, baroyên heyîn û rêxistinên mafê mirovan, hê berfirehtir li ber çavan bêne girtin, li her taxekê li her gundekî nûnerekî baro bête peywardarkirin, dereke ku hiqûq û hiqûqnas nekeviyê nemîne.

Di qada siyasî de, bi taybetî partîbûn weke amûrên ku rast diçine desthilatiyê, saziyên ku ji aliyê civaka şarwer ve, li ber çavan bêne girtin in. Jibo civaka şarwer mercên jêneger ev in ku, partîbûnên bi ranta dewleta kevneşopî û civakê ve girêdayî, werin derbaskirin, li şûna van partîyan ên ku hêza derûniya civakê derînin holê, yên ku bereka zagona bingehîn esas bigirin, partiyên bîrewer (hişmend) û birêxistinbûyî werin damezrandin. Partiyeye siyasî ku bi kadroyên xwe yên

perwerdekirî, di nava hemû civakên şarwer de, heta bi tax û gundan jî baskên xwe bi cîh kiribin, bi civak û dewleta kevin re bikaribe hunera lihevkinê pêkbîne, yê weke amûreke demokratîkbûnê ya bingehîn, di nava aştiyê de zorê li demokratîkbûna dewlet û civakê bike.

Jibo derbaskirina civaka şidetê û derbasbuyina civaka aştiyê, ya ku li hinek herêman di nava civakan de girîngî qezenc kiriye, pêdivî bi rêxistinbûn û yekîtiyên aştiyê heye. Tevgerên aştiyê yên ku wateya aştiyê, girîngiya wê, rê û rêbazên wê û çalakîbûna wê pêktînin, bi mîsogerî pêwîst e werine damezrandin. Jibo civakên weke yên Rojhilata Navîn ku heta bi mêjiyê xwe, şidet navxweyî kirine, aşitî, amûrên aştiyê û çalakiyên wê, saziyên civaka şarwer ên ku herî derbikevine pêş in. Yê bi baweriyê û bi berdewamkirineke bihêz, di pêşvebirina dewlet û civaka demokratîk de, roleke jiyanî bilîzin.

Jibo jin û ciwanên ku herî bêhtir pêdiviyê aşî û azadiyê ne, yekîtiyên jin û ciwanan ên piralî, saziyên civaka şarwer ên herî pêş in. Rêxistinbûnên ku ji derawaya jin û ciwanan a dîrokî û berbiçav û ji armancên wan ên siyasî re, bûne bersiv, ji aliyekî ve yê astengiyên civaka kevneperest û dewleta despotîk derbasbikin, ji aliyê din ve jî yê rola amûrên bingeh ên civaka şarwer bileyîzin ku civak hemû di şopa wan de bimeşe. Rêxistinbûneke yekîtiyên ciwan û jinan ku bi çendanî û çawanî baş bi armanc û bawerî bûbe, yê bibine ewlariya (pêbawerî) bingeh a serfiraziyê civaka şarwer.

"Federasyona Demokratîk" a bi wêfê rêxistinbûna ban ku hemû saziyên civaka şarwer digire nava xwe, li welatê ku linav û di nava sînorê wê dewletê de, dîsa li nava dewlet û welatên din jî, bi rêxistinên bi heman teşeyî re, bi piştgiriyê ku bête damezrandin û bi rêxistinbûnên federasyonên demokratîk, sazûman yê were temamkirin.

Parastina rewa, weke pirsgerêkeke gelemper a civaka şarwer, mijareke bingeh a herî girîng e ku rast bêteghîştin û sepanandin. Ev ne dibêtiyeke dîr e ku, timî ji civaka kevneşopî û ji dewletê hêriş werine ser civaka şarwer. Hêzên ku bixwazin vala derêxin û yên ku bixwazin proveke bikin, yê vê yekê an veşartî an jî eşkere, an legal an jî îlegal, di dewrê de bihêlin. Lewra berjewendiyên wan ên girîng hildiveşin, deryê rantê tê girtin. Ne gengaz e ku vê yekê bi hêsani bipejirînin. Jiberku gelek saziyên dewlet û civaka kevin ê bê erk bimînin û posîzyona wan yê hilweşe, yê timî gengaz be ku derkevîne derî hiqûq û zorê bikine rojevê. Ev rewş mafekî hiqûqî, mafê parastina rewa tîne rojevê. Pêwîst e naverok û şeweya parastina rewa, baş were têgihîştin. Hemû takekes û civakên xwedî maf, jibo parastina mafên xwe yên ku ji zagona bingehîn, peymanên gerdûnî û zagonên din tîne, dema ku bikevine rewşa parastina derûnî, ji serhildanan heta bi pêşandeyan, ji daxwaznameyên tomerî (pêkveyî) heta bi serlêdana dadgehan, heta ku mafê xwe bidestbixin, dikarin bi gelemperî an jî beşkî, tomerî an jî takekesî, bi her rê û rêbazê mafê xwe yê berxwedanê bikarbînin. Gelekî ku li hember ziman û çanda wî bêmafi hatibe kirin, heger ku rêyên hiqûqî û siyasî hatibin girtin, dikare bikeve nava berxwedaneke domkin an jî domdirêj. Ev ne serhildanek e, ev mafekî hiqûqî û rewa ye. Bikarneanîna vî mafi, perçiqandine hiqûqê ye.

Nexwestin û bikarneanîna hiqûq, bêhiqûqiya herî mezin e. Dera ku ev têgihîn hebe, li wêderê zagona daristanê derbasdar e. Herwiha hemû takekes, civat û gel, bi bêdengiya li hember bêmafiyan, hiqûq diperçiqînin. Xwestina maf û dema ku mafê wî ji destê wî bi zorê were standin, pêdivîbe serî hilde, ev mafê berxwedanê yê pîroz e. Derûna çêbûna hiqûq û dadmendiyê jî ev e. Bêdengî an jî sertewandina li hember bêhiqûqêye, qet ne mafê ti gel û takekesan e. Eslê wê, perçiqandina hiqûq, jehrdana civak û dewletê, ji vê sertewandinê tê. Parastina rewa, di welidandin û bikaranîna hiqûq de, rawestana hiqûqî ya bingeh e ku jênerêv be. Takekes, civat û gelên ku pêdiviya vî mafi bicîhneyînin, mafê wan tîne ku xwe wek mirov bihesibînin û gilî û gazincan bikin. Bi taybetî hiqûqa gerdûnî ku weke mafên jênerêv fermî kirine, mafên nifşê yekem, nifşê duyem û nifşê sêyem, mafên takekes ên şarmend (medenî), aborî û civakî û mafê gelan ê çandî û yê ku qedera xwe tayîn dikin, nixê serdemê yên ku bilind dibin e û keviyek ji yê bingeha şaristaniya demokratîk in.

Pirsgerêkeke din a civakên şarwer ku girîng e, mijara serokatî û kadroyan e. Jibo pêşnûmayên civaka şarwer ên wiha berfireh, pêwîstî bi saziyên perwerdeyî yên girîng heye. Bi kesên amator û ketûber, ev nimûneka civakê nayê avakirin. Herwiha, ligor pêdiviyê, damezrandina saziyên perwerdeyîyê ku yê kadroyan bigihînin, jênerêv e. Ev sazî, ji naveroka bi bîrdoziyî heta bi mijarên teknîkî, pêwîst e bi wergiriyeke dewlemend werine pêkanîn. Bi taybetî pêwîst e di qadên felsefeyê, xwedanasî, dîrok, hiqûq, ziman, huner, zanist, spor, aborî, siyaset, çapemenî û weşanê de, dibistanên bi şeweya akademîk ên bingeh û enstîtû, werin damezrandin. Sazumana dewlet û civakê ya gelemper, kadroyên ku hewceyî bi wan heyî, nagihîne. Encex ev kadro, di dibistanên xwe de, ligor armancên xwe bigihin.

Di vekirina kilîta Rojhilata Navîn a di asta civak û dewletê de, di bisînorkirina wêrankeriya rêbazên şideta kevneşopî de, pêdivî ye ku nimûneya civaka şarwer were xebitandin. Ev nimûne bi nêzîkbûna teorî û pratîk, çiqas ku here yê girîngiyê bi des tbixe. Di serî de ereb, îsrael, îran, îraq, kurd û herkes, pêwîst e mikur werin ku di derbaskirina nakokiyên sedsalan de, hemû rêbazên şidetê ku ceribandine û bi têgihînên di pişt wan de, sernekeftine. Pêşnûmayeke civaka şarwer a berfireh ku mafê parastina rewa timî di rojevê de bigire, jênerêv dibe. Pirsgirêka Qudsê, qet bi neteweperestiyê çareser nabe. Çareseriya pirsgirêka kurd, bi vê rêbazê yê sed salî din bidomîne. Şerê mezheban jî qet naqede. Eşîrtî bi dawî nabe. Civaka ku yê şidetê navxweyî bike, yê timî di rewşa serhildanê de be. Dewlet dar ji destê xwe bernade. Lêbelê ev rêbaz tev ê bêçarebûnê kûrbikin. Bi serdemê re nake yek, ê ji serdemê dûr bixe.

Li hember vê yekê, şeweya çareseriya şarwer a civakparêz a ku sparteka bingeha şaristaniya demokratîk, bi hêdiya be jî, ne ligor xwesteke herkesî be jî, herî terazîker û weke rêya çareseriya gelemper, bi rêbazên xwe yên ku aştiyê pêşvebibe û bi krîterên demokratîk gav bi gav çareserker be, jênerêv dibe. Şaristaniya Rojhilata Navîn ku di dîrokê de federasyoneke xwezayî ye, dema ku bi krîterên demokratîk ên hemdem, civaka şarwer pêşvebibe, dikare derawaya antîtezeke bi angaş bigire. Tezên rastê yên şaristaniya Ewropa û antîtezen şaristaniya Rojhilata Navîn ên çepê, yekîtiyeke diyalektîk pêkbînin, weke di dîrokê de, careke din yê bikaribin ber bi senteza ku ji mirovatîyê re pêdivî, pêngavekê bavêjin. Dema ku dîrok çerxên xwe bi vî rengî bixebitîne, yê bikaribe rê li ber hêviya ku bilind dibe û gavên pratîk ên serkeftî veke.

Di çêkirina antîteza Rojhilata Navîn de, mijara dawî ku pêdivî ye were nirxandin, weke hêzên çalak ên bingehe yê rola gelan be. Weke gelên dîrokê yên herî kevin, ên ku hîne şaristaniyan bûne, di roja me de çi îfade dikin û rola wan a di pêşerojê de, yê peresîneke çawa nîşan bide? Bersivandina vê pirsê, yê pêşya pêşveçûnên gengaz ronahî bike. Heger em bi kinayî û di asta terîfîkirinê de bînin zimên:

a- Rasteqîniya ereb û îsrael ên ji binyata semîtîk, di serê bûyerên ku dilebikîne û yê bide lebigandin de tê. Ev bûyer koka xwe ji beriya 4000 sal digire. Çanda Semîtîk, BZ di navbera 9000 û 6000an de, pêktê. Vê dawiyê ber bi rojhilat-rojava û başûr-bakur ve, belav dibe. Nava Erebiistan ku cîhê bûyina wan, BZ ji salên 9000an heta bi BZ 3000an, bêhtir xwedî avhewayeke bikêrhatî ye. Ev bikêrhatîbûn, di çêbûna qebîleyên semîtîk de, rola bingehe dilîze. Di hemû nivgiravê de, li Afrîka Bakur, ji Rojhilata Derya Spî heta bi peravên Feradê û çiyayên Torosan, çalakiya xwe nîşan didin. Zaravayên semîtîk ên gelekî cuda, di vê demê de çêdibin. BZ di salên 3000an de, meheşiya (bêavî) ku zêde dibe, koçberiya qebîleyan ber bi deverên bikêrhatî ve, bilez dike. Di çêbûna şaristaniya Misir û Sumer de, ev qebîle di derawaya hêza kar de ne. Di navbera herdu şaristaniyan û di navbera xwe de, qebîleyên ku pêşî bazirganî kirine ev in. Di dîrokê de sumeriyên, ev qebîleyên ku berê xwe dane ber bi wan, bi Amorît (Rojavayî) bi navkirine. Misriyan navê Apîrû (Yên ji çolê hatine, peyva îbranî ji vira tê) li wan kirine. Amorît, dema Akad, Babîl û Asûr, bi temamî serdestî Sumer dibin. Êbranî di navbera herduyan de, derbejêr û derbejoriyê dijîn. Dema ku Brahîm ji qada Sumer ji ôrê, ji Rihayê xwe berdide, Mûsa ji Misrê derdikeve. Ev weke şerekî ku li hember şaristaniya koledar azad bibin e. Ev pêvajoyê, bi bandorgirtina ji herdu şaristaniyan, bi derketina olên yek xweda û pêşveçûna wan bi encam dibe.

Li hember pir xwedayîya Sumer û Misrê, olê yek xweda, ji aliyê jiyana qebîleyan a yeknesak (monoton) û hewceyiya wan a bi yekbûnê, girîng e û tê fêhmîkirin. Encex dikarin qebîleyan bi baweriya xwedayekî tenê û hişk, birêvebibin. Bandorên mercên Erebiistan, di derketina van olan de diyarker e. Lêbelê ji şerê çêbûna yek xwedayî jî tê fêhmîkirin ku, piştî totemtî û pir xwedayiyê, gihîştine vê pêvajoyê. Brahîm pêvajoyê dide destpêkirin, bi Mûsa dibe ola qewm, bi êsa dibe ola gerdûnî û bi Muhemed pêşî yê hemû ereban û dûre dibe yê mirovatîyê. Ya ku êsa li ser navê hejaran dikir, Muhemed li ser navê bazirganan, ango çîna navîn dike. Herdu jî, ligor gerdûnîbûna van çînan, weke olê gerdûnî pêşveçûnê dikin.

Israra Cuhûyan a di ola qewmî de, rê li ber wan vedike ku di dîrokê de bibine hêmaneke guheîner a mezin. Cihûtî bi vî aliyê xwe, dibe hêza bingehe a veguherînerî û zorlêkeriya di sînga mirovatîyê de. Ji roja ku bûyî û heta îro, vê rola xwe didomîne.

Erebên weke nîfşê qebîleyên çolê yên dawî, Bi nûkirina olê Brahîm ê ji aliyê Hz Muhemed ve, teqîneke mezin çêdikin û derdikevine qada dîrokê. Bi hûnandineke bîrdoziyî ya îslamtî, xweda û neteweperestiya ereb, nasnameyek tê pêkanîn. Eslê wê ev diyar e ku him ji aliyê olî û him jî nijadî ve, ew û cihû xizmên hev in. Nakokiyên ku di navbera wan de zêde dibin, ji ber çîncînîbûnê ye. Levdana di navbera cihûyên ku bi bazirganiyê dewlemendtir bûne û erebên ku qebîleyên çolê yên dawî temsîl dikin de, bi ola îslamtîyê re, bêhtir bûye. Eslê wê, vê pêvajoyê bi Brahîm re dest

pêkiriye. Wî jî, derketin li hember qeranên bajarên Sumer ên ku ji îbraniyan dewlemendtir, kirye. Mûsa jî heman hejarên îbranî, li hember Mîsrê derxistine. Li êsraela niha levdanên bi vî rengî berdewam kirine. Bi Helen û Romayan re, bi Babîl û Asûriyan re, ev levdan qet kêmbûne. Hişmendiya cihûyan a di dîrokê de, bi hêza vê bazirganiyê û dersên ji levdanê tê. Cihûtiyê, piştî Babîliyan, koçreviya (koçberî) herî mezin ji destê romayîyan dîtine. PZ di sala 70an de li hawîrê cîhanê belavbûne.

Jiberku Cihû xwedî hişekî xasûk ê bazirganiyê ne, vê yekê civakên kû ew di nava wan de sîqilandine (tehrîk), ji ber vê yekê jî, timî hatine qirkirin. Herî dawî bi faşizma Hîtler-Alman re, çêbûna dewleta êsrael pêwîst bûye. êsrael, komkûjiya ku Alman li ser cihûyan pêkanî, niha li ser ereban disepîne. Cihû, di pêşveçûn û belavbûna şaristaniyên DYA û Ewropa û kapîtalîzmê de, roleke mezin dilîze. Di warê bazirganî, darayî, zanistî, hunerî û siyasî de, di tevaya cîhanê de xwedî bandor in. Şaristaniya kapîtalîst li piştî wan e. Nakokiya di navbera wan û ereban de, li ser axê sift bû ye. Tinekirina êsrael, ne gengaz e. Lêbelê veguherîna rewşa heyî, yê bikaribe amûrên çareseriyê derêxe holê. Lêbelê veguherîna neteweperestiya ereb jî, pêwîst e. Berevajî vê, herdu neteweperestî dikarin, ber bi bikaranîna bombeyeke atomê ya nû ve bibin. Di şerê bi vî şeweyî de, serdestiya êsrael a stratejîk heye. Lêbelê ti sûdmendiya vê, ji pêşveçûnên pratîk re tine.

Di tevaya cîhanê de, neteweperestiya ku xitimî, girêka kor a herî stemkar avêtiye Qudsê. Ev bajarê pîroz, naletiya neteweperestiyê û ya qebîletiya berê dikişîne. Heçku navê vî bajarî, tê wateya pîrozî, silav û aştiyê. Di bavîtiya olên yek xweda de rola cihûyan, di çêbûna neteweperestiyê de jî derbasdar e. Qurbanên herduyan jî, dîsa herî bêhtir bûne ew. Bi vê yekê re, ezmûna (tecrûbe) ku di navbera şaristaniyan de jiyane, rê li ber wan vekirye ku di warê zanist, huner û aborî de, nixê bîhêz bigihîjîne. Ji nivîsandina pirtûkên pîroz, heta bi gelek zanyar û hunermendên hemdem û berhemên wan, ji nav cihûyan derketine. Him dargî û him jî menewî, gihîştine hêzeke mezin. Hemû bîrdozî û sazîyên bingeh, li ser tîlya xwe dizivîrin.

Ereb, weke qebîleyên semîtîk ên çolê yê dawî, paş ve mane. Lêbelê jiberku li tevaya nivgîravê û li Bakurê Afrîka belavbûne, bi hindikayî ji aliyê erdnîgarî ve, gihîştine dewlemendiyeke çendanî û hêzekê. Di vê rewşê de, du komên ji binyata semîtîk, di tevaya cîhanê de, hatine hemberî hev. Bûne qurbanên ol û neteweperestiya ku afirandine. Cinawîrên ku afirandine, êdî wan dadiqurtînin. Herwiha, rêya çareseriyê wan a bi tenê ewe ku, nêzîkbûnên xwe ên bi ol û neteweperestiyê ve girêdayî, derbas bikin. Ev herdu komên ku yê bikaribin roleke girîng li Rojhilata Navîn bilîzin, pêwîst e ku di pîvanên şaristaniya demokratîk de, li hev bikin. Ji dêvla dabeşbûna wan a neteweperestî û olî, federasyonbûneke wan a nerm, rêyeke bi tenê ye ku derbikevin. Bi azadiya heyînen çandî re, pêwîst e federasyonêke Erebb-êsrail a di bin sazûmana aboriya bazara serbest de, jibo demeke dirêj, bête bernamêkirin. Ji xwe federasyonêke bi vî rengî, jibo erebên ku bûne 23 dewletok jî, pêwîst e. Yekîtiya Ereban ya heyî bê erk e. Federasyonêke demokratîk a êsrael û Filistin, yê zorê li ereban jî bike ku di bin banekî de bibine yek. Ji bilî derdoreke paşverû, ev diyar e ku tevaya Rojhilata Navîn ê ji federasyonêke wiha, sudeke mezin wergire. Ev yek jênerve ku di sedsala 21an de, tîkiliyên Erebb û êsrael, di bin federasyonêke demokratîk de, ber bi çareseriyê ve here. Ezmûna demokrasiya êsrael a di tevaya cîhanê de, yê di demokratîkbûna Ereban de, roleke dîrokî bileyze.

Ji aliyê din ve, sepandina laîktiyêke kûr ku perçeyek ji yê vê demokratîkbûnê ye, jênerve e. Bi hezaran sal in, wêrankerî û paşverûtiya ku li ser navê ol tê meşandin, êdî pêwîst e bi nûsaziyeke olî were derbaskirin. Bi nûsaziya bi ol re, serkeftina laîktiyê him yê hêzê bide demokratîkbûnê, him jî yê hêzê jê bigire. Dîsa pêwîst e bîrdoziya neteweperestiyê jî were derbaskirin. Dema di van herdu qadan de, bîrdoziyên ku levdanê geşdikin werine derbaskirin, yê felsefeyên yekîti û dadwer ku bi azadî û zanistî ve girêdayî, derbasdar bibin. Ev tîgîhînen felsefî yê di bingeha şaristaniya demokratîk de, yê xweşnêrîneke bingeh û aştiyê bînin. Ev rewş yê ji dêvla levdana Erebb û êsrael, wan ber bi levhatin û yekîtiyeke demokratîk ve bibe, pêşveçûneke wiha yê li Rojhilata Navîn û li tevaya cîhanê, rê li ber bandorekê veke.

Lihevkirina Erebb û êsrail, yê li Rojhilata Navîn di rêya aşti û yekîtiya demokratîk de, bibe pêngaveke bêhempa. Antîteza Rojhilata Navîn ku şaristaniya demokratîk a Ewropa yê xwe jê xweyî bike, bi lihevkirinê yê hêzeke mezin bigire û li cîhanê bandoreke zincîrkî bike. Dema Rojhilata Navîn a nû, ku yê di bingeha federasyona demokratîk de bilind bibe, careke din ê rê li ber pêvajoyêke şaristanî ya laîqî dîroka xwe û senteza şaristaniya demokratîk veke. Encamên lihevhatina Erebb û êsrael ên dîrokî, bi rastî jî gelekî girîng in. Ev yek yê çareseriyê nakokiyên herêmê yê din jî, bilezgîn bike û yê ber bi çareseriyê demokratîk ve zorê lê bike. Ev pêşveçûna bi vî rengî ku ji niha ve bandora wê tê dîtin, yê rewîşteke serdest qezenc bike. Êdî nayê hêvîkirin ku ev pêvajoya bi levdan, yê di nava

nelihvkinin û bê wateyiyekê de, demeke dirêj berdewam bike. Ne mercên cîgeyî, ne yên herêmî û ne jî yên navnetewî, vê rewşa bi vî rengî, ranegirin. Di sedsala 21an de, aştîyeke bi demokratîkbûnê ve girêdayî a di navbera ereban, Erebb-Ûsrael û tevaya herêmê de, yê di warê aborî û hunerî de, pêşveçûneke mezin çêbike. Di vê bingehe de, Rojhilata Navîn a ku yê hêzê qezenc bike, yê derfetê bistîne ku di tevaya cîhanê de, bûyerên layîqî dîroka xwe derîne holê û şaristaniya demokratîk ber bi sentezên nû ve biperesîn bike.

b- Qada şaristaniya êran a Rojhilata Navîn, di reseniya xwe ya ku ji dîrokê mayî de, li ber xwe dide. Rola ku di xeta veqetîna şaristaniya Rojhilat û Rojava de leyîstiyê, dixwaze ku îro bi ezmûna demokratîkirina çanda îslamtiyê, berdewam bike. Ev rewîştaya êran a nûsazîparêz, diçe heta bi demên dîrokê yên kevin. Ya ku koledariya Sumer nerm kiriye, şaristaniya êranê ye. Kevneşopiya Zerdest û bilindbûna Pers, eslê wê nûsazîparêziya di koledariyê de, ligor dema xwe, serfiraziya demokratîkbûnê ye. Di şaristanîbûna Asyayê de, rola êranê girîng e. Şaristaniya îslamtiya feodal, di pêşwazîkirina pêşî de, di nûsaziya re derbaskiriye. Şîatiya êranê, nûsaziya pêşî ye di îslamtiyê de ku bi erêniye. Hê berî, Manî û Marduk xwestine ku sazûmana Sasanî ya koledar nûsazî bikin. Dîsa Babek, li hember sunîtiya Abbasî, di derawaya serokatiya gel de ye. Ya ku Emewî hilweşandiye, bandora êranê ye. Ya ku Abbasî nerm kiriye, dîsa bandora êranê ye. Li hember sunîtiya osmaniyan a hişk û paşverûtiya wan a feodal, şaristaniya êran-Safawî, nêzîktirî gele û alîkarê elewîtiyê ye.

Di nûsaziya sedsala 19an de, rola êranê berdewam dike. Şoreşa dawîya sedsala 20an a mezin, dibê nesîbê êran. Ev şoreşa balkêş, weke şoreşeke Rojhilata Navîn, naşibe ku bi hêsanî yê vemire. Dema ku ji derve bandora şaristaniya demokratîk, bi rewşa nûsaziya wê ya ku ji dîrokê tê re bibe yek, jevketina kevneperestîya îslamtiyê ya di bin navê Şoreşa Êslamî ya êranê de, jênerev xuya dike. Şoreşa Êslamî ya êranê, an ê xwe bi xwe tine bike, an jî yê di bin navê îslamtiyê de, bi Rojhilata Navîn re hesêb bide dîtîna û yê zorê li çareserîya vê pîrsgirêkê bike. Ji ber vê yekê, encamên şoreşa Êslamî ya êran, bi hêsanî jî holê ranabin. Rewşa heyî, merhaleyê derbasbûyî ye. An ê di nava xwe de hê bêhtir kevneperest bibe, -lê semaxa (sebir) girseyê yê jî vê re gelekî zor be- an jî yê pêdivî bibe ku nûsazî bikeve merhaleya encama dawî. Ev jî yê di tevaya Rojhilata Navîn de, rê li ber pêleke demokratîk a îslamtiyê veke. Çawa Êsraêl li Rojava demokratîzma kapîtalîzmê û feodalîzmê û neteweperestîya ereb dikişîne ber bi demokratîkbûnê, li Rojhilat jî êran, dixwaze di nava îslamtiyê de, heman erkê berdewam bike.

Feodalîzma ereb a bi giraniya îslamtiyê, ketiye bin du pençikan. Nayê hêvîkirin ku îslamtiya feodal û antîdemokratîk, domdirêj bibe. Ev rewşa derbasbûyîna êranê, dirêj nadomîne. Heger ku ber bi kevneperestiyê ve here, yê ji aliyê neteweperestî û nûsazîparêziyê ve were perçekirin. Heger ku veguherîneke ber bi demokratîzmê biserbixe, Yekîtiya Demokratîk û Federatîf a êranê, yê bibe nimûneyê herî bihêz ku bandorê li Rojhilata Navîn bike. Komara Demokratîk a Êslam a êranê, yê bibe qiraseyê demokratîkbûna Rojhilata Navîn ê herî bi hêz. Ev alternatîf hê bêhtir ê bi bingeha dîrokî re girêdaneke zexm çêbike, yê bi şaristaniya demokratîk a hemdem re jî, di nava aştîyê de pîrsgirêkê bi lihevkirinekê çareser bike. Di herdu rewşan de jî, di berbiçaviya êran de, pêşveçûna antîtezê dikare hêzê qezenc bike. Jiberku êran bi xwe jî bi demokrasiyê re di nava hevnasiyekê de ye, dîsa mecbûr e ku roleke bi vî rengî, bigire ser milên xwe. Êran nikare li ser Asya Navîn, Kafkasya û him jî li ser tevaya Rojhilata Navîn, bêbandor bimîne. Yê bixwaze ku vê yekê jî, bi afirandîneke çareserîya îslamtiyê ya demokratîk, pêkbîne. Ev dikare bête nîqaşkirin, bê gelo yê biserbikeve yan na. Di rewşa sernekeftîna de, sazûmanê ku çiqas biçe kevneperest bibe, yê derkeve holê û dawîya vê jî yê perçebûn be. Lêbelê nayê hêvîkirin ku neteweperestî yê jî bingeha xwe ve were perçekirin. Di qedera êranê de, herî bêhtir yekîtiyê federatîf a demokratîk û hemdem, weke alternatîfêke din, xuya dike. Heger êrana demokratîk pêkneyê, di demeke dirêj de, Federasyona Demokratîk a Êran a ku pêdiviyê bi kemna olî ya hemdem neyîne, yê pêkwere. Di dema dirêj de, ev vebijark gengazêke bi hêz e. Êran di pêvajoya dîroka xwe de jî, di wesfê federasyonekê de ye. Niha jî dabeşbûyî çar eyaletên mezin e. Herwiha federasyona demokratîk a Êran nabe pêvajoyêke zor. Belkî jî di Rojhilata Navîn de, bibe welatê herî pêşî ku derbasî federasyonê bibe. Esasê wê, federasyona ku niha jî qismî tê jiyandin, yê bikeve rewşêke diyar û bi zagona bingehe.

Em dikarin bi hêsanî vê bibêjin, di bûyerên ku yên di sedsala 21an de bêtîne jiyandin de, pêşveçûnên di nava êranê de, yên bibîne hêzeke diyarker ên bingehe. Di antîteza ku Rojhilata Navîn ê li hember şaristaniya Rojava pêkbîne de, êran ê kevirê sêyemîn ê bingehe be. Heger kevirê yekem Êsraêl û yê duyem Erebb bin, ji ber serûbinbûyîna êranê ya dîrokî, erdnîgarî û rojevî, kevirê sêyemîn jî yê êran be. Giraniya ku antîteza Rojhilata Navîn ê bi êranê qezenc bike, yê hêzeke mezin derîne holê. Êsraêl ê vê antîteze di hemû şaristaniya Rojava de temsîl bike, ereb yê li Erebbistan û parzemîna Afrîka, êran jî yê li parzemîna Asya temsîl bikin. Di Rojhilata Navîn a sedsala 21an de,

antîteza ku yê li çepê şaristaniya demokratîk rûne, di welidandina senteza layîqî dîroka xwe de, yê bi berbiçaviya êranê hêzeke bireng qezenc bike û yê tevkariya xwe, bi hêviya şaristaniya nû re pêkbîne.

c- Anatolya û Tirkiya ku li bakurê Rojhilata Navîn, her dem rola diyarker leyîstiyê, di dema şaristaniya hemdem de jî, angaştê xwe berdewam dike. Anatolya di dîrokê de, xeta derbasbûyîn û veguherîna sazûmanan e. Di pêvajoya dîrokê de, di domdariya 15 000 salan de, nîrxên şaristaniya Rojhilata Navîn, di ser Kafkasya û Balkanan re kişandine Ewropa. Di van dused salên dawî de jî, nîrxên şaristaniya Ewropa dikişîne Rojhilata Navîn. Di BZ 2000an de, gelê di rola sereke de, hitîtiyên ji koka Aryen in. Ya rastir gelek gelên ku di bin navê Hitîti de bûne yek in. Bi neolîtîkê re, ji nû ve derbasî şaristaniya koledarî dibin. Bi hilweşîna kelayên Troya, Frîgya û Lîdyaya re (BZ 1200-600), Anatolya dikeve bandora Grek û pêvajoya Helenbûnê dijî. PZ heta salên 1000an, ev yek berdewam dike. Ermen li bakurê rojavayên wê û Kurd li başûrê rojhilata wê, di nava vê xetê de payîdar dibin. Anatolya ji PZ 1000an pêde, ji eşîrên tirkî re vedibe. Ev cîwarbûna wan, heta sedsala 14an berdewam dike. Bi şaristaniya selçûkî û osmaniyan, li rastî çînçînîbûnê tê. Çînçînîbûna tirkî a binyatî, di vê demê de ye. tirkmenên ku li çiyayên dimînî, taybetiyên tirkîtiyê diparêzin. Lêbelê yên li bajaran, bişavtineke hişk dijîn. Him selçûkî û him jî osmanî, mezhebê îslamî yê sunî bingeh digirin. Li hember nûsazîparêziya êranê, kevneperestiyê feodal bihêz dibe. Êmperatoriya Osmanî ku teraza nazik di navbera kapîtalîzm û feodalîzmê de girtî, heta ku şaristaniya kapîtalîst pêşve diçe, belav dibe û dijî. Lêbelê li hember pêvajoya belavbûna kapîtalîzmê, zêde li ber xwe nade û di serê sedsala 20an de, jevdikeve û tevli dîrokê dibe. Tirkî ve carê ji dêvla bîrdoziya îslamî yê ya kevneperest ve, bîrdoziya neteweperest a Rojavaparêz û derdorên siltantiyê yên ku di bin serokatiya M. Kemal re, ketibûne rewşa hevkarîya mêhtingehkarîya Rojava, li hember kompradorên ermen û rûman, li derve bi bolşewîkan re û li hundir bi kurdan re, dikevine nava yekîtiyê. Bi vê yekîtiyê him şerê rizgariya netewa qezenc dikin û him jî derbasbûneke pêvajoya komerê ya dîrokî pêktînin. Sedsala 20an Anatolya, êdî yê weke Komara Tirkî rola xwe bilîze.

Dema Komara Tirkîyê, kurdên ku di vê bûyerê de, weke hêmana damezrîner cîh girtibûn, bi sedema serhildanan têkdibe. Bi pêşvenberîna demokratîkbûnê, şensekî dîrokî yê pêşveçûnê wînda dike. Rewşa wê ya ku bi hêsanî dikare bibe Japonyayek, ji ber vê pîrsgirêkê dikeve astengiyê. Ev astengî bi awayekê kilîtbûyî rawestîya ye. Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de û bi asta şaristanîbûnê, di derawayê herî nêzîkî Ewropa de ye. Nîqaşeke demokratîk a herî sift dijî. Berendamtiya wê ya YE yê jî, ji ber ne demokratîkbûna wê, pêşvenaçê. Sedema di bin vê yekê de jî, hebûna Kurd e. Ev pîrsgirêka bingeh a li hember Tirkîyê, hatiye asta ku qedera wê diyarker bike. Tirkîyê ketiye nava herênayêke wisa ku, an divê vê pîrsgirêkê di nava komara demokratîk de çareser bike, an jî yê hermono bibe û di nava xwe de girtî bimîne. Hê mîsoger nebûye bê pîrsgirêkê çawa çareser bibe. Digel vê yekê, hemû mercên der û yên hundir, çareserîya demokratîk lêferzdikin.

Tirkîyê li Rojhilata Navîn, xwedî mercên civakî yên herî nêzîkî demokratîkbûnê ye. Di vî babetê de, gelek pêngav avêtine jî. Dema ku pêngavê mane jî bavêje, yê were derawayê ku li endamtiya YE yê rûne. Herwiha yê di şaristaniya demokratîk a Ewropa de, hêzê bide vebijarka demokratîkê. Yê hê bêtir bandorê li tirkîtiya Asya Navîn jî bike. Pêşveçûna Tirkîyê bi vî rengî, ya di sedsala 21an de, dibetiyêke bihêz e. Bi vê rewşê, yê di demokratîkbûna Rojhilata Navîn de, bibe kevirê bingehê çaremîn. Êsraêl, Ereb, êran û Tirkîyê, di warê çareserîya demokratîk a pîrsgirêka Rojhilata Navîn de, yên weke hêzên bingehîn, bikevine pêvajoya çêkirina antîteza Rojhilata Navîn. Astengên ku li pêşya vê yekê, weke levdana Ereb û Êrael, pîrsgirêka demokratîkbûnê û yekîtiya Ereban a di nava wan de, Êrana ku bi federasyoneke demokratîk (an di bin kemna îslamî yê de, an jî di bin kemna hemdemiyê de) ber bi çêbûneke payîdar ve here û heger Tirkîyê ku pêdiviyê pîrsgirêkên demokrasîyê çareser bike, sedsala 21an ê jibo tevaya herêmê, têkeve pêvajoyêke pêngavên bilind. Federasyona Rojhilata Navîn a demokratîk a ku yê li ser van her çar keviran bilind bibe, yê bibe antîtezeke rast a şaristaniya Ewropa û bi girêdana diyalektîkê ya ku yê di navbera xwe de pêkbînin, di çêbûna senteza nû ya dîrokî de, pêngavên mezin ê werine avêtin.

d- Di dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn de, derawayêke Kurd û Kurdistanê jî, ya ligora xwe heye. Jibo ku pêvajoyê rast were têgihîştin, pêwîst e rola vî gelî rast were terîfkirin, Ev yek him jî aliyê pêşveçûnê di roja me de û him jî çiqas ku dîrokê tê xepartin, hê bêtir tê fêhmkirin.

Ev yek mîsoger e ku Kurdistan, ji ber erdnîgariya xwe û çanda rîwek û ajalan ve, di cîhanê de herî pêşî, bûye dergûşa serdema neolîtîkê. Kurdistan holka ku şoreşa çandinî û gundîtiyê lê çêbûyî ye. Ji lêkolînên şûnwarnasî tê fêhmkirin ku, xwedî çandêke cîwarbûnê ya digihe heta BZ salên 11 000an e û dîrokeke ji vê kevintir, lê ser rûyê cîhanê tine ye. Bi navkirina gelên ku serdema neolîtîk afirandine, di çavkaniyên sumerîyan ên nivîskî de, derbas dibin. Vî cîhî û gelê wê, bi navê gelê çiyê

binavdikin. êro jî ev têgîn derbasdar in. "kur" di sumerî de, tê wateya çiya. Pêveka (veser) "tî" jî, xwemaliyê nîşan dide. Herwiha peyva "Kurtî" tê wateya gelê çiyê ango çiyayî. Wesfandinên Sumer ên din jî hene. Di wateya welatê bilind de, "órartî". Jiberku li dû gayan çandiyariyê dikin, bi wateya ku gelê xwedî ga, "Gûtî" (ga hê jî di Kurdî de tê bikaranîn), di wateya gelê ku bi halet cot dike de, bu "Aryen" hatine bi navkirin. Vê dawiyê, asûriyan bi wateya gelê li diyarê kanê, bi "Mate" û "Med", lûwiyan bi wateya welatên bilind bi "Gondwana" (gund bi Kurdî ye û îro jî tê bikaranîn), grekan bi "Kurdîana" û dîsa bi wateya gelê şivan û konan bi "Komagene" hatine binavkirin. Dema têkilî bi ereban re çêdibin, bi wateya îro bi "Ektrad" (pirejmariya Kurd), binavdikin. Ev di dîrokê de jî hatiye çespondin ku, siltanê selçukiyan Sancar, jî vê herême re, "Kurdistan" gotiye. Di dema Osmaniyan de jî, "Kurd" û "Kurdistan" di wateya hikûmetên cîgeyî û wilayetên de, hatine bikaranîn. Herî dawî damezrînerê komara tirk, M. Kemal jî, bi dehan daran, "Kurd" û "Kurdistan" weke hêmana damezrîner, bilêvkirine. Di sedsala 19 û 20an de, ev nav jî ber serhildanan di wêjeya cîhanê de, gelekî hatine bikaranîn.

Rola Kurdan a di dîrokê de, esasê wê ji afirîneriya wan a neolîtîkê tê. Ev yek mîsoger bûye ku, qada çiyayî û nîvdeşta Zaxros û Torosan ku Dicle û Ferad ji wan xweyî dibin, cîhê çêbûna neolîtîkê ne. Sumer, Misir, Hîtî û Persî, ji civaka neolîtîk a vîra xweyî bûne. Jiberku kanên vîra pirin û girîngiyê bidest dixin, ev herêma bûye qada hêrîş û dagirkeriyên. Jiberku jî çar aliyên ve tê tepisandin, ev gelê afirînerê neolîtîkê, li van çiyên timî ketine rêwşa xweparastinê. Çavkaniya ku şaristanî afirandî, ji aliyê şaristaniyê ve dîlgirtin. Ev rewş jî xweş ravedike bê çima weke eşîrên hişk mane. Lewra di mercên çiyê de, parastin encex bi rewşa yekîneyên eşîran gengaz be. Herî zêde dikarin, werine rewşa sazûmana konfederasyonê. Jibo damezrandina navendên bajêr ên şaristaniyê ne bikêrhatiye. Erdnîgariya wê ku li Rojhilata Navîn mîna kelayekê bilind, rola sengerê xwezayî dilîze. Ev mercên wiha didine nîşandan, bê çawa vê orîjînalîteya çandê ji beriya 10 000 salan, heta bi îro xwe parastîye.

Kurd û welatê wan, bûne şahidê hemû hêrîşên dema koledariyê. Heger ku em ji Gilgamêşê Sumer destpêbikin, babîliyan, asûriyan, persiyan, helenan, romayîyan, sasanîyan, bîzansiyan, ereban, tirkan, û moxolan li pey hev, ev ax dagirkirine. Lêbelê sazûmana bîngêh, eşîrtî ye. Carna bûne yek û carna jî bihevketine û heta dema îroyîn hatine.

Di dema feodalîyê de, begîtiyên Kurdan pêşveçûneke mezin pêkanîne. Gelek ji wan di asta hikûmetên cîgeyî û dewletan de, rol listine. Bi osmaniyan re, pevratîyê ku 400 salan domandî, pêkanîne. Rola wan a di warê îslamê û şaristaniyên êranê de, di asta kesayetî û xanedanan de, bihêz e. Tebaqeya wan a jor, di bişavtîneke sift re boriye. Hebûna eşîrtiyê, çanda wan parastîye. Serhildanên wan ên di merhaleya kapîtalîst de, li dijî wan bi encam bûne û rê li ber rola feodalîtiyê ya herî paşverû vekirîye. Di hatina tirkan a Anatolya de, bi Yavuz re berfirahiya împetoriyê ya ber bi Rojhilat ve û di fetihandina Erebaştanê de, rola kurdan a bîngêhîn çêbûye. Li hemberî vê yekê, tenê di asta azadiya eşîran û hikûmetên cîgeyî de mane. Perçebûna wan a piştî şerê cîhanê yê yekem, li dijî wan çêbûye, di bin serokatiya M. Kemal de, di şerê rizgariya netewî û damezrandina komarê de, weke gelê rizgarker û damezrîner rola xwe leyîstine. Dema ku sazûmana komarê, sazûmana eşîrtî bi tevayî xera kir, careke din serhildan destpêdikin, vê yekî jî jibo wan, rê li ber encamên wêranker vekirîye. Di heman demê de, li êran û Iraqê jî, bi têgihîna neteweperestî û dewleta navendî, serhildan ji aliyê Fers û Ereban ve hatine perçiqandin. Piştî vê yekê jî, bişavtîneke sift bûye pêvajoya jiyandê.

Di roja me de, Kurd weke gelê Rojhilata Navîn ê herî perçiqandî, hewl didin ku xwe ji piya bigirin. Perçebûna zêde, sazûmana feodal û eşîrtî, him bûye sedem û him jî encama pêşvemayîna wan. Ji van pençikên him der û him jî hundir, ti carî rizgar ne bûne. Ne bîrdoziya wan a olî û ne jî ya neteweperestî, weke cîranên wan, di warê pêşveçûna siyasî de rol ne listine. Ola îslamê û neteweperestiyê, Erebaş, Fars û Tirk weke nijad û netewê bihêz û bidewlet kirine, lêbelê di bişavtin û perçiqandina kurdan de rol leyîstine. Kurdan jibo xwe, ne ola îslamê ya feodal û ne jî bîrdoziya neteweperest a kapîtalîzmê, kirine rêberê netewî. Ezmûnên ku hatine kirin jî, ji marjînalbûnê wêdetir, tiştekî din pêkneanîne. Weke gelekî hejar dijî û di rewşa gelê ku ji şaristaniyê, xiyaneta herî mezin dîtî de ye. Lawazbûna ji aliyên netewî civakî ve, timî jî nîrxên feodal û eşîrtiyê xweyî dibe. Nayêna asta bilind a statûyên netewî û civakî.

Ev terîfkirinên kin, datîne holê ku, çareserîya Kurdan a bi tenê, demokratîkbûn e. Bi gelemperî derbaskirina ol û neteweperestiyê, hilweşîna feodalîzm û eşîrtiyê ya bilez, bûyerên bîngêhin in ku şensê rizgariya kurdan a demokratîk zêde dikin. Krîterên demokratîk ên ku li cîhanê pêşvedîçin, hê bêhtir bandorê li vê pêvajoyê dike. Zora ku ji aliyê cîhanê ve, jibo demokratîkbûnê êraqê tê kirin, îslamîtiya êranê ya demokratîk, veguherîna Tirkiyê ya demokratîka hemdem, derfetê dide dorpêça

dora wan ku ne li dij wan, jibo wan rolê bilîze. Ev hemû veguherînên der û hundir ên girîng, yekem car derfetê dide kurdan ku bi krîterên demokrasîyê, çareserîya pirsgirêkên xwe bibînin. Di heman şeweyê de, ew jî jibo cîranên xwe, ne hêmaneke serhildan û perçebûnê, di bingeha demokrasîyê de ketine rewşa garantiya yekîtiyê zexm. Jibo herdu aliyan, dema ku pêvajoya diyalektîkê ber bi demokratîkbûnê ve bilezgin bibe, çareserîya pirsgirêka Kurd ê jênerev bibe. Di dîrokê de, yekem car e ku bi gelên cîran re derfetên demokratîkbûnê yên bi vî rengî bidestdixe.

Di vê demê de, dîrokê roleke bêhempa daniye ser milên gelê Kurd. Mayîna di navbera sînorên perçekirî de, hatiye derawaya avantajekê. Jiberku ne hatiye rewşa gelekî bi jehrdiyana neteweperestiyê, ev bûye qezencek. Gelê Kurd ku xwe demokratîk dike, yê zorê li demokratîkbûna welatê ku tê de dijî û gelê wê jî, bike. Dema kevin tevgera Kurd, weke dabeşbûn û lîstika hêzên derve dihate dîtin. Berevajî vê niha bûye ewlayîya aşî, biratî û azadiyê. Kartêkera welat a hevgerîneke bihêztir, hatiye rewşa bingeha yekîtiyê payîdar. Li her dera ku gelê Kurd hebe, yê pêşveçûneke normên demokratîk ku dixebitin, were aqilan. Ædî çarenûsa kurdan ê ne nezanîn, serhildan, tepeserkirin û komkûjî bin, yê hişmendiyê demokratîk, civakeke şarwer a pêşveçûyî û pevrîyêke azad be.

Kurd ên bi vê misyona xwe ya dîrokî, li êranê di bin navê Komara Êslamîya Demokratîk an jî, Federasyona Demokratîk a êranê de, bibin xwedî pêngavên demokratîk. Li Iraqê, yê bi rewşa xwe ya federe û demokratîk, bibine ewleyîya Iraqa Demokratîk an jî Federasyona Demokratîk a Iraqê Li Tirkîyeyê, bi gavên demokratîk û bibiryar, yê di serfiraziya komara laîk û demokratîk de, rola herî bingehîn bilîzin. Di afirandina Suriya Demokratîk de jî, rola wan piçûk nayê girtin. Ev diyar e ku Kurd bi awayek serkeftî, van rolên xwe bileyîzin, yê bibe ewlayîyêke di rêya Federasyona Demokratîk a Rojhilata Navîn de. Kurd ên bibine hêza bingehîn a gel ku Rojhilata Navîn demokratîk bikin û bi kişînine aşîyê. Jibo leyîstina vê rola ku dîrokê li wan kiriye bar, pêwîst e Kurd bi hişmendî, bi rêxistinî û layîqî serokatiya stratejîk hereket bikin.

Li Rojhilata Navîn, Ermen, Asûr û gelên ji binyata Kafkas jî hene. Rola van gelan jî dişibe ya kurdan. Hemû merc jibo van gelen jî, weke rêya derketinê, demokratîkbûnê ferz dike. Li welatên ku lê û li Rojhilata Navîn, çiqas ku demokratîkbûn pêkwere, derfetên wan ên ku azad bibin û çanda xwe pêşvebibin, zêde dibin. Ev gelên ku hijmara wan piçûk, jiberku her yekî rakêşerê çandekê ne, reng û dewlemendiyên demokratîkbûnê ne.

Dema ku em di bingeha van dahûrandinan de, li tevaya Rojhilata Navîn binêrin, yê were dîtin ku ji gelek herêmên cîhanê paşvetir e. Rojhilata Navîn ji rabirdûya dîroka xwe ya mezin, gelekî dur maye. Ji wê dîrokê bêxeber e û nagihe nêzîkê layîqbûna wê jî. Ji aliyê komên marjînal ve tê rêvebirin ku, Ne bitemamî girêdayî nirxên Ewropa ne û ne jî girêdayî binyata Rojhilata Navîn in, di nava xûnifîneke teslîm bûnê de ne û bi xêzkeke serxwebûna sexte, berjewendiyên xwe birêxistin kirine. Heger ku bi awayek awerte, hinek serokên layîqî dîrokê derketibin jî, ji zorlêkirina rewşa heyî, dûr mane. Rojhilata Navîn a ku ronahîbûnê di nava tevayîyê de pêknayîne, zor e ku vî wêneyî biguherîne. Lêbelê demeke ku tevaya cîhanê ber bi yekîtiyên herêmî û navnetewî ve diçe, Rojhilata Navîn ku di nava xwe de ji stratêjiyê hevpar û pêngavên yekîtiyêkê dûr, ne jibo berjewendiyên ti gela ye. Dîroka Rojhilata Navîn ku nêzîkî hev û di hikmê federasyonê de jî, vê jîhevbelavbûnê ranagire. Mercên gelek dewletên hundirîn û herêmî yên dîrokî, çiqas ku diçe hê bêtir, Rojhilata Navîn a demokratîk ferz dike.

Bi pêvajoya darizandina li DMME yê re, ev dahûrandinên ku min pêşêxistin, jibo min têne wateyêke din jî. Dema ku ez li Rojhilata Navîn li maf digeriyam, ev rastiyeke e ku ji ber lihevkerîneke bi emperyalîzma pêkutî dikirin re, min berê xwe dabû Ewropa. Lebka min jibo ku ez di nava pîvanên wan ên demokratîk de çareseriyêkê bibînim, ji hewldanên li çiyê ku bêhtir bibe sedema windabûna giyanan, pêşdetir hatibû. Heçku çiya xemlên rast ên xewnên min bûn. Ji derketina çiyê, min çil salan sebir kişandibû. Lêbelê, ev nebûbû çetirgirtîneke min ku, derketina çiyê bêhtir êş û azarê bi de gelê min. Sincê min ê berpirsiyariyê û têgihîna min cîh nedidan vê yekê. Ev jî rast e ku, min nizanibû ev derketina min a Ewropa yê bi trajediyêke wiha biqede. Pîvan û wezinadin, birezîlî û xayîntî ez avêtime welatê yamyaman. Qaşo ez ji rê birim, bi hostayî lihev pêçam û li emralî, avêtime hundirê tabûtekê. Herwiha berjewendiyên wan ku ketibûne xeteriyê, careke din ketine bin ewlayîyê.

Ev rewş, heke ku hebe li dijî hiqûqê Ewropa ye. Ev jibo min girîng e ku ez helwesta dadgehê, weke pîvaneke şaristanî bibînim. Lêbelê ji vê û wêdetir, tişta min girîng didît ev bû ku, weke yekî ku teslîmî Ewropa bibe, yê cîh jê re were dîtin. Jiberku ev yek jibo min pêknedihat, encex bi dîtina antîtezekê, minê têkilî bi Ewropa re bidaniyana. Ev jî bi vê ve girêdayî bû ku, Rojhilata Navîn, li hember Ewropa antîteza xwe bi bingeha xwe ya dîrokî ve girêdayî, derbixe holê. Min hewl da ku ez

vê vekim û nîşan bidim. Heger bisînor be jî, ez di wê baweriyê deme ku ez biserketim e. Ez di wê baweriyê de me ku, min nêrîn û rexneyên gelek dost û hevalên ku ji bê derfetî, ne gihîştibûne min jî anîne zimên. Ev pêdivî bû. Digel ku gelek kêmasî hene jî, ez bawer dikim ku min berpirsiyariya xwe anî cîh.

Ev nêrîn û rexneyên min, di wesfê parêznameyekê de ne, min ev di odeyeke jibo kesekî de, di bin bandora komployeke giran de pêkanîne. Ezê hewl bidim ku beşa parêznameya xwe ya duyem jî amade bikim. Di vê beşê de ezê bêhtir, pirsgerêgên rêbaza dîroka Kurd, têkiliyên Kurd û tirkên, çareseriyên demokratîk, qewimîna komployê, wateya wê, hiqûqê Ewropa û nîrxê DMMeyê, bîname zimên. Rexneyên ku bêtine kirin, ên hêzê bidine min. Ev gelekî girîng e ku mijarên min ravekirine, neyên şewşandin û ji nêzîkbûnên bi zanistî dîr nekevin. Hê bêhtir min bala xwe da aliyê hînkariyê. Min hewl da ku rêbazê pêşvebibim. Pêdivî, hê bêhtir bi mêjiyên ku bihizirin heye. Mijarên ku min girîng dîtin, min bêhtir vekirin, ez bawer dikim ku yê encameke erênî bide.

Tenê di derbarê xweda û ol de, dikarin hinek gotinên min berevajî bikin. Lêbelê ez dixwazim ji niha ve bibêjim ku, ez herî bêhtir di vê mijarê de bihêz im û ez di wê biryarê de me ku pêdivî bêhtir bi kûrkirina şoreşa bîrdoziyî heye. Şoreşa bîrûbaweriyê, gelekî bi min girîng tê, Ez bawer dikim ku piştî, wijdanê azad ku zanibe bibihîze jî, yê pêşvebiçe. Heta ku şoreşa wijdan û bîrûbaweriyê neyê pêkanîn, şoreşgeriyê deynin dera han, nabine mirovekî hestiyar û bisinc jî. Heriha, ez dixwazim vê yekê bînim zimên ku, bi bersivdayina hemî kesan û gelê xwe, ez rihet bûme.

Ez van nîrxandinên xwe, di serî de jibo şehîdên zîndanên û ji hemû qurbanên di heman astengiyên de re, dikime diyarî. Ez dixwazim vê yekê jî diyar bikim ku, min bersivê da wan kesên ku bi awayek kûr û resene bi min ve girêdayî ne, ji her demê bêhtir jibo wan heme û ji xwe tiştêkî min ku ji min re be nemaye, bi vî rengî ez hezkirinên xwe yê germ û silavên xwe pêşkêş dikim.

Mirovatî yê qezenc bike!

2 Tîrmeh 2001- îmrâlî
Abdullah ÖCALAN
FERHENG A PARÊZNAMEYÊ
Amadekar: Jîr DILOVAN

FERHENG LEKHEHC

KURDÎ
KOKDI

TÛRKÎ
LÛKKI

A

Ast
aştîyane
aloz
afirandin
aborî
aborîzan
ajal
ajaldarî
ajo (dozîn)
arastin
afirandin
abadîn
aqlî (beraqil)
awerte
angaşt
ahengî
amûr (amraz)
awir (nêrîn, mêzakirin)
aştî
aştîxwaz
asteng (berbest)
azwerî (hêrs, çavsorî)
avhewa (sirişt)
ahengî
asa (norm)
arizîkirin
asîk (reşik)
ahengdar
asaw (girêba)
afirîde (dehbe)

Düzey
Barışçıl
Karmaşık
Yaratmak
Ekonomi
Ekonomist
Hayvan
Hayvancılık
Güdü
Donatım
Yaratım
Ebediyen
Rasyonel
İstisna
İddia
Koordinasyon
Araç
Bakış
Barış
Barışçıl, Birleştirici
Engel
Hırs, Tutku
İklim
Koordinasyon
Norm
Özelleştirme
Siluet
Uyumlu
Ur
Yaratık

B

berbînî
bêrêz
bêgiramî
bîrdozî
bîrdoziyî
berfireh
bergehdar
cihêreng
ciyawaz
biveguhêzî
bîrewer
bîrbir

Öngörü
Saygısız
Saygısızca
İdeoloji
İdeolojik
Kapsamlı
Kapsamlı
Değişik
Değişik
Aktarmalı
Bilinçli
Bilinçli

bêserûberî	Başıbozuk
bihestyarî	Duyarlılık
bertekî	Refleks
berhevdan	Körükleyici
bandor	Etki
bibandor	Etkili
berdar	Verimli
berhemdar	Verimli
bêber (kêmbere)	Verimsiz
bac	Vergi
bacgir	Tahsildar
berhem	Ürün
bûut	Boyut
biserûber (birêkûpêk)	Sistemli
bîrûbawerî	Zihniyet
bîrî	Zihni
bîrayî	Zihinsel
bilêvkirin	Söyleyiş
benî	Kul
bêzarbûn	Bıkmak
bêxatirî	Düşkünlük
berjewendî	Çıkar
berjewendperestî	Çıkarıcılık
bêsinc	Ahlaksız
bizav	Tepki, Akım
binesazî	Altyapı
bişavtin	Asimilasyon
binisandî	Bastırılmış
berxwarin	Tüketim
ban	Çatı
bergeh	Bakış Açısı
bêperoş	Heyecansız
bote	Pota
bermayî	Kalıntı
bijarteker	Eklektik
bêesil	Yoz
bêesilkirin	Yozlaştırma
bêweç	Çorak
best	İlham
beralîkirin (berhêlkirin)	Yönlendirmek
berek	İstikamet, Doğrultu
bikitekit	Ayrıntılı, Detaylı
berbiçav	Somut
berbiçavkirin	Somutlaştırmak
berxwer	Tüketici
berbihev	Uygun
bandev (navser)	Zirve, Doruk
bexş	Af
bexşandin	Affetme
başkirin	Tedavi
bajarvanî (şaresazî)	Şehircilik
bavkanî	Ataerkil
bijarte	Elit, Seçkin
berberî	Rekabet
binkî (xwecîh)	Yerli
bavik	Klan

bestlêhatin
berwarî
bergirtî

İlham Almak
Yatay
İçe Kapanık

C

cure
cudayî
cudâ
cihê
cîgeyî
candarîti
civat
civakparêz
co (coh, cok)
cemser

Çeşit
Değişiklik, Ayrılık
Ayrı
Ayrı
Yerel
Animizm
Cemaat
Toplumcu
Kanal
Kutup

Ç

çalak
çendaniyî
çendanî
çawanî
çandinî
çandiyar
çêker
çivdan
çeq
çivok
çolter
çin
çinçînîbûn
çarenûs

Aktif
Nicel
Nicel
Nicelik
Tarım
Tarımcı
Yapıcı
Sıvışmak
Bileşke
Dönek
Kir
Sınıf
Sınıflaşma
Alinyazısı

D

daraz
darizandin
destnîşankirin
diyarkirin
derpêşkirin
derpêşî
dozîne
derawa
damezrandin
dahênan
dahêner
dane
desthilatî
desthilatdar
dadmendi (dad)
dêran
dilîn (hest)
derûn (dil, nefis)
derhoze
derbasdar

Yargı
Yargılama
Belirlemek
Belirlemek
Öngörme
Öngörü
Kuram
Konum
Kurmak
İcat
İcatçı
Veri
Yetki
Yetkili
Adalet
Ayrışım
Duygu
Öz
Mucize
Geçerli

dibetî
destpênebûyî
dawer
dilniwazî
derasayî
dirûvtî
diligirtin
dulibî (dubare)
dadwer
dadwerane
di xwe de bihartin
darayî
daxwazname
derbejêr (berjêr)
derbejor (berjor)
dorhêl
daring
daringî
daykanî
devjêbernedan (jêneger)
daringperestî
destekarî
dawênpak
dûrkinin

Olasılık
Bakir
Sembol
Çekici
Olağanüstü
Benzerlik
Öze Dokunmak
İkili
Adil
Adilane
Kendisine Yedirmek
Mali
Dilekçe
İniş
Çıkış
Ortam
Madde
Maddi
Anaerkil
Vazgeçilmez
Materyalizm, Maddecilik
Müdahale
İffetli
Tenkil

E

E

erjeng
esehikirin
ezmûn
erênî
endezyar
efsane
ecizbûn (bêzarbûn)
ewlebûn
ewletî
ewlemend
ewledar
ewletî
ewiqandin
eznavendparêzî
embrîyon (goştperê)
erk
ewlayî (pêbawerî)
encam

Korkunç
Doğrulamak
Deney, Sınav
Olumlu
Mühendis
Söylence
Bıkmak
Güvenmek
Güven
Güvenilir
Güvenli
Güvenlik
Oyalamak
Benmerkezcilik
Ruşeym
İşlev
Güvence
Sonuç

F

F

fikare
fikaredar (bifikare)
fetsînok
firîşte

Sakınca
Sakıncalı
Bunaltıcı
Melek

G

G

gîhanek

Evre

giyan
geşdarî
giramî
giramgir
girambar
girtina navaxwe
guheran
guhêrbar
gengaz
gihîştî
gelemper
gotar
gotegot
goştperê
gewretirîn
girêçk (movik)
girêçkkirin
guftûgo
gêrevêre
girêba (ûr)
gerdûnî
gerdûnîtî
gihanî
geşt
guherînêr
gelo
gemerdan
gerdîş
giyanwer
giyanwerîtî
girsegir
giregir
gumanberî

Ruh
Refah
Saygı
Saygılı
Saygın
Kapsama
Değişim
Değişken
Mümkün
Yetişmiş, Olgun
Genel
Söylev
Söylenti
Embriyon
Muazzam
Eklem
Eklemeleme
Diyalog
Karman çorman
Ur
Evrensel
Evrensellik
Ulaşım
Seyahat
Değiştirici
Acaba
Tekel
Töre
Animist
Animizm
Muazzam
Büyükler
Kuşkuculuk

H

herêna
hewandin
heman
hiş (hişmendî)
hişmend (hişyar, hişdar)
hestyar
herêm
hîkarîker
hilberîn
hilberiner
hest
hevberkirin (kempirandin)
himbiz
hilatin
hevkêşe
hêman
hewing
hevgirtin
holk (seha)
hêza kar

İkilem
Barındırmak
Aynı
Bilinç
Bilinçli
Duyarlı
Bölge
Çarpıcı
Üretim
Üretici
Duygu
Kıyaslama
Sık
Doğma
Denklem
İlke, Eleman
Barınak
Birlik
Saha
İşgücü

hilweşin	Yıkılma
hoveber	İlkel
hov	Vahşi
holik	Kulübe
hermono	Dışlama
hermonobûyî	Dışlanmış
hemdem	Çağdaş
hemzayend	Hemcins
hingofî (fikra sabît)	Saplantı
hewisîn (hînûn)	Belleme
hûrlênêrîn	İrdelemek
hêvotin	Terbiye
hêvojkar (hêvojer)	Terbiyecî

İ

îzafî	Relativ
-------	---------

J

jîrêketin	Sapma
jîyan	Yaşam
jîyanî (jîndarî)	Yaşamsal
jîyanbar	Yaşanabilir
jîyîn	Yaşanmak
jîndewar	Yaşayan
jîndarî	Yaşamsal
jîrêderxistin	Saptırma
jîhevderxistin	Ayırt Etmek
jîhevcihêkirin	Ayırt Etmek
jîhevveqetandin	Ayırt Etmek
jênegar	Vazgeçilmez
jênerew	Kaçınılmaz
jêneqetîn	Ayrılmaz

K

kargêr	Yönetici
kemn	Örtü
kesayetî	Kişilik
kirmişîn	Büzülmek
kevneperest	Tutucu
kiryarî	İcraat
kiryar	İcraatçı
kerese	Malzeme
kenişte	Havra, Sinagog
kirde	Özne
ketûber	Sıradan
kemperandin	Kıyaslamak
kartêker	Etken
kadî	Küresel
kadîbûn	Küreselleşme
ketîbûn	Düşkünlük
kirêt	Çirkin
kaşker	Sürükleyici
ketandî	Yatalak

karesat	Felaket
kan	Maden
kitekit	Ayrıntı
keleş	Eşkiya
kevneşop	Gelenek
kevneşopî	Geleneksel
koçberî	Göç
koçrevî	Tehcir, Göç
kûzik (dîzik)	Çömlek
kûzker	Çömlekçi
kûzkerî	Çömlekçilik
kaşkirin (xiriqandin)	Sürüklemek
kêstiya bixêlî	Yelkenli Gemi
keval	Tablet
keyîti	Monarşi
kadîparêzî	Küreselcilik

L

lihevkirin	Uzlaşma
lêvegerandin	İndirgemek
lihevxiştî (têkel)	Karma
lêrastanîn	Zamanlama
lihevkirî	Tutarlı
lebk	Uğraşı
lebigîn	Uğraşma
lebigandin	Uğraştırma
lewe	Alivyon
liberabûn	İtiraz

M

merhale	Aşama, Evre
mandele	Yadsıma
mandelekirin	Yadsımak, İnkâr Etmek
merc	Koşul
mevred	Torpu
mebest	Niyet
mantîqiyet	Mantıkçılık
mezintirîn	Muazzam
mijok	Sömürücü
mijokatî	Sömürü
mêtingeh	Sömürge
mêtingehkar	Sömürgeci
mêtingehkarî	Sömürgecilik
mêtingehbûn	Sömürgeleşme
mêjîn	Ezeli
mêj	Ezel
miqatebûn	Gözetmek
mikur	İtiraf
mikurhatin	İtiraf Etmek
mehteşî (bêavî)	Susuzluk
mîrate	Miras
mirovnasî	Antropoloji
mirûz	Moral
mehan	Erozyon

mebest
malnişîn (teqawîd)
malnişînbûn

Niyet
Emekli
Emekli Olmak

N

newîn (wad)
nûsazî
nûsazîparêz
nifş
nehebandin
nihiçk
neyînî
nimûnek
nirx
nirxandin
necirandin
nehisguh
navtêdan
nivandin
navbeynkar
nixûmandin
navendparêzi
nîvend (nîskok)
nûghiştî
niçik
nuwaze
niçilandin
notirvan
nûvedan
neberbiçav
nivîsar (deq)
negîhêj (dûrîdest)
nefêambar
nûvedan (dahênan)
nivîstek
nemîş

Vaat
Reform
Reformcu
Kuşak
Yadsımak
Dürtü
Olumsuz
Model
Değer
Değerlendirmek
Yontmak
Laf Anlamaz
Kışkırtma
Uyutmak
Aracı
Örtmek, Bürünmek
Merkeziyetçilik
Odak
Yeni Yetme
Uzantı
Harika
Aşılacak
Bekçi
Buluş
Soyut
Metin
Ulaşılmaz
Anlaşılmaz
İcat
Kitabe
Figür

P

peresîn
peresanparêz
pêşniyar (pêşniyaz)
pêşniyazname
pêşbînî
perestîş
paşverû
pêşverû
pêşgirî
piştgirî (piştewanî)
pêwendî
pêşnûma
pûte
pûte pê dan
pêketî
pêşikî

Evrım
Evrımcı
Öneri
Önerge
Öngürü
İbadet
Gerici
İlerici
Tedbir
Dayanışma
İlgi
Proje
Özen
Özen Gösterme
Uygun
Öncelik

pêşdatir	Öncelikli
pêşeng	Öncü
pêvek (veser)	Ek
pirsyarî	Sorgu
pirsyarîkirin	Sorgulama
peroşdar	Heyecanlı
pêkhatî	Yatkın
perçiqîner	Ezici
pêkhatin	Oluşum
pençeşêr	Kanser
pêzan	Ehil
pîşesazî	Endüstri, Sanayi
pîşe	Meslek
pêşande (pêşanî)	Gösteri
pêşander	Gösterici
pêşangeh	Sergi
pêşandan	Sergilemek
peywir	Görev
peywirdar	Görevli
peywirdarkirin	Görevlendirme
peyman	Sözleşme
perav	Kıyı
pêşenimûne	Prototip
perestxane	İbadethane
pûtperestî	Fetişizm
pirole	Mübalâğa
perizîn	Kult
pêkutî (çewsan)	Baskı
peyvnasî	Etimoloji
pençik	Kıskaç
pirejmarî	Çoğul
pevratî	İttifak
peyîtandin (helsingandin)	Saptama
pargîdanî	Şirket
paşdeavêtin (texpaşkirin)	Erteleme
pêşdarazî	Önyargı

Q

qeyran	Bunalım
qad	Alan
qanî	İkna
qambost	Cüce
qesirbendî	Mimarlık
qutebir (mîsoger)	Kesin, Kati
qirase	Kaldıraç

R

rewişt	Karakter
rêveberî	Yönetim
rêvebirin	Yürütme
rolativ	İzafi
raberkirin	Öngörme
raçandin	Dokuma
rêxistin	Örgüt

rêz
rêzdarî
rûmetgiran (rûmetbilind)
rewa
rojanî
raperîn
rêbaz (rêûdirb)
rewşeparêz
ragihan (ragihîn)
ragihandin
rîwek
resen
rave
ravekirin
rasyonâlîzm
rêzik
raborî (rabirdû)
reşbînî
rêgeh
rikdar
rûxalî (serveyî)
rojev
rojaneyîtî
raselitîn
rexneyî
rakêşer
rewşedar
rûxîner
rêze
razdarî
rêje
rêzikparêz

Saygı
Saygı
Saygı Deger
Meşru
Aktuel
Ayaklanma
Yöntem
Statükocu
İletişim
İletmek
Bitki
Özgün
İzah
İzah Etmek
Akılcılık
Kural
Geçmiş
Karamsarlık
Rota
İnatçı
Yüzeysel
Gündem
Güncellik
Musallat
Eleştirel
Çekici
Muhteşem
Yıkıcı
Paradigma
Mistisizm, Tasavvuf
Nispet, Oran
Kuralcı

S

sermiyan
sêrebend
sexbêrî
sepan, sepîn
spekulatîf
sawîn
sazûman
sazî
suxre
suxrevan
safî
sûd
sûdmendbûn
sûdmend
serenc
serencperest
sêwiran
sêwirandin
serkî (ne kûr)
sosret (seyr)
seresazî

Sermaye
Büyücü
Tutum
Uygulama
Kurgusal
Yanılsama
Sistem
Kurum
Hizmet
Hizmetçi
Net
Yarar
Yararlanma
Yararlı
Macera
Maceracı
Tasarım
Tasarlamak
Sığ
Düşündürücü
Üstyapı

serveyî
sêbare (sêlibî)
sift
sulav
sîqilandin
sazûbûn
sîqalkirî
saw (erjeng)
silûk
serkutî
semax (tehemûl)
serhildêr

Yüzeysel
Üçlü
Yoğun
Çağlayan
Tahrik
Kurumlaşma
Cilalı
Korkunç
İnziva
Baskı
Tahammül
İsyancı

S

şanazî
şeml
şaristanî
şaşî
şelipîn
şewşandin
şarwer
şoreş
şêwe (teşe)
şêweparêz
şêwandin
şêwegirtin
şareza (şarmend)
şopîner
şûnwarnas
şûnwarnasî
şehitîn (şehtbûn)
şehitandin (şehtkirin)
şorind (waz)
şiyandar
şalyar
şêwedarbûn
şanîder

İftihar
Muazzam, Görkem
Uygarlık
Yanılğı
Yanılma
Çarpıtma
Sivil
Devrim
Şekil
Şekilci
Şekillendirme
Şekillenme
Uygar, Medeni
Takipçi
Arkeolog
Arkeoloji
Felç Olmak
Felç Etmek
Vaaz
Kadir
Vezir
Formasyon
Gösterge

T

tirsnak (erjeng)
tirsdêr (çavşikên)
teqez
têgîn
têgihîn
teorî (Nazariye, Waz)
têkel (lihevxiştî)
takekes
takekesparêzî
takekesitî
têborîn
tepisandin (tepeserkirin)
teriqet
teraz
terazdar (biteraz)

Vahim, Korkunc
Korkutucu
Mutlaka
Kavram
Anlayış
Teori
Karma
Birey
Bireycilik
Bireysellik
Vazgeçme
Bastırmak
Tarikat
Denge
Dengeli

terazîker	Dengeleyici
tevlihev	Karışık, Karmaşık
teşe (şêwe)	Şekil
tekûz	Yetkin, Mükemmel
tevînek (vehûn)	Doku
taybetî	Özellik
taybetmendî	Özgü
têgihîştin	Anlamak
tênegihînî	Anlayışsızlık
tênegihîştin	Anlamamak
tamandin (ji bo daran)	Aşılmak (Ağaçlar için)
têkdan	Çökertme
têkçûn	Yenilme
têkbirin	Yenme
tiral	Tembel
tundraw	Radikal
tomerî (pêkveyî)	Toplu
totemtî	Totemcilik
term	Ceset
tek û bertek	Etki – Tepki
tîkane	Dikey
texpaşkirin (paşdeavêtin)	Erteleme

U

utopia	Ütopya
utopîst	Ütopyacı

V

vehewandin	Barındırmak
vehewîn	Barınmak
veguherîn	Dönüşüm
veqetîn	Ayrılış
veguhêzîn	Aktarılma
veguhastin	Aktarma
veguhêzkar	Aktarmacı
veavabûn	Yapılanma
venêran	Denetim
venêr	Denetimci
venêrîn (venihêrtin)	Denetleme
vehûn (tevînek)	Doku
vebizav	Tepki
veser (pêvek)	Ek
veserbûn	Eklenme
veserkirin	Eklemek
vebijark	Seçenek

W

wekhevî	Eşitlik
wekhevîxwaz	Eşitlikçi
wergirî	Kapsam
wesf (çawanî)	Nitelik
wêrekî	Cesaret
wêrek	Cesaretli

X

xêlî	Örtü
xweşnedîtin	Yadırgama
xweferzkirin	Dayatma
xûnifandin (xûnaftin)	Özümsemek
xûnifîn	Özümlenmek
xelwetxane	Manastır
xwepereşt (ezpereşt)	Bencil
xeternak	Vahim, Tehlikeli
xebatbarî	İşlerlik
xemilandin	Donatım, Süslemek
xasûk	Kurnaz
xulam	Uşak
xemsarî	İhmal
xwezî	Öykünme
xurifîn	Bunamak
xwepêşan	Gösteri
xizm (lêzim, nêzîk)	Akraba
xweyîbûn	Beslenme
xwedawend	Tanrıça
xwedanî (xwedîtî)	Sahiplik
xwedan (xwedî)	Sahip
xiniz (zexel)	Sinsi
xepirî (hilxepirî)	Deşilmek
xepirandin	Deşme
xwemalî	Aidiyat

Y

yawe	Safsata
yeke	Ünite

Z

zanist	Bilim
zanistî	Bilimsel
zanyar	Bilim Adamı
zanko (zanîngeh)	Üniversite
zayend	Cins
zelal	Duru, Net
zîlal	Şeffaf
zexel (xiniz)	Sinsi
zanakî	Bilgece
zordest	Zorba
zorlêker	Zorlayıcı
zerengî	Kapasite

HINEK KURTKIRIN

HINEK KURTKIRIN

DYA	Dewletên Yekbûyî yê Amerika
YE	Yekîtiya Ewropa
KYD	Koma Yekbûna Dewletan
DMME	Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa
PMME	Peymana Mafê Mirovan a Ewropa
KE	Konseya Ewropa
BZ	Berî Zayînê
PZ	Piştî Zayînê
PMME	Peymana Mafê Mirovan a Ewropa